# KILAM & STRANÊN KURDÎ

Amadekar: Cewad Merwanî

BI NOTA & GOTIN



avesta | MÛZÎK: 310 | 4
**KILAM & STRANÊN KURDÎ**
**Bi Nota &Gotin**
**Berhevkar:** Cewad Merwanî
**Nota:** Sherko Hamasalih Chingiani

**Berpirsê Giştî:** Abdullah Keskin
**Amadekariya Weşanê:** Sacha Ilitch
**Berg:** Azad Aktürk
**Wêneyê Bergê ê Navê:** El Cezerî
**Wêneyê Bergê ê Kiras:** Mînyatûrên Şerefnameyê (Avesta, 2007)
Ji "Meclisa Mîrê Botan" û "Kela Egil"ê detay
**Rastkirin:** Avesta
**Rastkirina Soranî:** Kakşar Oramar
**Çapa Yekem:** 2010, Stembol

Çap: Berdan Matbaası
Sadık Daşdöğen Davutpaşa Cad.
Güven San. Sit. C Blok, No: 239
TOPKAPI / İSTANBUL
Tel: (0212) 613 12 11

© Weşanên Avesta. 2010
Ji xeynî danasînê bêyî destûra weşanxanê bi tu awayî nayê zêdekirin

**Sertifika no: 13193**

**AVESTA BASIN YAYIN**
**REKLAM TANITIM MÜZİK DAĞITIM LTD. ŞTİ.**
Şehit Muhtar Mahallesi Atıf Yılmaz Caddesi Öğüt Sokak No: 7
BEYOĞLU / İSTANBUL
Tel-Fax: (0212) 251 44 80 - (0212) 243 89 75

Ekinciler Caddesi
Nurlan Apt. Giriş Katı No: 2
OFİS / DİYARBAKIR
Tel-Faks: (0412) 223 58 99

www.avestakitap.com / info@avestakitap.com

**ISBN: 978-605-5585-16-7**

Amadekar: Cewad Merwanî

# Kilam & Stranên Kurdî

## Bi Nota & Gotin

avesta

HEINRICH HEINE
UNIVERSITÄT
DÜSSELDORF

Yilmaz Ersahin M.A.
Heinrich Heine Universität Düsseldorf
Empfehlungsschreiben zum Buchprojekt von

Herrn Cevat Akin

Sehr geehrte Damen und Herren,

Ich kenne Herrn Cevat Akin seit dem 2001, als er im Rahmen der Vorbereitung auf sein Buchprojekt „Kurdische Musik" an meiner Lehrveranstaltung „Filme & Musik der Migranten in Deutschland" (SS 2006) an der Heinrich-Heine-Universität Düsseldorf teilnahm. Ich betreute ihn während der kompletten Phase (von der Vorbereitung bis hin zur Verfassung und Nachbereitung) seines Buchprojektes. Das Musikbuch mit Noten besteht aus mehreren tausend Liedern von Tanzlieder bis hin zur traditionellen kurdischen Bardenlieder. Sie sind von alters her die Bewahrer der alten Geschichten und der mündlich tradierten Poesie.

In ihren Sprechgesängen geht es zumeist ausgesprochen melancholisch zu; die Sehnsucht, die Liebe, die Heimat sind die Themen, von denen sie erzählen. Abgesehen von der musikalischen Intensität verstehen sich die Barden auch als Chronisten, denn ihre Lieder sind gleichzeitig das musikalische Archiv ihrer kulturellen Identität. Westeuropäische Musikwissenschaftler und Historiker beschäftigen sich seit langem mit dieser einzigartigen Überlieferung und versuchen, sie durch Dokumentation vor dem Vergessen zu retten. An dieser Stelle leistet Herr Akin eine Pionierarbeit, die in den von Kurden bewohnten Ländern wegen der Verbote ihrer Kultur gar nicht möglich wäre.

Sein Buchprojekt „Kurdische Musik" zu publizieren kann ich mit allem Nachdruck unterstützen. Es wird für ein interkulturelles Zusammenleben von grosser Bedeutung sein, wenn auch Menschen aus der Aufnahmegesellschaft die Möglichkeit haben, die Kultur des Anderen zu erfahren und mit zu erleben.

Mit freundlichen Grüßen

Yilmaz Ersahin

**NAVEROK**

CEWOYÊ BAŞOTÎ / 15
PÊŞGOTIN / 17
SPASÎ / 20

GOTIN Û NOTA / 23

ALLA / 25
ALLA MEHMÛD / 26
AMÎN AMÎNÊ / 27
AMÎNÊ GIYAN / 28
AMÎNE SÛRE GUL / 29
AMÎNÊ Û AMÎN / 30
AMÎNÊ SÛRE GUL / 31
AMOZA GIYAN / 32
ARAMÎ GIYANIM / 33
ASÊ / 34
AŞÎNA / 35
AVA SORGULA / 36
AX DÊ Û BAVÊ ME / 37
AX HINARÊ HINARÊ / 38
AX LÊ DÎNÊ TORÎNÊ / 39
AX LÊ GULÊ / 40
AX LOLOY ZAVA / 41
AX Û EMAN ŞIKRAYÊ / 42
AXAWO / 43
AXEW AXE / 44
AY DÎ L / 45
AY LÊ KINÊ / 46
AY LÊ NURÊ / 47
AY LO DILO / 48
AY NÊRÎ NÊRÎ / 49
AY NERME / 50
AY NÎZAM / 51
AY ŞIL / 52
AY SÎLÊ NAZENÎNÊ / 53
AYŞOKÊ / 55
AZÎZEKEM / 56
AZÎZEM BEYANÎ / 57
AZÎZIM TO GULEKEMÎ / 59
BA BIÇINE NAW SILÊRAN / 60
BA LÊNÊN / 61
BA WA BÊ / 62
BANA BANA / 63
BARAN BARAN / 64
BARAN BARAN E / 65
BARANE / 66
BERBANEKÊ / 68
BEVLEKAN / 69
BAWANEKEY BAWIM / 70
BAXEWAN / 71
BAY ŞEMAL / 72
BAZÎ BÊYAN / 74
BÊ DIKTOR / 75
BE DÎNARÎ / 76
BE GULAN Û BE GULAN / 77
BE Î'NWANÎ / 78
BE LERZANE / 79
BE TEWRAT / 80
BÊ TO HELNAKEM / 81
BE YADÎ M KEN / 82
BEHAR HATEWE / 83
BEHARAN ÇE MEHZUN / 84
BEJNA ZIRAV / 85
BEJNÊ / 86
BEJNÊ / 87
BEJNOKÊ / 88
BELÊ EWSA DILÊKIM BÛ / 89
BÊLIM LO / 90
BENAZ GIYAN / 91
BER ÇELA / 92
BL..ÇELAN / 93
BER H..' BÊNE / 94
BERÎ BANU / 95
BÊRÎVANÊ / 96
BERIYÊ TÊ / 97
BÊRIYÊN SIBEHIYAN / 98
BÊRTÎ BÊRTÎ / 99
BÊRYA ÊVARÊ / 100
BERZÎ BERZÎ / 101
BEW BEW / 102
BEXDAYÊ / 103
BI ÇI YE / 104
BI ZEYIN / 105
BIHÊRE DESTAR BIHÊRE / 106
BI LBILO SEYRANIYO / 107
BILÛRVAN / 108
BINDANE Û HA BINDANE / 109
BINYA MALAN / 110
BIZINÊ / 111
BIZMAR E Û BIZMAR E / 112
BO FIRIBÎ AŞIQAN / 113
BO MINI T NAWÊ / 114
BOM BILÊ TOZE TOZE / 115
BONÎ HELALA DÊ / 116

BOR BOR / 117
BOY DÊNIM / 118
BUHARÊ HAT BUHARÊ / 119
BÛK Û ZAVA / 120
BÛKÊ DELALÊ / 121
BÛKÊ DELALÊ / 122
BÛKÊ DELALÊ / 123
CANE CANE / 124
CANÊ CANÊ / 125
ÇAROKE HEWLÊRIYE / 126
ÇAROKÊ / 127
ÇAROKÊ / 128
ÇAW CIWAN / 129
ÇAWÊ LÊ ÇAWBAZAN / 130
ÇEÇ HO HO / 131
ÇELE LI BER ÇELAN / 132
CELEBAN / 133
CELSE / 134
CEMEDÊ / 135
CEMÎLE GIYAN / 136
CEMÎLE / 137
CEMÎLE / 138
CENDIRME / 139
CENDÎ RME / 140
CEROY / 141
CÎRANÊ / 142
CIWABÊKIM DEWE / 143
CIWANÎ / 144
CIYÊ GOVENDÊ / 145
CIZÎR E / 146
COTKARO LO / 147
ÇELÎ XÊRÊ / 148
ÇEN CIWANÎ / 149
ÇIL KEZÎ / 151
ÇÎNG Û ÇING / 152
ÇING Û ÇING / 153
COXÊ MINO / 154
COXO / 155
ÇÛM CIZÎRÊ / 156
ÇÛM HELEZO / 157
ÇÛM MÛŞÊ / 158
DARA LI BAV DARA / 159
DAYÊ MÎRO VANA / 160
DAYÊ NASTÎNIM / 161
DAYNÊ / 162
DÊ BIÇIN MÛSILÊ / 163
DE BIÇÎN ZOZANAN / 164
DÊ BIDIN ME BÛKA ME / 165
DE BILA BÊTO ROBARO / 166
DE DERXIN / 167
DE GIDÎ MALA MIN / 168
DE GIDÎ NAR / 169
DE GULÊ HEY NABE / 170
DE KINA MIN KINA MIN / 171
DE LÊ LÊ WANÊ / 172
DE MEGRÎ MEGRÎ / 173
DE MEGRÎ MEGRÎ / 174
DE MEGRÎ MEGRÎ / 175
DE SIWARO / 176
DÊ WERÎ N GULA BIÇÎNIN / 177
DE YOYO / 178
DEBARÊ BARAN / 179
DEÇIME SER NALEŞ KÊNÊ / 180
DEÇME REWANDI Z / 181
DELALÊ YARE WEZO / 182
DELALÊ YAR WEZO / 183
DELAL E / 184
DELAL E / 185
DELÎL YARÊ / 186
DELÎLO WEY LO / 187
DELOY ZAVA / 188
DEM KUL / 189
DEMA ME /190
DEMAXIM WEZNE / 191
DENG DÊ LE ŞÎLANEKEY / 192
DENG NAKIM / 193
DENG NAKIM / 194
DER KANIYOKÊ NEFELE / 195
DÊRA HOZÊ / 196
DÊRE SORÊ BIÇÛKÊ / 197
DERDÎ HÎCRAN / 198
DERDI T LE MIN / 199
DERÊ MALA ME AV E / 201
DÊRE SORÊ / 202
DERJÊ / 203
DERKETO STÊRKA GEŞ E / 204
DERKEVE DERKEVE / 205
DERWAW BECÊM DÊLÊ / 206
DESMAL H'ERÎR / 207
DESMAL H'ERÎRÎ SÛRE / 209
DESTMALÊ / 210
DEŞTA MUŞÊ / 211
DESTMALA MIN / 212
DEV ZER / 213
DÊWANE BÛM MIN/ 214
DEYHÊNIM / 215
DI BAXAN / 216
DE BI LÛR LÛR TEŞIYÊ / 217
DÎDEM ZARA / 218
DÎLBERAM DÎLBER / 220
DILÊ TE FIRE YE / 221
DILEKEY WERGIRTIM / 222

DILÊM BIRIN ESKERÊ / 223
DILO MENAL / 224
DIMDIM (XANÎ DIMDIM) / 225
DÎN DELAL / 226
DÎNÊ CAN / 227
DÎNÊ MERO DÎNÊ / 228
DIYARBEKIR / 229
DOLAVÊ / 230
DON DON / 231
DONDIR XAN / 232
DOTMAM / 233
DÛ BE DÛ / 234
DÛ SER LE SER / 235
DÛ SÎWARÊN TÊNO / 236
DÛA' / 237
DUGMET DAXE / 238
DULBERÊ ÇAWMEST / 239
Ê WELE MAŞALLAH / 240
Ê WELE / 241
EBA YE / 242
EDLÊ RABE SIBE YE / 243
ELIFÊ / 244
ELWEN / 245
EMAN DERDIM ÇAREKE / 246
EMAN DIKTOR / 247
EMAN EMAN ZEKIYA / 248
EMAN EMAN / 250
EMAN EMAN / 251
EMAN KEJÊ / 252
EMAN KOÇERÊ / 253
EMAN SEBRÎ / 254
EMAN YARÊ / 255
EMAN EWBERE / 256
EMÊ KÈ'W KÊ BI ZAVA KIN / 257
EMER AXA / 258
EMÎNE EMÎNE / 259
EMÎNE / 260
ÊMO / 261
ÊMO / 262
EMREKEM ÇAVEKEM / 263
ÊRAN XOŞ E GERMÊN / 264
ÊRAN / 265
ERÊ BAZO / 266
ERÊ BÊNE / 267
ERÊ HAT / 268
ERÊ HO LEYLÎ / 270
ERÊ LAWJE / 271
ERÊ MAMEDO / 272
ERÊ NAZ / 273
EREBÊ MIN / 274
EREBO YAR EREBO / 275
EREV E / 277
EROY HOXIR / 278
ÊŞEK HAT / 279
EVRO BIHAR E / 280
EW KIÇE LEW MALE / 281
EWE HAT / 282
EWRÊ SER ME / 283
EY BE HERMÊ / 284
EY GERDE / 285
EY HERÎR HERÎRE / 286
EY WEY LERZANE / 287
EYNIKÊ / 288
EYŞÊ CANÊ / 289
EYŞÊ / 290
EY GULFIROŞ TA KEY / 291
EZ BEFR IM / 292
EZ BERF IM / 293
EZ ÇÛME CIZÎRÊ / 294
EZ LEYLA ME / 295
EZ NE DÎN IM / 296
EZ PÎRO ME / 297
EZ TEYMEZ IM / 298
EZÎZIM / 299
ÊVAR E BI RO DERENG E / 300
FATIM GULA MICLÎSA / 301
FATMAYÊ / 302
FATIMOKÊ / 303
FEQÎ / 304
FERAT / 305
FERŞÊ KANIYÊ / 306
FERZÊ / 307
FIKIR EZ BIRIM ÇIYAYÊ ME / 308
FÎNCANÊ HA FÎNCANÊ / 309
FITILÎ / 310
GELAWÊJ / 311
GELO EW KÎ YE / 312
GENIMO / 313
GERMA HAVÎNÊ / 314
GEWHERÊ / 315
GEWHERÊ / 316
GEWRÊ LÊ / 317
GIJILOKÊ / 318
GIRTIMI T BESTIMIT / 319
GIRYANIM DÊ / 321
GIYAN Û GIYAN / 322
GIYAN Û GIYAN / 323
GIYANE BESTEYÎ / 324
GOWEND E / 325
GOZELÊ GOZELÊ / 327
GÛL BEHBÛNÊ / 328
GULXIMDAN / 329

GULA ZER / 330
GULA ZER / 331
GULA ZER / 332
GULALE SURE / 333
GULÊ GULÊ / 334
GULÊ HATÎ / 335
GULÊ HEYRANÊ / 336
GULÊ HOY NAR / 337
GULÊ HOY NAR / 338
GULÊ MALIM GULÊ / 339
GULGULÎ / 340
GULÎ MIHABADÎ / 341
GULÎZER / 342
GULÎZER AY GULÎZER / 343
GULÎŞAN / 344
GULŞÊNA MIN / 346
GULŞÊNÎ / 347
HA BÊWO / 348
HA BI ÇEND E / 349
HA BI DARAN E / 350
HA ÇEMO ÇEMO / 351
HA ÇI KIR ÇI KIR / 352
HA DER BÛ / 353
HA GULÊ HA GULÊ / 354
HA JI ME WÊ DA / 355
HA LAWÎN / 356
HA LERÎ / 357
HA LEYLO / 358
HA LI SER ME / 359
HA MIN DÎ LI BANA / 360
HA NANA / 361
HA WER LÊ / 362
HACÎ MERYEM / 363
HARO BASO / 364
HA JI VÊ TÊLÊ / 365
HAT KARWAN E / 366
HATEWE / 367
HATIN / 368
HAWAR MENDO / 369
HAWAR Û SED HAWAR / 370
HA WER LÊ LÊ / 372
HEY BERDE BERDE / 373
HAY DIL DILO LO /374
HAY GO CAN / 375
HAY MEŞKÊ / 376
HAY NA NÎNAY / 377
HAY NÎNA DE BI RÊ BUKÊWO / 378
HAYÊ / 379
HAYLÊ / 380
HAYLÊ / 381
HÊ BI GOVENDÊ / 382
HEBÊ LEBÊ / 383
HEDYAYÊ / 385
HÊJÎRA LATÊ / 386
HÊL JI HÊLÊ / 387
HELE HELA / 388
HELEB / 389
HELEBÊ / 390
HÊLÎ HESENO / 391
HELLAME / 392
HEMKÊ / 393
HER EYŞÊ / 394
HER BÊLIM LO / 395
HER BÊLIM / 396
HER BÎNIN / 397
HER DERWA Û BÊCEM DÊLÊ / 398
HER DOLABÊ DOLABÊ / 399
HER FATIMÊ / 400
HER WAYE / 401
HERÊ RINDÊ / 402
HERÊ ZERDÊ / 403
HÊRÎLLA MAŞÊLLA / 404
HÊRÎZAR / 405
HERMÊ / 406
HERNE BERIYÊ / 407
HESENÊ AXÊ DELAL E / 408
HESO BI HEYRANO / 409
HESO YAN YA DINYAYE / 410
HESÛKÊ MEHRÛMÊ / 411
HETANÎ HEBIM / 412
HEWAR E / 413
HEWARÎ XALÎ / 414
HEWÎ / 415
HEWRÎ LE KOL / 416
HEY BÊ / 417
HEY BÊ / 418
HEY BELLAR / 419
HEY BÊMO / 420
HEY BÊNIN BÊNIN / 421
HEY BERÎ / 422
HEY BÊZALÊ / 423
HEY BO HELLAME / 424
HEY ÇOXE / 425
HEY DEBIRO / 426
HEY DENWÊ / 428
HEY DESTO / 429
HEY DOTMAMÊ / 430
HEY GUL HEY GULÊ / 431
HEY GULÊ GULÊ / 432
HEY GUNDO / 433
HEY HEY BERÎ GOVENDÊ / 434
HEY HÎBO / 435

HEY LE DÛR DA HATÎ / 436
HEY LO HEY ŞERÎNÊ DE WER / 437
HEY LO LO MÎRO / 438
HEY NAR / 439
HEY NARÊ / 440
HEY NAYE NAYE / 441
HEY PÊ DE / 442
HEY RAKIN XATÛNÊ RAKIN / 443
HEY RENÎ / 444
HEY ROBARE ROBARE / 445
HEY ŞANÊ / 446
HEY SÎNEMÊ / 447
HEY SOSİ N / 448
HEY WELATO / 449
HEY XAN / 450
HEY YARAN / 451
HEYDER AXA / 452
HEYLA KINÊ / 453
HEYRAN HEYRAN E / 454
HEYRANO / 455
HÎCRÎ YAR / 456
HO LEYLÎ / 457
HO LEYLO CAN LEYLO / 458
HO REŞO / 459
HOPLERÎ / 460
HOY CANO / 461
HOY CER HOY CER / 462
HOY ÇIYAWO / 463
HOY DELÎL / 464
HOY DIL / 465
HOY Dİ L / 466
HOY DIL / 467
HOY DÎLAN / 468
HOY GUL / 469
HOY HOY LEYLO / 470
HOY LELE / 471
HOP LEYLO / 472
HOY LÎLAN TOY LÎLAN / 473
HOY MEŞKÊ / 474
HOY MÎR HOY MÎR / 475
HOY NÊRGIZ / 476
HOY NERMÊ / 477
HOY ŞÊXÊ MINO / 478
HOY ŞIRNEXÊ / 479
HOY SORÊ / 480
HOY YEMAN (BAVÊ FEQÎR) / 481
HÛNÊ LÊ NARÎNA MIN / 483
HÛR CEMED / 484
HÛRIK HÛRIK BARANÊ / 485
ÎRO DÎSA / 486
ÎRO ROJA RIHETÊ / 487
JARO / 488
JI BERÎYÊ TÊ / 489
JI ÊVAR DA / 490
KA BÛKA MIN / 491
KANÎ Û SERKANÎ / 493
KANÎ / 494
KANYA LI PAL BENDA / 495
KANYÊ LI GUNDA / 496
KARWANE /497
KARWAN E / 498
KATÎ BEHARE / 499
KÊ MINÎ KUŞT / 500
KEÇ MEYROKÊ / 501
KÊÇAN XWARIM / 502
KEÇÊ TU KEÇA GULAN Î / 504
KEÇELO / 505
KEJÊ TU KEJ Î / 506
KEKO EHMEDO / 507
KELEŞO NOBEDARO / 508
KEMBER ZÊR / 509
KEMERE ŞIL / 510
KEYAN / 511
KEPRA ÇÊKIN / 512
KER KANÊ / 513
KERÎM LAWO ÇEQILMAST / 514
KES NAZANÊ / 515
KET XERMIYANÊ / 516
KETAN KETANE / 517
KETANE / 518
KETANE / 519
KEVOK IM LÊ LÊ / 521
KEW HÊLÛN HÊLÛN / 523
KEWMIL / 524
KEWYAR / 525
KEZÎ ZER / 526
KEZÎ ZERÊ / 527
KÎ ÇU BAJÊR / 528
KÎJAN DEÇINE MÊRGOLAN / 529
KÎJÊ MERO CIWANÎ / 531
KÎJÊ XOY DAWIM NÎŞAN / 532
KÎJOLEY NAZDAR / 533
KINA MIN / 534
KINGA MIN / 535
KIRAS KUDERÎ AWRÎŞIM / 536
KIRAS REŞ / 537
KIRAS REŞÊ / 538
KIRAS ZERDÊ / 539
KIRAS ZERDÊ / 540
KIRASÊ MEYRO / 541
KIRASÊ TE MELES E / 542
KIRASÊ TE MELES E / 543

KIRMAŞAN / 545
KIŞ MIRIŞKÊ / 547
KIWÊSTANAN XAL XAL / 547
KOÇER JI DASINÊ TÊNO / 548
KOÇERÊ / 549
KOÇÎ LEYLA / 550
KOFÎ KÊTAN / 551
KOLAN BE KOLAN / 552
KOLWANE SUR TOBE BÊ / 553
KULA DILÊ MIN WELAT / 554
KULENDE / 555
KULINDE / 556
KUR ŞIVAN E / 557
KURKO TALAN TALAN / 558
KURTÊ HAT / 559
LADE / 560
LAMLE BE DESTAN / 561
LANEW HEY LANIT KEM / 562
LANEW LANIT KEM / 563
LANIK LANKOLÊ / 564
LAW HEYRANO / 565
LAWE / 566
LAWIKO MÎRZO / 567
LAYE LAYE / 568
LE BAXÎ SÎNE / 569
LÊ BEJNÊ / 570
LÊ BI GOVENDÊ / 571
LÊ BI HOLÊ / 572
LÊ BÛKÊ / 573
LÊ DAYÊ / 574
LÊ DELALÊ / 575
LÊ DÎLBERÊ / 576
LÊ DÎN / 577
LÊ DÎNÊ / 578
LÊ ESMERÊ / 579
LÊ GOZÊ / 580
LÊ GOZÊ / 581
LE GUL Û LE GULAN / 582
LÊ GULÊ / 583
LÊ GULÊ / 584
LÊ HELÊ WERE / 585
LE KOLANÎ TENGEBER / 586
LÊ LÊ BÛKÊ / 587
LÊ LÊ DÎNÊ / 588
LÊ LÊ DÎNÊ / 589
LÊ LÊ KINÊ / 590
LÊ LÊ KINÊ / 591
LÊ LÊ MEYRO / 592
LÊ LÊ NÛRÊ / 593
LÊ LÊ QÎZAM XASA MIN / 594
LÊ LÊ WESÊ / 595
LÊ LÊ WESO / 596
LÊ LÊ XIMŞÊ / 597
LE MAL HATE DER / 598
LE MÊJE / 600
LÊ MEYRÊ MEYREMÊ / 601
LÊ MIBETÊ / 602
LÊ NAZ / 603
LÊ NAZÊ / 604
LE NÊW REŞMALÎ XÊLAN / 605
LE NÊW SABLAX DA / 606
LE PÊ DA / 607
LE PÊDAW PÊDA / 608
LE SÎLEY QEBRAN / 609
LÊ WENDÊ / 610
LÊ XANIMÊ / 611
LE XIŞE XIŞEY / 612
LÊ YARIM YAR YAR TIRKÊ / 613
LÊ ZEYNEVÊ / 614
LEBER LENCEW LARÎ TO / 615
LE BER NAZÎ ÇAW BAZAN / 616
LEBER NAZÎ ÇAWBAZAN / 617
LEGER LEGER / 618
LÊM YAXÎ / 619
LEM ZÎZ BUWE ÇAW KEJALIM / 620
LENCE / 621
LÊRLÊ GULÊ / 622
LESER KEPIRÎ SEPANAN / 623
LEW DÎNÊ Û DÎNÊ / 624
LEYLÎ BAWANIM / 625
LEYLO ZIRAVÊ / 626
LEYLO / 627
LEZO / 628
LI BAZDANÊ / 629
LI BINYA KELÊWO / 630
LI KENDALA / 631
LI MÊRGÊWO / 632
LI MÊRGÊWO / 633
LI MIN ESKERO / 634
LI SERBANE / 635
LÎ SEYRANA / 636
LÎMO HEY LÎMO / 637
LÎZANE / 638
LO BERDE / 639
LO BI LAWO / 640
LO BI LORIYE / 641
LO COTKARYO / 642
LO DILO DILO / 643
LO GEDE / 644
LO GIDYO PÎREMÊRO / 645
LO LAWO / 646
LO LI MIN LI MIN / 647

LO LO MIHEMEDO / 648
LO LORÎ HELÎM CAN / 649
LO REZO / 650
LO ŞIVANO / 651
LO LO PISMAMO / 652
LOLOY ZAVA / 653
LORKE LORKE / 654
LORKÊ LORKÊ / 655
LORKÊ Û LORKÊ / 656
LOY LIMIN / 657
MALAN BAR KIR / 658
MALE BABIM BÊ WEFA / 659
MALÊ MIN / 660
MALKA ŞEMO / 661
MALKÊ ME / 662
MAMANÎ / 663
MAMÊ ŞIWAN / 664
MAMIR MAMIR / 665
MAŞALA BEDIRXAN BEG / 666
MASÎKO / 667
MASÎKO / 668
MAYEY JIYANIM / 669
ME'BÛBÊ YARÊ / 670
MELAZGIR / 671
MELE CIWANEKE / 672
MELLÎ MELLÎ / 673
MEMANÎ / 674
MEMO / 675
MEMYAN E / 676
MEMYAN E / 677
MENALE BULBUL / 678
MEND E MEND E / 679
MÊNDÊ MIN / 680
MENDÎL / 681
MENDO / 682
MERD IM MERD IM / 683
MÊRDÎN E / 684
MERHEBA / 685
MERYEMÊ / 686
MERYEMÊ / 687
MERZIYE / 688
MEST IM / 689
MESTÛRE / 690
MÊVAN / 691
MÊVAN / 692
MEVLÎD SALE YE / 693
MEYRANÊ / 694
MEYREMÊ / 695
MEYRIKÊ / 696
MI LAWÎNE / 697
MÎN GURCÎ / 698
MIN DELÊM / 699
MIN GOT XEZALÊ / 700
MIN GOT ZEYNÊ ZEYNEMÊ / 701
MIN JI HELEB / 702
MIN TE DÎT / 703
MIN ZAXOKÊ DIKAN VEKIR / 704
MINARA SÊRTÊ / 705
MÎNE XANIM MÎNE / 706
MÎNE / 707
MÎRKÊ WANÊ / 708
MIRYEM BOKANÎ / 709
MÎRZE ME / 710
MÛ NAPISÊNIM / 711
MÛMEDAR / 712
MÛMINE / 713
MUTRÎBÎ H'ERÎFAN / 714
MÛZÎRKA / 715
NABE / 716
NAÇME LEQATÊ / 717
NADE / 718
NALBENDANO / 719
NAMDIWÊNÎ / 720
NAR HOY NAR / 721
NAR NARÊ / 722
NARÊ / 723
NARÎN / 724
NARÎN / 725
NARÎNÊ / 726
NARÎNÊ / 727
NASK Û CIWANÎ / 728
NASTÎNIM / 729
NAWÊRIM BILÊM / 730
NAYE NAYE / 731
NAYLONE / 732
NAYNIR NÎNA / 733
NAZ MEKE / 735
NAZANIM LE KÊ PIRSIM / 736
NAZDAR Û BE BEHANE / 737
NAZDAR Û NAZDAR / 738
NAZDAR / 739
NAZÊ / 740
NAZENÎN / 741
NAZENÎNÊ / 742
NE LI MAL E / 743
NEÇÎRVANO / 744
NEMAM NEMAME / 745
NEMIRDÛY HER MAWÎ TO / 746
NÊRÎME / 747
NESÎHET BÊ / 748
NEWROZ / 749
NÎME ÇARE / 750

NÎME ÇARE / 751
NÎNA NÎNA ÊMO / 752
NÎNA / 754
NÎNAYÎ TE ME / 755
NÎNIK NÎNIK NÎNARÊ / 756
NÎNIM NÎNIM / 757
NÛRÎ RÛXSARIT / 758
OKÊ KAŞON / 759
ORDEK IM / 760
ORMIYE / 761
OY NÊRGIZ / 762
OZMANO / 763
PAYÎZE LE MIN / 764
PAYÎZ E / 765
PEPÛ SULEYMANÎ / 766
PEPÛLEY ŞEM / 767
PERÇEM Û EGRÎCE / 768
PERÊŞANIM / 769
PERÎ / 770
PERÎ / 771
PERÎZADE / 772
PÎR ÊZDÎN AXA / 773
PIRÇÎ PEXŞANE / 774
PISMAMO / 775
PIŞTA KIROR / 776
QASPE QASPEÎ KEW / 777
QAZA GOLÊ / 778
QELEHA DIMDIM / 779
QERECDAX / 780
QERETAJDÎN / 781
QESEM / 782
QISEY IŞQ / 783
QÎZA MÎRÊ SIWÊREKÊ / 784
QUMRIYÊ / 785
QURM MIL / 786
RASTÎ / 787
RAZYANE / 788
RAZYE / 789
RÊBWAR / 790
REFÊ JI REFÊ ÇÛKAN / 791
RÊGAY AŞIQAN / 792
REŞKO / 793
REWŞA MALA SILTANÊ / 794
REZÊ / 795
RIHANOKÊ / 796
RIŞYÊN EGALA ÎSA / 797
ROBARO / 798
ROJ DERKET Û HATE DER / 799
ROJÎ CEJNE / 800
ROMANÎ HA ROMANÎ / 801
SAQÎ / 802
SÊ MAL / 803
SER MALÊ ME RE / 804
SED BIRYA MIN ZANÎBAM / 805
SEDO ME HOY HOY / 806
SELIK SELIK / 807
SELÎMO LAWO / 808
SELÎMO / 809
SELÎMO / 810
SÊMÊLÊ / 811
SERTENE / 812
SER GOVENDÊ / 813
SER GOVENDÊ MILANÎ / 814
SERÊLE / 815
SÊVA SOR / 816
SEWZE GIYAN / 817
SINDOYE / 818
SÎNEM / 819
SÎNEM / 820
SING Û BERÊ KEWA GOZEL / 821
SÎPANO GAZ BI GAZOYO / 822
SIVORE / 823
SIWAREK HAT / 824
SORÊ / 825
SOSIN / 826
SOYBE BALA BERZ / 827
SUK BIN DEY DEY / 828
SÛRE GUL / 829
ŞALÛLVANO / 830
ŞALURVANO / 831
ŞAM LURÎ / 832
ŞÊ Û SÊ / 833
ŞEDELAR / 834
ŞEHMÊRANÊ / 835
ŞEKIR AXA / 836
ŞELÎLVANO / 837
ŞEMAL HAT / 838
ŞEMAL WERE / 839
ŞEMAMÊ / 840
ŞEMAME Û ŞILÊRE / 841
ŞENG NAZÊ / 842
ŞER DAWETA MÊRANE / 843
ŞÊRO XALID BEG / 844
ŞEWE / 845
ŞEWQO / 846
ŞÊXANÎ / 847
ŞILE Û XANIM / 848
ŞILÊRE / 849
ŞIRÎN LEWENDÊ / 850
ŞÎRÎN LEYLANÊ / 851
ŞIRÎN TESÎ DERÊSÊ / 852
ŞIRÎNÊ / 853

ŞIRÎNÊW Û XANIM 855
SIVANÊ WAN KUVIYA / 856
SORÊ MALIM SORÊ / 857
TACÎ TACÎ TACÎHANE / 859
TAKEY AZÎZIM / 860
TAQÊ BELEKO YEMAN / 861
TARIK NÎNAYÊ ŞEMO / 862
TASEK AVA CAMIYÊ / 863
TAZYA ME YÊ ŞÊRÎN E / 864
TE EZ DÎN KIRIM / 865
TE GOT TE VA HATIM / 866
TE MEMIK ROBARIYO / 867
TEBAREK / 868
TEBAREK / 869
TENKE / 870
TENÛNE / 871
TEŞIYA MIN DARA JI DARÊ / 872
TEŞIYA TE / 873
TEŞIYÊ HA TEŞIYÊ / 874
TEW TEW CANÊ / 875
TEZE ME / 876
TÎL BELBENÊ / 877
TINCOLIYÊ / 878
TIRÊN HATO / 879
TOBE EYŞANÊ / 880
TOBE EYŞANÊ / 881
TOBE NAKIM / 882
TOBE / 883
TOL MEÇINE / 884
TORÎ NE / 885
TOZIRME / 886
TU DIZANÎ / 887
TU MIRAZA XORTAN Î / 888
TUXWA ŞIWANAN / 889
TUZIK / 890
URMIYE URMIYE / 891
WA JI HEMAMÊ / 892
WA MEKE / 893
WÊ LI BIN DARÊ / 894
WEK QUMRÎ / 895
WELATO / 896
WELE GOVEND RANABE / 897
WELE KECIK E / 899
WER HENE / 900
WER HENE / 901
WER HÊNE / 902
WERDEK IM / 903
WERE GIYAN / 904
WERE GULÊ / 905
WERE GULIM / 906
WERE KEÇÊ NAV KELEKA / 907
WERE QURBAN / 908
WERE QURBAN / 909
WERE WERE LANKÊ / 910
WERÎ LÊ EMÎNE / 911
WERIN GOVENDÊ GULÊ / 912
WERNE RÊZÊ / 913
WERNE SÊVA / 914
WEXTÊ MEHÎRÊ / 915
WEXTÊ ZERYAM NÎŞAN KIRIN / 916
WEY BARANÊ / 917
WEY FELEKÊ / 918
WEY HERÎRE / 919
WEY LO LIMIN / 920
WEY LO ŞIVANO / 921
WEY NARÊ NARÊ / 922
WEY WEY ZARA / 923
WEY ZERÎ / 924
W'EZ GUL IM / 925
W'EZ HATIME TE BIVÎNIM / 926
WEZ HENE / 927
WEZ HENE / 928
WÎ BI EREBO / 929
WÎ DAY / 930
WÎ ŞEMO / 931
WISA NENÊR TU LI MIN 932
WITIM EY KIÇ / 933
XAL MERCAN / 934
XALÊ XALYAZÊ / 935
XALÊK LE MABEYN / 936
XALO HECÎ / 937
XALOY / 939
XANBACÎ / 940
XAN XANIMÊ / 941
XANÊ BEYAZÊ / 943
XANÊ LÊ / 944
XANIMÊ / 945
XANIYÊ BAVÊ TE / 946
XANYÊ MEMO / 947
XECO DILÊ MIN / 948
XELEF IM / 949
XERÎBÊ / 950
XERÎBÊ / 951
XESIYA XERAB / 952
XEYABAN / 953
XEZALA MIN, DELALA MIN / 954
XEZALA MIN / 955
XEZALA MINÊ / 956
XEZALAM / 957
XEZALÊ YÊLÎ / 958
XEZALÊ / 959
XIFTAN / 960

XIFTAN / 961
XIME / 962
XIRINGE / 963
XIRNÎKÊ / 964
XÎZOLÊ / 965
XURNIK Û GURNIK / 966
XWELIYA WETEN / 967
XWESTÎ ME / 968
XWEZLA KIRASÊ BI ŞAL BÛMA / 969
XWEZLA BISKEK BÛMA / 970
YADÊ YABO / 971
YADIM KE FERYADIM KE / 972
YAR BÊZAR BÊZAR / 973
YAR BÊZARÊ / 974
YAR CAN TÊRCAN / 975
YAR DERWA / 976
YAR DÎLAN / 977
YAR EYŞÊ / 978
YAR GOVENDÊ / 979
YAR GULÊ / 980
YAR LI TEBEXA DIDIYA / 981
YAR MERHEBA / 982
YAR MEYREMÊ / 983
YAR ŞEMAMÊ / 984
YAR ŞÎNA MIN / 985
YAR SOSIN SOSIN / 986
YAR WELLE KEÇIK E / 987
YAR WESO / 988
YAR WEZO / 989
YAR XESUYÊ / 990
YAR XWIHKÊ / 991
YAR YAR / 992
YAR YARÊ / 993
YAR YEMAN / 994
YAR ZEYNEB / 995
YARA MIN A BEDEW E / 996
YARE CIWANEKEM / 997
YAREKEM ÇAWÎ ŞÎNE / 998
YAREKEM DELÊY BÛKE / 999
YAREKEM DILDAREKEM / 1000
YARÎ CARAN / 1001
YARÎ REZA ŞÎRÎNIM / 1002
YARILA / 1003
YEK MÛMIK / 1004
YERÎLO YERÎLO / 1005
YO ZEYNÊ / 1006
ZAVA TÊ JI HEMAMÊ / 1007
ZAVA / 1008
ZAWA LE BÛKÊ MEDE / 1009
ZEMBÎLFIROŞ / 1010
ZÊNEBÊ / 1011
ZENGILÊ NARÎN / 1013
ZER HÊLAN / 1014
ZÊR ZEYNEBÊ / 1015
ZÊRÎN / 1016
ZERIYA GUNDA DIL QEMERÊ / 1017
ZEYNOKÊ / 1018
ZIRAVÊ / 1019
ZIRAVÊ / 1020
ZIRAVIK HA / 1021
ZOZAN BER ZOZAN / 1022
ZULF ŞOR / 1023
ZULF Û RÛXSAR / 1024

## Cewoyê Boşatî

Mirov nikare tenê behsa du kesan bike, kesê ku gelek baş nas dike û behsa xwe bi xwe. Çaxê mecbûr dimîne behsa xwe bike, bi tu şikl û awayî mirov nikare objektîv be, ji ber ku, an pesnê xwe dide an jî xwe piçûk dibîne. Ji bo kesekê ku mirov gelek baş jî nas dike, dîsan jî 'eynî tişt e, mirov nikare gelek berfireh be, ji ber ku mirov dixwaze ew kes jî ji hêla kesên din ve bi çavên me bê dîtin. Bi kurtî mirov tucar nikare mutleq behsa kesek bike. Beriya ku aciz bibim û van gotinan binivîsim, min sê caran, sê cûreyên cihê yên kurtejiyana Cewo xwend, ne ji navê wî ne ji paşnavê wî ne jî ji bûyerên ku li ser wî nivîsîne, an jî ewî bi xwe gotiye, bi wan ez wî nas dikim. Lewra, ew Cewoyê ku bawer im behsa wî tê kirin, ne yê ku ez nas dikim. Min ew di salên xwendina nîvî de (ortaokul) naskir. Ji gundek dora Farqînê hatibû, wek nîvê kesên ku di sinifa me de bûn, ji gundên der û dorê hatibûn, em 5-6 kes zû bûn heval û ji hev qet neqetiyan. Her yek ji me bi xwestin, nexwestin, bawerî û dîtinên xwe ji hev gelek cihê bûn, lê cihêbûna me jî dewlemendiya feqîriya ku em tê de bûn. Cewo, kesek bê tirs, hinek hov, zêde dost û bi qilafetê xwe yî hinek girdok jî wek miya bêdeng, wek zarokek aram bû. Ji mezinan re bi hurmet û bi piçûkan re jî biramezin bû (ez dibêjim bû, ji ber ku gelo niha wisa ye nizanim).

Yekem car ku em nêzîkî hevûdin bûn, gava ku ewî ji min hin stranên kurdî xwestin. Ne ji ber ku min stran dizanibû an jî dengê min xweş bû, an ji xwedê neke min stran digotin, lê gava ewî stran digot min bi guhek gelek fireh ew guhdarî dikir û jê re digot ku li vir şaştî heye an jî filan der gelek xweş bû lê kêm bû. Ew ji min bawer bû ku, di nav hemû hevalên me de, min hay ji stranên kurdî yên gelêrî heye.

Di wan salên me yên xwendina navîn û lîseyê de, koma me ya hevalên nêzîn, mamosteyên xwendegehê jî nêzîkî xwe kiribû û ji derveyî dibistanê jî hevûdin didîtin û bi hev re stranên kurdî guhdarî dikirin, hin ji wan mamosteyan dest pê kiribû kurdî hîn dibûn. Di nav wan de, Zerrin ku mamosteya me ya sinifê bû, ji me gelek



1. Faysal, Murat, Orhan, Salih, Cewad, Berzan: Lîsa Farqînê: 15 gulan 19802. Berzan, Salih,
2. Cewad, Hesen: Şikefta Qeytûnê, Boşat-Farqîn, 14 tebax 1980
3. Berzan, Cewad, Salih, 2 kanûn 1980, Pista çolê-Farqîn.

hez dikir û di dawiya hemû dersên rojê de, piştî ku 3/4ên xwendekaran derdiketin, ewê digot: "Cevat, de beriya ku em biçin malên xwe ka stranek an duduyan bibêje." Li ser daxwaza wê, bê îstîsna, Cewo jî her carî pirs dikir: "Mamoste, bi kîjan zimanî?" Ewê jî her 'eynî bersîvê dida: "Bi zimanê ku em li wê deverê ne Cevat." Camêre me dest pê dikir ta ku em diwestiyan, lê her carî jî li min dinihêrt û dida fam kirin ku dibê ez qusurên wî yên gotinan nebêjim.

Em piştî cuntayê ji hev qetiyan, hin ji me hatin girtin, hin derketin, hin jî bûn piyawên dewlet an jî yên li dijî dewletê. Cewo jî piştî hin girtin û serêşiyên wê demê derket derve. Min cara yekem ew 19 sal şûn de dît. Di şeveka muzîka kurdî de li Parîsê. Ji wê çaxê ve projeya xwe ya berhevkirina stranên kurdî ji min re gotibû.

Di destpêkê de jî, min pê dabû fam kirin ku ne karek hêsan e, lê berhevkirina stranên kurdî di çi halî de be jî pêwist û girîng e ji bo tiştek li dû xwe hiştinê. Cewo jî, bi îmkanên xwe, bi zehmetî û nezaniya xwe, bi gazin û kêmasiyan be jî gelek tişt dan hevûdin û hê jî dixwaze bide hev û bi rêk û pêk ewan bigihîne neslên teze. Ji bo vê yekê bi tenê be jî xebata ku kiriye hêjayî nêrîn û parastinê ye.

Ger piçek be jî kelka min di vê xebatê de hebe, ew jî ji bo bîranîna şev û rojên Farqînê bi Berzo, Salo, Remzo, Yaso, Manso, Heso û hin kesin din e.

**Salih Yillik**

# PÊŞGOTIN

Çand û hunera kurdan jî wek ya hemû gelên din, bi peşveketina şaristaniya wan ve hevrast (paralel) e. Nemaze di stranên kurdan de, gelek motîv û hêmanên berbiçav ên di jiyana civakî û xwezayê ya îroyîn de jî tên bikaranîn û taybetiyên heyama neolîtîk tên dîtin. Mirov dikare bi hêsanî bibîne ku kurdan di stran û govendên xwe de; xweza, roj, ax, av, sewalên kedî û jiyana li dora wan hatiye hûnandin û şaristaniya pêşketî, bi awayeke şenber bi kar anîne. Her wiha piştî heyama neolotîkê jî mirov dikare şaristaniya cîvaka koledarî û feodal di çand û hunera kurdan de bibîne. Diroz û qewlikên (duayên) êzdiyan ku jêderka xwe ji baweriya zerdeştî ya li Kurdistanê jiyaye, girtiye û yên elewiyan ku dîroka wan jî biqasî ya dirozên êzdiyan kevn e, hemû wek berhemên hunerî ne. Dirozên êzdiyan ku jê re "qewl" tê gotin û wek awayekê îbadeta baweriya elewiyan "semah" û nemaze îlahiyên ku di van baweriyan de tên gotin, her yek ji berhemên hunerî yên bihişmet wê de, tiştek din nînin. Pêkanîna van berhemên hunerî yên ku di baweriya kurdan de evqas bibandor, pişt re bi xurtbûn û pêşketina îslamiyetê derbeke mezin dixwe û tê qedexekirin.

Piştî îslamiyetê di nav cîvaka elewî ya pêşketî de pêşkêşkirina van berhemên hunerî yên nîgarî (motîvî) û bi nexş û nimûşen olî, bi hatina desthilatdariyên paşverû ve bi tevahî hatiye qedexekirin û bi vî awayî destkeftinên şaristanî yên civakekê bi talan, bişaftin û komkujiyên mezin re rûbirû maye û ber bi tunebûnê ve çûye.

Ji kurdan re, li ser erdnîgariya Kurdistanê, li gel berhemên hunerî, amûrên ku di mûzîka kurdî de dihatin bikaranîn jî, hatibûn qedexekirin. Nemaze amûrên ku ji aliyê desthilatdarên îslamê ve bi navê îslamiyetê hatibûn qedexekirin, dahol û zurne mînakên balkêş in. Ji ber vê hindê mûzîka kurdan, li gor mûzîkên gelên din, di xwe de taybetiyên cihê diguncîne. Ew jî dengbêjiya bêamûr e. Dengbêjî, şewazeke taybetmendiya mûzîka kurdî ye û tenê bi dengê mirov pêk tê. Ev cureyên xebatê, bi dagirkeriya tirkan re tundtir hate qedexekirin û ev qedexe di roja îroyîn de jî, ji aliyê

Dewleta Komara Tirk ve li ser çand û hunera Kurd, li ser mûzika Kurd tê domandin.

Mûzîka kurdî pêmayiya (mîrasa) hemû gelên li Rojhilata Navîn e û di heman demê de pêmahiyeke hemû gelên cihanê ye jî. Berhevkirin û arşîvkirina vê pêmayê, di heyama îro de ji bo pêşerojê, tê wateya parastin û ragihandina pêmaya mirovatiyê. Ji ber vê hindê xebat pir girîng e.

Sedem û armanca min a mezin, a vê xebatê; yek coş û peroşa min a li hember mûzîka kurd e, ku ev mûzîk yek ji dewlemendiyên çand û hunera kurd e. Ya din ez van nirxan wek pêmaya mirovatiyê ya hevbeş dibînim. Ez dixwazim vê jî diyar bikim, ev xebat ewqas ne hêsan e. Ez bawer dikim ku ger ez vê dijwariyê bi mînakeke di jiyana min de qewimîbû, vebibêjim, wê balkêştir bibe.

Di sala 1983yan de hêj min lîse nû qedandibû. Li Amedê ji aliyê TRT (Saziya Televîzyon û Radyoya Tirkiyê) pêşbirkeke dengxweşiyê hatibû lidarxistin. Ez jî tevlî vê pêşbirkê bûbûm û wek kesê yekemîn hatibûm hilbijartin. Ji ber vê yekê ez girtim Radyoya Diyarbekrê ya TRTê. Bêyî ku haya min ji planan hebe, ez wek berhevkar şandim gundan. Teybeke dengan tomar dike û mesrefên min dan min û ji min xwestin ku ez gund bi gund bigerim; stran, meselok, pêkenok, çîrok û efsaneyên van deweran berhev bikim. Ez bi qasî 3 mehan gund bi gund geriyam, tiştên ku ji min hatibûn xwestin min berhev kir. Nêzikî 50 kasedî awaz (melodî), meselok, çîrok û efsane min berhev kirin ku ew ji pêncsedî pirtir awazên kurdî pêk dihatin. Ji aliyê TRTyê hat xwestin ku van awazên berhemên mûzîka kurdî yên min berhev kiribûn, wegerînim tirkî. Ev berhemên ku min berhev kiribûn, dê wek Awazên Mûzîka Gelê Tirk tomar biba. Min ev yek nepejirand. Min ew berhemên ku berhev kirbûn, ji bo ku ji derî armanca xwe neyên bikaranîn, veşartin. Wek hemû kurdan ji bo min jî, cihê ku ez pê herî bawer bûm, binê erdê bû. Mixabin demeke dirêj pê re, ez hîn bûm ku piraniya wan berheman riziyane.

Xirakirin û guhertina huner, nirxên çandî û mûzîka gelekî, bi rengekî guhertî malkirina wan a ji bo gelekî din; bişaftineke (asîmîlasyon) kirêt bû û dihat xwestin ku ez jî bibim amrazê vê kirêtiyê. Min ev yek nepejirand.

Ji ber ku jiyana min di xetereke mezin da bû min ew karê xwe bi piştgiriya Akademiya Kurdî li derveyî welat berdewam kir. Ez çûm gelek welatên ku kurd lê dijîn. Min li welatên Kafkasya, li seranserê Ewrûpa, her çar perçeyên Kurdistanê, ji Awustralya heta Kanada, arşîva radyoyên Êrîvan û Bexdayê stran û awazên kurdî berhev kir. Di encama karê 23 salan de min ji deh hezaran pirtir stranên kurdî berhev kirin.

Mûzîka kurdî li ber windabûnê bû her roj bi awayekî pirtir dihate talankirin, dizîn, ji xelkê din re dibû mal, min xwest ku pêşî li ber vî tiştî bê girtin. Da ku hunermendên kurd mûzîka xwe baş nas bikin, rasttir pêşwazî bikin û ji bo paşeroja me bi warekî ilmî bê arşîvkirin, min dest pê kir û notayên wan derxist û gotinên wan nivîsandin.

**Cewad Merwanî**

*Têbinî*

Ji ber ku li Kurdistanê bi hezaran salan koçberî, rev, talan çêbûne, kesek nikare bêje ku hinek stran yê kîjan herêmê an kîjan bajarî ne. Hinek stran hene ku li her herêmê bi qeydeyêkê tên xwendin, hinek jî hene wekî "Lê Lê Kinê" bi qeydeyên cûda tên xwendin. Car caran mûzîk, car caran jî gotinên wan tên guhertin. Di nava kitêba me de jî hinek stranên wisa hene.

Herweha kurd bi hezaran salan tev xelkên cîran wekî asurî, ermen, faris, ereb û tirk jiyane. Di warê kulturî de pirê caran bandora wan li ser hev çêbûye. Dibê ku hin meqamên kurdî bi esil aramî be yan jî farisî be. Dibe ku hin stranên wisa di nava kitêba me de cîh jî bigrin. Lê di vî warî de armanca me ne ew e ku em wan wekî stranên kurdî nîşan bidin, bîlakîs armanca me ew e ku wan bi çi awayî dibe û çiqas ji destê me tê ji windabûnê xilas bikin.

Stranên di van kitêban de ji çar aliyê Kurdistanê, ji arşîvên Radyoya Bexda û Êrîvanê hatine berhevkirin. Di destê me de hê bi hezaran stranên din ên gotin û notayê wan nehatine derxistin hene. Ev stranên van kitêban temamî yê govend û dîlanê ne. Emê di pêşerojê de stranên mêwal (lawik) û yê şer û mêraniyê biweşînin û bigihînin we.

Heta emrê me têrê bike, emê arşîva me ya ku ji nêzîkî 10 hezar stranan pêk tê, bi awayekî ilmî çap bikin û diyariyî gelê kurd bikin û dewlemendiya kultura kurdî bi gelên din yê cîhanê bidin nasîn.

*Spasdarî...*

Spas ji bo

Rojen Barnas, Hilmî Xoce (Akyol), Seydayê Goyan...

Ew stranên ku we bi kedeke mezin ji çavkaniyên wan ên zelal berhevkirî wê bi riya vê pirtukê bigihîjin gelê kurd. Ji bo vî karê we yê pîroz û çandparêziya we em bi navê xwe û yê Akademiya Kurdî spasdarê we ne...

...û spas ji bo alikariyên

Sherko Abdurehman (Note), hevalê min ê Koma Berxwedan, Hozan Şemdîn, Keremê Seyad û malbata wî, Hozan Aydin, Fewzî Ozmen, Jîr Dilovan, Enstîtuya Kurdî ya Kolnê, Yilmaz Erşahin, Kakşar Oramar, Ihsan Turkmen, Avesta, Amed, Gulşen, Kamuran Oto, Ihsan Siyah, Ako Ezîz, Wirya Ehmed, Yasîn Boyraz, Alan, Sabrî Agir, Yeşim Incedursun, Neslîhan Kaya, Salih Yillik, Mustafa Cevîk, Mensur Cahit Gemici, Remzi Güldere, Recep Cesur, Mehmet Boşatlıoğlu

herweha...

Fondation Kurde du Québec (Wekfa Kurdî a Québec)

Huseyin Akyol

Mehmet Akyol

Keyfo Kartal

Ulaş Çek

Ali Yalçin

Hasan Kaya

Guven Duman

Mehmet Akdeniz

Ibrahim Koltan

Mehmet Koçak

Huseyin Solak

Di derketina vê berhemê de, ji aliyê maddî û manevi, tekilî û lêkolinê, lêger û îmkanat ve piştgiriya Akademiya Çand û Hunera Kurdî li Ewrûpayê roleke girîng û mezin pêkanî. Em ji wan re mînettar û spasdar in.

Für seine freundliche und langjährige Unterstützung möchte ich mich beim Leiter des Kulturamtes der Stadt Neuss Herrn Harald Müller herzlich bedanken.
Ein besonderer Dank gilt auch seinen Mitarbeitern Herrn Christian Weber und Martin Jakubeit, die mir mit Ihrer freundlichen Hilfe zur Seite standen.

-1Betonwerk Melsdorf GmbH Am Ihlberg 22/24 24109
Kiel-Melsdorf

Oldesloerstr. 46 D-23319 Berkenthin

Welatparêz û hunerhezê gelê kurd birêz Salih Cete,
Bi hezar sala ye ku gelê me çand û hunera xwe parastiye. Bi riya dengbêj hunermendan heta vê rojê anîne. Bêşik keda te jî di vê berhemê de cîhekî girîng digre. Tu bi dilhezî wekî hunermendekî li vê çandê bi dil û can xwedî derketî. Ji ber alîkariya te em, ji te û hemû malbata te re spasdar in. Her dem şad û bextewar bin!

Birêz Mehmet S.Kaya
Her tu çiqas ji welatê xwe dûr bî jî, dilê te her tim bi gelê te, stran, çand û hunera gelê te re ye. Ez hêvîdar im em ê li ser wê axê, azad van stranên xwe bi kêf û şadî bistirên û daxwaz û xewn û xeyalên te li ser axa pîroz bi cîh bînin. Ji bo alikariyên te yê giranbuha em ji te û malabata te re spas dikin.

Qadir Kara Polatlî û ji gundê "Adatopraxê Pinar"ê ye û niha li Parîsê dijî. Rêzdar Kara ji bo ku di karê ji dayikbûna vê berhemê û zindîmayîna arşîv û hunera kurdî de hevkariya me kiriye, ez li ser navê hemû dilxwazên huner û çanda kurdî spasiya wî dikim.

Berzan Bayhan (Ji Licê qeza Diyarbekrê), li taxa Kortukê hatiye dinê û niha li Parîsê dijî. Dilsoziya kesên weke rêzdar B. Bayhan dihêle ku huner û çanda me di qadeke bilind de cîhê xwe bistîne û stêrka hunera kurdî geştir bibe. Ji bo hevkarî û keda wî em pir spasdar in.

Xelîl Bulut ji Ruhayê, li Romanya, bajarê Bûkreş e.
Ji dil û can spas ji rêzdar Bulut re ku wek evîndarekî strana kurdî ya klasîk di rojeke wiha da em bi tenê nehiştin û destê hevkariyê da me.

Murat Us ji Farqînê ye û çavên xwe li wir bi roniya jiyanê vekirine. Ew niha li Stockholmê dijî û wek karmendekî kurd li wir karê xwe didomîne. Di hilanîna vê pêngavê da rêzdar Murat Us jî destê hevkariyê dirêjî me kir. Ji bo wê jî em pir spasdarê wî ne.

Birêz Mensur Eker di vê projê da hemfikrê min bû û ji hêla manewî da jî çi ji destê wî hat, hevkarî da me. Wekî dilxazekî bi dil û can çanda kurdî diparêze û xwedî lê derdikeve. Bi dilekî tijî evîn ji bo arşîv û hunera kurdî ez spasiya wî dikim.

Birayên min, dostê gelê kurd ê ermenî ji Silpiyê Sevan Yagbasan ji bajarê Bruksel (Belçîka) xwediyê fîrma AN: S.A. Wekî birayekî me ku li ser wê axê hatî dinyayê, ji çand û hunera me hez dike û dixwaze bi her awayî biparêze. Em spasdarê te ne.

Ji bo hevkariya hunerhezê kurd rêzdar Omer Eroglu (Milo) ku ji kurdên Anatoliya Navîn û li bajarê Toronto (Kanada) dijî, spas dikim. Ew kurdperwerê hêja jî alîkariya xwe ji me kêm nekir û bi dil û can li ser navê kurdê Anatoliya Navîn piştgirî da me. Dubare spas ji wî û hemû endamên malbata wî re.

Oruç Adıman, di amadekirina vê kitêbê de gelek alîkarî bi me re kir. Spasek ji dil û can...

C. M.

# GOTIN Û NOTA

# Alla alla




Alla alla alla alla ya qudretil eynî
Alla alla alla alla rebil ala meynî


Hesen Huseyn her du kek in ya qudretil eynî
Hesen Huseyn her du kek in rebil ala meynî
Her du şêrê çav belek in ya qudretil eynî
Her du şêrê çav belek in rebil ala meynî
Her du dinya ji wan re yek in ya qudretil eynî
Her du dinya ji wan re yek in rebil ala meynî

Ew Hesenê kurê dayê ya qudretileynî
Ew huseynê kurê dayê rebil alameynî
Şûr girêda li ser ebayê ya qudretil eynî
Şûr girêda li ser ebayê rebil ala meynî
Çûbû xeza Kerbelayê ya qudretil eynî
Çûbû xeza Kerbelayê rebil ala meynî

Ew Hesenê kurê pîrê ya qudretil eynî
Ew Huseynê kurê pîrê rebil ala meynî
Şûr girêda li ser zincîrê ya qudretil eynî
Şûr girêda li ser zincîrê rebil ala meynî
Çûbû xeza ca Cizîrê ya qudretil eynî
Çûbû xeza ca Cizîrê rebil ala meynî

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Alla Mehmûd




Alla alla ya Mehmûd
Alla alla ya mewcûd
Sedeqe ji kîsê mewlûd
Li ser rihê mele Mehmûd

Ene cîh tu li dadaş e
Ene rih tu li dadaş e
Ne bes e tu li Lîlaş e
Li mala xalê hemaş e

Ene cih tu li Cizîr e
Ene rih tu li Cizîr e
Ne bes e tu nil Herîr e
Li mala xalê nezîr e

Ene cih tu li Hezro ye
Ene ruh tu li Hezro ye
Ne bes e tu nil saqoye
Li mala xalê Eloye

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Amîn Amînê




Diwenê feslî bangî şêwan amîn amîn amîn Amînê
çawim kewtibû be dû sêwan şede şil piştên peşmînê
bum be mecnun kewtime kêwan amînê xom barîkê xom
rêm niya birom derbeder xom

Diwênê feslî bangî hêştim amîn amîn amîn amînê
roh'î birdim xanimî hêştim şede şil piştên peşmînê
şerabî mergî pêriştim amînê xom barîkê xom
rêm niya birom derbeder xom

Le jêrewe hat kiras şînê amîn amîn amîn amînê
pêm waye yarim amînê şede şil piştên peşmînê
e'mir û çaw û qelbî mine amînê xom barîkê xom
rêm niya birom derbeder xom

# Amînê giyan






Amînê giyan gwarekanit melerzêne
Be xende derdim bidwêne
Nembizwênî detbiziwênim
Nemirim lew bendet derdênim
Şedey serit ale û abî
Amînê gwarekanit melerzêne
Ser helbêne, bê bela bî
Sûk biro kewşekanit meçespêne
Emin çonim ba toş wa bî
Amînê gwarekanit melerzêne
Şedey sert bim bûk rabe
Amînê gwarekanit melerzêne
Zulif û perçemitim bo labe
Şedey sert karî Taran
Amînê gwarekanit melerzêne
Boç min dekey berdebaran
Nemay le ser qewlî caran
Amînê gwarekanit melerzêne
Şedey sert karî Kaşan
Amînê gwarekanit melerzêne
Peymanit best le Qedaşan
Nemawim min bo gul başan
Amînê gwarekanit melerzêne

# Amînê sûre gul




Ewa min mirdim xotan selamet
Dîdartan bexêr bin taku qiyamet
Dawim kewtote dawî min nambê necat
Amînem sûregul ax be lence û larî
Be reng begzadey beşî hewşarî
Karxaney qend û birnûy sewarî
Be talan kewtiye des kurdewarî
Beyne û beynellah le guley xesarî,

Ya rebbî kes wek min şew xerîb ne bê
Dil birîndar û bêtebîb nebê
Le dunyay roşin wey wey bê nisîb nebê
Amînem...
Be reng...
Karxaney...
Be talan...
Beyne...
Le dûrî balat bûm perewaze
Xembarit kirdim zor bê endaze
Beqat pênakem jin bêmecaze

Aşiqî amînêm bûm, çawî wek baze
Aşiqî lêw alim le kanî niyaze
Aşiqî miryemim yekcar be naze
Amînem...
Be reng...
Karxaney...
Be talan...
Beyne...

Gileyî dekem be lay xudawe
Derwazey meynet boç bo min kirawe
Awirî têberdam ew belek çawe
Roh' wellahî giyan ax le lam nemawe
Cûtê memkanî ax şemamey sawe
Amînem...
Be reng...
Karxaney...
Be talan...
Beyne..

Soranî / Gelerî

# Amînê û Amîn




Amînê u amîn her etoy dinya u dînim
Qoleket danê, wey bîke be serînim
Amîn taqane min mergit nebînim
Amînê u amîn be to delêm kalê
Heste ba biroyn be cê bêlîn malê
Be des xom niye dil bot denalê
Ew destey kêye? Wey le nîwe şew da
Yarmî raperand wey le şîrîn xew da
Engustim derzî, zulfit xeyate
Roh´im êşikiçî dewrî balate
Şerte ta mirdin her dil be temate
Hey dad hey bêdad, derdim taw tawe
Şew le naley min wey sîrwan beawe
Ewa mang helat day le nêw hobe
Maçkirdin xoşe nobe be nobe
Xo min sofî nîm boç pêm dekey tobe
Ewa mang helat derbend bû xalî
Heste bipoşîn bergî e'wdalî
Şil-şil bîpêçe wey pencey nenalî
Amînê u amîn amîn taqane
Bimdeye maçê be mehremane
Çend roje natbînim derdim girane

# Amînê sûre gul




Besman lê bigire seransiwêyî banî
Le min malî zor le toş ciwanî
Karî min û to a'lem pêy zanî
Amînê Sûregul çend be lence û larî
Be reng begzadey başî hewşarî
Xozgem bew kesey her etoy yarî
Her koç koçit bû koçit bû be rast
Kem hîmetit kird malawat nexwast
Amînê Sûregul çend be lence û larî
Be reng begzadey başî hewşarî
Xozgem bew kesey her etoy yarî
Şert bê gulî kes nekem be bore
Ta gulim bo dê le... le xizmet towe
Şert bê ta demirim be dil bot bigirîm
Ta nalem derwa... bo e'rşî e'zîm
Piştên şil û mil heste beyane
Heta pêk debirên zorî nêwane
Amînê Sûregul çend be lence û larî
be reng begzadey başî hewşarî
Xozgem bew kesey her etoy yarî
Ne şewim xewe, ne rojim îsrah'et
Roh'mit pêm da bê nemawe taqet
Amînê Sûregul çend be lence û larî
be reng begzadey başî hewşarî
Xozgem bew kesey her etoy yarî

# Amoza giyan




Çendim pê gutî be tegbîrim bî amoza giyan
be qiset nekirdim xuda gîrim bî amoza giyan
amoza lew berî çomî
ey hawar cîranî xomî
amoza to bala berzî
amoza to bo min ferzî
ne çaw têr debê ne dil debêzê amoza giyan
xom lêre mawim yar le tewrêzê amoza giyan
amoza to bala berzî
ey to bo min ferzî
amoza zorom pê terzî
ey hawar gişt giyanim lerzî
ew şew le bextim mange şew tare amoza giyan
her cêyek deçim sayem diyare amoza giyan
kifnekem bibirin le kirasî zara amoza giyan
amoza to bala berzî
ey to bo min ferzî
amoza zorim pê terzî
ey hawar gişt giyanim lerzî

# Aramî giyanim




Aramî aramî giyanim leylê ruh'î rewanim
hawar ba bisûtê giyanim

Etirsim bimrim leylê netbînimewe
be ciwanemergî ser binêmewe

Aramî aramî...

Eger demzanî ewel wa debuy nuştem nedekird
bo xot çakdebuy

Aramî aramî...

# Asê




Werî lê lê lê lê lê lê
Werî lê lê zeryê asê
Te oynekê oynek bazê
Çûm hemamê hat hemamê
Çûm hemama pişt erasê
Ava hemamê çi germ e
Ava wêranê çi germ e
Porê asê kirye nerm e

Werî
Werî
Te
Çûm
Çûm
Ava hemamê xişandî
Ava wêranê xişandî
Porê asa min weşandî

Werî
Werî
Van hêlînê çûçû mûça
Saz xirabê çûç û mûça
Hêlîn çêkir hêlîn çêkir
Hêlîn çêkir li serkê qûça
Dem dewranê xal û xûça

Werî
Werî
Van hêlînê bet û meta
Saz xirabê bet û meta
Hêlîn çêkir
Hêlîn çêkir li serkê xeta
Dem dewranê qîzê meta


Werî
Werî
Van hêlînê qaz û maza
Saz xirabê qaz û maza
Hêlîn çêkir
Hêlîn çêkir li serkê gaza
Dem dewranê qîzê zaza

# Aşîna




Heta xot bît hemû kes aşinatin
Mepirse kêye yar û aşinakem
Kesêkî dî e'bam nexate ser şan
Eger rojê bira ser şanî kewakem
Ewey wek kêw debînim kaye giştî
Ke bêm xermanekey katî dilekem
Leber perwane dewirim çol nebû qet
Heta şewqêkî bo çû le çiraket
Dezanî çend çak bûm min legel dost
Keçî êsta ne xom çakim ne çake
Keçî êsta ke her ew new biraye
Delê nemdîwî natnasim birakem

# Ava sorgula




Me ji qal û behs kir
We ji qal û behs kir
Ava sorgula lê
Li ber çeman kesk kir
Evla zava ye lê
Avê li dest kir

Me ji qal û bîhn kir
We ji qal û bîhn kir
Ava sorgula lo
Li ber çeman şîn kir
Evla zava ye lê
Bûkê li zîn kir

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Ax dê û bavê me




Werin em bigrin qedrê dê û bava
Rind bişikirînin bi sehet û gava
Qedrê wan bigrin ronahiya çava
Tim bêjin hezar car malê ava

Ax dê û bavê me ax dê û bavê me
Ji dinê şêrîntir ew in emrê me

Kedê dê û bavê li ser me gelek e
Hemû xwêdana wan ne henek e
Navê wan hildin serê xwe nizim kin
Xwedê me bê wan tu cara neke

Ax dê û bavê me…

Navê dê û bavê gelek şêrîn e
Bexçeda gul in gulê bibîn in
Hiz bikî bigere çar qelbê dinyayê
Ciyê dê û bavê tu cara nayê

Ax dê û bavê me…

Çavkanî : Aramê Tigran, radyoya Êrîvanê

# Ax hinarê hinarê




Ax hinarê hinarê
Tu kulîlka biharê
Dûmana serê çiyanê
Sorgula çav kaniyanê

Rewşa mala çawanî
Herekete bi çok anî
Xwîna nava dilanê
Qîz mêrxasa kurdanê

Hinar e çav belek e
Sûret sor e werdek e
Bejna bilind minar e
Nêçîrvaneke zor e

# Ax lê dînê torînê




Ez çûm mila mêrgê wo
Tû ne li mila mêrgê wo
Lê dînê lê dînê
Ax lê dînê torînê
Serî bişo ji avê wo
Biskan berde ji porê wo
Disgotin
Dema mêrê te bimire
(w)ez dê bême malê wo
Disgotin
Ez çûm mila mêrgê wo
Mila mêrgê genim e
Siwaran hûrme hûrm e
Dû siwaran hûrme hûrm e
Dest badime li gerdenê
Yara dînê hakim e
Ez çûm mila mêrgê wo
Mila mêrgê înce ye
Siwaran heye heye
Du siwaran heye heye
Dema mêrê te bimire
Qurbana canê te ye
Ez çûm mila mêrgê wo
Mila mêrgê garis e
Siwaran hise hise
Du siwaran hise hise
Dest avêtin gerdenê
Yara dînê Faris e

Heremên Culemêrg û Şirnaxê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Ax lê gulê




Ax lê gulê lê lê gulê lê lê gulê
Lê gulê lê lê gul

Bejn bilind û şil û milê, şil û milê
Peywerê tu sorgul

Min tû dîto nav tûtinê nav tûtinê
Lê gulê lê lê gul


Min tu dit o nav tûtinê nav tûtinê
Nêv çeperan serê milê serê milê

Min gul dîto nêv tûtinê nêv tûtinê
Min du xeber wê gotinê wê gotinê

Ev daweta me Kurdan e me Kurdan e
Herçî neyê bê îman e bê îman e
Çepera ser û mil

Heremên Culemêrg û Şirnaxê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Ax loloy zava




Ax loloy loloy loloy loloy loloy zava
Ax loloy loloy loloy xaliq mala te ava

Ew zavakê vê payizê loloy loloy zava
Ew paşakê vê payizê xaliq mala te ava
Cîka raxin li sîka gûzê loloy loloy zava
Cîka raxin li sîka gûzê xaliq mala te ava
Zava radzê li paşla qîzê loloy loloy zava
Zava radzê li paşla qîzê xaliq mala te ava


Ew zavakê vê biharê loloy loloy zava
Ew paşakê vê biharê xaliq mala te ava
Cîka raxin li sîka darê loloy loloy zava
Cîka raxin li sîka darê xaliq mala te ava
Zava radzê li paşla yarê loloy loloy zava
Zava radzê li paşla yarê xaliq mala te ava

Ew zavakê vê havînê loloy loloy zava
Ew paşakê vê havînê xaliq mala te ava
Cîka raxin li şaneşînê loloy loloy zava
Cîka raxin li şaneşînê xaliq mala te ava
Zava radzê li paşla zînê loloy loloy zava
Zava radzê li paşla zînê xaliq mala te ava

Zava heye mîranî ye loloy loloy zava
Zava heye mîranî ye xaliq mala te ava
Qilçik sorê erebî ye loloy loloy zava
Qilçik sorê erebî ye xaliq mala te ava
Zava bi dilkê ca xesî ye loloy loloy zava
Zava bi dilkê ca xesî ye xaliq mala te ava

Herêma Amedê

# Ax û eman Şikrayê




Ax û eman Şikrayê
Rê dûr e xeber nayê
Cavê min bi rêve mayê
Ax û eman sikrayê

Sebra min bê te nayê
Sêrinê nû gehayê
Tez kuştim tez helandim
Tez berdame dinyayê

Nazik û nav giran î
Tu´b derdê dil nizanî
Agir berda vî canî
Hin jî tu nayê rayê

Bûm nexweşek bê derman
Ji derdê kitek ramûsan
Min dî wek te bê îman
Bi te re ketme belayê

Were ba min şêrînê
Derman ke vê birînê
Kes vî halî nabîne
Mirin xweştir e dayê

Ax û eman Şikrayê
Rê dûr e xeber nayê
Çavê bi rêve mayê
Ax û eman Şikrayê

Herêma Botan

# Axawo




Ax lo lo lo lo lo axawo
Wax lo lo lo lo lo axawo
Wezîro çol paşawo
Li qesra belek razawo
Min li ser simek lê dawo
Ji xewka şêrîn bazdawo
Xencer di cî de mawo
Kalan di cî de mawo
Xencer tu bi zêrê zer bî
Li pişta Elî û Emer bî
Ax lo lo lo lo lo axawo
Wax lo lo lo lo lo axawo

Herêma Amedê

# Axew axe




Hey axe û axe û axe bomtêke lew qoryaxe
Hey axe û axe û axe bomtêke cergim daxe

Beramberim damenîşe cergit derhênam le rîşe
Ew derdey le tuwe le minîşe hey axe û axe u...

Beramberim ramebure kizey cergim wek tenure
Lêy gerê le xwa be dûre hey axe û axe u...

Danîştiwe le ber nanî lêm diyare şilkey ranî
Ger xwa bo xoy bizanî hey axe û axe u...

Soranî / Gelêrî

# Ay dil




Tenê hiştim ay dil îşev çima çû
Wî ez kuştim ay dil îşev çima çû
Rabe peykev ay dil zû wî werîne
Te ez kuştim ay dil îşev çima çû

Şev çû ma tu êdî hew têy lo
Ez ranazêm kengê bê te xew tê lo
Xanî bûye zindan tê da ranazêm
Te ez kirim qêrîn nalîn tev tê lo

Te ji min dil bir carek min ji ter nedigo na
Te rû kul kir carek min ji ter nedigo na
Çima îro ji min xeyîdiye
Te bi min çi dikir carek min ji ter nedigo na

Şev çû…

Ay dil ay dil ma kes nine mina wî
Ez ji bo wî çi dixwazim mîna wî
Ax dema destê min li bin serê wî
Li min xweş tê gelek hilm û bîhna wî

Tenê hiştim ay dil îşev çima çû
Wî ez kuştim ay dil îşev çima çû
Rabe peykev ay dil zû wî werîne
Te´z li wir hiştim ay dil îşev çima çû

Şev çû…

Dilê min jî te dixwaze bibîne
Tu bi dûr ketî dilê min te nabîne
Çima rojên eşqê ewqas kin bûne
Lê ew şîna dil jî tim datîne

Şev çû…

Helbest : Cegerxwîn, çavkanî : Aramê Tîgran

# Ay lê kinê




Aylê kinê lê lê mala minê way way
Aylê kinê lê lê emrê minê way way

Ez ne kin im lê lê ne dirêj im way way
Tak rihane lê lê şax davejim way way
Dilê xorta lê lê pir digvêşim way way
Dilê lawan lê lê pir digvêşim way way

Wan guharan lê lê geze gez e way way
Memkê kinam lê lê seva tez e way way
Ez radimûsim lê lê we bi lez e way way
Rukê yarê lê lê bikim gez e way way

Wan guharan lê lê horê hor e way way
Rukê kinam lê lê seva sor e way way
Ba lê dixe lê lê kezi û por e way way
Ramusanê lê lê ciqas zor e way way

Herêmên Amed, Botan û Behdînan

# Ay lê Nûrê




Aylê Nurê lê Nurê zalim Nûrê
Aylê Nurê lê Nurê xayîn Nûrê
Ziravê bê qusûrê lê lê Nûrê
Xelka welatê dêrê zalim Nûrê
Barê Nûrê titûn e lê lê Nûrê
Du kolciya girtine zalim Nûrê
Birin sara mezin e lê lê Nûrê
Eywax eywax li min e zalim Nûrê
Malê Taho mêstine lê lê Nûrê
Mala Taho mêstine zalim Nûrê

Dikê sibê distire lê lê Nûrê
Nûrê tê tu digîrî zalim Nûrê
Go çima Nûrê tu digirî lê lê Nûrê
Kolciya mala min biri zalim Nûrê
Go çima Nûrê tu digirî lê lê Nûrê
Xelkê malê min birî zalim Nûrê

Serê singê erbazî lê lê Nûrê
Nûrê te to digazî zalim Nûrê
Go çira Nûrê tu digazî lê lê Nûrê
Ezê biçim cem Qazî zalim Nûrê
Go çima Nûrê tû di gazî lê lê Nûrê
Ezê biçim cem Qazî zalim Nûrê

Herêmên Amed, Botan, Behdînan û Serhed

# Ay lo dilo




Ay lo dilo lo dilo
Ay lo dilo lo dilo
Ay lo dilo lo dilo
Îslo dilo delîlo

Ma şîn warê hesenî
Aylo dilo lo dilo
Ma şîn warê hesenî
Îslo dilo delîlo
Pencera sera serî
Aylo dilo lo dilo
Pencera sera serî
Îslo dilo delîlo
Qomê ma ha pêserî
Aylo dilo lo dilo
Qomê ma ha pêserî
Îslo dilo delîlo
Ay lo dilo lo dilo
Ay lo dilo lo dilo
Ay lo dilo lo dilo
Îslo dilo delîlo

Ser sibayî honiko
Aylo dilo lo dilo
Ser sibayî honiko
Îslo dilo delîlo
Keyno mast kerd kodiko
Aylo dilo lo dilo
Keyno mast kerd kodiko
Îslo dilo delîlo
Nono korek pediko
Aylo dilo lo dilo
Nono korek pediko
Îslo dilo delîlo
Ay lo dilo lo dilo
Ay lo dilo lo dilo
Ay lo dilo lo dilo
Îslo dilo delîlo

Op selikî selikî
Aylo dilo lo dilo
Op selikî selikî
Îslo dilo delîlo
Delal zomê melikî
Aylo dilo lo dilo
Delal zomê melikî
Îslo dilo delîlo
Fistan delal tenikê
Aylo dilo lo dilo
Fistan delal tenikê
Îslo dilo delîlo
Ay lo dilo lo dilo
Ay lo dilo lo dilo
Ay lo dilo lo dilo
Îslo dilo delîlo

Dimilî, herêma Dêrsimê

# Ay Nêrî Nêrî




Ay nêrî nêrî nêrî nêrî way lê
Ay nêrî nêrî nêrî zalim way lê

Ew kî bû nêrî rakir lê lê way lê
Ew kî bû heram rakir zalim way lê

Nêrî ji avê derbas kir lê lê way lê
Nêrî ji avê derbas kir zalim way lê

Ay nêrî nêrî

Ew nêrîka bizina lê lê way lê
Ew herama bizina zalim way lê

Ay nêrî nêrî

Min cêrand li dor kizina lê lê way lê
Min cêrand li dor kizina zalim way lê

Ay nêrî nêrî

Kur heft sala şixulî lê lê way lê
Law heft sala şixulî zalim way lê

Ay nêrî nêrî...

Nekir heqê bazina lê lê way lê
Nekir heqê bazina zalim way lê

Ay nêrî nêrî...

Îsa Berwarî, radyoya Bexdayê, 1976

# Ay nerme




Desmalî serit h'erîrî nerme
Be dilim h'ez lê kird be zarim şerme
Ay nerme merme gişt giyanit nerme
Çadireket lade çi wei'dey şerme
Ne roh'mit pêm da ne le xudat şerme

Çawêkim deşê ça nabêtewe
Ew gulem lê zîze aşit nabêtewe
Ay nerme...

Çi xuda berdare xerqim key le xem
Ruh'mê xêrêt bêyan zor û yan kem
Ay nerme...

Deştî pişt qelawe razawe be gul
A'req derêjim zengul be zengul
Etom xoş dewê be giyan û be dil
Ay nerme...

Henasey sardim demalêw gerê
Şadiyet bê min lê we şîn gerê
Ay nerme...

Xuda xudame mang bibê awa
Destêk bigêrim le baxî sawa
Ay nerme...

Ewe ke deroy xot û dileket
Amanetit bê taqe guleket
Ay nerme...

# Ay Nîzam





Xo min kwêstanî lend nîm
Bênim karg û rêwasan
Xo min televizyon nîm
Dam nên bo qise û basan
Emin qerenî axa nîm
Gewrey îlî bilbasan
Aşiqî çawî ew kiçe bûm
Deyrifênim suk û asan
Hey nîzam û xom nîzam
Min nîzam nîm û eskerim
Leser balay lêw alê
Le dinya derbederim
Dinya hemû deyzanê
Mubtelay reş esmerim
(Qemtere) legel (burhan)
(Gulîce) mulkî (derman)
(Mîrawa) degel (bokan)
(Hesar) degel (qazilyan)
(Hermêle) mulkî xanan
Hemût be qurbanî bê
Degel kawlî (samrendan)
Hey nîzam û xom nîzam

Lêrekane serbazim
Mubtelay dû çawî bazim
Seferêkim kewte ber
Min îznî lê dexwazim
Berde morey gîrfanim
Desrokey destim fatim
Dawim kewtote dawî
H'etmen nabê necatim
Çawit estêrey roje
Ebrot le xew demênê
Bejin û balat zor ciwane
Rebî babit bimênê
De were destim desto ke
Cergim xwên dedelênê
Awirî le min ber dawe
Lêw al giyan namdiwênê
Bew xudayey bê mekane
Xerîbim lêrekane
Ew dilem behrî xemane
Pêm gut awêzanit bim
Singit taqî muruwane

Soranî / gelêrî

# Ay şil




Rastim pê bile erê boçî torawî
Le çî melûlî wey boçî rencawî

Ay şil wey şil şil û şêwawî
Her delêy newbûkî zawa lêy dawî

Soranî / Gelêrî

# Ay şilê û nazenînê




Leber derkyan dare hencîre yan henare
Leser balay lêw alê ba bimden le sêdare
Şerte heta nemkûjin dest helgîr nîm lew yare
Şew û roj û leyil û nehar dil bo wî bêqerare
Ay şilê nazenînê beh beh le sîrey potînê
Debim be çetirî serî yar le bo rêy mer doşînê
Eger dêt û radeburê sela lewey naybînê
Be çîm zanî yarî xom dê be qaqay pêkenînê
Wey le ber derkyan awe qed bilinde û belek çawe
Nazanim birader boçî lêw alê, le min torawe
Pêm gut awêzanit bim rojê taku rojawa
Roh'mî xuda le dilda bê xedengit le dilim dawe
Amînê nazenînê oxey le sîrey potînê
Debim be çetirî serî yar min le bo rêy mer doşînê
Eger dêt û radebûrê sela lewey naybînê
Awirî le min ber dawe qed barîkey lêw nexşînê
Leber ew jine reştale giyan qedî delêy şimşale
Ser keme ser ranî nermit pêmda de bew desmale
Ger gule pirsî kêye giyan bimşêle bilê bêh'ale
U'rûsim, cûm, ermenîm min dînim bo to betale
Wey leber ew jine çend ciwane giyan bejinî darh'eyzerane
Rêk û pêk beynella waye ebroy mangî kewane
Pêm gut awêzanit bim min ta sibeynê ew demane

Awirî le min berdawe wey be milwênêk herzane
Ay şîlê nazenînê beh beh le sîrey potînê
Balam be balay ew kiçe girtuwe çwar qamik kurtî dênê
Delêm bimdeye maçêk to bew ro be sibê û be dwênê
Awirit le min berdawe sure qurîngî le bîtwênê
Ciwane beynella ciwane dey mamizê deştî bokane
Pêm gut awêzanit bim wey h'dudê şar wêrane
Delêm awêzanî bim wey sertopî kurdistane
Awirî le min yar berdawe barî kird nemam le bane
Desmal h'erîrî sade giyan rûbendit bo min lade
Bo rûbend çakim kiçê lêw alê be rûy xalanim da de
Ay şîlê nasikê ciwanê kiçê meylî caranit kwanê
Pêm gut awêzanit bim dey le rastey xiyabanê
Awirit le min berdawe to pîr bûy ew mekire danê
Girtim dû maçim lê sitand wey le rastey xiyabanê

# Ayşokê




Ayşokê Ayşokê Ayşoka romanî
Şîrînê şemamokê destmala xortan î

Ayşokê çima çima Ayşoka romanî
Kevoka li nav genima destmala xortan î

Fîncana li dest mezina Ayşoka romanî
Dilkê min li cem te ma destmala xortan î

Ayşokê Ayşokê Ayşoka romanî
Şîrînê şemamokê destmala xortan î

Herêma Xerzan, çavkanî : Peywan Arjîn

# Azîzekem




rawkerî bed xu (azîzekem) xwên rêj û xwên xor
bo rezay xuday (azîzekem) besiye zulim û zor
her seyzadêkî (azîzekem) şal kirmanî bê
nembîstuwe le kes (azîzekem) ciwanî way dîbê
ey dile naşad bî (azîzekem) naşadit kirdim
muh'tac be dostî (herdû dîdem) bêwefat kirdim
be ciwanît qesem (azîzekem) pirşingî dênê
çerxî zemne (azîzekem) toş deşemzênê
ew ciwaniyey hete (azîzekem) be toş namênê

# Azîzim beyanî




E´zîzim beyanî, ke gul e´tirê derêjê
Ke bulbul denalê, ke sofî dête niwêjê
Le kûncî qefez da, be sed nale dexwênim
Henawim nemawe, leber çî naye şînim
Le hîciranî wîsalit, le dewirî xet u xalit
Heta hem dexwênim denalênim
Heta newgulî xom we dest dênim
Xezêmî giyan, leber çî naye şînim
Leber çawî ciwanit, leber cergî be xwênim
Gul u lale pişkût, dewir dewirî gulane
Gulî min depişkwê, beharî dû dilane
Ke bulbul denalê, delê kwa gulî sûrim
Henawim nemawe, demêke le to dûrim
Delên ewro behare, beharî dû dilane
Ke bulbul deka razî dildarî
Degel kone yarî cefakarî
Behare e´zîzim, beharî dû dilane
Ke bulbul dexwênê, leser pelikî gulane
Le baxî gulan da, her toy taqe gulî min

Le baxî wîsalit debê xunçe biçênim
Le hîcirî wîsalit be sed nale dexwênim
Le hîcirî to denalim e´zîzî rû be xalim
Dekêşim be dil razî dildarî
Depêwim cîhanî cefakarî
Debê birêjim leser to xwênî sûrim
Birînim be êşe demêke le to dûrim
Heta key birêjim, siruşkî sûr u alim
Kejalî e´zîzim, le hîcirî to binalim
Umêdim nemawe, meger lutifî îlahî
Ke xwênim derêjim, be cûrmî bê gunahî
Were roh´î rewanim, gulî bonxoş u ciwanim
Be bê to jiyani nebê çake
Umêdim be dergayî bê bake
Leser to derêjim siruşkî sûr u alim
Le hîcirî wîsalit, şew u rojê denalim

# Azîzim to gulekemî




Çend xoşe bezmî êwaran, azîzim to gulekemî
Le naw baxçekey henaran, azîzim to gulekemî
Le naw baxçekey henaran, le naw baxçekey henaran
henaran henaran henaran, azîzim to gulekemî
Çend xoşe bezmî êwaran, azîzim to gulekemî
Le naw baxçekey henaran, azîzim to gulekemî
Giyan azîzim to gulekemî

Be to delêm çaw estêre,azîzim to gulekemî
Xizmetêkman pê bisipêre,azîzim to gulekemî
Be to delêm çaw estêre, azîzim to gulekemî
Her ewroman mawe lêre,azîzim to gulekemî
Le naw baxçekey henaran, le naw baxçekey henaran
henaran henaran henaran, azîzim to gulekemî
Be to delêm çaw estêre, azîzim to gulekemî
Her ewroman mawe lêre,azîzim to gulekemî
Giyan azîzim to gulekemî

Wek bulbulan feslî behar, azîzim to gulekemî
Şew u roj u leyil u nehar, azîzim to gulekemî
Wek bulbulan feslî behar, azîzim to gulekemî
Denalênim bo weslî yar, azîzim to gulekemî
Giyane feslî behare, giyane feslî behare
Behare behare behare, azîzim to gulekemî
Çend xoşe bezmî êwaran, azîzim to gulekemî
Le naw baxçekey henaran, azîzim to gulekemî
Giyan azîzim to gulekemî

# Ba biçine naw Şilêran




ew şew her xemit giyane wa le kemîn da, wa le kemîn da
berew rûy xistim giyane be rûy zemîn da, be rûy zemîn da
were were ba biçîne nêw şilêran, carêk were bo lay minî malwêran

to gulaley dil giyane dulber e'zîzî, dulber e'zîzî
mezey talî xem giyane yaran le zîzî, yaran le zîzî
were were...

çend wexte dilim giyane xemgînî zeynin, xemgînî zeynin
wa diyare leylam giyane bêruh'm û meylin, bêruh'm û meylin
were were...

ta key xerîbî giyane kuçey şaran bim, kuçey şaran bim
ta key helweday giyane dîdey yaran bim, dîdey yaran bim
were were...

# Ba lênên




Ba lênên pêş baran hewarî melek şêxan
her dîtit daybaran be suwarî maynî şêxan
delê maçit护 nademê dayk û bab çawyan lêye

Ba wabê ba wabê bo debê tewella bê
de bêle xendekit bêtê xo dinya xera nabê
delê maçit nademê dayk û bab çawyan lêye

Ba lênên pêş baran xêl dê le zinwê şêxî
kîjê rawest daybaran bermuran le xoy dêxî
telebî le xway dekem le kin malî mey bêxî

Soranî / Gelêrî

# Ba wa bê




Soranî / Gelerî

Memkit zerde lîmoye
Mîslî narncî xoye
Kulmit gulî lîmoye
Le gel Turan têkel bûyin
Têrbûn le giftugoye
Pêm wit ruh'imî xêrt bê
Ew dilem bot renceroye
Ba wa bê ba wabê
Destim le memkit da bê
Eger memkan e'ziyet kem
Serpencem kolewar bê
Hîç e'zyetiyan nadem
Wey neba lêm tewella bê
Hey malî babim
Desmalî Şêley ale
Qedî delêy şimşale
Î'rûsim, cûm, ermenîm

Dînim bo wî betale
Xizmîne memken lome
Nasik û şilk û mindale
Awirî le min berdawe
Memikî helûjey kale
Ba wa bê ba wabê
Destim le memkit dabê
Hî minê bê bot bot defiroşim
Mihalî, Merwê û Pişder
Le ser balay toye giyan
Le dinya bûm der beder
Memkî çepit fincane
Ewî dîket wek gewher
Çîbikem ey hawar çîbikem
Xoşim dewêy reş esmer
Ba wa bê ba wa bê
Destim le memkit dabê

# Bana bana




Bana bana bana hey bana
Bana bana bana qurbano
Bano banê ber me hey bano
Bano banê ber me qurbano
Tênê kember nerme hey bano
Tênê kember nerme qurbano
Ne mij bavê şerme hey bano
Ne mij bavê şerme qurbano

Bana banê yalî hey bano
Ne mij bavê şerme qurbano
Tênê çarde salî hey bano
Tênê çarde salî qurbano
Cane diçim yalî hey bano
Cane diçim yalî qurbano

Bana banê şîvî hey bano
Bana banê şîvî qurbano
Keçkê bazin zîvî hey bano
Keçkê bazin zîvî qurbano
Deçime heyîvê hey bano
Deçime heyîvê qurbano

Heremên Amed, Botan û Behdînan

# Baran baran




Ewa min derom ser wesyetit bê
Dilekey minit le kine azîzekem amanetit bê
Baran baran baran barane baran debarê
Le çî degeray azîzekem le gulî beharê
Kewte mabeyinman h'ewt kêw û h'ewt ko
Meger bay reh'met azîzekem min bênêbo to
Bran baran baran baran nim nim termî kird
Î'şqî çaw ciwan û nazenînekem le dîn dermî kird
Daykit xecalet bawkit rûsiyah
Etoyan lêm kird e'zîzekem bo malî dunya
Baran baran baran baran baran dabarê
Le çî degeray azîzekem le gulî beharê
Kulî dilekem dê wek baranê
Min lêre mawim azîzekem yar le taranê
Baran baran baran baran baran termî kird
Î'şqî çaw ciwan û nazenînekem le dîn dermî kird

# Baran baran e




Soranî / Gelêrî

Baran, baran e nim nim termî kird
Ew kiçe ciwane le dîn dermî kird
Baran, baran e mezray kird rengîn
Yar xudahafîz be dilêkî xemgîn
Mirdin le bîrmî le mew diwawe
Pal dedem we pal qapî xudawe
Pal dedem we pal xewsî bexdawe
Baran baran e, hewir û barane
Yar xuda h'afîz dest lêk berdane
Mirdin le bîrmî, bîrim kirdewe
Ser le beyanî nwêjim kirdewe
Neh'let lew şeytan hoşim kirdewe
Neh'let lew şeytan hoşyar bûmewe...
Baran barane, debarê baran
Deda, le şanî sîmîn û'zaran

# Barane






Le baxî destim bird bo bey
Ey wey wey barane
Baxewan gazî kird neykey
Bot mirdin dey canane
Marangaz bû bedestî h'ey
Ey wey wey lem barane
Erê destyan lê mede
Cêga pencey yarane
Esmeran çawyan ciwaen
Le baxî destim bird bo sêw
Ey bimrim wey barane
Dest h'eyif bû girtim be lêw
Bot mirdim wey barane
Bê sah'îb bû, kirdim bexêw
Ey wey wey lem barane
Le baxda destim bird bo gul
Bot mirdim wey barane
Belkem, meqsûd bê, bendî dil
Bot mirdim wey barane
Lêm pisa rîşey cerg û dil
Bot mirdim wey barane
Le baxî min çinîm henar
Ey wey wey barane

Baxewan lêm kewte hawar
Ey wey wey barane
Cerg û dilim bû be bîmar
Ey wey wey barane
Le mabeynî gul û gulzar
Bot mirdim wey barane
Şilêr bun wa kewte hawar
Bot mirdim wey barane
Le baxîda bûm be mîwan
Ey hawar lem barane
Mîwanî gul û xat gulan
Bo to mirdim barane
Kewtime cêjwan, le nêw dalan
Bo to mirdim barana
Çume malyan be mîwanî
Bo to mirdim barane
Pencem gûşî legel ranî
Bo to mirdim barane
Daykî e'yar bû pêy zanî
Bo to mirdim barane
Meh'buban çawyan ciwane
Xirt û xol û xalyan ciwane
Le baxîda çinîm hulû
Bot mirdim wey barane
Yar keleget û xal le rû
Bot mirdim wey barane
Têr têr danîştîn dû be dû
Meh'buban çawyan ciwane


# Berbanekê




Berbanekê berbanekê
Berbanekê gulçîçekê
Ewkî berbanek girê da
Kinê gulçîçek girê da
Berbanekê hilda jorê
Gulçîçekê xwi bide dorê
Bavê te hakimê zorê
Îslam gawir xwi da dorê
Bûrim bûrim berbanekê
Bûrim bûrim gulçîçekê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Bevlekan




Bavlekan bavlekan e
Hey werine werine
Hey werine bavlekan e
Bûkle bûka şêran e
Hilavên ser milan e
Ser govend ya meran e
Ber govend ya xwesyan e
Bavlekan berdan deştê
Dengê van şêran xweş tê
Miryem huriya bihuştê
Hey govend e govend e
Zeriyên me li govendê
Meşiyane şox û rindê
Govend li beriya jorî
Dîsgotin
Meşiyane gerden morî
Hey govende govende
Meşiyane kember bista
Govend xweşe bi helbesta

Herêmên Botan, Behdinan

# Bawenekey bawim




Soranî / Gelerî

Bawanekey babim bînayî çawim
Le dûrî balat reş bû henawim
Bo to nemawim bo to nemawim
Ser ta be pay zêr bê
Pir deştî bajêr bê
Hemûy xende lêw bê
Min her tom dewê to
Feslî behare ewanya şîne
Eşqî yarêkim xwênî şîrîne
Feslî behare deşt û kêw xoşe
Le deştî kenêre na le dol wenewşe
Çon xuda berdare xerqim key le xem?
Meylim bideye hawar yan zor û yan kem
Feslî behare wextî gulzare
Kêw û çiya ciwan.. Dinya diyare


# Baxewan giyan






Leber ew jine reştale, qedî delêy şimşale
Ser keme ser ranit giyan pêmda de bew desmale
Ger gule pirsî kêye, ramjêne bilê mindale
Ger bo yekcar çeqey kird bimşêle bilê bêh'ale
Baxewan giyan min xerîbim rêgay baxit le kwêye
E'şqî balay lêw al bûm malyan le kerecêye
Ew dilem buwe be mecnun, şêtî çawî leylêye
Yalla ya sultan hawar derwanête burhanî
Seyzade barî kirduwe nema lew seholanî
De were destemilanit bim boç be derdim nazanî
Ca ew derdey min dekujê, jinî guley mêrdanî
E'ntîke û zêde lawe, çonî lê bikem silawe
Singit penîrî tere, zulfit giyabend û xawe
Kellekey çepim kune, lêw al be mist lêydawe
Awirî le min berdawe, leser çî lêm torawe

# Bay şemal




Ew guley meşhûrî gişt a'lem bû kwa yadî be xêr
Meylî wî dermanî derdî min bû kwa yadî be xêr
Çon debê fîkrit nebê tîrit le cergim kariye
Ew demey bûme nîşaney tîrî to yadî be xêr
Bay şemal bîda be des ew dulbere hawarem
Melh'emêkim bo binêrê bo dilekey zamdarim
Min ke seydî tîrî seyyadim nema seyyadî min
Ew demey tîrit le cergî min deda yadit be xêr
Ew ke deyfermû wefadarim be şertî a'şqî
Çon le yadim çê kelam û xendekey yadî be xêr
Bay şemal bîda be des ew dulbere hawarem
Melh'emêkim bo binêrê bo dilekey zamdarim
Ger be xemzey çawî mestî wek mûhîb şîrîn kelam
Merhemî derdî birîndarî dekird yadî be xêr
Çon bijîm bê to gulim ewro le gulzara nebê
Gişt cîhan zîndane bê to xemzeket yadî be xêr
Bay şemal bîda be des ew dulbere hawarem
Melh'emêkim bo binêrê bo dilekey zamdarim
Min denalênim ke bo leyla le gulzara niye

Çawî mest û xalî lêwî ew gulem yadî be xêr
Çawekem te key weku mecnunî şeyda nale kem
Her leser şertî qedîmim bê wefa yadit be xêr
Bay şemal bîda be des ew dulbere hawarem
Melh'emêkim bo binêrê bo dilekey zamdarim
Dulberî mah peykerî nazdarî min wa çote kwê
Pêy bilên ba bêtewe cananî min yadî be xêr
Xoş eda şîrîn le qay çaw mestî şox û şengekem
Bêtewe û bênêtewe samanî min yadî be xêr
Bay şemal bîda be des ew dulbere hawarem
Melh'emêkim bo binêrê bo dilekey zamdarim

# Bazî bêyan




Soranî / Gelêrî

Bazî Bêryan dûre deste eman eman
Bêrî dên, bêrî dên deste be deste
Herçî radebirê çaw meste eman eman
Radebirin dil deben be xemzey çawan
Be birjang kun deken cerg û henawan
Bazî Bêryan dûre dêye eman eman
Bêrî dên bêrî dên şîr meşkiyan pêye
Xom rawestam le ser rêye eman eman
Yar kolî xom çawî lêye eman eman
Radebirin dil deben be xemzey çawan
Be birjang kun deken cerg û henawan
Bazî Bêryan çêr û çêwe eman eman
Bêrî dên bêrî dên gwareyan zîwe
Teşî derêsin be rêwe eman eman
Radebirin dil deben be xemzey çawan
Be birjang kun deken cerg û henawan
Bazî Bêryan le derawan eman eman
Le nêw giyabend û giyaxawan
Qîbley awate bo lawan eman eman
Radebirin dil deben be xemzey çawan
Be birjang kun deken cerg û henawan


# Bê diktor






Bê diktor dewa û derman
Şêtit kirdim sergerdan
De were de were kejal giyan
Nexoşim bo to bîlla
Key dêy destim be daman
Pêkenîn bû be giryan
Det bînim çaw be giryan
Nexoş û derdedarim
De were de were be qurban
...(Azerî)
Lêm torawe kejalim
Deşt û kêw mal û h'alim
De were de were be qurban
Torawe çaw kejalim
Swêndit bo bixom be wella
Min wa bot tenya balim
Pêbikene ba bitbînim
Derçê giyanî şîrînim
Nexoş û derdedarim
De were roh'î şîrînim
... (Azerî)

# Be dînarî






Çaw û ebrot le yek tîrin
Ey wey ey wey be dînarî
Mîslî şahan be regbîrin
De were dey dey be dînarî
Ew çawaney helyan dênî
Ey wey ey wey be dînarî
Be kile û derman deyrengênî
Ciwanî kurtî be dînarî
Boç lêm zîzî namdiwênî
De were de were be dînarî
Be dînarî û be dînarî
Çend e'ntîke û mezedarî
Necîbeyan bird le bo şarî
Boç lêm zîzî zulif xawî
Ax delên gule lêy dawî
Bişkê destî kwêr bê çawî
Herçed dekem fikir û xeyal
Teqmîn delê naçîn emsal
Bo to mirdim mam pirteqal
Demhewê rojê bitbînim
Ba derçê giyanî şîrînim
Kurtê to destim desto ke
Taqaney mergit ne bînim
Lêm gum buwe kew û kewbar
Kotir defrê le sîley dar
Çawerêt dekem kiçe ciwanê
Tûşit bim min le rêy bazar

# Be gulan û be gulan




Serim sewday î'şqî dildare
Sa min be sewday çîm û çi kare
Be gulan û be gulan be gulî kenîrê
Ew guley heldegirim deçime hewlêrê

Her tobêk deykem tobem be fêle
Kirasêkî bidirû rêy destim bêle
Da xuda çarenûs be dway kê wêle
Be gulan...
Ew guley...

Razî nîm hênde piştêndî şil debestî
Zeh'mete ber bê destim le destî
Be gulan...
Ew guley...

# Be î'nwanî






Xemî xome xanim derdî duwan
Xemî xome ciwanê derdî duwan
Reng zerdî tom de were wek mirduwan
Hey be î'nwanî beşen çende ciwanî
Pêşkeşit bê de were baxî xanî
Sûre gulekey de were mukiryanî

Xemî xome ciwanê derdî kalê
Cût basikim lew gerdinet alê
Hey...
Pêş...
Sûre gulekey wella suleymanî

Xemî xome ciwanê derdî leyle
Le xem da derunim keyle
Derheq be min boçî yar bê meyle
Hey...
Pêş...
Sûre...

# Be lerzane




Sorani / Gelêrî

Ey be lerz û lerz suk were be lerzane
Gêlgêlekey dewrî serit pexşe perêşane

Hêzî pêm niye biçime ban yalê
Axo yarekem wa le çi malê
Hêzî pêm niye birom be rêda
Çun yar nexoşe kewtuwe le cêda
Hêzî pêm niye biçime malyan
Sebaret be yar bipirsim h'alyan
Hêzî pêm niye birom bîdwênim
Min wek perwane meger xom bisûtênim
Hêzî pêm niye birom rawestim
Çun şêt û şeyday dû çawî mestim

# Be Tewrat






Meclîsêkyan girtuwe, gure'y wa le taranê
Çiwar kesiyan pesend kirduwe, le ê'raq û êranê
Amîn giyan le sengeser, seyzade le baziyanê
Yarî xom le sabilaxe û lêw alim le bokanê

Be tewrat û be tewrat
Gerden qoring û lêw nebat
Erê bo xot qewilit da
Mangî taze le niwê hat
Be ser gerdî balat bim
Ew rencem nedey be bad
Bejinit darî şimşade
Dînit birdûm be bade
Rûm dênim zulfit lade
Bo rûbend çakim lêw al
Be rûy xalanim da de
Kirasekey şîrketî
Kewşekey keluzade
Hêndey min dua' dekem
Rebî gul her nemênê
Emin deçime xerîbî
Kê balat bişemzênê
Wek mayînî kak axa
Namerdêk detrifênê
Sibh'eyinê zû heldestim
H'azir debim nîwero
Dedem le ser bo bako
Singeket baxî şino
Ruh'mî xêri bê le dilim
Dêtin be wella boso
Le qemtere û burhanî
Le kulîçe û dermanî
Seyid kakecan hawar
Le mezray seholanî
Agadarî yarim bê
Kak eh'med le sileymanî
E'ntîke û zêde lawe
Çonî lê bikem silawe
Xedengî le dilim dawe
Singî penîrî kurdî
Zulfî giyabend û xawe
Kelekey çepim kune
Lêw al be mist ley dawe
Be tewrat û be tewrat
Be tewrat û încîle
Derd û dermanim kurtê jin
Çawî rastim kenîle
Bêcige le minî malwêran
Dinya bo to zelîle

# Bê to helnakem




Soranî / Gelêrî

Hawar haware yaran, berin hawarim
Destî şikawim le min torawe yarim
Ew sal bom naye sed car xozge be parim
Were ba aşit bînewe
Kulî dilekem, her toy gulekem, bê to helnakem

Ne cêjinim weku azîz cêjinedaran e
Ne dostim weku yaran dostî carene
Min lêre mawim, hawar yar le şarane
Were...
Kulî...

Reşe bextim her wek xalî ciwane
Leser çî yarî min degirê behane
Dil û dînim leser lêw alê dana
Were ba aşit bînewe, têkçûy leser çî
Xo min çim negut, le dilit der naçê

Yarim reş esmere le min torawe
Namey bo denêrim be dem şew bawe
Nazanim leser çî dilî êşawe
Were...
Kulî...

Deste û ejno danîştûm le ser yarê
Yarî min le kwêye
Bay şemal le kwêye berê hewarê
Gerçî ah û nalem lêy naka karê
Were...
Kulî...

Ke yar bê meyil bê, bê meyil mei'lume h'alim
Lewey reştir nabînim rojî talim
Satêk nasirewê bê to ew diley zalim
Were...
Kulî...

# Be yadim ken

Andante




Be yadim ken firyadim ken
Her çend carê to naz dekey
Ay birînekem sarêj ekey

Her wa derwa lence eka
Ser gonakey areq eka
Nexoş bî xwa key feriq eka
Birînekem ekulêtewe
Nexoş bî xwa key feriq eka
Ay birînekem sarêj naka

Her wa derwa weku tutî
E´ceb lutewaney lutî
Dek xwa bimkey be hawcutî
Ay birînekem ekulêtewe
Dek xwa bimkey be hawcutî
Birînekem mekulênewe

Areqî destî dilber bê
Ca jehirî marî h´ewser bê
Jehirî marî h´ewser bê
Sed car deyxom qedirî ser bê
Ay birînekem ekulêtewe
Sed car deyxom qedirî ser bê
Birînekem mekulênewe

Be yadim ken firyadim ken
Her çend carê to naz dekey
Ay birînekem sarêj ekey
Ay birînekem ekulêtewe

Alî Merdan, Hewlêr 2001

# Behar hatewe






Behar hatewe be rengî ciwanî
Bo askekanî ser şaxekanî
Bo gul û gulzarî nêw baxçekanî
Bo ser dergakanî rêh'anekanî
Behar hatewe behar hatewe
Dost û desgîran aşt dekatewe
Preçemî sî rengî sipî û sewiz û sûr
Awazî kirduwe la dinya menşur
Kuwanê mîlletim boçî le weten bûn dûr
Ewroke şaxit ciwane seraser bilûr

# Beharan çe mehzun




Derunim le h'esret dîdarit sûtawe
Dil le lat bê roh' fîdat bê
Agirit berda dilî min agirit berda dilî min

Beharan çe meh'zun denalênê bulbul
Heta key bigirîm be îşqî to ey gul
Ay gulî min sunbulî min
Agirit berda...

Ciwanî to lem şareda bê nezîre
Dilim murxî seh'ra be dawî to gîre
Ay gulî min sunbulî min
Agirit berda...

Binalêne bulbul ke wextî gulane
Le ser çil nema gul nîşaney xezane
Ay gulî min sunbulî min
Agirit berda...

Soranî / Gelêrî

# Bejna zirav




Tu gula li gundê xwe yî
Yek wek te lê tuneyî
Ji bo te ez j' dûr hatim
Dilê min te da heye...

Kuro dîno de here
Li dora min negere
Xortê gundê me pir in
Keçê me tune ji te re

Narim narim narim
Li vî gundî bi yar im
Li ser te evîndar im
Çûna bê te nikarim

Bejna zirav bejna te
Çavê xezalan li ser te
Dilêm bu perçe perçe
Ma ev ne bes e ji bo te…

Kuro lawo tu dînî
Ma tu van awiran nabînî
Fesad û nerind pir in
Hêsan nîn e evînî

Narim narim narim
Li vî gundî bi yar im
Li ser te evîndar im
Çûna bê te nikarim

Şeva di nîvê şevê da
Di berf û di bahozê da
Gilî û gazinê xwe dikim
Ketim mala bavê da

Milê xwe bide vî milî
Te agir berda vî dilî
Em derkevin ji vî warî
Da xelas bin ji vî halî

Silopî gundê Herbolê, 1985

# Bejnê




Bejnê bejnê lê bejnê bejnê lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Bejnê bejnê lê bejnê bejnê lê çav û biryên lê reş qeytan
Bejna min rinda lê dest rimbaza lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Gewra min rinda lê dest rimbaza lê çav û biryên lê reş qeytan
Sing dikanê lê van bezaza lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Sing dikanê lê van bezaza lê çav û biryên lê reş qeytan
Te law kuşte lê bi tinaza lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Te kur kuşte lê bi tinaza lê çav û biryên lê reş qeytan

Bejnê bejnê lê bejnê bejnê lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Bejnê bejnê lê bejnê bejnê lê çav û biryên lê reş qeytan
Bejna min rinda lê dest romiya lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Gewra min rinda lê dest romiya lê çav û biryên lê reş qeytan
Sing dikanê lê van moriya lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Sing dikanê lê van moriya lê çav û biryên lê reş qeytan
Te wez kuşt im lê bi yariya lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Te ez kuşt im lê bi yariya lê çav û biryên lê reş qeytan

Bejnê bejnê lê bejnê bejnê lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Bejnê bejnê lê bejnê bejnê lê çav û biryên lê reş qeytan
Wez û bejna xwe bihev ketin lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Wez û gewra xwe bihev ketin lê çav û biryên lê reş qeytan
Ser çiyakê lê bilind ketin lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Ser çiyakê lê bilind ketin lê çav û biryên lê reş qeytan
Xelk nizane lê wem hesret in lê bejnê bejnê lê bejn û bal
Xelk nizane lê em hesret in lê çav û bişryên lê reş qeytan
Bejnê bejnê lê bejnê bejnê lê bejn ê bejnê lê bejn û bal
Bejnê bejnê lê bejnê bejnê lê çav û biryên lê reş qeytan

Heremên Serhed û Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Bejnê




Bejnê Bejnê lê Bejnê Bejnê lê Bejnê Bejnê lê Bejnayê
Bejnê Bejnê lê Bejnê Bejnê lê sor qelemê lê min bi gorî

Ez û Bejna lê xwe bi hev ketin lê bejnê bejnê lê bejnayê
...lê gelo zeryam lê ji malayê
Av hêlanê lê bilind ketin lê bejnê bejnê lê bejnayê
...lê gelo zeryam lê ji malayê

Bejnê Bejnê...

Gelî kûr bûn lê em daketin lê bejnê bejnê lê bejnayê
...lê gelo zeryam lê ji malayê
Xewkam hatî lê em raketin lê bejnê bejnê lê bejnayê
...lê gelo zeryam lê ji malayê

Bejnê Bejnê...

Herêma Serhedê, radyoya Êrîvanê, 1975

# Bejnokê




Bejnokê bejnokê
Mala bavê bejnokê
Bejnokê bejnokê
Şêrînê şemamokê

Dosta min biçuk e
Mala bavê bejnokê
Dosta min biçuk e
Şêrînê şemamokê

Ser gerdenê zêr e
Bejnoka Emer e
Gerden zêrê zer e
Dosta min esmer e

Bejnoka Elî ye
Gerden zêrê spî ye
Dosta min biçûk e
Bejnoka cindî ye
Dosta min keyfi ye

Heremên Botan, Bahdînan, çavkanî : Cewad Merwanî

# Belê ewsa dilêkim bû







Ewey ewsa ke rûnakî eda bew jîne şêwawe
Dilêkî pir le aheng bû ke êsta pakî rûxawe
Dilê bo zarî dildarî beheştî xoşewîstî bû
Weku gul xane meydanî bûtî ciwanî peristî bû

Ewey ewsa...

Belê ewsa dilêkim bu ke serçawey jiyanim bû
Dilim malbendî awat û tewijm û tîrî giyanim bû
Tiruskey tiya bedî nakem serincim çende lêdawe
Le tebûy namuradî bû temî nasorî bew dawe

Ewey ewsa...

# Bêlim lo




Her bêlim, bêlim, bêlim, bêlim, bêlim lo
Her bêlim, bêlim, bêlim, bêlim, bêlim lo

Emê îşev li ku bin bêlim lo
Emê sibe li ku bin zalim lo
Li ser pira Batmanê bêlim lo
Li ser pira Batmanê zalim lo
Xweş tê dengê erbanê bêlim lo
Xweş tê dengê erbanê zalim lo
Li reşmoriyê geriyam bêlim lo
Li reşmoriyê geriyam zalim lo
Waye di stûyê Eyşanê zalim lo

Her bêlim, bêlim, bêlim, bêlim lo
Her bêlim, bêlim, bêlim, zalim lo

Emê îşev lu ku bin bêlim lo
Emê işev li ku bin zalim lo
Li ser pira Kemûkê bêlim lo
Li ser pira Kemûkê zalim lo
Xweş tê dengê tûtûkê bêlim lo
Xweş tê dengê tûtûkê zalim lo
Li reşmoriyê geriyam bêlim lo
Waye di stûyê nûbûkê zalim lo

Herêma Silîva, çavkanî : Rojen Barnas 1999

# Benaz giyan




Erê çendim pê witî giyane be tegbîrim bî
Erê be qisew nekirdim nazenîn xudagîrim bî

Erê benaz giyan benaz
Kiçê benazit kirdim
Erê mindalî dwênêm giyane to pîrit kirdim

Erê hêşta le gelma giyane dil pir le qînî
Kiçê mubarekit bê giyane  elqey bûkênî

Erê benaz giyan...

Erê çend sal be tîrî nazenîn e'şqit rencerom
Erê ewe le daxit giyane bar dekem derom

Erê benaz giyan...

Erê herkes aşiqe ciwanê wek û min nebê
Kiçê gîrodey dawî ciwanê perey dil nebê

Erê benaz giyan...

Soranî / Gelêrî

# Ber çela




Çelê li ber çelan bilind e
Heylo lawê min lawo
Yara min bejin bilind e
Çelê li ber çelan dirêj e
Yara min bejin dirêj e
Temo muxtar e ji mêj e
Çelê li ber çelan sor e
Temo muxtarê par e
Yara min bejn dar e

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Berçelan




Berçelan û berçelan
Kani avê sîpêlan
Berçelan warê axê
Ker (kerî) kêşane Urmexê
Şahiyan e li mala axê
Berçelan warê miran
Ker kêşane ser bîran
Şerê miran bi zinciran
Me pir kiro pir kiro
Me Berçelan pir kiro
Berana dûng stûr kiro
Me çêrando çêrando
Me Berçelan çêrando
Beranan dûng (dûv)hejando

Seydayê Goran, 2000

# Berhelbêne




Soranî/ Gelerî

Çende geram wilatan
Nemdî weku nîştîman
Şew u rojî şîrîne
Bê wêneye le cîhan
Nekey feramoşî key
Têkoşanî bê wiçan
Erê lêyde ber helbêne
De na lêyde berhelbêne
Ber helbêne, ber helbêne
Ber helbêney şil kirawe
Her deroyî u dekirawe
Gelêkîş memnunim bû
Be ciwanî bom girê dawe
Erê lêyde ber helbêne
De na lêyde berhelbêne

# Berî bang




Berî bangî sivhêwo
Piştî bangî sivhêwo

Kurtek şolê Şamêwo
Yarikan yar nevêwo

Berî bangî êvarî
Piştî bangî evarî

Tavkê dabû nizarî
Kurtek şolê Zebarî

Yarigê bê qirar î
Yarigê bê qirar î

Berî bangî nêv roj e
Piştî bangî nêv roj e

Gerden sêvê pişkoj e
Zeriyan xwe da beroj e

Gerden sê rêz bişkoj e
Dostka min çend dilsoj e

Heremen Botan, Bahdînan

# Bêrîvanê




Bêrîvanê mal wêranê şêrînê wey bê xwedanê
Zerka te ji boy çi vala ye meşka te ji boy çi qetyaye
Bêrivanê mal wêranê şêrinê wey bê xudanê

Bêriyê qêr ke sitrana da tu nakî êş û jana
Em ji tirsê qet namirin em ji tirsê qayîmtir in
Bêrîvanê mal wêranê şêrînê lê bê xudanê

Bêriyê bêje bêriya esmer û can û zeriya
Nêzîk ew buhar bêtin ew buhara pez bizêtin
Bêrivanê mal wêranê şêrînî bê xudanê

Pezê te bo çi hêle pê belabe ew kit kêtê
Bêriyê bêje şivani guh bide pezê xûdanê
Bêrivanê mal wêranê şêrine wek bê xwedanê

Tahsîn Taha, radyoya Bexayê 1976

# Bêriyê tê





Bêriyê tê ha ji bêriyê tê wê
Gundo kawa'm ji bêriyê tê wê
Bêriyê tê kuro ji bêriyê tê wê
Gundo rinda'm ji bêriyê tê wê
Bejin zirav e dêre lê tê wê
Gundo zeriyam ji bêriyê tê wê
Bejn zirav e dêre lê tê wê
Gundo rinda'm ji bêriyê tê wê
Dêre çiqas li bejnê tê wê
Bêriyê tê kuro ji bêriyê tê wê
Dêre çiqas li bejnê tê wê
Gundo kawa'm ji bêriyê tê wê

Bêri bêriyê mezina wê
Bêriyê tê ha ji bêriyê tê wê
Bêri bêriyê mezina wê
Gundo rinda'm ji bêriyê tê wê
Law şiwanê bizina wê
Bêriyê tê kuro jı bêriyê tê wê
Kur şivanê bizina wê
Gundo rinda'm ji bêriyê tê wê
Pez berda terazina wê
Bêriyê tê ha ji bêriyê tê wê
Çêrandi terazina wê
Gunda rinda'm ji bêriyê tê wê

Radyoya Erîvanê, 1976

# Bêriyên sibehiyan




Hey hatin hatin
Bêriyên sibehiyan
Disanê hatin
Bêriyên sibehiyan

Xwe dan hingaftin
Li ber van kêriyan
Kula min ji kê bû
Gerden mohriyan

Aqarê kîzo
Dû şemal tê de
Dostim ramûsim
Mala bavê de

Hey hatin hatin
Bêriyên nêv rojan
Xwe dan hingaftin
Ber van berojan

Kula min ji kê bû
Memik bişkojan
Derda min ji kê bu
Memik bişkojan

Hey hatin hatin
Bêriyên êvaran
Xwe dan hingaftin
Ber van nizaran

Derdê min ji kê bû
Xûdan guharan

Heremên Culemêrg û Şirnaxê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Bêrtî bêrtî




Bêrti Bêrti qurban Bêrti
Kalfê xortê malê kimê minra Bêrti
Ev çi sal bû mi dilkê xû girt
İtares bi ji dest min girti

İtares jêr da hati te kebakir
Dûmane ji zalilê li xû belakir
Xelkê go çitori berdoş e
Min di kelfê xû da sed si sê cara maçelakir

Baran bari merdewan şil kir
Dida ra bû ya pê çêkir
Xelkê ji mi ra kalo dil kir
Min cêng di wê dera ha da hıl kır

Baran bari erd miş mişî
Cahilê me tor bû ling terişî
Xelkê go çitori berdoşe
De´m go merke cahil bu xû kerişi

Kişle bişevitê çûne mirata
Siwareki derketiye hat ji vira da
Nema Fatê goti Hesen çum heksiz bu
Ji kala min ra porê xû şil kir girêda


De min go biye biye lavko biye
Bişevite gundê Omeysa li ti sî girtiye
Dema ez nedama lavkê pisi veremlî ye

De min go meke meke lavko meke
Ji pezî xwe ynê werîne li ser singê min mexel ke
Ciftê memikzozikê min pera te va hev ke

Ava bira germ û keli
De lê peya bû Hezret Elî
Mûhûba dilê min kate vi kali
De here go xûnge sozê te vi heksizi ma dina wi ali

Anatoliya Navin, çavkanî : Xalê Reşîd, 1998

# Bêriya êvarê




Yar yarê yarê lê yar yarê yarê
Yar yarê yarê lê bêrya êvarê
Lawiko îndarî lo kuriko îndarî
Destan de şûr e lo mertala darî
Li talanê xîne lo bîne vî diyarî

Yar yarê yarê lê yar yarê yarê
Yar yarê yarê lê bêrya êvarê
Lawiko Hezmazî lo kuriko Hezmazî
Destan de şûr e lo mertala tazî
Li talanê xîne lo bîne vî gazî
Yar yarê yarê lê yar yarê yarê
Yar yarê yarê lê bêrya êvarê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Berzî berî




Berzî berzî berzî şemame û serî derzî
Destim bird bo derzî wek kale bey delerzî

Erê mawer ho naley giyane cem cemînekem
Erê dîdey dinya û dîn wey wey dinya û dînekem

Erê derun we mewday hawar xedengirêj kerden
Erê rîşey sebûrîm azîz hate kêş kerden

Erê goşey siya mal azîz honda û diyawe
Erê çun mang legoşey azîz hewirî siyawe

Berzî berzî...

# Bew bew




Soranî / Geleri

Keftim we şunit azîz bew bew bew bew we meçu meçu
Ya xwa desteket azîz bew bew bew bew gîr bu xoy derçu

Bew bew bew bew bew meçurewe
Welle îmşew le laman roj bikerewe


Mermin çen witim azîz bew bew bew bew tu peşînetî
Wew qisey nakes azîz bew bew bew bew wegîr dûrketî

Bew bew xanime xasekem
Erê bew pîlet we ban diye rastekem

Bew ta bikey min azîz bew bew bew bew dû sîman wenu
Min darî narînc azîz bew bew bew bew tu darî lîmo

Bew bew bew...


# Bexdayê




Bexdayê xweş bexdayê
Roj û heyvê li dinyayê
Şol teybirên Xwedayê
Bexdayê dergok cotin
Roj û heyv vêk re hatin
Şol teybirên welat in
Bexdayê dergok sê ne
Roj û heyv vêk re têne
Şol teybirên Xwedê ne
Bexdayê dergok çar in
Roj û heyv vêk re dixwarin
Şol teybirên xwînkar in
Bexdayê dergok pênc in
Roj û heyv vêk re rênc in
Şol teybirên Kirmênc in
Bexdayê dergok şeş in
Roj û heyv vêk re (di)meşin
Şol teybirên keleş in

Herêm Şirnex, çavkanî : Seydayê Goyan, 2000

# Bi çi ye





Ha bi çi ye çi ye çi ye
Çemê çolyanê bi çi ye
Çemê çolyanê bi daro
Lê çeryan berx û karo
Çavreş keçika muxtaro

Ha bi çi ye çi ye çi ye
Çemê çolyanê bi çi ye
Çemê çolyanê bi gezo
Lê çeryan berx û pezo
Çavreş keçika çerkezo

Ha bi çi ye çi ye çi ye
Çemê çolyanê bi çi ye
Çemê çolyanê bi bî ye
Lê çeryan berx û mî ye
Çavreş keçika miftî ye

# Bi zeyin




Tu bi zeyin tu bi zeyin tu bi zeynî zeynebê
Tu bi zeyin tu bi zeyin tu bi zeynî melhemê
Tu bi zeyin tu bi zeyin tu bi zeynî zeynebê
Kulîlka evdil eynê melhemê


Baxçê zeyno kirkirk e zeynebê
Baxçê zeyno kirkirk e melhemê
Kirkirka girtiye firk e zeynebê
Kirkirka girtiye firk e melhemê
Mi divê zeyno ramûsim zeynebê
Dayka zeynoyê tirk e melhemê

Baxçê zeyno kelem e zeynebê
Baxçê dêlo kelem e melhemê
Kelema girtiye lem e zeynebê
Kelema girtye lem e melhemê
Dikim zeyno ramîsim zeynebê
Dayka zeyno Ecem e melhemê

Baxçê zeyno pîvaz e zeynebê
Baxçê dêlo pîvaz e melhemê
Pîvaza girtiye saz e zeynebê
Pîvaza girtye saz e melhemê
Mi divê zeyno ramîsim zeynebê
Xastiyê zeyno tolaz e melhemê

Herema Serhedê, çavkanî: Şemdîn, 1993

# Bihêre destar bihêre




Bihêre destar bihêr bihêr
Derdêmê gelek giran in giran in
Dengê destarê girîn e nalin e
Ax û figan û hevar e hevar e

Destaro dani tu herke tu herkê
Bibêje bila bi zarin bi zarin
Bihêre destar bihêre bihêre
Pêxwas û birçî hejar in hejar in
Bihêre destar bihêre bihêre
Pexwas û birçî hejar in hejar in

Destar û dan tu bigerîne bigerînê
Xem û dengê te hewal in hewal in
Carekî xemê bihêle bihêle
We nabi carek te nabi te nabi
Carekî xemê bihêle bihêle
Wa nabi carek te nabi te nabi

Ne êk e destar ne êk e ne êk e
Ne deh in destar ne deh in ne deh in
Ne sed in destar ne sed in ne s din
Ne hezar in destar ne hezar in
ne hezar in
Hijde car hezar hezar in hezar in
Belê ka rabêm çi bikin çi bikin
Car ciha ev rot belaw in belaw in

Herêmên Behdînan û Botan, çavkanî : Tahsîn Taha

# Bilbilo seyraniyo






Hey bilo bilo bilo
Bilbilo seyraniyo
Çavê reş tijî kilo
Min xwaro ji eşq ü dilo
Te yarik miqabilo
Ez û bilbilê lal im
Şev û rojan dinalim
Aşiqê bejna şepal im
Hey bilo bilo bilo
Ez û bilbilê dîn im
Şev û rojan dixwînim
Aşiqê bejna xatûn im
Ez û bilbilê kerr im
Hey bilo bilo bilo
Şev û rojan diherim
Aşiqên memkên ter im

# Bilûrvan




Bilûrvan û bilûrvan
Bilûrvan û şalûrvan
Xwezila bilûr bişkesta
Têla navê helbesta
Ewkî jinek bixwesta

Tu şiyar î mest î
Tu xewar î mest î
Xwezila bi wê şevê
Ew kî jinek xwestî
Bûkê ji hindav da
Fincan bida dest î

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Bindane û ha bindane




Bindan e ha Bindan e
Bindan gundê mîran e
Ûso dewlê mêran e
Kuştî layê mîran e
Ji bo mal û milkan e
Qasim bego lawîno
Te kiras kino cawîno
Te kuşt Qedriyê zavîno

Herêmên Amedê, Behdînan û Botan

# Binya malan




Binya malan zalim zalim
Mêrg û zevî way way
Mêrg û zevî way way

Giya genim zalim zalim
Hev dikevî way way
Hev dikevi way way

Dema çavêm zalim zalim
Te dikevî way way
Te dikevî way way

Dil cigerêm zalim zalim
Hev dikevî way way
Hev dikevî way way

Binya malan zalim zalim
Av û çem e way way
Av û çem e way way

Dadiwirî zalim zalim
Wek zemzem e way way
Wek zemzem e way way

Kuda terî zalim zalim
Ez dû te me way way
Ez dû te me way way

Tu bi ya min î zalim zalim
Ez ya te me way way
Ez ya te me way way

Herêmên Amedê, Behdînan û Botan

# Bizinê




Bizinê ha bizinê ha na na
Bizinê ha bizinê tew can na na

Bizina serê lodê ha na na
Bizina serê lodê tew can na na
Dev avêt gurza kodê ha na na
Dev avêt gurza kodê tew can na na
Bizinê bidinê tobê ha na na
Bizinê bidine tobê tew can na na

Bizina zik mezin e ha na na
Bizina zik mezin e tew can na na
Salê cot kara tîne ha na na
Salê cot kara tîne tew can na na
Yek dimre yek dimîne ha na na
Yek dimre yek dimîne tew can na na

Bizina pir bi lez e ha na na
Bizina pir bi lez e tew can na na
Nanê şivan didize ha na na
Nanê şivan didize tew can na na
Şivan bizinê dikuje ha na na
Şivan bizinê dikuje tew can na na

Herêm Şirnex, çavkanî : Seydayê Goyan, 2000

# Bizmar e û bizmar e




Bizmare û bizmare solê be bizmare
Pêy le cergî nawim şîrnê gwê be gware

Bizmar niye mêxe yarim kiçe şêxe
Bala berz û şîrîn çen belence û lare

Bizmare û bizmare...

Bizmarey le zêrê hatiwe le hewlêrê
ya xwa her be xêrê ew yare nazdare

Bizmare û bizmare...

Tebîbî dilanî maşella ke ciwanî
şox û mîhrebanî bê hawtay lem şare

Bizmare û bizmare...

Soranî / Gelêrî

# Bo firibî aşiqan




Bo firîbî aşqan û cezbî dil wa mahirî
renge şagirdît biken muhtab nesîm û samirî

Kafirîş ruh'mê be yexsîr û zelîlî xoy deka
sa were ruh'mê be h'alimke egerçî kafirî

Bo firîbî...

Ger be xencer pare parem ken le ser rêm dabinên
dest le to helnagirim min tom le xelkî çatirî

Bo firîbî...

Soranî / Gelêri

# Bo minit nawê





Debim be xulam bo çawî kalit
Xo min gawir nîm hatûme malit
Boç minit nawê bo çî minit nawê?
Xo min be bê to hel nakem tawê
Debim be xulam bo çawî mestit
Xo min gawir nîm kewtûme destit
Şil şil bimkûte, be nebatewe
Bimnêre zexmî ser gonatewe
Heta meyilit bû, be meylit jiyam
Êsta bê meylî, minîş dilniyam
Heta meylit bû, be meylim kirdî
Êsta to bê meylî wam zanî mirdî

# Bom bilê toze toze




Bom bilê toze toze
Hewrît le milan aloze
Baskim we jûr serî de
Ca çiş ba bişkê goze
Leber bedkar nawêrim
Lêy bikem cejine pîroze
Were destim de estoke
Bew germa û tep û toze
Awirî le min berdawe
Xalî şînî pîroze
Çendey lê paramewe
Awirî lê nedamewe
Ew awrey lêy damewe
Kewtim helnestamewe
Nexoş û derdedarim
Nesrîn bê be lamewe
Le bê lutfî yarî xom
Bê diktor detlamewe

# Bonî helala dê




Xerîb xerîbî şaran
Kewtime dûre diyaran
Boçî reh´mit nemawe
Qurban wek carî caran
Bonî helalan dê
Seday çaw kalan dê
Le gewere mala dê
Dey dey dey dey ba bê
Be kirasî ketan bê
Neşmîl gulî nesrîne
Çûzeley yasemîne
Xicîle u xwên şîrîne
Dey dey dey dey bîbîne
Demî be pêkenîne
Teyrî bê dane u awim

Perwaney bal sûtawim
Hemû a´lem deyzanê
Çaw ciwan bo to nemawim
Bonî helalan dê
Seday çaw kalan dê
Le gewere mala dê
Dey dey dey dey ba bê
Be kirasî ketan bê
Neşmîl gulî nesrîne
Çûzeley yasemîne
Xicîle u xwên şîrîne
Dey dey dey dey bîbîne
Demî be pêkenîne

Soranî / Gelêrî

# Bor bor




Bor bor bor bor, bora di ber borê da
Bor bor bor bor, keska di ber sorê da
Bor bor bor bor, savarê tûzik tê da
Bor bor bor bor, bûka ku di ber zavê de

Bor bor bor bor, bor anîne diyara
Bor bor bor bor, bor anîne diyara
Bor bor bor bor, xurmîn ketye siyara
Bor bor bor bor, xurmîn ketye siyara
Bor bor bor bor, şewtî dilkê hevala
Bor bor bor bor, şewtî dilkê hevala

Bor bor bor bor, bor anînê kaniyê
Bor bor bor bor, bor anîne kaniyê
Bor bor bor bor, reşmet ketye pêşiyê
Bor bor bor bor, reşmet ketye pêşiyê
Bor bor bor bor, şewtî dilkê xaltiyê
Bor bor bor bor, şewtî dilkê xaltiyê

Bor bor bor bor, bor anîne fetlekê
Bor bor bor bor, bor anîne fetlekê
Bor bor bor bor, reşmet ketye kelekê
Bor bor bor bor, reşmet ketye kelekê
Bor bor bor bor, şewtibû dilkê kekê
Bor bor bor bor, şewtibû dilkê kekê

Bor bor bor bor, bor anîne hewşêyo
Bor bor bor bor, bor anîne hewşêyo
Bor bor bor bor, qeydê avêtin pêyo
Bor bor bor bor, qeydê avêtin pêyo
Bor bor bor bor, şewtîbû dilkê dêyo
Bor bor bor bor, şewtîbû dilkê dêyo

Bor bor bor bor, me bor anî wem hatin
Bor bor bor bor, me bor anî wem hatin
Bor bor bor bor, sêvê sorê Xelat in
Bor bor bor bor, sêvê sorê Xelat in
Bor bor bor bor, ser çavê zavê hatin
Bor bor bor bor, ser çavê zavê hatin

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Boy dênim




Nexoş û sergerdanim
Delêm destim destoke
Xerîb û dil peşêwim
Boy dênim boy dênim
Dû korpey le lanik bê
Yan ew baskî xom debirim
Key danîşîn dû be dû
Memkit xire wek hulû
De were destim destoke
Swênd be wella û bîllaye
Zulfî hewda hewdaye
Be roj qewlim dedatê
Derdit le malim kalê
Sê gez be gezê kurdî
Pêm eybe û pêm îrade
To biro bawkit razî ke
E'ntîke û zêde lawe
Xedengî le dilim dawe
Qed bilind û belek çawe
Hêzî ejnom nemawe
Birwane barî lêwim
Xerîb û dil peşêwim

bo balat perêşanim
teskê derdit le giyanim
emin nazit natwanim
le gul û gwarey bo dênim
herdûkyan radejênim
yan hîçyan nagirênim
keleget û xal le rû
singit befrî elmalû
bo tom awir tê ber bû
bew derdey le dilim daye
be wey badî hewaye
şewê le jiwanim naye
kezyet bendî reşmalê
baskim le gerdinit alê
le bot bikem male û malê
daykit bo min hîç nalê
çonî lê bikem silawe
awirî le min berdawe
lewetey ew jine torawe
xembar û dil peşêwim
her etoy xunçe sêwim
de bê to bikey bexêwim

# Buharê hat buharê




Buharê hat Buharê
Gul vebû li rûkê yarê
Wexta çavê min lêket
Aqil ji serê min çûbû derê
Buharê hat Buharê
M'gulek dî l'rûkê yarê
M'bala xwe da vê gulê
Ji dil de evîndar e
Hin pir gulêm pir hene
Gulê min wekî te ne

Buhar hat tevb'gihayê
Tev girt çol û çiyayê
Buhar hate govendê
Govend qada mêra ye
Buharê hat Buharê
M'gulek dît binya darê
Bala xwe dam wê gulê
Ji dil de evîndar e
Hin pir gulêm pir hene
Gulê min wekî te ne

Buhara me şêrîn e
Tevde gîhayê hêşîn e
Keçê dilê min xweş ke
Giş bi kul û brîn e
Buharê hat Buharê
M'gulek dît binya darê
Bala xwe dam wê gulê
Ji dil de evîndar e
Hin pir gulêm pir hene
Gulê min wekî te ne

Buhar çi xweş û rind e
Tev girt bajar û gund e
Keçê te ez helandim
Carek serî li min hilde
Buharê hat Buharê
M'gulek dît binya darê
Bala xwe dam wê gulê
Ji dil de evîndar e
Hin pir gulêm pir hene
Gulê min wekî te ne

# Bûk û Zava




Hey Narîn Narîn Narîn delala dilê min Narîn
Tu bes rondikan dabarîn
Xelkê em ji loma xwarîn

Emêt hatin te nas kin Narê hey Narê (bûkê nazdarê)
Te bi kurtek û kiras kin Narê hey Narê
Te ji mal bavê xilas kin bûkê nazdarê

Ya rabûyî rawestiyayî bilindê rawestiyayî
Lewendî dahêlayî ya mayî çav lê rê birayayî

Em hatinno te bînin narê hey Narê (bûkê nazdarê)
Dem kekê dev te runîn Narê hey Narê
Paşê dê te bixemlînin bûkê nazdarê

Ya rabûyî çenda bilind e rawestiyayî çenda bilind e
Bejin şemal û find e piştî te xirabe gund e

Emêt hatine te yo Narê hey Narê (bûkê nazdarê)
Tu bike karê xwe yo Narê hey Narê
Te bistînin ji bavê te yo bûkê nazdarê

# Bûkê delalê




Bûkê delalê rabe xwe kar ke
Cil û cihêza bi serê xwe da ke
Zava şîrîn e xortekî pak e
Zava delal e xortekî pak e

Xemla we bûkê xemleka zêr e
Bûk û zava xwe dane ber e
Bûk sipiye zava esmer e
Bûk sipiye zava esmer e

Bûkê delalê tu pir hêja yî
Şemamoka li nav merda yî
Tu pir şîrîn î tu pir hêja yî
Xewn û xeyala çavê zava yî

Xemla te anîn ji alî yemen e
Dahul zurne adetê me ne
Tu pir bedew î tu pir şîrîn î
Xêr û xoşiyê ji mera tînî

# Bûkê delalê




Bûkê delalê karê xwe bike
Xemla xwe girêde qedirê xwe da ke
Dilê zavê tu ne êşînê
Zava delal e xortekî baş e
Zava bînbaş e xortekî baş e

Bûkê delalê ev mala te ye
Qêrîn û girîn bê feyda ye
Xatirê xwe bixwaze ji xweyê xwe ye
Zava delal e xortekî baş e
Zava bînbaş e xortekî baş e

Bûkê delalê gelek hêja yê
Tu azîzî rewşa mala yî
Xwîneka sor î tu bi dilê zava yî
Zava delal e xortekî baş e
Zava bînbaş e xortekî baş e

Bûkê delalê tu xema neke
Xem giranî tev da çê neke
Çavê biriyê belek li zavê helal ke
Zava delal e xortekî baş e
Zava bînbaş e xortekî baş e

Bûkê delalê bûka kurda yî
Şemamoka nava bexça yî
Tu azîza ber dilê zava yî
Zava delai e xortekî baş e
Zava bînbaş e xortekî baş e

Herêmên Amedê, Behdînan û Botan

# Bûkê delalê




Bûkê delalê karê xwe bike
Xemla xwe girêde qedrê xwe da ke
Dilê zavê tu ne êşinê
Zava delal e xortekî baş e
Zava bînbaş e xortekî baş e

Bûkê delalê ev mala te ye
Qerîn û girîn bê feyda ye
Xatirê xwe bixwaze ji xweyê xwe ye
Zava delal e xortekî baş e
Zava bînbaş e xortekî baş e

Bûkê delalê gelek hêja yê
Tu azîzî rewşa mala yî
Xwîneka sor î tu bi dilê zava yî
Zava delal e xortekî baş e
Zava bînbaş e xortekî baş e

Bûkê delalê tu xema neke
Xem giranî tev da çê neke
Çavê biriyê belek li zavê helal ke
Zava delal e xortekî baş e
Zava bînbaş e xortekî baş e

Bûkê delalê bûka kurda yî
Şemamoka nava bexça yî
Tu azîza ber dilê zava yî
Zava delal e xortekî baş e
Zava bînbaş e xortekî baş e

# Canê canê




Canê hat û bihurî, tolê hat û bihurî
Di mila de elbek tirî, mila de elbek tirî
Çavê mi bi çavê te ket xwînê li canêm tewirî
Çavê mi bi çavê te ket xwînê li canêm tewirî

Lê canê canê canê kulîlka mala hanê
Lê canê canê canê ewrê reşî nîsanê
Hûr hûr taviyê baranê hûr hûr taviyê baranê
Şil kir xemlê qîzanê şil kir xemlê qîzanê

Canê qîza mele ye, tolê qîza mele ye
Pala xwe daye derge ye, pala xwe daye derge ye
Paşil tije xurme ye, paşil tije xurme ye
Zarno wernê hêle ye, kurno wernê hêle ye

Lê canê canê canê kulîlka mala hanê
Lê canê canê canê ewrê reşî nîsanê
Hûr hûr taviyê baranê hûr hûr taviyê baranê
Şil kir xemlê qîzanê şil kir xemlê qîzanê

Canê qîza keşîş e, tolê qîza keşîş e
Pala xwe daye terîş e, pala xwe daye terîş e
Paşil tije êmîş e, paşil tije êmîş e
Zarno wernê êrîş e, kurno wernê êrîş e

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Canê canê




Canê canê canê
Kulîlka li mala Xanê
Canê canê canê
Esmerê bêrîvanê

Min b'qurbanê rebenê
Danî derdê qelenê


Canê canê canê
Kulîlka li mala Xanê
Canê canê canê
Esmerê bêrîvanê

Navê lawik nizanim
Navê keçkê Siltanê
Canê canê canê
Kulîlka li mala Xanê
Canê canê canê
Esmerê bêrîvanê

Poz gulê xizim zerê
Kesera ser keserê
Canê canê canê
Kulîlka li mala Xanê
Canê canê canê
Esmerê bêrîvanê

Herêmên Amed, Botan û Behdînan

# Çaroke hewlêriye




Le dûrî toye reşpoşim
Mest û xumar û serxoşim
Be maçit dê feramoşim
Kolwaney bo girê dedem
Çarokey bo girê dedem
Kiçê eger daykit razî bê
Destê le memkit dedem
Le dûrî toye bê h'alim
Mest û xumar û e'bdalim
Hîç gawirê ne bînê h'alim
Çaroke hewlêriye
Kolwane hewlêriye
Ewe deçme ser rêy merê
Boxom deçme ser rêy merê
Yarim şenge bêriye
Delên ewro nobe xêriye
Ew çawanet mîslî bazin
Mest û xumar pir le nazin
Birjangit tîrî serbazin
Çarokekey kolî to

Kolwanekey kolî to
E'trim pêye û bom hênawî
Be diyarî deydem be to
Swêndim xwardiwe û maçî dekem
Nêwan memkolanî to
Leser pirdê girtyan senger
Destê nîzamî xol beser
Lîngyan damê deste û xencer
Çarokekey gazire
Kolwanekey gazire
Nawêrim dû qisey pê bilêm
Daykî le wê h'azire
Tûnde delêy agire
Çawit esterey deryazî
Helyan dênî çen be nazî
Be kûştinim awat xwazî
Ew çawaney helyan dênî
Be kile û derman deyrengênî
Bo lêm zîzî nam diwênî
roj niye mirdûm lê nemrênî

# Çarokê




Leser meh'mud kanî
De ba bêt be tawî çarokê
Befran girt gwêswanî
De ba bêt be tawî çarokê
Kûştimî çawî ciwanî
De ba bêt be tawî çarokê
Çarokê û çarokê
Şilî ke û girêy de desrokê
Yar qewlî pêdawim giyane
Saz bin bo mendokê
Hewran gaze gaze
De ba bêt be tawî çarokê
Dexwênê gelwaze
De ba bêt be tawî çarokê
Yarim xumarî naze
De ba bêt be tawî çarokê
Yar qewlî pê dawim
Behar bê biçîn bo mendokê
Wey leser h'ewzî bokan
De ba bêt be tawî çarokê
Yar lêm deng be baze
De ba bêt be tawî çarokê
Muftelay dû çawî kirdum
De ba bêt be tawî çarokê
Hewran koye koye
De ba bêt be tawî çarokê
Dexwênê heloye
De ba bêt be tawî çarokê
Dil muftelay toye
De ba bêt be tawî çarokê
Çarokê û çarokê
Şilî ke girêy desrokê
Hewran têkyan dexurî
De ba bêt be tawî çarokê
Memkan kirasyan dadirî
De ba bêt be tawî çarokê
Nemirî daykî kurî
De ba bêt be tawî çarokê

# Çarokê




Hewran têkyan xurî de ba bê be tawê çarokê
Memkiyan kirasyan dirî ewe hat be tawê çarokê
Kûştimî daykî kurî de ba bê be tawê çarokê
De ba bê, de ba bê, de ba bê, ewe hat be tawê desrokê
Sibh'ey nîweroye saz be biçîne mendokê

Hewran koye koye de ba bê be tawê desrokê
Dexwênin heloye ewe hat be tawê desrokê
Yarim çaw heloye de ba bê be tawê desrokê
Şilke û tenike û girêy de dena beynî desrokê
Sibh'ey...

Leser meh'mud kanî de ba bê be tawê çarokê
Xencerim derijanê ewe hat be tawê desrokê
Leser çawî ciwanê ewe hat be tawê desrokê
Şilke u...
Sibh'ey...

Hewrî reşî dênê de ba bê be tawê çarokê
Baraney derijênê ewe hat be tawê desrokê
Şilke u...
Sibh'ey...

# Çaw ciwan




Erê deçime ser kanî miradan çaw ciwan
Ax şerî'y xom dekem hay tewawe
Ew sal h'ewt sale mirdim çaw ciwan
Ax bo xunçe gulêkî geşawe
Karwan bêne û ratmûsim çaw ciwan
Ay le şayî û zemawend ad
Ay le kulmey lêw al nîştuwe çaw ciwan
Ay tozî rêgakey şarî

# Çawê lê çawbazan






çawê de çawbazan
lêm degirin rêbazan
demkûjin be nazan
wey wey leber nazî to
demkûjin be nazan
leber çawî ciwanî to

çawê le çaw nerman
pire le kile û derman
helnayen le şerman
wey wey leber nazî to
demkûjin be nazan
leber çawî ciwanî to

reşmaley menguran
le dol û le xiran
qatilin bo kuran
wey wey leber nazî to
qatilin bo kuran
leber çawî ciwanî to

hewirî reşî dênê
baraney derijênê
leser çî namdiwênê wey...
leser çî namdiwênê leber...

be hewiran behare
dexwênin kewbare
yar kolêm lê diyare wey...
yar kolêm lêdiyare leber...

be hewran payize
yarkolim lê zîze
dexwênin azîze wey...
dexwênin azîze leber...

malî de mer daran
royîn bo hewaran
lêman debirin yaran wey...
lêman debirin yaran leber...


malî de mer dostan
bexêr neçine kwêstan
lêman debirin dostan wey...
lêman debirin dostan leber...

dû malin le roxin
kîjyan ciwan û şoxin
memikyan sêw û qoxin wey...
memikyan sêw û qoxin leber...

dû malin beranber
kîjyan reş esmerin
zor ciwan û dulberin wey...
zor ciwan û dulberin leber...

dû malin cîranin
kîjyan xan û manin rêgirî
cêjiwanin
wey...
rêgirî cêjiwanin leber...

# Çeç ho ho




Kavir çêriyan Eledaxê
Berxik çêriyan Eledaxê
Kavirê kur ma bi yataxê
Winda bu dewsa daxê

Çeç ho ho malê min
Serê malê yek kavir,
Du kavir, sê kavir
Win bidne min
Ez gune me.
Ezê xwera bikim mal

Kavirê kel î sîs e
Mîratê kel î sîs e
Hirya wî kir werîs e
Goştê wî bu helîs e

Seredor

Kavirê kel î jar e
Mîratê kel î jar e
Hirya wî kir hevsar e
Postê wî bu eyar e

Seredor

Kavir nîne beran e
Berxik nîne beran e
Hat heyamê kêran e
Goştê wî bu qurban e

Seredor

Herêma Serhedê, çavkanî : Şemdîn

# Çele li ber çelan




Çelê li ber çelan bilind e
Heylo lawê min lawo
Heylo lawê min lawo

Yara min bejin bilind e
Heylo lawê min lawo
Çelê li ber çelan dirêj e
Heylo lawê min lawo

Yara min bejin dirêj e
Heylo lawê min lawo
Temo muxtare ji mêj e
Heylo lawê min lawo

Çelê li ber çelan sor e
Heylo lawê min lawo
Temo muxtarê par e
Heylo lawê min lawo
Yara min bejn dar e
Heylo lawê min lawo

Herêmên Şirnex, Culemerg, çavkanî Seydayê Goyan, 2000

# Celeban




Celeban û celeban
Lê lê dînê dîn a min
Karwan têto ji Helebê
Ser bar şekirê şevê
Celeb celebê bizinan
Bizin berdan kizinan
Çavê min li xewa şîrîn
Destê min ser bazinan
Celeb celebê nêriyan
Nêrî berdan kêriyan
Çavê min li xewa şîrîn
Destê min ser moriyan
Celeb celebê beranan
Beran berdan helanan
Çavê min li xewa şîrîn
Destê min ser mercanan

# Celse






Dek malî babim ayşê
Pajiney kewşî dekewşê
Awî gulan dedêrê
Mandû buwe pencey dêşê
Piştênekey kirawe
Loyekî le dûy dexişê
Dek xecalet bê şemal
Toz le yarim denîşê
Desmal h'erîrî sade
Taw lêy deda û deruşê
Celse karî silêmanî
Beynella zêde ciwanî
Askol deley xermanî
Be milwênê herzanî
Ew derdey emin dekûjê
Jinî guley mêrdanî
Çawî westakey kwêr bê

Solan degûşê panyanî
De were awêzanit bim
Emşew taku beyanî
Be serxoşim mezanin
Be dînim deyperistim
Destim gêra berokî
Memkoley kewte destim
Hawarî kird wey daye
Le pir serpencey gestim
Xizmîne lomem meken
Maxolyay çawî mestim
Celse karî taranê
Ter nabê be baranê
Bakewşeket pîs nebê
Pêt leser çawim danê
Debêne dey maçit kem
Nasikî gware colanê

# Cemedê




Cemedê celîlê lêlavê hey xûnavê
Kûlîlka meş rû avê şil nabe ber vê tavê

Cemeda ber besta ew hinara ber besta (2 caran)
Me şkênand bi herdû destan şkênando bi herdû desta

Ser xatira kember bestan, xatira kember bestan
Cemedê celîlê lêlavê hey xûnavê

Kûlîlka meş rû avê şil nabe ber vê tavê
Cemeda kaniyan ew herama kaniyan

Me şkênando bi pehînan, me şkênando
Ser xatira van zeriyan xatira van zeriyan

# Cemîle giyan




Qurbanî demit bim rû be xal qurbanî zulfit bim çawkal
Qesem dexom sed car bequrban xoşim dewêy be dil û be giyan
Xoşim dewêy ey yarî ciwan
Xoşim dewêy cemîle giyan

Nemdîwe rojêkî şad û xoş jînim her h'esrete û naxoş
Tîrî îşqit şikandî balim boçî nakey reh'mê zalim
Boçî nakey reh'mê zalim

Bê to kar û pîşem giryane bê to beharim zistane
Bîke be xatirî çawî kalit carê were lay bîmarit
Carê were lay bîmarit

Soranî / Gelêrî

# Celîle




Giyanim fîday cemalit be - ey perî şewe cemîle
Yek be dinya toy awatim - beheştî dinyam cemîle
Helaney dil le şewawî - şadî hemu beharim cemîle
Qîblekey îşqim cemîle - xunçey baharim cemîle

Lew rojewe ke tom dîwe - aşiqî çawantim cemîle
Aşiqî xalekey rumetim - aşiqî gonatim cemîle
Gulî baxçey baharî to - nesîmî dem beyanî to
Qîblekey îşqim cemîle - xunçey baharim cemîle

Soranî / Gelerî


# Cemîle




Soranî / Gelêrî

Ew qura'n bitgirê
Hênat lêkit kirdewe
H'ewt car destit pêda da
Bo mizgewtit birdewe
Eminit sergerdan kirduwe
Be henasey serdeswe
Bo xot keyfim bo dekey
Be desmalî zerdewe
Cemîle hey cemeke û cemeke
Cemîle bêne maç kem demeke
Bazî yan şimqarî
Xasekewî yan barî
Kotirî le sîne carî
Leser to ba bimkûjin
Wek kabray le bazarî
Be dînim xoşim dewêy
Çunke bêçuwe to carê
Cemîle, ceme û ceme û cemîle
Reh'mit bê ew dilem bo to zelîle
Bot mirdim berokit bo derzîle
Ey hawar singit befrî qendîle
Çend ciwane qamkit bo engustîle
Bo xom dûrim naygemê
Kes niye welamî demê
Ebroy reşî peywestit
Çî lê bikem kewtûne jêr perçemê
Sebir û hoşyan lê birîwim
Kewtûme beh'rî xemê
Suçî peçeket lade
Mang derkewê le temê
Cemîle bo xom dûrim naygemê
Mal wêran kes niye welamî demê

# Cendirme




De loy lolo de loy lo
De lo gidiyo cendirme
Bes bike gurmegurme
Eba reş e bi surme
Şara serê te bi surme
Bajo were mala me

Cilê cendirme reş e
Cilê sivkê min reş e
Bişkoka sed û şeş e
Cendirme çi keleş e

De loy lolo de loy lo
De lo gidiyo cendirme
Bes bike gurmegurme
Şara serê te bi surme
Bajo were mala me

Cilê cendirme spî ye
Cilê sivkê min spî ye
Bişkoka sed û sî ye
Cendirme ji xwe cindî ye
Çi bi kim lawkê ronî ye

De loy lolo de loy lo
De lo gidiyo cendirme
Bes bike gurmegurme
Şara serê te bi surme
Bajo were mala me

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Cendirme




Çen cendirme cendirme sivkê malê cendirme
Malê barke were cem me çen cendirme cendirne
Malê barke were cem me sivkê malê cendirme
Heqê xanyê te li ser me
Mafê xanyê te li ser me

Cilê cendirme reş in
Cilê cendirme reş in
Pişkokê sed û şeş in
Pişkokê sed û şeş in

Çen cendirme
Malê barke were cem me çen cendirme cendirme
Malê barke were cem me sivkê malê cendirme
Heqê xanyê te li ser me
Mafê xanyê te li ser me

Cilê cendirme sor in
Cilê cendirme sor in
Pişkokê xelqe dor in
Pişkokê xelqe dor in

Çen cendirme cendirme sivkê malê cendirme
Malê barke were cem me çen cendirme cendirme
Malê barke were cem me sivkê malê cendirme
Heqê xanyê te li ser me çen cendirme cendirme
Mafê xanyê te li ser me sivkê malê cendirme

Cilê cendirme şîn e çen cendirme cendirme
Cilê cendirme şîn e sivkê malê cendirme
Pişkokê sed û sîne çen cendirme cendirme
Pişkokê sed û sîne sivkê malê cendirme

Herema Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Ceroy




Ha bi ceroy ceroy ceroy cer malêm cer
Ha bi ceroy ceroy ceroy cer bişkêm cer

Cer ji axa kaniyê malêm cer
Cer ji axa kaniyê bişkêm cer

Hilda milê zeriyê malêm cer
Hilda milê zeriyê bişkêm cer

Şik nekete paniyê malêm cer
Şik nekete paniyê bişkêm cer

Cer ji axa kendalan malêm cer
Cer ji axa kendalan bişkêm cer

Hilda milê delalan malêm cer
Hilda milê delalan bişkêm cer

Şik nekete guharan malêm cer
Şik nekete guharan bişkêm cer

Cer ji axa biyokê malêm cer
Cer ji axa biyokê bişkêm cer

Hilda milê nû bûkê malêm cer
Hilda milê nû bûkê bişkêm cer

Şik nekete neynûkê malêm cer
Şik nekete neynûkê bişkêm cer

Ha bi ceroy ceroy ceroy cer malêm cer
Ha bi ceroy ceroy ceroy cer bişkêm cer

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Cîranê




Herêma Amedê

Cîranê cîranê cîrana min
Hevalê hogirê bermalya min
Ez nexweş bûm ez dimirim
Cîranê cîranê cîrana min
Ez nexweş bûm ez dimirim
Hevalê hogirê bermalya min
Mele hat ez yasîn kirim
Mele hat ez yasîn kirim
Ez dişûştim, kefen kirim
Ez dişûştim, kefen kirim
Li heft daran siwar kirim
Li heft daran siwar kirim
Ber û berê malan birim
Ber û berê malan birim
Li ser qebrê peya kirim
Li ser gorê piya kirim
Ez bi destê qebrê kirim
Ez bi destê gorê kirim
Ezabdar ez sewal kirim
Ezabdar ez sewal kirim

# Ciwabêkim dewe




Teyrê bûm be ser çilî giyane gul fêr bûm
Kwa fêrî germay giyane naw germesêr bûm
Ciwabêkim dewe giyane be bûn û nebûn
Bêçarey kirdûm giyane guzeştey gerdûn
Xuda way kirduwe giyane min zelîlit bim
Mubtelay awengî giyane gonay sûrit bim
Ci...
Bê...
Weku perwane giyane we diway dekewim
Min şêtî kes nîm giyane her şêtî ewim
Ci...
Bê..
Xale xazyan kird giyane pîroze win bûn
Gewher le şaran giyane qîmetya kem bûn
Ci...
Bê..

# Ciwanî






A'şiqan dên û le dûr diyarin û diyarin
Rengyan zerde û lêw be barin û barin
Be derdî dil giriftarin û giriftarin
Meni'yan meken sahîb yarin û yarin
Ciwanî, ciwanî, ciwanî ciwanî, zor ciwanî
Askî şax û karmamzî germiyanî, bokanî
Cûtê saqî gware zêrin û zêrin
Mey le meyxanan degêrin û degêrin
A'şiqan le din werdegêrin
Karmamizî deştî bajêrin û bajêrin
Destey a'şiqan meclîsyan girt û girt
Be a'am nardiyan saqiyan bang kird û bang kird
Saqî mesit bû piyaley pir kird û pir kird
Çawî gêra a'şiqî qir kird û qir kird
A'şiq debê canane bê, canane bê
Cam û pêkî meyxane bê, meyxane bê
A'şiqî çawî efsane bê û efsane bê
Le bo saqî dêwane bê û dêwane bê

# Ciyê govendê




Ciyê govendê ev e
Lo dilo harê dilo
Ciyê govendê ev e
Min çi go te deyn nekir

Rijiya elbek dew e
Lo dilo harê dilo
Rijiya elbek dew e
Min çi go te deyn nekir

Sozê lawik derew e
Lo dilo harê dilo
Zeriya nekir xew e
Mi çi go te deyn nekir

Ciyê govendê Rast e
Lo dilo harê dilo
Ciyê govendê Rast e
Mi çi go te deyn nekir

Rijiya Elbek mast e
Lo dilo harê dilo
Rijiya elbek mast e
Mi çi go te deyn nekir

Berburya bûk dixwaste
Lo dilo harê dilo
Xwendiya buk dixwaste
Mi çi go te deyn nekir

Ciyê govendê gêr e
Lo dilo harê dilo
Ciyê govendê gêr e
Mi çi go te deyn nekir

Dîlanek lê digere
Lo dilo harê dilo
Dîlanek xweş digere
Mi çi go te deyn nekir

Dengbêja kirin şer e
Lo dilo harê dilo
Defçiya kirin şer e
Mi çi go te deyn nekir

Heremên Amed, Botan û Behdînan

# Cizîr e






Cizîr e Cizîr e memanê memanê memanê
Cizîr e Cizîr e tayka reş rihanê
Cizîr warê mîr e memanê memanê memanê
Cizîr warê mîr e tayka reş rihanê
Av kêşa bi zincîre memanê memanê memanê
Av kêşa bi zincîre tayka reş rihanê
Cizîr barek reş e memanê memanê memanê
Cizîr barek reş e tayka reş rihanê
Bişkok bîst û şeş e memanê memanê memanê
Bişkok bîst û şeş e tayka reş rihanê
Cihê dostim xweş e memanê memanê memanê
Cihê dostim xweş e tayka reş rihanê
Cizîr barek spî ye
Bişkok sê rêzî ye
Keyfa dostam niye
Cizîr barek sor e
Bişkok bist û çar e
Cihê dostim jor e

# Cotkaro lo




Bi xizêmê lê lê xwezya xizêm way way
Lo cotkaro lo lo tu cot neke way way
Rê û dirba lo lo xira neke way way
Xelk nifira lo lo li te bike

Lo cotkaro lo lo cot li pal e way way
Tu cot berde lo lo were mal e
Ez ramûsim lo lo kurê xal e

Lo cotkaro lo lo cot li kaş e way way
Tu cot berde lo lo hûr bimeşe way way
Mal heyrana lo lo çavê reş e way way

Lo cotkaro lo lo cot li mesîla way way
Tu ga berde lo lo nav kesîla way way
Ez ramûsim lo lo te bi destmala way way

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Çelî xêrê




Çelî xêrê çelîn e hey
Dawo Sêvdinê min
Dawo Sêvdinê min
Çelî xêrê çelîn e hey
Malo rengînê min
Dawo Sêvdinê min
Şûrê Sêvdîn hişîn e hey
Term kêşan gûnd bû şîn e hey
Çelî xêrê neqev e hey
Şûrê Sevdîn dû dev e hey
Term keşan gûnd bû rev e hey
Çelî xêrê bilind e hey
Deştka çiyê wê di bind e
Term keşan hol a gûnd e

Herêma Behdînan

# Çen ciwanî




Yalla ya sultan hawar, çend ciwanî
Beramber be burhanî, çend ciwanî
Seyd zade boç nemawe, xan û manî
Royîwe le seholanî, çend ciwanî
Ax ax hat be lence, roy be pence, zêr û gence
Perçem xeyate, de were roh'im le late, giyane dil betemate
E'ntîke û zêde lawe, çonî lê bikem silawe
Awirî lemin berdawe, boçî le min torawe
Ew şew ke şew zistane, çend ciwanî
Befran girtî kolane, çend ciwanî

Derdî min bê dermane, çend ciwanî
Key danîşîn dû be dû, çend ciwanî
Gerdinit tifengî birnew, çend ciwanî
Memkit xire wek hulû, çend ciwanî
Esîr û sergerdanim, çend ciwanî
Bedbext û mal wêranim, çend ciwanî
Boçî le min napirsî, çend ciwanî
Kurtê xelkî bokanim, çend ciwanî
Çend ciwan û reş esmerî, çend ciwanî
Çaw baz û biro seqerî, çend ciwanî
Xelkî wilatî pişderî, çend ciwanî
Be derkêy da raburdim, çend ciwanî
Daykî berokî girtim, çend ciwanî
Turan girûy lê girtûm, çend ciwanî
Bo kirasî daydire mirdim, çend ciwanî
Singit baxî şêxane, çend ciwanî
Le nizîk gilolane, çend ciwanî
Çî bikem parêzî berimê, çend ciwanî
Şew dêzî baxewane, çend ciwanî
Birya her nemdîbaye, çend ciwanî
Dîbam nemnasîbaye, çend ciwanî
Nasîm yarî xom baye, çend ciwanî
Sûre gulem be tenyaye, çend ciwanî
Derdit le malim nusret, çend ciwanî
Bo to nemawim î'smet, çend ciwanî
Ciwanî wek mayînî belek, çend ciwanî
Bezeyî pêm da nayet, çend ciwanî
Minim xerîb û bedbext, çend ciwanî
Şîrîne delêy kişmîşe, çend ciwanî
Mal le saru û qamîşe, çend ciwanî
Le bo turanê dekirim, çend ciwanî
Kirasî fermu danîşe, çend ciwanî

# Çil kezî




Çil çil kezî çil kezî
Çil çil kezî tawerzî
Tu li serê ta û derzî
Min go ax te digo xwezî

Çil çil kezî xerîbê
Hêstirka pêşya hîvê
Keremke were şîvê
Rûnê li ser balîvê

Çil çil kezî…

Çil çil kezî hat tarî
Dişxulê heya tarî
Mala bavê xwe dinalî
Te min kire vî halî

Çil çil kezî…


Kezî zerê kezî zer
Min xulama gulyê zer
Sîng spiyê berf li ser
Qewlê ber mala heyder

Çil çil kezî…

Kezî zera farqînî
Tu bi fîstana hêşînî
torê lawik nastînî
Kêfa xelkê li me tînî

Herêma Siliva, çavkanî : Aramê Tigran

# Çîng û çing




Çing û çing çiçring û çing leylikê leylanê
Çing û çing çiçring û çing sing sedefê canê
Kê digo leylo qîz e leylikê leylanê
Kê digo leylo qîz e sing sedefê canê
Filey e tac bi zîz e
Filey e tac bi zîz e

Çing û çing
Çing û çing
Kê digo leylo bûk e
Kê digo leylo bûk e
Filey e tac neynik e
Filey e tac neynik e

Çing û çing
Çing û çing
Kê digo leylo jin e
Kê digo leylo jin e
Filey e tac mezin e
Filey e tac mezin e
Çing û çing çi çring û çing leylikê leylanê
Çing û çing çi çring û çing sing sedefê canê

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Çing û çing




Çing û çing, çing çing û çing, leylikê leylanê
Çing û çing çiçring û çing sing sedefê canê
Li hev ketin qaz û quling, leylikê leylanê
Li hev qelbin rom û firing, evdalê canê

Kerê bêriyê reş e, leylikê leylanê
Dahşê beriyê reş e, evdalê canê
Serbarê wî bi zebeşe leylikê leylanê
Serbarê wî bi zebeşe, evdalê canê

Bûka male keleş e, leylikê leylanê
Bûka male nexweş e, evdalê canê
Çing û çing, çing çing û çing, leylikê leylanê
Çing û çing, çing çing û çing, evdalê canê

Li hev ketin qaz û quling, leylikê leylanê
Li hev qelbin rom û firing, evdalê canê
Kerê bêriyê çûne, leylikê leylanê
Dahşê beriyê çûne, evdalê canê

Serbarê wî bi titûn e, leylikê leylanê
Serbarê wî bi titûn e, evdalê canê
Bûka malê xatûn e, leylikê leylanê
Bûka malê melûn e, evdalê can

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Çoxê mino




Çoxê mino hirya berana
Wey malê mino hirya berana
Dabû ristin destê nezana
Wey malê mino destê nezana
Çoxib teng e negrit milana

Çoxê mino ji biskê bizina
Wey malê mino biskê bizina
Dabû ristin destê mezina
Wey malê mino destê mezina
Çoxib teng e negrit ji bazina
Wey malê mino negrit ji bazina

Çoxê mino mûyê karika
Wey malê mino mûyê karika
Dabû ristin destê keçika
Wey malê mino destê keçika
Çoxib teng e negrit zendika
Wey malê mino negrit zendika

# Çoxo




Hay çoxo çoxo çoxo
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano
Hay çoxo çoxo çoxo
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano

Hay çoxo de bila wabî
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano
Destê min paxla tebî
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano
Da´bi xêra bavê tebî
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano

Çoxê ji hirya berana
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano
Ristibû destê nezana
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano
Çox nagire´di milana
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano

Çox ji mûyê bizina
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano
Ristibû destê du jina
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano
Çox nagire´di bazina
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano

Çox ji mûyî karika
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano
Ristibû destê keçika
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano
Çox nagire´di zendika
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano

Hay çoxo çoxo çoxo
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano
Hay çoxo çoxo çoxo
Dey malê min malê min
De giyanê min çox cano

Herêmên Botan û Behdînan, çavkanî : Şemdîn

# Çûm Cizîrê




Çûm Cizîrê baxçey e gul û rîhan pê ve ye
Min û çavreş hev divê gund û cîrana çi ji me ye
Lawk têtû ji Diyarbekir lawk hatû ji Diyarbekir
Dest û pê bi hine kir bîlah te gotê ya min î
Mîrê hîza hez nekir rêka Şirnex bi dar e
Xeco kir bî hewar e, keçê kir bî hewar e
Keçê kir bî hewar e lawkê wê fîla re
Pîla keçê kire hewar e çonkî lawk fîla re
Rêka Şirnax bi histirî ye keçik lê rûniştiye
Keçik çima giriye, çonkî lawk girtiye

# Çûm Helezo




Herêma Serhdê

Çûm Helezo li benda rezo ne migo kin û kin û kin
Çûm Helezo li benda rezo pay kurmalyo tu dizanî
Îsal heft sal li pey te bi lezo ne migo kin û kin û kin
Îsal heft sal li pey te bi lezo pay kurmalyo tu dizanî
Sala heşta poşman wezo ne migo kin û kin û kin
Sala heşta poşman wezo pay kurmalyo tu dizanî

Çûm Helezo li benda qûmo ne migo kin û kin û kin
Çûm Helezo li benda qûmo pay kurmalyo tu dizanî
Îsal heft sal li pey te diçûmo ne migo kin û kin û kin
Îsal heft sal li pey te diçûmo pay kurmalyo tu dizanî
Sala heşta poşman bûmo ne migo kin û kin û kin
Sala heşta poşman bûmo pay kurmalyo tu dizanî

Çûm Helezo li benda tirî ne migo kin û kin û kin
Çûm Helezo li benda tirî pay kurmalyo tu dizanî
Îsal heft sal li pey te bi girî ne migo kin û kin û kin
Îsal heft sal li pey te bi girî pay kurmalyo tu dizanî
Sala heşta poşman kirî ne migo kin û kin ûkin
Sala heşta poşman kirî pay kurmalyo tu dizanî

# Çûme Mûşê




Çûme Mûşê wê bi dar e, lê wey lê lo wey lo
Hatim Mûşê wê bi dar e, qiz gelîn Mûş wêran
Lê diçêriya berx û kar e, lê wey lê lo wey lo
Lê diçêriya berx û kar e, qiz gelîn Mûş wêran
Zeriyê em qewla deynin, lê wey lê lo wey lo
Li ber deriyê muxtar e, qiz gelîn Mûş wêran

Çûme Mûşê wê bi bî ye, lê wey lê lo wey lo
Hatim Mûşê wê bi bî ye, qiz gelîn ! Mûş wêran
Lê diçêriya berx û mî ye, lê wey lê lo wey lo
Lê diçêriya berx û mî ye, qiz gelîn Mûş wêran
Zeriyê em qewla deynin, lê wey lê lo wey lo
Li ber deriyê Elî ye, qiz gelîn Mûş wêran

Çûme Mûşê wê bi gez e, lê wey lê lo wey lo
Hatim Mûşê wê bi gez e, qiz gelîn ! Mûş wêran
Lê diçêriya berx û pez e, lê wey lê lo wey lo
Lê diçêriya berx û pez e, qiz gelîn Mûş wêran
Zeriyê em qewla deynin, lê wey lê lo wey lo
Li ber deriyê Çerkez e, qiz gelîn Mûş wêran

Herêm Amedê

# Dara li bav dara




Dara li nav dara lê
Şewitya nav dara way
Kekê min zava ye lê
Aqûbe li hevala way

Biya li nav biya lê
Şewitya nav biya way
Kekê min zava ye lê
Aqûbet li hemiya

Geza li nav geza lê
Şewitya nav geza way
Kekê min zava ye lê
Aqûbet li çerkeza way

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Dayê mîro vana




Dayê mîro vona Dayê bego vona
Dayê hewaro derdê mi girona

Dayê mîro hoşî Dayê bego hoşî
Dayê mîro hoşî Dayê bego hoşî
Dayê monga borbiyar ma xur bidoşî
Dayê monga borbiyar ma xur bidoşî
Dayê qalê kênan dayê çiqa weşî
Dayê qalê kênan dayê çiqa weşî
Dayê mîro vona Dayê bego vona
Dayê hewaro derdê mi girona

Dayê pirdê pali Day pirdu berzo
Dayê pirdê pali Day pirdu berzo
Dayê ma sera şin Wa pird bi lerzo
Dayê ma sera şin Wa pird bi lerzo
Dayê kêna rinda Day paşna berzo
Dayê kêna rinda Day paşna berzo
Dayê mîro vona Dayê bego vona
Dayê hewaro derdê mi girona

Dayê ezo mîrê Xwe ma gavanî
Dayê ezo begê Xwe ma gavanî
Dayê ma gavonî Gon golikanî
Dayê ma gavonî Gon golikanî
Dayê şomê min û Mîr mi di nonî
Dayê şomê min û Mîr mi di nonî
Dayê mîro vona Dayê bego vona
Dayê hewaro derdê mi girona

# Dayê nastînim




Welle te nagirim, bille te nastînim
Wele te nagirim lo bille te nastînim
Derdê hewiyê welle nakişînim
Dayê ez nagirim bavo nastînim
Derdê hewiyê welle nakişînim

Jinê wî diduye cavê wî birçiye
Li malê pevçûye wele nastînim
Dayê nastînim lo, bavo nastînm
Welle te nastînim, bille te nastînim
Derdê hewiyê welle nakişînim

Jinê wî care bi dost û yare
Wele nastînim, bîle nastînim
Derdê hewiyê nakişînim
Wele te nastînim, bille nastînim

Herêma Amedê, çavkanî: Ayş e Şan

# Daynê






Bo lay kê biçim des we zamewe
Kê dermanim ka şew be lamewe
Daynê to daynê çonî deyzanî
Gozekey helgirt esmer bo kanî
Xozgem be goze deynête ser şan
Legel esmer giyan debin des le milan
Ya (heywan salî) mal be berzewe
Bedkarman bimrê be dem lerzewe
Êwarê tegbîr sibh'eynê bare
Payze û hewarim nizîk be yare
Ela'nle kwêstan debarê baran
Deyda le gonay nasik û nazdaran
Daynê to daynê herçon deyzanî
Gozekey helgirt be niyazî kanî
Beyn û beynella to zêde ciwanî
A'lem deyzanê le guley nebanî

# Dê biçin Mûsilê

Moderato




Dê biçîn Mûsilê
Şerefan Şerefan
Dê biçîn Mûsilê
Zendê zend kehreban
Musilê di berme de
Wa bi kûr û ken de
Dosta min rind e
Dê biçîn Musilê
Musilê ber malan
Wa bi kaş û kalan
Dosta min delal e
Dê biçîn Mûsilê
Musilê ber biye
Wa bi kaş û çiya
Dostam zêrî ye
Dê biçîn Mûsilê
Mûsilê ber ber e
Dostam esmer e

Herêmên Botan û Behdînan, çavkanî : Seydayê Goyan

# De biçîn zozanan

**Moderato**




De biçîn zozanan hey hey zozanek xweş e
Xemla zozanan hey hey gul û binefş in
Lawîn hey lawan hey hey simbêlên reş in
De biçîn zozanan hey hey de biçîn zozan
De biçîn zozanan hey hey zozanên sar e
Xemla zozanan hey hey tûs û kêvar e
Lawîn lawan hey lê simbêlên sor e
De biçîn zozanan hey hey zozanên hîn e
Xemla zozanan hey hey mêrg û kanî ne
Lawîn hey lawan hey hey tîle û lewendî ne
De  biçîn zozanan hey hey zozan befrîn e
Lawîn hey lawan hey hey gul sosinî ne
Lawîn lawane hey hey bejnêk şîrîn e
Xemla zozanan hey hey gulên eslî ne
Lawîn lawan hey hey bejin şîrîn e

# Dê bidin me bûka me




Em nadin, em nadin
Em bûkiga xwe nadin
Xezêmşora xwe nadin
Gerdenkêla xwe nadin

Pî/êxirxala xwe nadin

Bejnbilinda xwe nadin
Guhguhara xwe nadin
Biskbitêla xwe nadin
Enîstêra xwe nadin

Heta neynin bazino bazino
Bazino wê haziro
Ji dûh û heta pêro
Me bazin hazir kiro

Bes hêceta li me bigiro
Malkê me ji hev dûro
Wê li ber çemê Xabûro
Berf hate kulîlk hûro

Baranê deşt reşandin
Berfigan ser hingavtin
Berbûyan xwe xemilandin
Defvanan def dirandin

Şûrkêşan şûr hejandin
Hey dê bidin me bûka me
Em nadin, em nadin
Em bûkiga xwe nadin
Xezêmşora xwe nadin
Gerdenkêla xwe nadin

Pî/êxirxala xwe nadin

Bejnbilinda xwe nadin
Guhguhara xwe nadin
Biskbitêla xwe nadin
Enîstêra xwe nadin
Heta neynin gûstîlo

Herêma Culemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# De bila bêto robaro




Hêy hêy hey robaro robaro
De bila bêto de bila bê
De bila bêto robaro
Hêy, hêy ser kanî avên sare

Hêy, hêy min têr av jê vexware
Hêy, hêy ew robarê hîzêw o
Hêy, hêy ser kanî ji bin xîzêw o
Hêy, hêy ew robarê Sinehtê

Hêy, hêy ser kanî j'binî tehtê
Hêy, hêy me silave ser vê bextê
Hêy, hêy ew robarê Keşanê
Hêy, hêy serkanî j'bin şîlanê

Hêy, hêy me silave l'Eyşê canê
Hêy hêy hêy robaro robaro
De bila bêto de bila bê
De bila bêto robaro

Hêy, hêy bû celal û cobare
Hêy, hêy xişhabû weka mare

Herêma Culemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# De derxin




De derxin de derxin de bûka me derxin
De derxin de derxin delalya me derxin
Berf û baran bev ra tê de bûka me derxin
Berf û baran bev ra tê delalya me derxin
Ji bo xatrê sibatê de bûka me derxin
Ji bo xatrê sibatê delalya me derxin
Herçî bikene zer e
Herçî bikene zer e
Çav birjê bîbik der e
Çav birjê bîbik der e delalya me derxin

Herêma Amedê

# De gidî mala min




De gidî de gidî mala min
Hey la gidiyê mala min
Xan esmer şêrîna min
Zeriya mala bavê min
Edlê rabe sibe ye
Teq û reqa derge ye
Hey der bû der bû der bû
Karwanê Edlê der bû
Hêstira pêşî qemer bû
Taca Edla min ser bû
Edlê rabe sibe ye
Şîrinê rabe sibe ye
Teq û reqa derge ye
Çaxî nimêja te ye
Heger bikî feyde ye
Heger nekî gune ye
Hey borî borî borî
Karwanê edlê borî

Borî çû taxa jorî
Karwanê edlê borî

Hêstira pêşî qemer bû
Taca cana min ser bû

Herêmên Serhed û Botan, çavkanî : Seydayê Goyan

# De gidî nar




De gidî nar
De gidî nar û narikê

Navê nara min gul e
Kember zer e ser dil e

Tal û bextê narê bû
De gidî nar û narikê

Vê narê tevnek danî
Dar tevnî ji ber hilanî

Tal û bextê narê bû
De gidî nar û narikê

Navê dostan lê danî
De gidî nar û narikê

Navê nara min Fatê
Kember zer e dû qat e

Tal ü bextê narê bû
De gidî nar û narikê

Vê narê tevnek risto
Dar tevnî ji ber guhisto

Tal ü bextê narê bû
De gidî nar û narikê

Navê dostan lê xwesto
De gidî nar û narikê

Navê nara min Sîs e
Kember zer e teyis e

Vê narê tevnek çêkir
Dar tevnî serde rêkir

Tal û bextê narê bû
De gidî nar û narikê

Navê dostan lê çêkir
De gidî nar û narikê

Navê nara min Xec e
Kember zêrê derec e

Tal û bextê narê bû
De gidî nar û narikê

Heremên Serhed û Botan, çavkanî : Seydayê Goyan

# De gulê hey nabe




De Gulê hey nabe bê nabe nabe
Gulê hey nabe bê nabe nabe

Tew Gulê dil ketî bê çare nabe
Gulê dil ketî bê çare nabe

Tew Gulê rab huba bi dila nabe
Gulê rab huba bi dila nabe

Tew Gulê wê ji halê min çawa be
Dînê wê ji halê min çawa be

Tew Gulê dengê min li dinê bela be
Gulê dengê min li dinê bela be

Gulê mala komirciya xera be
Dînê mala komirciya xera be

Tew Gulê wez hatim te bibînim
Dînê wez hatim te bibînim

Gulê bibînim birevînim
Gulê bibînim birevînim

# De kina min kina min




De kina min kina min lê ber xanî karanê lo
De kina min kina min lê zerya dermana min lo

Ferheng e ferheng e lê ber xanî karanê lo
Ferheng e ferheng e lê de kinanî cananê lo

Lorkê koco deng denî ber xanî karanê lo
Lorkê koco deng denî de kinanî cananê lo

Kina min lewend e lê ber xanî karanê lo
Kina min lewend e lê de kinanî cananê lo

De kina min kina min lê zerya ber mala min lo
De kina min kina min lê zerya ber mala min lo

Êlmun e êlmun e lê de kinanî cananê lo
Êlmun e êlmun e lê ber xanî karanê lo

Kina min xatûn e lê de kina min cananê lo
Kina min xatûn e lê ber xanî karanê lo

Elyax e elyax e lê de kina min cananê lo
Elyax e elyax e lê ber xanî karanê lo

Nursengê pelax e lê de kina min cananê lo
Nursengê pelax e lê ber xanî karane lo

Kina min qozax e lê de kina min cananê lo
Kina min qozax e lê ber xanî karanê lo

# De lê lê Wanê




De lê lê lê lê Wanê
Bi hesreta Yerîvanê
Bi hesreta Yerîvanê
Gihiştî tû û dermanê

De lê lê lê lê Nazê
Karwan rabû ji Sewasê
Bi hesreta Alagazê
Xewa şêrîn te tu razê

De lê lê lê lê Wanê
Bi hesreta Araratê
Ew çiyayên Araratê
Berfa me sa li ne barê

De lê lê lê lê metê
Şahî ket nava miletê
Weka em herin dawetê
Xilas bibin ji nebetê

Radyoya Êrîvanê, 1975, çavkanî: Aramê Tigran

# De megrî megrî




Desre be lenger şede be lenger
Be roje roje bawanim salit birde ser
De megrî megrî megre behane
Nardûme bot bê bawanim hewrî le bane
Nardûme bot bê hewrî le bane

Desre be lenger şede be lenger
Baweşênt kem bawanim be rêh´aney ter
De megrî megrî, giryan girane
Her çend to degrî bawanim, malim wêrane
Her çend to degrî malim wêrane

Soranî / Gelerî

# De megrî megrî




Eto be giryan wa be dax u kul
Emin lêm h´eram rengî bax u gul
De megrî megrî, de megrî megrî
Çawit ciwane
H´eyfe bo çawî to ew giryane

Hatuço meke lew ber heywane
Bew hatuçûnet malim wêrane
Nalem le çînî zulfî xawî to
Serim esîrî nazî çawî to
De megrî megrî, de megrî megrî
Ey çawkalim
Bo degrî hey ro hawar be malim

Hatuço meke lew ber heywane
Bew hatuçûnet malim wêrane
De megrî megrî, de megrî megrî
Ey çawkalim
Bo degrî hey ro hawar be malim

Eto be giryan wa be dax u kul
Emin lêm h´eram rengî bax u gul
De megrî megrî, de megrî megrî
Çawanit dêşê
Kê bê kê bitwanê nazit bikêşê

# De megrî megrî






Xanim Naz Naka Mat U Melûle
Ne Çawî Riştuwe Ne Gonay Sûre
Wey De Megrî Megrî, Çaweket Ciwane
Herçî To Degrî, Malim Wêrane

Ew Çawe Ciwane Bê Sûrme Mes(T)E
Tu Xwa Pêm Bilê Xwênî Çend Kese
Wey...
Her...

Namem Binêrin Azîzim Bo Koşkî Yarim
Derdim Girane Min Derdedarim
Wey...
Her...

Dîdem Be Qurban Azîzim Xembarî Tome
Şewgar Her Degrîm Ciwanê Bê Darî Tome
Wey...
Her...

# De siwaro




Zeviya li pêş gunda şîn e hey lawo
Zeviya li pêş gunda şîn e hey pismamo

Me lê çandî beybûn e hey lawo
Me lê çandî beybûn e pismamo

Dosta lawê lawkê şêrîn e hey lawo
Dostan lawkê şêrîn e pismamo

De siwaro hey lê lê hey lo lo, hey lê lê
Nêçira Memê Alan, gawir negrîn halê te

Nêçira Memê Alan
Du kewan gawir negrîn halê te

Zeviya li pêş gundê sor e hey lawo
Zeviya li pêş gundê sor e pismamo

Me lê çandî gindor e, hey lawo
Me lê çandî gindor e, hey pismamo

Dosta lawkê pispor e hey lawo
Dosta lawkê pispor e pismamo

Zeviya li pêş gunda reş e hey lawo
Zeviya li pêş gunda reş e pismamo

Me lê çandî zeveş e hey lawo
Me lê çandî zeveş e pismamo

Dosta lawkê keleş e hey lawo
Dosta lawkê keleş e pismamo

Heremên Botan û Behdînan


# De werin gula biçînin




Dê werin gula biçînin he Gulê he Gulê Gula min
Dê werin gula biçinin şengê şoxê mala min
Dê zerî avê bînin he Gulê he Gulê he Gula min
Dê zerî avê bînin şengê şoxê mala min
Ava li gula bireşînin he Gulê he Gulê he Gula min
Ava li gula bireşînin şengê şoxê mala min
Zeriya navê dosta min he Gulê he Gulê he Gula min
Zeriya navê dosta min şengê şoxê mala min
Gula me çenda spî ye he Gulê he Gulê he Gula min
Gula me çenda spî ye şengê şoxê mala min

Ho yeman... Ho yeman ezê li serê çiyakê bilind û jorî...
Ho yeman.. îro min xezalek dît şeva vê şevê direj bû
Piştî xizêm şûrê îro navtenga xezala kovî kîkî Elî Bega dilê min helînî kir
ó xweşî û lezet li xwe heram kir dilê min bo sotî ye
Gula me çenda spî ye he Gulê he Gulê he Gula min
Gula me çenda spî ye şengê şoxê mala min

# De yoyo




De yo yo de yo yo yo yo melûlê bûkê
De yo yo de yo yo yo yo nazyê zarûkê
Me li wiyalî avê lê darê tihoka
Te li wiyalî avê lê darê tihoka
Berbûrî hatin lê xêlî li ser çoka

De yo
De yo
Me li wiyalî avê lê darê bihîva
Te li wiyalî avê lê darê bıhîva
Berbûrî hatin lê xênî kirîva

De yo
De yo
Me li wiyalî avê kelek danîne
Te li wiyalî avê kelek danîne
Berbûrî hatin lê xêlî nanîne

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Debarê baran




Ewa min derom ser wesyetit bê
Dilekey minit le kine azîzekem amanetit bê
Baran baran baran barane baran debarê
Le çî degeray azîzekem le gulî beharê
Kewte mabeyinman h'ewt kêw û h'ewt ko
Meger bay reh'met azîzekem min bênêbo to
Bran baran baran baran nim nim termî kird
Î'şqî çaw ciwan û nazenînekem le dîn dermî kird
Daykit xecalet bawkit rusiyah
Etoyan lêm kird e'zîzekem bo malî dunya
Baran baran baran baran baran dabarê
Le çî degeray azîzekem le gulî beharê
Kulî dilekem dê wek baranê
Min lêre mawim azîzekem yar le taranê
Baran baran baran baran baran termî kird
Î'şqî çaw ciwan û nazenînekem le dîn dermî kird

# Deçime ser Naleşkêne




Soranî / Gelêrî

Deçime ser Naleşkênê beramber be Bokanê
Ey wey beramber be Bokanê
Yarî min her necîbe, barîke û neşmîlanê
Mirdim kurtêy xal dane danê
Deçime ser Naleşkênê beramber Mehmudawa
Ey wey beramber be Mîrawa
Yarî min her kejale, çawî kale
Sûre guley baxî Sawe
Deçime ser Naleşkênê beramber be Miyandwawê
Ey wey beramber be miyandwawê
E'şiqî balay lêw al bûm, çî lê bikem kulimey gulî sêlawê
Ey wey dinyam bê wî min nawê
Deçime ser Naleşkênê beramber be Sablaxî
Ey wey beramber Xatûn Baxî
Yarî min her Kejale, çawî kale
Boçî le min buwe yaxî? Ey wey
Deçime ser Naleşkênê beramber be E'lyabad
Ey wey beramber malî E'lyabad
A'şiqî çawî kejalim, şîrîne, be wêney nebat
Meh'tel bûm bo çî nehat...?
Deçime ser Naleşkênê beramber malî şêx ler
Ey wey beramber min be şêxler
E'şiqî balay necîbim, necîbim, Qed barîkey reşesmer
Hawar Qed barîkey reşesmer
Deçime ser Naleşkênê beramber be germênê
A'şiqî çawî lêw alim xuda le minî nestênê
Yarî min her lêw ale bo min sed milyon dênê

# Deçme Rewandiz




Deçime rewandiz xom heldedêrim
Dengim naygatê kaxez denêrim

Be gulan û be gulan be gulî beroje
Le bîrim naçê maçî ew roje

Deçime...

Be gulan û be gulan be gulî şilêrê
Le bîrim naçê maçekey pêrê

Deçime...

Be gulan û be gulan be gulî hêroyê
Ew yarem denê derim ken le koyê

Deçime...

Soranî / Gelêrî

# Delalê yare wezo




Delalê yar wezo wez naçime guniya
Delalê yar wezo wez naçime guniya

Delalê yar wezo wez naçime darika
Delalê yar wezo wez naçime darika

Çi kul e çi derd e daye dilê jinika
Çi kul e çi derd e daye dilê jinika

Delalê yar wezo wez naçime qirşika
Delalê yar wezo wez naçime qirşika

Pir geriyam pir geriyam min nanî qirşika
Pir geriyam pir geriyam min nanî qirşika

Çi kul e çi derd e daye dilê keçika
Çi kul e çi derd e daye dilê keçika

Delalê yar wezo wez naçime darika
Delalê yar wezo wez naçime darika

Herêma Serhedê

# Delalê yar Weso




Herêma Serhedê

Delalê yar weso, wez naçime guniya
Delalê yar weso, wez naçime guniya

Banadim şe nakim, ha ez cotê guliya
Banadim şe nakim, ha ez cotê keziya

Çi kul e çi derd e daye dilê zeriya
Çi kul e çi derd e daye dilê zeriya

Delalê yar weso, wez naçime qirşika
Delalê yar weso, wez naçime qirşika

Lê nadim dernaxim, reqe reqê şimika
Lê nadim dernaxim, reqe reqê şimika

Çi kul e çi derd e daye dilê keçika
Çi kul e çi derd e daye dilê keçika

Delalê yar weso, wez naçime beyara
Delalê yar weso, wez naçime beyara

Hilnagirim ranakim, ha ez piştiyê dara
Hilnagirim ranakim, ha ez piştiyê dara

Çi kul e çi derd e daye dilê van yara
Çi kul e çi derd e daye dilê van yara

Delalê yar weso, wez naçime guniya
Delalê yar weso, wez naçime guniya

# Delal e




Delal e ha delal e wele ew kî delal e
Delal e ha delal e bîle ew kî delal e
Kirasê wî sipî e qilçik erdê dimale
Oda bavê keko da cota kewê xezal e
Gava me bûkê derxist ew kı ji kerban dinale

Cindiye ha cindiye wele ew kî cindî ye
Cindiye ha cindiye bîle ew kî cindî ye
Kirasê wî sipiye qilçikê erebi ye
Oda bavê keko da cota kewa xwendiye
Gava me bûkê derxist ew kî ji kerban miriye

Delal e ha delal e wele ew kî delal e
Delal e ha delale bile ew kî delal e

Herêma Amedê

# Delal e




Delal e ha delal e pa çi zavakî delal e
Delal e ha delal e pa çi zavakî delal e

Kirasê wî şemet e, lê qilçikê wî helal e
Kirasê wî şemet e, lê qilçikê wî helal e

Dîwana bavê Emer de weke karki xezal e
Dîwana bavê Emer de weke karki xezal e

Cindî ye ha cindî ye pa çi zavakî cindî ye
Cindî ye ha cindî ye pa çi zavakî cindî ye

Kirasê wî şemet e, lê qilçikê erebî ye
Kirasê wî şemet e, lê qilçikê erebî ye

Dîwana bavê Emer de weka kewkî xwendî ye
Dîwana bavê Emer de weka kewkî xwendî ye

Herêma Serhedê

# Delîl yarê





Delîl yarê yarê delîl yeman
Wemê sibê li kû bin delîl yarê yarê
Emê sibê li kû bin delîl yarê yeman
Li mala bavê bûkê bin
Li mala bavê bûkê bin
Emê li nava hewşê bin
Emê li nava hewşê bin
Emê li benda bûkê bin
Wemê li benda bûkê bin

Delîl yarê yarê delîl yeman
Wemê sibê li kû bin delîl yarê yarê
Emê sibê li kû bin delîl yarê yeman
Li mala bavê zavê bin
Li mala bavê zavê bin
Wemê li quncê odê bin
Emê li quncê odê bin
Li hêvya çay û qehwê bin delîl yarê yarê
Li hêvya çay û qehwê bin delîl yarê yeman
Delîl yarê yarê delîl yarê yeman

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Delîlo wey lo




Delîlo weylo, delîlo wey lo
Ser eskero onbaşiyo
Baş nefero tembûrçiyo
Qeymeqamo mifirdiyo

Te bejin şitla spindarê
Delîlo weylo delîlo weylo
Min divê cana xwe ramûsim
Delîlo weylo, delîlo wey lo
Berê lawik dan Berwarê

Min dît ser tayka hêjirê
Te bejin têla tembûrê
Min divê dosta xwe ramûsim
Berê lawik dan Cizîrê

Min dît ser tayka filfilê
Te bejin şitla sorgulê
Min divê dosta xwe ramûsim
Berê lawik dan  Dêrgulê

Min dît ser tayka benûkê
Te bejin şitla bihokê
Min divê zerya xwe ramûsim
Berê lawik dan Dihokê

# Deloy zava




Herema Amedê

De loy lo loy lo loy lo loy zava
Hene li desta kilê li dora çava
Ew mîrê Boşatê de loy lo loy lo loy lo loy zava
Ew begê Boşatê hene li ser desta kilê li dora çava
Ew ke kêm zava ye
Ew ke kêm zava ye
Werin vê civatê
Werin vê civatê

De loy lo loy lo loy lo loy zava
Hene li desta kilê li dora çava

Ew mîrê xinûsê
Ew begê Xinûsê
Ew ke kêm zava ye
Ew ke kêm zava ye
Xwedyê vê namûsê de loy lo loy lo loy lo loy zava
Xwedyê vê namûsê hene li desta kilê li dora çava

# Dem kul




Dem kul dem bêne dem biçkolane
Bêne maçitkem xal dane dane

Ew maley heme nezrî xuda bê
Be şert koçeket berew diwa bê


Dem kul dem bêne...

Eger giyan kêşan wek dûrî to bê
Ya xwa be nisîb gewrey serko bê

Dem kul dem bêne...

Soranî / Gelerî

# Dema me




Dema me çeper çêkirin
Saeta me çeper çêkirin

Şeşxanan zeytê werkirin
Xeberê sulhê rêkirin

Dema me çeper nijnîne
Saeta çeper nijnîne

Şeşxanan zeytê werbûne
Xeberê sulhê rêbûne

Dema me çeper guhêstin
Saeta me çeper guhêstin

Şeşxanan zeytê rêjandin
Xeberê sulhê hinartin

Herêma Behdînan

# Demaxim wezne




Demaxim wezne ay haware emşew çî şewe
seday zîl û bem ay haware bezmî xusrewe

Be maç û dû maç ay haware lêt nabim razî
ta leser sînet ay haware neykem desbazî

Demaxim...

Be maç û dû maç ay haware hîçit lê naye
wa bizane nan bu ay haware dat we gedaye

Demaxim...

# Deng dê le şîlanekey




Derdit le malim kalê
keziyet bendî reşmalê
Sê gez be gezî Kurdî
basikim le gerdinit alê
To biro babit razî ke
daykit bo min hîç nalê
Pêm e'yibe û pêm îrade
bot bikem male û malê
Erê deng dê le şîlanekey
Ba biçîne gwêyî banekey
Bangkeyin le jine ciwanekey
Bêtewe le naw ranekey
Daxizê bo heywanekey
Maç keyin kulme ciwanekey
Ba kwêr bê cîranekey
Çawit estêrey şewê
Kulmit denûkî kewê
Baskim bo bike be serîn
Be cût xewman lêbikewê
Le min û le gulekey mêrdit

Kammanit zor xoş dewê?
Erê deng dê...
Hênde min dua' ekem
Le gulî pîsî bêçare
Delêy le estoy daye
Nuştey şêxî Biyare
De were destim desto ke
Derd û dermanim zare
Awirit le min berdawe
Memkit wêney henare
Çibikem hîç taqet nagirim
Dilekem bot bêqerare
Rebî Raniye awa bê
Awekey sard û suke
A'şiqî Nesrîn çaw ciwanim
Her delêy taze bûke
Qîmet giran û wezin suke
Wek eşrefî biçûke
Taze yarêkim girtuwe
Kejal mal le Kerkûke

Soranî / Gelerî

# Deng nakim





Deng nakim ha deng nakim delalyê malê deng nakim
Deng nakim ha deng nakim şevgêryê şevê ranakim
Razaye şiyar nakim delalyê malê deng nakim
Misînê avê li desta kim delalyê malê deng nakim
Misînê avê li desta kim şevgerya şevê ranakim

Sasûn e gelî kûr e delalyê malê deng nakim
Sasûn e gelî kûr e şevgeryê şeve ranakim
Tivinga lawkêm berhûr e delalyê malê denk nakim
Tivinga lawkêm berhûr e şevgerya şeve ranakim

Sasûn e gelî teng e delalyê malê deng nakim
Sasûn e gelî teng e şevgêrya şevê ranakim
Tivinga lawkêm heftdeng e delalyê malê deng nakim
Tivinga lawkêm heftdeng e şevgerya şevê ranakim

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Deng nakim




Deng nakim ha deng nakim bê bavê wele ez deng nakim
Deng nakim ha deng nakim bê kokê wele ez deng nakim
Xanyê ewkî ji gund rakim bê bavê wele ez deng nakim
Xanyê ewkî ji gund rakim bê kokê wele ez deng nakim

Her çar alî bi şibak kim bê bavê wele ez deng nakim
Her çar alî bi şibak kim bê kokê wele ez deng nakim
Têda keko bi zava kim bê bavê wele ez deng nakim
Têda bira bi zava kim bê kokê wele ez deng nakim

Deng nakim ha deng nakim bê bavê wele ez deng nakim
Deng nakim ha deng nakim bê kokê wele ez deng nakim
Helînin ha helînin bê bavê wele ez deng nakim
Helînin ha helînin bê kokê wele ez deng nakim

Xanyê ewkî helînin bê bavê wele ez deng nakim
Xanyê ewkî helînin bê kokê wele ez deng nakim
Her çar alî bi kulîn in bê bavê wele ez deng nakim
Her çar alî bi kulîn in bê kokê wele ez deng nakim
Têda bûkê bixemlînin bê bavê wele ez deng nakim
Ji keko ra bişînin bê kokê wele ez deng nakim

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Der kaniyokê nefele




Der kaniyokê nefel e
Leyla Leyla leylanê
Derkaniyokê nefel e
Dayikê korê nemayê
Nefel e çarde pel e
Dayikê korê nemayê
Nefel e çarde pel e

Mexelê pezê kel e
Dayikê korê nemayê
Mexelê pezê kel e

Der kaniyokê kuncî ye
Dayikê korê nemayê
Der kaniyokê kuncî ye

Mexelê pezê spî ye
Dayikê korê nemayê
Mexelê pezê spî ye

Der kanikê zeveş e
Dayikê korê nemayê
Der kanikê zeveş e

Zeveş e dêndik reş e
Dayikê korê nemayê
Zeveş e dêndik reş e

Cihkê dosta min xweş e
Dayikê korê nemayê
Cihkê dosta min xweş e

# Dêra hozê




Ez naçim Dêra Hozê
Ez naçim Dêra Hozê

Hesin siwarê bozê
Me şere'l Dêra Qoçê

Hey Dêra Hozê eywan ê
Xopana dêrê eywan e

Dû şêrên navê li xwe dane
Êk Pewliêse êk Yewnan e

Pewlêsê 'd bêje wer nakim
Yewnanê'd bêje wer nakim

Dergehê dêrê venakim
Hacîbeyran bênav nakim

Dêra Hozê hez hezî
Dû şêrên tê de qelîzî

Dêra Hozê wê kelişti
Dû şêrên tê de runiştî

Pewlês û Yewnan ê kuştî
Pewlês û Yewnan ê kuştî

Pewlêsê tê de fetisî
Yewnanê'l xwinê gevizî

# Dêre sorê biçûkê




Dêre sorê biçûkê lêlê lêlê lelê lêlê lêlê
Dêre sorê biçûkê
Dest bi hine neynûkê
Par qîz bû îsal bûkê lêlê lêlê lêlê
Par qîz bû îsal bûkê
Berxê sebra mala minê wey lêlê

Dêre sorê mezinê lêlê lêlê lêlê lêlê lêlê
Dêre sorê mezinê
Dest bi hinne bazinê
Par qîz bû îsal jinê lêlê lêlê lêlê
Par qîz bû îsal jinê
Berxê sebra mala minê

Hindî were paytext e lêlê lêlê lêlê lêlê lêlê
Hindî were paytext e
Îznê bide bêm rext e
Dema bi soz û bext e lêlê lêlê lêlê
Dema bi soz û bext e
Berxê sebra mala minê

Dêre sorê biçûkê lêlê lêlê lêlê lêlê lêlê
Dêre sorê biçûkê
Dest bi hinne neynûkê
Par qîz bû îsal bûkê lêlê lêlê lêlê
Par qîz bû îsal bûkê
Berxê sebra mala minê

Radyoya Êrîvanê

# Derdî hîcran




Dil nexoşî derdî hîcre canî cananim were, ay canî cananim were
Let lete cerg u henawim mahî tabanim were ay mahî tabanim were
Î´lletî derd u şefakem wa be lêwî şekerit, ay wa be lêwî şekerit
Mayey jîn u h´eyat u derd u dermanim were, ay derd u dermanim were

Rojî cejne u çawekanit mewsimî azadiye, ay mewsimî azadiye
Bo bala gerdanî balat qoçî qurbanim were, ay qoçî qurbanim were
Ger bizanî çend peşêwe h´alekem bo ditinit, ay h´alekem bo dîtinit
Sed ewendey zulfekanit dil perêşanim were, ay dil perêşanim were

***Soranî/Seyid Alî Esxerî Kurdistanî***

Soranî , çavkanî : Seyid Elî Esxerî Kurdistanî

# Derdit le min






Bew Xudayey bê mekane
Xerîbim lêrekane
Ew dilem beh'rî xemane
Lêw alê le Bokane
De were destim de esto bike
Be dizî û be mehremane
Derdit le min Reş Esmer
Bot mirdim nasike dulber
Le ser balay lêw alê
Le dinya bûm der be der
Bazî baregay banê
We h'idudî Şarwêranê
Mirdim ew mekrey danê
Ba kewşeket pîs nebê
Pêt le ser çawim danê
Bo to nemawim Amînê
Qîtêy gware colanê
Be Xuday taq û tenyaye
Bejinit darî bîzaye

Nemirî le rûy dunyaye
Boç bezeyît pêm da naye?
Xerîb û sergerdanim
Bêkesim lew Bexdaye
Derdit le min Reş Esmer
Bot mirdim nasike dulber
Le ser balay lêw alê
Le dinya bûm der be der
Wa birînim dîwa û dîwe
Swêsney baxî h'ewşîwe
Le dwênêwe nemdîwe
De kiçê destemilanit bim
Befirew be bay barîwe
E'qilî le la birîwim
Kûştimî ew kiçe hetîwe
Derdit le min Reş Esmer
Bot mirdim nasike dulber
Le ser balay lêw alê
Le dinya bûm der be der
Dermanî h'ewt derdanî
Webalim be esto ciwanî
Birncî Reşt û Gêlanî
Karxaney Hemedanî
Sertopî Kurdistanî
Birnoy şanî Kurdanî
De were deste milanit bim
Be şew rawê dezanî
Derdit le min Reş Esmer
Bot mirdim nasike dulber
Le ser balay lêw alê
Le dinya bûm derbeder

# Derê mala me av e




Derê mala me av e zeriyê zeriyê
Hewşa mala me av e domamê min xulamê

Cot siyara daye nav e zeriyê zeriyê
Cot siyara daye nav e domamê min xulamê

Derê mala me aş e zeriyê zeriyê
Hewşa mala me aş e domamê min xulamê

Kurkê zeriyê kumaş e zeriyê zeriyê
Kurkê zeriyê kumaş e domamê min xulamê

# Dêre sorê




Dêre sorê biçûkê lêlê lêlê lelê lêlê lêlê
Dêre sorê biçûkê dest bi hinne neynûke
Par qizbû îsal bûkê lêlê lêlê lêlê
Par qîzbû îsal bûkê berxê sebra mala minê wey lêlê

Dêre sorê mezinê lêlê lêlê lêlê lêlê lêlê
Dêre sorê mezinê dest bi hinne bazine
par qîzbû îsal jinê lêlê lêlê lêlê
Par qîzbû îsal jinê berxê sebra mala minê

Hindî were paytext e lêlê lêlê lêlê lêlê lêlê
Hindî were paytext e îznê bide bêm rexte
Dema bi soz û bext e lêlê lêlê lêlê
Dema bi soz û bext e berxê sebra mala minê

Dêre sorê biçûkê lêlê lêlê lêlê lêlê lêlê
Dêre sorê biçûkê dest bi hinne neynûke
Par qîzbû îsal bûkê lêlê lêlê lêlê
Par qîzbû îsal bûkê berxê sebra mala minê

Radyoya Êrîvane

# Derjê




Hey derjêw derijêw derjê derijêw konabêtewe

Le derdî bê dermanî kewtûme sergerdanî
her toy aramî giyanî çîbkem cergim birawe

Hey derjêw...

Derdêkî way dawmetê kafir halim nebînê
le xwa dekem telebê le gelim aşt bêtewe

Hey derjêw...

# Derketo stêrka geş e




Derketo stêrka geş e
Lo lo lo lo lo lo
Derketo stêrka geş e
Heyrano li min lawiko

Aşiqê keça keş e
Lo lo lo lo lo lo
Aşiqê keça keş e
Heyrano li min lawiko
Keç û kur pê kêfxweş e

Du kurikan çilo birî
Gustîlok ji tiliyan firî
Çu sukê êk dî(n) kirî
Te girto û ramuso

Herêmên Serhed û Botan, çavkanî : Seydayê Goyan

# Derkeve derkeve




Derkeve derkeve lo derkeve derkeve
Derkeve derkeve lo dîna min derkeve

Heta ku dinya hebe lo heta dinya hebe
Heta ku dinya hebe lo yanga dilê min hebe

Pozkê wê bı xizêm e lo pozkê wê xizêm e
Pozkê wê bı xizêm e lo yeman şerek ev e

Lo bi dîne lo bi dîne lo lo bi dîne lo dîne
Lo bi dîne lo bi dîne lo kawam yeke dîn e

Ser govendê girtiye lo ser govendê girtiye
Ser govendÊ girtiye lo çepıla dihejîne


Kurik heya der tê lo gede heya der tê
Kurik heya der tê lo here ji xwera bîne

Lo bi dîne lo bi dîne lo lo bi dîne lo dîne
Lo bi dîne lo bi dîne lo kawam yeke dîn e

Ketiye ser govendê lo ketiye ser govendê
Ketiye ser govendê lo çepla dihejîne

# Derwaw becêmdêlê

**Moderato**






Be twê areq çin ey hawar namhêlê
Ser û perçemî derwa becêm dêlê
Delêy şazadey ey hawar neyhêştim
Rom û e'cemî royî be cêy hêştim
Her koç koçit bû ey hawar namhêlî
Koçit kird be rast roy be cêm dêlê
Kem hîmmetit kird ey hawar ney hêştim
Malawat nexwast ey hawar ney hêştim
Le şiney dare bî ey hawar nam hêlê
Le mezey qore derwa be cêm dêlê
Xuda helnegirê ey hawar namhêlê
Ew zulme zore derwa becêm dêlê
Qelay merîwan ey hawar ney hêştim
Palim da pêwe royî be cêy hêştim
qelakem rûxa ey hawar namhêlê
Pal dem be kwê we royî becêm dêlê
Hey dad hey bêdad ey hawar neyhêştim
Lew gewre şare royî be cêy hêştim
Ne dengî yar dê hawar nam hêlê
Ne bo xoy diyare derwa becêm dêlê
Malêk barî kird ea hawar nam hêlê
Kes neygêrawe royî becêm dêlê
Bo xom danîştim ey hawar neyhêştim
Dilxoşîm dawe royî be cêy hêştim

# Desmal h'erîr




Desmal h'erîrî dûber
Mêrdit kird xolim we ser
Eger h'ez dekey nemrim
To bimşêle nasike dulber
Leser balay toye giyanim
Emcarîş bûm derbeder
Ay laçin oy laçin, yarekem bê min
Bîbînim
Min nexoş û birîndarim, ew sarêj
deka birînim
Desmal h'erîrî sade
Dînit birdûm ba bade
Eger h'ez dekey nemrim
Were bimşêle necîb zade
Ne e'ybe ne îrade
Detbînim dilim şade
Ay laçin...
Min...
Desmal h'erîrî sûre
Qedî deley bilûre
Qise deka be zarî
Her deley saz û semtûre
A'şqî qed û balay bûm
Belekî deley tûre

Desmal h'erîrî şîne
Xoy şîrîne deley hengwîne
Biram bîllahî waye
To le çawî min bîbîne
Awirî le cergî min berda
Singî befrî h'ewşîne
Ay laçin giyan laçin, yarekem wa
dê dembînê
Ey cergekem zamdare ba sarêj
bika birînê
Desmal h'erîrî keske
Raperî deley aske
Daway dû maçim lê kird
Helat em baske û baske
Daway dû maçim lê kird
Her weku kotir dehasike
Ay laçin way laçin, yarim dît wa
Radebûrê
Her kes bêtu bîbînê beşik xuda
Deybûrê
Kîjoley kurdistanî
Nask û şîrîn zibanî
Delêm awirit tê berdam
Dermanî h'ewt derdanî

Awirit le min berdawe
Sertopî şarwêranî
Ay laçin...
Min...
To kîjole ciwanekem
Yare xan û manekem
Wêranit kird malekem
Neruxênî heywanekem
Ay laçin...
Min...
To kîjoley necîbî
Bo roh'î min h'ebîbî
Were derdim derman ke
To bo min wek tebîbî
Ay laçin...
Min...
Kîjolêkî le şarî
Sîslî daney henarî
Dermanî pakbîmarî
Beynella mezedarî
Yarim le mekteb hatewe
Kuşqî sewze xeyarî
Awirî le min berdawe
Bo derdî min tîmarî
Kîjolêkî le ladê
Memkit wêney zerdebê
Be qurbanî toy dekem
Serpakî mulkî lacê
Be qurbanî balat bê
Serpak şarî mîredê
Ay laçin...
Min...

# Desmal h'erîrî sûre






Desmal h'erîrî sûre ey hawar
Qedî delêy bilûre
Hîç roh'mim pê naka giyan û giyan
Kefire û le xwa dûre
Qise deka be zarî
Delêy saz û semtûre
Ey aman, yar emane, gul emane, axirî zemane
Desmal h'erîrî abî ey hawar
E'mr û çawekem rabî
De biro babanit şêwê şore jin
Zûm zanî bo min nabî
Ey aman, ...

Çawit estêrey şewê ey hawar
Kulmit dendûkî kewê
Baskim bo bike be serîn
Ba be cût xewman lê bikewê
Desmal h'erîrî sade ey hawar
Ne e'ybe û ne îrade
Bimkûje bew şert ciwanê
Rûbendit bo min lade
Ey aman, ...

Leser pirdê girtyan senger
Destê nîzamî xol be ser
Lingyan damê deste û xencer
Bo to nemam reş esmer
Ey aman, ...

Sing befirî kelî xane ey hawar
Yarim delêy ceyrane
Nexoşim bo lêw alê
Delêy xermanî gulane
Ey aman, ...

Befrî be bay barîwî
Wek sûre gul xemlîwî
Le dwênewe nem dîwî
Çaw ciwan dam hetîwî
Ey aman, ...

# Destmalê




Destmalê destmalê
Heyla li min destmalê
Destmalê destmalê
Zeriyê çav xezalê

Destmala kur sor e
Heyla li min destmalê
Destmala kur sor e
Zeriyê çav xezalê

Bişkok bist û çar e
Heyla li min destmalê
Bişkok bist û çar e
Zeriyê çav xezalê

Cihkê destê li jor e
Heyla li min destmalê
Cihkê destê li jor e
Zeriyê çav xezalê

Destmala kur reş e
Heyla li min destmalê
Destmala kur reş e
Zeriyê çav xezalê

Bişkok bist û şeş e
Heyla li min destmalê
Bişkok bist û şeş e
Zeriyê çav xezalê

Cihkê dosta'm xweş e
Heyla li min destmalê
Cihkê dosta'm xweş e
Zeriyê çav xezalê

Destmala kur spi ye
Heyla li min destmalê
Destmala kur spi ye
Zeriyê çav xezalê

Cihkê dosta'm xweş e
Heyla li min destmalê
Cihkê dosta'm xweş e
Zeriyê çav xezalê

Bişkok sê rêzî ye
Heyla li min destmalê
Bişkok sê rêzî ye
Zeriyê çav xezalê

Cihkê dosta'm lê ye
Heyla li min destmalê
Cihkê dostam lê ye
Zeriyê çav xezalê

Radyoya Êrîvanê

# Deşta Muşê




Deşta Muşa me bi daro
Delalyê û lê lê lê lê bi emo
Deşta Muşa me bi daro
Tû canê min emrê min bi qûrbana te

Lê diçêrya Berx û karo
Delalyê û lê Delalyê lê lê lê bi emo
Le diçêriya Berx û karo
Tû canê min emrê min bi qûrbana te

Esker kişyan kozmêyo
Delalyê û lê Delalyê û lê lê lê bi emo
Esker kişyan kozmêyo
Tu rihê min emrê min bi qurbana te

Top kişyan li ser topêyo
Delalyê û lê Delalyê û lê lê lê bi emo
Top kişyan li ser topêyo
Tu rihê min emrê min bi qurbana te

Bû gurmina boriyêyo
Delalyê û lê Delalyê û lê lê lê bi emo
Gurmin ket boriyêyo
Tu dilê min emrê min bi qurbana te

Kuç nema li ser kuçêyo
Delalyê û lê Delalyê û lê lê lê bi emo
Kuç nema li ser kuçêyo
Tu dilê min emrê min bi qurbana te

Emmo sitêrka sibêyo
Deialyê û lê Delalyê û lê lê lê bi emo
Sitêrka serê sibêyo
Tu dilê min emrê min bi qurbana te

Herêma Amedê

# Destmala min




Destmala min şolkê reş e
Quba xorta tê dimeşe
Destmala min şolkê reş e
Kewa gozel tê dimeşe
Kul birînêm çavê reş e bi ezîzem
Ka destmalê me ne li malê
Xewra naçe çavê reş e bi ezîzem
Ka destmalê me ne li malê

Destmala min eşax man de
Ne min par mal nîşan da te
Destmala min eşax man de
Ne min par mal nîşan da te
Ezîzo were min birevîne bi şerînem
Ezê bivime kevaniya te
Şerîno were min birevîne bi ezîzem
Ezê bivime bermalya te

Destmala min şolkê şîn e
Lawko were min birevîne
Destmala min şolkê şîn e
Ezîzo were min birevîne
Tu destmalê ji min ra bîne bi ezîzem
Felek çarê min bibîne
Tu destmalê ji min ra bîne bi ezîzem
Felek çarê min bibîne

Destmala min egerez e
Bejn û bala min edlez e
Destmala min egerez e
Bejn û bala min edlez e
Lawko were min birevîne bi ezîzem
Tu destmalê ji min nexwaze
Ezîzo were min birevîne bi şerînem
Tu destmalê ji min nexwaze

Herema Serhedê

# Dev zer




Herêma Amedê

Dev zer dev zer dev zerê
Dev zer dev zer dev zerê
Dev zer dev zer dev zerê
Keç qolana kenberê

Dev zer mi digo hîv wa ye
Dev zer dev zer dev zerê
Dev zer mi digo hîv wa ye
Keç qolana kenberê
Ro li ezman xuya ye
Dev zer dev zer dev zerê
Ro li ezman xuya ye
Keç qolana kenberê
Delal bû min nas nekir
Dev zer dev zer dev zerê
Esmer xwîşka kehya ye
Keç qolana kenberê
Dev zer dev zer dev zerê
Dev zer dev zer dev zerê
Dev zer dev zer dev zerê
Keç qolana kenberê

Dev zer mi digo hîv zîz e
Dev zer dev zer dev zerê
Dev zer mi digo hîv zîz e
Keç qolana kenberê
Ro li ezman dilîze
Dev zer dev zer dev zerê
Ro li ezmana dilîze
Keç qolana kenberê
Delal bû min nas nekir
Dev zer dev zer dev zerê
Esmer xwîşka ezîz e
Keç qolana kenberê
Dev zer dev zer dev zerê
Dev zer dev zer dev zerê
Dev zer dev zer dev zerê
Keç qolana kenberê

Awa hat û awa çû
Dev zer dev zer dev zerê
Awa hat û awa çû
Keç qolana kenberê
Suwar hat û peya çû
Dev zer dev zer dev zerê
Suwar hat û peya çû
Keç qolana kenberê
Delal bû min nas nekir
Dev zer dev zer dev zerê
Aqlê serêm pêra çû
Keç qolana kenberê
Dev zer dev zer dev zerê
Dev zer dev zer dev zerê
Dev zer dev zer dev zerê
Keç qolana kenberê

# Dêwane bûm min




Çawî ciwane û pirçî direje
Em şew cejwan serew leje
Bo xot kûştûtim, bimneje
Dewane bûm, dewane bûm,
min bou yare dewane bûm
Ew şemu' û min perwane bûm
Çî bû? Le pir begane bûm!
Qûrbanit bim ey baywade
Çarşew le ser yarim lade
Her le weney mangî çarde
Dewane bûm, dewane bûm
Herwa derwa deley pore

Gwarey altûn le gwey şore
Tu Xwa ciwane dil megore
Dewane bûm, dewane bûm
Qûrbanit bim bay şemalî
Bet û em hewre ramalî
Weder kewe xet û xalî
Dewane bûm, dewane bûm
Herwa derwa şîlan şîlan
Bo xoy yeke û dostî çilan
Be qameken be kiçe tîwan
Dewane bûm, dewane bûm
Dewane bûm, dewane bûm

Soranî / Gelerî

# Deyhênim






Deyhênim ew nazenîne deyhênim
Deyhênim ew belek çawe deyhênim

Qurbanit bim ey bay şewê deyhênim
Xew bê le çawim nakewê deyhênim

Deyhênim...

Ew çawaney helyan dênî deyhênim
Be kil û derman deyrazênî deyhênim

Deyhênim...

Çawit estêrey pênc û dû deyhênim
Misilmanim memke be cû deyhênim

Deyhênim...

# Di baxan




Di baxan dîlberên sorgul
Weke bilbil dikim meylê
Seher giha dinalim ez
Eman leylê eman leylê

Li ser textê êvîndara
Sitêm girtin ji dildara
Cegerxwîn bûm ji derda ra
Felek haylê felek haylê

Tu Leyla ez wekî Mecnûn
Sîtem girtin li min gerdûn
Xemê dil Dîcle û Ceyhûn
Felek heylê felek heylê

Eman leylê eman leylê
Felek heylê felek heylê

Bi nîşanê wek şêran î
Li te pîroz û şeyhan î
Te carek lê nekir qeylê
Felek heylê felek heylê

Helbest : Cegerxwîn, çavkanî : Mihemed Şêxo

# De Bi Lûr Lûr Teşiyê




De bi lûr, lûr lûr teşiyê
De bi lûr lûr lûr teşiyê

Teşiya min ji dara biyê
Lê dirêsim heriya miyê
Îşev çûbûm govendê
Ketim milê berbûyê

De bi lûr lûr lûr teşiyê
De bi lûr lûr lûr teşiyê

Teşiya min ji dara darê
Lê dirêsim heriya karê
Ez gewrê birevînim
Gune li hustiyê cinarê

De bi lûr lûr lûr teşiyê
De bi lûr lûr lûr teşiyê

Teşiya min ji dara merxê
Lê dirêsim heriya berxê
Îşev çûbûm govendê
Ketim milê çavreşê

De bi lûr lûr lûr teşiyê
De bi lûr lûr lûr teşiyê

***Serhed/Gelêrî***

Herêma Serhedê

# Dîdem Zara




Giryan le hewir fêr bûm pêkenîn le wenewşe
Têkçûn legel yarê aşitbûnewey xoşe
Car care dîdem zara, bem êware şedey lare, girûy lê girtûm zara
Delê legelit nayem, bom nekirî gul û gware

Leser balay leylaye bûm be pendî dinyaye
Mirdim be giryan û zarî şew û rojim xew naye
Zulfit reşe rêh'ane sîngit karigî kemaye
Xo minîş weku mecnunî nemawim bo leylaye

Xizmîne lomem meken tazem girtuwe ew yare
Le bejnê barîk ciwane gul û gware û qetare
Xemî dinyaye le min û lew diley bêçare bare
Car care...

Feslêkî zor dilgîre nêwan mangî beharan
Kwêstan derazênewe xêl heldekişin bo binaran
Du şit hêcgar zor xoşin bo sêbûrî dildaran
Gerelawijêy şewane helperînî êwaran
Car care...

...

Nêwan mangî beharan wextî xêl berew jûran
Le harey aw heldêrî kwêstanî ser sinûran
Wirşey bazine û pawane xirmey gware û bermuran
Qaqay kîje î'latyan le nêw gulale sûran
Car care...

...

E'mir û çawekem yare zêrî hejde e'yare
Gelî dost û biraderan tegbîr biken lew kare
Babî zîndanî kirduwe dewrey sîmî xardare
Nawêrê bête jiwanê kost û qerewil diyare
Car care...

...

# Dîlberam Dîlber




Dîlberam dîlber hezkiryê te me
Wan avên te yê re dildarê te me
Wez ne xwerîb im pismamê te me
Ne dûr im nêz im cîranê te me
Bibêjî nebêjî mêvanê te me

Dîlberam dîlber ji kaniyê tê
Bîna gul û rihana tev jê tê
Çavêm pêket dilê min ketê
Dîlberam dîlber hezkiryê te me
Bibêjî nebêjî mêvanê te me

Dîlberam dîlber diçû ser avê
Kinc-minca şuştê raxist ber tavê
Ramûsanek bo xêra dê bavê
Ne dûr im nêz im cîranê te me
Bibêjî nebêjî mêvanê te me

Çavkanî : Aramê Tigran, radyoya Êrîvanê

# Dilê te fire ye




Dilê te fire ye çav esmanê rûber
Dora min ronahî dide şev û roj her der
Hêla canê te jî lorî dibêjî
Tu derdê te hem bîr tînî tu dirêjî

Şîrê te helal zelal e can bike ser
Min ji wan kaniya teva xwariye ser û ser
Şevên te bûne roj rojên te bûne şev
Te şîrê zindî daye min nola cewala

Ez paşila ter da gewre mezin bûme
Av li gema gihîşte me li roja me
Ez jî nolî giştika me dest û dev û mil
Qaya min kemalê te emir didim

Herêmên Amed, Botan û Behdînan

# Dilekey wergirtim




Soranî / Gelêrî

Çon xuda heldegirê xerqim key le xem
Meylim bideye yan zor û yan kem
Ey çaw baz û ebro kewan
Kiçê ruh'mî xêrit bê çaw ciwan
Ey bo to mirdim, pênezan
Awirit tê berdam, fatim giyan
Dilekey wergirtim wazî lê hênam
Nemzanî çî bû? Cergî derhênam
Ey e'ntîke û toy belek çaw
Roh'mî xêrit bê zulif xaw
Awirit tê berdam kes nemaw
Bo to nemawim kiçî xoşnaw
Dilekey wergirtim...

Nemzanî...
Ey çaw baz û ebro kewan
Singeket befrî kelî xan
Min bo to mirdûm sergerdan
Kûştumit be çiley zistan
Ew maley heme ba biçê be talan
Balay tom dewê dem leser xalan
Ey yalla ya sultan hawar, dê derwanête burhanî
Giyan agadarî yarim bî wey kak eh'med le sileymanî
Dilekey wergirtim bo xoy lê da roy
Pirsî pê nekirdim, deroy ya naroy

# Dilêm birin eskerê




Dilêm birin eskerê ho yeman
Dilêm kirin leşkerê can û can
Qumandanê Romiya lê ax eman
Ev çawişên contirkan can û can
Çi wext bigre teskere ho mala min
Çi wext bigre teskere lê zerya min
Ji eskerya romiya lê mala min
Ji leşkerya contirka lê cana min

Destê min ji dilêm kirin lê ho yeman
Destê min ji malam kirin lê can û can
Jar û birîndar kirin lê ho yeman
Jar û perîşan kirin lê can û can
Birin herba Koreyê lê mala min
Birin şerê Koreyê lê zerya min
Nizanim pê çi kirin lê sebra min
Nizanim kû da birin lê mala min

# Dilo menal




Dilo menal xweş buhar e
Quling dikin zar e zar e
Dibên rabin temaşe kin
Kurdistana we birîndar e

Dilo menal bûhar şîn e
Ev dilê me kul birîn e
Hela tu ji felekê pirs ke
Ji kurda ra çi xayîn e

Dilo menal…

Dilo menal xweş havîn e
Quling dike qîr qîrîn e
De hûn li vir temaşe kin
Ji kurda ra çi xayîn e

Dilo menal…

Dilo menal xweş buhar e
Quling dikin zare zar e
Dibên rabin temaşe kin
Kurdistana we birîndar e

Çavkanî : Aramê Tîgran, radyoya Êrîvanê

# Dimdim (Xanî Dimdim)




Hey Dimdim e hey Dimdim e
Hawar e li Xanî Dimdim e

Xanî Kurdan xweş hakim e
Hawar e li Xanî Dimdim e

Dimdim anî li ber kolanê
Heftsed paleyê ber danê

Dimdim berekî berk kevir
Yê'd çinê kuling û tevir

Beran bibire b'elmas e
Ber simtin lê kir risas e

Dê bidim te zêrê xas e
Dimdim ani'l ber xelas e

Hey Dimdim e hey Dimdim e
Top û tifingan hûrme û gûrm e

Heftsed top çûnê b'dirûstî
Berek ji bereki neghûstî

Hey Dimdim e hey Dimdim e
Hawar e li xanî Dimdim e

Herema Omeriya, çavkanî : Hiseynê dengbej

# Dîn delal




Ax lo delal lo delal lawko dîno dîn delal
Ax lo delal lo delall kurko dîno dîn delal

Çûme newala bidar lawko dîno dîn delal
Hatme newala bidar kurko dîno dîn delal
Kewa gozel kirye xwar lawko dîno dîn delal
Kewa gozel kirye xwar kurko dîno dîn delal
Sing û berê wê kewê lawko dîno dîn delal
Sing û berê wê kewê kurko dîno dîn delal
Wekî şekirkî zelal lawko dîno dîn delal
Wekî şekirkî zelal kurko dîno dîn delal

Ax lo delal lo delal lawko dîno dîn delal
Ax lo delal lo delal kurko dîno dîn delal

Çûme newala bigez lawko dîno dîn delal
Hatme newala bidar kurko dîno dîn delal
Kewa gozel tê bilez lawko dîno dîn delal
Kewa gozel tê bilez kurko dîno dîn delal
Sing û berê wê kewê lawko dîno dîn delal
Sing û berê wê kewê kurko dîno dîn delal
Wekî şekirkî çerez lawko dîno dîn delal
Wekî şekirkî çerez kurko dîno dîn delal

• Herêma Amed û Serhedê, çavkanî : Şemdîn

# Dînê can




Herêma Amedê

Dînê dînê lê dînê can
Dînê dînê lê lawê can

Wez bim dînê tu bî can
Dînê dînê lê lawê can

Dîna me ne remoşî
Dînê dînê lê lawê can

Te serî bi şehrê poşî
Dînê dînê lê lawê can

Zer memika nafroşî
Dînê dînê lê lawê can

Dîna me ne sîpekî
Dînê dînê lê dînê can

Te li guharê gupekî
Dînê dînê lê dînê can

Te li kofî barê gakî
Dînê dînê lê lawê can

Xemil barê peyakî
Dînê dînê lê dînê can

Tu ji min ra malê nakî
Dînê dînê lê lawê can

Dînê dînê lê dînê can
Ez bim dînê tu bî can

# Dînê mero dînê




Qesem be dû çawî mestit, dînê mero dînê
Be cûtê ebroy peywestit, dînê...
Debime bazin le bo destit, xalekey amînê
Qesem be dû çawî ciwanit, dînê...
Be dû biroy mîslî kewanit, dînê...
Xom debime qoçî qurbanit, beh leber amînê
Qesem be zulf û perçemit, dînê...
Xalî ciwanî dewirî demit, dînê...
Min debim be şerîkî xemit, beh leber amînê
Qesem be balay lawlawit, dinê...
Be egrîcey têk alawit, xalekey nesrînê
Leber xelkî naylêm nawit, beh leber amînê
Tu bî tu endamî naskit, dîne...
Nîwe nîgay mîslî askit, xelekey amînê
Le estomî bialêne baskit, dîne...

Soranî / Gelêrî

# Diyarbekir




Herêma Amedê

Diyarbekir bi nav e loy loy mala min
Xorta lê kir silav e loy loy emrê min
Ez û yarê meşiyan loy loy mala min
Hûr hûr hatî xunav e loy loy emrê min

Li eywanê xew kirî loy loy mala min
Xelkê yara te birî loy loy emrê min
Ji xwewarê ranabî loy loy mala min
Xwelî li serê te kirî loy loy emrê min

Deryê Ruhayê bilind e loy loy mala min
Çi yarek xweş û rind e loy loy emrê min
Xelk û alem zewicî loy loy mala min
Yê min pepûk û kund e loy loy emrê min

Berçem berçem diçûme loy loy mala min
Rastî yara xwe bûme loy loy emrê min
Dema destê xwe da min loy loy mala min
Yar kenî ez şa bûme loy loy emrê min

# Dolavê




Herêma Amedê

Dolavê ji dar bênavê
Wez birçî me li ber dolabê
Jin bavê kafir bavê
Wez birçîme li ber dolavê

Zik birçî çav westiya
Wez birçîme li ber dolavê
Goşt heliya li ser hestiya
Wez birçîme li ber dolavê

# Don don




Don don don don don don don
Don don don Dondir Xan
Lawik şivan û şivan
Kurik şivanê berxan
Keçik bûbû bêrîvan
Binya dêrê cotkirî
Serya dêrê cotkirî
Min taştêka wî birî
Misas di min werkirî
Çokê min helhel kirî
Pê de rûnişt û girî
Ji berê çêtir kirî
Dondir Xan gay belek e
Serê dûvê xelek e

# Dondir Xan




Don Dondir Xan, Dondir Xan
Don Dondir Xan, Bedirxan
Don Dondir Xan, Dondir Xan
Qizilqurt û tetirxan

Gayê dondo belek e
Gayê seyo belek e
Serê qemçê bi xelek e
Boçiko êw-êw meke
Pişîkê naw-naw meke
Lê Eyşo derî veke
Derî bi qefl û mifteke
Min carek di paşka xwe ke

Don Dondir Xan, Dondir Xan
Don Dondir Xan, Bedirxan
Don Dondir Xan, Dondir Xan

Mila dêrê bi cotkirî
Wê xopanê bi cotkirî
Min kutek jê ra birî
Misas di min werkirî
Çima min hel hel kirî
Rûnişt û pê da girî

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Dotmam




Dotmam heyva geş e
Hey dotmam hey dotmam
Dotmam heyva geş e
Dotmam tu pismam ez
Derket ji ewrên reş e
Şerqê dabû erş e

Dotmam heyvek nû ye
Derket ji ewrên spî ye
Şerqê da gelî ye
Pismam pê keyfî ye

Dotmam heyvek can e
Derketî ji ezman e
Şerqê da geliyan e
Kula pismaman e

Dotmam heyvek sîs e
Derket ji ewrên nû ye
Şerqê daye dinê ye
Pismam her pê şa ye

Radyoya Erîvanê

# Dû be dû




Nexoş û derdedarim
Derdekem tûlaniye
Deçim bo lay yarî xom
Erê şore jin giyane rû be xal
Qed h'ekîmî wa niye
Dû be dû way dû be dû
Awir le cergim ber bû
Erê bêne maçit kem
Erxe rû be xal
Qelit le dilanim derçû
Nexoş û derde darim
Bo balat bê qerarim
Ruh'mî xerit bê lêw al
Erê şore jin giyane rû be xal
Reng zerd û lêw be barim
Nexoş û derde darim
Cerg û dilim sûtawe
ruh'mî xerit bê lêw al
Giyane rû be xal
Hêz le ejnom birawe

Soranî / Gelêrî

# Du ser le ser






Narinc û lîmo giyane gelfîsalêkin
Şehên û şehla zor ciwanin kîjî malêkin
Dû ser leser serînê, naskoley nazenînê
Wek min dîm kes neybînê
Kafir h'alim nebînê
Ella ya reb neybînê

Heta meylit bû şehla giyan, be meylim kirdî
Heta meylit bû ciwanê, be meylim kirdî
Ela'n bê meylî de biro, wam zanî mirdî
Du ser leser yek serîn
Nasik û nerim û xwên şîrîn
Zeh'mete be bêt bijîm

Erê le dûrî balat, wey wey wey bûm perewaze
Xembarit kirdim nazê, zor bê endaze
Beqat pê nakem de biro, jin bê mecaze
Dû ser leser yek balinc
Ba bikeyin texte û çadirêk
Leser çawî memik qinc
Wey leser balay memik xir

# Du sîwarên têno




Dû siwarên hey têno hey têno
Hey xana mêran

Dû siwarên hey têno hey têno
Hey şilxa mêran

Her hatin xeber gotin
Hey xana mêran

Her hatin xeber gotin
Hey şilxa mêran

Çar bûk in çil berbû ne
Hey xana mêran

Çar bêk in çil berbû ne
Hey şilxa mêran

Çil mêrok dawetî ne
Hey xana mêran

Çil mêrok dawetî ne
Hey şilxa mêran

Reniyok darenî ne
Hey xana mêran

Reniyok darenî ne
Hey şilxa mêran

# Dua'






Sûtandûte giyanî min bisûtêne ah û naley min
Heta key min bikêşim dûrî heta key min bikêşim nazit
Dua' dekem şew û roj emin bisûtêne ah û naley min

Bê to cergim hemû sûtawe bê to xwardin û xewim xwênawe
Eger rojê le cêy ferhad bim eger rojê şêtî seh'ra bim

Dua' dekem...

Eger rojê bidey e'zabim eger rojê le to cuda bim
Eger rojê naumêdim key eger rojê feramoşim key

Dua' dekem...

# Dugmet daxe




Soranî / Gelêrî

Qurbanit bim ey bay wade
Rûbend leser yarim lade
Be bînînî dilim şade
Dugmet daxe, dugmet daxe, dugmet
Kes nebînê xalî nêwan memkeket
Qurbanit bim ey bay şewê
Xew bê le çawim nakewê
Dil mecnune û leylî dewê
Ya reb helkey bay şemalî
Bîdey le desre û desmalî
Ba derkewê wirde xalî
Xaiq helkey bay mukiryan
Xunçe gul bê be bay ziryan
Cerg û dilim bû be biryan

# Dulberê çawmest






Giyane xurey awî şew dengî bilwêrê
Nazî yarî be wefa katî şew bêrê
Min le î'şqî to kizim, çaw reşey kar mamizim
Ax bilbilî sermest, bêne kulmet helmijim
Min le hîcrî to dijim, ax dulberey çaw mest

Xirmey puleke û ax mêxek û gwaran
Şewgerî şewdawet û yan hewherî swaran
Min le î'şqî to ...

Giyane bezmî bilbil û ax bazî kwêstanê
Qaspe qaspî xasekew yan dengî h'eyranê
Min le î'şqî to...

Xoşe yarî be wefa bête ser dînit
Ta demirî sakin debê ax cergî xwênînit
Min le î'şqî to...

Giyane mestî î'şqî tom şêt û şeydatim
Boçî torawî lêm ax taqe awatim
Min le î'şqî to...

# Ê welle maşallah




Ê wele
Top kêşa hola gund e
Hey maşallah
Top kêşa hola gund e
Halay halay biçinê
Dad û medat biçinê
Misriyan sor kir ji xwînê
Mirin çêtir e ji mayînê
Zarokê ber dikanê
Barkir ji barê ripiyan e
Cawekê bidin sindiyan e
De biçin nav goyan e
Dê ji(bo) xwe (bi)bim rîpyan e
Goyî dibêjin (w)em nakin
Vê tacê qebul nakin
Dînê xwe niqsan nakin
Hato Hesamê dîne
Tu goyan vecivîne
Xweyê şurê hişîn e
Îngilîz sor xaîn e
Kehnî(kanî) gûzê bin gûzê

Kîsikê Misto belgûz e
Kuşt hakimê Îngilîz e
Kehnî guze bûn ber e
Misto çêkir çeper e
Hakim rê û rê hat ser e
Mêlak lê kir du ker e
Dê werin û bibînin
Avgê gulan cemînin
Dinya sot û vemirînin
Halay halay hawar e
Şekir axa qumandar e
Hespê şînboz siwar e
Şekir û Lezgîn cot in
Şerînin melkemot in
Wan xeberê xwe gotin...

Heremên Botan û Behdînan

# Ê wele





Ê wele ê wele ê wele maşela
Ê wele ê wele sedeq bîle maşela
Mi ew kî nû zava dî
Mi ew kî nû paşa dî
Mi Sidîq nû zava dî
Me li hewşa xêrê dî
Me li nava hucrê dî

Ê wele
Ê wele
Sidîqê'm tu tirsyayî
Lê dayê netirsîme
Biçûk im nû zava me
Bi îlmê şerîf ava me
Ji eşqa dil awa me
Ji îlmê şerîf awa me
Ê wele
Ê wele ê wele ê wele maşela
Ê wele ê wele ê sedeq bîle maşela

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Eba ye




Eba ye eba ye lê kinê li te nayê
Eba ye eba ye dîlberê li te nayê
Eba nû çêkirî lê kinê li te nayê
Eba nû çêkirî dîlberê li te nayê
Me li zava kirî
Me li zava kirî
Ewkî şar xera kirî
Ew kî gund xira kirî

Eba ye
Eba ye
Eba nû çêkirî
Eba nû çêkirî
Me li zava kirî
Me li zava kirî
Gulk û surme kirî
Gulk û surme kirî

Eba ye
Eba ye
Ewkî çû bajêro
Zava çû bajêro
Erhel bazar kiro
Erhel bazar kiro
Bûkê begem kiro
Bûkê begem kiro
Eba ye
Eba ye

Herema Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Edlê rabe sibe ye






Lê lê lê lê lê Edlê
Edlê rabe sibe ye
Merûm rabe sibe ye
Şîrqe şîrqe derge ye lo
Neçe li mêja te ye
Lê lê lê lê lê Edlê
Tew lê gidiyê can Edlê

Edlê meşiya sib derî
Merûm meşiya sib derî
Edlê meşiya sib derî wî
Delal meşiya sib derî
Zêr dane ber kemberê
Radimûsim te esmerê
Lê lê lê lê lê Edlê
Tew lê gidiyê can Edlê

Mala Edlê li nav qefî
Mala şengê li nav qefî
Derdê Edla min giran e
Da ser derdê kezebê
Lê lê lê lê lê Edlê
Tew lê gidiyê can Edlê

Edlê meşiya sib derî
Merûm meşiya bi şimikê
Zêr daye ber cênîkê
Radimûsim te keçikê
Lê lê lê lê lê Edlê
Tew lê gidiyê can Edlê

# Elifê




Herê Elîfê lê belê Elîfê
Herê Elîfê lê diran hûrikê
Te sîng spiyê lê ji berfa Kurtikê
Te sîng spiyê lê ji berfa Kurtikê

Herê Elîfê lê belê Elîfê
Herê Elîfê lê dayka delala
Qaskî tu derê lê li hafa siwara
Qaskî tu derê lê li hafa siwara
Mîr hat kaniyê lê beg hat kaniyê
Mîr hat kaniyê lê beg hat kaniyê

Sola min deynin le ez herme pêşiyê
Sola min deynin lê ez herme pêşiyê
Herê dişmano lo belê dişmano
Wele nastînim lo paşî poşmano

Wele nastînim lo mîrê Farqînê
Bîle nastînim lo begê Farqînê
Sed û sî'w sê siwar lo kiriye rehînê
Sed û sî'w sê siwar lo kiriye rehînê
Kekêm zava ye lo birayêm zava ye
Kekêm zava ye lo siwarê mehînê

Herê Elîfê lê belê Elîfê
Te sîng spiyê ji berfa Heskîfê
Herê dişmano lo belê dişmano
Wele nastinim lo paşî poşmano

Wele nastînim lo mîrê Gergerê
Bile nastînim lo begê Gergerê
Sed û sî'w sê siwar kiriye defterê
Sed û sî w'sê siwar kiriye defterê
Kekêm zava ye lo birayêm zava ye
Kekêm zava ye lo xwediyê xencerê

Herê Elîfê lê belê Elîfê
Te sîng spiyê lê ji berfa Heskîfê
Herê dişmano lo belê dişmano
Wele nastînim lo paşî poşmano

Wele nastînim lo mîrê Patnosê
Bile nastînim lo begê Patnosê
Sed û sî'w sê siwar kiriye nifûsê
Sed û si'w sê siwar kiriye nifûsê
Kekem zava ye lo birayêm zava ye
Kekem zava ye lo xwediyê namûsê

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Elwen




Soranî / Gelerî

Elwen hey elwen giyan hey elwen elwen şîteke
Elwen serbiyem le qewim û xalan
Elwen hatiyen we berzî daran
Erê leyil ser biyem le qewim û karan

Hennar hennar hennarî gul hencîrî
Yarî tazey e'rusim îmşew niyet bipoşim
Îmşew şewî xoşiye şewî şeraw noşiye

Hennar hennar hennarî gul dirawî
Yarî tazey e'rusim îmşew niyet bipoşim
Îmşew şewî hersîne şewî we gul resîne

# Eman derdim çareke






çare reş bûm û le rêy xalî reşa bê çare mam
dek çi giyan sextim ke min êsta lew bare mam
eman derdim çareke, sed xozgem be pareke

min legel mecnunî hawrê bûm le rêy şêtî û ewîn
ew geyî be niyaz û min her bê dil û aware mam
eman...

bo hurujmim kewte rê şîrî biro û tîrî mijol
kunk kunî dil dûr le hejmar û cerg sedpare mam
eman...

gul beden emro le gulzara gulê pişkûtu bû
gul depişkwê ten le dem sersamî ew gulzare mam
eman...

# Eman diktor




Sebrî nazdare naz deka
Bo rêbwar kûştin wa deka
Ba pirçî perêşan deka emane eman
Bo a'şiq kûştin wa deka
Eman diktor e'mrim û çawim diktor were derdim çare ke
Be min derdî to ça nabê be dilit çarey ke
Dey dey be dilit çarey ke

Sebirî çû bo nexoşxane
Zorî têdan perêşane
Ey wey wey perêşane
Zulfî wek keziyey periyane
Diyare ney kirduwe be şane
Ey wey wey be şane
Eman diktor...

Sî û mirawî de porin
Be ser beh'randa denorin
Kîjî êstê kemşertin
Yekcar zû qewlan degorin
Eman diktor...

Soranî / Gelerî

# Eman eman Zekiya




Eman eman lê eman
Eman eman lê eman
Eman eman Zekiya eman eman

Herêma Amedê

Ketim dilê min êşiya
Bîhna misk û emberê
Ser memikê korîva
Memik qeymaxa miya eman eman
Eman eman lê Zeko
Tu bi qedrê rebê xweko
Tu dilyê lawik neko
Navê keçik nizanim
Navê kurik Heseyno

Zeko tê di Qamîşlokê
Delal tê di Qamîşlokê
Eynik danî ser çokê
Min dibê Zeko radimîsim
Van bajara Zaxokê


# Eman eman




Soranî / Gelêrî

Bane û merîwan giyan merîwan deşte
Cûte memkeket gwêzî serdeşte
Sebaret be to gul min dekem geşte
Eman eman eman eman
Yar eman eman eman eman
Mirdim le xerîbî eman
Ew maley heme giyan nezirî ella bê
Be şert koçeket giyan berew duwa bê
Eman...
Yar...
Mirdim...

# Eman eman




Eman eman cotên biskan min berde
Dexîl eman cotên biskan min berde

Eman eman heger tu yara min î
Dexîl eman heger tu yara min î

Eman eman ramûsan bê qeydî ye
Dexîl eman ramûsan bê qeydî ye

Eman eman dosta min a keyfî ye
Dexîl eman dosta min a keyfî ye

Eman eman berê kaniyê hişîn e
Dexîl eman berê kaniye hişîn e

Eman eman cotên biskan bihejîne
Dexîl eman cotên biskan bihejîne

Eman eman heger tu yara min î
Dexîl eman heger tu yara min î

Eman eman ramûsan bê qeydî ye
Dexîl eman ramusan bê qeydî ye

Eman eman berê kaniyê reş e
Dexîl eman berê kaniyê reş e

Eman eman dosta min a keyxweş e
Dexîl eman dosta min a keyfxweş e

# Eman kejê






Memkit henarî awdare, giyan awdare, wey awdare
Tirş û şîrîn, mezedare, mezedare, hey mezedare
H'akim bimda le sêdare, le sêdare, le sêdare
Aman kejê dîdem kejê kej û kejalê
Zulf şor û gerdin be xalê
Xoşim dewêy, nasik û mindalê
Xoşim dewêy, nasik û çaw kalê
Memkit dû mîm û kafêke, giyan kafêke, wey kafêke
Le balay sîne safêke, wey safêke, hey safêke
Her maçêkit tewafêke, tewafêke wey tewafêke
Çawit esterey bîst û dû wey bîst û dû wey bîst û dû
Heldê le kelî kemetû hey keme dû ey helmelû
Musulmanim memke be cû memke be cû bot debime cû
Qestem bew xaley le rûte le rûte hey le rûte
Fincanî destit yaqûte dey yaqute wey yaqûte
Ser helêne cergim sûta cergim sûta cergim sûta
Qesem be wey yarî ciwane yarî ciwane yarî ciwane
Le nêw cih'êlan sultane wey sultane wey sultane
Ke demrê sah'eb îmane wey îmane giyan îmane
Helim girin be sê û dû, be sê û dû wey be sê dû
Bimbene gerekî jurû giyan le jurû wey eman jurû
Şînim bo biken mil be murû, mil be murû mil be murû

# Eman koçerê




Eman eman koçerê
Tu bi kolana kemberê
Radimûsim kezîzerê
Pişta mala bêndere
Eman eman koçerê

Beriyê xaniyê me bi kevot
Pişta mala me bi kevot
Melkê mewtê here jor
Melkê mewtê were jor
Da biçe seyra dawetan
Xweziya min keziyan firot


Eman eman koçerê
Eman eman koçerê

Min dît li afirê gamêşa
Te dî li afirê gamêşa
Tilya min girt û kêşa
Gava çavê min lê ket
Şûşa dilê min êşa
Eman eman koçerê

Eman eman koçerê
Tu bi kolana kemberê
Radimûsim kezîzerê
Pişta mala bêndere
Eman eman...

Heremên Botan û Behdînan, çavkanî : Hesenê Cizrawî

# Eman Sebrî







Xozgem be dwênê nîwero
Sebriyan bird bo tancero
Kirasyan bo kird le gulî lîmo
Le dilî min de bonî boso
Eman eman ey sebriye
Qurbanit bim eman sebrî
Sed meşella çend be mekrî
Çîm pê gutuy boçî degirî
Be ser dade desrey hewrî
Xozgem be dwênê beyanî
Sebriyan bird bo sileymanî
Kirasyan bo kird le kirmanî
To be milwênê herzanî

# Eman yarê

**Moderato**




Kiz û kelelam eman yarê girde nişînim
Çon rojî carêk şil û mil giyan balat bibînim
Çende be e'yşî eman yarê çende be noşî
Tazem zanîwe şil û mil giyan dûr bê nexoşî

Barî kes nebê eman yarê nedametî to
Kengê way lê hat şil û mil giyan beynî min û to
Çende...
Tazem...

Bîke be xatir eman yarê bawesey şukire
Be naz ramebire şil û mil giyan îstêkî bigire
Çende...
Tazem...

Le dûr diyare eman yarê şui'ley çiraket
Yadî tom kirduwe şil û mil giyan be mergî biraket
Çende...
Tazem...

# Eman ewbere




Soranî / Gelêrî

Ember ewbere naske dulbere
Çonkem maçêkî ew bê xebere
Deykem maçêkî ew sewda sere

Çinar û law law seryan girtuwe gîr
Min bo kê degirîm be kêm deken jîr

Ember ewbere...

Çinar û law law seryan nemame
Min bokê degirîm kê be temame

Ember ewbere...

Ya e'babeylê mal be berzewe
Yarim nekujî be dem lerzewe

Ember ewbere...

# Emê kê'w kê bi zava kin






Emê kê'w kê bi zava kin
Emê kê'w kê bi zava kin
Emê Elî bi zava kin
Reş ebakî li nav milan kin
Serê daykê bi qurban kin

Emê kê'w kê bi zava kin
Emê kê'w kê bi zava kin
Emê Elî bi zava kin
Reş ebakî li nav mila kin
Di nava koma mêra kin
Serê metkê bi qurban kin

Emê kê'w kê bi zava kin
Emê kê'w kê bi zava kin
Emê Elî bi zava kin
Reş ebakî li nav milan kin
Di nava koma mêra kin
Serê xaltiyê bi qurban kin

# Emer Axa




Emer Axa ye Emer Axa ye
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Ew bazê çeng badaye
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Nav eşîran nav (li) xwe da ye
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Emer Axa ye Emer Axa ye
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Emer Axa ye hey gayê belek
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Ew bazê hey çeng bi helek
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Nav şeran de hey kuştin gelek
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Emer Axa ye Emer Axa ye
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axaye

Emer Axa ye hey gayê spî ye
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Ew bazê hey çeng rîşî ye
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Wan nav şeran hey kuştin sî ye
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Emer Axa ye Emer axa ye
Şer dê xweş kin
Hey Emer axa ye
Emer Axa ye hey gayê reş e
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Ew bazê hey çeng bi nexş e
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Wê li nav şeran hey kuştin şeş e
Şer dê xweş kin
Hey Emer Axa ye
Emer Axa gayê dîn e
Ew bazê çeng nexşîn e
Nav şeran de qetl û xwîn e

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Emîne Emîne




Emîne Emîne navxweş Emîne
Emîne Emîne kibar Emîne
Tu li ber dilê min lawkê çi qas şêrîn e
Tu li ber dilê min lawkê çi qas şêrîn e

Tu bi me ra bimîne kibar bi me ra kokîn e
Tu bi me ra bimîne kibar bi me ra kokîn e

Eslê Emînê ji orta Efrîn e
Eslê Emînê lê kibar ji orta Efrîn e

Emîne Emîne

Kevir û kuçkê çolê tu li min nexîne
Kevir û kuçkê çolê tu li min nexîne

Emîne Emîne

# Emîne




Emo emo Emîne lê emo Emîne
Emo emo Emîne lê delalê Emîne

Çav û birya b'neqîne lê emo emine
Çav û birya b'neqîne lê delalê Emîne

Çav û birya b'neqîne lê emo Emîne
Çav û birya b'neqîne lê delalê Emîne

Zeriyê gundê me cot in lê emo Emine
Zeriyê gundê me cot in lê delalê Emîne

Her cot in xeber gotin lê emo Emîne
Her cot in xeber gotin lê delalê Emîne

Bax û bostan kevot in lê emo Emîne
Bax û bostan kevot in lê delale Emîne

Herêmên Amed û Rihayê

# Êmo




Herêma Botan

De gurm e gurm e gurm e, lê Êmo
Şara serê te bi surm e lê Êmo

Rişika xurme xurme lê Êmo
Koçera deşta Mûşê lê Êmo

Bizina bi heskê didoşe lê Êmo
Tev zarokên dergûşê lê Êmo

Êmo hato xemilî lê Êmo
Ex biskên hinekiri lê Êmo

Heciyê ku nediçû davetê lê Êmo
Por û keziyê kurkiri lê Êmo

# Êmo




Êmo stêrka sibêyo delalyê lê, delalyê lê, delalyê lê, lê Êma min
Narînê stêrka sibêyo ha sibêyo gur nebînin halê min
Şewqa xwe da dinêyo delalyê lê, delalyê lê, delalyê lê, lê Êma min
Şewqa xwe da dinêyo ha dinêyo gur nebînin halê min
Heçî destê me bi hev xe delalyê lê, delalyê lê, delalyê lê, lê Êma min
Dergevanê xêrêyo tew xêrêyo gur nebînin halê min

Êmo stêrka xurbetê delalyê lê, delalyê lê, delalyê lê, le Êma min
Narînê stêrka xurbetê tew xurbetê gur nebînin halê min
Şewqa xwe da umetê delalyê lê, delalyê lê, delalyê lê, lê Êma min
Şewqa xwe da umetê tew umetê gur nebînin halê min
Heçî destê me bi hev xe delalyê lê, delalyê lê, delalyê lê, lê Êma min
Dergevanê cinetê tew cinetê gur nebînin halê min

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Emrekem çavekem




Erê êwarê tegbîr ciwanê giyan sibh'eynê bare
Mero payîze hewarim xanimekem nizîk be yare
E'mrekem çawekem tegbîre min be toy dekem
Eger be xot razî bî łew bendet rizgar dekem
Eger bimdeye maçê xomit be qurbanit dekem
Erê êwarê tegbîr direnge wextî parşêwe
Bo xom be dem raymûsim ciwane ew dem û lêwe
Erê êwarê tegbîr direnge wextî beyanî
Erê emin le cêjwan yarim çuwe bo kanî
Erê êwarê tegbîr ey hawar sibh'enê sefer
Erê xo min nexoşim bo to were reş esmer
Erê êwarê tegbîr direnge wextî beyane
Erê bo xom łe cêjiwan çîbikem dil sergerdane

# Êran xoş e germên






Xozge lew dinyaye da h'asil buwaye muradim
Çend cefam le dût kêşa a'qîbet renc be badem
Çî bikem yarî dûr wilat ela'n kewtote yadim
Belkim şêxanî gewre ken tegbîr be firyadim
He yêran xoşe germên qed qed lêy halan piştên
Lew peşmîney ciwan tire, nardim bot bê le germên
Be pêşkeşî balat bê sablax û biruske û lawên
Be pêşwazî balat bê serdeşt û bane û pêncwên
Singit baxî şinoye kulmit gulî lîmoye
Memkit narincî xoye gwaret le gift û goye
Key danîşîn dû be dû keleget û xal le rû
Ne mei'na û ne lomeye bo tom awir tê berbû
Xizmîne memken lome royî û le destim derçû
Singî befirî almalû memkî xir kird wek hulû
Çawit estêrey şewê kulmit dendûkî kewê
Basikim bo bike be serîn ba cût xewman lê bikewê
Le min û le gulekey mêrdit kammanit zor xoş dewê
Le xuda dekem temenna mergim we pêşit kewê

# Êran




Heyêran êran êran
Bû be meskenî şêran
Çawit wek gelawêje
Cilew kêşî estêran
Eger bargekey lêna
Dinyay bo kewte giryan
Xerîb û sergerdanim
Bo balat perêşanim
De were bimdeye maçê
Teskê derdit le giyanim
Xerîbim lêm qewmawe
Her min nazit detwanim
Hemû ncergim let lete
Birîndarî xencerim
Ciwanê destim desto ke
Lêw al were jûr serim
Be cût destim desto ken
Ew car leser seferim
Leber ew jine reş tale
Qedî delêy şimşale

Min ser keme ser ranit
Pêm dade bew destmale
Ger gule pirsî kêye
Ram jêne bilê mindale
(...) Ammane dînim
Bo to betale
Werin cergim heldirin
Be debanî pir cewher
Leser balay toye giyan
Le dinya bûm derbeder
Memkî çepit fincane
Ewî dîket wek gewher
Tîrêkit le dilî dawim
Le cigerim bû karîger
Bala berz û gird û mird
Destim le bo memkî bird
Kulmî sêwî lasûre
Têydaye xalî wird wird
Tuşî bûm le rêy kanî
Daway dû maçim lê kird

# Erê bazo




Erê bazo tu belengaz î
Cîki nîne tu tê da razî
Ji derdê zerya her dem dibezî

Erê bazo lo kurê dayê
Xeber hatî ji sarayê
Dikim nakim tu nayê rayê

Erê bazo lo kurê metê
Şal û şapik li bejna te tê
Govend xweş e li civatê

Erê bazo lo kurê pîrê
Av kişandî bi zincîrê
Govend xweş e li Cizîrê

Herêmên Botan û Behdînan, çavkanî : M. Arif Cizîrî


# Erê bêne






Erê bêne bo min bêne
Ew gerdine zerdet bêne
Kabanî dewlemendî
Lêt ciwane ber helbêne
Kabanî dewlemendî
Merd be, dilekem meşkêne
Bazî, kewî, kotirî
Roj le rojê ciwantirî
Deba le sêdarem den
Ba bimirim le xatirî
Hey bêne, bom bêne
Zor ciwan û xem rewêne
Kabanî dewlemende
Lêy ciwane, ber helbêne
Kewî ya na kewbarî?
Şehînî ya şimqarî?
Ba le ser to bimkûjin
Wek kabray le bazarî

# Erê hat




Soranî / Gelerî

Werin cergim heldirin be deban û kuşterî
Çend cêjiwan legel kird le pencere û duderî
Êsta lêm buwe be naşî delê biraderî kwênderî
Erê hat dîsan hat e'zîzim ew roh'î şîrînim hat
H'ukimî h'akim xoştire ya mergî mufacat
H'ez dekem le kinit bimirim yan be sea't nerom le lat
Delên mîwane lêwal nayelim ew şew birwat
Bom bang kene şemalî demêk dê û demêk naye
Zulfit reşe rêh'ane sîngit kargî kemaye
Xo minîş weku Mecnunê nemawim bo Leylaye
Erê hat dîsan hat e'zîzim roh'î şirînim hat
Deber ew sîngey demirim bote textî teşkîlat
Taksiyekî be kirê degirim misafîrim bo mihabad
Delên mîwane lêwal nayelim ew şew birwat
Silaw le bejinê barîk bînayî her dû çawim
Xo min be destî yarê dîl û esîr kirawim
Xuda bo xoy deyzanê de î'şiqit da sûtawim
Erê hat dîsan hat e'zîzim ew roh'î şirînim hat
H'ukimî h'akim xoştire ya mergî mufacat
H'ez dekem le kinit bimirim yan be sea't nerom le lat
Delên mîwane lêwal nayelim ew şew birwat
Derdêkî way dawmetê kafir h'alim nebînê

Gelî dost û biraderan bo bogêrin germeşînê
Delên lêre nemawe çuwe bo çîn û maçînê
Erê hat dîsan hat e'zîzim roh'î şirînim hat
H'ukimî h'akim xoştire ya mergî mufacat
H'ez dekem le kinit bimirim yan be sea't nerom le lat
Delên mîwane lêwal nayelim ew şew birwat
Hem narince û hem sêwe hawar ya şêxî kirêwe
Xem û meraqî yarê îşikî kirdûm be pêwe
Rebî nebarê baran taqe gulekem be rêwe
Erê hat dîsan hat e'zîzim rohî şirînim hat
H'ukimî h'akim xoştire ya mergî mufacat
H'ez dekem le kinit bimirim yan be sea't nerom le lat
Delên mîwane lêwal nayelim ew şew birwat


# Erê ho Leylî






Bew bayey dejîm dêt le lay towe
Memkit şemam deykem be bowe
E'şqî balatim be dil le xowe
Malî dil şewê perdey lê bowe
Erê ho leylî boç wa şêwawî
Delêy wenwşey şewnim lêy dawî
Delêy nobûkî zawa lêy dawî
Bew baye dejîm dê be bay şemal
Le dûrî balat sûtam be xeyal
Le destim derçû yarî xoş cemal
Bew baye dejîm dê be bay ziryan
Be pêşkeşit bê şeş dang mukiryan
Roh'mî xêrit bê dil bû be biryan
Bawanim şêwê kafir nemênê
Bayequş leser yarim bixwênê
Herçî bedkare werhem helênê
Erê ho leylî bawanim leylî
Roh'mî xêrit bê boç wa bê meylî
Min bûm be mecnun toş bûyit be leylî

# Erê lawje




Erê lawje, lawje lawêro lawjê min
Wan seran hûr hûr hûr bêje

Dê kuro lawjê min
Ev kejo çendi mêr kûje

Ez çûme mêrgên malan
Çend mêrgêk hêşîn e

Xulama te wê bejnê
Çend bejnek şêrîn e

Ez çûme mêrgên malan
Çend mêrgêk belek e

Ref refên van ordekan
Wê naw de gelek e


Xulama te wê bejnê wo
Wan çavên belek e

Ez çûme mêrgên malan
Mêrgêk bêm av e

Ref refên van ordekan
Wê ketî nav e

Xulama te wê bejnê wo
Çend bejnek zirav e

# Erê Mamedo




Erê Mamedo belê hey vayê
Belê Mamedo erê hey vayê
Refê kevoka firyan sarayê
Refê kevoka firyan hevayê
Çavêm raketî xewa min nayê
Serê min dêşe ji derdê dinyayê

Erê Mamedo belê hey vayê
Serê min dêşe ji derdê dinyayê

Erê Mamedo xortê Boşatî
Refê kevokan firyan ser tatê
Mamed çû riya çûnê nehatî
Şahê xorta bû wernin civatê

Erê Mamedo belê hey vayê
Serê min dêşe ji derdê dinyayê

Erê Mamedo xortê Farqînê
Refê kevoka firiyan hêlînê
Kûr vebûye devê vê birînê
Mamed kuştine ez nekim şînê

# Erê Naz




Ew şew şew bedire, şewî bedire
Heldêt leyl û qedire, leyl û qedire
Min le xom degirim ne dire, degirim nedire
Erê naz hey naz, tu xuda naz meke
Bigire sêweket çaw ciwan, bangewaz meke
Ew şew şew behare, şew behare
Yarim sîmîn u'zare, gul u'zare
Leber çîm lê bêzare, lê bêzare
Erê naz hey naz, neşêwê nazit
Min be maşênî cîb ciwanê, dêm bo pêşwazit
Ew şew şewî xoşe, şewî xoşe
Ba da nîşîn le h'ewşe, kiçê le h'ewşe
Le beynî gul û wenewşe, gul û wenewşe
Erê naz...
Ew şew şew ziryan, şew ziryane
Yarî min mêhrebane, mêhrebane
Êsta le cêjwane, wey le cêjwane
Erê naz...

# Erebê min




Ay Ereb, Ereb, Ereb, Erebê min
Ay Ereb Ereb Ereb weliyê min
Me xezal berdan delal Erebê min
Mêhvanê çavê belek weliyê min

Erebê vê Bexdayê Erebê min
Torînê vê Bexdayê weliyê min
Suwarê hespê bayê Erebê min
Mêhvanê Letîfayê weliyê min

Erbê vê berriyê weliyê min
Suwarê ciwaniyê Erebê min
Mêhvanê Nedîmayê weliyê min
Mêhvanê vê zeriyê weliyê min

Herema Amedê

# Erebo yar erebo




Erebo yar Erebo
Te rast diro direv nekir
Rastiya xwe go mi bawer nekir
Erebo mor şenda
Erebo mor li yekî
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirwetê
Zarno werne vê dawetê

Erebo yar Erebo
Erebo yar Erebo
Erebo mor li çenda
Erebo mor li didya
Didyê me du zulfîqar
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirwetê
Zarno werne vê dawetê

Erebo yar Erebo
Erebo yar Erebo
Erebo mor li çenda
Erebo mor li sisya
Sisyê me sê meh payiz
Didye me du zulfîqar
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirwetê
Zarno werne vê dawetê

Erebo yar Erebo
Erebo yar Erebo
Erebo mor li çenda
Erebo mor li çara
Çare me çar barigan
Sisyê me sê meh payiz
Didye me du zulfîqar
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirwetê
Zarno werne vê dawetê

Erebo yar erebo
Erebo yar erebo
Erebo mor li çenda
Erebo mor li pênca
Pêncê me şertê xweda
Çare me çar barîgan
Sisyê me sê meh payiz
Didyê me du zulfîqar
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirwetê
Zarno werne vê dawetê

Erebo yar Erebo
Erebo yar Erebo
Erebo mor li çenda
Erebo mor li şeşa
Şeşê me nîvsal temam
Pencê me şertê Xweda
Çare me çar barîgan
Sisyê me sê meh payiz
Didyê me du zulfîqar
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirwetê
Zarno werne vê dawetê
Erebo yar Erebo

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

Erebo yar Erebo
Erebo mor li çenda
Erebo mor li hefta
Heftê me heftê erda
Şeşê me nîvsal temam
Pêncê me şertê xweda
Çarê me çar barigan
Sisyê me sê meh payiz
Didyê me du zulfîqar
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirwetê
Zarno werne vê dawetê

Erebo yar Erebo
Erebo yar Erebo
Erebo mor li çenda
Erebo mor li heşta
Heştê me heştê erşa
Heftê me heftê erda
Şeşê me nîvsal temam
Pencê me şertê xweda
Çare me çar barigan
Sisyê ma sê meh payiz
Didyê ma du zulfîqar
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirwetê
Zarno werne vê dawetê

Erebo yar Erebo
Erebo yar Erebo
Erebo mor li çenda
Erebo mor li neha
Nehê me hemlê jina
Heştê me heştê erşa
Heftê me heftê erda
Şeşê me nîvsal temam
Pencê me şertê xweda
Çare me çar barigan
Sisyê me sê meh payiz
Didyê me du zulfîqar
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirwetê
Zarno werne vê dawetê

Erebo yar Erebo
Erebo yar Erebo
Erebo mor li çenda
Erebo mor li deha
Dehê me hemlê deva
Nehê me hemlê jina
Heştê me heştê erşa
Heftê me heftê erda
Şeşe me nîvsal temam
pencê me şertê Xweda
Çare me çar barigan
Sisyê me sê meh payiz
Didyê me du zulfîqar
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirwetê
Zarno werne vê dawetê

Erebo yar Erebo
Erebo yar Erebo
Erebo mor li çenda
Erebo mor li yazda
Yazdê me mehek pê ma
Dehê me hemlê deva
Nehê me hemlê jina
Heştê me heştê erşa
Heftê me heftê erda
Şeşê me nivsal temam
Pêncê me şertê Xweda
Çarê me çar barigan
Sisyê me sê meh payiz
Didyê me du zulfîqar
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirvetê
Zarno werne vê dawetê

Erebo yar Erebo
Erebo yar Erebo
Erebo mor li çenda
Erebo mor li donzda
Donzdê meh salek temam
Yazdê me mehek pê ma
Dehê me hemlê deva
Nehê me hemlê jina
Heştê me heştê erşa
Heftê me heftê erda
Şeşe me nivsal temam
Pêncê me şertê Xweda
Çare me çar barigan
Sisyê me sê meh payiz
Didyê me du zulfîqar
Yekî me yekî Xweda
Xweda xwedanê mirvetê
Zarno werne vê dawetê

# Erev e




Erev e hoy Erev e hoy Erevê min
Erev e hoy Erev e hoy delalê min

Min go îşev li hire ve hoy Erevê min
Min go îşev li hire ve hoy delalê min

Sibê ser rêka xwe ve hoy Erevê min
Sibê ser rêka xwe ve hoy delalê min

Êlên erevan boş in hoy Erevê min
Malên erevan boş in hoy delalê min

Mast nînin ron difroşin hoy Erevê min
Mast nînin ron difroşin hoy delalê min


Yan ji wan ve bizinên poşin hoy Erevê min
Yan ji wan ve bizinên poşin hoy delalê min

Êlên erevan pir in hoy Erevê min
Êlên erevan pir in hoy delalê min

Mast nînin ron dikirin hoy Erevê min
Mast nînin ron dikirin hoy delalê min

Yan ji wan ve bizinên kirin hoy Erevê min
Yan ji wan ve bizinên kirin hoy delalê min

# Eroy hoxir




Eroy hoxir eroy hoxir nezer nakey eroy hoxir
H´eyam e´qilim dil u dînim heder nakey eroy hoxir

Kilaw lar gurcî kew reftar nezer nakey eroy hoxir
Le tîrî ahî nakamîm h´ezer nakey eroy hoxir

Be duta eşkî h´esret xwên eberênî be ruy deşta
Temaşay lalezarî raguzer nakey eroy hoxir

Le lay xelkî gedaye gerdî jêr pêy mulkî dildarî
Le sayet wek huma tacim leser nakey eroy hoxir

Soranî / Gelerî, Elî Merdan

# Eşek hat




Êşek hat, janek hat ji çiyayê jorîn hat
Êşek hat janek hat ji çiyayê jorîn hat
Dibên êşa pîra ye dibên êşa pîra ye
Dibên êşa pîra ye dibên êşa pîra ye
Hemî ji aykê kala ye, hemî ji aykê kala ye
Hemî ji aykê kala ye, hemî ji aykê kala ye


Êşik hat janik hat ji çiyayê jorîn hat
Êşek hat janek hat kevno rabin piya ye

Êşek hat, janek hat ji çiyayê jorîn hat
Êşek hat janek hat ji çiyayê jorîn hat
Dibên êşa keça ye, dibên êşa qîza ye
Dibên êşa keça ye, dibên êşa qîza ye
Hemî ji aykê xorta ye hemî ji aykê xorta ye
Hemî ji aykê xorta ye hemî ji aykê xorta ye

Êşek hat janek hat ji çiyayê jorîn hat
Êşek hat janek hat kevno rabin piyaye

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Evro bihar e




Evro bihar e lê weylê lê weylê
Dîsa bihar e lê weylê wey zalim
Barankek barî lê weylê lê weylê
Reşandin dar e lê weylê wey zalim
Bejna keçikê lê weylê lê weylê
Çenda nazdar e lê weylê wey zalim

Evro havîn e lê weylê lê weylê
Dîsa havîn e lê weylê wey zalim
Barankek barî lê weylê lê weylê
Reşand zeytun e lê weylê wey zalim
Bejna keçikê lê weylê lê weylê
Çenda şirîn e lê weylê wey zalim

Evro payiz e lê weylê lê weylê
Dîsa payiz e lê weylê wey zalim
Barankek barî lê weylê lê weylê
Reşandin guz e lê weylê wey zalim
Bejna keçikê lê weylê lê weylê
Çenda ezîz e lê weylê wey zalim

Evro bihar e lê weylê lê weylê
Dîsa bihar e lê weylê wey zalim
Evro bihar e lê weylê lê weylê
Dîsa bihar e lê weylê wey zalim

# Ew kiçe lew male




Engustit derzî zulfit xeyate
Roh'im kêşikçî were were dewrey balate
To were, to were to were xanimî mezedar
Were were were xanimî mezedar
Ey wey herdûkman rêbwar
To mero şoxî mezedar
Engustit derzî zulfit awrîşim
Xuda nemkûjê şil û mil giyan dayime le lat bim
Ew kiçe lew male qewlî dawe pêm
Derk û derwazey le berim (leber çî) daxirawe lêm
Ew kiçe lew male xoy da nîşanim
Awirî pê nebû were were sûtandî giyanim
To were to were xanimî şil û mil
Were were şoxî (xanimî) çaw be kil
Ew kiçe lew male ciwan wek helale
Hîç lomem meken dil boy bêhale

# Ewe hat




Ewe hat dîsan hat bala berzekey xoman hat
Ewe hat dîsan hat çawreşekey xoman hat

Xizmîne cergim kunkune ew a'lemem lê dujmine
Çunke ew kiçe yarî mine

Ewe hat...

Xizmîne xotan û xwatan eger yarim hate latan
Qedirî bigrin be serçawtan

Ewe hat...

# Ewrê ser me




Ewrê ser me çiq çiqo yar î yar î têlo
Ewrê ser me çiq çiqo daxlî dûman î têlo
Xelk ji me kul bi ziko
Xelk ji me kul bi ziko

Ewrê ser me dû ne
Ewrê ser me dû ne
Xelk ji me dil giran e
Xelk ji me dil giran e

Ewrê ser me sor e
Ewrê ser me sor e
Xelk ji me dizar e
Xelk ji me dizar e

Ewrê ser me reştar î
Ewrê ser me reştar î
Xelk ji me qeherî yar î yar î têlo
Xelk ji me qeherî daxlî dûman î têlo

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Ey be hermê




Ey be hermê be hermê
Ca deçim hermêt bo dênim
Le taran û tewrêzan
Kirasî kirêmit bo dênim
Be xahîşt ya be zorî
Dêm le babit destênim
Desrokey tozê tîle
Ca berokit bo derzîle
Qamkit bo engustîle
Ax leser çî lêm zîzî
Zîz bûnit bê delîle
Ey be hermê be hermê
Ca deçim hermêt bo dênim
Le taran û tewrêzan
Kirasî kirêmit bo dênim
Be xahîşt ya be zorî
Dêm dû maçan destênim

Her çend dekem xeyalan
Qet ew diley min nasirewê
Ca girûy girtuwe wek mindal
Her delê yarim dewê
Rojî sed carim lêden
Le kwê bît dême ewê
Şêt û şeyday kirdûme
Ew dû çawî belekî
Nawêrim nêwî bênim
Ca leber zimanî xelkî
Sablaxim bo defşiroşt
Bo gul û gware û kirmekî
Ey be hermê be hermê
Dad be hermê gulawî
Nemirim dethênim ew sal
Kellem bidirûm de dawî

# Ey gerde






Delên lêwal lêm zîze be kes aşit nabêtewe
Kejal çote seferê dua'm bo biken bêtwe
Le xuday dekem telebê legelim aşit bêtewe
Ey gerde û giyanim gerde gerdin helaley zerde
Were merd û merdane dest le bedkaran berde

Detfermû bo to nabim çonî defermûy ta wa bim
Kewtibûme bendîxanê be yadî towe mabûm
Rebbî kostî dil kewê ger satê lêt cûda bim
Ey gerde...
Were...
Xizm û qewmim becêhêşt le deştî şar wêranê
Deçine swêsne û helalan kîjoley kurdistanî
Bilên be leylay azîz mecnun zexmî haniyanî
Mirdin çatire lew h'aley namewê zîndeganî
Ey gerde...
Were...
Zor le mêje lêm wine ew dilem kewte weswese
Lêw alim zor nexoşe û kewtuwe zor bêkese
Rojê carêk bîbînimbo minî bêçare bese
Ey gerde...
Were...
Şêtî çawî ciwanî tom xuda bo xoy deyzanê
Xo min wek kake mem a'şiqî cizîr û botanê
Helweday çawî reşim le germên û kwêstanê
Ey gerde...
Were...

# Ey Herîr Herîre




Deştî pişt qela ezîzekem razawe be gul
A'req derêjim ezîzekem zengul be zengul
Ax herîr herîre herîre û giyan herîr her yese
Be şoxî derwa ezîzekem le rêy medrese

Le kê torawî ezîzekem bikêşim nazit
Bo xom saz debim ezîzekem dême pêşwazit
Ax...
Be...

Ewe ke deroyit ezîzekem xot û dileket
Emanetit bê ezîzekem taqe guleket
Ax...
Be...

Xalim bijardin, bijardin sed û bîst û no
Le dewrey xalan ezîzekem narinc û lîmo
Ax herîr herîre herîre û giyane herîre heranî
Dem kul û perçemî ezîzekem ban çawim hatî

# Ey wey lerzane




Ewe min derom le bo germênê
Ew diley min xerîbe cêdemênê
Ey wey lerzane, ho bira lerzane
Şede qabîlî bala berzane
Her wek rêh'ane şîn bûy le baxî
Xo to nemamî miryem sablaxî
Ey wey lerzane, de bira lerzane
Lerzanekenit lerzim lê dênê
Qestiye be çawan cergim derbênê
Her mangê nwê bû h'alim peşêwe
Hîlal çun şêwey ebiroy toy pêwe
Îcazem bide maç kem ew lêwe
Çawim çawerêy rêgay ber malit
Belku le nakaw derkewê xalit
Desmalî serit h'erîrî nerme
Ewendem h'ez lê kird, bes le lam şerme
Le dûrî baalt bûm perewaze
Xembarit kirdûm zor bê endaze
Beqat pê nakem jin bê mecaze

# Eynikê




Eynikê tu eyn î eynikê eynikê
Neynikê tu neyn î neynikê neynikê
Eynika dikê ye eynikê eynikê
Neynika dikê ye
Eynika keko ye
Neynika keko ye
Ge li ber piştê ye
Ge li ser çokê ye
Bala min lê ye
Eşqa min jê ye
Eynikê tu eyn î eynikê eynikê
Neynikê tu neyn î neynikê neynikê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Eyşê canê






De lê lê de lê de lê
De lê lê Eyşê canê

Bilindê rû nîşanê (2 caran)

Min jê xwest ramûsanê
Neda min ramûsanê

Da Eliyê kelekvanê (2 caran)

Eyşê ji mala Tahirî
De lê lê Eyşê canê

Zend û bazend hilkirî
De lê lê Eyşê canê

Çeng li xewa xwe birî
De lê lê  Eyşê canê

Eyşê ji mala melayî
De lê lê  Eyşê canê

Zend û bazend hildayî
De lê lê Eyşê canê

# Eyşê




Eyşê me Eyşê nînim ha Eyşê me Eyşanê lê
Geyrê mê rindê nînim tew delalê

Kevoka per hesin im ha Eyşê me Eyşanê lê
Kewoka per hêsin im ha tew delalê
Dilê xorta dêşînim ha Eyşê me Eyşanê lê
Dilê xorta dêşînim ha tew delalê
Xortê xelkê dixapînim ha Eyşê me Eyşanê lê
Xortê xelkê dixapînim ha tew delalê

Eyşê qiza keşîşe ha Eyşê me Eyşanê lê
Delal qiza keşîş e tew delalê
Paşil tijî êmîş e ha Eyşê me Eysanê lê
Paşil tijî êmîş e tew delalê
Lewno werin bi êrîş e ha Eyşê me Eyşanê lê
Xortno werin bi êrîş e ha Eyşê me Eyşanê lê

Eyşê qîza mele ye ha Eyşê me Eyşanê lê
Delal qîza mele ye tew delalê
Paşil tijî xwurme ye ha Eyşê me Eyşanê lê
Paşil tijî xwurme ye tew delalê
Lawno werin yaxme ye ha Eyşê me Eyşanê lê
Xortno werin yaxme ye tew delalê

# Ey gulfiroş ta key




Ey gulfiroş ta key sewdayî to bim
E´trî gulim derwa min rencero bim
Bêne gulî sûrit ta e´tirî mawe
Dewirî (cewirî) zemanem sa cergim birawe cergim birawe cergim birawe
Min aşiqî rûy tom dinya dezanê
Bê wirde serfîm ka dewrî cewanê
Nebê binazî gulim ewro ke ciwanî
Tenya gulî gulekem baxî gulanî baxî gulanî baxî gulanî
Cêy naz u î´şwe niye ciwan u temîzî
E´mrî xudaye ke to bo min e´zîzî

Soranî / Gelêrî

# Ez befr im




Ez befr im befr im befr im lê lê nar lê nar
Ez befr im befr im befr im lê lê nar tu delal î
Wez befra çiyakî sor im lê lê nar lê lê nar
Wez befra çiyakî sor im lê lê nar tu delal î
Hemayloka bi mor im lê lê nar lê lê nar
Hemayloka bi mor im lê lê nar tu delal î
Dosta lawkê nehtor im lê lê nar lê lê nar
Dosta lawkê nehtor im lê lê nar tu delal î

Wez befra  çiyakî spî me lê lê nar lê lê nar
Wez befra çiyakî spî me lê lê nar tu delal î
Hemeyloka bi rîşî me lê lê nar lê lê nar
Hemeyloka bi rîşî me lê lê nar tu delal î
Dosta lawkê gundî me lê lê nar lê lê nar
Dosta lawkê gundî me lê lê nar tu delal î

Wez befra çiyakî reş im lê lê nar lê lê nar
Wez befra çiyakî reş im lê lê nar tu delal î
Hemeyloka bi nexş im lê lê nar lê lê nar
Hemeyloka bi nexş im lê lê nar tu delal î
Dosta lawkê keleş im lê lê nar lê lê nar
Dosta lawkê keleş im lê lê nar tu delal î

# Ez befr im




Ez berf im berf im berf im lê lê nar lê lê nar
Ez berf im berf im berf im lê lê nar tu delal î

Ez befra çiyakê sor im lê lê nar lê lê nar
Ez befra çiyakê sor im lê lê nar tu delal î

Hemalya dor bi mor im lê lê nar lê lê nar
Hemalya dor bi mor im lê lê nar tu delal î

Ez befra çiyakê spî me lê lê nar lê lê nar
Ez befra çiyakê spî me le lê nar tu delal î

Dosta lawikê gundî me lê lê nar lê lê nar
Hemalya dor bindî me le lê nar tu delal î

Em kurd in kurd in kurd in lê lê nar lê lê nar
Em kurd in kurd in kurd in le lê nar tu delal î

Timîn em ser bilindin lê lê nar lê lê nar
Barê Kurdistan hildin le lê nar tu delalê

Ez berf im berf im berf im lê lê nar lê lê nar
Ez berf im berf im berf im lê lê nar tu delal î

Herêm Amedê

# Ez çûme Cizîrê

ad libitum (Rîtmî Azad)




Ez çûme Cizîrê
Hey lo mîro
Disgotin
Şirnex û pê de
Cotekî xulaman hey lo mîro
Disgotin
Wê di nava rê de
Hingî ez pirsyar dikim
Disgotin
Mîr Sêvdîn di qeydê de
Ez çûme Cizîrê
Deriyok dadayî
Cotekî xulaman
Konê de razayî
Hingî ez pirsyar dikim
Mîr Sêvdîn nemayî
Ez çûme Cizîrê
Deriyok daxistî
Cotekî xulaman
Piştê de nivistî
Min jê pirsyar kir
Mîr Sêvdîn kûştî

Herêm Botan

# Ez Leyla me




Radyoya Êrîvanê

Ez Leyla me Leyla me hoy hoy Leylo
Wez Leyla me Leyla me can canê bi Seyro

Ez kulîlka li ber bera me hoy hoy Leylo
Wez kulîlka li bera me can canê bi Seyro


Ez ordek im ordek im hoy hoy Leylo
Wez ordek im ordek im can canê bi Seyro

Kofiya bi zêra çê nakim hoy hoy Leylo
Kofiya bi zêra çê nakim can canê bi Seyro

Ez ji wî gundî mêr nakim hoy hoy Leylo
Wez ji wî gundî mêr nakim can canê bi Seyro

Ez Leyla me...

# Ez ne dîn im




Ez ne dîn im ne hahame hay lê lê hay lê lê hay lê lê dînê
Ez ne dîn im ne hahame wey lê lê wey lêlê wey lê lê dînê

Ser xanîkê bav pal dame hay lê lê hay lê lê hay lê lê dînê
Ser xanîkê bav pal dame wey lê lê wey lêlê wey lê lê dînê

Çav belek çavan ez tev da me hay lê lê hay lê lê hay lê lê dînê
Çav belek çavan ez tev da me wey lê lê wey lêlê wey lê lê dînê

Ez ne dîn im ne bi durist im hay lê lê hay lê lê hay lê lê dînê
Ez ne dîn im ne bi durist im wey lê lê wey lêlê wey lê lê dînê

Ser xanîkê bav diwestim hay lê lê hay lê lê hay lê lê dînê
Ser xanîkê bav diwestim wey lê lê wey lêlê wey lê lê dînê

Radyoya Êrîvanê

# Ez pîro me






Ez Pîro me ez Pîro me
Lawino werinê ez Pîro me

Xweşmêrê mala Miho me
Lawino werinê ez Pîro me

Ez Pîro me gayê dîn im
Lawino werinê ez Pîro me

Xudanê şûrê boz hişîn im
Lawino werinê ez Pîro me

Wan xweşmêran bi şûr dişkînim
Lawino werinê ez Pîro me

Ez Pîro me gayê reş im
Lawino werinê ez Pîro me

Xudanê şûrê dev bi nexş im
Lawino werinê ez Pîro me

Nav şeran de çend keyf xweş im
Lawino werinê ez Pîro me

Ez Pîro me gayê spî me
Lawino werinê ez Pîro me

Xudanê şûrê dev rîşî me
Lawino werinê ez Pîro me

Nav şeran de çend keyfî me
Lawino werinê ez Pîro me

# Ez teymez im




Ez teymez im teymez im
Dê wernê wernê wernê
Bi mertalê çil gez im
Hero sê cara wernê
Nedirevim û ne dibezim
Dê wernê wernê wernê
Serkê qerqeşa ez im
Hero sê cara wernê

Teymez beranê sor e
Dê wernê wernê wernê
Serê tacî bi mor e
Dê wernê wernê wernê
Istenbolê şerek zor e
Dê wernê wernê wernê

Teymez beranê gind e
Dê wernê wernê wernê
Serê tacî bilind e
Dê wernê wernê wernê
Nedirevim û ne hind e
Dê wernê wernê wernê

Teymez beranê sîs e
Dê wernê wernê wernê
Serê tacî yê Rus e
Dê wernê wernê wernê
Istenbolê Şerek xus e
Dê wernê wernê wernê

Teymez beranê reş e
Dê wernê wernê wernê
Serê tacî bi nexş e
Dê wernê wernê wernê
Istenbolê şerek xweş e
Dê wernê wernê wernê

Ez teymez im teymez im
Dê wernê wernê wernê
(Hero sê cara wernê )

# Ezîzim




Were were nazenînim
Be naz biro ke bitbînim
Naz û nazenîn û nazdarî xomî
Derit dênim le bendî romî
Bê nisîbim ezîzim
Bê to xerîbim ezîzim
Be ber çawimî da deben
Yar bû reqîbim ezîzim
Dil şikawim ezîzim
Bo to nemawim ezîzim
Were lam nêwî dilim
Pê binê le çawim ezîzim

Gulim royî xak be serim
Let letî kirduwe cigerim
Swêndê dexom be î'şqî pakî leyla
Paşî balay lew alê h'erame dinya
Bê nisîbim ezîzim
Bê to xerîbim ezîzim

Were lam nemawim le tawit
Ba bonî kem zulfî xawit
Xuda bo xoy dezanê ey ezîzim
Kiz û damaw û peşêwim le tawit
Bê nisîbim ezîzim
Bê to xerîbim ezîzim

Xuda wenda le xerîbî
Dilî şeyday emin çî dî
Xwaye dilî nerim key ke
bimdwênê
Çî dîke şuşey dilî min neşikênê
Bê nisîbim ezîzim
Bê to xerîbim ezîzim
...

Xwaye agat le leyla bê
Rebbî esparde ella bê
Le koçî namuradî xeme beşî me
Xemê mexo ezîzim xuda kerîme
Bê nisîbim ezîzim
Bê to xerîbim ezîzim
...

# Êvar e bi ro dereng e




Êvar e bi ro dereng e haynim na haynim naynim naynim na
Êvar e bi ro dereng e de gidî de yala bûkê dem zava
Sî daket ser kerenge haynim na haynim naynim naynim na
Sî daket ser kerengede gidî de yala bûkê cem zava

Êvare bû rewe ye haynim na haynim naynim naynim na
...de gidî de yala bûkê dem zava
Dengê dîka li qibe ye haynim na haynim naynim naynim na
...de gidî de yala bûkê cem zava

Herêma Serhedê, çavkanî : Ozan Aydin

# Fatim gula miclîsa




Fatim gula miclîsa delal gula miclîsa
Dest berda dîsa dîsa Fatima gula miclîsa
Dest berda dîse dîse Fatima gula miclîsa

Dê were dê were dîdim were Fatim were lêlê
Dê were dê were dîdim were Fatim were lêlê

Fatimê tendûr dada delalê tendûr dada
Rîşê şahre hur bada Fatimê derê xwe dada
Rîşê şahre hur bada Fatimê derê xwe dada

Dê were dê were...

Fatim gula tetika delal gula tetika
Dest berda ser memika seyrana dilê lawika
Dest berda ser memika heyrana dilê lawika

Dê were dê were

Radyoya Êrîvanê

# Fatmayê




Her Fatmayê Fatmayê la îlahe îllalah
Her Fatmayê Fatmayê dayim estexfirîllah
Qîza ronya çavayê la îlahe îlallah
Qîza ronya çavayê dayim estexfirîlah
Hewşa Mekê bi kinêro la îlahe îlallah
Hewşa Mekê bi kinêro dayim estexfirîllah
Va siwaran hêre hêro la îlahe îlallah
Va siwaran hêre hero dayim estexfirîllah
Daweta Elî Şêro la îlahe îllalah
Daweta Elî Şêro dayim estezfirîllah

Her Fatmayê Fatmayê la îlahe îllalah
Her Fatmayê Fatmayê dayim estexfirîllah
Qîza ronya çavayê la îlahe îllallah
Qîza ronya çavayê dayim estexfirîllah
Kirasê Fatma çirisî la îlahe îllalah
Kirasê Fatma çirisî dayim estexfirîllah
Tevek al ayet Kursî la îlahe îllalah
Tevek al ayet Kursî dayim estexfirîllah

Herêma Amedê, çavkanî : M. Emîn Karataş

# Fatimokê




Fatmokê kwêstan çend xoin kwêstan
Kêl gerdin singî tom bax û bêstan
Fatimokê paş to nagirim hîç dostan
Kêl gerdin maçêkim bo xom estand
Fatimokê çend be çoman da hatim
Kêl gerdin şextey payzêy engawitim
Fatimokê de nêw beh'ran da durî
Kêl gerdin cergî a'lemêt birî
Fatimokê rebî babit zerd ka
Kêl gerdin le celebê kawirî
Fatimokê kwêstanman de temê da
Kêl gerdin sûtam awirêkim wêde
Fatimokê dugmey berokîm kirdewe
Kêl gerdin zîz bû aştim kirdewe
Fatimokê awirî bexêrim wêde
Kêl gerdin sûtam le î'şqêda
Fatimokê kwêstanman kêle şîne
Kêl gerdin bot derdeçim lew dîne

Sorani / Gelêri

# Feqî





Feqî heyran lê lê feqî qurban way way
Feqî çûne lê lê feqîtiyê way way
Li deşta jêrîn lê lê xerîbiyê way way
Feqyê piçûk lê lê da pêşiyê way way

Feqî heyran lê lê feqî qurban way way
Çi hucreke lê lê ji hucran wê da way way
Feqî û mele lê lê wanê tê da way way
Feqyê pêşîn lê lê xwe girêda way way

Feqî heyran lê lê feqî qurban way way
Çi hucreke lê lê ji hucran dero way way
Feqî û mele lê lê çûne fero way way
Feqyê min ewê lê lê reng esmero way way

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Ferat




Weyla dînê weyla dînê
Weyla dîn zalimê dînê
Vî Feratî xuşe xuş e
Vî xopanî xuşe xuş e
Pê ra hate qal û qirş e
Pê ra hate qal û qirş e
Memkê qolê sêva tirş e
Memkê dînê sêva tirş e

Weyla
Weyla
Vî Feratî nale nal e
Vî xopanî nale nal e
Pê ra hatin qirş û qal e
Pê ra hatin qirş û qal e
Memkê qolê sêva tehl e
Memkê dînê sêva tehl e
Weyla dînê weyla dînê
Weyla dîn zalimê dînê

# Ferşê kaniyê




Eman eman here kaniyê bi lez û bez
Dexîl yeman de birû kaniyê lez û bez
Eman eman çava bişo desta bes
Dexîl yeman çava bişo desta bes
Eman eman mame li civa na te ez
Dexîl yeman mame li civa na te ez

Eman eman here kaniyê bi şirînî
Dexîl yeman here kaniyê bi şirînî
Eman eman te sing şana higvînî
Dexîl yeman te sing şana higvînî
Eman eman tawa xaro bi lexrînî
Dexîl yeman xorta xaro bi lexrînî

Eman eman ferşê kanyê direj e
Dexîl yeman selê kanyê direj e
Eman eman yarê lê kir nimêj e
Dexîl yeman dostê lê kir nimêj e
Eman eman mame li civanê ji mêj e
Dexîl yeman mame li civanê ji mêj e

Eman eman ferşê kanyê ferşîn e
Dexîl yeman selê kanyê ferşîn e
Eman eman yarê lêda misîn e
Dexîl yeman yarê lêda misîn e
Eman eman melay lê xand yasîn e
Dexîl yeman seyda lê xand yasîn e
Eman eman here kaniyê bi lez û bez
Dexîl yeman de biru kaniyê lez û bez
Eman eman here kaniyê bi lez û bez
Dexîl yeman de biru kaniyê lez û bez

# Ferzê




Herêma Serhedê

Ferzê lê Ferzê,
Ferzê lê Ferzê
Li qam û bejnê
Li bejna Ferzendayê
Ferzê Ferzê lê Ferzê,
Ferzê lê Ferzê
Li qam û bejnê
Li bejna Ferzendayê
Weke take rihanê

Bejna min ne kin e lê
Ne dirêj e lê
Tayek rîhana ye
Xwe berda vê jengê
Serya bişo lê
Çava kil ke lê
Biska şeh ke lê
Tuncika berde lê Ferzendayê

Ferzê Ferzê lê Ferzê,
Ferzê lê Ferzê
Li qam û bejnê
Li bejna Ferzendayê
Ferzê Ferzê lê Ferzê,
Ferzê lê Ferzê
Li qam û bejnê
Li bejna Ferzendayê
Weke take rihanê

Ferzê bala xwe da çû
Min ra bû talû
Li bejnê û balê
Li bejna Ferzendayê
Bejnê gelek kûr bûn lê
Em daketin lê
Kef ket xorta lê
Nizanim tê ji mala kê

Ferzê Ferzê lê Ferzê,
Ferzê lê Ferzê
Li qam û bejnê
Li bejna Ferzendayê
Ferzê Ferzê lê Ferzê,
Ferzê lê Ferzê
Li qam û bejnê
Li bejna Ferzendayê
Weke take rihanê

Ez û bejna xwe çûn lê
Tev daketin lê
Bulbul û şalûl
Li me rabûn temaşê
Bejnê carek were lê
Rûnê li vê hêlê
Mijûl bin li ser eşq û evînê

Ferzê Ferzê lê Ferzê,
Ferzê lê Ferzê
Li qam û bejnê
Li bejna Ferzendayê
Ferzê Ferzê lê Ferzê,
Ferzê lê Ferzê
Li qam û bejnê
Li bejna Ferzendayê
Weke take rihanê

# Fikir ez birim çiyayê me




Fikra ez birim çiyayê me
Ditna werga mala me
Warêd kal û bavê me
Navnîşanê mala me

Min dit beriya pezê me
Tendûra bin hêsiya me
Dewsa cit û perde me
Navnişanê mala me

Konê me yî mezin bû
Penc stûr û du rez bû
Li ser rê û dirba bû
Bona rêwiya sitar bû

Hêsiya konda kulin bû
Rex kulinê stêr bû
Ew ji qulba malê bû
Dua duruzgê lê bû

Axlê dewêr piş kon bû
Koza berxa li rex bû
Tewla hespê wan dûr bû
Fezeda mexela pez bû

Aarame Tigran, radyoya Êrîvanê

# Fîncanê ha fîncanê




Fîncanê ha bi fîncanê eman eman fîncanê
Fîncanê ha bi fîncanê gidîno kawa me kanê

Fîncan birne dihanê fîncanê ha fîncanê
Fîncan birne dihanê gidîno kawa me kanê

Erze dane dîwanê fîncanê ha fîncanê
Erze dane dîwanê gidîno kawa me kanê

Îş ketiye nav baranê fîncanê ha fîncanê
Îş ketiye nav baranê gidîno kawa me kanê

Tasa pêş mam danê fîncanê ha fîncanê
Tasa pêş mam danê gidîno kawa me kanê

Tasa ortê qewm danê fîncanê ha fîncanê
Tasa ortê qewm danê gidîno kawa me kanê

Tasa sisiya jehr danê fîncanê ha fîncanê
Tasa sisiya jehr danê gidîno kawa me kanê

Malî cînar geriya bûn fîncanê ha fîncanê
Malî cînar geriya bûn gidîno kawa me kanê

Per û bask weşiya bûn fîncanê ha fîncanê
Per û bask weşiya bûn gidîno kawa me kanê

# Fitilî




Min dî li gir fitilî
Te dî li gir fitilî
Neynik danî xemilî
Xwelî'l tew li vî dilî
Dil kir lawkê dimilî

Ha til e til e til e
Ji tilê wê da çûme
Binî da Qitirbil e
Xwar bûm gewrê ramûsim
Pişta'm ji bavê kul e

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Gelawêj




Gellew gellew gelle hey hey lew gellawêje
Xwaye li minî nestênî ew bejn û bala rêze

Ey e'mrim ezîzim giyane kil le kewêda
Ey çawit mange le giyane çiwarde şewêda

Gellew gellew...

Erê ba sîrwan bimba wey wey be mintafewe
Erê we tunke tunkey giyane male cafewe

Gellew gellew...

Ey xalê le to dîm giyane yek le efsane
Wey nek le gul susen giyane xalî zemane

Gellew gellew...

# Gelo ew kî ye




Nava hezara ew qa qîzan e
Baxçe de gul e mirazî dil e
Gelo ew kî ye ji çi eslî ye
Şad e esman e qîza Kurdan e

Ew gerdenzer e enî gewher e
Lêvna narîn e dil ewitîne
Gelo ew kiye ji çi eslî ye
Şad e esman e qîza Kurdan e

Bejna zirav e sotin ji nav e
Bir û kevanî çav tîrê wan e
Gelo ew kî ye ji çi eslî ye
Şad e esman e qîza Kurdan e

Lê çav bi şewq e eslê wê şêx e
Malê dinê bim qurbana wê bim
Gelo ew kî ye ji çi eslî ye
Şade esman e qîza Kurdan e


Aarame Tigran, radyoya Êrîvanê

# Genimo




Genimo genimo
Rinda min gozela min
Genimo genimo
Rabû weka rimo
Rabû weka rimo
Hevranî Hakimo
Hevranê Hakimo
Genimê pêş mizgeftê
Me dirû bi qûwetê
Hevranî dawetê
Genim pêş dêrê wo
Me dirû bi kêrê wo
Hevranî xêrê wo
Her min got her girî
Ser milan xinzir î
Malbavok gawir î
Her min got her wene
Ser milok şûşe ne
Malbavok file ne

# Germa havînê




Germa havînê ez helandim
Îro du roj li benda te me
Birca bilind heya jorîn
Keçka xweşik çima nayê

Heseno kî ji te re go were
Ji hewşa bircê derkev dere
Go êvarî saet çara
Li nava reza kî bû bi te re


Xweşikê eger te diye
Tu zanî ew qîza kê ye
Ezê bêm dest û lingê te
Ramîsim deqa li eniyê

Heseno ev çi oyîn e
Tu li serê min dertîne
Min herd û çavê xwe dîto
Bi çavê tu vê digerîne

Xweşikê ev çi gotin in
Milk î tur û gune neke
Qîza cîrana me bû do
Bi çavê silav li me kir

Heseno te ez xepandim
Min go tu xortek bi nav î
Eger ênola te bikim
Li kuça bavê min zaf î

# Gewherê







Erê le min h'eram bî, her wek şerab le şêxan
Hîç reh'mî xudat le dilê niye, kafirey bê dîn û îman
Eger qewlim dedeyêy, be rastî bom were kewan
Dena bew nei'lete bî, ke xuda kirdî lew şeytan
Gewherê gewherê de bimkûjin her ba bimrim
Besim tane lê bide, bergey teşer nagirim
Rojî bîst û dû caran, min be ber dû çawit demirim

Derdit le malim kalê, keziyet bendî reşmalê
Sê gez be gezî kurdî, baskim le gerdinit alê
De biro babit razî bike, daykit bo min hîç nalê
Kiçê pêm e'ybe û pêm îrade, le bot bikem nale û nalê
Gewherê gewherê xerîbim de ba bimirim
Besim tane lê bide, bergey teşer nagirim

E'ntîke û zêde lawe, dûre lêy bikem silawe
Singit penîrî kurdî, zulfit giyabend û xawe
Kelekey çepim kune, lêw al be mist lêy dawe
Eger nabî be yarim, xudah'fîz mal awa
Gewherê...
Besim...

Singit karxaney miyanduwawê, dinyam be bê to nawê
Sêber le min h'eram bê, ba bisûtêm leber tawê
Beheştî baxîm denê wella, min be bê balay tom nawê
Awirî le min berdawe, bejinî şetilî lawlawê
Gewherê...
Besim...

# Gewherê




Weku kwêstanî Bêstûn, dayme serim xal xale
Tee'cib le yar demênim derh'eq min meylî keme
Yarim îcazem bida maç kem ew lêw û deme
Gewherê, malim Gewherê
Sîngit h'ewzî Kewserê
Xoştir le awî Zim-zim
H'ecacî deçine serê
Daway dû maçim lê kird
Nizîk bû (wexit bû) abrûm berê
Weku kwêsatnî bêstûn, ewa serim xalxale
Le çerxî tawî gerdûn, dilim deka sikala
E'şiqî qed û balay bûm, xwên şîrîn û çawî kale
Xo min kwêstanî Lend nîm, bênim Karg û Kemaye
Seyir û sefaye, sazkem, le bo çawî Leylaye
Le wetey ew jinem dîwe, ciwane qet kesim webîr naye
Gewherê malim Gewherê
Sînet h'ewzî Kewserê
Legel yar qewilman bestuwe
Behar biçîne kaniye qemterê
Awirit le min berdawe
Xwênit mijîm esmerê
Xo min kwêstanî Lend nîm, bênim karg û rêwasan
Hîç min karxanecar nîm damdenên bo qise û basan
A'şiqî dû çawî ciwanim deyrifênim suk û asan

Soranî / Gelêrî

# Gewrê lê




Gewrê lê bi gewrê lê gewrê lê bi gewrê lê
Gewrê lê bi gewrê lê gewrê lê bi çavreşê
Gewrê bi hafa Mûşê ket gewrê lê bi gewrê lê
Gewrê bi hafa Mûşê ket gewrê lê bi çavreşê
Ji xelqê tirê em dawet
Ji xelqê tirê em dawet
Kes nizane em qismet
Kes nizane em qismet

Herêma Amedê

Gewrê lê bi gewrê lê gewrê lê bi gewrê lê
Gewrê lê bi gewrê lê gewrê lê bi çavreşê
Gewrê sitêrka sibêwo
Gewrê sitêrka sibêwo
Şewqa xwe dabû dinêwo
Şewqa xwi dabû dinêwo

Gewrê lê
Gewrê lê
Gewrê sitêrka palanê
Gewrê sitêrka palanê
Şewqa xwe dabû meydanê
Şewqa xwi dabû meydanê

Gewrê lê
Gewrê lê
Gewrê sitêrka xurbetê
Gewrê sitêrka xurbetê
Şewqa xwe dabû umetê gewrê lê bi gewrê lê
Şewqa xwe dabû umetê gewrê lê bi çavreşê

# Gijlokê




Herêma Serhedê

Yar gijilokê gijilokê
Yar gijilokê baranê

Yar gijilokêm bihar e
Yar gijilokê baran e
Yar gijilokêm bihar e
Can gijilokêm bihar e

Dest qotî li beigê dara
Yar gijilokê baran e
Xew xweş e ligel yara
Yar gijilokê baran e

Yar gijilokê payîz e
Yar gijilokê'w baran e
Can gijilokêm payîz e
Yar gijilokê baran e

Te qotî ji beigê gûze
Yar gijilokê'w baran e
Zef xweş e li gel qîz e
Can gijilokê'w baran e

Yar gijilokêm bihar e
Yar gijilokê baran e
Yar gijilokêm bihar e
Can gijilokêm bihar e

# Girtimit bestimit




Soranî / Gelêrî

Ca le ber seyzadey şal şîn raste qewil û peymanî
Le ber seyzadey şal şîn raste qewil û peymanî
Tundî de baweş degirim dey mijim ser kulmanî
Girtimit, bestimit, kûştimit sûtandimit
Be zîndey çawekanit le jêr xak çeqandimit

Wekî le min qewmawe rebbî le kes neqewmê
Le wilatî mukiryanê kes niye hawarî bermê
Bab û daykî lêw alê tûren namdenê nermê
Girtimit...
Be...

Deléy swêndêkit bo bixom swênd be mizgewtî wawan
Ke lêre dujminim bin ta sehend û solawan
şerte destberdarit nîm şert bê be şertî piyawan
Girtimit...
Be...

Hem narince û hem sêwe hawar ya şêxî kirêwe
Xem û meraqî yarê îşkî kirdûm be pêwe
Yarebbî nebarê baran taqe gulekem be rêwe
Girtimit...
Be...
Nexoş û perêşanim aramim niye satê
Seferêkim kewte ber rêye hat û nehatê
Muntezîrim le rêye ba karwan bê û bimgatê
Girtimit...
Be...

Ciwane zulfî çîn çînî egirîcey têkelawî
Naze şaney kirduwe eminî xistote dawî
Her min wam lê neqewma a'lem hemûy tewawî
Girtimit..
Be..

Zulfî yarî nazenîn tewawî awatime
Wextî ew guley debînim min xoştirîn katime
Tîrî le dil dawim be mijolanî Fatime
Girtimit...
Be...

Yekcarî mestî kirdum ew dû çawî xumarî
Diyare gelêk diruste yarim qewil û qerarî
Min be pencanim deyguşim memkî wêney henarî
Girtimit, bestimit, kûştimit sûtandimit
Be sîley çawekanit le jêr xak çeqandimit

# Giryanim dê






Erê wey giryan giryan giryanim dê
Bew çawane giryanim dê

Kes nazanê hey be kê bilêm
E'şqî şemamey baxelim
Swêndî dawim rastî nelêm
Erê...
Bew...

E'qil û dîn derçuwe le destim
Mubtelay dû çawî mestim
To bitî û min detperistim
Erê...
Bew..

Dey çawim hey be çawe kaleket
Lêwim ca be lêwe aleket
Nawêrim bême maleket
Maç kem jêrtoy desmaleket
Erê...
Bew...

Wek ew sal le min qewmawe
Xem le cuwe neşêwawe
Ca roh'î birdûm qelbim mawe
Erê...
Bew...

# Giyan û giyan




Heta bimênim bo to demênim
Zekatî maçan giyan û giyan û giyan
Le toy destênim
To xot deyzanî giyan û giyan û giyan
Min qerizdarî tom ax wey qerizdarî tom
Le derdî î'şq û le tawî dûrî
Herçendî deykem giyan û giyan û giyan nabim seburî
Ax wey nabim sebûrî
Azîz bîstûme zor pereşanî
Be şew û be roj giyan û iyan û giyan wey çaw be giryanî
Ax wey çaw be giryanî

Heta bimêni minetbarî tom
To xot deyzanî giyan û giyan û giyan wey qerizdarî tom
Ax wey qerizdarî tom
Tenya mawmewe nexoş û rencûr
Le dost û refîq giyan û giyan û giyan wey kewtûmewe dûr
Ax wey kewtumewe dûr
Sa bes bo reqîb şîn û giryan ke
Carêkîş dostî giyan û giyan û giyan wey qedîmît yad ke
Ax wey qedîmît yad ke

# Giyan û giyan




Ba biçîne ser weys weysî xomane
pirsiyarî lê keyin xetay kemmane

Giyan giyan û giyan giyan azîzekem
nîwey şew rabûrd hawar întîzar ekem

Ger xetay min bu bimke har û şêt
ger xetay to bu xêr neyete rêt

Giyan giyan u...


Ba biçîne ser weys bo tobekarî
tobe le gişt şitê nel le dildarî

Giyan giyan u...

Ya h'ezretî weys mal we berzewe
hatime tewafit wetêw lerzewe

Giyan giyan ...

# Giyane besteyî




Giyane besyetî, giyane besyetî
Giyane besyetî , leylê besyetî
Tu xwa besyetî, derd u meynetî
Hawar, giyane besyetî

Her hênde ebê tuşîu negbetî
Her hênde ebê leylê tuşîu negbetî
Qinyatim tenha jehrawî petî
Giyane besyetî

Le neh´sî çare u bextî gumrahim
Hanam birawe leylê le nal u ahim
Tu xwa besyetî

Ecel qullapî gîr kird le cergim
Pêşanim eda nîşaney mergim
Tu xwa besyetî

Giyane besyetî, giyane besyetî
Giyane besyetî, tu xwa besyetî
Tuşî u negbetî giyane besyetî

Soranî, çavkanî Ali Merdan

# Gowend e




Gowend e, zemawend e, dilim bende, bew dem qende way way
Ser û roh' danane, cêy rawgey bazane, meydanî şêrane
Bew tîrî bê amanî to dil bote nîşane
Esîrî dawî zulfî tom derdî bêdermane

Xizmîne xemî jîne, yar h'ezîne, dil xemîne way way
Yarim xwên şîrîne, kotirey xal nexşîne
Gulî new perjîne, bê to h'eyatim bo çiye, çi jiyan û çi jîne
Ew xwêney min h'elalit bê şahîd bin xizmîne...

Xembarim, girftarim, bêqerarim, birîndarim way way
Min bo to xemgînim, yarî xwên şirînim, her toy mayey jînim..
Çî mawe bot fîdakem, ser ta be pay jînim
Ta key cewirî dil bikêşim, birêjim esrînim

Şêwawim, peşokawim, dil birawim, nûrî çawim way way
Qet naçî le bîrim, le ser to esîrim, pê bendî zincîrim
Eger satêk le yadim çî lêm heram bê şîrim
Le ser to demrişt, esîrim, bew kote bew kote yexsîrim

Min denalim, bo Kejalim, rû be xalim, zor şelalim way way
Kejalî çaw ciwanim, bo to perêşanim, fewta roh' û giyanim...
Be destî xot deway bike derdî bê dermanim...
Fîda bû le rêy î'şiqî to şeş dangî îmanim
Be destî xot deway bike derdî bê dermanim...

# Gozelê gozelê




Gozelê gozelê lê gozelê gozelê lê
Gozelê gozelê lê maliya min gozelê lê

Gundê me bi derge ye gozelê gozelê lê
Ew bextê min û te ye maliya min gozelê lê

Gozelê anî û anî gozelê gozelê lê
Gozelê sînek anî maliya min gozelê lê

Gozela min azîz î gozelê gozelê lê
Bextê mera tu qîz î maliya min gozelê lê

Ser xizima ya bi poz î gozelê gozelê lê
Ser xizima ya bi poz î maliya min gozelê lê

Şeroyê Biro, radyoya Erîvanê

# Gul behbûnê




Talan e taziyan e şahiyan e gûlbehbûnê
Talan çûbû evrazî
Talan çûbû evrazî
Çend lawên xencer tazî
Çend lawên xencer tazî

Eşîra tey şêlazî
Eşîra tey şêlazî
Talan çûbû elmakî
Talan çûbû elmakî

Kûr biçûk e li ber makî
Kûr biçûk e li ber makî
Derdê kurê ji mêlakî (kezeb)
Derdê kurê ji mêlakî (kezeb)
Talan çûbû nîşuvi
Talan çûbû nîşuvi
Çend lawên xencer zîv î
Çend lawên xencer zîv î
Eşîra tey derşûvî
Eşîra tey derşûvî
Merge xwehê berkevê
Merge xwehê berkevê
Keç kulîlka nû mû wê
Keç kulîlka nû mû wê
Derdê kurê ji xesûwê
Derdê kurê ji xesûwê
Keç berxika li ber mokê
Keç berxika li ber mokê

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Gul ximdan




Gulximdan e, ximdan e
Kafirbavê rimdan e

Gulximdan ez im ez im
Gulximdan e ximdan e
Dendikê bi çerez im
Kafirbavê rimdan e
Dermanê dilka ez im
Gulximdan e ximdan e
Dermanê dilka ez im
Kafirbavê rimdan e

Gulximdan e ximdan e
Kafirbavê rimdan e

Gulximdan îşev îşev
Gulximdan e ximdan e
Bang li me da dîkê nîvşev
Kafirbavê rimdan e
Şev li me bû sed û sî şev
Gulximdan e ximdan e
Şev li me bû sed û sî şev
Kafirbavê rimdan e

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Gula zer




Gulazer ha gulazer gulazer gerdena zer
Gulazer ha gulazer gulazer çiçeka zer
Tu bidî xatrê pêxember tu ji huryokê derê der
Tu bidî xatrê pêxember tu ji huryokê derê der
Ji te ra bêjim yek xeber ji te ra bêjim du xeber
Ji te ra bêjim yek xeber ji te ra bêjim du xeber

Gulazer gul çinî bû gerdena zer gul çinî bû
Gulazer gul çinî bû çiçeka zer gul çinî bû
Destî bi destî danî bû destî bi destî danî bû
Heta me karê xwe kir ezeba jin hanî bû

Gulazer ha hulazer gulazer gerdena zer
Gulazer ha gulazer gulazer çiçeka zer
Tu
Tu
Ji te ra
Ji te ra

Gulazer gul quraftî gerdena zer gul quraftî
Gulazer gul quraftî çiçeka zer gul quraftî
Destî bi destî nixaftî destî bi destî nixaftî
Heta me karê xwi kir ezeba jin revandî

Gulazer ha gulazer
Gulazer ha gulazer
Tu
Tu
Ji te ra
Ji te ra bêjim yek xeber, ji te ra bêjim du xeber

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Gula zer




Gula zer gula zer gula zer gula zer
Bide xatirê pêxember gula zer gula zer
Ji govendê were der gula zer gula zer
Ha bi gula zer gula zer ha bi gula zer
Gula zer îro du ro gula zer gula zer
Aşiqê te bûm kuro gula zer gula zer
Ha bi gula zer gula zer ha bi gula zer

Gula zer îro çar e gula zer gula zer
Berfê dabû zinar e gula zer gula zer
Deweta me li dar e gula zer gula zer
Ha bi gula zer gula zer ha bi gula zer

Gula zer îro du ro gula zer gula zer
Aşiqê teda bûm kuro gula zer gula zer
Ha bi gula zer gula zer ha bi gula zer

Gula zer ser kelekê gula zer gula zer
Min dîbû xweş werdekê gula zer gula zer
Radimîsim ta neynokê gula zer gula zer
Ha bi gula zer gula zer ha bi gula zer

Gula zer îro du…

Gula zer li pencerê gula zer gula zer
Xurmîn kete kemberê gula zer gula zer
Kerem ke were vêderê gula zer gula zer
Ha bi gula zer gula zer ha bi gula zer

Gula zer îro du...

Radyoya Êrivanê

# Gula zer




Gulazer Gulazer Gulazer
Tû bidi xatrê pexember
Gulazer Gulazer
Ji govendê derkevi der
Gulazer Gulazer ax Gulazer
Gulazer iro duro Gulazer Gulazer
Aşiqê teme kûru Gulazer Gulazer
Ax Gulazer Gulazer ax Gulazer

Gulazer iro car e Gulazer Gulazer
Berfê daye zinar e Gulazer Gulazer
Daveta me li dar e Gulazer Gulazer
Daweta me li dar e Gulazer Gulazer
Gulazer ax Gulazer Gulazer ax Gulazer

Gulazer li ber kelek e Gulazer Gulazer
Xû dabu xweş werdek e Gulazer Gulazer
Xû dabu xweş werdek e Gulazer Gulazer
Gulazer ax Gulazer Gulazer ax Gulazer
Gulazer iro duro Gulazer Gulazer
Aşiqê teme kûro Gulazer Gulazer
Gulazer ax Gulazer Gulazer ax Gulazer

# Gulale sure




Giyane le e´şqit sûta henawim
Dildarî tome min çarem çiye
Gulale surey ser kulmî yarim
Wa geşayewe bo h´alî zarim

Cemîley çaw ciwan toy hêzî giyanim
Tu xwa were lam zor perêşanim
Gulale...
Wa...

Le dinya her toy jiyan u xoşîm
Dilim meşkêne dil pir le janim
Gulale...
Wa...

Cemîley çaw mest şazde sal niye
Le ewîndarî h´alman h´al niye
Gulale...
Wa...

Balaket berze be qed çinarê
Kê toy a´ciz kird berdî lê barê
Gulale...
Wa...

Soranî, çavkanî : Tahir Tawfiq

# Gulê gulê




Herêm Xerpêt/Depê

Gulê Gulê delalê Gulê
Weke ava zelalê Gulê
Ez qurbana bejna te Gulê
Bêje tu qîza kêyi Gulê

Gulê diçe guniya Gulê
Digere li ber ciya Gulê
Ez heyrana bejna te Gulê
Tu delala gundiya Gulê

Gulê diçe sosina Gulê
Der dixîne bazina Gulê
Ez qurbana bazina Gulê
Ketiye destê nezana Gulê

# Gulê hatî




Gulê hatî refek çuko
Wî Gulê yo yo yo yo yo yo
Wî Gulê hatî refek çuko
Lê zerî ez mêvanê te me
Çûkan girtî sûk bi sûko
Wî Gulê yo yo yo yo yo yo
Çûkan girtî sûk bi sûko
Lê zerî ez mêvanê te me
Çibikim dawet bê bûko
Wî Gulê yo yo yo yo yo yo
Çibikim dawet bê bûko
Lê zerî ez mêvanê te me

Gulê hatî refek qazo
Wî Gulê yo yo yo yo yo yo
Wî gulê hatî refek qazo
Lê zerî ez mêvanê te me
Qazan girtî saz bi sazo
Wî Gulê yo yo yo yo yo yo
Qazan girtî saz bi sazo
Lê zerî ez mêvanê te me
Çibikim dawet bê sazo
Wî Gulê yo yo yo yo yo yo
Çibikim dawet bê sazo
Lê zerî ez mêvanê te me

Gulê hatî refek beto
Wî Gulê yo yo yo yo yo yo
Wî gulê hatî refek beto
Lê zerî ez mêvanê te me
Betan girtî xet bi xeto
Wî Gulê yo yo yo yo yo yo
Betan girtî xet bi xeto
Lê zerî ez mêvanê te me
Gulê rabe li me daweto
Wî Gulê yo yo yo yo yo yo
Gulê rabe li me daweto
Lê zerî ez mêvanê te me

Herêma Serhedê

# Gulê heyranê




Gulê hey narê bi narê narê
Dînê hey narê bi narê narê
Gulê min çavê di belek xwarê
Dînê min çavê di belek xwarê
Gulê sêva sur li guliya darê
Dînê sêva sur li guliya darê
Gulê bi devê min were xwarê
Dînê bi devê min were xwarê
Lê gulê tu qismeta vê carê
Lê dînê tu qismeta vê carê
Gulê hey narê bi narê narê
Dînê hey narê bi narê narê
Gulê min çavê di belek xwarê
Dînê min çavê di belek xwarê
Gulê Gultepe li cîkî dûz e
Dînê Gultepe li cîkî dûz e
Gulê şîr meyand bûye bûz e
Dînê şîr meyand bûye bûz e
Gulê şev dost e bi ro baldûz e
Dînê şev dost e bi ro baldûz e
Gulê hey narê bi narê narê
Dînê hey narê bi narê narê
Gulê min çavê di belek xwarê
Dînê min çavê di belek xwarê

# Gulê hoy nar

Moderato




Herêma Botan

Gulê hoy nar hoy nar hoy narê,
Dînê hoy nar hoy nar hoy narê
Gulê min çavêd belek xwarê
Dînê min çavêd belek xwarê
Gulê ser sinyoka savarê
Dînê ser sinyoka savarê


Gulê min bacê de mêze kir
Dînê min pence rê mêze kir
Gulê du zeriyan av li xwe kir
Dinê du zeriyan av li xwe kir
Gulê ya min bû'y Xwedê nekir
Dînê ya min bû'y Xwedê nekir

Gulê min dîbû refek bet e
Dînê min dîbû refek bet e
Gulê firiyan xet bi xet e
Dînê firiyan xet bi xet e
Gulê ava Şamê şerbet e
Dînê memkê keçka qudret e

Gulê Gultepe gundê me ye
Gulê hoy nar hoy nar hoy narê
Gulê kaniya ortê lûle ye
Dînê min çavêd belek xwarê
Gulê lûle ji lûlê zêde ye
Gulê hoy nar hoy nar hoy narê

Gulê Gultepe cîkî dûz e
Gulê hoy nar hoy nar hoy narê
Gulê tajingê kûze kûz e
Gulê hoy nar hoy nar hoy narê
Gulê yek yar e yek baldûz e
Gulê min çavêd belek xwarê

# Gulê hoy nar






Gulê hoy nar hoy nar hoy narê
Dînê hoy nar hoy nar hoy narê
Gulê Gultepe gundê me ye
Dînê Gultepe gundê me ye
Gulê kanîkî tê da heye
Dînê kanîkî tê da heye
Gulê çirka navê lûle ye
Dînê çlrka ortê lûle ye

Gulê ewrekî reş û tar î
Dînê ewrekî reş û tar î
Gulê ji êvar da baran barî
Dînê'j êvar da baran barî
Gulê dêla dê kir guhdarî
Dînê dêla dê kir guhdarî

Gulê deynê min li bavê te ye
Dînê deynê min li bavê te ye
Gulê ji milyonê zêde ye
Dînê ji milyonê zêde ye
Gulê ji bo xatrê çavê te ye
Dînê'j bo xatrê çavê te ye

Gulê Gultepe gundê me ye
Dînê Gultepe gundê me ye
Gulê her roj dawet tê heye
Dînê her roj dawet tê heye
Gulê sibê a min û te ye
Dînê sibê ya min û te ye
Gulê hoy nar hoy nar hoy narê
Dînê hoy nar hoy nar hoy narê

# Gulê malim gulê






Gulê malim gulê serwet û malim gulê
kiçê leçî torawî de were were pêm bilê

Erê çinar û lawlaw giyane seryan nemame
kiçê min bo kê degirîm giyane kê be temame

Gulê malim gulê...

Erê çirakey maltan giyane bo kujanewe
kiçê destit bo hêna giyane rûy mîwanewe

Gulê malîm gulê...

# Gulgulî




Gulgulî hab gulgulî gulgulî
Kesk û sor da xemilî gulgulî
Dinya kin û kemilî gulgulî

Keçkê Kurda delal in gulgulî
Dengbê jin deng zelal in gulgulî
Li ser welat dinal in gulgulî

Xortê Kurda xalis in gulgulî
Tev egit û fêrisin gulgulî
Ew ji kesî natirsin gulgulî

Gulgulî gulistan e gulgulî
Havin e zivistan e gulgulî
Kêf xweş e li Kurdistanê gulgulî

Heremen Amed, Botan û Behdînan

# Gulî Mihabadî




Xozgem bew rojey tom dî hatî û be naz raburdî
Hêlanet le dilim kird ey gulî mihabadî

Minim mecnunim minim dêwane
To şemî meclîs minim perwane
Bejn û balat şox û şeng ey gulî mihabadî


To gulî kurdistanî to estêrey beyanî
Fîday xakî berî pêt bo be derdim nazanî
Ew lêwey alit ew zulfey xawit ew kulmey nermit ew xaley ciwanî
Mestî kirdûm be bê mey kîjî mihabadî

Minim mecnunim...

Bîr û hoşim herçî bê bo tarîfî balat bê
Ey xatiratî ciwanim jînim bo to qet nabê
Toy awatî min herdû çawî min to tenya gulî kurdistanî min
Ey kîjî mihabadî

Minim mecnunim...

# Gulîzer




Dibêjin gul nexweş e wey gulîzer
Dibêjin gul nexweş e wey gul ez bimrim
Rebenê bi bextê reş e
Wey gul wey gul wey gulîzer
Derdêm yek bû bûn e sed hezar
Ez ji vî canê xwe bûme bêzar
Wax derdêm yek bû te kir sed hezar
Ez ji vî canê xwe bûme bêzar

Gula min gula zer e wey gulîzerê
Gula min gula zer e wey gulîzer
Ber çavêm here û were
Wey gul wey gul wey gulîzer
Derdêm yek bû bûne sed hezar
Ez ji vî canê xwe bûme bêzar
Derdêm yek bû bûne sed hezar
Ez ji vî canê xwe bûme bêzar

Gula min bê evîn e wey gulevînê
Ez bûm Mem ew bû Zînê
Wey gul wey gul wey gulîzer
Derdêm yek bû bûne sed hezar
Ez ji vî canê xwe bûme bêzar
Wax derdêm yek bû te kir sed hezar
Ez ji vî canê xwe bûme bêzar

Herêmên Riha, Botan û Behdînan

# Gulîzer ay Gulîzer




Gulîzer ay gulîzer min xulama guliya zer
Gulîzer ay gulîzer min xulama guliya zer
Çavêm xala gerdenê bedewê gula dinê
Sûret sorê hinarê sûret sorê hinarê

Gulê gulê gulanê min çavê reş belek xwarê
Gulê gulê gulanê min çavê reş belek xwarê
Kerem ke were malê rûnê li ser balgînê
Ez heyrana bejin balê ez heyrana bejin balê

Diçim li vir namînim ramûsanek bide min
Diçim li vir namînim ramûsanek bide min
Bes e derdan helînim ez dil û eşq rê kevim
Bes e derdan helînim ez dil û eşq rê kevim

Radyoya Êrîvanê

# Gulîşan




Gulîşan Gulîşan neke halim perîşan
Gulîşan esmerxan neke halim perîşan
Were ez te biramûsim
Desmalim bo te nîşan
Heke ez çûm xurmetê
Wê bo te bibit nîşan

Êvar e buhar e sihê girtî zinar e
Êvar e buhar e qîza girtî dîlan e
Qîzik li gundê me neman
Ji xeyrî me dost û yar e
Zerî li gundê me qet neman
Ji xeyrî me dost û yaran

Ez bi serê teb kim
Êvar e êvar egîdî e niza bo çî
Rebeno roj ti nemaye êvara me hewilî
Kuro dîno ez aşiq bîm
Ez mehşûq bîm zemanê xwe de
Di ber têlê re borîm
Min divê di gel qîzikê biaxivim
Ji êşiqê wê bî min dî rebeno têl fitilî ox
Heçî gotinekê yan ştexalîkê yan xeberkê biaxivê
Ez bibim kulekî penceşêrê

Radyoya Bexayê, çavkanî : Hesenê Cizrawî

Lolo lo lo bikevin ser wî dilî
Ax ay li min bêlome bê
Bi serê me hemiya hatibî
Wiha dibê

Bejina te Gulîşan mîna
Tayka vê gulê
Bejina te Esmer Esmerxan
Mîna tayka vê gulê
Çavdêrê qîz û xortan
Berdane li serê milê
Heçî Gulîşan nedît
Jê tê bêhna vê gulê
Heçî Esmerxan nedît
Jê tê bêhna vê gulê

Gulîşan Gulîşan neke halim perîşan
Gulîşan Gulîşan esmer halim perîşan
Were ez te biramûsim
Desmalim bo te nîşan
Heke ez çûm xurbetê
Wê bo te bibit nîşan

# Gulşêna min




Gulşêna min şêna min
Gulşêna min çavê min
Gulşêna min şêna min
Gulşêna min rihê min

Gulşêna min wa hatî
Gulşêna min şêna min
Gulşêna min wa hatî
Gulşêna min emrê min

Gulşêna min…

Te li kofî barê gakî
Gulşêna min şêna min
Te li kofî barê gakî
Gulşêna min çavê min

Gulşêna min sîpikî
Gulşêna min şêna min
Gulşêna min sîpikî
Gulşêna min emrê min

Gulşêna min…

De li guharê gupikî
Gulşêna min şêna min
De li guharê gupikî
Gulşêna min emrê min

Gulşêna min…

Radyoya Êrîvanê


# Gulşênî




Gul şênî şênî şênî
Gul şêniya min mala min
Gul şênîka Ertoşî
Gul şêniya min mala min
Te li serî qerepoşî
Gul şêniya min mala min
Ser memkan nafiroşî
Gul şêniya min mala min
Gul şênîka Tiyarî
Gul şêniya min mala min
Te li serî fêsî tarî
Gul şêniya min mala min
Sed heyfe tû bê yarî
Gul şêniya min mala min
Keremke were xênî
Gul şêniya min mala min

Radyoya Êrivanê

# Ha bêwo




Ha bêwo bêwo bêwo
Xwedêwo baran bêwo
Bidana bin konêwo
Her konek qîzek têwo
Her qîzek paçek lêwo
Her paçek cêbek lêwo
Her cêbek sêvek têwo
Her sêvek gezek lêwo

Herêma Omeriya

# Ha bi çend e




Ha bi çend e çend e çend e huvdew hujdew nozdew bîst
Jina ewkî çi rind e
Jina keko çi rind e
Bêjinga nava gund e
Keko qurban tu berde
Yeka çavreş di ser de

Ha bi çend e çend e çend e huvdew hujdew nozdew bîst
Ew kî keyayê gund e
Keko keyayê gund e
Jina keko çi rind e
Serê me ji ber bilind e
Ha bi çend e çend e çend e huvdew hujdew nozdew bîst

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Ha bi daran e




Ha bi daran e daran e
Cindî cindî bêzar e
Ha bi daran e daran e
Min çavên belek xwarê

Lê werî li ber malan e
Cindî cindî bêzar e
Lê werî li ber malan e
Min çavên belek xwarê

Ha bi daranê zebeşa
Cindî cindî bêzar e
Ha bi daranê zebeşa
Min çavên belek xwarê

Lê werî bi kele reşa
Cindî cindî bêzar e
Lê werî bi kele reşa
Min çavên belek xwarê

Ha bi daranê gûzan e
Cindî cindî bêzar e
Ha bi daranê gûzan e
Min çavên belek xwarê

Lê werî li dev gûzan e
Cindî cindî bêzar e
Lê werî li dev gûzan e
Min çavên belek xwarê

Ha bi daranê xeyala
Cindî cindî bêzar e
Ha bi daranê xeyala
Min çavên belek xwarê

Lê werî li dev beyara
Cindî cindî bêzar e
Lê werî li dev beyara
Min çavên belek xwarê

# Ha çemo çemo




Ha çemo çemo çemê Mûsilê
Heremo çemo were dînê çemê Mûsilê

Zeriyê me meşiyan çûn serê milê
Zeriyê me meşiyan were dînê çûn serê milê

Ha çemo çemo çemê Karayê
Heremo çemo were dînê çemê Karayê

Zeriyê me meşiyan çûn ser kaniyê
Zeriyê me meşiyan were dînê çûn ser kaniyê

Kê ez helandim qîzka axayê
Kê ez helandim were dînê qîzka axayê

Ha çemo çemo çemê Bitlîsê
Zeriyê me meşiyan were dînê çûne miclîsê

# Ha çi kir çi kir




Ha çi kir çi kir çi kir lê binêrin baranê çi kir
Ha çi kir çi kir çi kir lê binêrin xunavê çi kir

Barana par payîzê lê binêrin baranê çi kir
Xunava par payîzê lê binêrin xunavê çi kir
Weşando pelê gûzê lê binêrin baranê çi kir
Weşando pelê gûzê lê binêrin xunavê çi kir
Şil kiro xemla qîzê lê binêrin baranê çi kir
Şil kiro xemla qîzê lê binêrin xunavê çi kir

Ha çi kir çi kir çi kir lê binêrin baranê çi kir
Ha çi kir çi kir çi kir lê binêrin xunavê çi kir

Barana par biharê lê binêrin baranê çi kir
Xunava par biharê lê binêrin xunavê çi kir
Weşando pelê darê lê binêrin baranê çi kir
Weşando pelê darê lê binêrin xunavê çi kir
Şil kiro xemla yarê lê binêrin baranê çi kir
Şil kiro xemla yarê lê binêrin xunavê çi kir

# Ha der bû




Ha der bû, der bû, der bû towû hay lo lilo lo lilo
Ha der bû, der bû, der bû lê hay lê lilê lê lilê
Karwanê Hênê der bû towû hay lo lilo lilo
Karwanê Hênê der bû lê hay lê lilê lê lilê
Çil hêstir û çil kar bû towû hay lo lilo lo lilo
Çil hêstir û çil kar bû lê hay lê lilê lê lilê
Hêstira pêşî bi samar bû towû haylo lilo lo lilo
Hêstira pêşî bi samar bû lê hayl ê lilê lê lilê
Şemla gewra min li ser bû towû haylo lilo lo lilo
Şemla gewra min li sar bû lê haylê lilê lê lilê

Ha banî, banî, banî towû hay lo lilo lo lilo
Ha banî, banî, banî lê hay lê lilê lê lilê
Malê me li mezrê danî towû hay lo lilo lo lilo
Malê me li mezrê danî lê hay lê lilê lê lilê
Mezir teng bû hilnanî towû hay lo lilo lo lilo
Mezir teng bû hilnanî lê hay lê lilê lê lilê

Halîs e, lîs e, lîs e towû hay lo lilo lo lilo
Halîs e, lîs e, lîs e lê hay lê lilê lê lilê
Kotiyê mêrê te pîs e towû hay lo lilo lo lilo
Kotiyê mêrê te pîs e lê hay lê lilê lê lilê
Pirça serî bi werîs e towû hay lo lilo lo lilo
Pirça serî bi werîs e lê hay lê lilê lê lilê
Bi tûtû ra diçe lîse towû hay lo lilo lo lilo
Bi tûtû ra diçe lîsa lê hay lê lilê lê lilê

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Ha gulê ha gulê




Gulê ha gulê gulê ha gulê delalê
Gulê ha gulê gulê ha gulê lê canê

Zerî ji mala xana tê
Gulê ha gulê gulê ha gulê delalê
Zerî ji mala xana tê
Gulê ha gulê gulê ha gulê lê canê

Cot siwar (ji) rê da hatine
Gulê ha gulê gulê ha gulê delalê
Cot siwar (ji) rê da hatine
Gulê ha gulê gulê ha gulê lê canê

Agirê bi sor û moro
Gulê ha gulê gulê ha gulê delalê
Agirê bi sor û moro
Gulê ha gulê gulê ha gulê lê canê

Zerî ji hemamê têno
Gulê ha gulê gulê ha gulê delalê
Zerî ji hemamê têno
Gulê ha gulê gulê ha gulê lê canê

Cot siwar (ji) rê da hatine
Gulê ha gulê gulê ha gulê delalê
Cot siwar (ji) rê da hatine
Gulê ha gulê gulê ha gulê lê canê

# Ha ji me wê da




Ha ji me wê da malikê min tê
Ca ji me wê da malikê min tê

Cotê kevoka hevra gotî
Cotê kevoka hevra gotî

Gewr e rind e mêrê wê kotî
Gewr e rind e mêrê wê kotî

Ha ji me wê da tek zinar e
Ca ji me wê da tek zinar e

Cotê kevoka zare zar e
Cotê kevoka zare zar e

Gewr e rind e mêrê kotî ye
Gewr e rind e mêrê kotî ye

Ha ji me wê da tek newal e
Ca ji me wê da tek newal e

Cotê kevoka gale gal e
Cotê kevoka gale gal e

Gewr e rind e mêrê wê kal e
Gewr e rind e mêrê wê kal e

# Ha lawîn




Ha lawîn ha lawîn ha ha lawîn
Ha lawîn ha lawîn heyran lawîn
Kesk û sor û semawîn ha ha lawîn
Kesk û sor û semawîn heyran lawîn
Axura ewkî dirêj e
Axura ewkî dirêj e
Tije ga û gamêş e
Tije ga û gamêş e
Bûkê tê û didoşe
Bûkê tê û didoşe
Sersim lêdxe dirêje
Sersim lêdxe dirêje
Xwesî tê û dibêje ha ha lawîn
Xwesî tê û dibêje heyran lawîn

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Ha lerî





Ha lerî leri lerî tembûra xana li giderî
Ha lerî lerî lerî cil ax û sênî bi lengerî
Mehmûdo tû berber î tembura xana li giderî
Lawiko mehmudo tû berber î cil ax û sêni b lengerî

Erzirom çarde derî tembura xana li giderî
Erzirom çarde derî cil ax û sênî b lengeri
Her derî yek li ber î tembura xana li giderî
Her derî yek li berî cil ax û sênî b lengerî

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Ha Leylo




Ha bi leyo leyo leyo tu malê mi leyan î
Ha bi leyo leyo leyo tu emrê mi seyran î
Ji refa refek çûk e
Ji refa refek çûk e
Firyabû li ser sûk e
Geryabû sûk bi sûk e
Me silav li qîz û bûk e
Me silav li keç û bûk e

Ha bi leyo
Ha bi leyo
Ji refa refek bet e
Ji refa refek bet e
Firyabû li serkê xet e
Geryabû xet bi xet e
Me silav li qîza met e
Me silav li keça met e

Ha leyo
Ha leyo
Ji refa refek qaz e
Ji refa refek qaz e
Firya bû li ser gaz e
Gerya bû gaz bi gaz e
Me silav li xal û xarz e
Me silav li xal û xarz e
Ha leyo leyo leyo tu malê mi leyanî
Ha leyo leyo leyo tu emrê mi seyran î

# Ha li ser me




Ha li ser me, ha li ser me
Sîka darê da li ser me
Berfekî barî çi nerm e
Min ji çavên belek şerm e

Sîka darê dar mezin
Sîka darê dar mezin
Dest hine hine hine
Dest hine heta bazin
Qîz digrî lê'm naxwazin
Keş digrî lê'm naxwazin

Ha li ser me, ha li ser me
Sîka darê da li ser me
Berfekî barî çi nerm e
Min ji çavên belek şerm e

Sîka darê dar piçûk
Sîka darê dar piçûk
Dest hine hine hine
Dest hine heta neynûk
Qîz digrî lê'm nakin bûk
Keç digrî lê'm nakin bûk

Ha li ser me, ha li ser me
Sîka darê da li ser me
Berfekî barî çi nerm e
Min ji çavên belek şerm e

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Ha min dî li bana




Ha min dî li bana bana bana
Ca min dî li bana bana bana

Dilkê min ketiye keçika hana
Ha min dî li bana bana bana

Ha min dî li bana banê mezin
Ca min dî li bana banê mezin

Dest bi hine dest bi hine
Dest bi hine heya bazin

Ha min dî li bana banê biçûk
Ca min dî li bana banê biçûk

Dest bi hine dest bi hine
Dest bi hine heya neynûk


Qîz digerîn keç digerîn
Keç digerîn birine bûk

Ha min dî li bana banê jorîn
Ca min dî li bana banê jorîn

Dest bi hine dest bi hine
Dest bi hine heya jorîn

Ha min dî li bana bana bana
Ca min dî li bana bana bana

# Ha nana





De ha nana ha nana ha nana
De ha nana ha nana ha nana
Rêka li kevrê kelêwo ha nana
Rêka li kevrê kelêwo ca nana
Ew kî ji wê da têwo
Keko ji wê da têwo
Şêla wî ya zavêwo
Şêla wî ya zavêwo

De ha nana
De ha nana
Wez Eyşo me Eyşolî me
Wez Eyşo me Eyşolî me
Berfa bi şev barîme
Berfa bi şev barîme
Ser zimana helîme
Ser zimana helîme

De ha nana
De ha nana
Ava golê cemidî ha nana
Ava golê cemidî
Giyay mêrgê seridî
Giyay mêrgê seridî
Emrê min çûye sedî
Emrê min çûye sedî ca nana
Ecêbê awa nedî ha nana
Ecêbê awa nedî ca nana

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Ha wer lê





Herêma Serhedê

Ha wer lê lê lê lê lê lê lê lê lê
Ha wer lê lê lê lê lê lê çîlê beyazê
Çîlê beyazê lê şûşa Sêwazê
Çîlê beyazê lê şûşa Sêwazê
Meşa werdekê lê gerdena qazê
Meşa werdekê lê rêçûna qazê
Aşvanî hatin lê ji aşê Karazê
Delalî hatin lê ji aşê Karazê
Canûkê xwi avêtin taka perwazê
Delalê xwi avêtin taka perwazê
Mi lawkê xwi naskir li ser rêka gazê
Delalê xwi naskir bû li ser rêka gazê

Hawer
Hawer
Çîlê
Çîlê
Meşa
Meşa
Aşvanî hatin lê ji aşê mûsiya
Canûkê xwi avêtin taka gûniya
Mi lawkê xwi naskir li nava gundiya

Hawer
Çîlê
Meşa
Meşa
Aşvanî hatin lê ji aşê ferhendê
Canûkê xwi avêtin taka perwendê
Mi lawkê xwi naskir li serê govendê
Hawer
Hawer
Çîlê
Çîlê
Meşa
Meşa

# Hacî Meryem




Gulhaw haci Meryem
Erê berkew bêm lawa
Gull hey zami zamim hev zamim
Zamakam kûlyava
Zamakam kûlyava
Seredor
Kura aro ram kewdin hev zalim
Erê hawara qona
Ca daxi daxanim hoo zalim
Erê hawraman cola

Korê im sew tenya bê hew zalim
Erê cestey zebunim
Korê disan serbaz kend hew zalim
Erê diley pir hunnim

Korê xiyalani xam hew zalim
Erê hawirdim berdim
Korê hawar cedeymey hew zalim
Erê hinasey serdim

Sorani / Geleri

# Haro baso




Haro baso lo latin latin
Ebdalo baso lo latin Latin

Gaykan berde lo de biçine cotî
Te li nav şeran lo melkemotî

Haro baso lo xencer bas e
Xencer tûj e lo şûr elmas e

Nêv şeran de lo çendî mêrxwas e (2 caran)

Haro baso lo kurê pirê
Kaxez hato lo ji Cizîrê

Şekir xweş e lo gel hêjîrê (2 caran)


Haro baso lo kurê dayê
Kaxez hato lo ji Bexdayê

Şekir xweş e lo gel helayê
Haro baso lo kurê metê

Kaxez hato lo ji hikmetê
Şekir xweş e lo gel xêvetê

Herêmên Botan û Behdînan, çavkanî : M. Arif Cizrawî

# Ha ji vê têlê




Ha ji vê têlê, çû ji vê têlê delîlo lolo lolo lolo
Ha ji vê têlê, çû ji vê têlê siviko ez mêvanê te me

Ha ji vê têlê lê têla mezin delîlo lolo lolo lolo
Ha ji vê têlê, lê têla mezin siviko ez mêvanê te me
Dest hine kin heya bazin delîlo lolo lolo lolo
Dest hine kin lê heya bazin siviko ez mêvanê te me

Ha ji vê têlê lê têla piçûk delîlo lolo lolo lolo
Ha ji vê têlê lê têla piçûk siviko ez mêvanê te me
Dest hine kin heya neynûk delîlo lolo lolo lolo
Dest hine kin lê heya neynûk siviko ez mêvanê te me

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Hat karwan e




Hat karwan e karwan e Fata Sirmê
Hat karwan e karwan e Fata Sirmê

Hat karwanê Eliyan
Danî biniya gundiyan

Eyşê Fatê helandin
Helal malî helandin
Hat karwanê Emeran
Helal malî Emeran

Danî binya bê(n)deran
Hat karwanî heciyan
Helal malên heciyan
Danîn binya karçiyan (Hûrmî)
Danî binya karçiyan

Heremên Botan û Behdînan, çavkanî : M. Arif Cizrawî

# Hatewe




## HATEWE

Hatewe ba bêtewe naskê le h'emmamewe
Dem we pêkenîn û dest we setil û camewe
Werin cêgay bo daxen deba xew bîbatewe
Erê, ne xuda demkujê, çaw ciwan ne bo xom demirim
Erê çunke xerîbim, ciwanê giyan, kes nagirê qedrim
Hatewe ba bêtewe naskê le naw baxewe
Dem we pêkenîn û dest we gule baxewe
Zu ken cêgay bo daxen beşkim xew bîbatewe
Erê detirsêm bimrim ciwanê giyan le kirmaşanê
Erê qel û dal bimxwa hawar kes pê nezanê
Erê hey bê dad û bê dad ey wey hey awedanî
Erê qebrim helkenin suk biro le rêgay kanî
Delêm beşkim yarim bê ciwanê pêmda birwanê
Erê hey dad û bê dad ciwanê giyan xo min nemawim
Were wek cogeley aw çî bikem xwên dê le çawim

Soranî / Gelerî

# Hatin




Deng ketiye şerxê da
Azaye meşkiyê da
Wek ava erqê da
Cihano win jî yek bin hatin

Ew qam û qenat in
Hewar û firyat in hatin
Hatin hatin hatin

Merdno win jî yek bin hatin
Ew qam û qenat in
Hewar û firyat in hatin
Hatin hatin hatin

Dostiya dijmin qest e
Wey li wî bindest e
Jar û mel û mest e
Cihano win jî yek bin hatin

Win meryê yazîkin
De û terazîk in
Werne zû gazîk in
Cihano win jî yekbin hatin

Qelpê pê peyde kin
Azayê peyde kin
Edlayê peyde kin
Cihano win jî yek bin hatin

Aaramê Tigran, radyoya Êrîvanê

# Hawar Mendo




Her lêxin lêxin lêxin
Hawer mendo win lêxin
Her lêxin lêxin lêxin
Paniyê sola li erdê xin

Îşev şeva baranê
Hawer mendo win lêxin
Îşev şeva baranê
Paniyê sola li erdê xin

Govend geriya li eywanê
Hawer mendo win lêxin
Govend geriya li eywanê
Paniyê sola li erdê xin

Vir da çûme govendê
Hawer mendo win lêxin
Ketime milê siltanê
Paniyê sola li erdê xin

Her lêxin lêxin lêxin
Hawer mendo win lêxin
Her lêxin lêxin lêxin
Paniyê sola li erdê xin

Îşev şeva payizê
Hawer mendo win lêxin
Îşev şeva payizê
Paniyê sola li erdê xin

Govend gerya li duzê
Hawer mendo win lêxin
Hawer mendo win lêxin
Paniyê sola li erdê xin

Vir da çûme govendê
Hawer mendo win lêxin
Ketime milê wê qîzê
Paniyê sola li erdê xin

Her lêxin lêxin lêxin
Hawer mendo win lêxin
Her lêxin lêxin lêxin
Paniyê sola li erdê xin

Îşev şeva berfêyo
Hawer mendo win lêxin
Îşev şeva berfêyo
Paniyê sola li erdê xin

Govend gerya li hewşêyo
Hawer mendo win lêxin
Govend gerya li hewşêyo
Paniyê sola li erdê xin

Vir da çûme govendê
Hawer mendo win lêxin
Ketmê milê Eyşêyo
Paniyê sola li erdê xin

Her lêxin lêxin lêxin
Hawer mendo win lêxin
Her lêxin lêxin lêxin
Paniyê sola li erdê xin

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Hawar û sed hawar




Hûre biskê qerefîlê
Caxiya ceman
Şahiya yeman dawetê
Derdo !
Dadga reben heybetê
Hawar û sed hawar

Cîhgê govendê ev e
Derdo !
Elbga me mîştî dew e
Derdo !
Ev dawetê derew e
Hawar û sed hawar

Cîhgê govendê rast e
Derdo
Elbga me miştî mast e
Derdo

Heremen Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

Ev dawetê ji nû rast e
Hawar û sed hawar

Cîhgê govendê kûr e
Derdo
Elbga me miştî şîr e
Derdo
Ev govendê bi teybîr e
Hawar û sed hawar

Himko tu neça daran
Derdo
Dê bi te kevin siwaran
Derdo
Dê ji te vekin gûharan
Hawar û sed hawar

Himko tu neça aşî
Derdo
Dê bi têkevin onbaşî
Derdo
Dê ji te vekin qumaşî
Hawar û sed hawar

# Ha wer lê lê




Ha wer lê lê lê lê lê lê lê lê lê
Ha wer lê lê lê lê lê lê çîlê beyazê
Çîlê beyazê lê şûşa Sêwazê
Çîlê beyazê lê şûşa Sêwazê
Meşa werdekê lê gerdena qazê
Meşa werdekê lê rêçûna qazê
Aşvanî hatin lê ji aşê Karazê
Delalî hatin lê ji aşê Karazê
Canûkê xwi avêtin taka perwazê
Delalê xwi avêtin taka perwazê
Mi lawkê xwi naskir li ser rêka gazê
Delalê xwi naskiribû li ser rêka gazê

Hawer
Hawer
Çîlê
Çîlê
Meşa
Meşa
Aşvanî hatin lê ji aşê mûsiya
Canûkê xwi avêtin taka gûniya
Mi lawkê xwu naskir li nava gundiya

Hawer
Çîlê
Meşa
Meşa
Aşvanî hatin lê ji aşê ferhendê
Canûkê xwi avêtin taka perwendê
Mi lawkê xwi naskir li serê govendê
Hawer
Hawer
Çîlê
Çîlê
Meşa
Meşa

# Hey berde berde




Hay berde berde berde lo lawo destê min berde
Hay berde berde berde kuriko destê min berde
Hay berde berdee berde lo lawo destê min berde
Hay berde berde berde, wêtîmo destê min berde

Çendî kulan tarîn e wey, gund û cîran li ser de
Hay berde berde berde, lo lawo destê min berde
Hay berde berde berde, wêtîmo destê min berde
Min dîbû li gir fitilî, çavreş dî li gir fitilî
Eynik danî xemilî, eynik danî xemilî
Hay berde berde berde, Heseno destê min berde
Havîn e bi kul û derd, Heseno destê min berde

Heremên Botan û Behdînan, çavkanî : M. Arif Cizrawî

# Hay dil dilo lo




Hay dil hay dil dilo lo
Te digo çi mi digo wî lo lo
Waxt derbasbû weka lo lo
Heya ez heliyam lo

Hay dil dilê xortanî
Gelek tiştê xweş dizanî
Midgo qey tu b'zimanî
Le kurmancî nizanî

Hay dil hay dil dile geş
Tedi gelek tiştê xweş
Te yek dikir sed û şeş
Xerakir kezeba reş

Hay dil hay dil dil dêşe
Dil kezebê digivêşe
Kes nizane çi êş e

Aaramê Tigran, radyoya Êrîvanê

# Hay go can






Hay go can canê can hat bejina kaxidê
Hay go can canê can hat bejina kaxidê

Hay go can canê can zeriya min lê peya bû
Hay go can canê can zeriya min lê peya bû

Hay go can canê can min silavek lê dabû
Hay go can canê can min silavek lê dabû

Hay go can canê can xeyîdî xeber neda
Hay go can canê can xeyîdî xeber neda

Hay go can canê can silava min hil neda
Hay go can canê can silava min hil neda

Hay go can canê can hat bejina Bedlîsê
Hay go can canê can hat bejina Bedlîsê

Hay go can canê can çavreşa min peya bû
Hay go can canê can çavreşa min peya bû

Hay go can canê can min silavek lê dabû
Hay go can canê can min silavek lê dabû

Hay go can canê can hildim bibim rewanê
Hay go can canê can hildim bibim rewanê

# Hay meşkê




Hay meşkê meşkê meşkê
Hay meşkê
Hay meşkê meşkê meşkê
Hay jarê
Te ne rûnê ne keşkê
Hay meşkê
Te ne rûnê ne keşkê
Hay jarê

Meşkê dikêmo bin tûyê
Hay meşkê
Giyanê dikêmo bin tûyê
Hay jarê
Avê dikimê ji kaniyê
Hay meşkê
Bo nextê çil keziyê
Hay jarê
Meşkê dikêmo ser banî
Hay meşkê
Giyanê dikêmo ser banî
Hay jarê
Gazî dikime şivanî
Hay meşkê
Tu pezî bîne danî
Hay jarê

Meşka mastê miha tê
Hay meşkê
Giyana mastê miha tê
Hay jarê
Silk û sîr û bacan tê
Hay meşkê
Xwaziya mala du can tê
Hay jarê

Meşka min mastê tîr tê
Hay meşkê
Giyana min mastê tîr tê
Hay jarê
Silk û bacan û sîr tê
Hay meşkê
Xweziya mala du pîr tê
Hay jarê
Hay meşkê meşkê meşkê
Hay meşkê
Hay meşkê meşkê meşkê
Hay jarê

# Hay na nînay




Radyoya Êrîvanê

Hay na nînay ca nîna nînay hay na nînay keçika rind î
Hay na nînay ca nîna nînay ca nînay keçika rind î

Keçika rind î tê ji wî gundî ha nînay keçika rind î
...ca nînay keçika rind î
Tu ji wî gund î tu çiqa rind î ha nînay keçika rind î
...ca nînay keçika rind î

Hay na nînay...

Tu ji wî gund î tu çiqa rind î ha nînay keçika rind î
Tu çiqa rind î pozbilind î ca nînay keçika rind î
Tu bi xwelama tu bi çelengî ha nînay keçika rind î
...ca nînay keçika rind î

Hay na nînay...

# Hay nîna de birê bukêwo





Hay nîna nîna nîna hay nîna nîna nîna
Hay nîna nîna nîna zeryo bi heyrano nîna
Li min û kanya dêrxwistê hay nîna nîna nîna
Li min û kanya dêrxwistê zeryo bi heyrano nîna
Av xwar bi têr mestê
Av vexwar bi têr mestê
Heyrana kember sistê
Heyrana kember sistê

Hay nîna
Hay nîna
Li min û kanya dibûrî
Li min û kanya dibûrî
Av xwar bi destûrî
Av vexwar bi destûrî
Bi heyrana keleş hûrî
Bi heyrana keleş hûrî

Hay
Hay
Li min û kanya Kekanê
Li min û kanya Kekanê
Av vexwar bi leganê
Av vexwar bi leganê
Porê sor li nav milanê
Porê sor li nav milanê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Hayê




Hay hayê hayê lê hay hayê hayê
Şûşanê korê lê xato nemayê
Dermanek çêke lê ji mûm û şimayê
Birîna kûr e lê derman lê nayê

Hay hayê hayê lê hay hayê hayê
Şûşanê korê lê xato nemayê
Dermanek çêke lê ji mûm û hêkêye
Birîna kûr e lê derman lê têye

Herêma Amedê

# Haylê




Haylê haylê haylê haylê haylê haylê
Haylê haylê haylê tu megrî dada xalê
Karwanê Mûşê der bû
Karwanê Mûşê der bû
Tew hespê boz û qer bûn
Tew hespê boz û qer bûn
Dolmîşê sor û zer bû
Cêzê bûkê li ser bû haylê haylê haylê
Cêzê bûkê li ser bû tu megrî dada xalê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Haylê




Hay lê hay lê lê hay lê hay lê lê li min macirê
Hay lê hay lê lê hay lê hay lê lê xeftan zerê

Malan bar kir lê bar kir bar kir lê li min macirê
Kona bar kir lê bar kir bar kir lê xeftan zerê
Koç û keryan lê li rê kar kir lê li min macirê
Koç û keryan lê li rê kar kir lê xeftan zerê
Malan bar kir lê li pişt îşayê lê li min macirê
Kona bar kir lê li pişt îşayê lê xeftan zerê
Koç û kerî lê ketne çayê lê li min macirê
Koç û kerî lê ketne çayê lê xeftan zerê
Wezê çi bikim lê bi te zazayê lê li min macirê
Wezê çi bikim lê bite zazayê lê xeftan zerê

Haylê haylê lê haylê haylê lê li min macirê
Haylê haylê lê haylê haylê lê li min macirê

Malan bar kir lê bar kir bar kir lê li min macirê
Kona bar kir lê bar kir bar kir lê xeftan zerê
Koç û keryan lê li rê kar kir lê li min macirê
Koç û keryan lê li rê kar kir lê xeftan zerê
Malan bar kir lê li pişt muxurbê lê li min macirê
Konan bar kir lê li pişt muxurbê lê xeftan zerê
Koç û kerî lê ketne dirbê lê li min macirê
Koç û kerî lê ketne dirbê lê xeftan zerê
Wezê çibkim lê bi te mirtibê lê li min macirê
Wezê çibkim lê bi te mirtibê lê xeftan zerê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Hê bi govendê





Hê bi govendê kêf tune nayêm govendê
Hê bi govendê kêf tune nayêm govendê
Çi govendek hay nîna li bendê reza cay nîna
Her çiya hato hay nîna pişt bi qeza cay nîna
Ser govendê hay nîna keçka Xerza cay nîna

Hê bi govendê kêf tune nayêm govendê
Hê bi govendê kêf tune nayêm govendê
Çi govendek hay nîna pir biçûk e cay nîna
Her çiya hatin hay nîna qîz û bûk e cay nîna
Ser govendê hay nîna şox zarûk e cay nîna

Hê bi govendê kêf tune nayêm govendê
Hê bi govendê kêf tune nayêm govendê
Çi govendek hay nîna pir mezin e cay nîna
Her çiya hatin hay nîna mêr û jin e cay nîna
Ser govendê hay nîna dosta min e cay nîna
Hê bi govendê kêf tune nayêm govendê
Hê bi govendê kêf tune nayêm govendê

Radyoya Êrîvanê

# Hebê lebê




Êk ê me êk ya Xwedê
Jaro Hebê
Hebê Lebê
Kakilê şevê / Hebê Lebê
Her hinde bê / Hebê Lebê

Ser mektebê / Hebê Lebê
Para te bê / Hebê Lebê
Kûmik tûjo / Hebê Lebê
Ûr gijnîjo / Hebê Lebê
Qûn vîj vîjo / Hebê Lebê

Du yên me du peyda gul
Ek ê me êk ya Xwedê

Sê yên me sê yên yaran
Du yên me du peyda gul
Êk ê me êk ya Xwedê

Çarên me çarên cebar
Sê yên me sê yên yaran
Du yên me du peyda gul
Ek ê me êk ya Xwedê

Pêncên me ferz û nimêj
Çarên me çarên cebar
Sê yên me sê yên yaran
Du yên me du peyda gul
Êk ê me êk ya Xwedê

Şeşên me nîvgên salê
Pêncên me ferz û nimêj
Çarên me çarên cebar
Sê yên me sê yên yaran
Du yên me du peyda gul
Êk ê me êk ya Xwedê

Heftên me du li ber çelan
Şeşên me nîvgên salê
Pêncên me ferz û nimêj
Çarên me çarên cebar
Sê yên me sê yên yaran
Du yên me du peyda gul
Êk ê me êk ya Xwedê

Heştên me dergeh bihuşt
Heftên me du li ber çelan
Şeşên me nîvgên salê
Pêncên me ferz û nimêj
Çarên me çarên cebar
Sê yên me sê yên yaran
Du yên me du peyda gul
Êk ê me êk ya Xwedê

Nehên me mehên jînan
Heştên me dergeh bihuşt
Heftên me du li ber çelan
Şeşên me nîvgên salê
Pêncên me ferz û nimêj

Çarên me çarên cebar
Sê yên me sê yên yaran
Du yên me du peyda gul
Êk ê me êk ya Xwedê

Dehên me mehên şêran
Nehên me mehên jînan
Heştên me dergeh bihûşt
Heftên me du li ber çelan
Şeşên me nîvgên salê
Pêncên me ferz û nimêj
Çarên me çarên cebar
Sê yên me sê yên yaran
Du yên me du peyda gul
Êk ê me êk ya Xwedê

Yazdê me yek salê kêm
Dehên me mehên şêran
Nehên me mehên jinan
Heştên me dergeh bihuşt
Heftên me dû li ber çelan
Şeşên me nîvgên salê
Pêncên me ferz û nimêj
Çarên me çarên cebar
Sê yên me sê yên yaran
Du yên me du peyda gul
Ek ê me êk ya Xwedê

Danzdên me sal temam bû
Yazdê me yek salê kêm
Dehên me mehên şêran
Nehên me Mehên jînan
Heştên me dergeh bihuşt
Heftên me du li ber çelan
Şeşên me nîvgên salê
Pêncên me ferz û nimêj
Çarên me çarên cebar
Sê yên me sê yên yaran
Du yên me du peyda gul
Êk ê me êk ya Xwedê

# Hedyayê




De lim lê lê de lê lê
De lim lê lê de lê lê
De lim lê lê de lê lê
Can û ciger Hedya yê

Hedyam sêva dikana lê
De lim lê lê de lê lê
Hedyam sêva dikana lê
Can û ciger Hedyayê

Xwezî tu ya mi'b yana lê
De lim lê lê de lê lê
Xwezî tu ya mibyana lê
Can û ciger Hedyayê

Bila malêm nebyana lê
De lim lê lê de lê lê
Bila malêm nebyana lê
Can û ciger Hedyayê

De lim lê lê de lê lê
De lim lê lê de lê lê
De lim lê lê de lê lê
Can û ciger Hedya yê

Çûbam malê cîrana lê
De lim lê lê de lê lê
Çûbam malê cîrana lê
Can û ciger Hedyayê

Hedya min ruh û can e lê
De lim lê lê de lê lê
Hedya min ruh û can e lê
Can û ciger Hedyayê

Tena kirasê kitan e lê
De lim lê lê de lê lê
Tena kirasê kitan e lê
Can û ciger Hedyayê

De lim lê lê de lê lê
De lim lê lê de lê lê
De lim lê lê de lê lê
Can û ciger Hedyayê

# Hêjîra latê




Hêjîra çiya ye
Lê lê lê lê lê lê lê
Delala çiya ye
Darhêjîrokê xemrevînokê
Nav gul û giya ye
Lê lê lê lê lê lê lê
Nav gul û giya ye
Darhêjîrokê xemrevînokê
Bûk dilê zava ye
Lê lê lê lê lê lê lê
Bûk dilê zava ye
Darhêjîrokê xemrevînokê

Hêjîra me reş e
Lê lê lê lê lê lê lê
Delala me reş e
Darhêjîrokê xemrevînokê
Bûk çendî keleş e
Lê lê lê lê lê lê lê
Bûk çendî keleş e
Darhêjîrokê xemrevînokê
Zavayî kêf xweş e
Lê lê lê lê lê lê lê
Zavayî kêf xweş e
Darhêjîrokê xemrevînokê

Hêjîra latê yo
Lê lê lê lê lê lê lê
Delala latê yo
Darhêjîrokê xemrevînokê
Ser bextê yarê yo
Lê lê lê lê lê lê lê
Ser bextê yarê yo
Darhêjîrokê xemrevînokê
Cizîr bin xetêyo
Lê lê lê lê lê lê lê
Cizîr bin xetê yo
Darhêjîrokê xemrevînokê

# Hêl ji hêlê




Herêma Serhedê

Hêl ji hêlê qazan, lêlê qazan, lêlê qazan
Ref ji refê qazan, lêlê qazan kewê canê
Fir dan serê gazan, lêlê gazan, lêlê gazan
Fir dan serê gazan, lêlê gazan kewê canê
Me silav li xal û xwarzan, lêlê xwarzan, lêlê xwarzan
Me silav li xal û xwarzan, lêlê xwarzan, kewê canê

Hêl ji hêlê çûkan, lêlê çûkan, lêlê çukan
Ref ji refê çûkan, lêlê çûkan, kewê canê
Fir dan serê sûkan, lêlê sûkan, lêlê sûkan
Fir dan serê sûkan, lêlê sûkan, kewê canê
Me silav li qîz û bûkan, lêlê bûkan, lêlê bûkan
Me silav li qîz û bûkan, lêlê bûkan, kewê canê

Hêl ji hêlê betan lêlê betan, lêlê betan
Ref ji refê betan, lêlê betan, kewê canê
Fir dan serê xetan, lêlê xetan, lêlê xetan
Fir dan serê xetan, lêlê xetan, kewê canê
Me silav li qîzê metan, lêlê metan, lêlê metan
Me silav li qîzê metan, lêlê metan, kewê canê

# Hele hela




Hela hela hela hela kirîvê hela
Li kê derê bûye xela kirîvê hela
Li şikeftan bûye xela
Nanê wan li tex bexçan e
Mêrê wan li ser çiyan e
Li van zuxbirîmya
Li van çaq reşa
Li van kurda
Li van çavreşa

Hela
Li kê
Li zuxbirîmê bûye xela hele hela hela
Li zuxbirîmê bûye xela kirîvê hela
Nanê wan li tex bexçan e
Mêrê wan li ser çiyan e
Li van melkisiya
Li van çaq reşa
Li van gerîla
Li van çavreşa
Hela hela hela hela kirîbê hela

Herêma Amedê, cavkanî : Hilmî Akyol

# Heleb




Heleb Heleb Helebê hawar medet Helebê
Heleb Heleb Helebê hawar zêrîn Helebê
Ji Helebê çûm Diyarbekir
Dikandar dikan vekir
Min bazara şala te kir
Ji kêfa bû ji eşqa bû
Mi ji bîr kir rêşî nekir

Heleb Heleb Helebê hawar medet Helebê
Heleb Heleb Helebê hawar zêrîn Helebê
Dikandar dikan vekir
Ji Helebê çûm Diyarbekir
Min bazara zêrê te kir
Ji kêfa bû ji eşqa bû
Mi ji bîr kir qeytan nekir

Heleb Heleb Helebê hawar medet Helebê
Heleb Heleb Helebê hawat zêrîn Helebê
Ji Helebê çûm Diyarbekir
Dikandar dikan vekir
Mi bazara qondra te kir
Ji kêfa bû ji eşqa bû
Mi ji bîr kir nalçe nekir

Heleb Heleb Helebê hawar medet Helebê
Heleb Heleb Helebê hawar zêrîn Helebê
Ji Helebê çûm Diyarbekir
Mi bazara şara te kir
Ji kêfa bû ji eşqa bû
Mi ji bîr kir torî nekir

Herema Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Helebê




Heleb Heleb Helebê
Hewar medet Helebê
Ji Helebê çûm Diyarbekir
Min bazara şara te kir
Hem ji kêfa bû hem ji eşqa bû
Min ji bîr kir rêşî nekir

Heleb Heleb Helebê
Hewar medet Helebê
Ji Helebê çûm Diyarbekir
Min bazara qondra te kir
Hem ji kêfa bû hem ji eşqa bû
Min ji bîr kir boyax nekir

Heleb Heleb Helebê
Hewar medet Helebê
Ji Helebê çûm Diyarbekir
Min bazara şala te kir
Hem ji kêfa bû hem ji eşqa bû
Min ji bîr kir poşî nekir

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Hêlî Heseno




## HÊLÎ HESENO

Hêlî wer hêlî lo Heseno hêlî
Hêlî wer hêlî lo wer dengo hêlî
Dara dar kengerê tê bigrî xêlî
Ewkî zava ye xwedawo tu bêhlî
Kurik zava ye xwuşkê berdêlî
Jêr da dî hatî lo tavya baranê
Jor da dîhatî lo tavya baranê
Li ber serê keko li şitla rîhanê

Hêlî
Hêlî
Jêr da dîhatî lo tavya teyrokê
Jor da dîhatî lo tavya teyrokê
Li ber serê keko li şitla biyokê

Hêlî
Hêlî
Jêr da dîhatî lo tavya berfêwo
Jor da dîhatî lo tavya berfêwo
Li ber serê keko li şitla hirmêwo

Herêma Amedê

# Hellame




Soranî / Gelerî

Pêm megre pelp u biyanû
Xoşe qisey gwêy Banû
Le der u jûr dilit xoş bê
Lêt razî bê keybanû
Helam helam helame
Şîrînê deçête helame
Were lew desrey destit
Bimirim kifnim temame
Bo to nemawim Ame
Bazî ya na Şimqarî
Kotirî le sîley carî
Ba le ser to bimkûjin
Wek kabray naw bazarî
Helam, helam,....
Gulet pêy kirdim bûxtan
Bo to dil bû sergerdan
Malî gulet bê wêran
Were (delêm) destim desto ke
Kûrtê giyan hemû şewan
Helam, helam,....
Ne diroye u ne bûxtane
Bew Xudayey bêmekane
Dujmin malî wêrane

Awirî le min berdawe
Jinî guley mêrdane
De were were were ba cût bîn
Ta sibeynê ew demane
Helam, helam,...
Hey malî babim kalê
Kezyet bendî reşmalê
Sê gez be gezî Kurdî
Baskim le gerdinit alê
Pêm e´ybe u pêm îrade
Le bot bikem male u malê
Helam,....
Hey rendî malim rendî
Singit karxaney qendî
Beynella rend u mendî
Şewê giyane tûşî bûm
Girtim zor be dilbendî
Helam,....
Pêm wit gule lêy dawî?
Le ser çîm lê dilmendî?
Were, were ba cût bîn
Singit karxaney qendî

# Hemkê




Hemkê bêne sulavê
Hemkê mi dawo
Hemkê bêne sulavê
Day gorî dawo
Lê bireşînin gulavê
Hemkê mi dawo
Lê bireşînin gulavê
Day gorî dawo
Ser xatra belek çava
Hemkê mi dawo
Ser xatra belek çava
Day gorî dawo

Hemkê bêne serberî
Hemkê mi dawo
Hemkê bêne serberî
Day gorî dawo
Lê bireşînin enberî
Hemkê mi dawo
Lê bireşînin enberî
Day gorî dawo
Day kore dabiçit serî
Hemkê mi dawo
Day kore dabiçit serî
Day gorî dawo

Hemkê bêne mûzîrkan
Hemkê mi dawo
Hemkê bêne mûzîrkan
Day gorî dawo
Lê bireşînin Kûlîlkan
Hemkê mi dawo
Lê bireşînin Kûlîlkan
Day gorî dawo
Ser xatra zava bîkan
Hemkê mi dawo
Ser xatra zava bîkan
Day gorî dawo

# Her Eyşê






Her Eyşê Eyşa min a
Tu zerê ciger min a
Her Eyşê Eyşa min a
Tu zerê ciger min a

Her Eyşê îna meko
Del pîsê îna meko
Mon dewra çengli meko
Mon dewra çeng li meko
Xortan şar rezîl meko
Xorton şar keder meko
Ma rezîl ruspa meko
Ma rezîl ruspa meko

Her Eyşê Eyşa min a
Tu zerê ciger min a
Her Eyşê Eyşa min a
Tu zerê ciger min a

Her Eyşê Eyşa min a
Tu zerê ciger min a
Her Eyşê Eyşa min a
Tu zerê ciger min a

Eyş awê zerê şuşiya
Del awê zerê şuşiya
Çilaya qaz yaxiya
Eşkijê Çermukliya
Qeysiyê Malatiya
Portqalê Dortyoliya

Her Eyşê Eyşa min a
Tu zerê ciger min a
Her Eyşê Eyşa min a
Tu zerê ciger min a

# Her bêlim lo




Her bêlim, bêlim, bêlim, bêlim, bêlim lo
Her bêlim, bêlim, bêlim, bêlim, bêlim lo


Emê îşev li ku bin bêlim lo
Emê sibe li ku bin zalim lo
Li ser pira Batmanê bêlim lo
Li ser pira Batmanê zalim lo
Xweş tê dengê erbanê bêlim lo
Xweş tê dengê erbanê zalim lo
Li reşmoriyê geriyam bêlim lo
Li reşmoriyê geriyam zalim lo
Waye di stuyê Eyşanê zalim lo

Her bêlim, bêlim, bêlim, bêlim lo
Her bêlim, bêlim, bêlim, zalim lo

Emê îşev lu kû bin bêlim lo
Emê işev li kû bin zalim lo
Li ser pira Kemûkê bêlim lo
Li ser pira Kemûkê zalim lo
Xweş tê dengê tûtûkê bêlim lo
Xweş tê dengê tûtûkê zalim lo
Li reşmoriyê geriyam bêlim lo
Wa ye di stuyê nûbûkê zalim lo

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Her bêlim




Her bêlim bêlim bêlim her zalim zalim zalim
Her bêlim bêlim bêlim her zalim zalim zalim
Nexweş im tenik hal im nexweş im tenik hal im
Nexweş im tenik hal im nexweş im tenik hal im
Ji derdê zeryan dinalim ji kulê zerya dinalim
Ji derdê zerya dinalim ji kulê zerya dinalim

Mîr hatiye Hezroyê beg hatiye Hezroyê
Mîr hatiye Hezroyê beg hatiye Hezroyê
Xortê me girtin birin birin hewşa serayê
Delalê me tev birin birin hewşa serayê

Berf û baranê dayê dayê korê nemayê
Berf û baranê dayê, dayê korê nemayê
Malê me jî hindik e cirma hakim dernayê
Konê me jî hindik e cirma hakim dernayê
Dayê korê nemayê haydê em herin ricayê
Dayê korê nemayê haydê'm herne ricayê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Her bînim




Her bînin bînin her bînin bînin
Xesya wê bûkê li ser bigerînin
Çûm Diyarbekir fistan tu nînbû
Hatim Diyarbekir paç tu nînbû
Min dewsa paç da kiras hanîbû
Mi şûna fîstan da kiras anîbû

Her bînin
Xaltya wê bûkê li ser bigerînin
Çûm Diyarbekir qolya tu nînbû
Çûm Diyarbekir gerdenî tu nînbû
Dewsa qolyê da guhar hanîbû
Şûna qolyay da guhar anîbû

Her
Meta
Çûm Diyarbekir xêlî tu nînbû
Hatim Diyarbekir xêlî tu nînbû
Dewsa xêlyê da nîşan qatî hanîbû
Şûna xêlyê da bedlê nîşan anîbû

Her
Gorma
Çûm Diyarbekir sol tu nînbû
Hatim Diyarbekir sol tu nînbû
Dewsa solê da telik hanîbû
Şûna solê da şimik anîbû

Herema Amede, çavkanî : Hilmi Akyol

# Her derwa û bêcem dêlê




Çawit esterey cadiye
Agat le h'alî min niye
Le qiyametê ciwabit çiye
Her derwa û becêm dêlê
Le qiyametê cwabit çiye
Çar û bergî ferengiye

Hemû cuma'n paş selatê
Dû şit xoşin le dinyaye
Îman û çawî leylaye

Erê xeber berin bo xizmanim
Awirê ber bote xermanim
Lêm zîz buwe mîhrebanim
Her derwa û becêm dêlê
Lêm zîz buwe mîhrebanim
Dêm maçî kem namhêlê

A'reqî destî esmer bê
Jehirî hejdîhay h'ewt ser bê
Deyxomewe qedî ser bê
Wa roy û becêy hêştim
Deyxomewe qaç ta ser bê
Şerabî mergî pê çêştim

Qestem be wey yarî ciwane
Le nêw ceh'êlan sultane
Ke demirê sah'êb îmane
Her derwa û becêm dêlê
Bêm maçî kem namhêlê
Her derwa û becêm dêlê

Qestem be reh'man û reh'îm
Ta lew dinyayey dejîm
Nanêm meylî yarî qedîm
Xo roy û becêy hêştim
Nanêm meylî yarî qedîm
Şerabî mergî pê çêştim

# Her dolabê dobabê




Her dolabê dolabê her dolabê dolabê
Her dolabê dolabê bu şingîna dolabê (şingîn kete dolabê)

Dolaba ji dara darê her dolabê dolabê
Dolaba ji dara dare bu şingîna dolabê

Lê dirêse purta karê her dolabê dolabê
Lê dirêse purta karê bu şingîna dolabê

Dolaba ji dara biyê her dolabê dolabê
Dolaba ji dara biyê bu şingîna dolabê

Lê dirêse purta miyê her dolabê dolabê
Lê dirêse purta miyê bu şingîna dolabê


Dolaba ji dara merxê her dolabê dolabê
Dolaba ji dara merxê bu şingîna dolabê

Lê dirêse purta berxê her dolabê dolabê
Lê dirêse purta berxê bu şingîna dolabê

Her dolabê dolabê her dolabê dolabê
Her dolabê dolabê bu şingîna dolabê (şingîn kete dolabê)

Radyoya Êrîvanê

# Her Fatimê




Herê herê lê her Fatimê
Werê werê lê wer Fatimê

Del û dînê lê bav zalimê
Gulkê qezê lê ji topa rimê
Şerek çêbû lê li ser Dêrsimê
Şerê şûre lê Şêx naçimê

Herê herê lê her Fatimê
Werê werê lê wer Fatimê

Wele bi xêra lê vê êvarê
Şêxek hatye lê binê darê
Qutbek hatye lê binê darê
Bavê... Lê da înkarê


Herê herê her Fatimê
Werê werê lê wer Fatimê

Wele bi xêra vê sibêwo
Şêxek hatî lê nav hewşêwo
Qutbek hatî lê nav hewşêwo
Bavê... Lê da tobêwo

Herê herê her Fatimê
Werê werê lê wer Fatimê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmi Akyol

# Her waye






Erê ya sultan hawar ey wey mal be berzewe
Mero bedkarman bimrê ciwanê giyan be dem lerzewe
Her waye her waye rûy pencerey le baye
Her waye her waye pencerey berew baye
Yarim çote seferê bîparêzê xudaye
Yarim çuwe bo seyran agat lêy bê xudaye
Erê ew maley heme ciwanê nezrî ella bê
Erê bew şert koçeket hawar berew duwa bê
Erê demeket hengwîn le qutûy şîn da
Erê nardime xwazbênî bawan lêm çûn be qîn da
Her waye her waye xalêk leser gonaye
Yarim deçête serfer bîparêze xudaye
Erê her kesêk neybê kalê giyan dû dost û yarê
Erê ser bigrê le qur ciwanê giyan subih' û êwarê

# Herê Rindê




Radyoya Êrîvanê

Herê Rindê Rindê Rinda min
Belê Rindê Rindê Rinda min

Herê wêda tê bi çawîşa min
Belê wêda tê bi çawîşa min

Herê çavê bi reş baxşîşe min
Belê çavê bi reş baxşîşe min

Herê Rinda min tenek danî
Belê dosta min tenek danî

Herê nexşê bi ortê gul danî
Belê nexşê bi ortê gul danî

Herê navkê min û xwe lê danî
Belê navkê min û xwe lê danî

Herê Rinda min ne wahakî
Belê dosta min ne wahakî

Herê te li kofî bi barî dakî
Belê te li kofî bi barî dakî

Herê qemil li barê peyakî
Belê qemil li barê peyakî

Herê tu ji malê me ra nakî
Belê tu ji malê me ra nakî

Herê tê malê me xerakî
Belê tê malê me xerakî

# Herê Zerdê




Herê zerdê belê zerdê
Were'b kurmancî xeberdê
Zerdê av hanî'b misîna
Kemê av anî'b misîna
Rijand li goşê nivîna

Herê
Were'b
Zerdê av anî bi teştê
Kemê av hanî bi teştê
Rijand li goşê hewşê

Herê
Were'b
Zerdê av hanî bi leganê
Kemê av anî bi leganê
Rijand li goşê eywanê
Herê zerdê
Were'b

Herêma Amedê

# Hêrilla maşêlla




Herêma Botan

Hêrîlla maşêlla hay lac mano lac mano
Hêrîlla maşêlla sed etarê lac mano

Hêrîlla maşêlla dest bazina gulyano
Hêrîlla maşêlla dest bazina gulyano

Hêrîlla maşêlla seva xatirê xalano
Hêrîlla maşêlla bona xatirê xalano

Hêrîlla maşêlla Mûsula her du pêla
Hêrîlla maşêlla Mûsula her du pêla

Hêrîlla maşêlla teyara lê difiriya
Hêrîlla maşêlla teyara lê difiriya

Hêrîlla maşêlla dorê Zaxo difetiliya
Hêrîlla maşêlla dorê Zaxo difetiliya

Hêrîlla maşêlla hay lac mano lac mano
Hêrîlla maşêlla sed etarê lac mano

# Hêrîzar





Her hêrîzar hêrîzar
Zerdê bi mor û mircan
Geh ez çûm mala metran
Geh ez hatim mala metran
Jina metran çav qitran
Xeber da bi dilkî giran

Her hêrîzar hêrîzar
Zerdê bi mor û mircan
Geh ez çûm mala keşe
Geh ez hatim mala keşe
Jina keşe çavreş e
Xeber da bi dilkî xweş e

Her hêrîzar hêrîzar
Zerdê bi mor û mircan
Geh ez çûm mala mele
Geh ez hatim mala mele
Jina mele çav bi kil e
Xeber da bi dilkî kul e

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Hermê






Hatim le lay nalênê
Xewsê le minit nestênê
Temaşayekî deka u
Be naz kulmem bo dênê
Hermê wey wey hermê, singolet baxî wirmê
Dû şemamey ser singit, nawêrim destyan bemê
Le ber daykî nawêrim, pêm e'ybe û deka şermê

Hatim le lay bokanê
Barîkey neşmîlanê
Baskim we jûr serî da
Kurtê xal dane danê
Delêm were ba cût bîn
Barîk û neşmîlanê
Hermê...
Dû...
Le...

Hatim le lay wirmêye
Barim qox û hermêye
Delêm bimdeyê maçê
Xwên şîrîn keyfim pê ye
Hermê...
Dû...
Le...

# Herne beriyê




Herne beriyê herne beriyê
Herne beriyê xezala bînin
Wemê delala ji kê re bînin
Wemê xezala ji kê re bînin
Wemê xezala ji keko re bînin

Xezal rabûne xwe dan kendalan
Xezal rabûne xwe dan kendalan
Tajî tûle ne nikarin bi xezalan
Tajî tûle ne nikarin bi xezalan
Keko birawo banke hevalan
...Birawo banke hevalan

Li dû min nayê li pey min nayê
Pê re heyirîm ketme belayê
Malî hindik e qelend dernayê

Herema Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Hesenê axê delal e




Delal e ha bi delal e Hesenê axê delal e
Delal e ha bi delal e rengê malê delal e

Kirasê bi te leme ye cîkê erdê di male
Kirasê bi te leme ye cîkê erdê di male

Dîwana bi mîro paşa bi lê bîna yar kewê lal e
Dîwana bi mîro paşa bi lê bîna yar kewê lal e

Cindî ye ha bi cindî ye Hesenê axê cindî ye
Cindî ye ha bi cindî ye torinê malê cindî ye

Kirasê bi te leme ye qincîkê wî erebî ye
Kirasê bi te leme ye qincîkê wî erebî ye

Dîwana bi mîro paşa mîna kewa xwendî ye
Dîwana bi mîro paşa mîna kewa xwendî ye

Çi dîne ha bi çi dîne Hesenê axê çi dîne
Çi dîne ha bi çi dîne torinê malê çi dîne

Kirasê bi te leme ye qincikê mila dijdîne
Kirasê bi te leme ye qincikê mila dijdîne

Dîwana bi mîro paşa wey weke kewa dixwîne
Dîwana bi mîro paşa wey weke kewa dixwîne

# Heso bi heyrano




Hay lolo lo lolo lo lolo lo lo
Hay lolo lo lolo Heso bi heyrano

Erda Karazê lê erdekî dûz e
Şewtiya Karazê lê şewtyanî dûz e
Ser sînga zeriyam lê zêrek altûz e
Ser sînga zeriyam lê zêrek altûz e
Xwar bûm ramûsim lê xwişk û baltûz e
Xwar bûm ramûsim lê xwişk û baltûz e

Ax lolo lo lolo Heso bi heyrano
Ax lolo lo lolo Heso bi heyrano

Erda Karazê lê erdekî nerm e
şewtiya Karazê lê şewtyanî nerm e
Xwar bûm ramûsim lê Elah li ser me
Xwar bûm ramûsim lê Elah li ser me
Elah li ser me lê mi ji çava şerm e
Elah li ser me lê mi ji çava şerm e

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Heso yan ya dinya ye




Dara tev da benîşt e
Heso yan ya dinya ye
Dara tev da benîşt e
Gede yan ya dinya ye

Şivana bi wîşte wîşt e
Heso yan ya dinya ye
Şivana bi wîşte wîşt e
Gede yan ya dinya ye

Dara dehl mehye mê ye
Heso yan ya dinya ye
Dara dehl mehye mê ye
Gede yan ya dinya ye

Şivana bi hêle hêl e
Heso yan ya dinya ye
Şivana bi hêle hêl e
Gede yan ya dinya ye

Heso min birevîne
Heso yan ya dinya ye
Gede min birevîne
Gede yan ya dinya ye

Bêbextî te nahêle
Heso yan ya dinya ye
Bêbextî te nahêle
Gede yan ya dinya ye

Dara der me gelas e
Heso yan ya dinya ye
Dara der me gelas e
Gede yan ya dinya ye

# Hesûkê mehrûmê





Hesûkê mehmûrê tavê daye kulekê
Hesûkê mehmûrê tavê daye kulekê

Hesûkê mehmûrê îro roja rihetê
Hesûkê mehmûrê îro roja rihetê

Hesûkê mehmûrê hat bejina kaxidê
Hesûkê mehmûrê hat bejina kaxidê

Hesûkê mehmûrê tu bilind bejna kaxidê
Hesûkê mehmûrê tu bilind bejna kaxidê

# Hetanî hebim




Hetanî hebim qurbana te bim
Lê çi bêjim ez
Ax û kesek im qeda te sekim
Bibehêje bim
Te qem ceyranê derê seyranê
Te temaşekim

Yar te germî naz da gel binaz
De bistirê bi saz
Were nav baxçe seyrana
Wê he hertî hertî ke
Yar de germî naz da gel binaz
De bistirê bi saz

Herêma Behdînan


# Hewar e




Bo xom dûrim naygemê
Kes niye welamêy demê
Sebir û hoşî lê birîwim
Kewtûme beh'rî xemê
Du biroy reşî hîlalî
Kewtûne jêr perçemê
Sûçî çadireket lade
Ba mang bête der le temê
Heware hey heware
Giyane hewarî ser û malim
Yarebî le dostim derçê
Ciwanî bibiye h'elalim
Çend salan şêtî to bûm
Be bê heq û bê kirê
Mudetêk lewey pêştir
Peymanman best le derê
Ne e'hid û ne peymanit
Qet qet nabeye serê

Sîley roh'mit bo bizwê
Ba xuday min netgirê
Heware hey heware
Giyane hewarî ser û malim
Yarebî ledostim derçî
Ciwanî bibiye h'elalim
Ey yarê yarê yarê
Le demî şekir dębarê
Bay şemal bîkatewe
Goşey derkî h'esarê
Çawerwanî yarekem
Tawêkî bête xwarê
Belku kemêk bîbînim
Goşêkî çawî yarê
Heware giyan heware
Saz be biçîne hewarî
Kîjgel ba biron de pêş da
Dabinîşin de gel yarî

# Hewarî xalî




Ciwanî bala û dem û çaw
Behrey ta ser lîmo kal
Hezar çaw ciwan qedbarîk
Hatibûm bibime awalî
Kewtûye çalî tarîk
Kewtime hewarî xalî
Ey dile rencero bî
Her weku rencero bûy
Min pêm wabu to dostî
Hatibûm bibime awalî
Dostêkî serbexo bûy
Kewtime hewarî xalî

Behar royî gul nema
Şadî bo bulbul nema
Berg û neway gul nema
Hatibum bibime awalî
Be cêyhêştim nemzanî
Kewtime hewarî xalî
Bo det fermû bo to nabim
Çonî defermûy ba wa bim
Kewtibûme bendîxanê
Hatibûm bibime awalî
Be yadî towe mabûm
Kewtime hewarî xalî

# Hewî




Hewî ha hewî hewî ha hewî
Qeda li tebî bela li ser bî
Ketin hebî rabûn qe tunebî
Ez û hewya xwe tev çûn nokano
Me be hev ra digot fena xûçkano
Derdê hewiyê daye çokano
Hewiya biçûk çêlek didotin
Hewya mezin derdê xwe digotin

Hewî ha hewî
Qeda li te bî
Ketin hebî
Ez û hewya xwe tev çûn qirşika
Me be hev ra digot fena xûşkika
Derdê hewiyê daye gurçika
Hewya mezin ben û benkêro
Hewya biçûk berdilka mêro


Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Hewrî le kol




Detirsim bimirim, netbînimewe
Be ciwane mergî ser binêmewe
Hewrî le kol, bazine le qol, sing nerim û nol
Wexte le swêt bimirim
Ey berî beyanan pêm xoşe, le baweşit bigirim
Ey hemû beyanan zor xoşe le amêzit bigrim
Xelkî xem dekirê min heme xelwar
Rengim zerd buwe le dûrî nazdar
Emin merîzim min bo to, were car û bar
Nexoşim, kewtûm, bibî qerizdar
Hewrî le kol...
Xelkî xem dekirê, min defiroşim xem
Lutfêkit bibê ya rebî, sayet nebê kem
Bimdeye maçêk, bot mirdim to le xalî dem...
Hewrî le kol...
E'mbarî xemim ey hawar buwe kalarêj
Nexoşim, derdim girane, buwe dûr û dirêj
Hewrî ..


# Hey bê




Hey bê de bilê bê, yarim le nîwey şew da
Qebirî mirdût lêw al, pêm bilê meylit be kê da?
Ew derdey min dekûjê toy le baxel„ gule sey“ da
E'ntîke û zêde lawe
E'ntîke û zêde ciwane
Rebbî Raniye awa bê
Awekey sard û suke
A'şiqî Miryem çaw ciwan bûm
Her deley taze bûke
Qîmet giran û wezin suke
Wek eşrefî biçûke
Xizmîne memken lome
Safe deley mêkuke

Soranî / Gelêrî

# Hey bê




Soranî / Gelêrî

Hey bê de bilê bê yarim de nîwe şewda
Erê ew deste kêye giyane de şîrîn xewda
Cerey helgirt bo bîrê
Leber desmal herîrê
Çendî xom mecbûr dekird destim bo helnagîrê
Delêm biderê maçêk carê deka tegbîrê
Hey bê de bilê bê...
Eger h'ez dekey qiyametit bê
Dilekey minit le kine amanetit bê
Hey bê...
Erê şedêk dahatuwe le bokan wawe
Erê e'mir û e'zîzim le serî dawe
Hey bê...

# Hey bellar




Hey be lar û be lar û be lare
Memkolet şekire sêwin be darewe
Ey be lar û be lar û be larit bim
Fîday memkoley gulhenarit bim
Memkeket henar kêlî qebrim bê
Zulfeket hengwîn şew le dewrim bê
Memkolet henar, henarî sawe
Beynella xoş û meyxoş pir awe
Memkolet henarin, henarî bane
Biçûk û ciwanin wêney fincane
Memkolet henar, henarî serdeşt
Cûte kulmet sêwî beheşt
Memkolet henar, mizre û meyxoşe
Merdî xuda be beminî bifroşe
Memkolet henar, henarî reze
Wêney şemame dûn leser terze

# Hey Bêmo




Hey bêmo bêmo bêmo hey bêmo
Hey bêmo bêmo bêmo koçerê lê

Xwe bigre heta têmo hey bêmo
Kulilka li erdê têwo koçerê lê

Heçiya jinên wan cwan in hey bêmo
Ser singên wan mercanin koçerê lê

Dilê lawan kovanin hey bêmo
Dilê lawan kovanin koçerê lê

Hey bêmo bêmo bêmo hey bêmo
Hey bêmo bêmo bêmo koçerê lê

Kulîlka li erdê têwo hey bêmo
Heçiya jinên wan kurtin koçerê lê

Nav lêvan pirtin pirtin hey bêmo
Her roj ew kul û derdin koçerê lê

Wan bigrin û vekutin hey bêmo
Wan bigrin û vekutin koçerê lê

Heremên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hey bênin bênin




Nayelê satê bisrewim boxom
Eme salêke min çawerêy tom
Başe min le lat derdim helrêjim
Tamî şîrînî lêwit biçêjim
Hey bênin bênin kejawe bênin
Ew kiçe mindale dilî meşkênin

H'eyfe ew çawe le ber çaw nebê
Dilî zamarim pêy dewa nebê
Şêtî çawit bum çume mîrî sur
Dûa'm bo kirdî le nizîk le dûr
Hey bênin bênin kejawe bênin
Ew kiçe mindale dilî meşkênin

# Hey berî




Hey berî berî berî
Keç xezala 'l beriyê

Dinya bû av û herî
Pismamo da biçîn şerî

Hey berî beriya dirêj
Avê li golan bû qirêj
Pismamo emrê dirêj

Hey berî beriya beqan
Avê li golan bû leq e
Pismamo berî li heq e

Hey berî beriya dêm e
Av êlî golan bu hêm e
Pismamo berî li kêm e

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hey bêzalê




Hey bêzalê hey bêzalê
Gûndo hûn bêjin bêzalê
Sêva sorê guliya darê
Lawino herin bênin xwarê
Bêzal kevokekî şîn e
Serê çengê wî nexîne
Firda çûbû Fereşîne
Nextê bêzal çil çerxîne
Bêzal kevokekî spî ye
Serê çengê wî spî ye
Firda çûbû ber kevî ye
Nextê bêzal çil û sê ye
Hey bêzalê hey bêzalê
Gundo hûn bêjin bêzalê
Bêzal kevokekî sor e
Serê çengê wî bi mor e
Firda çûbû erşê jor e
Nextê bêzal çil û çar e
Bêzal kevokekî reş e
Serê çengê wî bi nexş e
Firda çûbû li ber erş e
Nextê bêzal çil û şeş e
Hey bêzalê hey bêzalê
Gundo Fatimê hûn bêjin bêzalê
Sêva sorê li binya darê
Lawino herin bênin xwarê

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hey bo hellame




Hey bo helame
Şirîn helame
Bew desrey destit
Tmame kifnim

Erê sewan sew nalim
Giyan dey dey giyan dey
Rojan ro rome
Erê yek car pejarey
Dûryiekey tume

Erê delêm lew bane
Giyan dey dey giyan dey
Xom bixeme xwarê
Erê bixeme bawes
Gêl gêledarê

Soranî / Gelêrî

# Hey çoxe




Hey çoxe çoxe çoxe
Hey malê min malê min
Hey malê min çoxano

Min girto te kir ber xwe
Min girto te kir ber xwe

Çoxê ji kejê beranan
Çoxê ji kejê beranan

Hilkiro dor helanan
Hilkiro dor helanan

Çavê min li xewa şêrîn
Çavê min li xewa şêrîn

Destê min ser mercano
Destê min ser mercano

Çoxê kejê nêriyan
Çoxê kejê nêriyan

Berdane dor kêriyan
Berdane dor kêriyan

Çavê min li xewa şêrîn
Çavê min li xewa şêrîn

Destê min ser moriyan
Destê min ser moriyan

Çoxê kejê karikan
Çoxê kejê karikan

Berdane dor hewdikan
Berdane dor hewdikan

Çavê min li xewa şêrîn
Çavê min li xewa şêrîn

Devê min ser memikan
Devê min ser memikan

# Hey debiro




Soranî / Gelêrî

Yaran gulekem giyane dil deşikênê
Bo wa mexrûrî giyane ciwanekey dwênê
Ciwanî heta ser giyane bo kes namênê
De biro to de biro nabim be yarit
Hey be diro derçû azîz giyan qewl û qerarit


Minîş weku to sermest û mexrûr
Êsta le yarê giyane kewtûmewe dûr
Kwêra têkit na ciwanê bargey koçî sûr
De...
Hey...

Sozî beyane giyane henasey sardim
Boçî napirsî giyane le ah û derdim
Be ciwanît qes(t)em ciwanê bo çawit mirdim
De...
Hey...

Bîrim bird bo lay giyane yarekey şarim
Koçî bargey sûr ciwanê kewtuwe be yadim
Rencî çend saley ciwanê dawe be badim
De...
Hey...

Çerxî zemane giyane renceroy kirdim
To xot deyzanî ciwanê toy deway derdim
Be bê sûç û bê tawan bo ciwabit kirdim
De...
Hey...

# Hey denwê




Xizim û kesekanim genê
Deçime baxî şaî'ranê
Belku perîxanim denê
Hey deniwê û deniwê û deniwê
Hey deniwê û xewî suke
Ew kîjem taze bûke, wek sêwî ser
Çilûke

Kesê neyete ser şanim
Lêm netorê perîxanim
Nazî wî emin deytiwanim
Hey...
Hey deniwê û xewî naye
Şew be întîzarî yarim, xew be
çawim da naye

Min ademî eto perî
Perî ciwanin bo dulberî
Xom lê kirdote mûşterî
Hey...
Hey deniwê û xewî suke
Ew...

Le nêw rûnakî û tarîkî
A'şiqim be kemer barîkî
Birya dostim bay cerêkî
Hey...
Hey deniwê û xewî naye
Şew...

Kîj dêne xwar deste deste
Yekêk le nawyan çaw meste
Ew arezume û mebeste
Hey...
Hey...
Şew...

# Hey desto




Hey desto desto desto
Kuro destê xwe bide min
Hey desto desto desto
Kuro milê xwe bide min
Fincanok ji qehwê xwestin
Kuro destê xwe bide min
Fincanok ji qehwê xwestin
Kuro milê xwe bide min
Yek xwaro yek da destî
Kuro destê xwe bide min
Yek xwaro yek da destî
Kuro milê xwe bide min
Hewşa dêrê biçûk e
Kuro destê xwe bide min
Hewşa dêrê biçûk e
Kuro milê xwe bide min
Jê derket cotek bûk e
Kuro destê xwe bide min
Jê derket cotek bûk e
Kuro milê xwe bide min

Hey desto desto desto
Kuro destê xwe bide min
Hey desto desto desto
Kuro milê xwe bide min
Par keç bû isal bûk e
Kuro destê xwe bide min
Par keç bû isal bûk e
Kuro milê xwe bide min
Hewşa dêrê mezin e
Kuro destê xwe bide min
Hewşa dêrê mezin e
Kuro milê xwe bide min
Jê derket cotek jin e
Kuro destê xwe bide min
Jê derket cotek jin e
Kuro milê xwe bide min
Par keç bû isal jin e
Kuro destê xwe bide min
Par keç bû isal jin e
Kuro milê xwe bide min

# Hey dotmamê




Hey dot hey dot hey dotmamê
Raşikê çêke de biçin Şamê
Ji qehrên mamê ên jin mamê

Heylo ezo piliya rezî
Wextê dotmam bêje xwezî
Ezê (bi) kirim qar û qezî
Her yarî dotmamê ezim

Hey pismamo lazim lazim
Ezê du tiştan ji te dixwazim
Kil û neynûk cotek bazin

De bila te li Zaxo gotiba
Min dê guharên cot firotba
Kil û neynûk bê qîmet bû

Hey pismamo reng hurmetê
Rêka min û te vêketê (hevket)
Kil û  neynûk bê qîmetê


Hey dotmamê hûre hûrê
Rûne li ber sihka kevirê
Emrê xwe de ber negirê

Hey pismamo xûrçi xûrçî
Reyka piştê lê qûrmiçî
Emrê xwe de ne zewicî

Heremên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hey gul hey gulê


Moderato




Hey gul hey gul hey gulê
Govenda bûk û zava
Dem dema gul bişkiftin
Govenda bûk û zava
Pêjonokan hilmiştin
Gul zerî diyarî hiştin
Ew gula geliyê kûr de
Reş kezî di ranê stûr de
Şahî ye di mala mîr de
Hey gul hey gul hey gulê
Ew gula geliyê şaxê
Reş kezî ket kemaxê
Şahî ye li mala axê
Hey gulê tû oldaş î
Poşiyogê bike şaş î
Hey gulê tu esmer î
Poşiyogê bike serî

# Hey gulê gulê

**Moderato**




Hey gulê gûlê gûlê
Esmerê nazê gulê

Ew gula d'geliyê kûr de
Ew delala geliyê kûr de

Reş kezî'd ranê stûr de
Reş kezî'd ranê stûr de

Şahiye'l mala mîr de
Şahiye'l mala mîr de

Ew gula geliyê şaxê
Ew delala geliyê şaxê

Reş kezî ket kemaxê
Şahiye'l mala axê

Hey gulê gulê gulê
Esmerê nazê gulê

Ne dîn im ne dil mayim
Eywanê de razayim

Kerbavê derman dayim
Kerbavê derman dayim

Ne dîn im ne dûrist im
Eywanê de nivistim

Kerbavê ez êxistim
Kerbavê ez êxistim

Hey gulê gulê gulê
Esmerê nazê gulê

Hey dînê dînê dînê
Hey dînê dîniya neke

Bê dilya kurik neke
Bê dilya kurik neke

Ne dîn im ne dil mayim
Ne dîn im ne dil mayim

Eywanê de razayim
Kerbavê derman dayîm

Ne dîn im ne dirûst im
Ne dîn im ne dirûst im


Eywanê de nivisitim
Eywanê de nivisitim

Kerbavê ez êxistim
Kerbavê ez êxistim

Hey gulê gulê gulê
Esmerê nazê gulê

# Hey gundo

Andante




Hey gundo gundo gundo narê hoy narê
Hey gundo gundo gundo bûkê delalê

Lê xwendo teyr û kundo narê hoy narê
Lê xwendo teyr û kundo narê hoy narê

Me jê bir bejn bilindo narê hoy narê
Me jê bir bejn bilindo narê hoy narê

Hey gundo binya girî narê hoy narê
Hey gundo binya girî narê hoy narê

Befrê seran lêkirî narê hoy narê
Befrê seran lêkirî narê hoy narê

Me bûk ji mal bavê birî narê hoy narê
Me bûk ji mal bavê birî narê hoy narê

Xanikê xanan xane narê hoy narê
Xanikê xanan xane narê hoy narê

Îşêvê keç mêvan e narê hoy narê
Îşêvê keç mêvan e narê hoy narê

Sibehê 'l ser çavan e narê hoy narê
Sibehê'l ser çavan e narê hoy narê

Xanikê bavan dêro narê hoy narê
Xanikê bavan dêro narê hoy narê

Îşêvê raze têro narê hoy narê
Îşêvê raze têro narê hoy narê

Sibehê oxir xêro narê hoy narê
Sibehê oxir xêro narê hoy narê

Herêmên Şirnax û Çulemerg

# Hey hey berî govendê




Hey hey berî govendê nîv roj e
Hey hey pêşî govendê nîv roj e

Hey hey zeriyan xwe dan beroj e
Hey hey kuşt Ubeydê dil soj e

Hey hey berî govendê sibehan e
Hey hey pêşî govendê sibehan e

Hey hey zeriyan xwedan bircan e
Hey hey kuşt Ubeydê jin ciwan e

Hey hey berî govendê te dibînim
Hey hey te li dosta xwe şibhînim

Hey hey dest li gerdenê diwerînim
Hey hey dest li gerdenê diwerînim

# Hey hîbo




Hey hîbo hîbo hîbo
Talan hîbo hîboyê
*Dîsgotin 1*
Hey hîbo hîbo hîbo
Tavê dabû şerqê veda
Ronahî da dinyayê
*Dîsgotin 2*
Roj derket ji gazê hîbo
Talan hîbo hîboyê
Roj derket ji gazê hîbo
Tavê dabû şerqê veda
Ronahî da dinyayê
Me silave ser selîbo
*Dîsgotin 1+2*
Agirê xêvetê cotin
*Dîsgotin 1+2*
Serî mîlande hatin
*Dîsgotin 1+2*

Keçikê te wez helandim
*Dîsgotin 1+2*
Bihna memkan wem sotin
*Dîsgotin 1+2*
Hey hîbo hîbo hîbo
*Dîsgotin 1+2*
Roj derket tavê (li) nêv e
*Dîsgotin 1+2*
Agirê xêvetê sêne
*Dîsgotin 1+2*
Serî mîlande têne
*Dîsgotin 1+2*
Keçikê te wez helandim
*Dîsgotin 1+2*
Bihna memkan jê têne
*Dîsgotin 1+2.*

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hey le dûr da hatî






Be xom be xom kird neşmîl giyan sengbaranim ken
Wêl û awarey neşmîl giyan nêw xalanim ken
Hey le dûr giyan le dûr way le dûr mal le dûr dêye
Memkêkit henar neşmîl giyan yekêkit bêye

Henaseyek le min ey hawar dîdekem sozêk le şemal
Sebebkarî min neşmîl giyan bibê be koy zûxal
Hey...
Mem...

Serim sergerdan ey hawar dîdekem pam be kotewe
Serpencem bibirin neşmîl giyan be lîmotewe
Hey...
Mem...

Kewtûy le naw mal azîzim wey dîdekem e'say destimî
Min kesim niye neşmîl giyan to gişt kesimî
Hey...
Mem...

# Hey lo hey şêrînê de wer




Hey lo hey lo hey şêrînê de wer
Hey lo hey lo hey şêrînê de wer

Te kiras kitan e lewendî caw e
Te kiras kitan e lewendî caw e

Lawik xerîb e naxwit helaw e
Lawik xerîb e naxwit helaw e

Naçime serbanî serbanî banî
Naçime serbanî serbanî banî

Tu bi min de bide taya kitanî
Tu bi min de bide taya kitanî

Kurik xerîbê cotê memkanî
Lawik xerîbê cotê memkanî

Xalê min Ebdo tu neçe aşî
Mamê min Ebdo tu neçe aşî

Dê bi te kevine siwar û onbaşî
Dê bi te kevine siwar û onbaşî

Dê ji te vekine qûtn û qumaşî
Dê ji te vekine qûtn û qumaşî

Xalê min Ebdo neçe tu der e
Mamê min Ebdo neçe tu der e

Dê li te kevine cotek nefer e
Dê li te kevine cotek nefer e

Dê ji te vekine rext û kember e
Dê ji te vekine rext û kember e

Dê ji te vekine rext û kember e
Dê ji te vekine rext û kember e

Cihkê min dênin sê benda darê
Xewik xweş bûne poxela yarê

# Hey lo lo Mîro




Hey lo lo mîro lo lo
Hey lo lo mîro lo lo
Tu her ho neke

Min bibe meydanê lê lê
Destê min veke

Temaşa min û lê lê
Celadê xwe bike

Hey lo lo mîro lo lo
Tu xudan dîwani

Destê min bigre lê lê
Min bibe meydanê

Temaşa min û lê lê
Celadê wanê

Celad kafir e lê lê
Tu misilman î

Hey lo lo mîro lo lo
Mîrkê Cizîrê

Me du ga hene lê lê
Nayê ber nîrê

Hey lo li min dînê lê lê
Hey lo li te dînê

Xweziya bizmêr (bi)bim lê lê
Simê mehînê

Digel şêxê xwe diçim
Mekke û Medînê

Hey lo li min harê lê lê
Hey lo li te harê

Xweziya bizmêr bin lê lê
Simê dewarê

Digel şêxê xwe diçim
Heta bi zêbarê

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hey nar




Dîsan şew ha bo h'alî min
Bo ew diley pir xeyalî min
A'lem sûta le sikalay min
Hey nar hey nar bawanim yar
Dwênê rabûrd koç û koçbar
Qesem bew xaley le rûte
Fincaney destit yaqûte
Dedrewşên delêy zimrûte
Çawit estêrey bîst û dû
Heldê le kelî kemetû
Musulmanim memke be cû
Xerîb mawim le hewlêrê
Kes niye bilê ba xerîb bexêrê
Nemdî royî çaw estêrê
Dwênê royî koç û koçbar
Gerdinî zerdit be milim le guley xesar

Sorani / Gelêrî

# Hey narê




Hey narê narê narê, wey qezat le giyanim yarê
Kes dilî a'ciz nekirdûy, firmêskit dêne xwarê

Erê silaw le bejnê barîk, bînayî her dû çawim
Bo destî yarê ciwanê, dîl û esîr kirawim
Hey...
Kes...

Bo xoy qewilî pê dam, le ber gorî qelatê
Beratî çawî ciwanî, nazdar dû maçim datê
Birînim sarêj debin, çaw ciwan xêrî degatê
Hey...
Kes...

Be ber malyan rabirdim, tîley çawêkî damê
Be çawan têy geyandim, debê bigirim aramê
Biçime cêjiwanî pêşû, piştî derkey dalanê
Hey...
Kes...

# Hey naye naye






Erê bîke bo xatirî giyane î'şqî le dest çû
Kalê serit helêne ciwanê agirim tê berbû
Giyane min jin dênim kalê ne to bike şû
Hey naye naye naye dengî gware zêr naye
Rojê carêkim bese bîbînim le bêlaye
Xalekey ser rûmetî ciwane nexişî xudaye
Erê ne çaw têr debê giyane ne dil debîzê
Kalê xom lêre mawim giyane yar le tewrêzê
Hey naye...
Serêke û mestî nazim dilêke û bot nemawe
Dilim heqî be deste fitway serî dirawe
Lei'net le yarî dirozin wefay bo kes nemawe
H'ewt salan yarî min bûy bo çît nekird malawa
Erê derdêkî dawmê giyane dermanî nekird
Kalê şemal be befrî zorî kwêstanî nekird
Hey naye...

# Hey pê de




Hey pê de pê de hey
Temlo lawo pê de
Rişkê temê min lo
Taqê qesrê de
Neçe zaxokê lo
Neyarên rê de
Hey şîn e şîn e lo
Zaxokê şîn e
Xemla temê min lo
Sosin û beybûn e
Xemla lawê min lo
Sosin û beybûn e
Cawekê hato lo
Temo keyfin e
Hey sor e sor e lo
Zaxokê sor e.
Xemla temê min lo
Belka gindor e
Xemla lawê min lo
Belka gindor e
Cawekê hato lo
Temo abor e
Xeberek hato lo
Temo abor e
Hey reş e reş e lo
Zaxokê reş e
Xemla temê min lo
Belka zebeş e
Cawekê hato lo
Temo nexweş e

Herêmên Amed, Botan û Behdînan

# Hey rakin xatûnê rakin




Hey rakin, hey rakin, hey rakin
Delalê Hey narînê rakin
Hey rakin, hey rakin, hey rakin
Tû ji gulan hey gûla sor î

Çargokê hê lê dû ta kin
Delalê hê narînê rakin
Çargokê hê lê dû ta kin
Şêrînê hê xatûnê rakin

Malbavê hê lê winda kin
Delalê hê narînê rakin
Malbavê hê lê winda kin
Delalê xatûnê rakin

Hey bênin hey bênin hey bênin
Delalê narînê bênin
Hey bênin hey bênin hey bênin
Delalê xatûnê bênin

Çargokê hê lê bişdînin
Delalê narînê bênin
Çargokê hê lê bişdînin
Delalê xatûnê bênin

Malbavê hê jê bistînin
Delalê narînê bênin
Malbavê hê jê bistînin

De rakin hê çend bilind e
Bejin hey şemal û find e
Dê narê hey bibin gûnd e
De hilû hey heval gorî

Delalê hê xatûnê rakin
Xatûnê hey ji bircên jorî
Narînê hey pal vedayî
Hey cih û balik vedayî

Narê diyariya zava yî
Em hatin Narê rakin
Xêliye hey serde dû takin
Te ji mala bavê xelas kin

Hey hinde hey sed car hind e
Bejna Narînê bilind e
Narê xirab kiribû gund e
Narinê pal vedayî

Delalê pal vedayî
Dayîkê hey cih deynayî
Narînê hey diyariya zava yî
Em hatin Narînê nas kin

Em hatin hey delalê nas kin
Te bi kurtek û kiras kin
Te ji malbavê xelas kin

# Hey renî




Hey renî renî renî
Eyşê nazê nû bûkê
Hey renî renî renî
Te guhar zêrê bel bûkê
Veresya ji bedenî
Eyşê nazê nû bûkê
Veresya ji bedenî
Te guhar zêrê bel bûkê
Berketin berbûk hemî
Eyşê nazê nû bûkê
Berketin berbûk hemî
Te guhar zêrê bel bûkê

Hate reniya mezin e
Eyşê nazê nû bûkê
Hate reniya mezin e
Te guhar zêrê bel bûkê
Veresya ser û bine
Eyşê nazê nû bûkê
Veresya ser û bine
Te guhar zêrê bel bûkê
Ber ketin mêr û jinê
Eyşê nazê nû bûkê
Ber ketin mêr û jinê
Te guhar zêrê bel bûkê

Hate reniya piçûk e
Eyşê nazê nû bûkê
Hate reniya piçûkê
Te guhar zêrê bel bûkê
Veresiya ji gêdûkê
Eyşê nazê nû bûkê
Veresiya ji gêdûkê

Te guhar zêrê bel bûkê
Ber ketin zava û bûke
Eyşê nazê nû bûkê
Ber ketin zava û bûkê
Te guhar zêrê bel bûke
Hate reniya talêyo
Eyşê nazê nû bûkê
Hate reniya talêyo
Te guhar zêrê bel bûkê
Veresya newalê yo
Eyşê nazê nû bûkê
Veresya newalêyo
Te guhar zêrê bel bûkê
Ber ket bûka salêyo
Eyşê nazê nû bûkê
Ber ket buka salêyo
Te guhar zêrê bel bûkê

Reniya tiyê guhişkê
Eyşê nazê nû bûkê
Reniya tiyê guhişkê
Te guhar zêrê bel bûkê
Veresya ber kêvrûşkê
Eyşê nazê nû bûkê
Veresya ber kêvrûşkê
Te guhar zêrê bel bûkê
Ber ketin kesêd xûşkê
Eyşê nazê nû bûkê
Ber ketin kesêd xûşkê
Te guhar zêrê bel bûkê
Reniya kanuna piçûk
Weresiyabû ji ber neynûk
Berketin zava û bûk

Herêma Çulemergê


# Hey robare robare




Hey robare robare
Malê mino şemamok e
Malê mino şemamok e
Hey robar e robar e
Ordek çû robar e
Ordek çû robar e
Bû celal û cobar e
Malê mino şemamok e
Bû celal û cobar e
Ordek çû robar e
Ew robarê sinehtê
Serkanî ji binî tehtê
Silav e li ser vê bextê
Ew robarê hîzanê
Ser kanî ji bin şîlanê
Silave li Eyşê canê
Hey robare robar e
Ser kanî ji avê sar e
Min têr av jê vexwar e

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hey şanê




Hey şanê şanê şanê hey şana min
Kofî li ber girêdanê kêloka min

Vê bersifkê genim e hey şana min
Wê wêranê genim e kêloka min

Siwaran hûrme hûrm e hey şana min
Siwaran hûrme hûrm e kêloka min

Şanê yara hakim e hey şana min
Şanê yara hakim e kêloka min

Vê bersifkê pivaz e hey şana min
Vê bersifkê pivaz e kêloka min

Siwaran gaze gaz e hey şana min
Siwaran gaze gaz e kêloka min

Yarê şanê tolaz e hey şana min
Yarê şanê tolaz e kêloka min

Vê bersifkê bi nîsk e hey şana min
Vê bersifkê bi nîsk e kêloka min

Herêmen Şırnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hey sînemê




Hey Sînemê Sînemê
Hey lo, hey lo Sînemê
Hey Sînemê Sînemê
Keç xezalê negihamê
Min dî(t) rêga(rê, reka) kehniyê
Destek gula bidimê
Ehda min ber Xwedê be
Piş te negihim tu jinê
Sînem dûr û elmas e
Wê di nîfinga (nava) behrê de
Min divê hewasî biçim ê
Hût, û ne hût ên di rê de
Ên wey Sînemê nînin
Nav erebên beriyê de
Xala li eniya Sînemê
Elîf û bîst û du ne
Bêjin dayîka Sînemê
Delal çendî keyfî ne
Daxwaza Sînem xanê
Bûye şîtek hûrmî ye
Cawkê bidin mişk, û maran
Nexwit ew çavên spî ye
Xala li eniya Sînemê
Elîf û bîst û sê ne
Bêjin dayîka Sînemê
Sînem çendî keyfi ne
Ehda min ber Xwedê be
Pişte nekim tû şûyê (jin nakim)
Xala li eniya Sînemê
Elîf û bîst û ça re

Heremen Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydaye Goyan

# Hey sosin




Hey sosin sosin sosin
Sosina mêrga çiyayî
Hey sosin sosin sosin
Sosina mêrga çiyayî

Zeriyên me çûn dîlanê
Kemberên hemûyan badayî
Zeriyên me çûn dîlanê
Kemberên hemûyan badayî

Mehelê ramusanê
Aqil û sewdan nemayî
Mehelê ramusanê
Aqil û sewdan nemayî

Hey sosin sosin sosin
Sosina mêrga hez hezî
Hey sosin sosin sosin
Sosina mêrga hez hezî

Zeriyên me çûn dîlanê
Kemberên hemûyan derizî
Zeriyên me çûn dîlanê
Kemberên hemûyan derizî

Mehelê ramûsanê
Aqil sewdan ji min dizi
Hey sosin sosin sosin
Sosina mêrga beleke

Zerî meşiyan govendê
Kemberên hemûyan heleke
Mehelê ramûsanê
Aqil û sewdan geleke

Hesen Cizrawî, radyoya Bexdaye

# Hey welato




Hey welato welato
Werin werin bibînin

Avê li golan cemînin
Nîsk û nokan biçînin

Dinya sot û vemirînin
Werin werin hesab kin

Avê li golan cema kin
Dinya sot û xera kin

Hey welato beyaro
Me lê çando xeyaro

Xweli li xelkê beyaro
Hey welato beyaro

Me lê çando sosino
Xwelî li xelkê Bêjino

Hey welato pîvazo
Me lê çando soryazo

Xwel li xelkê tolazo

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hey xan




Hey xan hey xan hey xanê lê lê lê lê lê xana min
Hey xan hey xan hey xanê cawê te ji dikana min
Xanê te digo ez mêr nakim
Qolê te digo ez mêr nakim
Bisk û tûnçka şe nakim
Bisk û tûnçka şe nakim
Xortê xelkê mar nakim
Xortê xelkê mar nakim

Hey xan
Hey xan
Xanê bexçe bi sîro
Qolê bexçe bi sîro
Sîr tev bûne keysîro
Sîr tev bûne keysîro
Mêrê xanê êsîro
Mêrê qolê êsîro

Hey xan
Hey xan
Xanê bexçe pîvaz e
Qolê bexçe pîvaz e
Pîvaz bûne gulbaz e
Pîvaz bûne gulbaz e
Mêrê xanê tolaz e lê lê lê lê lê xana min
Mêrê qolê tolaz e cawê te ji dikana min

Herêma Amedê, çavkanî : Mehmûd Kizil

# Hey yaran




Hênde tîr mede azîzim lew dile tenge
Dil goşte qurban azîzim nek pola û senge
Ey yaran yaran yaran, dûr bûm le yaran
Ew guley heldegirim giyane deçimewe taran
Ew guley heldegirim giyane wek carî caran

Erê êsta ke le naw giyane xanûy berdîne
Be xemî towe giyane dilim xemgîne
Ey ...
Ew...
Ew...

Erê ricaye le h'eq giyane to meke cefa
Gunahim niye ciwanê be xeyrez wefa
Ey...
Ew...
Ew...

# Heyder axa




Heyder e, Heyder e, Heyder e Heyder axa
Heyder e, Heyder e, te gulê li baxa

Dara li çiyê yo Heyder axa
Şewtiya li çiyê yo te gulê li baxa
Hêlîna hirçê yo Heyder axa
Hêlîna hirçê yo te gulê li baxa
Cîhê mêrê çê yo Heyder axa
Cîhê mêrê çê yo te gulê li baxa

Heyder e, Heyder e, Heyder e Heyder axa
Heyder e, Heyder e, te gulê li baxa

Dara li nav gilgila Heyder axa
Şewtiya li nav gilgila te gulê li baxa
Hêlîna bilbila Heyder axa
Hêlîna bilbila te gulê li baxa
Cîhê çav bi kila Heyder axa
Cîhê çav bi kila te gulê li baxa
Heyder e, Heyder e, Heyder e Heyder axa
Heyder e, Heyder e, te gulê li baxa

Dara li nav dara Heyder axa
Şewtiya li nav dara te gulê li baxa
Sî dabû berwara Heyder axa
Sî dabû berwara te gulê li baxa
Cîhkê bûk û zava Heyder axa
Cîhkê bûk û zava te gulê li baxa

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Heyla kinê




Heyla kinê lê lê mala minê way way
Heyla kinê lê lê ji min kintir way way
Wez geriyam lê lê ji te pirtir way way
Mi kes nedî lê lê ji te rindtir way way


Heyla kinê lê lê mala minê way way
Heyla kinê lê lê ewqasayê way way
Min sê cara lê lê ramîsayê way way
Cara çara lê lê mal avayê way way

Heyla kinê lê lê mala minê way way
Mi kina xwe dî lê lê lê nav zebeşa way way
Mi çav kirê lê lê çeplê xwe weşa way way

Mi kina xwe dî lê lê li nav kundira way way
Mi çav kirê lê lê wê xwe findira way way

Herêmên Amed, Bontan û Behdînan

# Heyran heyran e




Heyran heyran e were lo lo wele heyran e yar
Heyran heyran e were lo lo wele heyran e yar
Were mala me heyrano rûnê nekene lo
Were mala me heyrano rûnê nekene lo

Cilkê heyrano were lo lo qirêje ji para yar
Cilkê heyrano were lo lo qirêje ji para yar
Heger ez neşom were lo lo ser dilê min qare
Heger ez bişom were lo lo xelq dibêjin yar e

Heyran heyran e were lo lo wele heyran e yar
Heyran heyran e were lo lo wele heyran e yar
Gundî fesad in were lo lo şik bi me didin yar lo
Gundî fesad in were lo lo şik bi me didin yar lo

# Heyrano




Heyran heyrano lawo dîsa heyrano way way
Heyranî dayê lê lê qurbanî dayê way way
Tifing hilanî lê lê çûbûne çayê way way
Derman qediya lê lê dost kete tayê way way

Heyranî pîrê lê lê qurbanî pîrê way way
Tifing hilanî lê lê çûbûn nêçîrê way way
Derman qediya lê lê dost kete bîrê way way

Heyranî metê lê lê qurbanî metê way way
Tifing hilanî lê lê çûbûn dawetê way way
Derman qediya lê lê dost ket zehmetê way way

Hespê heyranî lê lê teyarî ale way way
Tewlek didanê lê lê li mêrgê dinale way way
Ji pêşî helî lê lê dare male way way

Hespê heyranî lê lê teyarî boz e way way
Tewlek didanê lê lê li mêrga bi toz e way way
Ji pêşî helî lê lê dare balyoz e way way

Herêm Serhedê

# Hîcrî yar




Soranî / Gelerî

Ey gulî nakamilim ey taqe yarim
Derdî î'şqim kariye şêt û hejarim
Bê wefa ta key cefa dil bê qerarim
Hîcirî yar hîcirî yar derdî girane
Be bê xalî rûxit malim wêrane
Şerbetî î'şiq û cefa laîq be xome
Pêt çiye ew agirî pêy rencerome
Dilniya û bê qerarî dû çawî tome
Hîcirî...
Be bê...
A'şiqî cewir û xeman derdî girane
Tîrî î'şqî ew guley derdî be cane
Bê sebeb torawe lêm ew xunçe ciwane
Hîciri...
Be bê...
Kê heye ewro bilê a'şiqî çone
Şerbetî î'şiq û cefa mektebî kone
Yarî min sûre gule e'tirî be bone
Hîcirî...
Be bê...
Bê qerarim min le swêy cemalî mahit
Şui'ley esterekey nîwe nîgahit
Ta key esîr û kiz bim min we ban rahit
Hîcirî...
Be bê...

# Ho Leylî




Nexoş û derdedarim – ho Leylî
Bo balat bêqerarim – ho Leylî
Rûhmî xêrt bê lêw al– ho Leylî
Reng zerd û lêw be barim – ho Leylî
Ho Leylî, Leylî, Leylî - çaw esterey
Sêweylî
Derheq be min bêmeylî

Şawit esterey şiwanan – ho Leylî
Heldê hemû beyanan – ho Leylî
Deda le kuçe w kulanan – ho Leylî
Narinc, lîmo, pirteqal
Bo memkeket pirûkam
Esterey le asmanî
Le yarî xom bûm be kam
Nexoş û cê le banî
Be milyonê herzanî
Tu çî rengî zerd kirdûyit?

Ey gule malî wêranî?
Şawit esterey şewê
Gulmet denukî kewê
Baskim be jor serî de
Mergim be pêşit kewê
Şawit esterey rojê
Ebrût le xew demênê
Bejinit bo min bimênê
Sore qorîngî germênê
Hatûm le lay Bokanê
Kurtê xal dane danê
Ba kewşeket pîs nebê
Pêt le ser çawim danê
Şaw esterey a'smanî
Heldê hemû beyanî
Baskim be jor serî
Sertopî Kurdistanî

Soranî / Gelerî

# Ho Leylo can Leylo




Wez keyfê dikim keyf nakim
Ho Leylo wez keyfê dikim keyf nakim
Wez keyfê dikim keyf nakim
Can Leylo wez keyfê dikim keyf nakim
Wez vê gundê mêr nakim
Wez vê gundê mêr nakim
Kofiya zêran çênakim
Kofiya zêran çênakim
Dilê mela kul nakim
Dilê mela kul nakim
Wez keyfê dikim biharê
Wez keyfê dikim biharê
Xoce çû binya darê
Xew xweş e poxla yarê
Wez keyfê dikim havînê
Xoce çû binya gûnê
Xew xweş e gel xatûnê
Wez keyfê dikim payîzê
Xoce çû binya gûzê
Xew xweş e poxla qîzê
Wez keyfê dikim çiriyê
Xoce çû binya biyê
Xew xweş e gel zeriyê

Herêm Serhedê

# Ho Reşo




Ho Reşo!
Cembelî
Hêrî li ber hêrî,
Hey gidiyo malo
Hêrî li ber hêrî
Ho Reşo! Cembelî
Du şivanan sê şivanan pez dane bêrî
Hey gidiyo malo
Du şivanan sê şivanan pez dane bêrî
Ho Reşo! Cembelî
Ya min digo ya te digo wê li bana bêrî
Hey gidiyo malo
Ya min digo ya te digo wê li bana bêrî
Ho Reşo! Cembelî
Deşta nokan bên ce ye
Hey gidiyo malo
Deşta nokan bên ce ye

Ho Reşo! Cembelî
Siwaran heye heye
Hey gidiyo malo
Siwaran heye heye
Ho Reşo! Cembelî
Eslê Meyro file ye
Hey gidiyo malo
Eslê Meyro file ye
Deşta nokan genim e
Siwaran hurme hurme
Eslê Meyro hakim e
Deşta nokan bên nok e
Siwaran hoke hoke
Eslê Meyro melûk e

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hoplerî




Hoplerî çi hoplerî
Etîmo dest li serî
Wî serî hato Wanê
Mêriko tu tetervan î
Tetero tu bilbil î

Dilê min bû kirkira
Dilê min behra xeman
Du zerî te ji Eceman
Min ya xwe got ya te ma

Ref refê wan çûçikan
Bir birên van çûçikan
Firdan çûn ser hejikan
Tu brînên min derman ke
Derman ji destê keçikan

Ref refê van kewikan
Bir birên van kewikan
Firdan çûn ser tehtikan
Tu brînên min derman ke
Derman ji destê zerikan

Ref refê van çûçikan
Wet firîn çûn qirikan
Brînên min tîmar ke
Ser destê van keçikan

Ref refê van zerwêlan
Wet firîn çûn nihêlan
Brînên min timar ke
Ser destê van çihêlan

Ref refên qirireşan
Wet firîn çûne erşan
Brînên min timar ke
Ser destên poşî reşan

Herêmên Şirnax û Çulemerg

# Hoy cano




Hoy can hoy can hoy cano hoy cano
Hoy can hoy can hoy cano toy cano
Singê li mêrgê kutano hoy cano
Golik lê girêdano toy cano
Derbendê wan qetiyano hoy cano
Qîzik dûv de meşiyano toy cano
Cano siwarê mehînê hoy cano
Bajo here Mêrdînê toy cano


Mêhvanê xatûn Zînê hoy cano
Mêhvanê xatûn Zînê toy cano

Hoy can hoy can hoy cano hoy cano
Hoy can hoy can hoy cano toy cano

Singê li mêrgê kutano hoy cano
Çêlek lê girêdano toy cano
Derbendê wan qetiyano hoy cano
Pîrek dûv de meşiyano toy cano
Cano siwarê Dildilê hoy cano
Bajo here Musilê toy cano

Mêhvanê Îsa gulê hoy cano
Mêhvanê Îsa gulê toy cano

# Hoy cer hoy cer




Hoy cer hoy cer hoy cer e
Hey kanê cer, hey kanê cer
Hoy cer hoy cer hoy cer e
Hey bişkên cer

Miştik penîrê ter e
Hey kanê cer, hey kanê cer
Miştî penîrê ter e
Hey bişkin cer


Kitik û mişkan ser şer e
Hey kanê cer hey kanê cer
Kitik û mişkan ser şer e
Hey bîşkin cer

Cer ji ava Dihokê
Hey kanê cer, hey kanê cer
Cerij (cerji) ava dihokê
Hey bîşkin cer

Wê li ser milê Fatokê
Hey kanê cer, hey kanê cer
Wê li ser milê Fatokê
Hey bîşkin cer

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hoy çiyawo




Hoy çiyawo hoy çiyawo
Hawar le min
Ma did le min ho çiyawo
Hişîno têr geyawo
Hawar le min
Madid le min ho çiyawo
Çûm ser çiyakê Hilorê
Hawar le min
Ma did le min ho çiyawo
Dor de deşta û nizarê
Hawar le min
Ma did le min ho çiyawo
Meqamê kofî sorê
Hawar le min
Ma did le min ho çiyawo
Çûm ser çiyakê Behdînan
Hawar le min
Ma did le min ho çiyawo
Dor de deşta Merxînan
Hawar le min
Ma did le min ho çiyawo
Meqamî kofî hişînan
Hawar le min
Ma did le min ho çiyawo

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hoy delîl




Hoy hoy delîl hoy hoy delîl
Lîsê dîkê me li hewa
Bangê dide bi direwa
Lê lê jinê jinebiyê
Gulka şarê heft weqiyê

Hoy hoy delîl hoy hoy delîl
Lîsê dîkê me li jor e
Azan dide dor bi dor e
Jinebî çavan kil dikin
Xortê xelkê bengî dikin

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hoy Dil




Hoy dil hoy dil hoy dil lolo dilê min lo lo dilê min
Hoy dil hoy dil hoy dil lo lo dilê min şeni emrê te


Pîr bûm dil pîr nabe lolo dilê min lo lo dilê min
Pîr bûm dil pîr nabe lo lo dilê min şênî emrê te
Şahê Ecem rabe lo lo dilê min lo lo dilê min
Şahê Ecem rabe lo lo dilê min şênî emrê te
Zewac bê dil nabe lo lo dilê min lo lo dilê min
Zewac bê dil nabe lo lo dilê min şênî emrê te
Cahil bê yar nabe lo lo dilê min lo lo dilê min
Cahil bê yar nabe lolo dilê min şênî emrê te

Dilêm dilkê karê lo lo dilê min lo lo dilê min
Dilem dilkê karê lo lo dilê min şênî emrê te
Ar ket koka darê lo lo dilê min lo lo dilê min
Ar ket koka darê lo lo dilê min şênî emrê te

Dilêm dilkê qîzê lo lo dilê min lo lo dilê min
Dilêm dilkê qîzê lo lo dilê min şênî emrê te
Ar ket koka gwîzê lo lo dilê min lo lo dilê min
Ar ket koka gwîzê lo lo dilê min şênî emrê te

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Hoy dil




Hoy dil hoy dil dilê min
Hoy dil hoy dil kêfa min
Dil dilê karikan dilê min
Dil dilê karikan kêfa min
Çerya li dor darikan dilê min
Çerya li dor darikan
Çav li xewa şêrîn
Çav li xewa şêrîn
Dest li ser memikan
Dest li ser memikan

Hoy dil
Hoy dil
Dil dilê bizinan
Dil dilê bizinan
Çerya li dor kizina
Çerya li dor kizina
Çav li xewka şêrîn
Çav li xewka şêrîn
Dest li ser bazinan
Dest li ser bazinan

Hoy dil
Hoy dil
Dil dilê berana
Dil dilê berana
Çerya li dor girana
Çerya li dor girana
Çav li xewa şêrîn
Çav li xewa şêrîn
Dest li ser mircana dilê min
Dest li ser mircana kêfa min

Herema Amedê

# Hoy dil




Hoy dil hoy dil hoy dil lolo dilê min lo lo dilê min
Hoy dil hoy dil hoy dil lo lo dilê min şeni emrê te

Pîr bûm dil pîr nabe lolo dilê min lo lo dilê min
Pîr bûm dil pîr nabe lo lo dilê min şênî emrê te
Şahê Ecem rabe lo lo dilê min lo lo dilê min
Şahê Ecem rabe lo lo dilê min şênî emrê te
Zewac bê dil nabe lo lo dilê min lo lo dilê min
Zewac bê dil nabe lo lo dilê min şênî emrê te
Cahil bê yar nabe lo lo dilê min lo lo dilê min
Cahil bê yar nabe lolo dilê min şênî emrê te

Dilêm dilkê karê lo lo dilê min lo lo dilê min
Dilem dilkê karê lo lo dilê min şênî emrê te
Ar ket koka darê lo lo dilê min lo lo dilê min
Ar ket koka darê lo lo dilê min şênî emrê te

Dilêm dilkê qîzê lo lo dilê min lo lo dilê min
Dilêm dilkê qîzê lo lo dilê min şênî emrê te
Ar ket koka gwîzê lo lo dilê min lo lo dilê min
Ar ket koka gwîzê lo lo dilê min şênî emrê te

Herema Amedê

# Hoy dîlan





Hoy dîlan dîlan  dîlan toy toy dîlan dîsa dîlan
Hoy dîlan dîlan dîlan tu bi şekirê nav mendîlan

Ha digo têye ji kaniya wayê hoy dîlan dîlan dîlan
Keçik têye ji kaniya wayê toy dîlan dîsa dîlan
Avê tîne ji bona çayê hoy dîlan dîlan dîlan
...toy dîlan dîsa dîlan
Keçik rind e girtim tayê hoy dîlan dîlan dîlan
...toy dîlan dîsa dîlan

Hoy hoy dîlan...
Hadigo têye ji kaniya zuxor hoy dîlan dîlan dîlan
Keçik têye ji kaniya zuxor toy dîlan dîsa dîlan
Avê tîne ji kaniya guhir hoy dîlan dîlan dîlan
...toy dîlan dîsa dîlan
Keçik rind e çibkim ji xwe hoy dîlan dîlan dîlan
...toy dîlan dîsa dîlan

Radyoya Êrîvanê

# Hoy gul





Hoy hoy gulê hoy gulê hoy gulê
Hoy hoy gulê hoy gulê can gulê
Gul gula Diyarbekrê hoy gulê
Gul gula Diyarbekrê can gulê
Şêrîn fena şekirê hoy gulê
Şêrîn fena şekirê can gulê

Wez gul dikim gul nayê hoy gulê
Wez gul dikim gul nayê can gulê
Wez kêf dikim kêf nayê hoy gulê
Wez kêf dikim kêf nayê can gulê

Gulê gula Kurda ye hoy gulê
Gulê gula Kurda ye can gulê
Qîza mîrê Mosilê hoy gulê
Qîza mîrê Mosilê can gulê

# Hoy hoy Leylo




Ez kêf dikim kêf nakim hoy hoy Leylo
Ez kêf dikim kêf nakim toy Leylo

Kofiya bi şing şing çênakim hoy hoy Leylo
Kofiya bi şing şing çênakim toy Leylo

Mîr gote qebûl nakim hoy hoy Leylo
Mîr gote qebûl nakim toy Leylo

Dilê xorta kul nakim hoy hoy Leylo
Dilê xorta kul nakim toy Leylo

Ez kêf dikim buhar e hoy hoy Leylo
Ez kêf dikim buhar e toy Leylo

# Hoy lele




Hoy lele toy lele
Ne bi ruvî me ne bi şêr im
Hoy lele toy lele
Xwe di hevşî de vedişêrim
Hoy lele toy lele
Şeşek du nan vêdhêrim
Hoy lele toy lele
Hê ji kewaniyê newêrim
Hoy lele toy lele
Ruvîngî mamê mino
Hoy lele toy lele
Xwe gij kir hate mino
Hoy lele toy lele
Go ez birayê te me
Hoy lele toy lele
Du qîl kir hêta mino
Hoy lele toy lele
Ruvî hato dizîka
Hoy lele toy lele
Telyaye ber enîşka
Hoy lele toy lele
Çivek dudu dane xwe
Hoy lele toy lele
Aniye qira mirîşka
Hoy lele toy lele
Dora ruvî nîna kin
Hoy lele toy lele
Gazî terewila kin
Hoy lele toy lele
Deynê ruvî giran e
Hoy lele toy lele
Ruvî li hev bela kin
Hoy lele toy lele
Ruvingî birê guro
Hoy lele toy lele
Te dêl kiriye biviro

Hoy lele toy lele
Kanî tu me re bêje
Hoy lele toy lele
Te mirîşk kuda biro
Hoy lele toy lele
Ruvîngî tele bazo
Hoy lele toy lele
Jêl ve tê kaze kazo
Hoy lele toy lele
Werin ruvî bigirin
Hoy lele toy lele
Wî xariye goştê qazo
Hoy lele toy lele
Her ruvî ruvî ruvî
Hoy lele toy lele
Mîratê belî kuvî
Hoy lele toy lele
Hudanê hezar çivî
Hoy lele toy lele
Mirîşka kuda divî
Hoy lele toy lele
Vî rûvî çikir çikir
Hoy lele toy lele
Rûvî dûnê xeravkir
Hoy lele toy lele
Hedurya rûvî nayê
Hoy lele toy lele
Malik li me xerav kir
Hoy lele toy lele
Zimanê wî şirîne
Hoy lele toy lele
Gotnê wî hingivîn e
Hoy lele toy lele
Bi çiva xwe dihejîne
Hoy lele toy lele
Me teva dixapîne

Herêma Serhedê, çavkanî : Şemdin

# Hop Leylo




Hop Leylo Leylo Leylo hop Leylo Leyla yê
Hop Leylo Leylo Leylo dermanê dilê min

Bilindê çû ber ewran
Xweziya yara te bimro
Min'j mêwo mêwa rezî
Marekê binde tezî
Tirsim leylo bigezî

Min'j mêwo mêwa tirî
Marekê'd bin de mirî
Tirsim leylo bigirî

Hop leylo herho neke
Şev û roj mitaleke
Destê min'l poxla xweke

# Hoy lîlan toy lîlan






Hoy lîlan toy lîlan
Xesî ya mine demdemî
Hoy lîlan toy lîlan
Ber gulînê qedimî

Hoy lîlan toy lîlan
Gulîn ser da hedimî
Hoy lîlan toy lîlan
Gulîn ser da hedimî

Hoy lîlan toy lîlan
Xwezîl xwesiyam tinebya
Hoy lîlan toy lîlan
Xwezîl xwesiyam tinebya

Hoy lîlan toy lîlan
Barek kişmişê min hebya
Hoy lîlan toy lîlan
Bila dora min xewle biya

Hoy lîlan toy lîlan
Kêf kêfa min û te biya
Hoy lîlan toy lîlan
Kêf kêfa min û te biya

# Hoy meşkê




Hoy meşkê hoy meşkê
Ne dehnê hey ne keşkê

Hoy meşkê hoy meşkê
Kevaniyê zik meşkê

Meşka me nava rê de
Heçiya hat kelek lê da

Hoy meşkê hoy meşkê
Ne dehnê hey ne keşkê

Kevaniyê zik meşkê
Kevaniyê zik meşkê

Meşka me ya bizinan
Hiramê ya bizinan

Me keya tere zinan
Ser xatira kezî zeran

Hoy meşkê hoy meşkê
Ne dehnê hey ne keşkê

Kevaniyê zik meşkê
Kevaniyê zik meşkê

Meşka me ya beranan
Hiramê ya beranan

Me keya dor helanan
Ser xatira van yaran

Hoy meşkê hoy meşkê
Ne dehnê hey ne keşkê

Kevaniyê zik meşkê
Kevaniyê zik meşkê

Meşka me ya çûranan
Hiramê ya çûranan

Me keya dor zûranan
Ser xatira zeryanan

Hoy meşkê hoy meşkê
Ne dehnê hey ne keşkê

Kevaniyê zik meşkê
Kevaniyê zik meşkê

Meşka me ya nêriyan
Hiramê ya nêriyan


Me keya dor kêriyan
Ser xatira moriyan

Hoy meşkê hoy meşkê
Ne dehnê hey ne keşkê

Kevaniyê zik meşkê
Kevaniyê zik meşkê

# Hoy mîr hoy mîr

Andante




Hoy mîr hoy mîr hoy mîro
Ebdal Omero mîro
Bê rawo bê teybîro
Wê xewnê neke ji bîro

Ebdal xewnek dîtiye
Şêro xewnek dîtiye
Ji dayîkê re gotiye
Ew xewna te dîtiye

Min jî ew xewn dîtiye
Ew xewnek şeytanî ye
Ew xewnek şeytanî ye
Dayîkê tu tifalî

Jinbavê tu tifalî
Bê şûr û bê mertalî
Dayîkê ne tifal im
Jin bavê ne tifal im

Xweyê şûr û mertal im
Xweyê şûr û mertal im
Şûna Ristemê Zal im
Şûna Ristemê Zal im

Çûm şerê dêwê kal e
Çûm şerê dêwê kal e
Ebdal dê çit zozana
Şêro dê çit zozana

Vexwit ava keviyane
Vexwit ava keviyane
Dê xwit goştê berxwane
Dê xwit goştê berxwane
Hoy barkir barkir barkir
Ebdal Omera barkir
Hefsed hêştiran kar kir
Qesta zozanên jor kir

Ava tehl û tirş kar kir
Ebdal dê çit Mûsilê
Şêro dê çit Mûsilê
Mûsilê xirab kiro
Camiak lê ava kiro

Heremên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydaye Goyan

# Hoy nêrgiz




Hoy nêrgiz nêrgiz nêrgiz nêrgizê
nêrgizvanê
Hoy nêrgiz nêrgiz nêrgiz dewkilê
bêrîvanê
Nêrgiz gula li çiya
Nêrgiz gula li çiya
Nêrgiz bûka heciya
Nêrgiz bûka heciya

Hoy nêrgiz
Hoy nêrgiz
Nêrgiz gula li dera
Nêrgiz gula li dera
Nêrgiz bûka beglera
Nêrgiz bûka beglera

Hoy nêrgiz
Hoy nêrgiz
Îşev şevka baranê
Îşev şeva baranê
Cîka deynin li eywanê
Ciya deynin li eywanê
Nêrgiz mêrê te kanê
Nêrgiz mêrê te kanê

Hoy nêrgiz
Hoy nêrgiz
Îşev şevka berfêwo
Îşev şeva berfêwo
Cîka deynin li hewşêwo
Ciya deynin li hewşêwo
Nêrgiz mêrê te bêwo
Nêrgiz mêrê te bêwo
Hoy nêrgiz
Hoy nêrgiz

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hoy nermê




Hoy nermê nermê nermê
Delalê nermê li mal e
Delalê nermê li mal e
Hoy nermê nermê nermê

Şêrînê malxok bêhal e
Şêrînê malxok bêhal e
Havîn e dinya germ e
Havîn e dinya germ e

Tavên baran da ser me
Tavên baran da ser me
Min ji mala bavê şerm e
Min ji mala bavê şerm e

Çendî rind û delal e
Çendî rind û delal e
Çend govend e delal e
Çend govend e delal e

Çûme deriyok dadayî
Çûme deriyok dadayî
Cih û balik danayî
Cih û balik danayî

Keçik û kurik razayî
Keçik û kurik razayî
Çûme deryok daxisî
Çûme deryok daxisî

Cih û balik raxisî
Cih û balik raxisî
Keç û kurik nivistî
Keç û kurik nivistî

# Hoy şêxê mino




Hoy şêxê mino
Tu şêxê min î
Ezo qurbano
Tu şêxê min î
Tu li şev û rojê
Pişt serê min î
Tu li şev û rojê
L'xiyala min î
Feqê şêxê min
Hemû spî ne
Dargê serêlan
Hemû şilte ne
Hey şêxê mino
Bavê Fatmayê
Heçî kesê hato
Te telîm dayê
Xwezika bizmar bam
Simê mehînê
Dîsa bizmar bam
Simê mehînê
Gel şêxê xwe bam
Mekke û Medînê

# Hoy Şirnexê




Hoy Şirnexê hoy Şirnexê
Hoy Şirnexê xweş Şirnexê
Xweş tê dengê mak û berxê

Berî talan da Geznexê
Berî wêran da Geznexê
Me li Şirnexê kir dîwan e

Veyketin meznê Goyan e
Veyketin lawên Goyan e
Me sefere ser Gewdan e
Me hêleye ser Gewdan e

Geliyê Gewdan tavê dayê
Xiravê Gewdan tavê dayê
Wan lawên me rahêlayê
Dengê Gûlan li qesrê nayê

Me li Şirnexê kir coxî ye
Me li wêranê kir coxî ye

Wê veyketin mifirdî ye
Sefer li hozo, mêrê ye
Hozo mêr xirab kiriye

Geliyê Gewdan tavê dayê
Geliyê Gewdan tav lê zer bû
Eskerên li milan du ker bû
Brînên mêran ji xwînê ter bû

Hey gûlano kesê dayê
Te simbêl perê zirnayê
Mertal şor bû ser ebayê
Gulan kuşto korê dayê

Me Gulano kesê xwişkê
Me wêrano kesê xwişkê
Te simbêl perê mirîşke
Mertal şor bu ser enîşkê

Gulan kuşto korê xwişkê
Wêran kuşto emrê xwişkê
Pirga Cizîrê hêsin e
Pêde têto ro mezin e

Esîr girtin dê kujin e
Simbêlê Heyder sosin e
Heyder ket behra bê bin e
De raveye de raveye

Heyder paşa de ravey e
Silehê li milan her heye
De (bi) çi harî Mîrê xwe ye
Caw hato Mehmed derwêş e

Sûrî hişîn j' kavlan kêşa
Talan anî çelê mêşa
Çû hato Şêxkê qûtik e
Te li mistan tifega bedlig e

Talan girto kir hevrig e
Çû hato îsvê Eloy e
Te destan tifega nîmo ye
Talan anî serê ro ye

Herêmên Botan û Behdînan, çavkanî: Îdîsê Şirnaxî


# Hoy sorê




Hoy sorê sorê tu sora min î
Delalê sorê tu sora min î
Hoy sorê dema mal çû zozanan
Delalê dema mal çû zozanan
Hoy sorê dema Xwedê lê anî
Delalê dema Xwedê lê anî
Hoy sorê lê da barkê kizwanan
Delalê lê da barkê kizwanan
Hoy sorê dema Xwedê lê anî
Delalê ez malxo tu kevanî

Herêmên Botan û Behdînan

# Hoy yeman (Bavê Feqîr)




Giran: Bavê Feqîr carekî digo torina haniye her wextî way li minê
hewar li min hoy li minê oy oy...
gelî xelkîno hingî çavê min çavê bavê Feqî siyarê gênco diketî,
bavê feqîrê kalingê jî teye sê gule mamo zerê birîndar e hawar
dilo emrê mino

Lez: Hoy yeman hoy yeman hoy yeman hoy yeman
Heyranê seyranê wî çaçanê
Rî û singê ramûsanê memik pêçane seyranê

Rî û singê ramûsanê memik pêçane seyranê
Destê çaçanê bigre destê çaçanê bigre
Destê çaçanê bigre destê xopanê wer bibe
Dest û yeman oy yeman dest û yeman oy yeman

Radyoya Êrivanê

Heyranê wî seyranê wî can canê
Rî û singê ramûsanê memik pêçanê seyranê

Giran: Bavê Feqîr carekî digo torina haniye her wextî way liminê hewar limin hoy liminê oy oy...
gelî xelkîno hingî çavê min çavê bavê Feqî siyarê genco diketî bavê feqîrê kalingê jî teye sê kule mamo zerê birîndar e hawar dilo emrê mino

Lez: Min dîbû nav rezê te dîbû nav rezê
Mal xerab dîbû nav rezê girêdabû der derzî
Girêdabû der derzî destê çaçanê bigrin
Destê çaçanê bigrin destê xopanê wergrin
Dest û yeman oy yeman dest û yeman oy yeman
heyranê seyranê çaçanê
Rî û singê ramûsanê memik pêçane seyranê

Min dîbû ser bîrê te dîbû ser bîrê
Mal xerab dibû ser bîrê av kişand zincîrê
Av kişand zincîrê av kişandîbû zincîrê
Wey huy huy huy yeman
Heyranê seyranê çaçanê
Rî û singê ramûsanê memik pêçanê huy huy yeman

# Hûnê lê narîna min




Sibeya sibe nabe hûnê lê hûnê lê narîna min
Sibeye sibe nabe ka win lê başê lê bedewayê

Ez hatim te bivînim hûnê lê hûnê lê narîna min
Wez hatim te bivînim ka win lê başê lê bedewayê

Bivînim û birevînim hûnê lê hûnê lê narîna min
Bivînim û birevînim ka win lê başê lê bedewayê

Te ji dê û bava bistînim hûnê lê hûnê lê narîna min
Te ji dê û bava bistînim ka win lê başê lê bedewayê

Sibe ye tavê dayê hûnê lê hûnê lê narîna min
Sibe ye tavê dayê ka win lê başê lê bedewayê

# Hûr cemed




Hûr cemedo cemed e
Hûr cemedo cemed
Hûr cemedo cemed e
Sing cemed berf û lêlav

Hûr cemedo ber bestan
Me şikand bi her du destan
Hûr cemeda newalan
Me şikando bi xirtolan

Ser xatira bazin zêran
Hûr cemedo li kêriyan
Me şikand bi kêrigan
Ser xatira bazin spiyan

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Hûrik hûrik baranê




Hûrik hûrik baranê
Nuxtik nuxtik baranê
Ewkî li devkê eywanê
Bûkê li devkê eywanê
Ewkî bala xwi didanê
Zava bala xwi didanê

Hûrik hûrik baranê
Nuxtik nuxtik baranê
Ewkî li devkê eywanê
Zava li devkê eywanê
Ewkî bala xwi didanê
Bûkê bala xwi didanê

Herema Amedê

# Îro dîsa




Herema Serhedê

Çay golano çay golano
Mal barkirin çûn zozano
Çay golano çay golano
Mal barkirin çûn zozano
Ez qurbana te zozano
Mala rinkî li navdano
Ez kurbana te zozano
Mala rinke li navdano

Îro dîsa îro dîsa ez dimirim îro dîsa
Îro dîsa îro dîsa ez dimirim îro dîsa

Hember malan tijî mal e
Ez dişewitim ava sar e
Hember malan tijî mal e
Ez dişewitim ava sar e
Sibê werim te bibînîm
Êvar herim stuxwar e
Sibê werim te bibînîm
Êvar herim stuxwar e

Îro dîsa îro dîsa ez dimirim îro dîsa
Îro dîsa îro dîsa ez dimirim îro dîsa

Zozan zozan ez digerim
Şev û roja xewam nayê
Zozan zozan ez digerim
Şev û roja xewam nayê
Ez heyrana bejna bilind
Çû zozanî çima nayê
Ez heyrana bejna bilind
Çû zozanê çima nayê

Îro dîsa îro dîsa ez dimirim îro dîsa
Îro dîsa îro dîsa ez dimirim îro dîsa

# Îro roja rihetê




Îro roja rihetê bilbil birine dawetê
Îro roja rihetê bilbil birine dawetê

Dikevne ser govendê ha lêxin lêxin lêxin
Dikevne ser govendê lawiko xin pehnî lêxin

Bilbil bîska din hatî ha lêxin lêxin lêxin
Bilbil bîska din hatî lawiko xin pehnî lêxin


Dor bextê me sê ro ne ha lêxin lêxin lêxin
Soz bextê me sê ro ne lawiko xin pehnî lêxin

Lêdixin qeyde halone ha lêxin lêxin lêxin
Lêdixin qeyde halone lawiko xin pehnî lêxin

Îro roja rihetê bilbil birine dawetê
Îro roja rihetê bilbil birine dawetê

Herema Amedê

# Jaro





Tew tew jaro
Hey narimê narimê
Tew tew jaro
Hey narimê narimê
Tew tew jaro
Bilind e weke rimê
Tew tew jaro
Bilind e weke rimê

Tew tew jaro
Lo erdiko beyaro
Tew tew jaro
Xirabmalo beyaro
Tew tew jaro
Me lê çandî xiyaro
Tew tew jaro
Me lê çandî xiyaro
Tew tew jaro
Xwezî li vayê govendê
Tew tew jaro
Xwelî li vanê li malo

Tew tew jaro
Lo erdiko hilmişt î
Tew tew jaro
Xirab malo hilmîşt î
Tew tew jaro
Me lê çand barek kuncî
Tew tew jaro
Me lê çand barek kuncî
Tew tew jaro
Xwezî li vayê govendê
Tew tew jaro
Xwelî lî vayê runiştî

Tew tew jaro
Lo erdiko beyazo
Tew tew jaro
Xirab malo beyazo
Tew tew jaro
Me lê çandî pîvazo
Tew tew jaro
Me lê çandî pîvazo
Tew tew jaro
Xwezî li vayê govendê
Tew tew jaro
Xwelî li vayê tolazo

# Ji bêriyê tê




Ji bêriyê tê way ji bêriyê tê
Gundo kinam ji bêriyê tê

Bejin zirav dêre lê tê
Gundo kinam ji bêriyê tê

Bêrî bêriyê ber bang da
Gundo kinam ji bêriyê tê

Devê min xwar bijanga
Gundo dostam ji bêriyê tê

Ez hatim te bi gul gulî kim
Gundo lo kinam ji bêriyê tê

Xortara derde kul kirim
Gundo kinam ji bêriyê tê

Ji bêriyê tê way ji bêriyê tê
Gundo kinam ji bêriyê tê

Radyoya Êrîvanê

# Ji êvar da




Ji êvar da ha ji êvar da aha nînay nînay nînay
...zeriyê wez mêvanê te me
Ji êvar da tendûr dada aha nînay nînay nînay
...zeriyê bextê bavê te me
Cîkêm deyne di suka sar da aha nînay nînay nînay
...zeriyê wez mêvanê te me
Cîkêm deyne di suka sar da
Zeriyê meşya goved kişya tew zeriyê emrê ji tera weşya

Ji êvarda kew dibûn cot aha nînay nînay nînay
...zeriyê bextê bavê te me
Zeriyê dil û ceger im sot aha anînay nînay nînay
...zeriyê bextê bavê te me
Pir jê hiz kir jê ra negot aha nînay nînay nînay
...zeriyê bextê bavê te me
Pir jê hiz kir jêra negot
Zeriyê meşya govend kişya tew zeriyê emrêm ji te ra weşya

Herêma Serhedê

# Ka bûka min

Moderato






Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu bûka min
Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu delalya min
Koro Jin tev dibin
Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu bûka min
Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu delalya min

Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu bûka min
Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu delalya min

Nadime te ez nadime te
Nadime te ez bûka te
Ta ku xelatê wê neynî
Nadime te ez delalya te

De tu maniya negire
Xelatê wê hazir e
Mala min e pir dûr e
Ha li ber çemê xamur e
Ser de tê kuliyê hûre
Zarokan kure kur e
Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu bûka min
Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu delalya min
Nadime te ez nadime te
Nadime te ez bûka te
Nadime te ez nadime te
Nadime te ez delalya te
Defçiya def teqandin

Siwara hespê xwe westandin
Berbûya mes qetandin
Mi xwendiyê xwe civandin
Sed beran jê gurandin
Def û dawet darandin
Ka bide min tu bûka min
Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu bûka min
Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu delalya min

Nadime te ez nadime te
Nadime te ez bûka te
Ta ku qelenê wê neynî
Nadime te ez delalya te
Qelenê wê aniye
Sed miyê qerqaşî ye
Sed zêrê reşadî ye
Çil dêrê qeytanî ye
Yek hespê du zînî ye
Cot gurzê rustemî ye
Mavzereke rusî ye
Ka bide min tu bûka min
Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu bûka min
Ka bide min hay ka bide min
Ka bide min tu delalya min

Nadime te ez nadime te
Nadime te ez bûka te
Nadime te ez nadime te
Nadime te ez delalya te

Hey mirovê ha zordar
Bese te xwîna me xar
Dinê tevî bidin te
Çavê te lê nabe bar
Dinê tev jî ya te be
Çavê te lê nabe bar

Her bînîn bînin bînin
Lawno dara win bînin
Her bînîn bînin bînin
Keçno stûna win binin
Ev teresa nayê rê
Lêxin bûkê bistînîn
Ev bêbava nayê rê
Lêxin bûkê bistînin

# Kanî û serkanî




Soranî / Gelerî

Nexoş û mestî dû çawî kalim
H'eqim be deste eger binalim
Bo dû çawî ciwan emcar e'bdalim
Qed barîkey şil û mil
Belek berzî pajine pir
Awirêkim lêde
Bot sûtam be dil
Kanî û ser kanî ser çeşmey gul bê
Nei'let lew kîjey şûy nabedil bê
Ew ser zemîne boy toy lê naye
Awirî tê ber bê her şew le laye
Ba zahîd pê bizanê dil be tenhaye
Balaket berze hêndey minarê
Kê tefrey dawî berdî lê barê
We kew dexwênî şew le nizarê
Rêgakem dûre menzilim kwêstane
Şew be ser dadê xwe lêm mîwane
Min le xerîbî, yar le êrane
Heste le xewê bizane çîm dewê
Le gerdinî zerdit dû maçim dewê
Le xudam telebe h'ewt kostit kewê
Yan ciwabê be xêr yan dilniyam ke
Kem deste û damên şêx û melam ke
Bes lewe ziyatir dil muftelam ke

# Kanî




Kanî kanî avsar kanî
Malan barkir li ser danî
Felek destê xwe berhev ke
Me mirazê xwe hilnanî

Diçim û têm bibînim
Xwazgîniyê te bişînim
Ger bidin min bira bidin
Ger nadin, te direvînim

Kanî kanî avsar kanî
Malan barkir li ser danî
.Kanî kanî şêrîn kanî
Malan barkir li ser danî
Du rindan je av hilanîn
Yek ya min bû min nizanî

Kanî kanî avsar kanî
Malan barkir li ser danî
Min û te tev peyman danî
Ger poşman bî tu dizanî.

Anadoliya navîn, çavkanî : Xalê Reşîd

# Kanya li pal benda





Ha leylo leylo leylo ha leylo mi leylo
Ha leylo leylo kanya li pal benda leylo
Ha leylo çima çima ha leylo mi leylo
Ha leylo çima çima kanya li pal benda leylo
Garisê nav genima
Garisê nav genima
Fincanê dest hakima
Fincanê dest hakima
Dest girt û rû ramîsa
Dest girt û rû ramîsa
Mi'd go bes te'd go çima
Mi'd go bes te'd go çima

Ha leylo
Ha leylo
Ha leylo dîsa dîsa ha leylo mi leylo
Ha leylo dîsa dîsa kanya li pal benda leylo
Hilhilê nav garisa
Hilhilê nav garisa
Fincanê dest fêrisa
Fincana dest fêrisa
Dest girt û rû ramîsa
Dest girt û rû ramîsa
Mi'd go bes te'd go dîsa
Mi'd go bes te'd go dîsa kanya li pal benda leylo
Ha leylo
Ha leylo leylo kanya li pal benda leylo

Herema Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Kaniyê li gunda





Ho bi leylo leylo leylo kanê xweşkokêd mîran
Ho bi leylo leylo leylo kanê leylokêd mîran
Kanya li gund hizhizî kanê xweşkokêd mîran
Kanya li gund hizhizî
Kêranê nav derizî
Kêranê nav derizî
Mi leylo ji bavê dizî

Kanyê li gund herî ne
Kanyê li gund herî ne
Kêranê nav birî ne
Kêranê nav derî ne
Leylo ji bavê kirîne
Here leylo werîne

Kanya li gunda şerbet e
Kanya li gunda şerbet e
Kêranê nav duqet e
Kêranê nav duqet e
Mi leylo ji bavê xweste
Mi leylo ji bavê xweste

Herema Amedê, çavkanî : Hilmi Akyol

# Karwane




Karwane hey karwane
Karwan bo wa bê hestî
Beşkê xuda qafle başî
Nakirê tawêk rawestî
Yarî min degel toye
Dest denême naw destî
Zor detirsim neybînim
Maç kem dû çawî mestî

Xemgîn u perêşanim
Aramim niye satêk
Seferêkim kewte ber
Rêye hat u nehatê
Çawerême le rêga
Ba karwan bê u bimgatê
Yarim degel karwanê
Qewle dû maçim datê

Karwane hey karwane
Karwan kewte bin daran
Kîj defiroşin henaran
Daney be sed dînaran

Bo minî malwêran nabê
Dest nada bo hezaran
Peşêw u dil şikawim
Welî şax u kêwanim
Deste u ejno danîştûm
Muntezîrî karwanim
Aramî lê helgirtûm
Derwa aramî giyanim
Belku bika ruh´mê be min
Ew şew bê be mîwanim

Karwane...
Karwan...
Kîj...
Daney...

# Karwan e




Xemgîn u perêşanim
Aramim niye satêk
Seferêkim kewte ber
Rêye hat u nehatê
Çawerême le rêga
Ba karwan bê u bimgatê
Yarim degel karwanê
Qewle dû maçim datê
Karwane u hey karwane
Karwam kewte bin daran
Kîj defiroşin henaran
Daney be sed dînaran
Bo minî malwêran nabê
Dest nada bo hezaran
Peşêw u dil şikawim
Wêlî şax u kêwanim
Deste u ejno danîştûm
Muntezîrî karwanim

Aramî lê helgirtûm
Derwa aramî giyanim
Belku bika ruh´mê be min
Ew şew bê be mîwanim
Karwane hey karwane
Karwan bo wa bê hestê
Beşkê xuda qafle reşê
Nakirê tawêk rawestê
Yarî min degel toye
Dest denême naw destê
Ba xerîbî deydenêm
Maç kem dû çawî mestê

# Katî behare






Katî behare çawekem ba biçine baxî dû be dû
Gul biçinîn be her dû dest bênîne sema dost û cû
Saqî be helperînewe dêt û deçê lenêw çemen
Xunçe be pêkenînewe dil derifênê zû be zû
Bulbul û qumirî her teref sazî tereb deken keçî
Le şaxî gul le baxî dil xo denwênê kundebû
E're'r û ser û narewin pakî be dem nesîmewe
Be reqis û şewiq û zewqewe dên û deçin be arezu
Edeb zîra le zîndeber tereb le bax û gulşena
Le lay beşer le bo dewa nema h'eya û abirû
Xoşiye keyfe şadiye bezime heraye çopiye
Be î'şqî bûkî bulbulê xunçe ke bû ke dil xesû
Raz û niyazî dil deken bulbul û qumrî pêkewe
Herdû be fikrî zikrewe xunçe be yek deden be şû
Her be tenê îmamiye bê beş û behre mayewe
Xermanî xem be badeka denikî estem deka be tû

# Kê minî kuşt





Kê minî kuşt ew kiçe ciwane
Malyan le sîley qebrane
Boy deçme lay diyane
Kê minî kûşt ew kiçe diyane

Mang le asman rawestawe estêran dewryan lê dawe
Yarî xomew lêm torawe
Kê minî kûşt...

Mang le asman bîst û sêye le ser sînet elf û bêye
Heta demrim temam pêye
Kê minî kûşt...

Soranî / Gelêrî

# Keç Meyrokê




Keç Meyrokê Meyrokê lê lê lê Meyro
Şîrînê şemamokê lê lê Seyro

Keç Meyroka mêrin î lê lê Meyro
Bab delala mêrin î lê lê Meyro

Beb delala mêrîn î lê lê Meyro
Tu xizêma zêrîn î lê lê Meyro

Tu xizêma zêrîn î lê !ê Meyro
Ser textê law qîzîn î lê lê Meyro

Tu xizêma zêrîn î lê lê Meyro
Gewrê rindê Meyro

Herema Amedê

# Kêçan xwarim




Ser nişûvî dikim hewar
Dû kêçên rabûn ji xewa
Serê wan serê mêkewa

Ya Reb çi bikim kêçan xwarim
Xaliq Rebbî çend dijwar in

Ser nişûvî mel kevzine
Dû kêçên li pey min d'bezine
Bû şeq şeqa şaxên van kêçan e
Ev ne kêç in ev bizin in

Ya Reb çi bikim kêçan xwarim
Xaiiq Rebbî çend dijwar in

Ser nişûvî me êrêwo
Dû kêç derketin j'Dêrêwo
Dûvkê wan dûvkê bêrêwo

Ya Reb çi bikim kêçan xwarim
Xaliq Rebbî çend dijwar in

Ser nişûvî me li ermiştî
Dû kêçên min re gihiştî
Ji min xelas kir hestiyê piştî

Ya Reb çi bikim kêçan xwarim
Xaliq Rebbî çend dijwar in

Ser nişûvî mala melayî
Ber min danî goştî gayî
Kêça mezin nehêlayî

Ya Reb çi bikim kêçan xwarim
Xaliq Rebbî çend dijwar in

Ser nişûvî mala Şehbaz e
Ber min danî nan û pîvaz e
Kêça kiçik rih çil gaz e

Ya Reb çi bikim kêçan xwarim
Xaliq Rebbî çend dijwar in

Ser nişûvî bûm pira mezin
Dû kêçên pey min dibezin
Goştê leşê min jê tezin

Ya Reb çi bikim kêçan xwarim
Xaliq Rebbî çend dijwar in

Van sofiyan gote gote
Dû kêç ên bi hevre gote
Go emê xwe li te bikin melkemot e

Ya Reb çi bikim kêçan xwarim
Xaliq Rebbi çend dijwar in

# Keçê tu keça gulan î




Keçê tu keça gulan î
Tu bekçiya bexçan î
Tu bekçiya bexçan î
Rokî wer ba min mêvan î
Rokî wer ba min mêvan î
Rokî wer ba min mêvan î
Keçê tu keça gulan î

Ew qelemê bi dest te da
Min da ber çentê te da
Tu gula xwendevan î
Tu gula xwendevan î
Pir zana û biryan î
Pir zana û biryan î
Pir zana û biryan î
Tu gula xwendevan î

Keçê tu keça...

Keçê tu keça jor î
Çi rindî gula jor î
Wa porê hine sor î
Wa porê hine sor î
Tu destmal dayê dor î
Tu destmal dayê dor î
Tu destmal dayê dor î
Keçê tu keça dilan î

Keçê tu keça...

# Keçelo





Tu bi lî lî lî lî lî
Ala ala keçelo

Keçelo du biran e
Li deştê rawestane
Kêl û nîv heqê wan e
Yek dan e yek arvan e

Keçelê pîr eyşanê
Meşa ji pare berdanê
Heta qitrê Şêxanê
Li wê derê gihanê
Heqê serê wî danê

Keçelo ser mezino
Emelê serê mino

# Kejê tu kej î




Kejê tu kej î welle billeh tu kej î
Çavê min b'te ket dilê min keto te jî
Keçê elwendê çil bisk û çil kezî

Çavê min b' te ket ez neçûm mala xwe jî
Çokê min şkestin ez neçûm mala xwe jî
Kejê tu kej î welle ,billeh tu kej î
Çavê min b'teket dilê min keto te jî

Didanê vê keçikê hebê birincî
Çavê vê keçkê mîna hebê qolincî
Kejê tiştîr e ketiye mala me jî

Kejo beran e beran berdan helanan
Stûwê keja min stûwê qumça mercanan
Min divê ramûsim guneh stûwê cîranan
Kejo nêriyan nêrî berdan kêrî ye

Stûwê keja min stûwê qumça gayî ye
Min divê ramusim guneh stûwê gundî ye
Kejo bizinan bizin kizinan

Stûwê keja min stûwê qumça bazinan
Min divê ramûsim guneh stûwê nezanan

Heremên Botan û Behdînan, çavkanî : M. Arif Cizîrî

# Keko Ehmedo




Keko Ehmedo hey lê hey lê lê lê
Mîrdê te gaz ke hey lo yeman e
Hespê xwe bajo hey lê hey lê lê lê ji pirê derbaz ke hey lo yeman e
Tevrêza cane hey lê hey lê lê lê mirdê daxazke hey lo yeman e

Keko Ehmedo hey lê hey lê lê lê
Mîrdê dexunî hey lo yeman e
Hespê xwe bajo hey lê hey lê lê lê girêde gûnî hey lo yeman e
Tevrêza cane hey lê hey lê lê lê mîrdê te bistînî hey lo yeman e

Keko Ehmedo hey lê hey lê lê lê
Mîrkê qereça hey lo yeman e
Hespê  xwe bajo hey lê hey lê lê lê here dereca hey lo yeman e
Tevrêza cane hey lê hey lê lê lê fîl û fereca hey lo yeman e

Keko Ehmedo hey lê hey lê lê lê
Mîrdê te gazke hey lo yeman e
Keko Ehmedo hey lê hey lê lê lê
Mîrdê te gazke hey lo yeman e

# Keleşo nobedaro




Keleşo nobedaro wey lo lo lo lo lo lo wî bi lo lo
Lawiko wî nobedaro yar dilê min emrê te

Tu ji nobê were xwaro wey lo lo lo lo lo lo wey lo lo
Tu ji nobê were xwarê yar dilê min emrê te

Ez çûm derî dadabû wey lo lo lo lo lo lo wey lo lo
Nobedar jî paldabû yar dilê min emrê te

Keleşo nobedaro lo lo lo lo lo lo wey lo lo
Rebeno gunekaro yar dilê min emrê te

Şev yeke wî diz hezaro wey lo lo lo lo lo lo wey lo lo
Şev yeke wî diz hezaro yar dilê min emrê te

Radyoya Êrivanê

# Kember zêr




Herema Amede

Kember zêrê kember zêr
Kember zêrê qaş mermer

Fîstan sorê kezî zer
Kembera xwe dida ser
Lawkê xemla xwe girêda
Reş rihana xwe dida ser

Kemberzêra heldayî
Bav delala heldayî
Xizim zêra badayî
Feq tuj lewra axayî

Kemberzêra Boşatî
Bav delala Boşatî
Tu bi xizêma şimşatî
Zû çûyî dereng hatî

Kemberzêra zin zinî
Bavdelala zin zinî
Xizimzêra mezin î
Bimrî û bijî a min î

# Kemere şil




Hey dad hey bê dad kemere şil lew bê dadiye
Kes le derdî kes agadar niye
Kemere şil kemere şil boy dênim kemere şil
Şil şil ca bîbeste ay ba têr balat bînim

Şewan denustim be tasetewe bon enêm be boy henasetewe
Kemere şil kemere şil boydênim kemere şil
Şil şil ca bîbeste ay ba têr balat bînim

# Keyan




Erê kenyan û kenyan dey dey kenyage beşkeym
Erê le diway balaket dey dey dil be kî xuşkeym

Erê cuy helal malî dey dey destit bigirtam
Erê geday şar we şar dey dey erat bikirdam

Erê kenyan û kenyan...

Erê wefîday malekey dey dey rûy le çemit bam
Erê weîday wirdexal dey dey dewrî demit bam

Erê kenyan û kenyan...

# Kepra çêkin




Kepra çêkin lê lê lê
Kepra çêkin way way
Kepra sor e lê lê lê
Kepra sor e way way
Heft tifingê lê lê lê
Dev lê mor e way way
Eliyê Remo lê lê lê
Berda di bor e way way
Kepra reş e lê lê lê
Kepra reş e way way
Heft tifingê lê lê lê
Dev binexş e way way
Eliyê Remo lê lê lê
Berda di meşe way way
Kepra şîn e lê lê lê
Kepra şîn e way way
Heft tifingê lê lê lê
Dev zêrîn e way way
Eliyê remo lê lê lê
Gel me nîne way way
Kepra spiy e lê lê lê
Kepra spiy e way way
Heft tifingê lê lê lê
Dev rîşiy e way way
Eliyê Remo lê lê lê
Berde têye way way

# Ker kanê




Ker kanê ker kanê lo kurê kerê ker kanê
Ker kanê ker kanê lo lawê kerê ker kanê
Ker birine dîwanê lo kurê kerê ker kanê
Ker birine dîwanê lo lawê kerê ker kanê
Fincana qehwê danê lo kurê kerê ker kanê
Fincana qehwê danê lo lawê kerê ker kanê
Ker dane xeberdanê lo kurê kerê ker kanê
Ker dane xeberdanê lo lawê kerê ker kanê

Ker kanê ker kanê lo kurê kerê ker kanê
Ker kanê ker kanê lo lawê kerê ker kanê
Diranê kerê mircan in lo kurê kerê ker kanê
Diranê kerê mircan in lo lawê kerê ker kanê
Biryê kerê qeytan in lo kurê ker kanê
Biryê kerê qeytan in lo lawê kerê ker kanê
Ker neyarê gelan in lo kurê kerê ker kanê
Ker neyarê gelan in lawê kerê ker kanê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Kerîm lawo çeqilmast




Kerîm lawo çeqilmast
Min meyand û nebû mast
Kûçikê mexmer alast
Bû koçerekê bi rast
Kerîm lawo çeqilmast

Ez çûme Şam û Heleb
Anîn sê bizinê celeb
Yeke kor û yeke pîr
A dinê bizina tiştîr
Bûm hemberê mala mîr
Kerîm lawo çeqilmast

Herêma Botan

# Kes nazanê






Sî û mirawî de porin
Beser beh'ran da denorin
Kîjî ew e'srey kem şertin eman eman
Yekcar zû qewlan degorin


Balexaney berew şertî
Birwane çerxî rûmetî eman eman
Wexte şxet bim azîzim le h'esretî

Kes nazanê be kê bilêm
E'şqî şemamey baxelêm eman eman
Swêndyan dawim azîzim rastî nelêm

Rêh'an qezat le ferdêkim
Her satey tûşî derdêkim eman eman
Mubtelay desmal zerdêkim

Sed neh'let le xom û le xom
H'eyfê bo u'mrî rabirdûm eman eman
Muh'tac be destî toy kirdûm

# Ket xermiyanê




Ket xermiyanê ket xermiyanê
Cotê ewkî ket xermiyanê
Cotê keko ket xermiyanê
Sifr û sênî çû ji talanê
Ew kî mîrê li dîwanê
Ew kî begê li dîwanê
Keko begê li dîwanê

Ew kî remla li diyaran e
Keko remla li diyaran e
Ew kî qutya ber dilan e
... Teyrê li ser testan e
... Rîşkê guharan e
...Roviyê çikalan e
...Biçûkê van biran e
... Îlmê van melan e

Ket xermiyanê ket xermiyanê
Cotê ew kî ket xermiyanê
Cotê keko ket xermiyanê
Sifr û sênî çû ji talanê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Ketan ketane







Yarî min zor ciwane
Şox û mêhrebane
Kîjoley Kurdistane
Ketane û Ketane
Hawar Ketane
Befirî kelîxane
Bimirim Ketane
Wenewşey kwêstane
(Beh beh ketane) Çi mêhrebane
Kîjoley Kurdistane...
(Nasike û zor ciwane) Hawar çi ciwane
Şox û berqerare
Çi nasik û nazdare
Yek car şermezare
Şox û efsun kare
Hawar Ketane...
Ketanem bo bang ken
Dey kiley le çawan ken
Derdî min derman ken
Hawar Ketane...
Ketaney Emîrî
Bo çi le min dilgîrî?
Min baz û to nêçîrî
Hawar Ketane...
Ketaney Mîr Qazî
Min dekem rawe bazî
Çend ciwan û mumtazî
Hawar Ketane...
Min dîbam emcare
Derdî emin zare
Le gwêt daye gware
Çi şox û nazdare
Hawar Ketane

Ketanem bo bang ken, ey wey Ketane
Ca kilêy le çawan ken, şil şil Ketane
Derdî min derman ken, xanim Ketane
Derom rêm nedîwe, ey wey Ketane
Befirim lê barîwe, ey wey Ketane
Ca gulim lê xemlîwe, bimirim Ketane
Emşêw şew zistane, yarî min zor ciwane
Kilêy le çawane, her delêy xermane
Hewran ko be koye
Hewran gaze- gaze
Hewran têkiyan dexûrî

# Ketane




Ne derdim weku ciw .nê giyan derde daran e
Ne birînim weku wella birîndaran e
Wextî cêjiwanê ciwanê giyan bangî şêwane
Ketane û ketane, hey wey ketane
Ketanem bo bang ken, zor be î'nwane
Ketanem bo bang ken şede le milane

Çawî le çaw nerman
Pire le kile û derman
Helnaye le şerman
Xoşewîstî ew şare bimirim ketane
Ketanem...
Ketanem...
Ketanem...

Ew şew şew zistane
Befiran girit kolane
Lêm têkçû cêjiwane
Xoşewîstî...
Ketanem...
Ketanem...

Ketanem...
Du malin le roxin
Kîjyan ciwan û şoxin
Singiyan sêw û qoxin
Xoşewîstî...
Ketanem...
Ketanem...
Ketanem...

Malî le mer dostan
Be xêr neçine kwêstan
Lêman debirin dostan
Xoşewîstî...
Ketanem...
Ketanem...
Ketanem...

Malî de mer daran
Royîn bo hewaran
Lêman debirin yaran
Xoşewîstî...
Ketanem...
Ketanem...
Ketanem...

# Ketane




Ne derdim weku ciwanê giyan derde daran e
Ne birînim weku wella birîndaran e
Wextî cêjiwanê ciwanê giyan bangî şêwane
Ketane û ketane, hey wey ketane
Ketanem bo bang ken, zor be î'nwane
Ketanem bo bang ken şede le milane

Çawî le çaw nerman
Pire le kile û derman
Helnaye le şerman
Xoşewîstî ew şare bimirim ketane
Ketanem...
Ketanem...
Ketanem...

Ew şew şew zistane
Befiran girit kolane
Lêm têkçû cêjiwane
Xoşewîstî...
Ketanem...
Ketanem...
Ketanem...


Du malin le roxin
Kîjyan ciwan û şoxin
Singiyan sêw û qoxin
Xoşewîstî...
Ketanem...

Ketanem...
Ketanem...

Malî le mer dostan
Be xêr neçine kwêstan
Lêman debirin dostan
Xoşewîstî...
Ketanem...
Ketanem...
Ketanem...

Malî de mer daran
Royîn bo hewaran
Lêman debirin yaran
Xoşewîstî...
Ketanem...
Ketanem...
Ketanem...

# Kevok im lê lê




Ez kevok im lê lê lê lê…
Lê lim lê lê lê lim lê lê lê lê lê lê…
Ez kevok im way way ez kevok im qurbano
Ez kevoka şîn im way way kevoka şîn im qurbano
Li ser bana bin bana hûr datînim lê lê
Li ser bana bin bana hûr datînim lê lê
Ez aşiqê lê lê lê lê…
Çavê şîn im way way çavê şîn im qurbano
Ez aşiqê lê lê lê çave şîn im qurbano
Ez aşiqê lê lê lê çave şîn im qurbano

Ez kevok im lê lê lê lê…
Ez kevok im way way ez kevok im qurbano
Kevoka reş im way way kevoka reş im qurbano

Heremên Botan û Behdînan, çavkanî: M. Arif Cizîrî

Li ser bana bin bana hûr dimeşim têm têm
Li ser bana bin bana hûr dimeşim têm têm
Ez aşiqê lê lê lê lê...
Çavê reş im way way çavê reş im qurbano
Ez aşiqê lê lê lê çave reş im qurbano
Ez aşiqê lê lê lê çave reş im qurbano

Ez kevok im lê lê lê lê...
Ez kevok im way way ez kevok im qurbano
Kevoka nêr im way way kevoka nêr im qurbano
Li ser bana bin bana hûr diçêrim way way
Li ser ba na bin bana hûr diçêrim way way
Ez aşiqê lê lê lê lê...
Jinika bi mêr im way way jinika bi mêr im qurbano
Ez aşiqê lê lê lê jinika han im qurbano
Ez aşiqê lê lê lê jinika han im qurbano

# Kew hêlûn hêlûn




Kew hêlûn hêlûn hêlûn
Xanê lê canê lê kew hêlûn
Kew hêlûn hêlûn hêlûn
Xanê lê canê lê te ez kuştim

Hanî di gola da şûştin
Xanê lê canê lê kew hêlûn
Hanî di gola da şûştin
Xanê lê canê lê te ez kuştim

Kew hêlûna zinara
Xanê lê canê lê kew hêlûn
Kew hêlûna zinara
Xanê lê canê lê te ez kuştim

Xew xweş bû li paşilê yara
Xanê lê canê lê kew hêlûn
Xew xweş bû li paşilê yara
Xanê lê canê lê te ez kuştim

Kew hêlûn hêlûn...

Radyoya Êrivanê

# Kewmil




Şerte le daxit keşkol le kol kem
Birom le Bexda ber çawit çol kem
Kewmil, kewmil, kewanî
Kûştimî çawî ciwanî
Ew derdey min dekûjê
Jinî guley mêrdanî

Le nêw Sablax da burcêk diyare
Be qed ew burce xem le dilim bare
Reng zerd û zeî'f lêwim be bare
Kewmil, ...

Ya sultan hawar mal we berzewe
Guleket bimrê be dem lerzewe
Kewmil, Kewmil, kewanî
Kûştimî çawî ciwanî
Le Sileman Kendî xom dem be çom da
Bo Ayşê çawmest le berdezerd da
Kewmil, ...
Heste le xewê bizane çîm dewê
Le gerdinî zerdit dû maçim dewê
Derdî emin û to le guleket kewê
Kewmil, kewmil...

# Kewyar




Kewyarêy kewyar, xas kewyarêkî
Dem ter û lêw al e'ceb yarêkî
Wenewşem deçinî, melo be melo
Xelkan pêy şad bûn, eminîş rencero
Kewyarêy kewyar erdelaniye
Sewzey qed barîk şil û mil Mûkiryaniye
Ew qed barîke deynasim xo Bokaniye
Wenewşem deçinî pencem da le gul
Şewgarim şeq kird, negeyîm be dil
Kewyarêy kewyar kewyarey xomî
Berezay şaxan, kenêrey çomî
Leber dilî min sultanî romî
Yan ciwabê be xêr, yan dilniyam ke
Bes le me ziyatir şêt û şeydam ke
Wenewşem deçinî melo tay taye
Dilekem xerîb yar be tenhaye
Detirsim bimrim netbînimewe
Be ciwane mergî ser binêmewe

# Kezî zer




Kezî zer û kezî zer
Hawar hawar kezî zer
Kezî zer û kezî zer
Min xulama guliyên zer

Cotên memkan hatinder
Dilê min de bû keser
Kezî zera Goyanî
Min dîto serê banî

Îşaret kir nezanî
Kezî zera Şirnexî
Perçemê bide rexê lo
Tû ji min re nabî exî

Hey ordek, ordek ordek ordek
Ordeka gola wanê wo
Diramusim çavên belek
Bejin şemala şevê wo
Kezî zer û kezî zer hawar hawar kezî zer

Xûdan memkên girover
Min guliyên zer
Weke sêva xelatî
Serî sor û binî zer

Wek berfika zinaran
Siha darê tim li ser
Wek penirê biharan
Min givaşt û av jê her

Tû'j govendê were der
Te'd ramûsim dîsa her
Kezî zera hit hitî
Binya malan şemitî
Dava taqan lewitî
Nava kalan peritî

# Kezî zerê




Ha wer wer lê
Ha wer wer lê
Ha wer wer lê kezî zer
Ha wer wer lê ha wer wer
Kur xulama guliyê zer

Tuji govendê derkev der lê
Ha wer wer lê kezî zer
Tuji govendê derkev der
Kur xulama guliyê zer

Te ra bêjim çend xeber lê
Hawer werlê kezî zer
Tera bêjim çend xeber
Kur xulama guliyê zer

Te dibê runê te dibê her lê
Hawer wer lê kezî zer
Te dibê runê te dibê her
Kur xulama guliyê zer
Keziyê milê te cotin lê
Hawer werlê kezî zer
Keziyê milê te cot in
Kur xulama guliyê zer

Li ser milan da digotin lê
Hawer wer lê kezî zer
Li ser milan da digotin
Kur xulama guliyê zer

Bîhna memika em sotin lê
Hawer wer lê kezî zer
Bîhna memika em sotin
Kur xulama guliyê zer

Keziyê milê te sê ne lê
Hawer wer lê kezî zer
Keziyê milê te sê ne
Kur xulama guliyê zer

Li ser milan de têne lê
Hawer wer lê kezî zer
Li ser milan de têne
Kur xulama guliyê zer


Keç mêvanê malê ne lê
Hawer wer lê kezî zer
Para kurkê xelkê ne
Kur xulama guliyê zer

# Kî çu bajêr




Ew kî çû bajêr e lo lawiko
Ew kî çû bajêr e eba gewro
Zava çû bajêr e
Zava çû bajêr e
Ew kî tê di rê re
Ew kî tê di rê re
Keko tê di rê re
Zava tê di rê re
Tajî tûle pê re
Tajî tûle pê re
Aqlê dostê jê re lo lawiko
Aqlê yarê jê re eba gewro

# Kîjan deçine mêrgolan




Kîjan deçine mêrgolan, wella mêrgîne
Têkra deçinin wenewşan
A'req lew heniyey detkê, tik-tik, dêne xwar
Ter deken paniyey kewşan
Kîjê bêne maçit kem, de ba ratmûsim
Webal be estoy pêxoşan
Çawî xumar û nêrgiz, boçî naye bîbînim?
Pir be dil temaşay bikem, derbiçê giyanî şîrînim
Ya rebî mergit nebînim

Kîjan deçine mêrgolan, ey wey mêrgîne
Têkra deçinin helalan
A'req le henyey detkê, tik-tik dête xwar
Ter deken wirde xalan
Kiçê bêne maçit kem, car car ratmûsim
Webal bestoy delalan

Çawî xumar û nêrgiz boçî naye bîbînim?
Kîjan deçine mêrgolan, ey wey mêrgîne
Têkra deçinin bêzaye

E'req le henyey detkê, tik-tik dête xwar
Ter bûn xalî Leylaye
Le wetey ew kişem dîwe
Hîç kesim webîr naye
Çawî xumar û nêrgiz boçî naye bîbînim?
Kîjan deçine mêrgolan, ey wey nêw şaxan
Têkra deçinin rêwasan
Beyanî zahîr dekird... hat bo lam
Xal û meman nenasan
Be pêşkêşî balat bê giyane
Hemû mulkî Sinasan
Çawî xomar û nêrgiz boşî naye bitbînim?

Kîjan deçine mêrgolan, ey wey mêrgîne
Têkra deçinin wenewşe
A'req lew heniyey detkê tik-tik
Terdeken paniyey kewşe
Kîjê le dayikit metirse
Bom were derkî h'ewşe
Çawî xumar û nêrgiz boçî naye bîbînim?

Kîjan deçine mêrgolan.., ey wey mêrgîne
Têkra deçinin kenêrê
E'req le heniyey detkê
Terdeken xalî mêrê
Delên necîb hatewe, wellay yarî min...
Be a'm bilên bexêrê
A'şiqî çawî Leyla bûm... min ta mawim be xêrê
Çawî xumar û nêrgiz boçî naye bîbînim?

Kîjan deçine kwêstanan, nêw şaxan
Be a'm deken rêwasî
Be sergerdî balat bê, erê bot nemam
Hemû e'lî Bilbasî
Xizmî xotim ciwanê giyan
Boç bê lutifî û namnasî
Çawî xumar û nêrgiz boçî naye bîbînim

# Kîjê mero ciwanî




Le bê lutifiyeket cergim birawe dey
Seyid to şalit (mirdim) ber ke bem lawe dey
Tu bî to xuda, giyanim ber ke bem lawe dey
Kîjê mero ciwanî, sêwî ser likanî, çend le ser dilanî
Çi xuda berdare, ciwanê xerqim key le xem dey
Meylim bideye, (mirdim) yan zor û yan kem dey
Helse le xewê, ey wey bizane çîm dewê dey
Le gerdinî zerdit esmer û maçim dewê dey
Kîjê mero ciwanî sêwî ser likanî baxî h'esen xanî

# Kîjê xoy dawim nîşan





Kîjê xoy dawim nîşan zulfî kirdiwe perêşan
Perçem wek gul û reyh'an eman î'lacim ken le pêkan

Dîme ew çawe ciwane şewim biwe beyane
Rambestin be dua'yek halim zor perêşane

Ew kîje neşmîlane ciwan û le ber dilane
Be naz heldênê çawan zulfî deka perêşane

Soranî / Gelêrî

# Kîjoley nazdar




Xunçey dilekem arezû
Bo bibe be gul zû be zû
Xudaye şûkur be to
Min heme (mehtab) xal le rû
Rîşey cergim mehtabe
Maçî bo min kebabe
Rîşey cerg û dil mehtab
Maçit bo min wek şerab
Xuda, hêndem nekûjî ta
Mehtab pêm delê babe
Kîjoley nazdar hat be lence û lar
Mehtab mezedar.. Namdwênê
Qesiye be naz bimsutênê
Xerîke cergim derdênê

# Kina min




Ha kina min kina min lê ca kina min kina min lê
Kina min kina min lê tew zerya ber mala min lê

Kina min kin nîne lê ha kina min kina min lê
...zerya ber mala min lê
Binevşe xatûn e lê ha kina min kina min lê
...zerya ber mala min lê

Ha kina min...

Kina min kevnik danî ha kina min kina min lê
...zerya ber mala min lê
Nexşê navê gundayî ha kina min kina min lê
...zerya ber mala min lê
Navê min li serî danî ha kina min kina min lê
....zerya ber mala min lê

Ha kina min...

Herêma Serhedê, çavkanî : Aydin Helo

# Kinga min




Kinga min kin nîne lê kinê lê
Dema xwe di xemilîne lê gewrê lê

Cergê min dihelîne lê kinê lê
Havîn e havîn e lê gewrê lê

Weriya belkê gûnê lê kinê lê
Kinka min xatûn e le gewrê lê

Bihar e, bihar e lê kinê lê
Weriya belkên daran lê zeriyê lê

Kinga min xweşik e le kinê lê
Payîz e payîz e lê zeriyê lê

Weriya belkên gûz e le kinê lê
Kinga min ezîz e lê zeriyê lê

Kinka malê dinyayê kinê lê
Sing mêrga xunav daye zeriyê lê


Lawikan ra hêlayê kinê lê
Kinka min kinîne lê kinê lê

Dema xwe di xemilîne lê zeriyê lê
Cergê min dihelîne lê kinê lê

Weriya belkên bî ye lê zeriyê lê
Kinka min zerî ye lê kinê lê

Herêma Serhedê

# Kiras kuderî awrîşim




Kiras kuderî awrîşim
Ba bes axit bo helkêşim
Kiçê be xuda swêndit dedem
Satê were lat danîşim
Çaw ciwan be xuda swêndit dedem
Satê were lat danîşim
Were were le beramberim satê danîşe
Rojî dû car boç etorêy kirdûte be pîşe
Rojî sed car lêm etorê kirdûye be pîşe

Kiraseket çîtî more
Tozê helîke zor şore
Dil her dile ke dame to
Tixwa neşmîl dil megore
Dil her dile ke dame to
Tixwa çaw ciwan dil megore
Were were ber pencere gêlgêledarî
Xom ebim be mêmanit çaw ciwan nasik u nazdarî
Xom ebim be mîwanî çaw mest nasik u nazdarî

Kiraseket ketan şîne
Mubarekit bê şîrîne
Leser çî le min torawî
Reh´mit bê besiye em qîne
Were were le beramberim satê danîşe
Rojî dû car boç etorêy kirdûte be pîşe
Rojî sed car lêm etorê kirdûye be pîşe

Soranî / Gelêrî, Elî Merdan

# Kiras reş




Deşî pişt qela gul girtûyetî
Dil her yekêke yar bidûyêtî
Erê wey yar birdûyêtyi
Wey wey wey kiras reşê wa le rêdawe
Dey da le kulmit germay nîwero
Erê wey tawî nîwero
Her dêt û derwa morem lêdeka
Yarî çend salem h'aşam lê deka
Wey..
Dey..

# Kiras reşê




Eger demzanî be zimanî bulbul
Hergîz nem dekird karî nabe dil
Eger demzanî ewel wa debûy
Nûştem nedekird bo xo ça(k) de bûy
Her kesê deyka menî'y dildarî
Per û po derkat weney pasarî
Her kesê deyka menî'y emin û to
Le malî bimrêt be heşt û be no
Kiras reşî sewda xoşî rû dapoşî xot meşarewe
Xot meke be jêr (ey hawar) kolê darewe
A'şiqî balat bûm bot mirdûm le pêrarewe
Kiras ciwanî mîhrebanî lêm nebanî xot meşarewe
Xot meke be jêr çirpî û darewe

# Kiras zerdê






Welî mekanî bêstûn, a'şiqî gencî fereydûnim
Le nêw a'şiqan da mecnunim kiras zerdêm lê alawe
Lê alawe al û abî şermendey dergay xuda bî
Ser helêne bêbela bî
Hey delêm bimdeye maçêk be naz kulmey dênê rabî
Bew quraney le ser destim, let letim ken le ser piştim
Namênim meylî kone dostim kiras zerdêm lê alawe
Lêy alawe lêy alawe bejinî tom delêy lawlawe
Kiras zerdêm bo biken be bûk bom bênne baxî mîrawe
E'qil û dîn derçû le destim, mubtelay dû çawî mestim
To bitî min detperestim kiras zerdêm lê alawe
Lêy alawe lêy alawe bejinî tom delêy lawlawe
Kiras zerdêm bo biken be bûk bom bênne baxî mîrawe

# Kiras zerdê




Welî mekanî Bêstûn, a'şiqî gencî Fereydûnim
Le new a'şiqan da Mecnunim kiras zerdêm lê alawe
Lê alawe al u abî şermendey dergay Xuda bî
Ser helêne bêbela bî
Hey delêm bimdeye maçêk be naz kulmey dêne rabî
Bew Quraney le ser destim, let letim ken le ser piştim
Namênim meylî kone dostim kiras zerdêm lê alawe
Lêy alawe lêy alawe bejinî tom delêy lawlawe
Kiras zerdêm bo biken be bûk bom bênne baxî Mîrawe
E'qil u dîn derçû le destim, mubtelay dû çawî mestim
To bitî min detperestim kiras zerdêm lê alawe
Lêy alawe lêy alawe bejinî tom delêy lawlawe
Kiras zerdêm bo biken be bûk bom bênne baxî Mîrawe

# Kirasê meyro

**Moderato**




Pelên darê pelên darê
Kirasê Meyro ji pelên darê
Hersê mehgên biharê
Sed pîroz be li bejna yarê

Pelên biyê pelên biyê
Kirasê Meyro ji pelên biyê
Hersên mehkên çiriyê
Pîroz be li bejna xatûnê

Pelên gûzê pelên gûzê
Kirasê Meyro ji pelên gûzê
Hersên mehkên peyîzê
Sed pîroz be li bejna qîzê

Herêmên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Seydayê Goyan

# Kirasê te meles e




Kirasê te meles e hawar lê hawar lê hawar lê
Min da bû ber meqes e can û can can qurban
Min da bû ber meqes e can û can can qurban
Îro min dosta xwe dît hawar lê hawar lê hawar lê
Por sor e çavê reş e can û can can qurban
Por sor e çavê reş e can û can can qurban

Kirasê te medrûm e hawar lê hawar lê hawar lê
Hûrik hûrik didrûme can û can can qurban
Hûrik hûrik didrûme can û can can qurban
Her çî yara wî tune hawar lê hawar lê hawar lê
Ji her dû dinyan mehrûm e can û can can qurban
Ji her dû dinyan mehrûm e can û can can qurban

Kirasê te heft reng e hawar lê hawar lê hawar lê
Kirasê te heft reng e can û can can qurban
Kirasê te heft reng e can û can can qurban
Li gundê me govend e hawar lê hawar lê hawar lê
Li gundê me govend e can û can can qurban
Li gundê me govend e can û can can qurban

Radyoha Erivane

# Kirasê te meles e





Kirasê te meles e ha wer lê ha wer lê
Min dabû ber meqes e can û can can qurban
Her çî yara wi tune ha wer lê ha wer lê ha wer lê
Kucik lave teres e can û can can qurban

Kirasê te medrûme ha wer lê ha wer lê ha wer lê
Hurik hurik didrûme can û can can qurban
Her çî yara wi tune ha wer lê ha wer lê ha wer lê
Ji herdê dinya mehrûm e can û can can qurban

Li gundê me dawet e ha wer lê ha wer lê
Kêf û şaya millet e can û can can qurban
Her çî yara wi tune ha wer lê ha wer lê ha wer lê
Ew bê qedr û qimet e can û can can qurban

Radyoha Êrîvanê

# Kirmaşan




Kirmaşan şarî şîrînim
Şarî ciwan u Kurdnişînim
Pêm xoşe dayme bitbînim
Xoşim dewêy kiçe cîran
Xoşim dewêy kiçe cîran
Emin dost u to dezgîran ey wey wey
De were, de were ey wey wey baban wêran

Kirmaşan cêgey ecdadim
Cêgey Şîrîn, cêy Ferhadim
Qet qet to naçî le yadim
Xoşim... Xoşim... Emin...
De were de were baban wêran

Kirmaşan şarêkî ciwanî
Şarî gewrey Kurdistanî
Sahîbî Taq u Westanî
Xoşim...
Xoşim...
Emin...
De...

Kirmaşan şarî rengînî
Cêgey ferhad cêy şîrînî
H'ez bikey dayme bîbînî
Xoşim... Xoşim... Emin...
Sûre gulekey nêw Mukiryan

Kirmaşan şarî dilxoşî
Kirmaşan nem key to feramoşî
Şarî şîrîn u serxoşî
Xoşim...
Xoşim...
Emin...
Sûre...

Kirmaşan tarîfî tom tewawe
Têyda madûy min h'esawe
Çun wêney bûk bom razawe
Xoşim...
Xoşim...
Emin...
Xoşim dewêy baban wêran

Radyoya Bexdaye

# Kiş mirîşkê




Kişe û kişe kiş mirîşkê
Tozê meke tozê meke
Min di tozê da hûnda meke
Kişe û kiş kiş mêratê

Kera bînin tevra bînin
Gund û cîran li hev bicivînin
Vê mirîşkê ji hev derînin
Vê miratê ji hev derînin

Hûr û pizûr para xezûr
Ser û kelle para melle
Hestî û dasî para xwesî
Roviya dirêj para dengbêj

Hêta navê para zavê
Hestiyê çokê para bûkê
Kişe kişe kiş mirîşkê
Kişe û kişe kiş mîratê

Herêma Amedê


# Kiwêstanan xal xal




Mal le merîwan dil le dû cêga
Min xerîb mawim, lew sere rêga
Kwêstanan xal xal befrî naçêto
Qîblem torawe aştî nabêto
Mal wa le taran xom le silêmanî
A'şiqî çawî tom nabê neyzanî
Ya rebî çî bikem bo tozê derman
Bîdem be gulekey bê dîn u îman
Bextêk le ezel ke bê çare bê
Destî lê meden ba aware bê
Bo lay kê biçim dest be zamewe
Kê dermanim ka şew be lamewe

Soranî / Gelerî


# Koçer ji dasinê têno




Hey tênê tênê tênê
Koçer ji dasinê têno
Dîsgotin
Pira mêrgevê tênê
Koçer dasinê sê ne
Her sêne sol li pê ne
Hey çar in çar in çar in
Her çar in sol bizmar in
Hoy şer e şer e şer e
Qêrîn û sed car şer e
Kir tola seyê ker e
Şerê li dû vê nişûvî
Çend lawên xencer zûvî
Kir tola seyê kûvî
Eşîra tey derşêvî
Şerê li dû vî xendekî

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Koçerê




Herêma Amedê

Koçerê lê bi koçerê, narînê, narînê lê bi nar
Koçerê lê bi koçerê, xwar bûm ser bejnê da

Embara me di hizhizî, narînê, narînê lê bi nar
Embara me di hizhizî, xwar bûm ser bejnê da
Stûna navê derizî, narînê, narînê lê bi nar
Stûna navê derizî, xwar bûm ser bejnê da
Pismama dotmam dizî, narînê, narînê lê bi nar
Pismama dotmam dizî, xwar bûm ser bejnê da


Koçerê lê bi koçerê, narînê, narînê lê bi nar
Koçerê lê bi koçerê, xwar bûm ser bejnê da

Koçera li beriya Bêrtê, narînê, narînê lê bi nar
Delala li beriya Bêrtê, xwar bûm ser bejnê da
Nastînim keçka bê dê, narînê, narînê lê bi nar
Nastînim sêwiya bê dê, xwar bûm ser bejnê da

Koçerê lê bi koçerê, narînê, narînê lê bi nar
Koçerê lê bi koçerê, xwar bûm ser bejnê da

Koçera li beriya bê av, narînê, narînê lê bi nar
Delala li beriya bê av, xwar bûm ser bejnê da
Nastînim keçka bê bav, narînê, narînê lê bi nar
Nastînim keçika bê bav, xwar bûm ser bejnê da

# Koçî Leyla




Sorani / Geleri

Sî u mirawî de porin
Beser beh'ran da denorin
Kîjî ew e'srey kem şertin
Hêcgar zû qewlan degorin

Le sablaxê weder kewtim
Le gule zerde weser kewtim
We diway koçî leyla kewtim
Ax we diway koçî azîzim leyla kewtim

Le sîley qebiran haware
H'akim bimda ey hawar le sêdare
Dest helnagirim azîzim lew nazdare

Wek ewsal le min qewmawe
Xem le cuwe azîzim nêşêwawe
Ca roh'î birdû qelbim mawe

# Kofî kêtan




Kofî kêtan qolê zêran
Mêze li ka vî xana malî

Destê kezî bejna nazî
Birî qeytan çav mêwedan

Kofî kêtan...

Sûretê sor Elcewazî
Navkê zirav gulî gula

Kofî kêtan...

Tilî mûmîn lêw lemedîn
Gerden gazî mîna qazî

Kofî kêtan...

Xizêm gustîlk poz qerenfîl
Bazin xirxal kenê cemal

Kofî kêtan...

Soranî / Gelêrî

# Kolan be kolan




Ew şew le bextim mange şewtare
Her cêyek deçim ciwanê giyan sayem diyare
Kolan be kolan, cade be cade
Şermî pênawê azîzem çadireket lade
Henasey sardim le mal u gerê
Ew şadiyey bê minit kird lêt weşîn gerê
Kolan be kolan, cade be cade
Şermî pênawê azîzem çadireket lade
Ew maley heme nezrî ella bê
Belku koçeket ciwanê giyan berew diwa bê
Kolan be kolan, cade be cade

Şermî pênawê azîzem çadireket lade
Sê mangey zistan biriya şew baye
Dem le naw dem ciwanê giyan çaw be xew baye
Kolan be kolan, cade be cade
Şermî pênawê azîzem çadireket lade
Xanim naz naka mat u melûle
Ne çawî riştuwe ciwanê giyan ne gonay sûre
Kolan be kolan, cade be cade
Şermî pênawê ciwanê giyan peçeket lade
Şermî pênawê ciwanê giyan çarşêwit lade

# Kolwane sur tobe bê






Be wey badî hewaye
Zulfî hewda hewdaye
Cûtê çawî beleke
Şewê le jiwanim naye
Çaroke sûr tobe bê kolwane sûr tobe bê
Ew yarem min xoş dewê, fêrî tawle u hobe bê
Boye le min torawe
Pêm gut zulfit jakawe
Swêndî xward be wellaye
Her xot destit lê dawe
Singî textî mermere
Zulfî marî la şere
Awirî le min ber dawe
Zor ciwane u lêwî tere
Hey malî babim kalê
Kezyet bendî reşmalê
To biço babit razî ke
Daykit bo min hîç nalê
Pêm e'ybe u pêm îrade
Le bot bikem male û malê
Bejnî darî h'eyzerane
Singî befrî kelî xane
Pêm gut awêzanit bim
Be dizî u be meh'remane

# Kula dilê min welat




Kula dilê min welat kesera dilê min welat
Tavê avêt rojhilat wexta şixul û xebat

Welat gelek şêrîn e milet welat dihebîne
Axa zîv û zêrîne xebatê tim pêşta tîne

Kula dilê min welat...

Welat deşt û zozan e milletê navda biran e
Qesr û qonax lêdan e ji bonî emrê însan e

Kula dilê min welat...

Welatê me zaf xweş e şixul ser rê ye dimeşe
Dilê însan tim geş e tê kêfa min û keleş e

Kula dilê min welat...

Aramê Tigran, radyoya Êrîvanê

# Kulende




Ay kulende kulende kulende bejin u balay bilinde
Agirî le cergî berdam ew kiçe dewlemende

Erê qelay merîwan nazenîn palimda pêwe
Wela qelakem ruxa giyane paldem be kêwe

Kulende kulende...

Kulence kulence kulence kulencekey mermerî
Kîjê dergam lê bikewe nazenîn pişten perperî

Kulende kulende...

Soranî / Gelêrî

# Kulinde




Kulind e, kulind e
Rabe şemla min e rabe
Kulind e, kulind e
Rabe qet na rabe
Kulindê pîre Fatê pîre Fatê
Kulind xweşe li vê civatê , vê civatê
Kulindê pîre Eyşê pîre Eyşê
Ser tûre çû ber erşê ber erşê
Kulind xweş e li nava hewşê
Kulindê pîre qûtê pîre qûtê

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Kur şivan e




Kûr şivan e şivan e
Law xerîbo xerîbo law xerîbo şivan e
Law xerîbo xerîbo law xerîbo şivan e
Kepenê reş milan e


Berxik golan avdan e
Çavê min li xewa şêrîn
Destê min ser mercana
Kur şivanê bizinan

Bizin berdan kizinan
Kur şivanê gîsk kûran
Çavê min li xewa şîrîn
Destê min ser xirtolan

Kûr şivanê gîsk kûran
Gîsk kûr berdan derdolan
Çavê wî'l xewa şêrîn
Destê wî ser xirtolan

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Kurko talan talan




Kûriko hey talan talan
Lawiko hey talan talan

Ez geriyam hey kolan û kolan

Te li min da hey kepiya solan (2caran)

Kuriko hey mele Îsa
Lawiko hey mele Îsa

Tûtina sor hey bike kîsa
Him xêr e hey namûs e

Kuriko hey mele Bekir
Lawiko hey mele Bekir


Tûtina sor li kîsê xwe kir
Min xwaro hey te ewde kir

Kuriko hey nêvroyiyo
Lawiko hey nêvroyiyo

Tu ji kelhê hey were zûyo
Yara kurîk gûndiyo

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Kurtê hat




Baî'sî germî bazarit giyane min bûm
Celay awêney giyane ruxsarit min bûm
Kurtê hat rabird kwêr bim nemzanî
Xemî ewîşim kewte ser şanî

Min sikem giyane benaw meh'bubî lêda
Rewacim pê da giyane be şar u dêda
Kurtê...
Xemî...
Be bay henasey giyane sardit despêrim
Agirî dilimit giyane le dewir degêrim
Kurtê...
Xemî...
Tepe û dukelî giyane henaset beriz bê
Nalet wek nalem giyane be taw u leriz bê
Kurtê...
Xemî...

# Lade




Ey kîjî ladê u bane u daristan
Kesbî tom salê mazuwe u galiwan
Erê lade of lade...
Hey lade rûbend peşmîne
Ey hawar xwênit şîrîne
Ey kîjî ladêy mih'alî mengur
Bo to nemawim şoxî ciger bir
Kîje kurdekey mih'alî şarwêran
Boçî detbînim to çaw be giryan
Kiçe kurdekey mih'alî begzade
Min bo to mirdûm rûbendit lade
Kîje kurdeke boçî damawî
Be dawî gerdun gîrode mawî
Kîje kurdekey mih'alî dêbokirî
Boçî damawî boçî to degirî
Kîje kurdekey dewirî şamatî
Le qend şîrîn tir delêy nebatî
Kîje kurdekey mih'alî mameşî
Tu xuda pêm bilê boç hênde bon xoşî

# Lamle be destan




Î'şiq bêçarey kirdûm sûtawim le wêda
Zulfit ba deyşekênê be kwêstan u be wêda
Dengî bulbul u qumirî dê de nîwe şewê da
Dil be lêw alê bende boye şêt bû de wê da
Kaxez denûsim bo leyla be dilêkî pir be xwênewe
Dengî qulîngan dên le heway, delên kwêstanîn dênewe
Şew dawetiyan têkra degirt lale be destan
Çend ciwan u pak u şîrîne kîjî kurdistan


# Lanew hey lanit kem




Ewe min pîr bûm hey piştim çemawe
Gelay zindegîm xo le dar kenyawe
Lane u lanit kem şane u şanet kem
Şew le nêw cêda roj le baxçêda
Gileyî dekem min be lay xudawe
Derwazey meynet boç bo min kirawe
Lane u lanit kem şane u şanet kem
Pamûre ciwanê mal le bokanî
Boç min le cûmley e'bdî xuda nîm
Sea'têk le dest mêh'net reha nîm
Heta meylit bû min be meylit jiyam
Êsta to bê meylî hey eminîş dilniyam
Heta meylit bû minîş be meylim kirdî
Êsta to bê meylî biro wamzanî mirdî

Soranî / Gelerî

# Lanew lanit kem






Çi Xuda berdare, to xerqim key le xem
Meylim bideye yan zor u yan kem
Lane u hey lanit kem
Şanem wey şanit kem
Şew le nêw cêda
Roj le baxçê da
Xuda bistênê heqim le dayet
Min cewrim kêşa, kê nîşete sayet?
Lane u lanit kem
Şane u şanit kem
Pa be mûre ciwanî
Mal le Bokanî
Ca ebê temennam min be balay kê bê
Kê bigirim be yar? Gul şewey toy lê bê
Lane u lanet kem...
Ew maley heme min ba nezrî Ella bê
Be şert koçeket berew diwa bê
Yalane u lanit kem
Sê car bew mangey Xermaney dawe
Min hêşta meylî tom be kes nedawe
Tu Xuda lêy bipirsin boçî torawe?
„Her mangê niwê bê min halim peşêwe"
Çon hîlalî şêwey ebroy toy pêwe
Firzendey xelkî, ya min çendem dil pêwe
Lane u lanit kem...

# Lanik lankolê




Lanik lanik lankolê
Lanik le dar henarê
Westa bê le taranê
Lankê dirûst ka bo çaw ciwanê
Delê le lankêyda nanûm
Ba boy saz keyin colanê

Ew qura´ney bitgirê
Hênat lêkit kirdewe
Sê car destit pêda da
Bo mizgewtit birdewe
Bo xot keyfim bo dekey
Be destmalî zerdewe
Eminit malwêran kirduwe
Be henasey sardewe
Lanik lanik lankolê
Lanik le dar henarê
Westa bê le taranê
Lankê dirûst ka bo çaw ciwanê
Delê le lankêyda nanûm
De ba boy saz keyin dîlanê

Key danîşîn dû be dû
Qed barîkey xal le rû
Memkêkit wêney henar
Yekî xire wek hulû
Qurî dinyam weser ken
Roy u le destim derçû
Singî karxaney qende
Leser çomî caxetû
Lanik....

Soranî / Gelêrî

# Law heyrano




Bê lo lo lo lo law heyrano
Bê lo lo lo lo law heyrano

Bê lo lo lo wez im wez im
Heyrano wez im wez im
Şekirkî terz bi terz im
Dermanê dilka ez im

Hênekê bi dolabo
Xwelî li mêrê xirabo
Mêrê xirab ezabo

Hênekê bi çarşî ye
Enkebîr li qarşî ye
Mêrê xirab du rû ye

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Lawe




Ay lawe lawe berke wey lawe
Dilim pir xwêne u cergim kewawe

Fîday nalekey pay perwat bim
Fîday çeweylê şewbîxewit bam

Ay lawe lawe...

Xom xaneqînî dostim qesriye
Xatirxay bîme teqsîrim niye

Ay lawe lawe...

Soranî / Gelêrî

# Lawiko Mîrzo




Lawiko Mîrzo tu dizanî bi ha
Tu dizanî hay tu dizanî
Lawiko Mîrzo tu dizanî bi ha
Sed kul mala tu dizanî

Qedrê zeriya nizanî
Lawiko Mîrzo tu dizanî
Qedrê zeriya nizanî bi ha
Sed kul mala tu dizanî


Zeriya min hatibû der da
Lawiko Mîrzo tu dizanî
Zeriya min hatibû der da
Sed kul mala tu dizanî

Fîno kofî serî da
Lawiko Mîrzo tu dizanî
Fîno kofî serî da
Sed kul mala tu dizanî

Wez şerma rabûm berda
Lawiko Mîrzo tu dizanî
Wez şerma rabûm berda
Sed kul mala tu dizanî

Lawiko Mîrzo...

# Laye laye




Destim le banî bîlla kelamullan bê
Nazdarekem kelamulla bê
Le to zyatir be xuda meger xuda bê
Ey hawar meger xuda bê
Laye layet bo dekem
Belkim xew bitbatewe
Dest xeme nêw memkolanit
Hetaku roj min belatewe
Yan xirxal bim şew be patewe
Şêx h'esen negrê ya reb korpet le dawan

Ella ella korpet le dawan
Be bêwe jinî belke bom bêye bawan
Ya rebî bom bêye bawan
Boç min le cumley ciwanê e'bdî xuda nîm
Sea'tê le destî mêh'net reha nîm
Ey hawar mêh'net reha nîm
Gileyî dekem wella be lay xudawe
Hemîşe be lay xudawe
Derwazey meynet boçî bo min kirawe
Ey hawar bo min kirawe

Soranî / Gelêrî

# Le baxî sîne




Lay lay dilim lay le baxî sîne
Aram bini giyan şadî biwîne

Aram bigre to bo aram bê giyanî min
Firmêsk ba kem biçê le ser çawanî min
Ey dilî zarî min ewne zarî meke
Ewne bo yareket bê qerarî meke
To bo çî riswa bî mecnunî şeydabî

Lay lay...
H'ekayetî xemî leyla efsaneye
Mecnunu wanebu ecru efsaneye
Ey dilî zarî min...

Lay lay...
Yarit meylî niye meylî toy bo çiye
Axir boçî dilim wa aramit niye
Ey dilî zarî min...

Sorani / Gelêrî

# Lê bejnê




Çi bejneke lê hatibû der da
Lê bejnê lê bejnê lê bejnakê
Çi bejnîke lê hatibû der da
Lê bejnê lê zeriya min ji mala kê
...Zeriya min reş ji konê kê

Koma mêra lo rabû berda
Lê bejnê lê bejnê lê bejnakê
Koma mêra lo rabû berda
Lê bejnê lê zeriya min ji mala kê
...Zeriya min reş ji konê kê

Çi bejneke li ser xaniya
Lo bejnê lê bejnê lê bejnakê
Çi bejnîke li ser xaniya
Lê bejnê lê zeriya min ji mala kê
...Zeriya min reş ji konê kê

Gazî dikir lo bi tiliya
Lê bejnê lê bejnê lê bejnakê
Gazî dikir lo bi tilî ya
Lê bejnê lê zeriya min ji mala kê
...Zeriya min reş ji konê kê

Çi bejnekî li ha ber malê
Lê bejnê lê bejnê lê bejnakê
Çi bejnîkî li ha ber malê
Lê bejnê lê zeriya min ji mala kê
...Zeriya min reş ji konê kê

Notila bejna lo lê qîzxalê
Lê bejnê lê bejnê lê bejnakê
Notila bejna lo lê qîzxalê
Lê bejnê lê zeriya min ji mala kê
...Zeriya min reş ji konê kê

Gazî dikir lo bi destmalê
Lê bejnê lê bejnê lê bejnakê
Gazî dikir lo bi destmalê
Lê bejnê lê zeriya min ji mala kê
...Zeriya min reş ji konê kê

Radyoya Êrîvanê

# Lê bi govendê




Lê bi govendê lê bi govendê
Lê bi govendê lê bi govendê

Min xulama bejnê zendê
Min xulama bejnê zendê

Wez kerba te hatime bendê
Wez kerba te hatime bendê

Ew govenda sor gul gulî
Ew deweta sor gul gulî

Qîz keskê sor dixemilî
Qîz keskê sor dixemilî

Ser govendê da mil milî
Ser govendê da mil milî

Lê bi govendê lê bi govendê
Lê bi govendê bas lewendê

Radyoya Erîvanê

# Lê bi holê




Lê bi holê bi holê bi holê lê lê holê
Lê bi holê bi holê bi holê Malbav Çolê
Du hol in du holgir in lê lê holê
Du hol in du holgir in Malbav Çolê
Du keçên Gihar gir in lê lê holê
Du keçên Gihar gir in Malbav Çolê
Du kurik ji qehran mirin lê lê holê
Du lawik ji qehra mirin Malbav Çolê

Hola min a nexaş e lê lê holê
Hola min a nexaş e Malbav Çolê
Dixaze tiryê reş e lê lê holê
Dixaze tiryê reş e Malbav Çolê
Lawkê gundî kêfxweş e lê lê holê
Lawkê gundî kêfxweş e Malbav Çolê

Hola min a tawî ye lê lê holê
Hola min a tawî ye Malbav Çolê
Dixaze tiryê sipî ye lê lê holê
Dixaze tiryê sipî ye Malbav Çolê
Lawkê gundî cindî ye lê lê holê
Lawkê gundî cindî ye Malbav Çolê

# Lê bûkê




Lê bûkê lê narê
Bûka hez û meza
Lê bûkê lê narê
Tiriyê nava reza
Lê bûkê lê narê
Zava da ber geza

Lê bûkê lê narê
Bûka me diyarî
Lê bûkê lê narê
Tiriyê mêwa tarî
Lê bûkê lê narê
Zava jê nexarî

Lê bûkê lê narê
Bûka me we nake
Lê bûkê lê narê
Zêra bi xwev e nake
Lê bûkê lê narê
Mal bavê ji bîr nake
Lê bûkê lê narê
Bûka hez û meza

# Lê dayê




Negrî nelorîne lê dayê negrî nelorîne hevalê
Keçê her malê xelkê ne lê dayê
....hevalê
Day û bav palê peşî ne lê dayê
....hevalê

Perde we ku dav e lê dayê
....hevalê
Me têra dîtin çav e lê dayê
....hevalê
Te pîroz bît ew nav e lê dayê
....hevalê

Perde we ku mû ye lê dayê
....hevalê
Me têra dîtin rû ye lê dayê
....hevalê
Te pîroz bît ew şû ye lê daye
....hevalê

Perde we ku derzî lê dayê
....hevalê
Me tera dîtin kezî lê dayê
....hevalê
Te pîroz bît ew xweşî lê dayê
....hevalê
Negrî nelorîne...

# Lê delalê




Lê delalê were vira
Derdê xwe bejim ji te ra
Te min xistî nav agira
Evîndar im Evîndar im
Evîndara bejna te me

Lê Delalê rewşa dinê
Kûlilka xorta bi tenê
Em bûne wek Memo Zînê
Evîndar im Evîndar im
Evindarê bejna te me

Lê Delalê hey lê canê
Ka soza te da min kanê
Tu sor gula Kurdistanê
Evîndar im Evîndar im
Evîndarê bejna te me

Herêma Amedê, çavkanî : Şiyar

# Lê dîlberê




Lê dîlberê lê dîlberê
Nav şêrînê dev şekirê
Zulfiya zerê gerden zerê
Tu ji eywanê derkev derê
Te li piştê xwest kemberê
Dêre li piştê rû qeyntere
Dilê xorta kir kederê

Dîlber min dît bû payîzê
Ba lê dixe bergê gûzê
Xew xweş bûye li paşla qîzê
Lê dîlberê lê dîlberê
Nav şêrînê dev şekirê

Dilber min dît bû biharê
Ba lê dixe bergê darê
Xew xweş bûye li paşla yarê
Lê dîlberê lê dîlberê
Nav şêrînê dev şekirê

Radyoya Êrîvanê

# Dê dîn




Lê dîn lê dîn lê dînê lê lê dînê
Lê dîn lê dîn lê dînê zalim dînê
Hat karwanê Mêrdînê
Xirab malê Mêrdînê
Danî li gir herînê
Danî li gir herînê
Eyşo dev şekirê
Ez kuştim ez helandim
Kirme darê mêzînê
Kirme darê mêzînê

Lê lê
Hat karwanê Helebê
Xirab malê Helebê
Danî li binya selebê
Danî li binya selebê
Eyşo dev şekirê
Ez kuştim ez helandim
Kirme darê meqlebê
Kirme darê meqlebê

Lê lê
Hat karwanê kurdîka
Xirab malê kurdîka
Danî li Kerxa Kîka
Danî li Kerxa Kîka
Eyşo dev şekirê
Ez kuşt im ez helandim
Kirme zêrê cênîka
Kirme zêrê cênîka

# Lê dînê




Lê dînê lê dînê wax lê dînê lê dînê
lê dînê, lê dînê, tew dînê zalim dînê
Ez dîna çiyakê spî me, ax lê dînê lê dînê
Hemayila bi reşî me wax lê dînê
Dosta lawikê keyfî me, wax lê dînê
Dosta lawikê keyfî me, tew dînê zalim dînê
Ez dîna çiyakê reş im wax lê dînê
Hemayila bi nexşim ax dînê, lê dînê
Wez dîna çiyakê sor im lê dînê, lê dînê
Wez dîna çiyakê sor im wax dînê zalim dînê
Hemayiloka sor im ax dîne, lê dînê
Hemayiloka sor im tew dînê zalim dînê
lê dînê, lê dînê
Wax dînê zalim dînê

Radyoya Êrîvanê

# Lê esmerê




Hara lê lê lê hara lê lê lê
Hara lê lê lê lê esmerê
Hara lê lê lê hara lê lê lê
Xorta çavê belek xwarê


Ti esmera ti va barî
Hara lê lê lê hara lê lê lê
Ti esmera ti va barî
Xorta çavê belek xwarê

Usar eno waxt warêno
Hara lê lê lê hara lê lê lê
Usar eno waxt warêno
Xorta çavê belek xwarê

Şar barkeno şîn warêno
Hara lê lê lê hara lê lê lê
Şar barkeno şîn warêno
Xorta çavê belek xwarê

Warê şenga min qerejo
Hara lê lê lê hara lê lê lê
Warê Şenga min qerejo
Xorta çavê belek xwarê

# Lê gozê




Lê qolê lê gozê de tu were were were
Hey hewar hey medet sing spî derzî zer e
Lê qolê lê gozê riya kanyê bi xîço
Hey hewar
Lê qolê lê gozê dolaba hîçe hîço
Hey hewar
Lê qolê lê gozê mêrê xirab qilîço
Hey hewar

Lê qolê
Lê gozê
Lê qolê lê gozê riya kanyê bi kawo
Hey hewar
Lê qolê lê gozê mirîşka ka vedawo
Hey hewar
Lê qolê lê gozê mêrê xirab belawo
Hey hewar hey medet mêrê xirab belawo

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Lê gozê




Lê gozê tew gozê tu were were were
Lê gozê tew gozê tu were were were

Lê gozê tew gozê sîng spî kezî zer e
Lê gozê tew gozê sîng spî kezî zer e

Lê gozê tew gozê memik sêvê li eyndara
Lê gozê tew gozê memik sêvê li eyndara

Lê gozê tew gozê mêrê gozê çi pîs e
Lê gozê tew gozê mêrê gozê çi pîs e


Lê gozê tew gozê birine sûka Bedlîs e
Lê gozê tew gozê birine sûka Bedlîs e

Lê gozê tew gozê bîna fetloka ris e
Lê gozê tew gozê bîna fetloka ris e

Lê gozê tew gozê mêrê gozê bi kêr nayê
Lê gozê tew gozê mêrê gozê bi kêr nayê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Le gul û le gulan




Le gul û le gulan giyan le gulî genım û co
Nejî ew zalmey giyan daybirîm le to

Dûrît aramî giyan le ber helgirtûm
Le diway koçeket giyan satê nesrewtûm

Le ber koçeket giyan piştim çemawe
Wek dar bîbada boy tewijmî bawe

# Lê gulê




Lê gûlê lê gûlê
Heleva ter kakilê
Min xwarî ji eşk û dilê
Dexil eman yar yar gûlê

Ez êsirê baxêt gûla
Tû êsirê baxêt gûla
Hatim gûlê birevînim
Ketim destê kafira

Gûlê lez dike bilezîne
Cavreş lez dike bilezîne
Herdu biska dihejîne
Xemê dilêm direvîne

Hesen Cizrawî, radyoya Bexdayê

# Lê gulê




Aylê gulê gulê gulê
Şirina'm tev de gul (Delala'm)
Hem rihan û qurnefîlê
Şirina'm tev de gul (Delala'm)
Ji bona lawik bi dilê
Şirina'm tev de gul (Delala'm)

Gul im gul im gula sipî me
Şirina'm tev de gul (Delala'm)
Li ber derî runiştime
Şirina'm tev de gul (Delala'm)
Dosta lawikê gundî me
Şirina'm tev de gul (Delala'm)

Weylê gulê gul çiçekê
Şirina'm tev de gul (Delala'm)
Ez runiştim li kêlekê
Şirina'm tev de gul (Delala'm)
Heciyê dosta wiya başbe
Şirina'm tev de gul
Sê ro kuştin ji felekê
Delala'm tev de gul

Gulê dibû ser xaniya
Şirina'm tev de gul (Delala'm)
Min ban kirê bi tiliya
Şirina'm tev de gul (Delala'm)
Hingî dilê min êşiya
Şirina'm tev de gul (Delala'm)

Radyoya Êrîvanê

# Lê helê were




Lê lê lê lê lê lê lê lê helê were
Lê lê lê lê lê qurban heyrano

Gul û çîçekî li ber bîhna min î were
Gul û çîçekî li ber bîhna min î
Terka te nadim heta mirinê were
Terka te nadim heya mirinê

Wele ferîda bîle ferîda were yar
Wele ferîda bîle ferîda
Ew bayê reşê bada serî da qurbano
Ew bayê reşê bada serî da

Lê lê lê lê lê lê lê lê helê were
Lê lê lê lê lê qurbana hinê
Min ji te seh nekir çû xeber ji dinê were
Min ji te seh nekir çû xeber ji dinê

Lê lê lê lê lê lê lê lê helê were
Lê lê lê lê lê qurbana hinê
Gul û çîçek î li ber bîhna min î were
Terka te nadim heya mirinê

Herêmên Botan û Behdînan, çavkanî : M. Arif Cizîrî

# Le kolanî tengeber






Le kolanî tengeber şan mede le şanim
Rut wermegêre u esmer xelkî lay xotanim

Le kolanî ber maltan etbînim car u bar
Min şêtî balay to bum hey şêtî nalebar

Le kolanî ber maltan şayiye u seyrane
Gişt xelkî şadin wey wey min malim wêrane

Le kolanî pêş maltan şayiye u helperkê
Kîj legel kuran wey wey ca deken çaw birkê

# Lê lê bûkê




Lê lê bûkê lê lê bûkê
Bûkan bûkan e
Solgê li ser piyan e
Dêm heyva çardan e
Tê ji malên bavan e
Lê lê bûkê lê lê bûkê
Tê ji malên bavan e

Bûka me wer nake
Çarkê li xwe nake
Malbavê ji bîr nake
Lê lê bûkê lê lê bûkê
Malbavê ji bîr nake

Hespê min li xendegê
Zîn bavê kêlegê
Yariya Mehmed begê
Lê lê bûkê lê lê bûkê
Yariya Mehmed begê

Kolanên me kûr in
Berbûyên me hûr in
Bûk-şêx berbû dûr in
Lê lê bûkê lê lê bûkê
Bûk şêx berbû dûr in

Kolanên me teng in
Berbûyên me reng in
Bük-şêx berbû şeng in
Lê lê bûkê lê lê bûkê
Bûk şêx berbû şeng in

Bûka me wer kirî
Çarkê li xwe wer kirî
Malbavê ji bir kirî
Lê lê bûkê lê lê bûkê
Mal bavê ji bir kirî

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Lê lê dînê




Lê lê dînê lê lê dînê lê lê dînê
Lê lê dînê lê lê dînê tew tew narînê
Dîna'm qîza hedada
Lê lê dînê lê lê dînê tew tew narînê

Min xwestî û bavê neda
Lê lê dînê lê lê dînê tew tew narînê
Derkê bavê xwe dada
Lê lê dînê lê lê dînê tew tew narînê

Ez hatim te bibînim
Lê lê dînê lê lê dînê tew tew narînê
Dê û bavê te li min bi kîn in
Lê lê dînê lê lê dînê tew tew narînê

Ez hatim aliyê we da
Lê lê dînê lê lê dînê tew tew narînê
Min xwestî û bavê neda
Lê lê dînê lê lê dînê tew tew narînê

Ber derî bû me qerda
Lê lê dînê lê lê dînê tew tew narînê
Lê lê dînê lê lê dînê lê lê dînê
Lê lê dînê lê lê dînê tew tew narînê

Radyoya Êrivanê

# Lê lê dînê





Di şahrekî hêdî here lêlê dînê lê lê
Tê da me hişt çûndina te re çavreşê lê lê
Te digo ez herim lê ezê zû werim lê lê dînê lê lê
Zû hatina te bi hev rê çavreşê lê lê

Ez çûm derî li te vedibû lê lê dînê lê lê
Çûndina me li pey te bû çavreşê lê lê
Yek ji wê da hat ne ya min bû lê lê dînê lê lê
Ya ku min dil girt ya dinê bû çavreşê lê lê

Diyarbekir e çar goşe lê lê dînê lê lê
Delala min tê dimeşe çavreşê lê lê
Ez çibikim ji malê dinyayê lê lê dînê lê lê
Derdê min çavê reş e çavreşê lê lê

Radyoya Êrivanê

# Lê lê kinê




Lêlê kinê lê lê mala minê way way
Ken şîrina lê lê dilê min e way way

Lêlê kinê lê lê ji Kûlpêo way way
Bişîne pey lê lê bira bêyo way way

Lêlê kinê lê lê avqas kaye way way
Bi bihûsta lê lê xwe di pîvaye way way

Lêlê kinê lê lê hûrî hûrî way way
Xan werdeka lê lê gola kûr i way way

Kin werdeka lê lê ava kûri way way
Ez radimîsim lê lê tu ji min dur i way way

Herêma Amedê

# Lê lê kinê




Lê lê lê lê lê lê lê lê lê kinê
Kinika mala lê bavê minê

Lê lê lê lê lê lê lê lê lê kinê
Qom qidupê lê çokê minê

Hawar gundo lo kinika min yek e
Nehat gundo lo kinika min yek e

Ew jî yek e lo çav belek e
Kinê rûnê lo biska şeke

Lê lê kinê lê reqaseyê
Min sê cara lê ramûsayê

Min sê cara lê ramûsayê
Carka çara lo destûr dayê

Te lê lê kinê lê hûrî mûr î
Meş werdeka lo gola kûr î

Meş werdeka lo gola kûr î
Tu ya min î lo ji min ne dûr î

Lê lê lê kinê lê ha ji te kintir
Wez geriya me lo ha ji te pirtir

Ez geriyame lo ha ji te pirtir
Min kes nedît lo ha ji te rindtir

Heremên Şirnax û Çulemerg, çavkanî : Evdilmelîk Şexbirikî

# Lê lê Meyro




Girê sîrê bi sîr e lê lê lê lê Meyro
Gir xopanê bi sîr e tolik vanê Meyro

Du siwara wîre wîre lê lê lê lê Meyro
Du siwara wîre wîre tolik vanê Meyro

Xwestiya Meyro wezîr e lê lê lê lê Meyro
Xwestiya Meyro wezîr e tolik vanê Meyro

Girê sîrê bi kelem e lê lê lê lê Meyro
Gir xopanê bi kelem e tolik vanê Meyro

Du siwara bi leme lem e lê lê lê lê Meyro
Du siwara bi leme lem e tolik vanê Meyro

Girê sîrê bi ce ye lê lê lê lê Meyro
Gir xopanê bi ce ye tolik vanê Meyro

Du siwara bi heye hey e lê lê lê lê Meyro
Du siwara bi heye hey e tolik vanê Meyro

Girê sîrê bi nok e lê lê lê lê Meyro
Gir xopanê bi nok e tolik vanê Meyro

Du siwara bi hoke hok e lê lê lê lê Meyro
Du siwara bi hoke hok e tolik vanê Meyro

Xwestiya Meyro zarûk e lê lê lê lê Meyro
Xwestiya Meyro zarûk e tolik vanê Meyro

# Lê lê Nûrê




Herêma Amedê

Ax lê Nûrê lê Nûrê lê lê Nûrê
Ax lê Nûrê lê Nûrê lê lê Nûre

Lê Nûrê li binya te me lê lê Nûrê
Delalê li binya te me zalim Nûrê
Xulamê bavê te me lê lê Nûrê
Xûlamê bavê te me zalim Nûrê

Bê pol û bê pere me lê lê Nûrê
Bê pol û bê pere me zalim Nûrê
Aşiqê çavê te me lê lê Nûrê
Aşiqê çavê te me zalim Nûrê

Mêrê Nûrê esker e lê lê Nûrê
Mêrê tolê esker e zalim Nûrê
Rebiyo bidî teskere lê lê Nûrê
Rebiyo bidî teskere zalim Nûrê

# Lê lê qîzam xasa min




Lê lê qîzam xasa min şêrîn şêrîn besa min
Lê lê qîzam xasa min şêrîn şêrîn besa min
Îro pê te kêf xweş e tu şeraba kasa min
Îro pê te kêf xweş e tu şeraba kasa min
Lê lê qîzam xasa min şêrîn şêrîn besa min
Lê lê qîzam xasa min şêrîn şêrîn besa min
Îro pê te kêf xweş e tu şeraba kasa min
Îro pê te kêf xweş e tu şeraba kasa min

Sitî çavê kil têyî gul baxima gul têyî
Sitî çavê kil têye gul baxima gul têyî
Bi wan çavên reş belek nava min û dil têyî
Bi wan çavên reş belek nava min û dil têyî
Lê lê qîzam…

Kulîlk a ber bala min eşq hewasa mala min
Kulîlk a ber bala min eşq hewasa mala min
Kenê te çawa xweş xweş tê tu balgî ber pala min
Kenê te çawa xweş xweş tê tu balgî ber pala min
Lê lê qîzam...

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Lê lê Wesê




Lê lê Wesê lê lê wesîlayê way way
Teşî rêsê lê lê çû serayê wax wax
Mala Wesê lê lê mahkeme ye wax wax
Mala Wesê lê lê mahkeme ye wax wax

Xaniyê wesê lê lê taxa jor e wax wax
Were xwarê lê lê ez bi gorê wax wax
Lê lê Wesê lêlê deriyê çaxê wax wax
Lê lê Wesê zalimê wesîlayê wax wax

Were Were lêlê wer koçerê way way
Kofî xwarkir lê lê xweş dîlberê wax wax
Kanê Wesê zalimê sozê berê wax wax
Lê lê Wesê lê lê wesîlayê wax wax
Xortê xelkê lê lê dil berdayê wax wax

Herêma Amedê

# Lê lê Weso




Lê lê Weso lê lê lê Wesîlayê way way
Lê lê Weso lê lê lê Wesîlayê way way

Te por sorê lê lê lê henne dayê way way
Te por sorê lê lê lê henne dayê way way

Teşî rêsê lê lê lê çû serayê way way
Teşî rêsê lê lê lê çû serayê way way

Mala Weso lê lê lê ji mala wê da way way
Mala Weso lê lê lê ji mala wê da way way

Ez radimûsim lê lê lê ji mala bavê way way
Ez radimûsim lê lê lê ji mala bavê way way

Radyoya Êrîvanê

# Lê lê Ximşê




Mala Ximşê serê çiya ne
Oy li min lê lê li min lo lo li min lê lê Ximşê
Mala Ximşê serê çiya ne
Bextê te me guh bide min ez gune me lê lê Ximşê

Mala Ximşê bi derge ye
Oy li min lê lê li min lo lo li min lê lê Ximşê
Mala Ximşê bi derge ye
Bextê te me guh bide min ez gune me lê lê Ximşê

Ximşê odê da palda ye
Oy li min lê lê li min lo lo li min lê lê Ximşê
Ximşê odê da palda ye
Bextê te me guh bide min ez gune me lê lê Ximşê

Bavê Ximşê qîz nedaye
Oy li min lê lê li min lo lo li min lê lê Ximşê
Bavê Ximşê qîz nedaye
Bextê te me guh bide min ez gune me lê lê Ximşê

Dilê qîza xorta maye
Oy li min lê lê li min lo lo li min lê lê Ximşê
Dilê xorta qîza maye
Bextê te me guh bide min ez gune me lê lê Ximşê

Herêmên Botan, Bahdînan

# Le mal hate der







Erê le mal hate der, hate der, hate der
Zemane, zemane, zemane çawî ciwane
Delê sakekey helgirt qerare biçê bo bane
Kûştumî be naz bîlla perçem reşe rêh'ane
Wêney mayînî xoş tei'lîm fêrî teqle u lingdane
Sertopî kurdistane
Kiçê ew derdey min dekûjê
Hî jinî guley bêgane

Nerm u nol u gird u mird
Daway dû maçim lê kird
Kulmî sêwî lasûre
Têydaye xalî wird wird
Şewê taku beyanî ew basket bo bikem be pird
Şewê taku beyanî ew basket bo bikem be pird
Erê la mal hate der hate der ba bête der
Qed barîkey sinewber
Awirî lemin berdawe
Le serî bûm derbeder
Memkî çepey fincane
Ewî dîkey wek gewher
Tîrêkî le dîlî dawim
Le cigerim bû karîger

Le tawî bînînî to
Le bot bumete koçber
A'şiqan wa hemû cût bûn
Emin u to mayin xak be ser

Erê qeytanî dû lêwanî
Bendî dilim pisawe
Be bîlla zêde ciwane
Rê niye bikem silawe
Singî penîrî kurdî
Zulfî giyabend u xawe
Kellekey çepim kune
Naskol be mist lêy dawe
Awirî le min ber dawe, awirî le min ber dawe
Zulfî giyabend u xawe
Erê leber ew daykey demirim
Memkî ser serî nawe

# Le mêje




Şedey bestûwe bêryanî
Desrokey tozêk tîle
Berokî bo derzîle
Qamikî bo engustîle
Le ser çî le min zîzî
Zîz bûnit bê delîle

Bo xom dûrim naygemê
Kes niye welamêy demê
Sebir u xoşî lê birîwim
Kewtûme beh'rî xemê
Dû biroy reşî hîlalî
Kewtûne jêr perçemê
Sûçî çadireket lade
Ba mang derçê le temê

Le mêje zor le mêje
Yexsîrit kirdûm lêre
Zekatî çawekanit
Awrêkim wêde xêre
Gerdinit helaley zerde
Bejinit şetle şilêre
Sebaret be çawî ciwanit
Ba awedan bê êre

Tu Xuda dilim meşkêne
Tawêk were baweşim

Bejinî barîk lêm zîze
Derjê firmêskî geşim
Le dinya da xoşîm nedî
Bedbext u çare reşim
Le mêje zor le mêje
Yexsîrit kirdûm lêre

Sî rojey remezanê
Ferze le ser ûmetê
Le dunyay rûn bûm nebî
çît lê bikem le qiyametê
Le mêje zor le mêje
Yexsîrit kirdûm lêre

Hem narice u hem sêwe
Hawar ya şêxî kirêwe
Xem u meraqî yarê
Îşkî kirdûm be pêwe
Ya xuda ne barê baran
Taqe gulekem be rêwe

Le mêje zor le emêje
Yexsîrit kirdûm lêre
Zekatî çawekanit
Awrêkim wê de xêre

# Lê Meyrê Meyremê




Genîngî dar e min got Meyrê Meyremê
Çol bengî dar e nîşana min li cemê

Alo berxivan e bi lê Meyrê Meyremê
Alo berxivan e bi nîşana min li cemê

Genîngî gez e bi lê Meyrê Meyremê
Çolbengî gez e bi nîşana min li cemê

Gur tê bi lez e bi lê Meyrê Meyremê
Gur tê bi lez e bi nîşana min li cemê

Şîva gur pez e bi lê Meyrê Meyremê
Şîva gur pez e bi nîşana min li cemê

Genîngî bî ye bi lê Meyrê Meyremê
Çol bengî bî ye bi nîşana min li cemê

Gur tê hêdî ye bi lê Meyrê Meyremê
Gur tê hêdî ye bi nîşana min li cemê

Şîva gur mî ye bi lê Meyrê Meyremê
Şîva gur mî ye bi nîşana min li cemê

Genîngî bi totik bi lê Meyrê Meyremê
Çol bengî bi totik bi nîşana min li cemê

Şeroyê Biro, radyoya Êrîvanê

# Lê mibetê




Lê mibetê lê mibetê
Lê mibetê lê mibetê

Topa ezmana lê ketê
Topa ezmana lê ketê

Xala sor e xala sore
Xala sor e navka xetê

Kurika dîtiye kurika dîtiye
Kurika dîtiye dilêm ketê

Te li wê zendê te li wê zendê
Te li wê zendê wê sihetê

Lê mibetê lê mibetê
Lê mibetê lê mibetê

Radyoya Êrivanê

# Lê naz




Ewil bêjin bismîlah lê bi naz lê bi naz lê bi nazê
Ji me elhemdûlîlah yek xal li gerden gazê

Sê çiya li Hondokê hene lê bi naz lê bi nazê
Sê çiya li Hondokê hene yek xal li gerden gazê
Tev şîş û mengenen e lê bi naz lê bi nazê
Tev şîş û mengenen e yek xal li gerden gazê
Meskenê zeryê di me ne lê bi naz lê bi nazê
Meskenê zeryê di me ne yek xal li gerden gazê

Sê çiya li Hondok dirêj in lê bi naz lê bi nazê
Sê çiya li Hondok dirêj in yek xal li gerden gazê
Şîş mengene davêjin lê bi naz lê bi nazê
Şîş mengene davêjin yek xal li gerden gazê
Methê lawkan dibêjin lê bi naz lê bi nazê
Methê lawkan dibêjin yek xal li gerden gazê


Ew nazoka şerqiya lê bi naz lê bi nazê
Gewr û rinda şerqiya yek xal li gerden gazê
Dest gerya bînbaşiya lê bi naz lê bi nazê
Dest gerya bînbaşiya yek xal li gerden gazê
Xwarina gedikliya lê bi naz lê bi nazê
Xwarina gedikliya yek xal li gerden gazê

Nazê şekla dinyayê lê bi naz lê bi nazê
Gewrê şekla dinyayê yek xal li gerden gazê
Şewq da fena lembayê lê bi naz lê bi nazê
Şewq da fena lembayê yek xal li gerden gazê
Nazê keça Kurda ye lê bi naz lê bi nazê
Nazê keça Kurda ye yek xal li gerden gazê

Ewil bêjin bismîlah lê bi naz lê bi naz lê bi nazê
Ji me elhemdûlîlah yek xal li gerden gazê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Lê Nazê




Wê bi Nazo Nazeliyê
Lê Nazo lê Nazo lê Nazo Nazeliyê
Nazo Nazeliyê lê Nazo lê Nazo lê
Nazo sebrê dila

Lê Nazo sebrê dila
Lê Nazo lê Nazo lê Nazo Nazeliyê
Çav reşê kanî kilan
Lê Nazo lê Nazo lê Nazo sebrê dila

Wê bi Nazo Nazeliyê
Lê Nazo lê Nazo lê Nazo Nazeliyê

Kewhêlê erebiyê
Lê Nazo lê Nazo lê Nazo sebrê dila

Nisêbînê bi qişleye
Lê Nazo lê Nazo lê Nazo Nazeliyê
Dor Herînê bi dergeye
Lê Nazo lê Nazo lê Nazo sebrê dila

Way dor Herînê bi dergeye
Lê Nazo lê Nazo lê Nazo Nazeliyê
Gundî û cîran çi ji me ne
Lê Nazo lê Nazo lê Nazo sebrê dila

Herêmên Botan û Behdînan, çavkanî : M. Arif Cizirî

# Le nêw reşmalî xêlan




Le nêw reşmalî xêlan le nawçey xêlî goran
Kiçe kurdî çaw be kil dê bo lay dildar bo cêjwan
Be çirpe u dem pêkenîn u be lence
Birwane dê lew mer doşîn dil pir le hîwa u ewîn

Çend ciwane ew rawestane dil le xurpey mestane

Le goşecêy dildarî çawerêy şedelarî
Xuda axo key dildar bê bo cêjwan bo dildarî
Le pir ebînî dildarê wek perî wek bala perî
Peykerî le cêjwan le nadiyarî
Çend ciwane...

# Le nêw Sablaxda




Le nêw sablax da burcêk diyare
Be qed ew burce xem le dilim bare
Le bê lutifî yar, henasem siware
Reng zerd u zeî'f lêwim be bare
Hey leylî leylî, leylî bawanim
Bo çî demkûjî min bê tawanim
Sablax çend xoşe xakî dilgîre
Ew kiçe lew male kot u zincîre
Le dûrî balat bûm perewaze
Xembarit kirdûm zor bê endaze

Soranî / Gelerî

# Le pê da





Le pêy da wey le pêy da
Delê bo dwayiye nabim
Le pêy da royî le pêy da
De lê bo dwayiye nabim
Delê dest berdarim be
Lêm deden daye u babim
Bo lam were zor u kem
Dil buwe be e'mbarî xem
Min perwane eto şem
Bo turanî xom dekirim
Dahatuwe kirasî çem çem
Le kwêm dî hey le kwêm dî
Seyran, bulbul le kwêm dî
Hestêkim dê le banî
Yar bo rabûrd şewê dî
Kulmit gulî sêlawê
Dinyam be bê to nawê
Mandû u mirdûm turan giyan
Hatûm le lay xoşnawê
Şeytanê be lei'net ke
Xot le baweşim bihawê
Beheştim hemû bidenê
Min be bê turanim nawê
Wey rendî malim rendî
Kulmet gulî peywendî
Daway maçêkim lê kird
Daymê be rend u mendî

Turan daway maçim kird
Boye wa lêm dilmendî
Bazî yana şimqarî
Xasekewî yan barî
Ba leser to bimkûjin
Wek kabray le bazarî
Turan destim desto ke
Delêy bêçuwe tucarî
E'ntîke u zêde lawe
Çonî lê bikem silawe
Xizmîne memken lome
Turan dilekem sûtawe
Turan le min torawe
Cergim hemûy let lete
Key danîşîn dû be dû
Keleget u xal le rû
Memkit xire wek hulû
Dûrî awirim tê ber bû
Turan nameyek binêre
Malî babit xirap bû
Sing karxaney miyandiwaw
Bot mirdim turan belek çaw
Cejnî qurban hate pêş
Malî babit bû şêwaw
Delêm destim desto ke
Qed barîk u zulif xaw

# Le pêdaw pêda

**Moderato**




Hey de lêde u de lêde, giyane
baze u zengoley le pêda
Yar delê bo dwayî nabim, giyane
kotirim başû lêm deda

Erê roh'î rewanim
Zeh'mete bê to bijîm
Ax were swêndêkî bixoyin
Be asmanî h'ewtemîn
Belku bew swêndey
Dabinîşîn girde u nişîn
Hey...
Yar...

H'alî bûy le lerzînim
Yexet lade bitbînim
Çîm kirduwe lêw alê
Dekûlêniyewe birînim
Xo minîş wek kake memî
A'şiq be xatû zînim
Hey...
Yar...

Serêke u mestî nazin
Dilêke u bot nemawe
Delêm h'eqî bedeste
Fitway serî dirawe
H'ewt salan yarî min bûy
Boçît ne kird malawa
Hey...
Yar...

Min çawerwanî leylêm
E'cayib boçî nehat
Yarebî xudaye xêr key
Ew rencem nedey be bad
Hey be qurbanî toy dekem
Sablax hetaku pişder
Hey...
Yar...

Deçime ser girdî h'usnî
Beramber be qelatê
Yarim le girdî çikole
Diyare u dengim naygatê
Berdî be kêlewe xist
Da xuda dostî degatê
Hey...
Yar...

Soranî / Gelêrî

# Le sîley qebran






Le sîley qebiran haware
H'akim bimda le sêdare
Qet nanêm meylî ew yare
Qet nanêm meylî xedare

Le sîley qebiran hay sizaye
H'akim bimkûjê lew qelaye
Nanêm min meylî leylaye
Qewil eda, şew le jiwanim naye
Teh'a lew rêze xalane
Bo min çakin ew çawane
Yarî xome hay le nebane (behane)
Xeber berin bo xizmanim
Awirê berbote xermanim
Şêwawe derî babanim
Wergerê balat hay bibînim
Ba derçêt, giyanî şîrînim
Ya rebî min mergî to nebînim
Çawit çiray, seh'ray çîne
Kulmit gulî nêw perjîne
Wek min dîm, kafir meybîne
Çun swêsiney baxî h'ewşîne
Wergerê, awêzanit bim
Ya rebî dest le milanit bim
Xwa bîka, şew be mîwanit bim
Ya rebî min be cîranit bim

# Lê wendê




Wele çi go lîsto limlê lê lê lê lê lê wendê
Delal çi go lîsto limlê nenim şema mahşerê

Bermo lêva demo limlê lê lê lê lê lê wendê
Te digo leva demo limlê nenim şema mahşerê

Xwezya lawkê pispor im lê lê lê lê lê wendê
Xwezya lawkê pispor im nenim şema mahşerê

Te digo lê wer bimeşim lê lê lê lê lê lê wendê
Min digo lê wer bimeşim lê nenim şema mahşerê

Xwezya lawikê keleş im lê lê lê lê lê wendê
Xwezya lawikê keleş im nenim şema mahşerê

Wez dîno distînim lê lê lê lê lê lê wendê
Delal dîno distînim lê nenim şema mahşerê

Te digo lêva girtî me lê lê lê lê lê wendê
Delal lêva girtî me nenim şema mahşerê

Xwezya lawkê gundî me lê lê lê lê lê wendê
Xwezya lawkê gundî me nenim şema mahşerê

Radyoya Êrîvanê

# Lê xanimê




Lêb xanimê xanimê xanim xanimê xanimê
Lêb xanimê xanimê rewşa govendê naçimê

Lê xanima min ev e xanim xanimê xanimê
Qeda li eslê te bikeve
Hero halê me ev e

Lêb xanimê xanimê xanim xanimê xanimê
Lêb xanimê xanimê rewşa govedê naçimê

Lê xanima hertoşî
Te şara qere poşî
Bêriyê da pez didoşî

Lêb xanimê xanimê xanim xanimê xanimê
Lêb xanimê xanimê rewşa govendê naçimê

Lê xanima azîz î
Xizêm zêra altuz î
Bextê minra tu qîz î

Lêb xanimê xanimê xanim xanimê xanimê
Lêb xanimê xanimê rewşa govedê naçimê

Heréma Amedê

# Le xişe xişey





Wey dwênê royî bangîhêştim
Ax pêm wit bo maçê neyhêştim
Ca şerabî merigî pê çêştim
Wey le xişe xişey sayey peşmîne
Rabird nemzanî zaraye

Erê wey çaw degêrim diyar niyê leylim
Ax helbet konî kirduwe meylim
Erê wey aşiqî estêrey sîweylim
Wey le xişe xişey sayey peşmîne
Rabird nemzanî amîne

Erê wey ne mecnunim ne ferhadim
Ca zeh'met kêş u renc be badim
Erê ya reBotan-Behdînanî h'asil bê miradim
Le xişe xişey payey ber saye
Rabird nemzanî zaraye

Erê wey le sablaxê wederkewtim
Le gule zerde weserkewtim
Erê wey wediway koçî leylê kewtim
Le...
Ra...

# Lê yarim yar yar tirkê




Lê yarim yar yar tirkê
Lê dostê bi dosta tirkê
Kember zîva kember zêra ket kêlekê
Hez dikim xala li qirikê
Radmîsim pozê şirikê
Dil ketî eniya bi deqandî
Hez dikim tûncika bi qusandî
Sê silava li xala li qirikê
Sê silava li xala li qirikê

Lê yarim yar yar tirkê
Lê dostê bi dosta tirkê
Yarê min dî li hewşa mezin
Dosta min dî li hewşa mezin
Dest bi hine bi heya bazin
Keçik êdî min naxwazin

Lê yarim…

Lê yarim yar yar tirkê
Lê dostê bi dosta tirkê
Yarê min dî sêlê tîne
Dosta min dî sêlê tîne
Şeş baxî gava direşîne
Mişmişa diqelîne
Elxata pê dixapîne

Lê yarim…

# Lê Zeynevê






Le Zeynevê  Zeynevê
De bila Zeynev bêwo
Le Zeynevê  zeynevê
Destmal ber piştêwo
Lê Zeynevê (w)em cot in
Destmal ber piştêwo
Seri milan de hatin
Serî milan de hatin
Bîhna memkan (w)em sotin
Lê Zeynevê em sê ne
Serî mîlan de têne
Bîhna memkan jê têne
Lê Zeynevê wem çar in
Her çarin sol bizmar in
Keçikê te ez helandim
Bihna memkan ez xwarim

# Leber lencew larî to







Şew geyişte h'alî caran
Bom bilên be şay wefa daran
Zû bête ser derdedaran
Ay leber kê h'eyate leber to
Namewê sablax paşî to

Bo kesê xom hay denalim
Sed car kafir bê hay be h'alim
Lêm torawe çaw kalim
Ay leber kê h'eyate leber to
Ay leber lence u larî to

Ew şew nebû şewî dînê
Be xeyal çûme medînê
Xizmet perîzadey çînê
Ay...
Namewê...

Baxî gulanim pê bisipêre
Xunçe be xunçe bî bijêre
Yekî kem bê pêm bibijêre
Ay...
Namewê...

# Le ber nazî çaw bazan




Çawê de çawbazan
Lêm degirin rêbazan
Demkûjin be nazan
Wey wey leber nazî to
Demkûjin be nazan
Leber çawî ciwanî to

Çawê le çaw nerman
Pire le kile u derman
Helnayen le şerman
Wey wey leber nazî to
Demkûjin be nazan
Leber çawî ciwanî to

Reşmaley menguran
Le dol u le xiran
Qatilin bo kuran
Wey wey leber nazî to
Qatilin bo kuran
Leber çawî ciwanî to

Hewirî reşî dênê
Baraney derijênê
Leser çî namdiwênê wey
Leser çî namdiwênê
Leber...

Be hewiran behare
Dexwênin kewbare
Yar kolêm lê diyare wey
Yar kolêm lêdiyare leber...

Be hewran payize
Yarkolim lê zîze
Dexwênin azîze wey...
Dexwênin azîze
Leber...

Malî de mer daran
Royîn bo hewaran
Lêman debirin yaran wey
Lêman debirin yaran
Leber...

Malî de mer dostan
Bexêr neçine kwêstan
Lêman debirin dostan wey
Lêman debirin dostan
Leber...

Dû malin le roxin
Kîjyan ciwan u şoxin
Memikyan sêw u qoxin wey
Memikyan sêw u qoxin
Leber...

Dû malin beranber
Kîjyan reş esmerin
Zor ciwan u dulberin wey
Zor ciwan u dulberin
Leber...

Dû malin cîranin
Kîjyan xan u manin
Rêgirî cêjiwanin wey
Rêgirî cêjiwanin
Leber...

Soranî / Gelêrî

# Leber nazî çawbazan






Hatim be boney xalan
Tûşî dawî zulfit bûm
Teyrekî nabeled bûm
Nemzanî danew dawe
Tûşî dawî zulfit bûm
Nemzanî danew dawe
Bes u'mrî min be bade
Dem bene u zulfit lade
Dil boye namirade
Bew şewe roj gîrawe
Ey aweney dilberim
Zarit gul zulfit zire
Rûy xot bene bem lawe
Ba henasem netgire

# Leger leger




Hoy leger leger leger
Sêv kiro hoy balegir
Ew kî bu bûka xwe bir
Sêv kiro hoy balegir

Bûka xwe li coniya me kir
Sêv kiro hoy balegir
Hey hatin hatin hatin
Berbûyên meyê hatin


Bûka xwe me hazir kir
Sêv kiro hoy balegir
Bûka xwe siwar kir
Sêv kiro hoy balegir

Hoy leger leger leger
Sêv kiro hoy balegir
Hey têne têne têne
Berbûyên meyê têne

Bûk rakirin û çûne
Sêv kiro hoy balegir

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Lêm yaxî




Lêm yaxî lêm yaxî, şîlane u gerdin baxî
Lêm yaxî boç lêm yaxî, şîlane u gerdin baxî
Elê daye lêm gerê, deçime seyrî çwarbaxî
Elê daye lêm gerê, deçime seyrî çwarbaxî

Çawit esterekey rojê, heldê berî beyanî
Memkolet şekiresêwe, le baxî mecîdxanî
Yarim dergam lê bikewe, kuştimî şewboy beyanî
Çaw mest dergam lê bikewe, kuştimî sermay beyanî

Deçime wilatî germênê, lêm a´cize u naman diwênê
Deçime wilatî bitwênê, lêm zîze u naman diwênê
Çaw reş boç lêm torawî, be çawan emlawênê
Neşmîl boç wa torawî, be çawan demlawênê
Lêm...
Elê...

Çawit esterey rojê, heldê le lay şarî bokan
Çawit estereky rojê, heldê le lay şarî bokan
Nawêrim çaw ciwan maç kem, le tirsî minale wirdkan
Nawêrim yarim maç kem, le tirsî minale wirdkan
Lêm...
Elê...

Soranî, Elî Merdan, adyoya Bexdaye

# Lem zîz buwe çaw kejalim




Kiras çîtî lemseye
Ew jine cîranî meye
Bo xoy zor şox u şenge
Qed barîk delêy neye
Lêm zîz buwe çaw kejalim
Zulif şor u gerdin be xalim
Kabra be h'eyranit bê
Birîndarim birîndar
Piştênî çîtî ale
Qed delêy şimşale
Ne e'ybe u ne îrade
H'alim le boy bê h'ale
Piştênî çîtî reşe
Gerdinî wêney wenewşe
Le guley mêrdit metirse

Ew car bom were h'ewşe
Hatûm le lay nalênê
Xewis le minit nestênê
Awirî le min ber dawe
Sûre qurîngî germênê
Cergim hemû let lete
Boye xwên dedelênê
Çawit estêrey rojê
Ebrot le xew demênê
Temena dekem le xuda
Rebî le minî nestênê
Ne e'ybe u ne îrade
Rûbendit bo min lade
Bew pencanet bimşêle
Bew kolwanet pêm dade

# Lence




Her wek baz u bend bitkeme balim
Êsta lêm dûrî talan be malim
Ey wey lence u xanim lenceye
Îştiyay le kirasî kirêşeye
Eger nemdeyey h'ewt maç be carê
H'ewt kostit kewê her yek le şarê
Kê tefrey dawî berdî lê barê
Ey wey lence u xanim talan be malim
Wek perwane, min sûta balim
Her kesê neybê dû dost u yarê
Ser bigirê le qûr subih' u êwarê
Be şil u mil, hatine mîwanê
Gwarey zêr, dênime colanê
Toy barîk u neşmîlanê
Daykeket bimrê, babit bê îman

Wa bûn be baî's dilî herdûkman
Be roj qerewil agam le poste
Çawerêy kîjêkim dû çawî meste
Be roj h'eresi wam le îdare
A'şiqî kîjêkim yekcar xeddare
Ey wey lence u xanim lenceye
Lencey be serî penceye
Be roj h'eresim agam le kale
A'şiqî kîjêkim çawî xezale
Be roj h'eresim meimur merkezim
Dû bizinî rûtim heye be bê merezim
Ey wey lence û xanim lenceye
Îştiyay le kirasî, ay kirêşeye
Royney be serî penceye

# Lêrlê gulê





Lêrlê gulê gulê gulê lêrlê gulê gula min
Lêrlê gulê gulê gulê bûkê gulçîçeka min
Birayê bûkê dîno mîno lêrlê gulê gula min
Birayê bûkê dîno mîno bûkê gul çîçeka min
Li oda diyar rûniştiyo
Li oda diyar rûniştiyo
Seeta mezin ji me xwestiyo
Seeta
Zava axa seknandiyo
Zava axa rawestiyo
Çiqa bêjin bê minetiyo
Çi bixwazin bê minetiyo

Lêrlê
Lêrlê
Birayê bûkê efendî ye
Birayê bûkê efendî ye
Li qesra jorîn rûniştî ye
Li qesra jorîn rûniştî ye
Seeta mezin ji me xwestî ye
Seeta
Çi bixwazin bê minetite
Çiqas bêjin bê minetî ye
Zava axa seknandiye lêrlê gulê gula min
Zava axa seknandiye bûkê gul çîçeka min

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Leser kepirî sepanan

Moderato




Le ser kepirê sepanan wey deba xeplê wat lê bê
Tirşe bi bayîncanan wey deba keçê wat lê bê

Le gundê me şayiye sed kure kirmanc şeqinnox
Eyaloxu meyalox dilm u dilanî şalox

Le ser kepirê...

Qedit reyh'aney ser gufkî cot cot degirê bayîncan
Eger rojê netbînim wey h'ezim deçête mastawê

Le ser kepirê...

Soranî / Gelêrî

# Lew dînê û dînê




Le dûrî toye reş poşim, lew dînê u dînê min
Mest u xembar u serxoşim, lew dînê u dînê min
Be maçit dê feramoşim, lew dînê u dînê min
Dîn dîn dîn..., Lew dînê u dînê min
Baskit danê u bazût nerme gul bo serînê min
Ew çawaney mîslî bazin, lew dînê u dînê min
Mest u xumar pir la nazin, lew dînê u dînê min
Birjangit tîrî serbzin, lew dînê u dînê min
Ew heramey min deyzanim, lew dînê u dînê min
Berdî bo bikêşim ba şanim, lew dînê u dînê min
Hêşta minete be giyanim, lew dînê u dînê min
Ew heramey kin bokanê, lew dînê u dînê min
Yar kutêye u dane danê, lew dînê u dînê min
Kûştey wîm xuda deyzanê, lew dînê u dînê min

# Leylî bawanim




Hey leylî leylî, leylî bawanim
Boçî demkûjî min bê tawanim
Le nêw sablax da burcêk diyare
Be qed ew burce xem le dilim bare
Le bê lutifî yar, henasem sware
Reng zerd u zeî'f lêwim be bare
Hey leylî leylî, leylî bawanim
Bo çî demkûjî min bê tawanim
Sablax çend xoşe xakî dilgîre
Ew kiçe lew male kot u zincîre
Le dûrî balat bûm perewaze
Xembarit kirdûm zor bê endaze

# Leylo ziravê




Zirav zirav ziravê leylo leylo ziravê
Zirav zirav ziravê min qet bê te nabê

Ziravê weka derzî leylo leylo ziravê
Delalê weka derzî min qet bê te nabê

Li ber dikê mera dibazî leylo leylo ziravê
Li ber dikê mera dibazî min qet bê te nabê

Hirketî şar û kezî leylo leylo ziravê
Hirketî şar û kezî min qet bê te nabê

Leylo çûye qirşika leylo leylo ziravê
Tolê çûye qirşika min qet bê te nabê

Bû req reqê şimika leylo leylo ziravê
Bû req reqê şimika min qet bê te nabê

Radmîsim ser memika leylo leylo zirave
Radmîsim ser memika qet bê te nabê

Ziravê weka mû ye, ber derê me ra bûriye
Mîr hakim ji ber rabûye, mîr hakim ji ber rabûye

Radyoya Êrîvanê

# Leylo




Leylo leylo ziravê
Leylo leylo ziravê
Leylo leylo ziravê
Leylo çûye ser avê
Leylo leylo ziravê
Leylo çûye ser avê
Kinc şûştin dane tavê
Leylo leylo ziravê
Kinc şûştin dane tavê
Cilan dişo bi aravê
Leylo leylo zirave
Cilan dişo bi aravê
Leylo leylo ziravê
Leylo leylo zirave
Leylo leylo ziravê
Zirav e weke derzî
Leylo leylo zirave
Zirav e weke derzî
Ber derê me re bezî
Leylo leylo zirave
Ber derê me re bezî

Mîr hakim ber lerizî
Leylo leylo ziravê
Mîr hakim ber lerizî
Leylo leylo zirave
Leylo leylo zirave
Leylo leylo zirave
Zirave weke mûye
Leylo leylo zirave
Zirave weke mûye
Ber mala mere çûye
Leylo leylo zirave
Ber mala mere çûye
Mîr hakim ber rabûye
Leylo leylo zirave
Mîr hakim ber rabûye
Leylo leylo zirave
Leylo leylo zirave
Leylo leylo zirave

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Lezo







Ay Lezo Lezo Lezo
Hay Lezo Lezo Lezo
Şirîno bikulezo hay Lezo

Ber me de bê mermer e
Piş me de bê mermer e
Mermera sor û zer e
Hay Lezo Lezo Lezo
Mermera sor û zer e
Hay Lezo Lezo Lezo
Ji min re biye keder e
Rezîlo bê ezo hay Lezo
Hay Lezo Lezo Lezo

Ber me de bêbîbî ye
Hay Lezo Lezo Lezo
Ber me de bêbîbî ye

# Li bazdanê




Ha li bazdanê bazdanê
Hevala min û kewê
Ewkî rabû ji xewê
Hevala min û kewê
Keçik rabû ji xewê
Hevala min û kewê
Dest dada elba dewê
Hevala min û kewê

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî: Seydayê Goyan

# Li binya kelêwo




Rêka li binya kelêwo heyranê
Rêka li binya kelêwo seyranê
Ew kî ye ji wê da têwo heyranê
Ew kî ye
Qîzik e ji wê da têwo
Keçik e ji wê da têwo
Paçê melesî lêwo
Paçê elmanî lêwo
Sed bimbarek li bejnêwo
Sed pîroz be li bejnêwo

Rêke
Rêka
Ew kî ye tê ra têwo
Ew kî ye tê ra têwo
Kurik e têra têwo
Lawik e têra têwo
Şal û şapik lêwo
Şal û şapik lêwo
Sed bimbarek li bejnêwo
Sed pîroz be li bejnêwo


# Li kendala




Ha li kendala ha li kendala esmer xezala li kendala
Ha li kendala ha li kendala esmer delala li kendala
Ew kî çû seyda xezala esmer xezala li kendala
Zava çû seyda xezala esmer delala li kendala
Qîz hanî tevû guhara
Keç anî tevû guhara
Law hanî tevû egala
Kur anî tev û egala
Ha li kendala ha li kendala esmer delala li kendala
Ha li kendala ha li kendala esmer delala li kendala

Heremen Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Li mêrgêwo




Li mêrgêwo li mêrgêwo malê me li mêrgêwo
Li mêrgêwo li mêrgêwo konê me li mêrgêwo
Bi qurban xwuşk û dêwo malê me li mêrgêwo
Bi qurban xwuşk û dêwo konê me li mêrgêwo
Ew kî ye ji wê da têwo
Ew kî ye ji wê da têwo
Saqo li ser gîzmêwo
Saqo li ser gîzmêwo

Li mêrgêwo li mêrgêwo malê me li mêrgêwo
Li mêrgêwo li mêrgêwo konê me li mêrgêwo
Ha danî ha danî mala li mêrgê danî
Ha danî ha danî kona li mêrgê danî
Ew kî ye tep helanî ew kî beyraq danî
Ew kî ye tep helanî ew kî beyraq danî

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Li mêrgêwo





Li mêrgêwo li mêrgêwo malê me li mêrgêwo
Li mêrgêwo li mêrgêwo konê me li mêrgêwo
Ew kî ye ji wê da têwo malê me li mêrgêwo
Ew kî ye ji wê da têwo konê me li mêrgêwo
Qatlixê hêşîn lêwo
Qatlixê hêşîn lêwo
Bûkê rakin pêwo
Bûkê rakine pêwo
Li qarşî çavê dêwo
Li qarşî çavê dêwo
Ha danî danî danî malan li mêrgê danî
Ha danî danî danî konan li mêrgê danî

Li mêrgêwo
Li mêrgêwo
Ew kî ye ji wê da têwo
Ew kî ye ji wê da têwo
Kinê ye ji wê da têwo
Kinê ye ji wê da têwo
Fîstanê îpek lêwo
Fîstanê îpek lêwo
Bi qurban xuçk û dêwo
Bi qurban xuçk û dêwo
Ha danî danî danî malan li mêrgê danî
Ha danî danî danî konan li mêrgê danî

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Li min eskero




Li min li min eskero li min
Li min li min çawîşo li min
Eskerê dilê min bernadin
Çawîşê dilê min bernadin
Kûçkê sûbay îznê nadin
Esker dane qeza Farqînê
Çawîş dane qeza Farqînê
Pê dikirin ders û telîmê

Li min
Li min
Eskerê
Kûçkê
Esker dane qeza Îsparta
Çawîş dane qeza Îsparta
Pê dikirin telîm û dersa
Li min li min eskero li min
Li min li min çawîşo li min

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Li serbane






Li ser banê wey wey çû ser bane
Li ser banê - banî mezin
Dest xurt na girt lêlê dest xort negirt hawar hate bazin
Delîlxanê delîlxanê delîlxanê xanamin
Birayê te qurbana min

Li ser banê lêlê çû ser bane
Li ser bane giyan banê biçûk
Dest xo derkird lêlê dest xo derkird hawar heta neynûk
Delîlxanê delîlxanê...

Li ser bane lêlê çû ser bane
Li ser bane giyan banê berîn
Dest xo helkird lê lê dest xo helkird hawar reng û rengîn
Delîlxanê delîlxanê...

# Li seyrana




Li seyrana li seyrana narka mala bavê min
Li seyrana li seyrana te şikand qam û cindyê min
Diyarbekir bi giya ye
Diyarbekir bi giya ye
Textê kekê min tê da ye
Textê birê min tê da ye
Deng lê nekin ew zava ye
Deng lê nekin ew zava ye
Ew zavakê van apa ye
Ew zavakê van apa ye
Ew destmala ser desta ye
Ew destmala ser desta ye
Ew xelatê ser xala ye narka mala bavê min
We xelatê ser xala ye te şikand qam û cindyê min

Heremen Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Lîmo hey lîmo




Lîmo hey lîmo, lîmoy şîrazî
Serpencet nerme lîmo giyan bo şew desbazî

Be maç u dû maç lîmo giyan lêt nabim razî
Ta leser sînet lîmo giyan neykem desbazî

Lîmo hey lîmo...

Be maç u dû maç lîmo giyan hîçit lê nayê
Wa bizane nan bu lîmo giyan dat be gedaye

Lîmo hey lîmo...

# Lîzane




Hoy lîzanê lîzanê
Şer e (li) şîva lîzanê
Hekari darişyanê
Şibyên tavên baranê
Dest bavên silehanê
Şer e li şîva Lizanê
Şîva lîzanê reş e
Şer e (li) şîva Lîzanê
Bişkok bîst û şeş e
Şer e (li) şîva Lîzanê
Cîhê lîzanê xweş e
Şer e (li) şîva Lîzanê
Şîva lîzanê sor e
Şer e (li) şîva Lîzanê
Bişkok dara darê
Şer e (li) şîva Lîzanê
Cihkê lîzanê (li) jor e
Şer e (li) şîva Lîzanê

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Lo berde




Şevek nîvê şevê da lo
Di giraniya xewê da
Destê xwe da destê min lo
Bin roniya şevê da

Lo berde lo berde
Lawo destê min berde
Evînî bi kul û derde lo
Lawo deste min berde

Min te dî bû xevza gulan
Sibe nîvro êvaran
Destê xwe da deste min lo
Xisim ketiye guharan

# Lo bi walo




Lo bi lawo lawo lawo
Lo bi lawo lawo lawo
Serê bozê berdaho
Boz li Bîngolê avdaho
Wî de lawo lawo lawo
Kur malo gede lawo

Lo bi laho lawê metê
Kur malo kurê metê
Pez berda devê xetê
Heyrana marîfetê
Wî de lawo lawo lawo
Kur malo gede lawo

Lo bi lawo derewîno
Kurmalo derewîno
Te di kura memik dîno
Ser sor in kok spîno
Wî de lawo lawo lawo
Kur malo gede lawo

# Lo bi lariye




Radyoya Êrivanê

Lo bi lorî ye bi lorî ye lor lorî ye bi lorî ye
Lo bi lorî ye bi lorî ye ser bi zêrê bi morî ye

Lorî qîza bi mele ye lor lorî ye bi lorî ye
...ser bi zêrê bi morî ye
Pişta xwe da bi derge ye lor lorî ye bi lorî ye
...ser bi zêrê bi morî ye
Paşil tujî bi xurme ye lor lorî ye bi lorî ye
...ser bi zêrê bi morî ye
Law lo lêxin ya me ye lor lorî ye bi lorî ye
...ser bi zêrê bi morî ye

Lo bi lorî ye...

Lorî qîza bi keşîş e lor lorî ye bi lorî ye
...ser bi zêrê bi morî ye
Pişta xwe da bi girîş e lor lorî ye bi lorî ye
...ser bi zêrê bi morî ye
Paşil tujî bi hewîş e lor lorî ye bi lorî ye
...ser bi zêrê bi morî ye
Law lo lêxin baxşîş e lor lorî ye bi lorî ye
...ser bi zêrê bi morî ye

Lo bi lorî ye...

# Lo cotkaryo




Bi xizêmê lê lê xwezya xizêm way way
Lo cotkaryo lo lo tu cot neke way way
Rê û dirba lo lo xira neke way way
Xelk nifira lo lo li te bike

Lo cotkaryo lo lo cot li pal e way way
Tu cot berde lo lo were mal e
Ez ramûsim lo lo kurê xal e

Lo cotkaryo lo lo cot li kaş e way way
Tu cot berde lo lo hûr bimeşe way way
Mal heyrana lo lo çavê reş e way way

Lo cotkaryo lo lo cot li mesîla way way
Tu ga berde lo lo nav kesîla way way
Ez ramûsim lo lo te bi destmala way way

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Lo dilo dilo




Lo dilo dilo lo dilo lo dilo dilo lo dilo
Lo dilo dilo lo dilo sefîlo dilo ser dilo

Emê îşev li ku bin lo dilo dilo lo dilo
Emê îşev li ku bin sefîlo dilo ser dilo

Ha ser pira Qersê bin lo dilo dilo lo dilo
Ha ser pira Qersê bin sefîlo dilo ser dilo

Ha mêvanê Besê bin lo dilo dilo lo dilo
Ha mêvanê Besê bin sefîlo dilo ser dilo

Emê îşev li ku bin lo dilo dilo lo dilo
Emê îşev li ku bin sefîlo dilo ser dilo

Ha ser pira Batmanê lo dilo dilo lo dilo
Ha ser pira Pertekê sefîlo dilo ser dilo

Dilê min ketiye Siltanê lo dilo dilo lo dilo
Dilê min ketiye Siltanê sefîlo dilo ser dilo

Lo dilo dilo lo dilo lo dilo dilo lo dilo
Lo dilo dilo lo dilo sefîlo dilo ser dilo

Herêma Amedê

# Lo gede




Herêma Serhedê

Lo´b lo gede lo gede
Lo´bi lo gede lo gede
Lo´b lo gede lo gede
Wî xudê bela xwe bide te
Tu çima hatî mala me
Lo´b lo gede lo gede
Tu çima hatî mala me
Wî xudê bela xwe bide te
Pişta xwe da stêrê me
Lo´b lo gede lo gede
Pişta xwe daye stêrême
Wî xudê bela xwe bide te
Çavê xwe berda keçka me
Lob lo gede lo gede
Çavê xwe berda qîzka me
Wî xudê bela xwe bide te

Rabe here ji mala me
Lo´b lo gede lo gede
Rabe herê ji mala me
Wî xudê bela xwe bide te
Bişewite dilkête
Lo´b lo gede lo gede
Bila daxbe dilkê te
Wî xudê bela xwe bide te
Bavêm keçkê nade te
Lob lo gede lo gede
Bavêm qîzkê nade te
Wî xudê bela xwe bide te

Lawkê xelkê ne durist in
Lo´b lo gede lo gede
Gedê xelkê ne durist in
Wî xudê bela xwe bide te
Ser kuleka radiwestin
Lo´b lo gede lo gede
Ser xanîka radiwestin
Wî xudê bela xwe bide te
Keçkê me ji aqil xistin
Lo´b lo gede lo gede
Qîzkê me ji aqil xistin
Wî xudê bela xwe bide te

# Lo gidyo pîremêro




Lo gidyo lo lo gidyo
Lo gidyo pîre mêro
Aşiyo hevran hêro
Maqûlo jin bijêro

Min pîre mêr nevêto
Min kale mêr nevêto
Wextê'j mizgeftê têto
Şeq reqê'j hêlgan têto

Pîre mêrê Repinî
Kale mêrê Repinî
Kêriya rezan sekinî
Te kir nûklê hesinî

Pire mêrê Qulavî
Kale mêrê Qulavî
Te kir xiyarê tovî
Beyaran neke şovî

Pîremêri Hilalî
Kale mêrî Hilalî
Hêlik Kulindê kav î
Kitikan da ber kûlav î

Pîremêrî Heletî
Ew seg bavê Heletî
Sekinî binya tehtî
Topa Xwedê bi rih ketî

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydaye Goyan

# Lo lawo




Herêma Serhedê

Lo lawo hêşme hêşme wey lolo lo lolo wey lolo lo
Delalo hêşme hêşme ca dilê min, emrê te
Keremke were pêş me wey lolo lo lolo wey lolo lo
Kerem ke were peş me ca dilê min, emrê te
Bê awir û bê xişme, wey lolo lo lolo wey lolo lo
Bê awir û bê xişme, ca dilê min, emrê te

Lawiko mele Îsa wey lolo lo lolo wey lolo lo
Kurmalo mele Îsa ca dilê min, emrê te
Qeytanê li devê kîsa  wey lolo lo lolo wey lolo lo
Qeytanê li devê kîsa ca dilê min, emrê te
Bi dest girt rû ramisa, wey lolo lo lolo wey lolo lo
Bi dest girt rû ramisa, ca dilê min, emrê te

Lawik hato ji Meterê wey lolo lo lolo wey lolo lo
Delal hato ji Meterê ca dilê min, emrê te
Leyisto bi xencerê  wey lolo lo lolo wey lolo lo
Leyisto bi xencerê ca dilê min, emrê te
Mêvanê te esmerê wey lolo lo lolo wey lolo lo
Mêvanê te dilberê ca dilê min, emrê te

Lawik hato ji Baqûzê wey lolo lo lolo wey lolo lo
Delal hato ji Baqûzê ca dilê min, emrê te
Leyisto bi heba gwîzê wey lolo lo lolo wey lolo lo
Leyisto bi heba gwîzê ca dilê min, emrê te
Mêvanê te baldûzê wey lolo lo lolo wey lolo lo
Mêvanê te baldûzê ca dilê min, emrê te

# Lo li min li min




Herêma Serhedê

Lo li min li min lo li min
Lo li min li min lo li min

Bavê keçikê nade min
Wey li min li min lo li min

Agir ketiye dilê min
Hoy li min li min hey li min

Wê bi çawa be halê min
Lo li min li min lo li min

Wez hatim te bi gul gul kim
Lo li min li min lo li min

Te bi ordekê ra ji dil kim
Lo li min li min lo li min

Xorta ra derde kul kim
Lo li min li min lo li min

Lo li min li min lo li min
Lo li min li min lo li min

# Lo lo Mihemedo




Lo lo Mihemedo
Avik û avik
Mala bavê wo
Avik û avik
Lo lo Mihemedo ava befrêwo
Mala bavê wo ava befrêwo
Lo lo Mihemedo mêrg û kanî wê li hindavik
Mala bavê wo mêrg û kanî wê li hindavik
Şa biskên yarê xwinavik
Şa biskên yarê xwinavik
Gergerê nerme
Gergerê nerme
Dilê xwe negire xeme

Ez sibê berbûyên te me
Kolan kolanan de tê wo
Kolan kolanan de tê wo
Latika nêrgizê
Me dîrû gûrzêli ber gûrzê
Latika beybûnê
Me dîrû cûnî li ber cûnî
Me kirî kizweta (elbise) canê
Her here were were wanê
Hêstrokê bavê qepanê
Bikirîn kizweta canê
Her here were sûkê
Hêstrokê bavêje tû'kê (dara tû)
Bikirîn kizweta bûkê

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Lo lorî Helîm can




Lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm can
Lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm can

Pezê bavê min hezar lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm çan
Pezê bavê min hezar lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm can

Tu bi gelekî malê´m xwar lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm can
Tu bi gelekî malê´m xwar lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm can
Dika te da nene xwar lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm can
Ddika te da nene xwar lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm can

Li te bibe kul û jar lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm can
Li te bibe kul û jar lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm can
Kul û jara sala par lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm can
Kul û jara sala par lo lorî lo lorî lo lorî lo lo lorî lawo Helîm can

Lo lorî lo lorî...

# Lo rezo




Lo rezo rezo rezo, narim kolana reza
Lo rezo rezo rezo, narim kolana reza

Tiryê rezê min cirdik e narim kolana reza
Kolana rez hindik e narim kolana reza
Kolana rez hindik e narim kolana reza

Tiryê rezê min spî ye narim kolana reza
Kolana rez hêdî ye narim kolana reza
Kolana rez hêdî ye narim kolana reza

Tiryê rezê min reş e narim kolana reza
Kolana rez çi xweş e narim kolana reza
Kolana rez çi xweş e narim kolana reza

Herêmên Amed û Xerpêtê

# Lo şivano




Lo şivano lo şivano
Lo şivano lo, lo şivano

Lo şivano lo şivano
Jaro dilo dilkovano

Ser ranabe ji ber xemano
Ji ber cotên bav û birano

Navê şivanî hevind e
Pez berdabû dola gûnd e

Ya ser bêrê ya der bêrê
Ya li nav bêrê bejn bilind e

Navê şivanî Elî ye
Ho delalî malê Elî ye

Pez berdabû dola spî ye
Pez berda bû dor gelî ye

Bêriya malê ji xwe spehî ye
Ya li ser bêrê gerden spî ye

Navî şivanî Emer e
Pez berdabû dola zer e

Bêriya malê ji xwe esmer e
Ya li ser bêrê gerden zer e

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Lo lo pismamo




Lo lo pismamo tu çima deng nakî
Serê xwe carek bilind ranakî
Serê xwe carek bilind ranakî
Eskerê dijmin li çiyayê jor în
Weka xweş mêra ji hev bela nakî
Weka xweş mêra ji hev bela nakî

Lo lo pismamo zanim xweş mêr î
Pismamê Rustem yan Egît şer î
Pismamê Rustem yan Egît şer î
Roja hallanê roja lêdanê
Mêr be li meydanê dotmam diborî
Mêr be li meydanê dotmam diborî

Lo lo pismamo haya te ji te be
Şarika min î reş li serê te be
Şarika min î reş li serê te be
Roja lêdanê tu li meydanê
Lêdan tim hebe reva te nebe

Şalê xezanî rabe li xweke
Pişta xwe girêde rext û fîşek e
Pişta xwe girêde rext û fîşek e
Pismamê min î dotmama tem e
Ji te ra kil da ye çavê belek e
Ji te ra kil da ye çavê belek e

Lo lo pismamo tu çima deng nakî
Serê xwe carek bilind ranakî
Serê xwe carek bilind ranakî
Eskerê dijmin li çiyayê jor în
Weka xweş mêra ji hev bela nakî
Weka xweş mêra ji hev bela nakî

Aramê Tigran, radyoya Êrîvanê

# Loloy zava




Herêma Amedê

Ax loloy loloy loloy loloy loloy zava
Ax loloy loloy loloy ronîka çava

Ew zavakê vê payizê loloy loloy zava
Ew paşakê vê payizê xaliq mala te ava
Cîka raxin li sîka gûzê loloy loloy zava
Cîka raxin li sîka gûzê xalişq mala te ava
Zava radzê li paşla qîzê loloy loloy zava
Zava radzê li paşla qîzê xaliq mala te ava

Ew zavakê vê biharê loloy loloy zava
Ew paşakê vê biharê xaliq mala te ava
Cîka raxin li sîka darê loloy loloy zava
Cîka raxin li sîka darê xaliq mala te ava
Zava radzê li paşla yarê loloy loloy zava
Zava radzê li paşla yarê xaliq mala te ava

Ew zavakê vê havînê loloy loloy zava
Ew paşakê vê havînê xaliq mala te ava
Cîka raxin li şaneşînê loloy loloy zava
Cîka raxin li şaneşînê xaliq mala te ava
Zava radzê li paşla zînê loloy loloy zava
Zava radzê li paşla zînê xaliq mala te ava

Zava heye mîraniye loloy loloy zava
Zava heye mîraniye xaliq mala te ava
Qilçik sorê erebiye loloy loloy zava
Qilçik sorê erebiye xaliq mala te ava
Zava bi dilkê ca xesiye loloy loloy zava
Zava bi dilkê ca xesiye xaliq mala te ava

# Lorke lorke




Lorke lorke lorke lorke xanimê lorke
Lorke lorke lorke lorke xanimê lorke
Min bi heyrana dilê hûr ke xanimê lorke
Min bi heyrana dilê hûr ke dilbavê çêke

Çûme mala berî xweşik xanimê lorke
Çûme şêna berî xweşik xanimê lorke
Danî ber min nan û tirşik xanimê lorke
Danî ber min nan û tirşik dilbavê çêke

Çûme mala Eliyê Emer xanimê lorke
Çûme şêna Eliyê Emer xanimê lorke
Danî ber min qela qemer xanimê lorke
Danî ber min qela qemer dilbavê çêke

Çûme mala Xalê Bekir xanimê lorke
Çûme şêna Xalê Bekir xanimê lorke
Danî ber min hebû şekir xanimê lorke
Tobe bi min lê tam nekir dilbavê çêke

Çûme mala mama Eliyê zaza xanimê lorke
Çûme mala mama Eliyê zaza xanimê lorke
Danî ber min goştê qaza, xanimê lorke
Danî ber min goştê qaza, xanimê lorke

# Lorkê lorkê




Lorkê lorkê lorkê lorkê xanimê lorkê
Lorkê lorkê lorkê lorkê delalê lorkê
Kêrê bine penêr hûr ke xanimê lorkê
Min bi xulama gulyên sor ke delalê lorkê

Çûme mala Aliyê Zaza xanimê lorkê
Hatim mala Aliye Zaza delalê lorkê
Dani ber min goştê qaza xanimê lorkê
Dani ber min goştê qaza delalê lorkê

Ji wirda çûme mala Diyar xanimê lorkê
Ji wêda hatim mala Diyar delalê lorkê
Danî ber min nan û xiyar xanimê lorkê
Danî ber min nan û xiyar delalê lorkê

Çûme mala Avdê Ali xanimê lorkê
Hatim mala Aavdê Ali delalê lorkê
Danî ber min nan û qeli xanimê lorkê
Danî ber min nan û qeli delalê lorkê

Herêma Amedê

# Lorkê û lorkê






Lorkê û lorkê û lorkê û lorkê
Xatûnê lorkê
Şil û mil û çaw be kilî
Taqaney daykê
Gozey helgirt cerey dana
Xatûnê lorkê
Derî hêna cam û şane
Xatûnê lorkê
Gozey helgirt cerey pir kird
Xatûnê lorkê
Be bay şemal memkî xir kird
Xatûnê lorkê
Gozey sûr û awî şewê
Bot mirdim nasikê
Demim we xalanit kewê
De mero tesikê
Gozey sûrî awî sarde
Hey mero nasikê
Boy tê kirdim mangî çarde
Xatûnê lorkê
Gozey helgirt bo gwêy rubar
Xatûnê lorkê
Efsunî kird nasik û nazdar
Boy mirdim lorkê

# Loy li min




Ha sibe ye sibe nabe
Loy li min li min loy li min
Ca sibe ye sibe nabe
Bav keçikê nade min
Zerî ji xewê ranabe
Loy li min li min loy li min
Rindê ji xewê ranabe
Sika darê Huba yarê
Germiya Rewanê da li ser me
Wey wey da li ser me
Wê halê me çawa be
Loy li min li min loy li min
Çav di dil ra pê nabe
Bav delalê nade min
Dil ketiyê çare nabe
Loy li min li min loy li min
Dil ketiyê çare nabe
Sika darê huba yarê
Germiya Rewanê da li ser me
Wey wey da li ser me
Ha sibe ye tav mij mij î
Loy li min li min loy li min
Ca sibe ye tav mij mij î

Bav rindikê nade min
Avêd kaniya kelijî
Loy limin limin loy limin
Avêd gola kelijî
Sika darê huba yarê
Germiya dewanê da li ser me
Wey wey da li serme
Ser xaniya bune tijî
Loy limin limin loy limin
Ser xaniya bune tijî
Bav torinê nade min
Ji komê yek ya minjî
Loy limin limin loy limin
Vê komê yek ya minjî
Sika darê huba yarê
Germiya Rewanê da li ser me
Wey wey da li serme

Herêmên Amed û Serhedê, çavkanî : Şemdîn

# Malan bar kir




Malan bar kir lê lê çûne varan lê
Dinê lê, dînê lê dînara min
Goştê me xwarin lê lê mişk û maran lê
Gewrê lê rindê lê hevala min

Ez dîn nebûm lê lê te ez dîn kirim lê
Dînê lê dînê lê dînara min
Ez hurc nebûm lê lê, hûlo kirim lê
Gewrê lê rindê lê hevala min

Ez kew nebûm lê lê kedî kirim lê
Dînê lê dînê lê dînara min
Paşila xwe da lê lê xwedî kirim lê
Gewrê lê rindê lê hevala min

Malan barkir lê lê koç bi rê ket lê
Dînê lê dînê lê dînara min
Te dilê'm êşand lê agir pê ket lê
Gevrê lê rindê lê hevala min

Rabe vere lê lê li heviya te me lê
Dînê lê dînê lê dînara min
Dil bi kûl im lê evînê te me
Gewrê lê rindê lê hevala min

Jana te da dil lê lê jana min e lê
Dînê lê dînê lê dînara min
Pey te nayê lê sebra min e lê
Gewrê lê rindê lê hevala min

Herêmên Dêrsim û Bîngolê, çavkanî : Bahrî Yuruk

# Male babim bê wefa






Male babim bê wefa sebrim nema takey cefa
Singî baxî ba sefa lêm zîze lêm zîze namdwênê
Gewherî yekdaneye dem qend u rû mahî tabanê

Derdî îşqim kariye wa xwên le çawim cariye
Min beşim xembariye lêm zîze lêm zîze...

Naleyî îşqe reşim min aşiqî çawî reşim
Zîze yarî dawetim lêm zîze lêm zîze...

# Malê min




Hoy malê min malê min tew emrê min canê min
Bexçe bi hermî ye tew malê min malê min
Bexçe bi hirmî ye tew emrê min canê min
Jin heye cindî ye
Jin heye cindî ye
Mêr jê re gorî ye
Mêr jê re gorî ye

Hoy malê min malê min tew emrê min canê min
Bexçe bi hinar e
Bexçe bi hinar e
Jin heye bê ar e
Jin heye bê ar e
Mêr jê re neyar e
Mêr jê re neyar e

Hoy malê min malê min tew emrê min canê min
Bexçe bi hebreş e
Bexçe bi hebreş e
Jin heye keleş e
Jin heye keleş e
Mêr jê re nexweş e
Mêr jê re nexweş e

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Malka Şemo




Malka Şemo ber çiyayê ye
Tarik nînayê Şemo tarik nînayê Şemo
Malka Şemo ber çiyayê ye
Tarik nînayê Şemo şîşkê mîşkê ecemo

Berfê baranê dayê da
Tarik nînayê Şemo tarik nînayê Şemo
Berfê baranê dayê da
Tarik nînayê Şemo şîşkê mîşkê ecemo

Malka Şemo li devê rê ye
Tarik nînayê Şemo tarik nînayê Şemo
Malka Şemo li devê rê ye
Tarik nînayê Şemo şîşkê mîşkê ecemo


Keleş lawkê mindê ye lê
Tarik nînayê Şemo tarik nînayê Şemo
Keleş lawkê mindê ye lê
Tarik nînayê Şemo şîşkê mîşkê ecemo

Hero dîna min têye lê
Tarik nînayê Şemo tarik nînayê Şemo
Hero dîna min têye lê
Tarik nînayê Şemo şîşkê mîşkê ecemo

Radyoya Êrîvanê

# Malkê me

Moderato




Malkê me deyna bû
Binya dinyayê
Te bejin zirav e
Kember lê nayê
Yar sêrto xatûnê
Di kelha serayê
Yar bejin zirav e
Kember da rexê
Yar sêrto xatunê
Kelha ewrexê
Malkê me deyna bû
Binya Cizîrê
Yar sêrto xatûnê
Kelha Îzmirê
Malkê me deyna bû
Binya Kerkûkê
Yar bejin ziravê
Kember neynûkê

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Mamanî





Cizîr e Cizîr e Mamanî
Mamanî Mamanî
Cizîr e Cizîr e Zeriyê ordêlanî
Cizîr berê reş e
Mamanî Mamanî Mamanî
Cizîr berê reş e
Zeriyê ordêlanî
Bişkok bîst û şeş e
Mamanî Mamanî Mamanî
Bişkok bîst û şeş e
Zeriyê ordêlanî
Lawkê min kêfxweş e
Mamanî Mamanî Mamanî
Lawkê min kêfxweş e
Zeriyê ordêlanî

Cizîr berê sor e
Mamanî Mamanî Mamanî
Cizîr berê sor e
Zeriyê ordêlanî
Bişkok domen dor e
Mamanî Mamanî Mamanî
Bişkok domen dor e
Zeriyê ordêlanî
Lawkê min pispor e
Mamanî Mamanî Mamanî
Lawkê min pispor e
Zeriyê ordêlanî

Cizîr berê spi ye
Mamanî Mamanî Mamanî
Cizîr berê spî ye
Zeriyê ordêlanî
Bişkok dorê sî ye
Mamanî Mamanî Mamanî
Bişkok dorê sî ye
Zeriyê ordêlanî
Lawkê min cindî ye
Mamanî Mamanî Mamani
Lawkê min cindî ye
Zeriyê ordêlanî

# Mamê şiwan





Mame şiwanî kolneder - kurdî ferengî le ber
Xunçey dilim bê awe - hanam bo to hênawe
Le dîmenî beharan - le balindey kwêstanan

Be sozî germî giryan - bilwêrit bêne giryan
Satê leber şaleket - derbêne şimşaleket
Taku be nizmî h'eyran - firmêskim bête giryan

Mamê şiwanî...

Soranî / Gelêrî

# Mamir mamir




Mamir mamir mamir mamir ha mamo
Mamir mamir mamir mamir pismamo
Mamir li berda nave mamir hamamo
Runê li berda ave mamir kur mamo

Mamir mamir mamir mamir ha mamo
Mamir mamir mamir mamir pismamo
Xelkê jina te bir mamir ha mamo
Xûlî li ser te kir mamir kur mamo

Mamir mamir mamir mamir ha mamo
Mamir mamir mamir mamir pismamo
Mamo te li min ciye mamir ha mamo
Ava tem aniye mamir pismamo

Mamir mamir mamir mamir ha mamo
Mamir mamir mamir mamir pismamo
Xû mede sîka kevir mamir ha mamo
Xelkê xwestiya te bir mamir pismamo

Heremên Amed û Serhedê, çavkanî : Eyşe Şan

# Maşala Bedirxan beg




Hey xanê xanê xanê
Maşala Bedirxan beg
Fetehê têt ji Ridwanê
Xweyê koşk û dîwanê
Feteh beg û birayê xwe
Şûr hilkêşa milê xwe
Şûr dakêşa milê xwe
Çû qumriyê tola xwe
Tolan anî bi destê
Ava sêrtê hûr ber e
Cezma Fetehî zer e
Fetehê ser leşker e
Ava Sêrtê hindik e
Cezma feteh şorig e
Feteh beg hêj biçûk e
Ava Sêrtê mezin e
Esker hat ser û bin e
Feteh kuşt mixabin e
Ewrex ê berde şkêr e
Mertalê Osman zer e
Osman kuşt xulam vêr e
Ewrex ê berde zevî
Mertalê Osman çevî
Osman kuşt xulam revî
Ser çeperan da xwarin
Ew şûrkêşê xwînkar in
Fetehê hêj kurik e
Şur kêşa melkemot e

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Masîko




Yar yeman yeman yeman yar yeman
Yar yeman yeman yeman dost yeman
Masîko per beleko yar yeman
Masîko per beleko dost yeman
Vê avê meke leko yar yeman
Vê avê meke leko dost yeman

Yar yeman
Yar yeman
Masîko per hêşîno yar yeman
Masîko per hêşîno dost yeman
Tu vê avê mereşîno yar yeman
Tu vê avê mereşîno dost yeman
Yar yeman yeman yeman yar yeman
Yar yeman yeman yeman dost yeman

# Masîko




Lo bi masîko hanana lo bi masîko canana
Masîko hanana lo bi masîko canana

Lo bi masîko hanana per beleko canana
Per û baska hanana tu li ba neko canana
Ava golê hanana şelî meko canana

Lo bi masîko…

Lo bi masîko hanana per hêşîno canana
Per û baskan hanana ne bi weşîno canana

Lo bi masîko…

# Mayey jiyanim




Jiyanî min hemuy xeme zerdexeney yekcar keme
Telarî min wêraneye bê awaz u honraweye

Were were şemal were mayey jiyanim (awatî giyanim)
Hêdî hêdî hêdî were destim (mayey jiyanim) were hoy şikistim

Le dûrewe nawit bîstûm neşareza xoşit wîstûm
Guwaye legel şîi'rekanma zor jiyawî zor jiyawî

Were were...

Soranî / Gelerî

# Me'bûbê yarê




Hey yarê, yarê Me' bûb ê yar ê
Hey yarê, yarê delalê mebûbê yar ê
Me kirasek hebû ji belk (pel) ê hinarê
Me kirasek hebû rebenê belkê hinarê


Heft hosta hatin ji xana Şingarê
Heft hosta hatin rebenê ji xana Şingarê
Min divê ne kurt be, min dive ne dirêj be
Min divê ne direj rebenê ber bejna yarê

Me kirasek hebû ji belka filfilê (îsot)
Me kirasek hebû rebenê belka filfilê
Heft hosta hatin ji xana Mûsîlê
Heft hosta hatin rebenê xana Mûsîlê

Min divê ne kurt be min divê ne dirêj be
Min divê ne direj be rebenê ber bejna yarê
Min kirasek hebû ji belkê hêjîrê
Min kirasek hebû rebenê belkê hêjirê

Heft hosta hatin ji xana Cizîrê
Heft hosta hatin rebenê xana Cizîrê
Min divê ne kurt be min divê ne dirêj be
Min divê ne dirêj be rebenê ber bejna yarê

# Melazgir




Milazgir xweş Milazgir narê hey narê
Milazgir xweş Milazgir ewdalê canê
Milazgir şan e şîn e narê hey narê
Milazgir şan e şîn e evdalê canê
Ser me de şan e şîn e narê hey narê
Hesp tewo ling bi xwîn e
Hesp hato delalê min siwar nîne
Ez nizanim delal li kû dimîne

# Mele ciwaneke




Mele ciwanekey serdarî kanî
Boçî denalênî heta beyanî
Hîç kes natwanê ta roj binalê
Meger aşiqî dêwaney xalê

Were herdûkman naleman yek xeyin
Belku bew îşqe nîştîman serxeyin

Naley min le şewiq ew ruxsareye
Ahim le dûrî ew dildareye
Ewe min yaran bo yar enalim
To le dewri çî hawar be malim

Were herdûkman...

To kê derûnî lê helqirçandî
Kam yare wa bem derday geyandî
Yaran min u to herdû haw derdîn
Herdûkman wek yek tûşî yek derdîn

Were herdûkman...

Soranî / Gelerî

# Mellî mellî




Mellî mellî mellî mellî mellî mellî mellî siwaro mellî
Mellî mellî mellî mellî mellî mellî mellî siwaro mellî

Mala mellî newalê mellî mellî mellî mellî mellî mellî
Mala sibkê newalê mellî mellî mellî mellî mellî siwaro mellî

Tajî berda xezalê mellî mellî mellî mellî mellî mellî mellî
Tajî berda xezalê mellî mellî mellî mellî siwaro mellî

Gopal darê wê êvarê mellî mellî mellî mellî mellî mellî
Gopal darê wê êvarê mellî mellî mellî mellî derdo mellî

Xwezya min memik xwarê mellî mellî mellî mellî mellî mellî mellî
Xwezya min memik xwarê mellî mellî mellî mellî derdo mellî

Girabêtê Xaço, radyoya Êrîvanê

# Memanî




Memanî memanî lo memanî memanî
Memanî memanî lo zava tu rih û can î
Memo şiva hişk e lo memanî memanî
Memeo şiva hişk e lo zava tu rih û can î
Ayetek nivişt e
Ayetek nivişt e
Mi pêça heya pişt e
Mi pêça heya pişt e

Memanî memanî
Memanî
Memo şiva ter e
Memo şiva ter e
Ayetek li ser e
Ayetek li ser e
Mi pêça heya ber e
Mi pêça heya ber e

Memanî
Memanî
Memo şiva zîv e
Memo şiva zîv e
Ayetek ji hîv e
Ayetek ji hîv e
Mi pêça heya nîv e
Mi pêça heya nîv e

# Memo




Hoy hoy hoy memo
Mem Ebasî Ebasî
Jahro dilo memo
Mem Ebasî, Ebasî

Hoy hoy hoy Memo
Kurtekî ser kirasî
Jahro dilo Memo
Kurtekî ser kirasî

Hoy hoy hoy Memo
Mem' em tê ji Diyarbekir
Jahro dilo Memo
Mem' em tê ji Diyarbekir

Hoy hoy hoy Memo
Wi anî barek şekir
Jahro dilo Memo
Wi ani barek şekir

Hoy hoy hoy Memo
Tîrê cerge du ker kir
Jahro dilo Memo
Tîrê cerge du ker kir

Hoy hoy hoy Memo
Hespê Memê min boz e
Jahro dilo Memo
Hespê Memê min boz e

Hoy hoy hoy Memo
Meydanê dike toz e
Jahro dilo Memo
Meydanê dike toz e

Hoy hoy hoy Memo
Sefer dayikê pîroz e
Jahro dilo Memo
Sefer dayikê pîroz e

# Memyan e




Memyan e, memyan e, Memo ez avê venaxwim
Memyan e, memyan e, şîrîn şerbetê naxwim

Ava ji çiyê tê, Memo ez avê venaxwim
Ava ji çiyê tê, şîrîn şerbetê naxwim
Ji nav gul û giyê tê, Memo ez avê venaxwim
Ji nav gul û giyê tê, şîrîn şerbetê naxwim
Bêhna yarê jê tê, Memo ez avê venaxwim
Bêhna yarê jê tê, şîrîn şerbetê naxwim

Memyan e, memyan e, Memo ez avê venaxwim
Memyan e, memyan e, şîrîn şerbetê naxwim

Dara li nav gilgila, Memo ez avê venaxwim
Şewtiya li nav gilgila, şîrîn şerbetê naxwim
Hêlîna bilbila, Memo ez avê venaxwim
Hêlîna bilbila, şîrîn şerbetê naxwim
Cihê çavbikila, Memo ez avê venaxwim
Warê çavbikila, şîrîn şerbetê naxwim

Memyan e, memyan e, Memo ez avê venaxwim
Memyan e, memyan e, şîrîn şerbetê naxwim

# Memyan e




Memyan e memyan e Memo memyan e memyan e
Memyan e memyan e Memo memyan e kimyan e

Memyana lawan e Memo memyan e memyan e
Meydana lawan e  Memo memyan e kimyan e

Singê zer zozan e Memo memyan e memyan e
Meydana lawan e  Memo memyan e kimyan e

De bila me biskek heviyano j'biskên van berana (2 caran)
Berdana helana Memo berdana helana (2 caran)

Çavê li xewa şîrîn Memo destê li ser mercana (2 caran)
De bila me biskek heviyan o biskê van bizinan (2 caran)

Berdane li kizinan Memo berdane kizinan  (2 caran)
Çavê li xewa şîrîn Memo destê li ser bazinan (2 caran)

De bila me biskek heviya biskê van nêriyan (2 caran)
Berdana kêriyan Memo berdane kêriyan (2 caran)

Çavê li xewa şîrîn Memo destê li ser moriyan  (2 caran)

# Menale bulbul




Menale bulbul, menale bulbul
Çun behar hat wei'dey gule
Cumle cîhan deyzanê
Bulbul a'şiq be gule
Çawit estêrey şewê
Kulmit dendukî kewê
Baskim bo bike be serîn
Be cût xewman lê bikewê
Desmal h'erîrî sade
Rûbendit bo min lade
Bo rûbend çakim, ciwanê
Be rûy xalanim da de
Reng zerd u lêw be barim
Bo balat bê qerarim
Çunkê natbînim lêw al
Dayme le giyan bêzarim
E'ntîke u mezedarî
Emcar le guley xesarî
Hemû ê'raq deyzanê
Eto le guley bêzarî

Soranî / Gelêrî

# Mend e mend e




Mend e mend e mend e hoy mendê min
Mend e mend e mend e lawikê min
Çîçika sibê xande hoy mendê min
Keçika (zeriya )kir govend e

Textê (kevirê )reşo vajî
Binda tole tajî
Mendo ji germa najî

Textê (kevrê) reş mezino
Binda terazino
Mendo anî jino

Çûme (hatim ) geliyê jorî
Tifinga te bi morî
Bikuj bele sorî

Herema Xerpûtê

# Mendê min




Mend e Mend e Mend e lo Mendê min (Lewendê min)
Çûçka sibê xwende lo Mendê min (Lewendê min)
Keçika kir govend e lo Mendê min (Lewendê min)
Mend e Mend e Mend e lo Mendê min (Lewendê min)

Çi dara li gêrêyo lo Mendê min (Lewendê min)
Hêlîna hirçêyo lo Mendê min (Lewendê min)
Ciyê mêrê çêyo lo Mendê min (Lewendê min)
Mend e Mend e Mend e lo Mendê min (Lewendê min)

Çi dara li gêdûkê lo Mendê min (Lewendê min)
Hêlîna pepûkê lo mendê min (Lewendê min)
Ciyê zava bûkê lo Mendê min (Lewendê min)
Mend e Mend e Mend e lo Mendê min (Lewendê min)

Herêma Serhedê

# Mendîl




Mendîlî hûr e lo bira mendîlî hûr e way
Bûka me derxin lo bira rêka me dûr e way

Mendîlî qehwe lo bira mendîlî qehwe way
Bûka me derxin lo bira xelk ji me diqehre way

Mendîlî reş e lo bira mendîlî reş e way
Bûka me derxin lo bira xelk ji me nexweş e

Mendîlî spî ye lo bira mendîlî spî ye way
Bûka me derxin lo bira xelk ji me hêvî ye way

Herêma Amedê

# Mendo




Mendo mendo mendo mendê min
Mendo mendo mendo lewendê min
Çûçka pê de xwendo mendê min
Çûçka pê de xwendo lewendê min

Dara li mexerê mendê min
Dara li mexerê lewendê min
Hêlîna oxerê mendê min
Hêlîna oxerê lewendê min

Dara li gedûgê mendê min
Dara li gedûgê lewendê min
Hêlîna pepûgê mendê min
Hêlîna pepûgê lewendê min

Dara li gilgila mendê min
Dara li gilgila lewendê min
Hêlîna bilbila mendê min
Hêlîna bilbila lewendê min

Herêma Amed, Serhed û Xerpûtê

# Merd im merd im




Merd im merd im gelek merd im
Him dengbêj im him sazbend im
Xem û xeyal ezê berdim
Ji vir hatê lê bê derd im

Têla sazê xwe bijdînim
Ez bi sazê xwe emin îm
Kêfa xelkê ezê bînim
Kêf û şahiyê em bibînin
Him dengbêj im him sazbend im
Xem û xeyal ezê berdim
Ji vir hatê lê bê derd im

Têla sazê min zirav e
Dengekî xweş wê jê rabe
Wê li dinyayê bela be
Dinya alem wê pê şa be
Him dengbêj im him sazbend im...

Lo sazbendo tu ji kur hatî
Bi xêr û bi silamet hatî
Bi vî sazî bi vî miqamî
Kêf û şahiya vî welatî
Him dengbêj im him sazbend im

Aramê Tigran, radyoya Êrivanê

# Mêrdîn e





Mêrdîn e lê Mêrdîn e loy loy de loy loy loy
Ew kî çûye Mêrdîn e
Zava çûye Mêrdîn e
Kurik çûye Mêrdîn e
Ew qora zêra tîne
Li ber xesyê datîne
Xesî xeydan hilnayne
Keçik tê û heltîne

Mêrdîn e
Ewkî
Kurik
Zava
Ew topa çûxa tîne
Li ber xesyê datîne
Xesî xeydan helnayne
Keçik tê û hiltîne

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Merheba

**Moderato**




Yar merheba, yar merheba, ehlen we sehlen merheba
Li min kurk û li te eba, ehlen we sehlen merhaba


Yar merheba şimik reşê, ehlen we sehlen merhaba
Şimkê derxe were hewşê, ehlen we sehlen merheba
Were rûne li ser merşê, ehlen we sehlen merhaba

Yar merheba, yar merheba, ehlen we sehlen merheba
Li min kurk û li te eba, ehlen we sehlen merhaba

Yar merheba şimik sorê, ehlen we sehlen merhaba
Şimkê derxe were jorê, ehlen we sehlen merheba
Were rûne li ser mexfûrê, ehlen we sehlen merhaba

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Meryemê




Meryemê Meryemê lê
Kê digo her te digo Meryem law e
Meryemê Meryemê lê
Mi digo her te digo çavreş law e
Ew olê ser xwe me lê
Kê digo her te digo Meryem law e
Eşqa bejna te me lê
Mi digo her te digo çavreş law e

Ez Meryema gêj im lê
Kê digo her te digo Meryem law e
Ez Meryema gêj im lê
Mi digo her te digo çavreş law e
Şeva roja bibêjim lê
Kê digo her te digo Meryem law e
Eşqa bejna dirêj im lê
Mi digo her te digo çavreş law e

Ez Meryema dîn im lê
Kê digo her te digo Meryem law e
Ez Meryema dîn im lê
Mi digo her te digo çavreş law e
Şeva roja dixwînim lê
Kê digo her te digo Meryem law e
Eşqa bejna dirêj im lê
Mi digo her te digo çavreş law e

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan


# Meryemê




Agirogê ser nizaran
lê lê lê lê lê Meryemê
Agirogê ser nizaran
Zerî bi zêbaran bê xemê
(Li) min têt dengê cotyaran
Meryem hûriya necaran
Agirogê serê deştê
Dengê cotyar li min xweş tê
Meryem hûriya bihûştê
Agirogê nêva rê wo
Dengê cotyar li min tê wo
Meryem hûriya dinê wo
Agirogê berê bin de
Dengê cotyar bilind e
Meryem hûriya gûnd e

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Merziye




Merziye ey nazenîn ey çaw xumarim
Sewze giyan le dûrî tu yese bîmarim

Wek weney dewrî şeheq hawarkem yahu
Şûkranem we yezdan u we şay dilda hu

Merziye meylî we min hatu oxey bay
Ser u mal u zîndegîm buden we fîday

Soranî / Gelêri

# Mest im




Giyane ya ciwabê be xêr ya dilniyamke
Bes, deste u damên şêx u melam ke
Mestim, mestim, mestim, mestim bo mestî çawî
Kûştûmî zerdey lêwî, kûştûmî zûlfî xawî

Piştên şil u mil heste beyane
Mero heta pêk degeyin (pê debirîn) axir zemane
Mero heste le xewê, bizane çim dewê
Le zûlfî terit dû maçim dewê
Mestim, mestim, mestim, mestim bo mestî çawî
Kûştimî qedî barîkî, aman egrîcey xawî

Yalla ya sultan hawar mal be berzewe
Emcar babekey bimrê be dem lerzewe
Mestim, mestim, mestim, mestim bo mestî çawî
Aman şîrîn zibanî, kûştimî egrîcey xawî

Soranî / Gelêri

# Mestûre




Ew sal he'wt sale xemim refîqe
Mestûre aman mestûre giyan
Şadî bê meyle dê be deqîqe
Mestûre...
Mestûrey mestan sêwî ser destan
Mestûre...
Paşî balay to nagirim hîç dostan
Mestûre...
Xerîb le şaran xerîbî yarin
Mestûre...
Cêgay xerîban goşe u kenarin
Mestûre...
Mestûrey mestan...
Mestûre...
Paşî...
Mestûre...
Be seyidî sadat be musay kazim
Mestûre...
To xot deyzanî min be to bazim
Mestûre...
Mestûrey mestan...
Mestûre...
Paşî...
Mestûre...

# Mêvan




Mêvan mêvan mêvan can
Mêvan mêvan mêvan can
Keremke şêniya bavê min

Çi mêvanekî bi ezîz e
Mêvan mêvan mêvan can
Çi mêvanekî bi ezîz e
Keremke şêniya bavê min
Saza dest da ji dara guz e
Mêvan mêvan mêvan can
Saza dest da ji dara guz e
Kerem ke şêniya bavê min
Mêvan lê dixe yar dilîze
Mêvan mêvan mêvan can
Mêvan lê dixe yar dilîze
Kerem ke şêniya bavê min

Mêvan şivanê van karika
Mêvan mêvan mêvan can
Mêvan şivanê van karika
Keremke şêniya bavê min
Karik berdan dor darika
Mêvan mêvan mêvan can
Karik berdan dor darika
Keremke şêniya bavê min
Derdê dilê van keçika
Mêvan mêvan mêvan can
Derdê dilê van keçika
Keremke şêniya bavê min

Zadîna Şekir û Hemîdê Mecîd, radyoya Êrîvanê

# Mêvan




Mêvan mêvan mêvan mêvan mêvan mêvan can
Mêvan mêvan mêvan keç gorî lo can xulam
Mêvan li rê dimeşîne mêvan mêvan mêvan can
Mêvan li rê dimeşîne keç gorî lê can xulam
Saz û tembûr hewa tîne
Saz û tembûr hewa tîne

Ez mêvanê wê şevêwo
Ez mêvanê wê şevêwo
Şev û biro tev li rêwo
Şev û biro tev li rêwo
Wez aşiqê wê bejnêwo
Wez aşiqê wê bejnêwo
Mêvan
Mêvan

Radyoya Êrîvanê

# Mewlîd sale ye






Mevlîd sale ye temam mêran e
Emrê te zirav eşq e û şan e
Lênîn nizane çendî rewan e

Naha emrê xwe em nakin gazî
Edleya dinê hemû nexwaze
Cawa qîz û xort dîsa jî naz e

Em ji partiya xwe gelek razîne
Qirarê partiyê me ra mizgîn e
Xêr û xweşiyê tim me ra tîne

Mevlîd sale ye temam mêran e
Emrê te zirav eşq e û şan e
Lênîn nizane çendî rewan e

# Meyranê




Li tirî ha li tirî Meyranê
Li tirî ha li tirî Zozanê
Kurik keçkê fitilî Meyranê
Kurik keçkê fitilî Zozanê
Dewa erza wê kirî Meyranê
Dewa erza wê kirî Zozanê
Keçik rûnişt û girî Meyranê
Keçik rûnişt û girî Zozanê

Li tirî ha li tirî Meyranê
Li tirî ha li tirî Zozanê
Çi mêywej mêywa tirî Meyranê
Çi mêywej mêywa tirî Zozanê
Marekî bin da mirî Meyranê
Marekî bin da mirî Zozanê
Tirsim leylam bigirî Meyranê
Tirsim leylam bigirî Zozanê

Li tirî ha li tirî Meyranê
Li tirî ha li tirî Zozanê
Çi mêywek mêywa kerkuş Meyranê
Çi mêywek mêywa kerkuş Zozanê
Marekî binda mequş Meyranê
Marekî binda mequş Zozanê
Tirsim leyla mi bi derguş Meyranê
Marekî binda mequş Zozanê
Li tirî ha li tirî Meyranê
Li tirî ha li tirî Zozanê

# Meyremê




Keh Meyremê Meyremê
Tolikvanê Meryemê
Qiza şahê Ecemê
Tolikvanê Meyremê

Diyarbekir bi cî ye hala hala Meyremê
Sê sûwar hatin hediyê qîza şahê Ecemmê
Derdê min keçka miftî ye hala hala Meyremê
Kulam keçka miftî ye qîza şahê Ecemmê

Diyarbekir bi dar e hala hala  Meyremê
Sûwar hatin bi xar e qîza şahê Ecemê
Derdê min keçke Bextiyar e hala hala Meyremê
Kulam keçka Bextiyar e qîza şahê Ecemê

Diyarbekir bi cey e hala hala Meyremê
Suwara hey û hey e qîza şahê Eceme
Derdê min keçka fille ye hala hala Meyremê
Kûla min keçka fille ye qîza şahê Ecemmê

Meryem Xan, radyoya Bexdaye

# Meyrikê




Meyrikê tu Meyr î Meyrikê Meyremê
Meyrikê tu Meyr î nîşana min li cemê
Newal bi bî ye Meyrikê Meyremê
Newal bi bî ye nîşana min li cemê
Gur tê bi hêdî ye
Gur tê bi hêdî ye
Çavê wî li mî ye
Çavê wî li mî ye nîşana min li cemê

Meyrikê
Meyrikê
Newal bi merx e
Newal bi merx e
Gur tê bi çerx e
Gur tê bi çerx e
Çavê wî li berx e
Çavê wî li berx e nîşana min li cemê

Meyrikê
Meyrikê
Newal bi gez e
Newal bi gez e
Gur tê bi lez e
Gur tê bi lez e
Çavê wî li pez e
Çavê wî li pez e nîşana min li cemê

Meyrikê
Meyrikê
Newal bi dar e
Newal bi dar e
Gur tê bi xar e
Gur tê bi xar e
Çavê wî li kar e
Çavê wî li kar e
Meyrikê
Meyrikê tu meyrê nîşana min li cemê

Şeroyê Biro, radyoya Êrîvanê

# Mi lawîne




Mi lawîn e mi lawîn e heyrano mi lawîn e
Mi lawîn e mi lawîn e qurbano mi lawîn e
Ew kî xanî digerîne heyrano mi lawîn e
Ew kî xanî digerîne qurbano mi lawîn e
Keko xanî digerîne heyrano mi lawîn e
Zava xanî digerîne qurbano mi lawîn e
Werîs tilyê difirîne heyrano mi lawîn e
Werîs tilya wî difirîne qurbano mi lawîn e
Ew kî korê derman bîne heyrano mi lawîn e
Bûkê korê derman bîne qurbano mi lawîn e
Dermanê wî şeba şîn e heyrano mi lawîn e
Dermanê wî şeba şîn e qurbano mi lawîn e
Mi lawîn e mi lawîn e heyrano mi lawîn e
Mi lawîn e mi lawîn e qurbano mi lawîn e

Herêma Amedê

# Mîn gurcî




Ay le mîm gurcî hay le mîm gurcî
Ay le bala berz suxmey narincî

Qesr u xaneqîn ser hudî êran
Giştî wequrwan çawekey ceyran

Ay le mîm...

Qesir u qorot u heta bin kure
Giştî wequrwan ew suxme sure

Ay le mîm...

Sorani / Gelêrî

# Min delêm




Min delêm: şarî dilim bax u gulistane deçim
E'qil delê: (na, qesebe şorişî mestane, neçî)
Min delêm: nuxteyî ew rewzenî îmane deçim
Ew delê: (na reşe, cê raw geyî şeytane, neçî)
Min delêm: mesken u aramgeyî canane deçim
Ew delê: (ser be serî têkçuwe, wêrane, neçî)
Min delêm: cegeyî her şêt u cinunane deçim
Ew delê: (na, zedeyî pencey periyane neçî)
Min delêm: merkezî eswarî h'erîfane deçim
Ew delê: (cê temeî' çawî h'esudane neçî)
Min delêm: wextî xeter meimen u qelxane deçim
Ew delê: (kun kune, cêgey serî peykane neçî)
Le hemû çûn u neçûne serî sûrma (kamîl)
Min delêm: ciwane biçim, ew delê wa ciwane neçî

# Min got xazalê




De min got xezalê lê lê neçe qirşika way
De min got rebenê lê lê neçe qirşika way

Wê li te derên lê xezalê siyarê redika way
Wê li te derên lê delalê siyarê redika way

Wê ji te bistînin xezalê cotê memika way
Wê ji te bistînin delalê cotê memika way

Ne min got xezalê lê lê neçe dera way way
Ne min got delalê lê lê neçe dera way way

Herêmên Botan û Behdînan, çavkanî : M. Arif Cizîrî

# Min got Zeynê Zeynemê




Genîngî dar e min got Zeynê Zeynemê
Çol bengî da re nîşana min li cemê

Elo berxvane min got Zeynê Zeynemê
Delal keçikane nîşana min li cemê

Genîngî kûr e min got Zeynê Zeynemê
Çol bengî kûr e nîşana min li cemê

Mesîngî hûr e min got Zeynê Zeynemê
Mesîngî hûr e nîşana min li cemê

Gewra min dûr e min got Zeynê Zeynemê
Gewra min dûr e nîşana min li cemê

Genîngî dar ın min got Zeynê Zeynemê
Çol bengî dar ın nîşana min li cemê

Gul hemî sor in min got Zeynê Zeynemê
Gul hemî sor in nîşana min li cemê

# Min ji Heleb




Min ji Heleb Heleb Heleb
Min ji Heleb çû Diyarbekir

Me derî deriyan vekir
Me derî sûkan vekir

Bazara qundra te kir
Min ji bîr kir boyax nekir

Bazara poşiya te kir
Min ji bîr kir gûl gûl nekir

Bazara zêrê te kir
Min ji bîr kir pir pir nekir


Bazara bazinê te kir
Min ji bîr kir qeynax nekir

Bazara şala te kir
Min ji bîr kir gûlîv nekir

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Min te dît

Andante




Min te dibû li nav genek li nav geneka
Keçê tû meke van heneka
Ez radimîsim çav beleka
Vay lê lê vay lê lê zalim lê lê

Min te dûbû nav zebeş li nav zebeşa
Bejn û bala te ya xweşa
Ez radimisim van çavreşa
Vay lê lê vay lê lê zalim lê lê

Min te dibû li nav tutuna li nav tutuna
Çavên te weka zeytûna
Ez radimîsim çav xatûna
Vay lê lê vay lê lê zalim lê lê

Radyoya Êrîvanê

# Min Zaxokê dikan vekir




Min Zaxokê dikan vekir
Hey lê dayê hey lê da
(Disgotin 1)
Min Zaxokê dikan vekir
Berxê rû sorgula min
(Dîsgotin 2)
Min bazara qundra te kir
(Dîs 1+2)
Du sed zêran kêmtir nekir
(Dîs1+2)
Çûme mêrgê mêrgek şilo
(Dîs1+2)
Min giya dirû te kir milo
(Dîs1+2)
Şîva hespê lawkê xwe biro
(Dîs1+2)
Çûme mêrgê mêrgek besto
(Dîs1+2)
Min giya diru te kir desto
(Dîs1+2)
Şîva lawikê xwe xwesto
(Dîs1+2)

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Minara Sêrtê




Lo lo pismam o lo
Minara Sêrtê

Şêxê min siwara lo
Pêşiya êlê te

Minara Sêrtê lo
Berekî reş e

Eskerek boş e lo
Berde dimeşe

Hekîmo bênin lo
Derman zebeş e

Minara Sêrtê lo
Berekî sor e

Eskerek boş e  lo
Berde dibore

Minara Sêrtê lo
Qûmberek ser e

Hekimok bênin lo
Derman gindor e

Herêmên Şirnax û Çulemerge, çavkanî : Seydayê Goyan

# Mîne xanim mîne




Mîne xanim mîne, mîne xanim mîne derdit le giyanim mîne
Em şanim na ew şanim bimşêle kurde xanim
Demşêlêt u namşêlêt demkey te xew cêmdêlî

Mîne xanim mîne...

E'ntîke u zêde ciwanî wêney befirî kwêstanî
Şêt u dêwanet kirdum naskê aramî dilanî
Bala berz u çawkalî kîjoley kurdistanî

Mîne xanim mîne...

Nazdarey nazenînim mîne giyanî şîrînim
Kûşte u şêtî nîgay tom pêbikene ba bitbînim
Hîçî dîkem xoşnawê her toy sermayey jînim

Mîne xanim mîne...

Soranî / Gelerî

# Mîne




Zanîwte mîwan mîna giyan boçî şîrîne
Şekire lêw nûstun mîna giyan lew jêr zEmîne

Nêrgizî çaw kal mîna giyan demew beharan
Kawên le lay mîna giyan deşt u kêwsaran

Hewayekî xoş mîna giyan melbendî nebû
Hemu kes be tay mîna giyan kirasê nûstun

Ew serçawaney mîna giyan leser herdanin
Firmêrskî çawî mîna giyan ciwane merganin

Çawî ciwananim mîna giyan kewtûne bin gil
Nîşanman eda mîna giyan gerdûn leser çil

# Mîrkê Wanê




Tu bi kerem î tu bi kerem î
Mîrkê wanê tu bi kerem î
Tu bi kerem î tu bi kerem î
Mîrkê wanê tu bi kerem î

Tu xwedan hubr û qelem î
Mîrkê wanê tu bi kerem î
Xwî vedana rexê çem î
Mîrkê wanê tu bi kerem î
Sînorê Romê Ecem î
Mîrkê wanê tu bi kerem î

Tu bi dewlet î tu bi dewlet î
Mîrkê wanê tu bi dewlet î
Tu bi xwedan hubr û kaxet i
Mîrkê wanê tu bi dewlet î

Xwe vedana rexê şet î
Mîrkê wanê tu bi dewlet î
Sînorê romê milet î
Mîrkê wanê tu bi dewlet î

Tu bi adil î tu bi adil î
Mîrkê wanê tu bi adil î
Tu dermanê dilêd kul î
Mîrkê wanê tu bi adil î

Tu melhema birinê kulî
Mîrkê wanê tu bi adilî
Day çu serî bav çû milî
Mîrkê wanê tu bi adilî

Tu bi kerem î tu bi kerem î
Mîrkê wanê tu bi kerem î
Tu bi kerem î tu bi kerem î
Mîrkê wanê tu bi kerem î

Herêmên Amed û Serhede

# Miryem Bokanî




Ta key min şêt u maxolya u lal bim
Ta key le tawî balat e'bdal bim
Ew Miryemey min deyzanim, berdî bo bikêşim be şanim
Hêşta minete be giyanim
Miryem aman Miryem çaw ciwan, Miryem Bokanî, Miryemê
Ew Miryemey balay berze, memkî şemamey ser terze
Cûtêk lîmoy bo min ferze
Ew Miryemey çawî ciwane, qed bilinde u xan u mane
Gule le nêw gulistane
Ew Miryemey reş esmere, çawî baz ebroy seqere
Cût memkî wêney gewhere
Ew Miryemey kezî dirêjê, le hewraz u serewlêjê
Kûştûmî bo xoy demnêjê

# Mîrze me




Mîrze me mîrze me mîrza mîrê me
Mîrze me mîrze me axa qewmê xwe
Sing singê hesin î mîrza mîrê me
Sing singê hesin î axa qewmê xwe
Li erdê mekinî
Li erdê mekinî
Eşîr pê sekinî
Eşîr pê sekinî

Mîrze me mîrze me mîrza mîrê me
Mîrze me mîrze me axa qewmê xwe
Sing singê darîn e
Sing singê darîn e
Li erdê danîne
Li erdê danîne
Eşîr pê hanîne mîrza mîrê me
Eşîr pê hanîne axa qewmê xwe

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Mû Napisênim




Emin demgut le dinya ta bimênim
Leber kes esteme ser danewênim
Keçî êsta le dawî biskî to da
Giriftarim gulim mû napisênim
Ciwanê giyan bo wat lê kirdim
Be qisey xelkît le gel kirdim
Ya xwa bedkar bê be pirdim
Çi qisey çakit bo nekirdim

Jiyanim pir le rence u namiradî
Be helkewtîş ne hatim tûşî şadî
Dilim hênde tenge her cêy to debê u bes
Etoş meh'kumî h'episî înfiradî
Ciwanê...
Be...
Ya xwa...
Çi..

Qerar bû bêy legel xot şadî bênî
Nehatî gerçî pêt da bûm belênî
Le naw kurda nebû peyman şikandin
Le kwê fêr buy gulim peyman şikênî
Ciwanê...
Be...
Ya xwa...
Çi...

Eger çî royî qet naçî le yadim
Dekem yadit, be yadî towe şadim
Ke barget bo hewar têk na e'zîzim
Şika estûndekî tawilî miradim
Ciwanê...
Be...
Ya xwa..
Çi...

Soranî / Gelêrî

# Mûmedar




Soranî / Gelêrî

Mûminê yar mûminê mûmedarê
Mûminê yar mûminê hukimdarê
Mûminê ava sar e
Mûminê ava sar e
Sibe bû min hevîr kir
Sibe bû min hevîr kir
Ava hevîr ji bîr kir
Ava hevîr ji bîr kir


Mûminê
Mûminê
Cota ceran destan da
Cota ceran şiqitî
Cota ceran şiqitî
Bejna bûkê lewitî
Bejna bûkê lewitî
Dilê zava şewitî
Dilê zava şewitî
Hêstrê ji çav avêtî
Hêstrê ji çav avêtî

Mûminê
Mûminê
Bûkê ava hinarê
Ji gelî da kir xwarê
Heyrana bejn û balê

Zava ava biyoke
Ji gelî da hoke hoke
Heyrana bejn û balê

# Mûmine

**Moderato**




Her mûm e mûm e mûm e mûmedarê
Her mûm e mûm e mûm e hukimdarê
Mûmê me çûne deştê mûmedarê
Mûmê me çûne deştê hukimdarê
Danîn li sîka teştê
Danîn li sîka teştê

Her
Her
Mûmê me çûne çiya
Mûmê me çûne çiya
Danîn li sîka biya
Danîn li sîka biya

Her
Her
Mûmê me çûne zozan
Mûmê me çûne zozan
Danîn li sîka guzan
Danîn li sîka guzan
Her
Her

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Mutrîbî h'erîfan





Ey mutrîbî h'erîfan des(t) ke be nexime xwanî
Awazî toye bo dil wa defe'ka xemanî

Be min şîfaye sa dey, bom lêde berbit u ney
Ew derdî dil heta key, çî mawe u'mrî fanî

Bom lêde çeng û u'de, remize le ya wecude
Ba kwêr bê ew h'esude, em sire ba nezanê

Saqî le dil h'ezer ke, çare le derdeser ke
Cerêkî yek nezer ke, bo safî hîranî

# Mûzîrka






Herê lawo kuro lawo
Mûzîrka xweş mûzîrka dilê min
Herê lawo kuro lawo
Sor û zer kir ji kulîlka dilê min

Herê lawo kuro lawo
Meskenê zava buka dilê min
Herê lawo kuro lawo
Dilkê min ji qurmê dar dilê min

Herê lawo kuro lawo
Hersêd heyvê biharê
Dilê min
Herê lawo kuro lawo

Xew xaşin ji paxlêd yarê dilê min
Herê lawo kuro lawo
Dilkê min ji qurmê guzê dilê min
Herê lawo kuro lawo

Hersêd heyvê payîzê dilê min
Herê lawo kuro lawo
Xew xaşin paxlêd qîzê dilê min
Herê lawo kuro lawo

Dilê min û dilê te dilê min
Herê lawo kuro lawo
Şertî dilê min û te dilê min
Herê lawo kuro lawo

Min ya xwe got ma ya te dilê min
Herê lawo kuro lawo
Mûzîrka xweş mûzîrka dilê min


# Nabe




Nabe nabe nabe keçikê wele nabe
Nabe nabe nabe dildarê bîle nabe
Şahê ecem rabe
Zewaca bê dil nabe
Ewkî bajarvanî
Keko bajarvanî
Ji bîr kir hene nanî
Ji bîr kir hene nanî
Topa qumaş hanî
Topê qumaş hanî
Li ber xwestyê danî
Li ber xwestyê danî
Xesyê hat hilanî
Xesyê hat helanî
Nabe nabe
Nabe nmabe
Şayê
Zewaca bê dil nabe
Ewkî çû bêriyê
Bûkê çû bêriyê
Ewkî çû pêşiyê
Zava çû pêşiyê
Dest avêt keziyê
Dest avêt keziyê
Da xatrê xesiyê
Da xatrê xesiyê
Nabe nabe nabe keçikê wele nabe
Nabe nabe nabe dildarê bîle nabe

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Naçme leqatê




Naçme leqatê ho yeman ho yeman
Ketme înatê ho yemana xwedê
Leqat bi genim e ho yeman ho yeman
Wêran bi genim e ho yemana xwedê
Li me derketin ho yeman ho yeman
Sê siwar bi rim e ho yemana xwedê
Ji me dixwazin ho yeman ho yeman
Keça hakim e ho yemana xwedê

Naçme leqatê
Ketme înatê
Leqat bi bî ye
Wêran bî bi ye
Li me derketin
Sê siwar hêdî ye
Ji me dixwazin
Keça miftî ye

Naçme leqatê
Ketme înatê
Leqat bi gez e
Wêran bi gez e
Li me derketin
Sê siwar bi lez e
Ji me dixwazin ho yeman ho yeman
Keça çerkez e ho yemana xwedê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Nade




Nade nade nade bav Delalê nade
Nade nade nade bav Hezarê nade
Li çawişyê nade, bav Delalê nade
Li çawişyê nade bav Hezarê nade

Nade nade nade bav Delalê nade
Nade nade nade bav Hezarê nade
Li melefyata nade bav Delalê nade
Li melefyata nade bav Hezarê nade
Xortê Şêxelîlka dayim di kêflîne
Davên ser mezriya bûkek jê hanîne

Nade nade nade bav Delalê nade
Nade nade nade bav Hezarê nade
Li Bismilê nade bav Delalê nade
Li Bismilê nade bav Hezarê nade
Xortê çawişiya dayim kêflîne
Davên ser Bismilê bûkek jê hanîne

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Nalbendano




Nalbendano hey nalbendano
Werinê hê nalbendano
Nalbendano hey nalan jêke
Serî bizmaran jêke

Keçkokê ji malan rêke
Nalbendano nal hişîno
Serî nalên te kûno
Ne dixwazino hêy ne direvino

Werinê hêy nalbendano
Nalbendo hêy nalên te sor
Teraşke hêy nal bide dor
Keçkokê hêy de were jor

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Namdiwênî







Esmer boçî torawî?
Pêm bilê boçî rencawî?
Wek gulale sûrey behar
Le deşt u kêw xemlawî
Namdiwênî bo çîm nadiwênî?
Bo lêm zîz bûy namdiwênî?
Eger bê u bimdiwênî, nemrencênî,
nemşemzênî
Ser dedem le mizgênî, eman ro'h de-
dem le mizgênî

Esmer beynella ciwanî
Sertopî Kurdistanî
Le ber dilî dostanî
Bîlla deley xermanî
Ewca aramî dilanî
Namdiwênî bo çîm nadiwênî?
Bo lêm zîz bûy namdiwênî?
Eger bê u bimdiwênî, nemrencênî,
nemşemzênî
Ser dedem le mizgênî, ro'h dedem le
mizgênî

Esmer le kwê mêwanî
Jinî guley mêrdanî
Be milwênê herzanî
Îcarem kird le xanî
Mamizî deştî Bokanî
Namdiwênî bo çîm nadiwênî?
Bo lêm zîz bûy namdiwênî?
Eger bê u bimdiwênî, nemrencênî,
nemşemzênî
Ser dedem le mizgênî, roh' dedem le
mizgênî

Şil u mil u gird u mird
Destim le bo memkî bird
Kulmey sêwî la sûre
Têydaye xalî wird wird

# Nar Hoy Nar




Narê hey narêb le hey narey lo jarê
Navê dosta min Fatê lo jarê
Kemer piştê wera te lo jarê
Hakim rabij welate lo Narê

Hey Nar hey Nar hey Narib lo jarê

Navê dost a mi Gulok e lo jarê
Navê ddost a mi Gulok e jarê
Kemera bi deryoke lê jarê
Kemera bi deryoke lo Narê
Hatim raa bêj dijokê lo Narê
Hey naar hey nar hey naaar bi lo jarê

Sing'l zerya te ware lo jarê
Her girana bi tare lo jarê
Lo fitar e êvar e lo narê
Hey nar hey nar hey narib lo jarê

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Nar narê




Hoy nar hoy nar hoy narê narê
Awa hat û awa çû narê
Ber bi mala keya çû narê
Siwar hat û peya çû narê

Hoy nar
Serê'm li serderê ket
Kumê 'm li navderê ket
Hiş û aqlê'm pê ra ket
Hoy nar hoy nar hoy narê narê

Herêmên Amed, Botan û Behdînan

# Narê




Narê narê hoy narê narê
Rû sorê wek hinarê şirînê
Min çavê belek xarê narê
Sibê nîvro êvarê şirînê

Narê diçû ber avê narê
Por berda heya navê şirînê
Mêr û jinan dişînin narê
Qelen didne dê û bavê şirînê
Serdor
Kaniya li binya malan narê
Xoxa li gulyê daran şirînê
Me heta karê xwe kir narê
Roj li me bû êvaran şirînê

# Narîn




Narîn Narîn Narînê Narînê narînciyê
Narîn Narîn Narînê koçerê akinciyê
Avêt sitêrka xurbetê Narînê narînciyê
Avêt sitêrka xurbetê koçerê akinciyê
Şewqê dabûn miletê
Şewqê dabûn miletê
Herçî destê me bihev xe
Herçî destê me bihev xe
Ew dergevanê cinetê
Ew dergevanê cinetê

Narîn
Narîn
Avêt sitêrka sibê ye
Avêt sitêrka sibê ye
Şewqê dabû dinê ye
Şewqê dabû dinê ye
Herçî destê me bihev xe
Herçî destê me bihev xe
Ew dergevanê xêrê ye
Ew dergevanê xêrê ye

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Narîn




Hey Narîn hey Narîn hey Narîn hey Narîn
Narînê hey Narîn delalê

Narînka çiyayê hey Narîn hey Narîn
Delalê ciyayê delalê
Nav gûl û giyayê hey Narîn hey Narîn
Nav gûl û giyayê delalê

Narînkêb xemlinin hey Narîn hey Narîn
Delalêb xemlinin delalê
Gûlalêb resinin hey Narîn hey Narîn
Gûlalêb resinin delelê

Qesra babo bilinde hey Narîn hey Narîn
Qesra babo bilinde delalê
Buk û zava li binde hey Narîn hey Narîn
Buk û zava li nave delelê

# Narînê




Narînê em hatin te Narînê hoy Narê
Narînê em hatin te sorgul jêd barê
Em hatin Narê nas kin
Zêran'l bejnê qiyas kin
Te'j malbavê xelas kin
Em hatin te bibînîn
Zêran'l bejnê bibînin
Te,ji malbavê bistînin
De rakin çend bilinde
Bejin şemala finde
De rakin rawestînin
Xelyokê ser hilînin
De deyk û bav bibînin
Narînê hûre qutê
Eşîrê malbav xurtê
Te"j komên giran girtê
Bavê Narîn zengîne
Xwey kihêl û mehîne
Rengê bûka me nîne

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Narînê




Narînê hoy Narînê Narîn hoy Narîn
Narînê hoy Narînê sorgûl jê dibarî

Narîna birayê xweyê Narin hoy Narîn
...sorgûl jê dibarî
Delalya mala xweyê Narin hoy Narîn
...sorgûl jê dibarî

Narînê hoy...

Ez hatim te bibînim Narin hoy Narîn
...sorgûl jê dibarî
Dê û bavê te bikînin Narin hoy Narîn
...sorgûl jê dibarî
Tirsim qelen bistînin Narin hoy Narîn
...sorgûl e jê dibarî


Narîne hoy...

Ez hatim te bixwazim Narin hoy Narîn
...sorgûl jê dibarî
Dê û bavê te binaz in Narin hoy Narîn
...sorgûl jê dibarî
Tirsim qelen bixwazin Narin hoy Narîn
...sorgûl jê dibarî

Narînê hoy...

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Nask û ciwanî




Yalla ya xalib hawar, derwanête burhanê
Seyidî kakecan hawar, lew meziray seholanê
Meni'im meken wellahî, a'şiqim min be çaw ciwanê
Kîjoley kurd qedbarîk, gule le naw şaxanê
Pêm gut awêzanî bim, belku qedirim bizanê
Bot mirdim nask u ciwanî, kîjoley Kurdistanî
Askî kêwî Elmelû, şemamey çiwar bêstanî
Awirit le min berdawe, wêney befirî kwêstanî
De were awêzanit bim, wêney befirî kwêstanî
Hatûm le lay Miyanduawê, kulmit gulî Sêlawê
Sêber le min h'eram bê, ba bisûtêm le ber tawê
De were awêzanit bim, dinyam be bê to nawê
Bot mirdim nask u ciwanî, to gulî le new gulanî
De were awêzanit bim, her to qedrim dezanî
Hatûm le lay Meraxe, kulmet kulmî çiwar baxe
Yarî xom gulî guldane, be keyif u be demaxe
Le bo xatirî lêw alê, awedan bê Sablaxe
Bot mirdim nasik u ciwanî, kîjoley Kurdistanî
Min le ber ew goze demirim, gule deybat bo kanî
De were awîzanit bim, xoşewîstî mêwanî
Bala berz u çaw kalî, wella le ber dilanî
Bot mirdim nasike ciwanî, meylî caranit kwanê
Girtim dû maçim lê send, lew rastey xiyabanê
Pêm gut awêzanit bim, pîr bûy ew mekire danê
Le gel yar qewilman yeke, ber derkê u nêw dalanê
Pêm gut awêzanit bim, le çolê u le bêstanê

# Nastînim





Wele nastînim lê bîle nastînim
Wele nastînim lê mîrê Xunûsê
Sî û sê siwar ketine nifûsê
Evla zava ye lê xwedyê namûsê

Wele nastînim lê bîle nastînm
Wele nastînim lê mîrê Gergerê
Sed û sî siwar lê ketne defterê
Evla zava ye lê xwedyê xencerê

Herêma Amedê

# Nawêrim bilêm




Erê serit helêne wey wey nazenîn rû le gerdun ke
Erê temaşay bilêsey dey dey dîdekem pîre derûn ke
Nawêrim bîlêm nawekey hey hey le mestî çawekey
Kîje ciwan ha lew gereke, qed barîk u çaw beleke


Erê detirsim bimrim wey wey nazenîn be ciwane mergî
Erê bîbeme bin xak wey wey dîdekem naley diltengî
Nawêrim...
Kîje...

Erê rengim zei'feran dey dey nazenîn bextim qetrqne
Giyane selamî nardibû dey dey dîdekem cêjnî qurbane
Nawêrim...
Kîje...

Erê salehay sale wey wey nazenîn min rencberî tom
Erê be nan u aw u dey dey dîdekem cil u bergî xom
Nawêrim...
Kîje...

Soranî / Gelêrî

# Naye naye




Birîndarim denalim pir be dîdey xeyalim
Boçî napirsî h'alim pereşan u e'bdalim

Hey naye naye naye
Çarey min u to naye
Erê bo naye

Behare xem rewêne dinyay şîrîn şîrîne
Kej u kêwan bibîne birwane çend rengîne

Hey naye...

Soranî / Gelêrî

# Naylone




Ka derwêşî kwêstanê werine ser xiyabanê
Be meşmulyan nûsîwim le defterî taranê
Ey wey naylone babim naylone
Naylone ay naylone, naylonekey h'erîre
Cergim hemûy let lete birîndarî zincîre
Ka derwêşî kwêstanê bo min biçine tikaye
Hawar u dad min çî bikem le des babî leylaye
Ka derwêşî kwêstanê besyetî pelip u behane
Cergim hemûy let lete birîndarî debane

# Naynir nîna




Haynir nîna naynir nîna haynir nîna nay nîna
Haynir nîna naynir nîna haynir nîna nay nîna
Haylê w lilê lê w lilê haynir nîna nay nîna

Mi te li govendê dîbû
Mi te li dîlanê dîbû
Taqî li bejnê birîbû
Mi te ji bavê kirîbî
Pa haynir nîna naynir nîna haynir nîna nay nîna

Haynir nîna naynir nîna haynir nîna nay nîna
Haynir nîna naynir nîna haynir nîna nay nîna
Haylê w lilê lê w lilê haynir nîna nay nîna

Serya mala me bi dirî
Binya mala me bi dirî
Heçî ku neyê govendê
Porê diya xwe dibirî

Haynir nîna naynir nîna haynir nîna nay nîna
Haynir nîna naynir nîna haynir nîna nay nîna
Haylê w lilê lê w lilê haynir nîna nay nîna

Serya mala kelem e
Binya mala kelem e
Navê keçkê nizanim
Pa navê tornam Meyrem e
Haynir nîna naynir nîna haynir nîna nay nîna

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

Haynir nîna naynir nîna haynir nîna nay nîna
Haylê w lilê lê w lilê haynir nîna nay nîna

Tu jî li ber mêwa tirî
Ez jî li ber mêwa tirî
Hebo libo jêkiri
Heyrana bejna zirav
Pa dev û lêvê şekirî

Haynir nîna naynir nîna haynir nîna nay nîna
Haynir nîna naynir nîna haynir nîna nay nîna
Haylê w lilê lê w lilê haynir nîna nay nîna

# Naz meke




E'sire demî rojawa
Tom dî mandûm h'esawe
Ya xuda be xêr bêytewe
Şilke rêh'aney sawe
Naz meke, naz meke, nazlê nazit be çendî
Lêw qeytanî ferengî, delêy kotirî delengî

Leser pirdî miyanduwawê
Desirem lê kewte awê
Be qurbanî balat bim
Ew narincem bo bawê
Naz...
Lêw...

Rawestawe le ber derkê
Ey bilê nazit be çendî
Kilî le çawan detikê
Pêm bilê u maçit be çendî
Naz...
Lêw...

Delêm bimdeyê maçê
Barîkê nazit be çendî
Bom were male u malan
Dey bilê nazit be çendî
Naz meke, naz meke pêm bilê nazit be çendî
Şede şilê, çaw be kilê, barîkê nazit be çendî

Soranî / Gelêrî

# Nazanim le kê pirsim





Nazanim le kê pirsim ew gulem mîwanî kêye
Sebaret be yarî xom awedan bê ew dêye
Zêrî hejde e'yyare demançey kele kêye
A'şiqî qed u balay bum, şox u gware le gwêye
Ciwanî be dînim ciwanî, be milyonê herzanî
Awirit le min berdawe ser topî kurdistanî
Hey leber ew goze demirim naskol deyba bo kanî
Basikim we jûr serî de xoşewîstî mîwanî
Mest u xumar u serxoş giriftarî xalit bim
Naskol min be xulamî dû çawî kejalit bim

# Nazdar û be bahane




Nazdar zîze bê behane, bo wî derdim girane
Wecaxêkî bo dirûst kem çîmento u balexane
Lew xalane lew lêwane kamyan maç kem lew dwane?
Kirdit be a'det gorewî çinîn, a'şiq dekûjî dem be pêkenîn
Awa tûş de bê feleke feleke biraderîne feleke
Le beh'ranim degerêtewe gemiye
Le çomanim degerêtewe
Geleke le a'lemê xudaye
Be talan deçêtewe mere malat
Dewlete şekemeh'ndekem
Lem heye hejar be talan deçêtewe deku lal bim
Bejnê te barîke te dû çawê beleke
Kirdit be a'det derk u dû kołan
Ew xet u xalet nedey be talan
Kirdit be a'det banî e'maret
Be dest meşiq ekey be çaw îşaret

# Nazdar û nazdar




Soranî / Gelêri

Nazdar û nazdar, nazdarey malan
Ew xet û xalet , bo da be talan
Ew maley heme nezirî ella bê
Belku koçeket berew diwa bê
Eger giyan kêşan wek dûrî to bê
Ya reb be nisîbî gawirî ser ko bê
Wenewşem deçinî melo be melo
Xelkî pêy şad bûn eminîş rencero
Detirsim bimrim be ciwane mergî
Bîbeme jêr xak naley dil tengî
Detirsim bimrim dax le dilim bê
Xakekey bexda aw u gilim bê
Heste bê bo lam wek carî caran
Be kwêrî dûjmin be dîdey yaran
Detirsim bimrim net bînimewe
Be ciwane mergî ser binêmewe
Nazdar û nazdar, nazdarî babî
Kotore barîkey bal be şore bî

# Nazdar




Soranî / Gelêrî

Ne xuda demdatê giyane mergêk be hasan
Ne dil le lay to dîdem debê herasan
Nazdar u nazdar u nazdarey kakî
Xo min zûm zanîwe to bo min çakî

Bîke we xatirî giyane h'ezretî musa
Ger misilmanît ciwanê tefredan bese
Nazdar u nazdar u nazdarey xomî
Xunçey nêw baxan giyane nemamî çomî

Le şiney darî bî dîdem le mezey qore
Xuda helnagirê dîdem ew zûlme zore
Nazdar...
...

Hey dad u hey bêdad lew gewre şare
Ne dengî yar dê ne bo xoy diyare
Nazdar u nazdar u nazdarey şûşe
Heste ba biroyin dîdem dileket mexşûşe

# Nazê




Pa imirê min bo çiye nazê
Nazê, nazê, nazê, nazê, nazê
Imirê min wey bo çiye nazê
Nazê nazê nazê gerdengazê
Nazê çûye razaye
Nazê nazê nazê nazê
Nazê çû nehatiye
Nazê nazê nazê nazê
Nazê nazê nazê gerdengazê
Dosta lawê tolazê
Nazê nazê nazê gerdengazê
Hatim deryek dadayî
Nazê nazê nazê nazê
Cih û balîf radayî
Nazê nazê nazê nazê
Ez û tu li ser razayî
Nazê nazê nazê nazê gerdengazê
Dosta lawê tolazê
Tê li gel min wê razê
Nazê nazê nazê nazê gerdengazê

Hesen Cizrawî, radyoya Bexdayê

# Nazenîn




Reşim poşawe reş tir le banî
A'zyet barî tom naşê neyzanî
Erê hoy nazenîn ...Nêşêwê nazit
Xom debim be xulamî dû çawî bazit
Be maşênî cîb dêm bo pêşwazit
Eger be bê to şadîm le dil bê
Şadî u nociwanîm! Awêtey gil bê
Eger meyleket feramoşim bê
Sifîdey kifin bala poşim bê
Reşim poşawe girye u zarîme
Bo balay ciwanî to bê qerarîme

# Nazenînê




Zorim h'ewil le dwa da
Ser leser ranî taku beyanî
Bûme mîwanî nazenînê
Bê wefa bûy nemzanî, ser...
Bûme...
Şew u şewgarim şeq kird, ser...
Bûme...
Le naw sîng u memkanî, ser..
Bûme...
Kelegetê nabînim, ser...
Bûme...
Henawim boy nemawe, ser...
Bûme...
Delên şûy kird be reqîb
Bê wefa bû giyane kone yarim
Dostî parim bêqerarim
Diyare wefay nemawe, bê..
Bûme...

Aşiq u malwêran bûm, ser...
Bûme...
Be birsêtî xom nezanî, ser...
Bûme...
Ba birwat be neh'let bê, ser...
Bûme...
Dostî namîhrebanî, ser...
Bûme...
Yar bo min bêwefa bûy, ser...
Bûme...
Taze nakem dildarî, ser...
Bûme...
Şerte deçime biyabanî, ser...
Bûme...
Namênimewe le şarî, ser...
Bûme...

# Ne li mal e




Ne li mal e ne li male oy oy oy oy
Ne li mal e ne li mal e li min sebrê tu domamê

Zava çû hemamê oy oy oy oy
Zava çû hemamê li min keçikê tu domamê
Nexweş e bêhal e oy oy oy oy
Nexweş e bêhal e li min gewrê tu domamê

Ne li mal e ne li mal e oy oy oy oy
Ne li mal e ne li mal e li min sebrê tu domamê

Zava çûye sûkê oy oy oy oy
Zava çûye sûkê li min gewrê tu domamê
Tîne hina bûkê oy oy oy oy
Tîne hina bûkê li min keçikê tu domamê

Ne li mal e ne li mal e oy oy oy oy
Ne li mal e ne li mal e li min sebrê tu domamê

Hine di teştê kin oy oy oy oy
Hine di teştê kin li min keçikê tu domamê
Destê bûk û zava kin oy oy oy oy
Destê bûk û zava kin gewrê tu domamê

# Nêçîrvano






Hohohoy nêçîr nêçîr nêçîr
Tohohoy nêçîr nêçîrvano
Hohohoy nêçîr nêçîr nêçîr
Tohohoy nêçîr nêçîr nêçîrvano
Nêçîrvanê pez kuvyano
Hohohoy nêçîr nêçîrvano
Nêçîrvanê pez kuvyano
Tohohoy nêçîr nêçîr nêçîrvano
Ha bi dest da ye tîr kevano
Hohohoy nêçîr nêçîrvano
Ca bi dest da ye tîr kevano
Tohohoy nêçîr nêçîr nêçîrvano

Hohohoy nêçîr nêçîr nêçîr
Tohohoy nêçîr nêçîr vano
Hohohoy nêçîr nêçîr nêçîr
Tohohoy nêçîr nêçîr nêçîrvano
Sîpanê gaz ber gazo
Hohohoy nêçîr nêçîr nêçîr
Xopanê gaz ber gazo
Tohohoy nêçîr nêçîr nêçîrvano
Ha di binyê de Elcewazo
Hohohoy nêçîr nêçîr nêçîr
Ca di binyê de Elcewazo
Tohohoy nêçîr nêçîr nêçîrvano
Mexelê pezê mazo
Hohohoy nêçîr nêçîr nêçîr
Mexelê pezê mazo
Tohohoy nêçîr nêçîr nêçîrvano

Hohohoy nêçîr nêçîrnêçîr
Tohohoy nêçîr nêçîrvano
Hohohoy nêçîr nêçîrnêçîr
Tohohoy nêçîr nêçîr nêçîr ano
Sîpanê holo molo
Hohohoy nêçîr nêçîr nêçîr
Xopanê holo molo
Tohohoy nêçîr nêçîr nêçîrvano
Ha di binyê de avid golo
Hohohoy nêçîr nêçîr nêçîr
Ca di binyê de avid golo
Tohohoy nêçîr nêçîr nêçîrvano
Mexelê pezîd kolo
Hohohoy nêçîr nêçîr nêçîr
Mexelê pezîd kolo
Tohohoy nêçîr nêçîr nêçîrvano

# Nemam nemame




Bînê ser dilim naske penceket, ey hawar namem
Baweşênim ke be egrîceket, ey hawar namem
Nemam nemame, nemam zor ciwane
Awirî tê ber dam perçem rêh'ane

Bînê ser dilim pencey şimşalit, ey hawar namem
Emin dey mijim dû lêwî alit, ey hawar namem
Bînê ser dilim pencey barîkit, ey hawar namem
Bimke şerîk le lîmoy ferîkit, ey hawar namem
Bînê ser dilim her car be carê, ey hawar namem
Kê tefrey dawî berdî lêbarê, ey hawar namem
Nemam nemame, nemam çend ciwane
Awirî tê berdam ew new nemame

# Nemirdûy her mawî to




To baranî werzî mujdey ay lalo giyan lalo
Be sermana debarî nemirduy hermawî to
Hetaw rête u nêrgiz çawte ay lalo giyan lalo
Le giyanmana rûbarî nemirduy her mawî to

Le asmanî yadî to da ay lalo giyan lalo
Min çirîkem bal degirê nemirduy her mawî to
Wek hewênit bestey minîş ay lalo giyan lalo
Hemu dinya degerê nemirduy her mawî to

Pêşim kewe gul esterey ay lalo giyan lalo
Xoşewîstî şewanim nemirduy her mawî to
Min be bê to rêy çunewey ay lalo giyan lalo
Kurdistanim nazanim nemirduy her mawî to

# Nêrîme




Nêrî me nêrî me melko
Nêrî me nêrî me hemko

Nêriyê kiresis e Melko
Nêriyê kiresis e Hemko

Çenga xûsexûs e Melko
Çenga xûsexûs e hemko

Zozanek Bidlîs e Melko
Zozanek Bidlîs e hemko

Nêrî me nêrî me melko
Nêrî me nêrî me hemko


Nêriyê kirekal e Melko
Nêriyê kirekal e Hemko

Çenga nalenal e Melko
Çenga nalenal e hemko

Zozan Herekol e Melko
Zozan Herekol e hemko


Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Nesîhet bê




Nesîh'et bê bo dildarî
A'şiq nebin be rêbwarî
Çunke a'şiq dilî xwêne
Xoy dekûjê le naçarî
A'şqan pak dilyan biryane
Boye wêl u sergerdane
Rengiyan zerd u perêşane
A'şiq be balay çaw ciwane
A'şqan dên le dûr diyarin
Rengiyan zerd u lêw be barin
Meni'yan meken giriftarin
A'şiq be balay çaw karin
Meni'yan meken giriftarin
Boye serpakyan bîmarin
A'şqan pak dilyan nasike
Mei'şûqeyan wek asike
Deperê ew baske u baske
Emro boye xoy dehaske

# Newroz




Newroz Newroz ay Newroz way Newroz
Newroz Newroz ay Newroz way Newroz
Newroza min şêrîn e ay Newroz
Newroza min şêrîn e ay Newroz
Newroza min şêrîn e ay Newroz

Newroz buharê tine ay Newroz
Dera giştî dixemilîne ay Newroz

Newroz azadiyê tîne ay Newroz
Çavê dijmin dertîne ay Newroz
Newroz serbestiyê tîne ay Newroz

Newroz Newroz ay Newroz way Newroz
Newroza min şêrîn e ay Newroz
Newroz azadiyê tîne ay Newroz
Newroz serbestiyê tîne ay Newroz
Dera giştî dixemilîne ay Newroz

Radyoya Êrîvanê

# Nîme çare




Erê ew bala berzey ew têl be sere
Erê eminî kûştûwe, xoy bê xebere
Erê roh' u îmanim, ew reş esmere
Çîbikem nîme çare
Dil a'şiqe u birîndare
Kes nanasim lew şare
Yarî xome u lêm bêzare

Xozge lew dinyaye da
h'asil baye miradim
Çend cefam le dût kêşa,
a'qîbet renc be badim
Çîbikem nîmeçare
E'ntîke u zêde lawe
Çonî lê bikem silawe

Singî penîrî Kurdî
Zûlfî giyabend u xawe
Kelekey çepim kune
Lêw al be mist lêydawe
Kiçê eger nebî be yarim
Xudah'afîz, mal awa...

Xerîb mawim le Bexdaye
Bejinit çile bîzaye
Delêm bimdeye maçê
Bejnit çile bîzaye
Le wetey ew jinem dîwe
Hîç kesim we bîr naye
Dawim kewtote dawî
Qet-qet kotayî naye
Çî bikem nîme çare

Erê qurban koçekey
Ey wey Eh'med Awat bim
Erê baweş u mindalî
Ciwanê korpey sawat bim
Erê le Xwam telebe
Her min xom be zawat bim
Çîbikem nîme çare

# Nîme çare




Erê ew bala berzey ew têl be sere
Erê eminî kûştûwe, xoy bê xebere
Erê roh' u îmanim, ew reş esmere
Çîbikem nîme çare
Dil a'şiqe u birîndare
Kes nanasim lew şare
Yarî xome u lêm bêzare

Xozge lew dinyaye da
h'asil baye miradim
Çend cefam le dût kêşa,
a'qîbet renc be badim
Çîbikem nîmeçare
E'ntîke u zêde lawe
Çonî lê bikem silawe

Singî penîrî Kurdî
Zûlfî giyabend u xawe
Kelekey çepim kune
Lêw al be mist lêydawe
Kiçê eger nebî be yarim
Xudah'afîz, mal awa...

Xerîb mawim le Bexdaye
Bejinit çile bîzaye
Delêm bimdeye maçê
Bejnit çile bîzaye
Le wetey ew jinem dîwe
Hîç kesim we bîr naye
Dawim kewtote dawî
Qet-qet kotayî naye
Çî bikem nîme çare

Erê qurban koçekey
Ey wey Eh'med Awat bim
Erê baweş u mindalî
Ciwanê korpey sawat bim
Erê le Xwam telebe
Her min xom be zawat bim
Çîbikem nîme çare

# Nîna nîna Êmo




Nîna Nîna kar tomed e
Kar tomed e kar û sinhet
Kar û sinhet ji destê xorta
Êmo newa li bin dar e lê lim lê lê lê êmo
Tolê newa li bin dar e malê min û bi kêfa te
Emo newa li bin dar e lê lim lê lê lê êmo
Tolê newa li bin dar e malê min bi xulama te

Sê siwar têno bi xar e lê lim lê lê lê êmo
Sê siwar têno bi xar e malê min bi xulama te

Êmo keçika muxtar e lê lim lê lê lê êmo
Êmo keçika muxtar e malê min bi xulama te

Nîna Nîna kar tomed e
Kar tomed e kar û sinhet
Kar û sinhet ji destê xorta
Êmo newa li bin gez e lê lim lê lê lê êmo
Tolê newa li bin gez e malê min bi xulama te

Sê siwar têno bi lez e lê lim lê lê lê êmo
Sê siwar têno bi lez e malê min bi xulama te

Êmo keçika çerkez e lê lim lê lê lê êmo
Êmo keçika çerkez e malê min bi xulama te

Nîna Nîna kar tomed e
Kar tomed e kar û sinhet
Kar û sinhet ji destê xorta
Êmo newa li bin bî ye lê lim lê lê lê êmo
Tolê newa li bin bî ye malê min bi xulama te

Sê siwar têno hêdî ye lê lim lê lê lê êmo
Sê siwar têno hêdî ye malê min bi xulama te

# Nîna




Nîna lê, nîna lê, nîna lê nîna
Gewrê rind qozaxê nîna

Nîna lê em hatin te bixwazin
Gewrê lê em hatin te bixwazin
Dê û bavê te lê li me bi naz in
Tirsim lê qelen pir bixwazin

Nîna lê, nîna lê, nîna lê nîna
Gewrê rind qozaxê nîna

Nîna lê em hatin te bibînin
Gewrê lê em hatin te bibînin
Dê û bavê te lê li me bi kîn in
Tirsim qelen pir bistînin

Nîna lê, nîna lê, nîna lê, nîna
Gewrê rind qozaxê nîna

Herêma Amedê, çavkanî: Rojen Barnas

# Nînayî te me




Ha nîna nîna nînayî te me
Ca nîna çavreş li benda te me
Ha nîna keynay Evdoyê dimbilî
Ha nîna cor de hat û gulgul î

Ha nîna
Ca nîna
Ha nîna oda şêx î bi şibako
Ha nîna şibako berepako

Ha nîna
Ca nîna
Ha nîna oda şêx î pencere
Ha nîna pencere û beramber e

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Nînik nînik nînarê




Nînik nînik nînarê hoy nînarê hoy nînarê
Nînik nînik nînarê hoy dewranê tew dinyayê

Nînik keça kurda ye hoy nînarê hoy nînarê
Nînik keça kurda ye hoy dewranê tew dinyayê

Nava mala geriyaye hoy nînarê hoy nînarê
Nava mala geriyaye hoy dewranê tew dinyayê

Çare li gora qetiyayê hoy nînarê hoy nînarê
Çare li gora qetiyayê hoy dewranê tew dinyayê

Çibkim bi malê dinyayê hoy nînarê hoy nînarê
Çibkim bi malê dinyayê hoy dewranê tew dinyayê

Nînik nînik nînarê hoy nînarê hoy nînarê
Nînik nînik nînarê hoy dewranê tew dinyayê

# Nînim nînim




Nînim nînim nînnayê hoy nînnayê hoy nînnayê
Nînim nînim nînnayê hoy dewranê tew dinyayê

Nînim keça derwêş e hoy nînayê hoy nînayê
Dostam keça derwêş e hoy dewranê tew dinyayê

Tew serî qele quşê hoy nînayê hoy nînayê
Tew serî qele quşê hoy dewranê hoy dinyayê

Dermanê çavê nexweş e hoy nînayê hoy nînayê
Dermanê çavê nexweş e hoy dewranê tew dinyayê

Nargoşê yaram kî ne hoy nînayê hoy nînayê
Nargoşê yaram kî ne hoy dewranê tew dinyayê

Nînim nînim...

# Nûrî rûxsarit




Nûrî rûxsarit wederxe derdî bê dermane şew
Zulmetî zulfit leser rûte, le roj mîwane şew
Diwê şikur merdane, min rêm birde naw zulfî siyat
Ta bizanin, ehlî mûlkî dil, qelay mêrdane şew
Her le mexrîb ta beyanî bê wiçan dêt u deçê
Her le dûy xurşîdî xawer wêl u sergerdane şew
Qedirî şew ça bigre a'şiq, şemi' u perwane delên
Soz u giryey şemi', her şew sûtinî perwane şew
Kwêr u nabînaye êstake le daxî rojî rût
Boye reş poş u feqîr u mat u bestezimane şew
A'şiq u mei'şûq le roj da xo deparêzin le xelik
Ger penay çakit dewê, bo ew duwe birwane şew
Heste kamîl, besiya sistî, dey biro lê rakewe
Ta wilat bê deng u base, ta le roj mîwane şew

Soranî / Gelerî

# Okê kaşon




Okê kaşon huşena lêro
Liminî lêro liminî
Okê kaşon huşena gidî
Cêran cur surmeliya

Tutek verd şina yena lêro
Liminî lêro liminî
Tutek verd şina yena gidî
Cêran cur surmeliya
Desmaj sivê vergena lêro
Liminî lêro liminî
Desmaj sivê vergena gidî
Cêran cur surmeliya

Okê kaşon huşena lêro
Liminî lêro liminî
Okê kaşon huşena gidî
Cêran cur surmeliya
Okê kaşon huşena lêro
Liminî lêro liminî
Okê kaşon huşena gidî
Cêran cur surmeliya

Di rikat nimaj kena lêro
Liminî lêro liminî
Di rikat nimaj kena gidî
Cêran cur surmeliya
Dueyê kedêr mi kena lêro
Liminî lêro liminî
Dueyê kedêr mi kena Gîdî
Cêran cur surmeliya
Nuşena ru bermena lêro
Liminî lêro liminî
Nuşena ru bermena gidî
Cêran cur surmeliya

Okê kaşon huşena lêro
Liminî lêro liminî
Okê kaşon huşena gidî
Cêran cur surmeliya

# Ordek im




Ez ordek im ordek im lê lê ordekê ordekê
Ez ordek im ordek im memik şemala şevêo

Ez ordeka ser sor im lê lê ordekê ordekê
...memik şemala şevêo
Dosta lawkê pispor im lê lê ordekê ordekê
...memik şemala şevêo
Şev û rojan dilorim lê lê ordekê ordekê
...memik şemala şevêo

Ez ordek im...

Ez ordeka ser reş im lê lê ordekê ordekê
...memik şemala şevêo
Dosta lawkê keleş im lê lê ordekê ordekê
...memik şemala şevêo
Şev û rojan dimeşim lê lê ordekê ordekê
...memik şemala şevêo

Ez ordek im...

Radyoya Êrîvanê

# Ormiye




Ormiye, Ormiye lêb lê gulê, lêb lê gulê, lê lê
Ormiye zerî ye sîng sedefê, devpiçûkê, çavbelekê, enî gewerê canê
Keç keça walî ye lêb lê gulê, lêb lê gulê, lê lê
Keç keça walî ye sîng sedefê, devpiçûkê, çavbelekê, enî gewerê canê
Paşil bi hirmî ye lêb lê gulê, lêb lê gulê, lê lê
Paşil bi hirmî ye sîng sedefê, devpiçûke, çavbelekê, enî gewerê canê

Tetwan e Tetwan e lêb lê gulê, lêb lê gulê, lê lê
Tetwan e Tetwan e sîng sedefê, devpiçûkê, çavbelekê, enî gewerê canê
Keç keça metran e lêb lê gulê, lêb lê gulê, lê lê
Keç keça metran e, sîng sedefê, devpiçûkê, çavbelekê, enî geweriê canê
Paşil bi xweydan e lêb lê gulê, lêb lê gulê, lê lê
Paşil bi xweydan e sîng sedefê, devpiçûkê, çavbelekê, enî gewerê canê

Erdîş e Erdîş e, lêblê gulê, lêb lê gulê, lê lê
Erdîş e Erdîş e, sîng sedefê, devpiçûkê, çavbelekê, enî gewerê canê
Keç keça çawîş e, lêb lê gulê, lêb lê gulê, lê lê
Keç keça çawîş e sîng sedefê, devpiçûkê, çavbelekê, enî gewerê canê
Paşil bi êmiş e, lêb lê gulê, lêb lê gulê, lê lê
Paşil bi êmiş e, sîng sedefê, devpiçûkê, çavbelekê enigewerê canê

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Oy nêrgiz




Oy nêrgiz nêrgiz nêrgiz
Nêrgizê narê ciwanê
Oy nêrgiz nêrgiz nêrgiz
Sorgulê Berîvanê

Ez nêrgiza cayê sor im nêrgizê narê ciwanê
Ez nêrgiza cayê sor im sorgulê berivanê
Zozan zozan dimorim nêrgizê narê civanê
Zozan zozan dimorim sorgulê berivanê
Oy nêrgiz nêrgiz nêrgiz
Nêrgizê narê ciwanê
Oy nêrgiz nêrgiz nêrgiz
Sorulê Bêrîvanê

Ez nêrgiza cayê reş im nêrgizê narê ciwanê
Ez nêrgiza cayê reş im sorgulê berivanê
Zozan zozan dimeşim nêrgizê narê ciwanê
Zozan zozan dimeşim sorgulê berivanê
Oy nêrgiz nêrgiz nêrgiz
Nêrgizê narê ciwanê
Oy nêrgiz nêrgiz nêrgiz
Sorgulê berivanê

# Ozmano




Herêma Serhedê

Deblo lo lo, deblo lo lo deblo lo lo deblo lo lo
Deblo lo lo lo lo lo lo ozmano (Mêvano)

Şivka ozmin şiv şîlan e, şivka mêvin şiv şîlan e
Mi girêdaye heft têlan e
Her têleke tew tew heft rengan e
Her têleke wey wey heft rengan e

Hespê ozmin bikşînin, hespê mêvin bikşînin
Teng û benan bişidînin teng û quşan bişdinin
Ozmin siwar kin tew tew ne êşînin
Mêvin daynin wey wey ne êşînin

Hespê ozmîn bivne avê, hespê mêvin bivne avê
Teng û benan bidine navê, teng û qusan bidine navê
Ozmin siwar kin tew tew ne êşînin
Mêvin daynin wey wey dewsa bavê

# Payîze le min




Zulfî wek reş mar hatûne xwarê
Le dem u lêwî şekir debarê
Payize le min direnge le to
Sûr debûn xezel zerd debûn lîmo

Gerdin bilind u beriz u zor ciwane
Ebiroy wek hîlal mijolî peykane
Payize...
Sûr...

Ger çawî reşî be naz heldênê
Le pîr u le ciwan dil derifênê
Payize...
Sûr...

Zorim pê xoşe leser dinyaye
Helperkêy kurdî legel leylaye
Payize...
Sûr...

Şan leser şan dest leser deste
Bizane çî têda ew tewin u beste
Payize...
Sûr...

# Payîz e




Soranî / Gelerî

Payize u payize payize u payize
Payize u hewaran wek bûkî reş matin
Le swey dildaran

Werzî hatnewey koç u koçbaran payiz
Boye mat u xembarim herwek bûkî zîz
Payize u payize...

Reng zerdî min u giyane zerdî xezanan
Yaran min dûrim wey wey wek yek mezaran
Payize u payize...

Rend zerdî xezan giyane xetay payize
Reng zerdî min dey hawar dûrî azîze

Payize u payize

# Pepû Suleymanî




Pepu suleymanî malim rimanî
Çaw ebro mişkî şal kirmaşanî

Eray dûryeket fire hurîme
Çenay besitun xeme kurîme

Pepu suleymanî...

Xom kirmaşanî ziwatan niyezyanim
We zimanî kurdî qezat le giyanim

Pepu suleymanî...

Soranî / Gelêrî

# Pepûley şem




Le î'şqî şem pepûle helprûza
Be sûtanî pepûley şem delerza
Leber çî roj u şew bulbul denalê
Le î'şqî gul per u poy dademalê
Were to bê wefayî gul bibîne
Be bulbul nalê besye ew girîne
Be noş dar u î'lacî ew birîne
Le kwê sarêj debê ya dekirê pîne
Birînî cergî min zamî ewîne

Soranî / Gelerî

# Perçem û egrîce




Em perçem u egrîcet hemû dujminî dîne
Ew zulif u ruxet afetî ser ruy zemîne
Nazîlê lêre lewê, barîkê xasekewê
Her êstê maçim ewê
Nayxeme nîmeşewê
Be şêxekey kanî kewê

E´şqit le dilim sabîte nek a´rîze qurban
Wek tureyî şahan ke leser ruy nikîne
Nazîlê lêre lewê, barîkê xasekewê
Her êstê maçim ewê
Nayxeme nîmeşewê
Be şêxekey kanî kewê

Dil bote kebab bo mujeyî dîdey mestit
Qurban lewe mei´lume ke lêwit nimkîne

Soranî, Elî Merdan, adyoya Bexdayê

# Perêşanim




Perêşanim min denalênim
Firmêskî çawan debarênim
Hemû u'mrî xom leser dana
Le tawanit bûm be dêwane
Nazanim çonî bikem çare
Dermanî ew dile bîmare
Be bê hude şêt u hejarim
Be derdî dil min giriftarim

Delên mecnun cewirî kêşawe
Le diway leyla roh'î danawe
Gulim çit kird çon debê wabê
Dilî mecnun şêtî leyla bê
Nazanim...
Dermanî...
Be bê hude...
Be derdî...

Dilim şêwa kê bû şêwandî
Gulim şemza kê bû şemzanî
Ewa leyla koç deka lêre
Nema gulşen xêl berew jêre
Nazanim...
Dermanî...
Be bê hude...
Be derdî...

Felek tu xuda çerxî dewiranit
Şew u roj u karî mîzanit
Eger carêk lew hemû caran
Be meylî dil xo bide yaran
Nazanim...
Dermanî...
Be bê hude...
Be derdî...

Soranî / Geleri

# Perî




Soranî / Gelêrî

Besye qurban derdî ser
Bo to mirdim reş esmer
Leser balay toye min
Le dinya bûm derbeder
Memkî çepit fincane
Ewî rastit wek gewher
Were deste milanit bim
Le dinya bûm derbeder
Of perî, perî perî
Qirîngî çomî gaderî
Îcazem le daykî send
Bo xom debime mişterî
Were deste milanit bim
Çend ciwan u reş esmerî
Swêndim dawî be wella
Şîrînî delêy şekerî
Qeytanî dû lêwanî
Bendî le dilim pisawe
Kifrê le min qewmawe
Destim le memkî dawe
Sîngî penîrî kurdî
Zulfî giya bend u xawe
Kelekey çepim kune
Lêw al be mist lêy dawe
Eger nebî be yarim
Xuda h'afîz mal awa

# Perî




Perî ya balatirî le ala wala tirî
Bew xaley kulmî ciwanît le perî wala tirî

Her carê ke detbînim dekûlênewe birînim
Kezî sor ba bitbînim sarêjke taze birînim

Perî ya...

Qedit wêney lawlawe ciwanekey lay seydawe
Were bibe be yarim biçîn bo baxî şeqlawe

Perî ya...

# Perîzade




Perîzade lê perîzade
Perîzade lê perîzade

De tu rabe lê dêrî dade
De tu rabe lê dêrî dade

De tu rabe lê dêrî dade
De tu rûnê lê biska bade

Qîzik ramûsana nade
Qîzik ramûsana nade

Perîzade lê perîzade
Perîzade lê dêrî veke

De tu rûnê lê de tû rûnê
De tu rûnê lê zulfa şeke

Tu bi xebera lê tu bi xebera
Tu bi xebera lê xelkê neke

Tu min li nava lê sîngê xweke
Tu min li nava lê sîngê xweke

Perîzade lê perîzade
Perîzade lê perîzade

Radyoya Bexdayê

# Pîr Ezdîn axa




Pîr Êzdîn Pîr Êzdîn e hey Pîr Êzdîn axa
Pîr Êzdîn Pîr Êzdîn e hey Şêr Êzdîn axa
Mertalê sor û şîn e hey Pîr Êzdîn axa
Mertalê sor û şîn e hey Şêr Êzdîn axa

Nav şeran wek te nîne hey Pîr Êzdîn axa
Nav şeran wek te nîne hey Şêr Êzdîn axa

Xweyê şûrê bi lexş e hey Şêr Êzdîn axa
Xweyê şûrê bi lexş e hey Şêr Êzdîn axa

Nav şeran çend keyf xweş e hey Pîr Êzdîn axa
Nav şeran çend keyf xweş e hey Şêr Êzdîn axa

Pîr Êzdîn Pîr Êzdîn e hey Pîr Êzdîn axa
Pîr Êzdîn Pîr Êzdîn e hey Şêr Êzdîn axa

Ser çeperan de dimeşe hey Pîr Êzdîn axa
Ser çeperan de dimeşe hey Şêr Êzdîn axa

Ew şûr kêşê keleş e hey Pîr Êzdîn axa
Ew şûr kêşê keleş e hey Şêr Êzdîn axa

Soreş e pê kêf xweş e hey Pîr Êzdîn axa
Soreş e pê kêf xweş e hey Şêr Êzdîn axa

Xweyê şûrê zeriy e hey Pîr Êzdîn axa
Xweyê şûrê zeriy e hey Şêr Êzdîn axa

Pîr Êzdîn Pîr Êzdîn e hey Pîr Êzdîn axa
Pîr Êzdîn Pîr Êzdîn e hey Şêr Êzdîn axa

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Pirçî pexşane





Yarim bê şane pirçî pexşane
beser kolwane şalî ser şane
mezey çawane qîbley lawane
karmamzekey çom u awane
wêney bê gerdî pirxalî wirdî
le gel milwankey gerdinî zerdî
ke seyrî dekey be bergî kurdî
nazanî dilit kamyan bu birdî

Giyan suk u nasik çend xincîlane
qulingî pêşengî qafley melane
xermanî gulane melbendî dilane
qeşeng riskawî nexşî yezdane

Yarim bê...

Soranî / Gelêri

# Pismamo





Lo lo pismamo şara bi mîra
Hûçê pismamêm gaza li ber mîra
Bi xelkê paşa bû bi min wezîra

Lo lo pismamo bi şara werucî
Pembokê serara hat û kelîjî
Xwelî li pismam bê Dotmam zewicî

Orta sibatê ba û baran tê
Xwelî li pismam be dotmam peya tê
Ji xelkê wetrê Pismam siwarê çê

Xweliya heft tenûra
Serê girş û hûra
Çilo dotmama xwe
Dane xelkê dûra
Kirine cêrya
Xesû û xezûra

# Pişta kiror




Heft mêran xwe ji gund kir çak e
Şer çû ser berî bîşyok e
Binya Kirorê bi hinar e

Pişta Kirorê bi hinar e
Heft mêran xwe ji gund kir kar e
Şer çû ser ordiya xwînkar e

Binya Kiror'ê hêjîr e
Pişta Kirorê h'ejîr e
Heft mêran xwe ji gund kir teybîr e
Şer çû ser ordiya wezîr e

# Qaspe qaspeî kew






Xo min kwêstanî lend nîm
Bênim karg u rêwasan
Hîç min telefizyon nîm
Dam denêy bo qise u basan
Xo min qerenî axa nîm
Gewrey xêlî bibasan
A'şiqî dû çawî bazim
Dey rifênim suk u asan
Qaspe qaspî kew dê
Kew le binarî ber dê
Kew bo kewbarim dexwênê
Le îzae'y kurdî
Weku kwêstanî bêstûn
Deyme serim be teme
Dayme dilekem pir xeme
Telaqet kesit nema
Min sed sal le ê'raq bim
Pêm delên xelkî e'ceme
Henarî nêw sincuran
Koxî nêw qerelwan

Lêrewe pêşkeşit bê
Ta zînuy baram luwan
Ew dilem şêt u şeydaye
Çend derdim le dildaye
Dû didanî telaye
Zulfî hewda hewdaye
Kemêk kurte balaye
Têy helden le guley segbab
Ger delêy reşe kaye
Qaspe qaspî kew dê
Kew le binarî ber dû
Her min bang dekem kurte jin
Ew pêm delê derdû
Destoy lêw alî depisênim
Kareba u mûr u zerdû

# Qaza golê




Delîl im dayê wem çaçan in
Qayşê piştê me ji qeytan in
Kumê me ji postê berxan in
Xwarna me ji goştê teyran in
Qaza golê qazî sor e
Tembîl da eskerê jor e
Teresê tirko tê bi dor e

Delîl im dayê wem çaçan in
Qayşê piştê me ji qeytan in
Kumê me ji postê berxan in
Xwarna me ji goştê teyran in
Qaza golê qazî şîş e
Tembîl da eskerê çîn e
Teresê tirko tê bi latîn e

Delîl im dayê wem çaçan in
Qayşê piştê me ji qeytan in
Kumê me ji postê berxan in
Xwarna me ji goştê teyran in
Qaza golê qazî reş e
Tembîl da eskerê reş e
Teresê tirko tê dimeşe

Heremên Serhed û Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Qeleha dimdim




Dimdim hate ber kolanê
Berdi di danin ser berdanê
Da bi çêkin ciyê lêkdanê

Barik Allah hosta Abas e
Berdi di dani wek risasê
Roj hekê wi zereki xazê

Barik Allah osta eliyê
Berdi dani ser berdiyê
Roj heki wi zerek sipehî ye

Herêma Urmiyê

# Qerecdax




Qerecdax bi kevrê reşo
Mal wêran bi kevrê reşo
Cota zeryan lê dimeşo
Cota kewan lê dimeşo
Mektûb hatî ji Amedê
Name hatî ji Amedê
Mektûb hatî dor bi nexşo
Name hatî dor bi nexşo
Go dotmama te nexweşo
Go keçmama te nexweşo
Lê dotmamê wey dotmamê
Wey dotmamê mêr xulamê

Qerecdax bi kevrê soro
Mal wêran bi kevrê soro
Cota kewan lê diboro
Cota zeryan lê diboro
Mektûb hatî ji Amedê
Name hatî ji Amedê
Mektûb hatî dor bi moro
Name hatî dor bi moro
Go dotmama te li dixtoro
Go keçmama te li dixtoro
Lê dotmamê wey dotmamê
Wey dotmamê mêr xulamê

Qerecdax bi kevrê spî ye
Mal wêran bi kevrê spî ye
Cota zeryan lê xwendiye
Cota kewan lê xwendiye
Mektûb hatî ji Amedê
Name hatî ji Amedê
Mektûb hatî dor girtî ye
Name hatî dor girtî ye
Go dotmama te mirî ye
Go keçmama te mirî ye
Lê dotmamê wey dotmamê
Wey dotmamê mêr xulamê

# Qeretajdîn




Qeretajdîn qere ye Qeretajdîn
Qeretajdin qere ye şêr û bazin
Te'l mistan tevere ye Qeretajdin
Şêr û bazin
Şerê şêran eve ye Qeretajdin
Şêr û bazin
Qeretajînê gulê Qeretajdin
Şêr û bazin
Siwarê'l vê dildilê qeretajdin
Şêr û bazin
Qonaxek bir dêrgûlê Qeretajdin
Şêr û bazin
Qeretajdinê pîrê Qeretajdîn
Şêr û bazin
Siware li vê beygirê Qeretajdîn
Şêr û bazin
Qonaxek bir Cizîrê Qeretajdîn
Şêr û bazin
Qeretajdîn qereye Qeretajdîn
Qeretajdîn qereye şêr û bazin

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Qesem




Were peyamî dilim
Bere bide be gulim
Le hîcirî xalî rûxit
Pisandî bendî dilim
Med ezabim
Binêre cwabim
Le baxî taze berim
Xerîb u derbederim
Esîrî dawim
Be dil sûtawim
Le yarî lale rûxim
Demêke bê xeberim

Qesem be h'usinî cemal
Qesem be çawî kejal
Qesem be zulfî reşit
Qesem be rojî wîsal
Nemawe rengim
Sûtawe cergim
Le sozî naley dil
Le razî bulbul
Ke bê miradim
Kiz u kesadim
Le bê wefayî behar
Le hîcirî çawî xumar

Kizey henawî reşim
Sirîçkî sûr u geşim
Le bê wefayî felek
Ewane bûne beşim
E'zîzî malim
Şehîdî xalim
Qesem be xendey rût
Dilim xemgîne le dût
Fexamî î'şqim
Xew û xeyalim
Qesem be cewir u cefat
Qesem be î'şiq u wefat

Kesêk heye le cîhan
Le î'şiqî raz u nîhan
Bizanê h'alî dilim
Le şîn u dad u fexan
Esîrî dawim
Be dil sûtawim
Fexan u şîne beşim
Bibîne bextî reşim
Çiye gunahim
Ke bê penahim
Felek kiz u be xeme
Le êşî cergî reşim

Soranî / Gelêrî

# Qisey işq




Her emnim ew kesey jînî bo to mawe
H'ez le kes nakem qet taku dinya mawe
Her toy qisey îşqim tixwa memxe lawe
Cergim sûtawe

Her toy xoşewîstim be dil det peristim
Her toy tekyagahî şîi'r u helbestim
Be yadî dû  çawit bexway bê mey mestim
Toy qisey îşqim

Reng zerd u çaw be giryanim be xuday bê to
Bê deng u mat u xembarim welle bê to
Ca bo çîme emin ew jiyane bê to
To qisey îşqim

Soranî / Gelerî

# Qîza mîrê siwêrekê





Qîza mîrê Siwêrekê can
Hey can can wey can cana min
Kenber ketî kêlekê
Ramîsim tu dey nekê
Tu bê dilya min nekê

Qîza mîrê dêrgula
Kenber ketiye ser dilan
Ru sorê ji pelê gulan
Xwe bihejîn herdu milan

Destê xwe bide destê min
Emê hevdû birevînin
Herin nav kîk û milan
Herin nav kîk û milan

# Qumriyê




Qumriyê hey Qumriyê
Dilo de loy loy dilo de loy loy
Qumriyê hey Qumriyê
Dilo de loy loy delîl Qumriyê

Qumrî keça mela yî
Dilo de loy loy dilo de loy loy
Çavreş keça mela yî
Dilo de loy loy delîl Qumriyê

Serî min de bela yî
Dilo de loy loy dilo de loy loy
Serî min de bela yî
Dilo de loy loy delîl Qumriyê

Qumrî keça keşêş î
Dilo de loy loy dilo de loy loy
Çavreş  keça keşêş î
Dilo de loy loy delîl Qumriyê

Ji xwe berde rîşî û pûşî
Dilo de loy loy dilo de loy loy
Ji xwe berde rîşî û pûşî
Dilo de loy loy delîl Qumriyê

Qumrîkê hedet medet
Dilo de loy loy dilo de loy loy
Çavreşê hedet medet
Dilo de loy loy delîl Qumriyê

Tû rûne biskan berde
Dilo de loy loy dilo de loy loy
Tû rûne biskan berde
Dilo de loy loy delîl Qumriyê

Tû rûne rişyan berde
Dilo de loy loy dilo de loy loy
Tû rûne rişyan berde
Dilo de loy loy delîl Qumriyê

# Qurm mil




Qûrm mil qûrm mile qûrm mile qur mile
Qûrm mil qûrm mile qûrm mile dar mile
Şitla biharê qûrm mile qurmile
Şitla biharê qûrm dar mile
Wê li milê yarê qûrm mile qurm mile
Wê li milê yarê qûrm mile darmile
Qûrm milê bî yê qûrm mile qûrm mile
Qûrm milê bî yê qûrm mile darmile
Şitla çiriyê qûrm mile qûrm mile
Şitla çiriyê qûrm mile dar mile
Milê zeriyê qûrm mile qûrm mile
Milê zeriyê qûrm mile dar mile
Qurm milê gûnê qûrm mile qûrm mile
Qurm milê gûnê qûrm mile dar mile
Şitla havînê qûrm mile qûrm mile
Şitla havînê qûrm mile dar mile
Milê xatunê qûrm mile qûrm mile
Milê xatunê qûrm mile dar mile
Qûrm milê gûzê qûrm mile qûrm mile
Şitla payîzê qûrm mile dar mile
Milê ezîzê qûrm mile qûrm mile
Milê ezîzê qûrm mile dar mile

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Rastî






Desmal h'erîrî dû ber
Mêrdit kird, xolim we ser
Eger h'ez dekey nemirim
Kçiê bimşêle, reş esmer
Rastî, rastî, rastî
Min nemam bo çawî mestî
Bo xom deçime serînî
Çun necîbe direng heldestî
Be çîm zanî yar xom dê
Be xirîngey bazney destî

Desmal h'erîrî sade
Rûbendit bo min lade
Eger h'ez dekey nemirim
Bimşêle h'acîzade
Nexoş u sergerdanim
Bew peşmîney pêm dade
Kiraseket şîrketî
Kewşeket kalozade
Rastî, rastî, ...

Desmal h'erîrî sûre
Qedî deley billûre
Qise deka be zarî
Deley saz u semtûre
Boçî nayete kewan
Kafire u le Xwa be dûre
Rastî, rastî, ...

Ne e'ybe u ne şikoye
Memkit narncî Koye!(xoye)
Singit baxî Şinoye
Kulmet gulî lîmoye
Xelkî şêtî Cindiyanin
Ew diley min şêtî toye
Rastî, rastî, ...

Bew Xudayey bêmekane
Min xerîbim lêrekane
Delêm bimdeye maçê
Be dizî u be meh'remane
Ew dilem boy sergerdane
Amênim le Bokane
Delêm awrit tê berdam
Beynella zêde ciwane
Rastî, rastî...

# Razyane




Razyane razyane
We gull û bi reyhane
Yar bo dengi na yê
Lew der û eymane

Arezûmendince hed wi werden
Ca firawan xeylê aziz tasey tom kerdem

Yani cesmey lit feramos kerden
Mer ba det necam bê serti werdem

Wer ne yani cis ne caren carê
Xeber ne pirsi ci derde darê

Soranî / Gelêrî

# Razye




Ay tom dare mêwî
Giyane şîn bûy le kêwî
De were maçî demeke
Demirim noberey sêwî
Ey wey maç dekem gonat
Be şert lêwit ne bizêwî
Ay tom dare biyekey
Giyane şîn bûy le dêber
De mero eminîş nexoşim
Xanim sayey tom leser
Reziye tom dare benî
Giyane rîşey dilkenî
Xo min des helgir nîm qet
Xanim lew mêxek benî
Reziye tom dare biyekey
Giyane şîn bûy le ber dê
Hawar cûte memkeket
De mero wêney zerde bê
Ay tom şore biyekey
Xanim şîn bûy le çomî

De were î'şwe u naz meke
Ciwanê to yarî xomî
Reziye, rezye dareke
Reziye şede lareke
Demirim bo to bar meke
Ay tom dare biyekey
Ciwanê in bûy le ber dê
De were saz be bo kwêstan
Bimrim bo bîza u mendê
Reziye tom dare benî
Giyane şîrîn wek qenî
Hawar min des helgir nîm
Xanim lew mêxek benî

Soranî / Gelerî

# Rêbwar




Ew çawe bazey be qurban Xwa be toy dawe
Meynetî dinya babekem her bo min mawe
Rêbwar u rêbwar sûre gul be rêbwarit bim
Le mûçey ber dê Seyzade nîwe kart bim

To zêrî xalîs be qurban min e'ybart bim
şerte ta demirim şorejin fîday kart bim
Dû çawî bazî to bîlla bûn be celabim
Pêyan bifermû malwêran neden e'zabim

Rêbwar u rêbwar xanim giyan eminîş rêbwarim
Eminîş weku to şorejin dil birîndarim
şerte ta meh'şer ciwanê jin a'şiq îxlas bim
Kabe keç nekem çaw ciwan giyan her to şûnas bim

Eger nebiwaye ciwanê jin be boney xalit
Ca min çîm dekird malwêran le dewrî malit
Piştên şil u mil ciwanê giyan heste le xewê
Le gerdinî zerdit ey hawar dû maçim dewê
Derdî emin u to şorejin le guleket kewê
Rêbwar u rêbwar...

Soranî / Gelêrî

# Refê ji refê çûkan




Refê ji refên çûkan lê lê çûkan lê lê çûkan
Firdan çûne sûkan lê lê sûkan lê lê sûkan
Gewrê canê

Silavan qîz û bûkan lê lê bûkan lê lê bûkan

Refê ji refê qazan lê lê qazan lê lê qazan
Firdan çûne golan lê lê golan lê lê gazan
Gewrê canê

Silavan keçên xwarzan lê lê xwarzan lê lê xwarzan

Refê ji refên kewan lê lê kewan lê lê kewan
Firdan çûne zozan lê lê zozan lê lê zozan
Gewrê canê

Refê ji refê qûmriyan lê lê qûmriyan lê lê qûmriyan
Firdan çû ser rêyan lê lê rêyan lê lê rêyan

Silavan van zeriyan lê lê zeriyan lê lê zeriyan

Refê ji refê ordekan lê lê ordekan lê lê ordekan
Firdan çûn ser kulekan lê lê kulekan lê lê kulekan

Silavan qîzên began lê lê began lê lê began

# Rêgay aşiqan




Lem lawe giryey nay u ney
Lew lawe xwên dey (be) camî mey
Awir le a'lem berdedey
Awaye rêgay aşiqan
Carêk le çawan bigire xew
Bigirî be naley nîwe şew
Ta dête der xurşîdî new
Awaye rêgay aşiqan
Ta dil nesûtê dil be dem
Fanî nebê ser ta qedem
Perwane qet naga be şem
Awaye rêgay aşiqan
Aşiq debê mestane bê
Xakî derî meyxane bê
Saqî le kin canane bê
Awaye rêgay aşiqan
Kê wek wefayî bendeye
Lew baxî gul dil xendeye
Bew camey xidirî zîndeye
Awaye rêgay aşiqan

Soranî / Gelêrî

# Reşko




Hoy reşik e reşik e
Reşiko weleh we(r) nakim
Reşiko weleh we(r) nakim

He(r)çî kesî mal xweşike
He(r)çî kesî mal xweşike

Dê mala xwe bin nîk e
Dê mala xwe bin nîk e

Mala Reşo wê di girde
Mala Reşo wê di girde

Hoy reşik e reşike
Hoy reşik e reşike

Mala Reşo wê li kêrî
Mala Reşo wê li kêrî

Te li dîlanê qef kirî
Te li dîlanê qef kirî

Ya canê têre borî
Ya canê têre borî

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Rewşa mala siltanê




Rewşa mala siltanê ho yemman
Ez anîm ber nemanê ho yemman
Te sozek ji mi re dabû ho yemman
Gelo soza te kanê ho yemman

Siltanê çend hêja ye ho yemman
B`xwedê rewşa mala ye ho yemman
Evîn gellek xweş e ho yemman
Gelo jê re çawa ye ho yemman

Heqê te li min jî nîne ho yemman
Ez anîm ber nemanê ho yemman
Te sozek ji mi re dabû ho yemman
Gelo soza te kanê ho yemman

Herêma Amedê, çavkanî : Şiyar

# Rezê




Rezê rezê rezê lolo mamo
Rezê rezê rezê pismamo
Rezê mêmud teze lolo mamo
Rezê mêmud teze pismamo
Binda marê terze lolo mamo
Binda marê terze pismamo
Tirsim te bi geze lolo mamo
Tirsim te bigeze pismamo

Reze reze reze lolo mamo
Reze reze reze pismamo

Rezê mêmud tirî lolo mamo
Rezê mêmud tirî lolo pismamo
Binda marê mirî lolo mamo
Binda marê mirî pismamo
Tirsim te bigirî lolo mamo
Tirsim te bigirî pismamo

Reze reze reze lolo mamo
Reze reze reze pismamo

Rezê mêmud zere lolo mamo
Rezê mêmud zere pismamo
Li zevya hembere lolo mamo
Li zevya hembere pismamo
Dora xwe cepere lolo mamo
Dora xwe cepere pismamo

Herêma Xarpêt / Qereqoçan

# Rihanokê




Çûm Bexdayê bi bî yê
Hatim Bexdayê bi bî yê
Bejna Rihan sipehî ye ha
Bejna çavreş sipehî ye

Hû yeman hû yeman
Sal çûbin ma ye zeman
Ez ji do da li hêvya te mam

Rihan ji malek mezin e
Dest û zendê abazin e
Navê Rihanê negrim
Bi xwedê ev emrê min e

Mala Rihan bilinc e
Fistanê çavreş bilinc e
Taxma Rihan firince ha
Taxma çavreş firince

Rihanê Rihanokê
Rihsorê şemamokê
Ezê Rihan birevînim
Hejka şilfe zarokê

Hesen Cizrawî, radyoya Bexdayê

# Rişyên egala Îsa




Hoy beyne beyne beyne
Ebdalo malo beyne
Hoy beyne beyne beyne
Kaniya kendalan leylo
Rîşyên egalê Îsa
Vedimale erdê dîsa

Heft salan jinê neyne
Ebdalo malo beyne
Heft salan jinê neyne
Kaniya kendalan leylo
Rîşyên egalê Îsa
Vedîmale erdê disa

Emiş hevalê tene
Ebdalo malo beyne
Emiş hevalê tene
Kaniya kendalan leylo
Rîşyên egalê Îsa
Vedimale erdê dîsa

Ebdalo ji guliya darê
Ebdalo malo beyne
Salek ji qewle te ne
Ebdalo malo beyne
Ebdalo ji gund kirne der
Ebdalo malo beyne

Her sê mehkên biharê
Ebdalo malo beyne
Xew xweş e gel vê yarê
Ebdalo malo beyne
Her se mehkên çiriyê
Ebdalo malo beyne

Xew xweş e gel zeriyê
Ebdalo malo beyne
Ebdalo ji guliya gûzê
Ebdalo malo beyne
Her sê mehgên payizê
Ebdalo malo beyne

Xew xweş e gel vê qîzê
Ebdalo malo beyne

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Robaro




Robaro robaro malê min robaro
Robaro robaro xemla vê biharê

Pêlên ji avên saro malê min robaro
Pêlên ji avên saro xemla vê biharê

Ser kehnî'j çinarê malê min robaro
Ser kehnî'j çinarê xemla vê biharê

Ser kehnî tu'j kû tê malê min robaro
Ser kehnî tû'j kû tê xemla vê biharê

Ber keviyên befrê tê hey la li min robaro
Ber keviyên befrê tê xemla vê biharê

Bihna yara'm jê tê hey la li min robaro
Bihna yara'm jê tê xemla vê biharê

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Roj derket û hate der




Roj derket û hate der
Tav derket û hate der

Sed hezar û êk defter
Kerek ewro kete ber

Mîr Mihemed ser leşker

Roj derketo hat nîvro
Esker hato Cizîro

Hate hindada mîro

Roj derket û ava bû
Esker kelhê cema bû

Mesiha Mistefa bû

Wê li meydanê meydanê
Herdem şerê li meydanê

Wê li meydanê cindî ye
Herdem şêro li meydanê

Alayek sor û zer e
Mîr Mihemed esker e

Roj derket û ava bû
Tav derket û ava bû

Leşker kelhê cema bû
Mîr Mihemed Mesîha bû

Roj derkete hindavê
Tav derkete hindavê

Hemû lekda civiyane
Şibyê tavên baranê

Roj derket hat nîvro
Tav derket hat nîvro

Esker hato Cizîro
Hato hindada Mîro

Heremen Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Rojî cejne




Dil nexoşî derdî hîcre canî cananim were, ay canî cananim were
Let lete cerg u henawim mahî tabanim were ay mahî tabanim were
Î´lletî derd u şefakem wa be lêwî şekerit, ay wa be lêwî şekerit
Mayey jîn u h´eyat u derd u dermanim were, ay derd u dermanim were

Rojî cejne u çawekanit mewsimî azadiye, ay mewsimî azadiye
Bo bala gerdanî balat qoçî qurbanim were, ay qoçî qurbanim were
Ger bizanî çend peşêwe h´alekem bo ditinit, ay h´alekem bo dîtinit
Sed ewendey zulfekanit dil perêşanim were, ay dil perêşanim were

Seyid Elî Esxerî Kurdistanî / Soranî

# Romanî ha romanî




Romanî ha Romanî hey lo lawo Romanî
Romanî ha Romanî derdî lawo Romanî
Tacê wî rî çi anî hey lo lawo Romanî
Tacê wî rî çi anî derdî lawo Romanî

Cotkar meşe nîlanî hey lo lawo Romanî
Cotkar meşe nîlanî derdî lawo Romanî
Xwedî keçikê dernanî hey lo lawo Romanî
Xwedî keçikê dernanî derdî lawo Romanî

Xewneka wê dernanî hey lo lawo Romanî
Xewneka wê dernanî derdî lawo Romanî
Fîncanê dest û risa hey lo lawo Romanî
Fîncanê dest û risa derdî lawo Romanî

Romanî ha Romanî

Radyoya Êrîvanê

# Saqî




Saqî bom têke şerabî h'ewt sale
Bîxom be silametî ew tenya xale
Le dilî şikawî min dengî sêtarim dê
Xiringey baziney dayîm dê sermestim
ey hawar
Şuşey dilekem şikawe
Bê to bêzar u e'bdalim emşew
Bê to e'bdal u bê h'alim em şew
Erê piyaley dilim şikawe
Çwa ciwan bot denalim
Şêt u şeyde u e'bdalim
Serxoşim min turan
Serxoşim, şêt u e'bdalim
Şuşey dilekem şikawe
Bê to bîmar u e'bdalim ewşo (ew şew)

Bê to e'bdal u bê malim ewşo
Xemzey çawî bazit kûştumî ewşo
Lerey memkolanit kûştumî ewro
Bê roh'im meşkêne dil
Turan bot denalim
Şêt u şeydy çaw kalim
Sermestim ey hawar
Şuşey dilekem şikawe
Bê to bîmar u e'bdalim ewşo
Bê to e'bdal u bê h'alim ewşo
Saqî bo têke sêwkey şest u şeş
Bîxom be silametî cûtê çawî reş
Saqî bom têke şerabî çil u çwar
Bîxom be silametî dû çawî be xumar
Nazdar le kwêy?!...

# Sê mal




Yarê yarê yarê yarê
Yarê yarê yarê yeman
Hersê malê li koşkê yarê
Hersê konê li koşkê yeman
Tajî berda keroşkê yarê
Tajî berda keroşkê yeman
Xwedê hivza me bike yarê
Xwedê hivza me bike yeman
Ji tometê mala xwuşkê yarê
Ji tometê mala xwuşkê yeman

Yarê yarê
Yarê
Hersê malê newalê yarê
Hersê malê newalê yeman
Tajî berda xezalê
Tejî berda xezalê
Xwedê hivza me bike
Xwedê hivza me bike
Ji tometê mala xalê
Ji tometê mala xalê

Yarê yarê
Hersê malê li xetê
Hersê malê li xetê
Tajî berda zer betê
Tajî berda zer betê
Xwedê hivza me bike
Xwedê hivza me bike
Ji tometê mala metê
Ji tometê mala metê
Yarê
Yarê
Têr nabim ji dildarê yarê
Têr nabim ji dildarê yeman

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Ser malê me re




Ser malê me re lê bin malê me re
Ser malê me re lê bin malê me re
Holekê çêkim lê kinkoka xwe re
Holekê çêkim lê kinkoka xwe re
Kin here kêyfê lê min bibe ji xwe re
Kin here kêyfê lê min bibe ji xwe re

Yar yarê yarê lê yar yarê yarê
Şuşanê korê lê xato nemayê
Melhemê çêkin lê ji bez û şemayê
Melhemê çêkin lê ji bez û şemayê
Birînê dila lê derman lê nayê
Birînê dila lê derman lê nayê

Yarê muşî ne lê dostê muşî ne
Yarê muşî ne lê dostê muşî ne
Şarikê serya lê hemu rîşî ne
Şarikê serya lê hemu rîşî ne
Birînê dila lê derman nedine
Birînê dila lê derman nedine

Herêma Serhedê, çavkanî : Şemdin

# Sed birya min zanîbam




Sed birya min zanîbam ew gule mîwanî kêye
Dayma dûa'm bo dekird awedan bê ew dêye
Zêrî hejde eyare u şox u gware le gwêye

Emin çî dî natwanim dûrî to teh'emul kem
Ta kengê xefetî wek mindal be zik rijkem
Espî xeyalatî xom be yadit zîn u cil kem
Didanî umêdî to be berdî xefet kun kem

Hênde giryam paramewe wexte xom kuwêr u gul kem
Ax carêkî helsurê têr têr destit demil kem

Sed birya min...

# Sedo me hoy hoy




Sedo me hoy hoy
Sedo me
Bejin, bilindê
Navteng, ziravê
Birhok, qetranê
Ristkok, mercanê
Memkok, fincanê
Malgok, wêranê
Hoy sedef xanê
Koligoga sedo hiz hizî
Hoy sedef xanê
Her çar kenaran derizî
Sosina çiyagê Kato me
Hoy sedef xanê
Beybûna merga xala me
Wezê berfa çiyagê kêl spî me
Hoy sedef xanê
Wezê berfa çiyagê kêl spî me
Wezê ya lawikê keyfî me
Hoy sedef xanê
Wezê ya lawikê keyfî me

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Selik selik




Selik selik hoy belê
Selik selik hoy nene

Te l'berxwe kir hoy belê
Çitê tenik hoy nene

Têre'd binim hoy belê
Sing û memik hoy nene

Selik hato hoy belê
Ji vî aqarî hoy nene

Te li ber xwe kir hoy belê
Çîtê tarî hoy nene

Têr'd binim hoy belê
Sing û mirarî hoy nene


Çi dawete hoy belê
Berî kûne hoy nene

Dawet xweş kir hoy belê
Mêr û jin e hoy nene

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Selîmo lawo

♩= 108




Hê serwêlî serwêlî Selîmo lawo serwêlî
Kesê ji kêzikê newêrî Selîmo lawo serwêlî
Ji law ra kirine berdêlî Selîmo lawo serwêlî
Rebiyo aykê min nehêlî Selîmo lawo serwêlî
Kirine bûka serbixêlî Selîmo lawo serwêlî

Tava li kulekê reş e Selîmo lawo serwêlî
Keçikan kofiyê xwe girêdan Selîmo lawo serwêlî
Reşrihan kirin nexşe Selîmo lawo serwêlî

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Selîmo




Ha li kendala kendala Selîmo lawo li kendala
Ha li kendala kendala tajî berda xezala

Ha ser wêlî ser wêlî Selîmo lawo ser wêlî
Par keç îsal berdêlî bûme bûka ser bi xêlî

Ha li ezmana ezmana Selîmo law li ezmana
Hanîn berxêd berana taştiya law mêvana

Ha li titûnê titûnê Selîmo law li titûnê
Agir da ser qelûnê ji ta bînim xatûnê

Ha li bêndera bêndera Selîmo law li bêndera
Dileyize bi xencera bûm mêvanê dev zera

Herema Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Selîmo




Ha bi ser hêlî ser hêlî
Selîmo lawo ser hêlî
Kewnêr da pey mariyê
Ramûsim te zeriyê

Ha li zozana zozana
Selîmo lawo li zozana
Dims û rûnê legana
Danî bû li ber mêvana

Ha li titûnê titûnê
Selîmo lawo li titûnê
Danî bû ser qelûnê
Dabûn qelendê xatûnê

Ha li geneka geneka
Selîmo lawo li geneka
Genim ketye xeleka
Kêla wî çû feleka

Min di pacê re mêzekir
Te di pacê re mêzekir
Bizk berda tûncik şekir
Ya min bû xwedê nekir

Herêma Amedê

# Sêmêlê




Hey sêmêlê sêmêlê
Halay hawar sêmêlê
Girgira tirimbêlê
Şer xweş kir berembêlê
Şerê mêran seyran e
Sêmêlê li ber çiya yî
Eskerê li bin deyna yî
Hol çû şerê axa yî
Sêmêlê li ser sê gira
Bû gir gira bedligan
Şere'l banî şemligan
Hati koma leşkera
Topê xwe li ser vegire
Hey gir e gir e gir e
Meydan zengilê gir e
Dîsgotin
Kihêlan nira nira
Şer çû mezra mamxûra
Ertoşî hatin ji dil e
Derbasbûn pira bilbil e
Şer xweş kiro ji nû dil e
Hey givan e givan e
Meydan zengil givan e
Him hima van topan e
Komên gewdan cida ne

Çavkanî : Seydayê Goyan

# Sertene




Erê malê barî kird hey barî kird
Giyane kes neygêrawe dîdekem kes neygêrawe
Erê bo xom danîştim hey danîştim
Giyane dilxoşîm dawe dîdekem dilxoşî dawe
E'mrekem wey çawekem hea dîdekem
E'zîzim sertene hey dîdekem sertene
ReBotan-Behdînanî mibarekit bê hey mibarek bê
Gul u gware u jêrçene hey gul u gwar u jêrçene

Erê xuda deyzanê hey deyzanê
Giyane bo to nexoşim dîdekem bo to nexoşim
Erê xelkî xem dekirê dey xem dekirê
Giyane min xem defiroşim dîdekem xem defiroşim
Erê ta mimkîn debê hey wey debê
Dena her be î'şweye dîdekem her be î'şweye
Erê le wilatî xoman wey wey xoman
Giyane kêwêk diyare dîdekem kêwêk diyare
Erê be qed ew kêwey wey ew kêwey
Giyane xem le dilim bare dîdekem xem le dilim bare
E'mrekem...
E'zîzekem...
ReBotan-Behdînanî...
Gul u...

# Ser govendê




Ser govendê min hilanî
Lavno lêxin bi heranî
Tu rih î rih û can î
Te zû kêfa min anî

Li vî erdî li vî asmanî
Çil hêstirê kermanî
Sed kîs perê siltanî
Min qelenê te anî

Govend li mala bavê ye
Serê govend zava ye
Govend heqê zava ye
Evqas qelen te daye

Govendê mele me
Kirasê bûkê felle me
Zava gelek be xem e
Bûkê bavên li cem e

Çi govendek bi deng e
Kirasê bûkê heft reng e
Bûkê derxin dereng e
Bîna zavê zaf teng e

Radyoya Êrîvanê

# Ser govendê milanî




Ser govendê milanî
Lawlo lêxin heranî
Tu rihê rihê can î
Te zû kêfa min anî

Vî erdî vî ezmanî
Çil hestirê qermanî
Sed kîs perê siltanî (lo)
Min qelenê te anî
Ser govendê...

Govend li mal bava ye
Serê govend zava ye
Govend heqê zava ye (lo)
Ewqas perê tê daye
Ser govendê

Govendê lem e lem e
Kiras bûkê fela me
Zava gelek bê xem e (lo)
Bûkê bavê li cem e
Ser govendê

Çi govendek bi deng e
Kirasê bûkê heft reng e
Bûkê derxe dereng e
Bêhna zavê zaf teng e
Ser govendê

Aramê Tigran, radyoya Êrîvanê

# Serêle




Serêle hey rêle rêle
Hewar e li min î memanê
Digotin
Bedla kurik ji çolan e

Kêjolê hey xemla zêr e
Kakilê hey şev baranê
Serelê hey rêl şîn bûne
Keçikên me çûn dîlanê

Hewar e li min memanê
Kezî hey li bejnê xemilîn
Serelê hey rêl şîn bûne
Hewar e li min memanê

Sorgûlê hey hişîn bûne
Keçkogê hey çend xemilîne
Hewar e li min memanê
Kakilê hey şev baranê

Radmûsim hey çûm bajêr e
Serêle hey rêl hişîn bû
Bedla kurik ji çolanê
Xemila hey narînê spî bû

Bedla kurik ji çolanê
Ramûsim hey çend keyfîn bû
Hewar e li minî memanê

Serêle hey rêl çêbûne
Xemla hey narînê beybûne
Hewar e li minî memanê
Ramûsim hey çend keyfîne

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Sêva sor




Sêva sor hey sêva sor hey sêva sorê
Sêva sor hey sêva sor sor gûla jorê

Derkî zer kil û mercan bizmar dibarî
Xezêmek nêvde qîtan, derkî veke de biçîne jorî


Sêva sor ya'b sêvê ve hey sêva sorê
Xezêmok ser lêvê ve sor gula jorê

Pîroz bit ser bejnê ve hey sêva sorê
Pîroz bit ser bejnê ve sor gula jorê

Sêva sor hişm e hişm e hey sêva sorê
Xirab kir taxa pişt me sor gula jorê

Herêmên Şirnax û Çulemergê, cavkanî : Seydayê Goyan

# Sewze giyan




Besim lê bigre seyzade sere swêy banî
Le min malî zor le toş ciwanî
Eto siparedy xewsî geylanî
Sewze mero sewzelê, barîke tom dewê
Mîwanî rojêm memxere şewê
Min le gerdinî zerdit be wella dû maçim dewê
Meylim be to da nazenîn wam zanî merdî
Nemzanî bo min be qurban her ax u derdî
Her kesê bîka be qurban menî'î dildarî
Per u po derka yarebî wêney pasarî
Birya hî min biway reş esmer to be yekcarî
Sewze mero sewzelê barîkey e'mrim
Tu serî babit...Wa meke demirim

# Sindoye




Sindo ye sindo ye sindikê lê
Sindo ye sindo ye keçikê lê
Sindo bi giya ye
Sindo bi giya ye
Siwaran xar berdaye
Siwaran xar berdaye
Jina rind bela ye
Jina rind bela ye

Sindo ye sindo ye sindikê lê
Sindo ye sindo ye keçikê lê
Sindo bi gidîş e
Sindo bi gidîş e
Siwaran hîşe hîş e
Siwaran hîşe hîş e
Jina rind bexşîş e
Jina rind bexşîş e

Sindo ye sindo ye sindikê lê
Sindo ye sindo ye keçikê lê
Sindo bi genim e
Sindo bi genim e
Siwaran hime hime
Siwaran hime hime
Jina rind hakim e sindikê lê
Jina rind hakim e keçikê lê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Sînem




Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were
Sînem seknî li ser xanî mendolekê dêjîne
Keser seknî li ser xanî mendolekê dêjîne
Bakê seherê lê da xizêm ji poza heltîne
Zer memik bextê te me feqyan ji hucrê derîne
Xeber hatî ji bavê ra dibê Sînem nexweş e
Keser hatî ji bavê ra dibê Sînem nexweş e
Temîn bikin necara çêke kêlikê reş e
Temîn bikin mer û mişka xeranekin çavê reş e

Hoy Sînem
Sînem seknî li ser xanî mendolekê xwe li ba kir
Keser seknî li ser xanî mendolekê xwe li ba kir
Bakê seherê lêda xizêm ji poza duta kir
Zer memik bextê te me feqyan hucre xerakir
Xeber hat ji bavê ra dibê Sînem miriye
Temîn bikin necara çêke kêlkê sipî ye
Temîn bikin mer û mişka xeranekin gula rûye

Herema Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Sînem




Yar Sînemê, Sînemê hawar hawar Sînemê
Yar Sînemê Sînemê siftê lehdê çarşemê
Sînem xeyidî bi çolê ket berê xwe da baniyê
Keser xeyidî bi çolê ket berê xwe da baniyê
Sira seherê lê da tîtka zêran li eniyê
Sînem wez bextê te me wez biçme xerîbiyê

Sînem sekinî li ser xanî mendolekê xwe li ba kir
Keser seknî li ser xanî mendolekê xwe li ba kir
Sira seherê lê da xizêm ji pozê du ta kir
Sînem wez bextê te me tîman gundan xera kir

Yar Sînemê Sînemê hawar hawar Sînemê
Yar Sînemê Sînemê siftê lehdê çarşemê
Sînem xeyidî bi çolê ket berê xwe da baniyê
Keser xeyidî bi çolê ket berê xwe da baniyê
Sira seherê lêda tîtka zêran li eniyê
Sînem wez bextê te me wez biçme xerîbiyê

Sînem sekinî li ser xanî mendolekê xwe dêjîne
Keser sekinî li ser xanî mendolekê xwe dêjîne
Sira seherê lêda xizêm ji pozê dertîne
Sînem wez bextê te me tîman ji gundan derîne

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Sing û berê kewa gozel




Sing û berê kewa gozel elek yaz e
Vê buharê wê xemiliye rez bi rez e
Memkê yarê li bedenê cot kanî ne
Xale sûret mîna gulê kurmancî ne
(Xale sûret mîna konê kurmancî ne)

Gulyê yarê mîna çavê ber buharê
Hev girtine fitil fitil têne xwarê
Ezî li ser kew kubarê bengê xefûr
Hilda deste û lîlandin simê tembûr

Min got yarê tembûr destê min da
helya
Were lawkê xwe keremke cotê gulya
Go beytûlo qor û gulyê me qumaş in
Hingê mîna te bi sewda û bi haş in

Cotê gulya bû cotê malximên fenî
Sazê ket tilî û pêciyê min lerizî
Merg û gelyê elekyazê girtin dûman
Nizam çima buhar li min bû zivistan

Sing û berê kewa gozel elek yaz e
Vê buharê wê ximiliye rez bi rez e
Memkê yarê li bedelê cot kanî ne
Xale sûret mîna gulê kurmancî ne

Aramê Tigran, radyoya Êrîvanê

# Sîpano gaz bi gazoyo




Sîpano gaz bi gazoyo
Kanê Leyloka min Leylo
Wêrano gaz bi gazoyo
Kanê meqûba bi dila

Binê dara bi cewazo yo
Kanê Leyloka min Leylo
Binê dara bi cewazo yo
Kanê meqûba bi dila

Sîpano gaz bi

Xwelî li xortê tolazoyo
Kanê Leyloka min Leylo
Xwelî li xortê tolazoyo
Kanê meqûba bi dila

Sîpano gaz bi

Sîpano çi hindikoyo
Kanê Leyloka min Leylo
Sîpano çi hindikoyo
Kanê meqûba bi dila

Sîpano gaz bi

Me lê çandiye dendiko
Kanê Leyloka min Leylo
Me lê çandiye dendiko
Kanê meqûba bi dila

Sîpano gaz bi

Xwelî li xortê gundikoyo
Kanê Leyloka min Leylo
Xwelî li xortê gundikoyo
Kanê meqûba bi dila

Sîpano gaz bi

Herêma Amedê

# Sivore




Hoy sivore sivore
Şêxê lawo sivore
Sivore sivikê darê
Ji vê darê çû wê darê
Dê bikin qeliya biharê
Hoy sivore sivor e
Sivore sivikê gûz e
Dê bikin qeliya payîzê
Sivore sivikê gûn e
Ji vê gûnê çû wê gûnê
Dê bikin qeliya havînê

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Siwarek hat




Siwarek ji wê da hat mêvanê kê yê
Siwarek ji wê da hat mêvanê kê yê
Telka min deyne ez herme pêşiyê
Şimka min deyne ez herme pêşiyê
Ji pirsê eyb tune tu mêvanê kê yê
Ji pirsê şerm tune tu mêvanê kê yê

Kekê Eyşo me ez birê Fato me
Kekê Eyşo me ez birê Fato me
Wele wez mîr im, mîrê Barava
Bîle ez mîr im, mîrê Barava
Sed û sî siwar berdan nav ava
Sed û sî kelek berdan ser ava
Birê'm zavaye xwedyê van nava
Kekê'm paşaye xwedyê van nava

Wele wez mîr im mîrê Gergerê
Bîle ez mîr im mîrê Gergerê
Sed û sî sal e ez ketme defterê
Sed û sîsal e wez ketme defterê
Birê'm zavaye xwedyê xencerê
Kekê'm paşaye xwedyê xencerê

Wele wez mîr im, mîrê Xinûsê
Bîle ez mîr im mîrê Xinûsê
Sed û sîsal e ez ketme nifûsê
Sed û sîsal e wez ketme nifûsê
Birê'm zava ye xwedyê namûsê
Kekê'm paşa ye xwedyê namûsê

Herêma Amedê

# Sorê




Sorê tu sora min î
Sor gûla latê wo
Sorê tu sora min î
Nêrgiza çiyê wo
Şevê li ber xewa min î
Sor gûla latê wo
Şevê li ber xewa min î
Nêrgiza çiyê wo
Rojê li xiyala min î
Rojê li xiyala min î
Sorê rabe sibe ye
Sorê rabe sibe ye
Sorê rabe nîroj e
Sorê rabe nîroj e
Tavgê dabû beroj e
Tavgê dabû beroj e
Derdê sora min giran e
Tavgê dabû beroj e
Sora min birîn soj e
Sora min birîn soj e
Sorê rabe êvar e
Sorê rabe êvar e
Sihgê girto nizar e
Sihgê girto nizar e
Sora min birîndar e
Sora min birîndar e

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Sosin




Ev sosin sosin sosin sosina li merg û çiyayî
Qîzik cûbûn dilanê hemî bi kemberê badayî
Min ji eşkê ramûsanê aqil li serda nemayî
Te ji derdê ramûsanê aqil û sevda nemayî

Ev sosin sosin sosin sosina li mêrg û nivîsê
Çûbûn dîlanê hemî bi kemberê ku rîsê
Min ji derdê ramûsana aqil û sezda difroşê
Te ji derde ramûsanê aqil û sevda difroşê

Ev sosin sosin sosin sosina li mêrga belek e
Qîzik çûbûn dîlanê hemî bi kemberê xelek e
Min ji derdê ramûsanê aqil û sevda gelek e
Te ji derdê ramûsanê aqil û sevda gelek e

Ev sosin sosin sosin sosina li mêrga hêşin e
Qîzik çûbûn hemî bi kember zîvîn e
Min ji derdê ramûsanê aqil û sevda desine
Te ji derdê ramûsanê aqil û sevda desine

Hesen Cizrawî, radyoya Bexdayê

# Soybe bala berz




Soranî / Gelerî

Soybe bala berz heste beyane
Dem le nawî dem, dest le memkane
Her temê leser kêwî sakîne
Ewe tem niye henasey mine
A'lem leser to le min dujmine
Erê wey soybe giyan xo min yane nîm
Emin xizmî tom be bîlla hîç bêgane nîm
Hêndem sebir kird taqetim birya
Malî sebir şêwê perdey dil dirya
Soybey bala berz, derdit le malim
Ser goy memkeket bidrê le balim
Le dostim derçê, naze giyan bibye h'elalim
Ey ehlî şino êwe u xudatan
Gulekem mindale, kewtote nêwtan
Qedirî wacibe leser hemûtan
Soybey bala berz, derdit le giyanim
Ruh'mî xudat bê, emşew mîwanim
Min be derdî to nâzêdayme dezanim

# Suk bin dey dey




Suk bin dey dey rêk bin dey dey
Tê helken le goranî rêkxen pêtan gurcken xotan
Bo suskeyî u şêxanî

Çawreş were destim bigre şermî nawê le şayî
Le seyran u zemawend u le dol u kêw u çiyayî
De were çaw ciwan bigirîn destan bo şayî bin daranî

Suk bin dey dey...

Le nêw gul u gulzarî deşt çen xoşe bezm u seyran
Le gel dengî dehol u zurna u le nexmey beste u h'eyran
De were çaw ciwan bigirîn destan bo şayî bin daranî

Suk bin dey dey...

# Sûre gul




Çaw estêrey sûre gulekem
Be xuda şêwawe dilekem, ax sûre gulim
Be mergî taqe birakem
Hîç wext feramoşit nakem, ax sûre gul way
Le dinya da taku mawim
Her toy be xuday bînayî çawim, ax sûre gulim xemlîwe

Maltan berew rojhelate
Roh'im kêşikçî balate, ax sûre gul way
Hemû şewe nîwe şewê
Be dayîm roh'im le late, ax sûre gul way
Le her...

Pêm xoşe mîwanî min bî
Hemîşe cîranî min bî, ax sûre gul way
Pêm xoşe mîwanî to bim
Hemîşe cîranî to bim, ax sûre gul way
Le her...

Soranî / Gelêrî

# Şalûlvano




Herêma Amedê

Lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo
Lo lo lo lo lo lo lo lo lo şalûlvano
Hat karwanê kurdîka lo lo lo lo lo lo
Hay karwanê kurdîka lo lo şalûlvano
Danîbû'l Kerxa Kîka lo lo lo lo lo lo
Danî bû li Kerxa Kîka lo lo şalûlvano
Eyşo fato ez kuşt im lo lo lo lo lo lo lo
Eyşo fato ez kuşt im lo lo şalûlvano
Kirme zêrê cênîka lo lo lo lo lo lo lo
Kirme zêrê cênîka lo lo şalûlvano

Hat karwanê Helebê lo lo lo lo lo lo lo
Hat karwanê Helebê lo lo şalûlvano
Danî li binya selebê lo lo lo lo lo lo lo
Danî li binya selebê lo lo şalûlvano
Eyşo Fato ez kuştim lo lo lo lo lo lo
Eyşo Fato ez kuştim lo lo şalûlvano
Kirme darê meqlebê lo lo lo lo lo lo lo
Kirme darê meqlebê lo lo şalûlvano

Hat karwanê Mêrdînê lo lo lo lo lo lo lo
Hat karwanê Mêrdînê lo lo şalûlvano
Danî li gir herînê lo lo lo lo lo lo lo
Danî li gir herînê lo lo şalûlvano
Eyşo Fato ez kuştim lo lo lo lo lo lo lo
Eyşo Fato ez kuştim lo lo şalûlvano
Kirme darê mêzînê lo lo lo lo lo lo lo
Kirme darê mêzînê lo lo şalûlvano

# Şalurvano




(Ey) şalurvan şalurvano
Wey malê min wey wey halê min şalurvano

Şalurvanê gelyerî
Wey malê min wey wey halê min şalurvano
Li van deran çi digerî
Wey malê min wey wey halê min şalurvano
Destmala sor li serî
Wey malê min wey wey halê min şalurvano

Ey şalurvanê beyara
Wey malê min wey wey halê min şalurvano
Tu digerî li ser dara
Wey malê min wey wey halê min şaluevano
Çi digerî li ser dara
Wey malê min wey wey halê min şalurvano

Şalurvan şalurvano
Wey malê min wey wey halê min şalurvano

# Şam lurî




Şam lurî bilurîne
Dergûşa te lawîn e
Şam lurî bilurîne
Bêşiga te zêrîn e

Şam lurî bilurîne
Dergûşa te xal û xet e
Şam luri bilurîne
Axriya we zeynetê

Şam lurî bilurîne
Kal û pira biciwine
Şam lurî bilurîne
Nawê we bi sewî e

Aramê Tîgran, radyoya Êrîvanê

# Şê û şê




Şê û şê ha şê û şê
Şê û şê mihîna şê
Ewkî siwar e li mihîna şê
Zava siwarê mihîna şê
Sor heqîbek li piştê

Şê û şê
Şê û şê
Lê bûkê derî veke
Kulê dilê xwe bi derke
Şê û şê ha şê û şê
Şê û şê mihîna şê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Şedelar




Xuda bîstênê h'eqim le dayet
Min cewrim kêşa, kê nîşte sayet
Şedelar, of şedelar, şedelar, h'akimekey bane
De bêne, bêne maçit kem, dem biçkolane...
Her kesêk neybê dû dost u yarê
Ser bigrê le qûr, subih' u êwarê
Şedelar, ...
Eto lew sere, le h'ucrey h'ewt reng
Eminîş wam lêre xerîb u dilteng
Şedelar...
Detirsim bimirim, çiley zistanê
Qel u dal bimxwa, kes pênezanê
Şedelar, of şedelar, h'akimekey bokan
De bêne, bêne, maçit kem, şoxekey h'alzan

# Şehmêranê




Şehmêranê hey Şehmêranê
Mala bavê hey Şehmêranê
Co kêşane ji behra Wanê
Sê sed kîsên wê lê danê
Ber dilê min belaş danê
Şehmêranê çû ber kaşan
Sê sed kîsan da şabaşan
Ber dilê min hêj belaşe
Şehmêranê çû berberê
Sê sed kîsan lê xerç kirê
Ber dilê min belaş birî
Kehr (kar)ê xendalê hey kehrê xendalê
Were mala min hey kehrê xendalê
Siwarê peya darîşanê
Bûk leylanê rewş xwe danê
Mala bavê hey Şehmêranê

Heremen Şirnax û Çulemerge, çavkanî : Seydayê Goyan

# Şekir axa




Hoy şeng e şeng e
Şekir axa şeng e
Ser mil giran e hey
Milan heft reng e
Mîro (w)ez çi bikim
Hey dîwano teng e
Hoy bênin, bênin
Hey şekir axa bênin
Hoy bênin , bênin
Hey axayo bênin
Ser mil giran e
Hey milan werênin
Heger hêj neyê
Hey kefîlan dêynin
Kefilên dibêjin
Hey emiş wer nakin
Oldaşên dibêjin
Hey emiş wer nakin
Şekir axa siwar e
Wem bê nav nakin
Axawo siwar e
Wem bê nav nakin
Were ji oliyê
Hey were ji oliyê
Xan ismir xan beg
Hey were ji oliyê
Te dest li sîng e
Hey êk li kefiyê
Brînên şekir axa
Hey derbê misriyê
Birînên axayî

Hey derbê misriyê
Were ji kolanê
Hey were ji kolanê
Xan ismir xan beg
Hey were ji kolanê
Birînên şekir axa
Hey derbê xencerê
Te dest li sînge
Hey êk li kêlegê
Brînên şekir axa
Hey derbê tifegê
Birînên axayê
Hey derbê tifegê
Hey bênin bênin
Hey şekir axa bênin
Ser mil giran e
Hey milan werênin
Şekir axahanî
Hey hespê siwar kir
Qonax qonax
Hey hespê siwar kir
Axa siwar bû
Ji hespê peya kir
Cotek demanca
Hey kêlegê kar kir
Birînên şekir axa
Hey kûl û heft reng e
Şekir axa kuştin
Hey axa bê deng e

Herêmên Amed, Bontan û Behdînan

# Şelîlvano




Şelîlvan şelîlvano
Malê min hey malê min
Emrê min şelîlvano
Disgotin
Şelîlvanê Hewêri
Malê min hey malê min
Emrê min şelilvano
Dest kopalê kenêri
Serbextê min tû mêri
Nav şeran xwe di bijêri
Şelilvanê dasinî
Nav şeran xwe di pesini
Şelîlvan da bi deştê de
Şûrê hişîn di mistê de
Ket nav şerê romê de

Herêmên Amed, Bontan û Behdînan

# Şemal hat






Şemal hat bay behare
Pamal deka pejarere
Têkyan pêça hewarçî (xêlatê)
Menzilyan qerax şare
Le nêw kîjî ew ê'ley
Dû çawî yarim diyare

Keziyey weku reşmare
Singî baxçey henare
Gêlgêle u desire u şede
E'lqe u derzîle u gware
Her le yarê min ciwanin
Xwên şîrîn u minalkare


Yarim hate nêw şarî
Bar deken bo hewarî
Têkel bûn le qendîlê
Ê'lî surçî u zurarî
Kiz u girde nişînim
Le swêy çawî be xumarî

Katê royî bo kanî
Çûme seyrî çawanî
Taq bûmewe le malan
Dûr bûm le awedanî
Awirî dawe bo lam bê
E'llamey daykî zanî

Yarî min gerdin kêle
Minalkare u cih'êle
Qewlî pêdam bîbînim
Birêkim lê be fêle
Wek mangî şewî çardey
Diyare le nêw ew ê'le

Sed birya nemdîbaye
Taze xem be kar naye
H'orî beheştim denê
Degel malî dinyaye
Her dû dinyam pê deda
Ger çawî yarêm baye

# Şemal were




Ca çon şêt nebim nedem be xomda
Çon xakî a'lem nekem be serda
H'eyfe bo min u to destman lêk berda
Erê were şemal were, derdî dilekem bo yar bere
Le derdî dilekem, yar bê xebere

Kirdit be a'det pencere nîştin
Mijôl bûn be tîr bo rêbwar kûştin
Erê...
Le...

Sutiyan ne sûtiyan le herdû ser bê
Ne yek bisûtê yek bê xeber bê
Erê...
Le...

Soranî / Gelerî


# Şemamê




Şemamê Şemamê Şemamê bûkê
Domamê domamê domamê bûkê
Şemam bûka mele
Domam bûka mele
Genim da zerdele
Nehişt para mele
Revî çû ser kele
Şemamê tîto vît e
Eslê xwe egît e
Şemamê nan dîpêje
Girkan hildavêje

Herêma Serhedê

# Şemame û şilêre






Şemame u şilêre şemam şilikî
Heste were êre were êre zerd u tenikî
Gunah niye u xêre wey xêre taze u tenikî

Şemam leber nanî wey nanî şemam şilikî
Pencem girt legel ranî eyranî zerd u tenikî

Şemame u şilêre...

Şemamey xet xete xet xete zerd u tenikî
Maçkem ew xal u xete wey xete taze u tenikî

Şemame u şilêre

# Şeng Nazê




Şeng nazê nazê nazê nazoka min
Şeng nazê nazê nazê delalya min
Ewkî ewkî biran e nazoka min
Ewkî ewkî biran e delalya min
...Biran e nazoka min
...Biran e delalya min
Ketne dawên giran e
Ketne dawên giran e

Şeng nazê
Şeng nazê
Ewkî ewkî siwar bû nazoka min
Ewkî ewkî siwar bû delalya min
Ew karker e siwar bû
Ew keko ye siwar bû
Li Amedê peya bû
Li ber malê peya bû

Şeng nazê
Şeng nazê
Qawe xwar û hêsa bû
Qawe xwar û hêsa bû
Serê xesyê qurban bû
Serê xesyê gorî bû
Xwestî rabû pê şa bû nazoka min
Xwestî rabû pê şa bû delalya min


# Şer daweta mêran e




Hoy şer e şer e şer e
Şer daweta mêran e
Meneka girt û pere
Kir tola seyê ker e
Şerê li dûvî evrazî
Çend lawên xencer tazî
Eşîra te(yê) şerazi
Şerê li dûvî nîşûvî
Çend lawên xencer zîvî
Eşîra te(yê) derşûvî
Şerê li dûvî elmakê
Kur biçûkê li ber makê
Cindiyan û cindiyan
De bila bêne meydanê
Sîqan dane misriyan
Nêçîra sibe zûyan
Cindiyan û pismîran
Sîqan dabûn zincîran
Nêçîra sibe zûyan
Hey heyatê heyat
Zor delalê heyatê
Kevroşka li serê latê
Reşît beg jor da hatê
Reşît bego kurtiko
Nav şeran de hindiko

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Şêro Xalid beg




Şêro qutasî cot in
Şêro hey Xalid bego
Mêro hey Xalid bego
Her cotin siwarê li ber tên
Keçikê te wez helandim
Hey şêro qutasî sêne
Heçiya tê siwarê li pê tên
Egîd meşiya li Meydanê
Şere'l mezrabotanê
Kir şerê axir zemanê
Deng da li her aliyê dinê

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Şewe




Şewe lew sewzezare lew demawe
Mekoy xem laçuwe demkul çemawe

Meke laço deman bênin biyanun
Beyane dem binê naw dem nemawe

Şewe dinya weku zulfit siyapoş
Were ba derdî dil bikrên (bikeyin) feramoş

Destim desto ke ba bitgirme baweş
Eger mirdim le xoşiyan çawî to xoş

Be sergerdanî jêr gerdaneket bim
Bala gerdanî bala ciwaneket bim

Ewe tom dî le ser kûştem dekey şîn
Be gorî çawî pir giryaneket bim

Şewe estêre beziriwen le serman
Le mangî rût henasem bote xerman

Tikey awingî kulmit ter deka lêw
Gezo barî le şerman u le german

Mamoste Hejar / Soranî

# Şewqo




De yar yeman yar û yeman
Yar de yar yeman şewqo
Yar yeman yar û yeman
Yar de yar yeman şewqo
Kelha Mêrdîn bilind e
Yar de yar yeman yar û yeman
Li serê mum û find e
Yar de yar yeman şewqo
Mêrdînê ser berjêr e
Yar de yar yeman yar û yeman
Dilkê min maye pê ra
Yar de yar yeman şewqo
Mêrdînê baxçê gula
Yar de yar yeman yar û yeman
Silav li dost û yara
Yar de yar yeman şewqo

# Şêxanî




Hey şêxanî şêxanî
Here lê lê lê here lo lo
Here lê lê lê here lo lo
Hey şêxanî şêxanî
Serbextê min zor ciwan î
Serbextê min zor ciwan î
Mala xwe li Misrê danî
Mala xwe li Misrê danî
Şêxanî tê ji Alan î
Şêxanî tê ji Alan î
Îro roja mêran î
Îro roja mêran î
Xweyê qewmê giran î
Xweyê qewmê giran î
Yek zanî yek nezan î
Yek zanî yek nezan î
Xweyê kerî mihan î
Xweyê kerî mihan î
Şêxanî ji Mamxuran î
Şêxanî ji Mamxuran î
Xweyî kerî bizinan î
Xweyî kerî bizinan î
Şêxanî tû Goyan î
Şêxanî tû Goyan î

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Şile û xanim




Awê golanim germe şile u xanan
Dad helatin bo mêrdan şerme hew hewê mîrê me

Awê golanim tîje şile u xanan
Dad delên ayşan taze kîje hew hewê mîrê me

Awê golanim tale şile u xanan
Dad delên ayşan zor mindale hew hewê mîrê me

Soranî / Gelerî

# Şilêre




Şilêre wey şilêre, şilêre giyan şilêre
Bonxoşe wek kinêre, bonxoşe wek kinêre
Şilêrim çende ciwane, şilêrim çende ciwane
Le begzedey hewlêre, le begzadey hewlêre

Şilêrim hat be lence, şilêre hat be lence
Memkoley çende qince, memkoley çende qince
Were bênye maçit kem, were bêniye maçit kem
Sînet baxî tirunce, sînet baxî tirunce

Şilêrim çende ciwane, şilêrim çende ciwane
Qijî kalî pexşane, qijî kal u pexşane
Were bênye maçit kem, were bêniye maçit kem
Şilêr kîjî kurdane, şilêr kîjî koyiyane

Şilêre wey şilêre, şilêre giyan şilêre
Bonxoşe wek kinêre, bonxoşe wek kinêre
Şilêrim çende ciwane, şilêre çende ciwane
Le begzedey hewlêre, le begzadey hewlêre

Tahir Tewfiq / Soranî

# Şirîn lewendê




Erê lê lê lê şirîn lewendê
Xezala çiya gula ber bendê
Çavê reş kilke biskan tu berde
Guliyê sor şeke berde ser zendê

Azadî gelek şirîn û xweş e
Bê dilî zore wek marê reş e

Erê lê lê lê şirîn lewendê
Xezala çiya gula ber bendê
Çavê reş kilke biskan tu berde
Guliyê sor şeke berde ser zendê

Koçerî xweş e bi berx û miyan
Şara Amudî da ser guliyan

Erê lê lê lê şirîn lewendê
Xezala çiya gula ber bendê
Çavê reş kilke biskan tu berde
Guliyê sor şeke berde ser zendê

Herêma Amedê, çavkanî: Meta Eyşan

# Şîrîn Leylanê




Şîrnê leylanê şîrnê babiçîne seyranê

Qesem be balay çînçînit bem egrîcey jêr poşînit
kafir bum hatime ser dînit şîrnê leylanê...

Çawî reşt be xumarewe memkit sêwe be darewe
xwa pêy dawî meyşarewe şîrnê leylanê...

Curê saqî gware zêrî mey le meyxanê degêrin
aşiqan le dîn werdegêrin şîrnê leylanê...

Qurbanit bim ey bay şewê xew bê le çawim nakewê
dil mecnune u leylay dewê şîrnê leylanê...

Sorani / Gelêrî

# Şîrîn tesî derêsê




Tayêkî rîşeyî dil be nûkî xemzeda da
Destêkî bo sema bird rûbendî mahî lada
Hawar şîrîn giyan
Nafey gulî e'yan bû e'tirî be dem seba da
Barîk u lûs u nasik wek zulfî xawî bada
Wek şaxî gul be lada şîrîn teşî derêsê
Ke kewte çerx u gerdiş teşî be destî rengîn
Hewday le lêw u dem da xurşîdî sîne nesrîn
Hawar şîrîn giyan
Semay be zuzeneb da kefî xezîbî şîrîn
Girtî xetî mudara şefeq be e'qdî perwîn
Sîh'rêke bo dil u dîn, şîrîn teşî derêsê
Nukî teşî be gerdiş qutbêkî çerxî pêwe
Mucrîb bû be dawî ke çerxî kewte nêwe
Şîrîn teşî derêsê
Wek zuhre destî kêşa ke bendî qewsî pêwe
Estêre mahî dagirt sabit kira be pêwe
E'req be rû be rêwe, şîrîn teşî derêsê
Hawar şîrîn giyan
Dugmey kirasî ber bû bizût hewrî beharî
Sewday be a'şiqan da baxî gul u henarî
Hawar şîrîn giyan
E'yan bû penceyî roj be xetî îstîwa da
Be subh'î sadiq engut zexeb le nêw sema da
Hawar şîrîn giyan

# Şîrînê




Şirînê şirînê şemam e
Şemamê çar bîstan î
Bejin rêk û pêk û ciwan
Kesî aramî dillanî
Le ber xatrî balay to dey
Awedan bê Silêmanî
Le ber bejnû balay to
Awedan bê Silêmanî

Yalah ya sultan hawar
Derwanê te burhanê
Seydî kake giyan hawar
Le mezray seholaê
Agadarî yarim bê
Kak Ehmed li Silêmanî

Şirîn şirîn şemam e
Şemamê çar bîstan î
Bejin rêk û pêk û ciwan
Kesî aramî dillanî
Le ber xatrî balay todey
Awedan bê Silêmanî
Le ber bejnû balay todey
Awedan bê Silêmanî

Hatum lelay nalênê
Yar zîzew nam diwênê
Şêxî germiyan û kostan
Xuda le minî nestênê
Şirîn şirîn şemame
Şemamê çar bîstanî
Bejin rêk û pêk û ciwan
Kesî aramî dillanî
Le ber xatrî balay todey
Awedan bê Silêmanî
Le ber bejnû balay todey
Awedan bê Silêmanî

Sîb heynanê la canê
Êwarey barî mêrgan
Çadirê reş malê hilldeyn
Le kostanî zimredan
Le gel yarê danîşîn
Wey bêjin bestew bendan
Şirîn şirîn şemame
Şemamê çar bîstanî
Bejin rêk û pêk û ciwan
Kesî aramî dillanî
Le ber xatrî balay todey
Awedan bê Silêmanî
Le ber bejnû balay todey
Awedan bê Silêmanî

# Şîrînêw xanim




Şîrîne xanim şîrîne xanim kejal giyan wa nabê
Gul bebê mêxek wey bo diyarî nabê

Ne bax bê pergul ne gul bê xawen
Îtir çî fayde giyan bo gul damawin
Şîrînê u xanim...

Şîrîne xanim kejal giyan bawanim
Qiset legel nakem çunke netlawanim
Şîrînê u xanim...

Elmas dûrît ax le dil karkerden
Be sed perçeyen dewa weywey neberden
Şîrînê u xanim...

# Şivanê wan kuviya




Şiwanê wan kuviya geranê
Xwedanê wana kî ye şervanê li ser çiya
Pirça xezalê kesî carê li dest û beriya

Çav reş e çav belek e. Tû li min nede tireki
Çend sal e li te aşik im. Min Cizîrê pirsa te dikir

Xezalê çend delalê. Dicêri li beriya Şengalê
Heft sala li heviya te Mam. Bu qismet kûrê xalê

Berf û baran hatiye. Şil kir pirça deriyê
Wa qîzik û balava zeriya govend tew xweç kiriye

Rûbarik nale nal e riyê te çendî xal e
Sing û bere wê zeryê wek ava kaniya sar e

Hesen Cizrawî, radyoya Bexdayê

# Şorê malim şorê




Derdit le min şore jin
Ba leser to bimkûjin, ba leser to bim kûjin
Dest le balat helnagirim
Gurc be birnew bimkûjin, gurc be birnew bimkûjin
Şorê malim şorê
Derd u dermanim şorê
Her derwa u lêm detorê
Her çend dêt u radebirê
Xwên le birînim deçorê, xwên le birînm deçorê

Derdit le min kalê giyan, derdit le malim kalê
Keziyet bendî reşmalê, keziyet bendî reş malê
Sê gez be gezî kurdî
Baskim le gerdinit alê, baskim le gerdinit alê
To biro babit razî ke
Daykit bo min hîç nalê, daykit bo min hîç nalê
Şorê malim şorê
Derd u dermanim şorê
Her derwa u lêm detorê
Her çend dêt u radebirê
Xwên le birînim deçorê, xwên le birînm deçorê

Desmal h`erîrî dûbar
Mêrdit kird xolim we ser, mêrdit kird xolim we ser
Eger h´ez dekey nemirim
Ter bimşêle reş esmer, wey le dinya bûm derbeder
Şorê malim şorê
Derd u dermanim şorê
Her derwa u lêm detorê
Her çend dêt u radebirê
Xwên le birînim deçorê, xwên le birînm deçorê

Desmal h´erîrî sûre
Wey qedî delêy bilûre, sipiye delêy kafûre
Qise deka be zarî
delêy saz u semture, wey delêy saz u semture
Şorê malim şorê
Derd u dermanim şorê
Her derwa u lêm detorê
Her çend dêt u radebirê
Xwên le birînim deçorê, xwên le birînm deçorê

Çawit esterey şewê
Kulmit dendukî kewê, kulmit dendukî kawê
Baskım bo bike be serîn
Be cût xewman lê bikewê, ey be cût xewman lê bikewê
Şorê malim şorê
Derd u dermanim şorê
Her derwa u lêm detorê
Her çend dêt u radebirê
Xwên le birînim deçorê, xwên le birînm deçorê

# Tacî tacî tacîhane




Tacî tacî tacîhan e
Keçika biçûk e wez mêvan e
Tacî tacî tacîhan e
Keçika biçûk e wez mêvan e

Tacîhanam kember navê
Tacî tacî tacîhan e
Tacîhanam kember navê
Keçika biçûk e wez mêvan e

Kembera zer ketiye navê
Tacî tacî tacîhan e
Kembera zer ketiye navê
Keçika biçûk e wez mêvan e

Min derdê te daye navê
Tacî tacî tacîhan e
Min derdê te daye navê
Keçika biçûk e wez mêvan e

Ez radmîsim te cindiyê
Tacî tacî tacîhan e
Ez radmîsim te cindiyê
Keçika biçûk e wez mêvan e

# Takey azîzim

Moderato




Takey çawerêy yaran bim
Xerîb bim le şaran bim
Takey xemlhelkêşî wan bim
Çaw be girye u giryanim

Ger nemdîtiyewe azîzim
Biro bo xot silamet
Dîdenî yaran azîzim
Giyane kewte qiyamet

Dil zelîl bî bo le kulî
Were bigire samanêk
Zûxawim le dilî helqulî
Girûy girtuwe bo ciwanî

Wêlim be dway derdî dilim
Xerîbim le şaranim
Dest be sîne lare milim
Çaw be girye u giryanim

Dilim deryay bê payan bê
Her ax helkêşî tome
Cêgay xwaz u kanebiyan bê
Yekcar pejarey tome

# Taqê beleko yeman




Hoy yeman, yeman, yeman
Yar yeman
Hoy yeman, yeman, yeman
Yar yeman
Taqê beleko yeman
Yar yeman
Kul ket nêv êla meman
Kul ket nêv êla meman
Ecevê kit jê neman
Ecevê kit jê neman
Taqê belek bêm reş e
Taqê belek bêm reş e
Bişkojik bîst û şeş e
Bişkojik bîst û şeş e
Cîhê dosta min xweş e
Cîhê dosta min xweş e

Taqê belek gulgulî
Taqê belek gulgulî
Kesk û sorê xemilî
Kesk û sorê xemilî
Kovana ser vê dilî
Kovana ser vê dilî
Taqê belek bêm spî ye
Taqê belek bêm spî ye
Bişkojek sê rêzî ye
Bişkojek sê rêzî ye
Cîhê dosta min niye
Cîhê dosta min niye

Aramê Tigran, radyoya Êrivanê

# Tarik nînayê Şemo




Malka Şemo ber çiyayê ye
Tarik nînayê Şemo tarik nînayê Şemo
Malka Şemo ber çiyayê ye
Tarik nînayê Şemo şîşkê mîşkê ecemo

Berfê baranê dayê da
Tarik nînayê Şemo tarik nînayê Şemo
Berfê baranê dayê da
Tarik nînayê Şemo şîşkê mîşkê ecemo

Malka Şemo li devê rê ye
Tarik nînayê Şemo tarik nînayê Şemo
Malka Şemo li devê rê ye
Tarik nînayê Şemo şîşkê mîşkê ecemo

Keleş lawkê mindê ye lê
Tarik nînayê Şemo tarik nînayê Şemo
Keleş lawkê mindê ye lê
Tarik nînayê Şemo şîşkê mîşkê ecemo

Hero dîna min tê ye lê
Tarik nînayê Şemo tarik nînayê Şemo
Hero dîna min tê ye lê
Tarik nînayê Şemo şîşkê mîşkê ecemo

*Zadîna Şekir, radyoya Êrîvanê*

# Tasek ava camiyê




Herê lê lê were lê lê
Herê lê lê wer Fatimê
Wele ewkî kirme dîno
Wele Fato kirme dîno
Tasek ava camyê bîno
Nava memka nîm û xwîno

Herê
Herê
Wele ewkî kirme xaro
Wele Fato kirme xaro
Tasek ava camyê xwaro
Nava memka kul û jaro

Herê
Herê
Wele ewkî kirme mesto
Wele Fato kirme mesto
Tasek ava camyê xwesto
Nava memka zîwan kesto
Here lê lê werelê lê
Here lê lê wer fatimê

# Tazya me yê şêrîn e




Tazya me ye şêrîn e ew teşkîla lêmin e
Tazya me ye şêrîn e ew teşkîla lêmin e
Lêmin hîme we nedaye em rê xweda deh salî ye
Lêmin hîme we nedaye em rê xweda deh salî ye

Deh saliye emrê naze bo xwe bûye azad e
Deh saliye emrê naze bo xwe bûye azad e
Bona hemû miraze weke rojê ber çava
Bona hemû miraze weke rojê ber çava

Anye eşqê û şahiyê wê cûma ev şadî ye
Anya eşqê û şahiyê wê cûma ev şadî ye
Daye mere dil şahiyê û û ronî vedikeve
Daye mere dil şahiyê û û ronî vedikeve

Tazya me ye şêrîn e ew teşkîla lêmin e
Tazya me ye şêrîn e ew teşkîla lêmin e
Lêmin hîme we nedaye emrê xweda deh salî ye
Lêmin hîme we nedaye emrê xweda deh salî ye

# Te ez dîm kirim




Ez ne dîn im te ez dîn kirim haylê dînê
Ez ne dîn im te ez dîn kirim tew tew dînê

Çol û peza ra wer kirim haylê dînê
Ez kofî bûm kedî kirim tew tew dînê

Konê bavê te giran e haylê dînê
Şûnka bavê te giran e tew tew dînê

Bar kirî ga û garan e haylê dînê
Tirsa min ji Roma giran e tew tew dînê

Konê bavê te hindik e haylê dînê
Bar kirî ga û golik e tew tew dînê

Tirsa min ji Roma hindik e haylê dînê
Tirsa min ji Roma hindik e haylê dînê

Vî Ferhatê bi nale nal e haylê dînê
Vî anderî bi nale nal e tew tew dînê

Ber xwe anî qoc û qal e haylê dînê
Memkê dînam sêvê tal e tew tew dînê

Vî Ferhatî bi xurşe xurş e haylê dînê
Vî anderî bi xurşe xurş e tew tew dînê

# Te got te va hatim




Te got te va hatim nabînim ha xwendim
Tava sibê va derketye dilê min jî tev lêketye
Çavê min li riya te qetya ka nayê dimayê

Tavê da ser çava û ez şandim va xema
Min go tev de were meçe min ber kula neke heft car
Ba min rûne de a qence delala dilê min

Dilê min xişûşe go tu belî na şûşe
Boy te ketime deşt û çolê
Bûme hişka çiyayê golê çawa dikim
Nayê yolê halê min ê çawa be

Roj diçe ber ava işiq nema van çava
Min ji te ra va qebûl kir û stiyê xwe riya te xwar kir
Te çavê xwe ji kêra kil kir ez hiştime bitenê


# Te memik robariyo




Hêy hêy te memik û te memik
Te memik robariyo
Hey hey tû li ber min veke bendik
Te memik robariyo
Hêy hêy tû memikan ne berde
Te memik robariyo
Hey hey ramûsim her dû memik
Te memik robariyo
Hêy hêy te memkên van keçano
Te memik robariyo
Hey hey sêvikên serê tano
Te memik robariyo
Hêy hêy ew para aşiqano
Hêy hêy te memkên jine biya
Hêy hêy eyarê fisto biye
Hêy hêy ew para van gundiyan

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Tebarek




Hoy tebarek, tebarek
Hûseynila tebarek
Hûseynila tebarek
Şahiya te bimbarek
Şahiya te bimbarek
Ramûsim rojê carek
Ramûsim rojê carek
Hûseyn ê pîrê Fatê
Hûseyn ê pîrê Fatê
Sîware li hespê qatê
Sîware li hespê qatê
Qonaxek bîr hîkmetê
Qonaxek bîr hîkmetê
Huseyn ê pîrê pîrê
Huseyn ê pîrê pîrê
Sîware li hespê pîrê
Sîware li hespê pîrê
Qonaxek bîr Cizîrê
Qonaxek bîr Cizîrê

Çûme çiyaki hilori
Çûme çiyaki hilori
Bin de deşta mizori
Bin de deşta mizori
Mihvani kofî sorî
Mihvani kofî sorî
Çûme çiyakî Behdînan
Çûme çiyakî Behdînan
Bin de deşta Merxînan
Bin de deşta Merxînan
Mihvanî kofî şînan
Mihvanî kofî şînan
Çûme çiyakî Kêlêwo
Çûme çiyakî Kêlêwo
Bin de deşta Skêtêwo
Bin de deşta Skêtêwo
Mêhvanî yarê lêwo

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Taberek




Tebarek ha tebarek
Ahmed axayo tebarek
Tebarek ha tebarek
Kekêm zava ye bimbarek

Çûm Helebê yek carek
Ahmed axayo tebarek
Hine anî yek barek
Kekêm zava ye bimbarek
Heçî mala qîz tê da
Ahmed axayo tebarek
Serê malê leganek
Kekêm zava ye bimbarek
Heçî mala bûk tê da
Ahmed axayo tebarek
Serê malê sihanek
Kekêm zava ye bimbarek
Heçî mala pîr tê da
Ahmed axayo tebarek
Bi heft mala wirwarek
Kekêm zava ye bimbarek

Çi bîrek binî kûr e
Ahmed axayo tebarek
Çi bîrek binî kûr e
Kekêm zava ye bimbarek

Kevirê binî ferfûr e
Ahmed axayo tebarek
Kevirê binî ferfûr e
Kekêm zava ye bimbarek
Me bûk anî ji dûr e
Ahmed axayo tebarek
Me bûk anî ji dûr e
Kekêm zava ye bimbarek

Çi bîrek binî teng e
Ahmed axayo tebarek
Çi bîrek binî teng e
Kekêm zava ye bimbarek
Kevirê binî heftreng e
Ahmed axayo tebarek
Kevirê binî heftreng e
Kekêm zava ye bimbarek
Me bûk anî dereng e
Ahmed axayo tebarek
Me bûk anî ji dereng e
Kekêm zava ye bimbarek

# Tenke






Kifnekem bibirin be mewday miqest
Şert bê meyleket bernedem le dest
Minway tenkewe tenkey şîrazî
Ser pencey sur kird bo pencebazî
Be malî dinya bom nabê razî

Çawim pir le xwêne dekulê henawim
Çende bê ruh'mî min bot nemawim
Çende bê ruh'mî min bot sûtawim
Minway tenkewe tenkey mal wêran
Ya be dostim bî ya be dezgîran

Tenke bo xatirî h'ezretî dawid
Xo min şêtî tom sûtawim le tawit
Minway...
Ya be...

We bîrit naye şewanî şadî
Le rêgay to da çendim cefa dî
Minway...
Ya be...

# Tenûne




Wê li tenûnê wê li tenûnê
He kulav reşo wê li tenûnê
Kerkê berxan ber şevînê
He kulav reşo wê li tenûnê
Zozan xweş bûn de biçinê
Wê li tenûnê nêv kêvaran
Berxik berdan çû palinê
Kerkên pezan çûn şevinê
Yara Reşo ne diyar e
Kerkên pezî berde xwar e

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Teşiya min dara ji darê




Teşiya min dara ji darê lê lê
Bejin ziravê ta bi rihanê
Teşiya min dara ji darê lê lê
Çavikê min dît dilkê min dît dîlber meşiya bi eywanê

Lê dirêsim mûyê karê lê lê
Bejin ziravê ta bi rihanê
Lê dirêsim mûyê karê lê lê
Çavikê min dît dilkê min dît dîlber meşiya bi eywanê

Teşiya min dara ji gezê lê lê
Bejin ziravê ta bi rihanê
Teşiya min dara ji gezê lê lê
Çavikê min dît dilkê min dît dîlber meşiya bi eywanê

Lê dirêsim hiriya pezê lê lê
Bejin ziravê ta bi rihanê
Lê dirêsim hiriya pezê lê lê
Çavikê min dît dilkê min dît dîlber meşiya bi eywanê

Teşiya min dara ji biyê lê lê
Bejin ziravê ta bi rihanê
Teşiya min dara ji biyê lê lê
Çavikê min dît dilkê min dît dîlber meşiya bi eywanê

# Teşiya te




Teşiya te ji dara bi darê mi go bejin ziravê ta rihanê
Kuliya te ji dara bi darê mi go bejin ziravê ta rihanê
Lê dirêsa mûyê karê mi go

Cavkê xwe mi dî
Dilkê xwe heband
Diranê xwe sikand
Gavka dinê derka hanê
Dîlber meşiya li eywanê

Teşiya te ji dara merxê mi go bejin ziravê ta rihanê
Kuliya te ji dara merxê mi go bejin ziravê ta rihanê
Lê dirêse liva berxê mi go

Dîsgotin

Teşiya te ji dara biyê mi go bejin ziravê ta rihanê
Kuliya te ji dara biyê mi go bejin ziravê ta rihanê
Lê dirêse hiriya miyê mi go

Dîsgotin

Têşiya te ji dara gezê mi go bejin ziravê ta rihanê
Kuliya te ji dara gezê mi go bejin ziravê ta rihanê
Lê dirêse hiriya pezê mi go

# Teşiyê ha teşiyê




Teşiyê ha teşiyê
Bûka mala bûka mala bavê min
Teşiyê ha teşiyê
Teşkêlandiye teşkîlandiye qama min

Lê ristiye hiriya miyê
Bûka mala bûka mala bavê min
Lê ristiye hiriya miyê
Teşkêlandiye teşkîlandiye qama min

Teşiyê ha teşiyê…

Çêkin cihêzê zeriyê
Bûka mala bûka mala bavê min
Çêkin cihêzê zeriyê
Teşkêlandiye teşkîlandiye qama min

Teşiyê ha teşiyê…

Teşiya dara gûzê
Bûka mala bûka mala bavê min
Teşiya dara gûzê
Teşkêlandiye teşkîlandiye qama min

Teşiyê ha teşiyê…

Teşiya dara gûzê
Bûka mala bûka mala bavê min
Lê ristiye hiriya pezê
Teşkêlandiye teşkîlandiye qama min

Teşiyê ha teşiyê…

Çêkin cihêzê gevezê
Bûka mala bûka mala bavê min
Çêkin cihêzê gevezê
Teşkêlandiye teşkîlandiye qama min

Teşiyê ha teşiyê…

Teşiya dara erxê…
Çêkin cihêzê zelîxê...

Teşiya dara darê...
Çêkin cihêzê bêzarê...

Herêma Amedê

# Tew tew canê




Tew tew tew tew tew canê
Tew tew tew tew tew canê
Tew tew tew tew tew canê
Xweziya min bi sala wanê

Xweziya min bi sala wanê
Em hatin Ayîtanê
Em hatin Ayîtanê
Tew tew bax û bostane

Tew tew bax û bostan e
Em dikin kêf û bi seyran e
Em dikin kêf û bi seyran e
Li nava Ayîltan e

Tew tew tew tew tew canê
Tew tew tew tew tew canê
Yek cane yek sêvan e
Ya çiçî ya gul can e

Ya çiçî ya gul can e
Her sê zeriyê kurdan e
Her sê zeriyê kurdan e
Em hevr a tev meşiyane

Em hev ra tev meşiya ne
Em hatin Erîwanê
Her sê yekê gulanê
Em dikin kêf û bi seyranê
Em dikin kêf û bi seyranê
Bi sayanî dinya ne
Bi sayanî dinya ne
Li dinyayê tev dane

Tew tew tew tew tew canê
Tew tew tew tew tew canê
Tu bi nermê xeberdanê
Tew bêkê xet û qurbanê

Radyoya Êrîvanê

# Teze me




Teze me wez teze me tak rihana'z teze me
Teze me wez teze me res killê cavê te me
Singê min zinarê mesîl tak rihana'z teze me
Lewa min kaniya asîl reş kilê cavê te me

Beyto xeyda hesarê gul kemilîn buharê
Rûkê min sor û spî wek dendika hinarê
Cot kezî li nava mila wek gûliyên cînarê
Li ser kanî û zêviyan ramûsan nayên jimarê

Mereto û xezali lawiko tu pir delalî
Xwezî tu bûbyay malxwo ey bûbûma bermalî
Dûr ketim ji ber çavên te min hiştî bi wî halî
Ji hemû hêla bîrindar ketme tora wî kalî

Ji mewa mewa beyar tak rîhana'z teze me
Di bin da markî te yar reş kilhe çavê te me

Herêma Amedê

# Tîl belbenê


Moderato




Tîl belbenê belbenê
Tila li belbenê belbenê
Tila li belbenê belbenê
Tîl belbenê belbenê
Zêrê li gerdenê berçemê
Zêrê li gerdenê berçemê
Tîl belbenê em cot in
Tîl belbenê em cot in
Tîl belbenê em sê ne
Tîl belbenê em sê ne
Keziyên ser milan tê ne
Keziyên ser milan tê ne
Bihna memkên yarê ne
Bihna memkên yarê ne
Tîlbelbenê em çar in
Tîlbelbenê em çar in
Keziyên ser milan xwar in
Keziyên ser milan xwar in
Nextê yarê xwinkar in
Nextê yarê xwinkar in

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Tincoliyê




Tincoliyê loryê loryê
Hoy delalê gerden moryê
Tincoliyê wisa wisa
Hoy delalê wisa wisa
Hilhilê nava garisa
Hilhilê nava garisa
Fincanê li dest fêrisa
Fincana li dest fêrisa
Bi dest girt û rû di ramûsa
Bi dest girt û rû'd ramîsa
Mi'd go bes te digo dîsa
Mi di go bes te'd go dîsa

Tincoliyê
Hoy
Tincoliyê çima çima
Hoy delalê çima çima
Hilhilê nava genima
Hilhilî nava genima
Fincanê li dest hakima
Fincana li dest hakima
Bi dest girt û rû di ramûsa
Bi dest girt û rû'd ramîsa
Mi di go bes te 'dgo çima
Mi'dgo bes te digo çima

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmi Akyol

# Tirên hato




Herêma Amedê

Hato hato lo tirên hato
Hato hato lo qoşmez hato
Hat tirêna lo Diyarbekir
Hat qoşmeza lo Diyarbekir
Li îstasyonê lê minawre kir
Li îstasyonê lê minawre kir
Vagon vagon lê yoxilme kir
Vagon vagon lê oxilme kir
Lawkê'm tê da bû mi nas nekir
Dosta'm tê da bû mi nas nekir

Hato
Hato
Hat tirêna lo atmîşliya
Hat qoşmeza lo atmîşliya
Girya dayka lo ecemiya
Girya dayka lo ecemiya
Esker kişyane mewziya
Esker kişyane mewziya

Hato
Hato
Hat tirêna lo Qurtelanê
Hat qoşmeza lo Qurtelanê
Topê wan jî lo li ser tanqanê
Topê wan jî lo li ser tanqanê
Esker kişya lo ser qerwanê
Esker kişya lo ser qerwanê

# Tobe Eyşanê




Her tobe tobe li min
Tobe Eyşanê way
Her tobe tobe li min
Berxê tu can î way

Bejna Eyşanê li min
Kela gavana way
Bejna wey bavê li min
Kela gavana way
Hoste berdanê li min
Gihandne ezmana way
Hoste berdanê li min
Gihandne ezmana way
Ser sîngê Eyşê li min
Berfa zozana way
Ser sîngê Eyşê li min
Berfa zozana way

Bejina Eyşanê li min
Tura mêwêyo way
Bejina way bavê li min
Tura mêwêyo way
Şîn dike beriyê li min
Devkê xetêyo way
Şîn dike beriyê li min
Devkê xetêyo way
Eyşan me dixaze li min
Kilê subhêyo
Eyşan me dixaze li min
Kilê subhêyo

Bejna Eyşanê li min
Kela hesinî way
Bejina wey bavê li min
Kela hesinî way
Hoste berdanê li min
Şagirt sekinî wey
Hoste berdanê li min
Şagirt sekinî wey
Ser singê Eyşê li min
Behra bê binî
Ser singê Eyşê li min
Behra bê binî

Kela li tûm e
Hewarek rabû pêde diçûme
Ser singê
Eyşê teqdîr dibûme

Herêma Amedê

# Tobe nakim




Ez tobe makim were lê lê
Ez tobe makim way
Ya şêx mihemed were lo lo
Ez tobe nakim way

Gel poşî reşa were lê lê
Dîlanê nakim way
Gel poşî reşa delalê
Dawetê nakim way

Dunyay pûç e were lê lê
Nezerê nakim way
Dunya mirin e delalê
Nezerê nakim way

Hindî keçik e were lê lê
Sêva şîrîn e way
Hindî qîzik e delalê
Sêva şîrîn e way

Sed maça lê bide were lê lê
Gune tê nîne way
Sed maça lê bide
Delalê gune tê nîne way

Dunya mirin e were lê lê
Çi feyde nîne way
Dunya mirin e delalê
Çi feyde nîne way

Hindî keçik e were lê lê
Gula ber rokê way
Hindî qîzik e delalê
Gula ber rokê way

Sed maça lê bide
Were lê lê Xala qirikê way
Sed maça lê bide
Delalê xala qirikê way

Dunya mirin e were lê lê
Çi feyde nake wey
Dunya mirin e delalê
Çi feyde nake wey

Herêma Amedê

# Tobe




Ew çawaney helyan dênî
Be kile u derman, deyan rengênî
Roj niye mirdûm lê nemirênî
Bo çi lêm zîzî u namdiwênî
Tobe tobe, tobe tobe
Tobey, mergime
Yarî min Torawe
Kizey cergime
Çawit reşe degel birot
Bew xalaney dewirî lîmot
Dayikit maçkem? Yan her bo xot
Gerekî Xirê em ber, ew ber
Awî guncêy weku kewser
Le bo to nemam reş esmer
Wexte le dîn biçime der
Le ser çî zîzî kiçê giyane
Bo to mirdim wey malwêran

Roh'î minit bê be qurban
Dile esîr u sergerdan
Yarî min, mal le êran
Bo to mirdim mal wêran
Xemî xome u derdî diwan
Reng zerdî tom wek mirduwan
Beqa meke be kiçe tîwan
Ey rendî malim rendî
Kiçê singit karxaney qendî
Maşella rend u mendî
Le ser çîm lê dilmendî?
Daway maçêkim lê kird
Dayimê be rend u mendî
Silêmanîm şarî kone
Lêy dexiwênê seqir u sone
Daxo yarim h'alî çone?
Weku rêh'aney be bone

# Tol meçine




Tol meçine meçine meçine
Tolikê meçin giya ye
Li binya mala kem daye
Ewkî tê da razaye
Keko tê da razaye
Deng lê nekin zava ye
Zavay mala xala ye

Herêma Amede

# Torî ne




Herêma Amedê

Torî ne em torî ne
Keçkê yeman em torî ne
Torî ne em torî ne
Sebra dila em torî ne

Kurtikê bi gulî ne
Keçkê yeman em torî ne
Kurtikê bi gulî ne
Sebra dila em torî ne

Ser bana runiştî ne
Keçkê yeman em torî ne
Ser bana runiştî ne
Sebra dila em torî ne

Eşqê keçkê bi kezî ne
Keçkê yeman em torî ne
Eşqê keçkê bi kezî ne
Sebra dila em torî ne

Torî ne ne ji van dera
Keçkê yeman em torî ne
Torî ne ne ji van dera
Sebra dila em torî ne

Govend geriya li bêdera
Keçkê yeman em torî ne
Govend geriya li bêdera
Sebra dila em torî ne

Govenda seran sera
Keçkê yeman em torî ne
Govenda seran sera
Sebra dila em torî ne

Torî ne em torî ne
Keçkê yeman em torî ne
Torî ne em torî ne
Sebra dila em torî ne

# Tozirme




Tozirme ha tozirme ha cano dîno lo tozirme
Tozirme ha tozirme ha cano dîno lo tozirme

Min go qere qawirme ha cano dîno lo tozirme
Min go qere qawirme ha cano dîno lo tozirme

Dewetê gurme gurme ha cano dîno lo tozirme
Dewetê gurme gurme ha cano dîno lo tozirme

Ez çûme Diyarbekir ha cano dîno lo tozirme
Ez çûme Diyarbekir ha cano dîno lo tozirme

Bazara şara te kir ha cano dîno lo tozirme
Bazara şara te kir ha cano dîno lo tozirme

Radyoya Êrîvanê

# Tu dizanî




Lawiko Mîrzo tu dizanî bi ha
Tu dizanî hay tu dizanî
Lawiko Mîrzo tu dizanî bi ha
Sed kul mala tu dizanî

Qedrê zeriya nizanî
Lawiko Mîrzo tu dizanî
Qedrê zeriya nizanî bi ha
Sed kul mala tu dizanî

Zeriya min hatibû der da
Lawiko Mîrzo tu dizanî
Zeriya min hatibû der da
Sed kul mala tu dizanî

Fîno kofî serî da
Lawiko Mîrzo tu dizanî
Fîno kofî serî da
Sed kul mala tu dizanî

Wez şerma rabûm berda
Lawiko Mîrzo tu dizanî
Wez şerma rabûm berda
Sed kul mala tu dizanî

Lawiko Mîrzo...

Herêma Amedê

# Tu miraza xortan î





Tu miraza xortan î lê dînê
Lêlê dînê lê dînê tew dînê
Gerden sî û sê qor mircan lê dînê
Lêlê dînê lê dînê tew dînê

Tu ciwata xortan î lê dînê
Lêlê dînê lê dînê tew dînê
Destê xwe bide destê min lê dînê
Lêlê dînê lê dînê tew dînê

Herêma Amedê

# Tuxwa şivanan




Nîwe şewe dinya xamoş
Dête gwêm ahengêkî xoş
Ahengêkî giyan perwere
Şadî hêne, xefet bere
Ahengêkî dil newaze
Tare, yolone, ya saze
Na... Na... Ahengî bilwêre
Ca mere gwêy bo radêre
Hezar xozgem be xot şiwane
Ke bew mange şewe ciwane
Danîştûy le rijd u heldêr
Pence debizêwî le bilwêr
Degel tebîe't hawdemî
Şadî, be keyfî, bê xemî
Axaş be noker nagirî
Wek min le daxa namirî
Were şiwane hemû şewê
Nîwe eşwê, katî xewê
Lew kêw u niwale zenwêre
Tê tûrêne lew bilwêre
Leser tiropkî ew kêwe
Pence le bilwêr bibizêwe
Ba kêweke deng datewe
Şaî'rîş xew bîbatewe

# Tuzik




Tuzik li ser ava ye
Av li binya mala ye
Pir nexweşe bela ye
Tuzik dermanê dila ye

Baranê reşe reş e
Pir nexweşe navêş e
Tuzik jê ra bi pêj e
Tuzik dermanê dilêş e

Keçik çûne tuzikê
Xort diçûne pêsikê
Dest avête bendikê
Avê avête navikê

Pirê rabû ser piya
Gazî kire gûndiya
Emaneta tuzikê
Tuzik heyata hemûya

Aramê Tigran, radyoya Êrivanê

# Urmiye Urmiye




Urmiye Urmiye lê bi lê gulê lê bi lê gulê lê lê
Urmiye Urmiye sîng sedefê dev çûçûkê poz bijingê enî gewherê canê

Kina min ne zeriye lê bi kinê lê bi lê kinê lê lê
Kina min ne zeriye sîng sedefê dev çûçûkê poz bijingê enî gewherê canê


Erdîş e Erdîş e lê bi lê kinê lê bi lê kinê lê lê
Erdîş e Erdîş e sîng sedefê dev çûçûkê poz bijingê enî gewherê canê

Ew qîza çawîş e lê bi lê kinê lê bilê kinê lê lê
Ew qîza çawîş e sîng sedefê dev çûçûkê poz bijingê enî gewherê canê

Pêşê da kişmîş e lê bi lê kinê lê bilê kinê lê lê
Pêşê da kişmîş e sîng sedefê dev çûçûkê poz bijingê enî gewherê canê

Herêma Amedê

# Wa ji hemamê





Wa ji hemamê derketiye way limin way li min
Bi xêlî û pûşî ye way li min way memik sip
Cergê dilê min ew sotiye way li min way memik sip -

Wa ji hemamê derketî car way li min way memik sip
Çavê reşê sûret hinar way li min way memik sip
Ewya biçûk cergê min sot way li min way memik sip

Wê ji hemamê derketi car way limin way memik sip
Cavê resê suret hinar way li min way memik sip
Cergê min ji ew anî xor way li min way memik sip
Cemala wî ji leyl û nehar way li min way memik sip

Herêmên Amed û Serhedê, çavkanî : Eyşe Şan

# Wa meke




## WA MEKE

Sorani / Gelêri

Çawit şîne pirçit kal
Ebrot perî reş dal
Detbem u detrifênim
Wêney mayînî şêxe zal
Roh'mî xêrit bê lêw al
Ew dilem bot bû , bew e'bdal
Qedit le bo kembere
Basikit ciwan bo xirxal
Wa meke, wa meke, wa meke
Daykim diyare u abirum çû
De were, de were têkel bîn
Bo tom awir tê ber bû
Çaw bazî ebro kewan
Roh'm bo to bû mîwan
De were deste milanit bim
Şewan hetaku rojan
Awirit le min berdawe
Daykî minit bê be qurban
Eminit bo? Destew ejno
To jinî guley mêrdan

# Wê li bin darê




Wê li bin darê lê lê lê
Li binê darê way way
Min dihejîne lê lê lê
Rîşyên çarê way way
Qeda bikeve lê lê lê
Bextê yarê way way
Wê li bin guzê lê lê lê
Binê gûzê way way
Xweş zozanko lê lê lê
Binê gûzê way way
Min dihejîne lê lê lê
Rîşyên hî zê way way
Qeda bikeve lê lê lê
Bextê qîzê way way
wê li bin biyê lê lê lê
Binê biyê way way
Xweş zozanko lê lê lê
Binê biyê way way
Min dihejîne lê lê lê
Rîşyên kefiyê way way
Qeda bikeve lê lê lê
Bi nevîniyê way way

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Şeydayê Goyan

# Wek qumrî




Bîstûme şîrînît dexûrê
Leser dilim bû be girê
Ahî min bedkarman bimrê
Ey wey wey wey barane
Wek qumrî serbalim şîne
Deçirîikênim bem hawîne
Esmeran xwênyan şîrîne
Ey wey wey wey barane
Bîstûme delên torawî
Be bejinit wêney lawlawî
Bedkarman reş bêt henawî
Ey wey wey wey barane
Tenya gulekey seh'ray çînim

Demewêt tawêk bitbînim
Ca derçêt giyanî şîrînim
Ey wey wey wey barane
Tenya gulekey le bokanî
Şox u şeng u mîhrebanî
Maşella şîrîn zubanî
Ey wey wey wey barane
Çawim be çawe kaleket
Lêwim be lêwe aleket
Bibînim xet u xaleket

Soranî / Gelêrî

# Welato




Hey welato welato
Werin werin bibînin

Avê li golan cemînin
Nîsk û nokan biçînin

Dinya sot û vemirînin
Werin werin hesab kin

Avê li golan cema kin
Dinya sot û xera kin

Hey welato beyaro
Me lê çando xeyaro

Xwelî li xelkê beyaro
Hey welato beyaro

Me lê çando sosino
Xwelî li xelkê jino

Hey welato pîvazo
Me lê çando soryazo

Xwelî li xeklê tolazo

Herêma Amedê

# Wele govend ranabe






Wele govend ranabe
Bîle govend ranabe
Xwelî li mêrê xirab be
Rûdinê qet ranabe
Radizê şiyar nabe
Loy loy lolo loy lolo loy lolo loy

Ewa hat û ewa çû
Siwar hat û peya çû
Çavê min bi çavê reş ket
Hiş û aqlêm pê re çû

Wele govend ranabe
Bîle govend ranabe
Xwelî li mêrê xirab be
Rûdinê qe ranabe
Radizê şiyar nabe
Loy loy lolo loy lolo loy lolo loy

Min dî li gir fitilî
Eynik danî xemilî
Xwezî min gewra xwe bidya
Li ser kewna ewilî
Wele govend ranabe

Bîle govend ranabe
Xwelî li mêrê xirab be
Rûdinê qe ranabe
Radizê şiyar nabe
Loy loy lolo loy lolo loy lolo loy

Berçem berçem diçûme
Benîştê xwe dicûme
Leqayî yarê bûme
Yar kenî pê şa bûme

Wele govend ranabe
Bîle govend ranabe
Xwelî li mêrê xirab be
Rûdinê qe ranabe
Radizê şiyar nabe
Loy loy lolo loy lolo loy lolo loy

Lêlê lêlê lê Xecê
Pişta xwe bide derencê
Ramîsanek bide min
Bavê te here hecê

Wele govend ranabe
Bîle govend ranabe
Xwelî li mêrê xirab be
Rûdinê qe ranabe
Radizê şiyar nabe
Loy loy lolo loy lolo loy lolo loy

Ha di cî da di cî da
Mala apê hecî da
Ramîsanek bide min
Bin lihêfa spî da

# Wele keçik e




Wî wele keçik e, bile keçik e
Wî wele keçik e bile keçik e
Wî seri fino ye binda telik e
Wî guhi guhar e, guharê gupik e

Wî pozi xizêm e xizêm sirik e
Wî dikim ramûsim nizam çi dike
Bejna keçikê dara hol hol e
Wî bejna delalê dara hol hol e

Wî bakê lê rabû aliyê Stanbolê
Wî bakê lê rabû aliyê Stanbolê
Ser singê keçikê ketim pêkolê
Ser singê delalê ketim pêkolê

Wî wele keçike bile keçikê
Wî serî fînoy e binda telik e
Wî guhî guhar e guhar gupik e
Wi pozî xizêm e xizem sirik e
Wî dikim ramûsim nizam çi dike

Bejna keçikê dara hez hezê
Wî bejna delalê dara hez hezê
Wî bakê lê rabû aliyê sêwazê
Wî bakê lê rabû aliyê sêwazê

Ser singê kecikê meriv lê raze
Ser singê delalê meriv lê raze

Herêma Serhedê, çavkanî : Şemdîn

# Wer hene




Herêma Amedê

Wer hene hene hene wer hene
Wer hene hene hene wer xêro
Çûm bajêr Diyarbekir wer hene
Çûm bajêr Diyarbekir wer xêro
Bazara qondra te kir wer hene
Bazara qondra te kir wer xêro
Mi ji bîr kir nalçe nekir wer hene
Mi'j bîr kir nalçe nekir wer xêro

Heneka vê payizê
Heneka vê payizê
Qaşika li ser tembûzê
Qaşika li ser tembûzê
Ecland li bin gûzê
Ecland li bin gûzê
Hene li destê baldûzê
Hene li destê baldûzê

Çûm bajêr Diyarbekir
Çûm bajêr Diyarbekir
Bazara şala te kir
Bazara şala te kir
Mi ji bîr kir torgî nekir
Mi ji bîr kir torgî nekir

Wer hene hene hene wer hene
Wer hene hene hene wer xêro
Heneka vê Licokê
Heneka vê Licokê
Qaşika li ser tihokê
Qaşika li ser tihokê
Ecland li bin biyokê
Ecland li bin biyokê
Hene li destê fatokê wer hene
Hene li destê fatokê wer xêro

# Wer hene




Wer hene wer hine hevalê
Wer hene wer hine delalê
Êvara henê ye hevalê
Êvara henê ye delalê
Bûk anîn hewşê ye hevalê
Bûk anin hewşê ye delalê
Şewtî dilkê dê ye hevalê
Şewtî dilkê dê ye delalê
Wer hene wer hine hevalê
Wer hene wer hine delalê

Herêma Amedê

# Wer hêne




Wer Hêna Hêne Hêne bê xwedyê çiqa şên e
Hênekê bi dolab e bê xwedyê bi dolab e
Hemû şûv û kirab e tevek şûv û kirab e
Xwelî li mêrê xirab e xwelî li mêrê xirab be
Dikuxe qe sar nabe dikuxe qe sar nabe
Tî dibe birçî nabe tî dibe birçî nabe

Wer
Hênekê vira wê da bê xwedyê virda wê da
Enkebîr di ortê da Enkebîr di ortê da
Eskerê romê tê da eskerê romê tê da
Navê heyrano pê da navê heyrano pê da

Wer
Êdî nabêm lolo ye êdî nabêm lolo ye
Hîv derket mi'dgo ro ye hîv derket mi'dgo ro ye
Şewqa xwe da Tirelo ye şewqa xwi da Tirelo ye
Emer beg mîrê no ye Emer beg mîrê no ye
Esker bir Palo ye esker bir Palo ye

Wer
Hênekê bi çarşî ye Hênekê bi çarşî ye
Enkebîr li qarşî ye Enkebîr li qarşî ye
Xwelî li mêrê du rû ye xwelî li mêrê du rû ye
Mêrê xortî cindî ye mêrê xortî cindî ye

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Werdek im





Wez werdek im werdek im lê wez werdek im werdek im
Wez werdek im werdek im şalûl û bilbil di golê da
Wez werdeka ser kesk im
Wez werdeka ser kesk im
Serê golê meqes kim
Binê golê meqes kim

Wez werdek im
Wez werdek im
Wez werdeka ser şîn im
Wez werdeka ser şîn im
Serê golê duqsînim lê wez werdek im werdek im
Binê golê duqsînim şalûl û bil bil di golê da

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Were giyan




Nazdarim çende ciwane
Were were were bizanim
Qijî pexiş u pexişane
Were giyan were giyan çaw ciwanim

Yarim wa hat be lence
Were...
Memkoley çende qince
Were giyan...

Şêxî germên u kwêstan
Were...
Xwaye le minî nestênê
Were...

Bala berze neşmîle
Were...
Boy nemawim dexîle
Were...

Çaw ciwan maçê kerem ke
Were...
Nemawim u dil zelîle
Were...

Tahir Tewfiq / Sorani

# Were gulê




Baran barî gulê, gulê tene tene,
Vana reke were gulê min û tene
De bilezin gulê gulê zû bimeşe,
Rojên giran were gulê li benda me ne.

Baran barî gulê, gulê hûr hûr lê kir,
Gul û sosin were gulê rengê xwe vekir
Çiya û zozan gulê gulê tev xemilîn,
Kanî û rûbar were gulê tev de der kir.

Baran barî gulê gulê her der xweş kir,
Dar û devî were gulê tev da geş kir,
Ew reng û dengê were gulê wayê delal,
Dilê kedxwar bi vê re reş kir

Herêma Xerputê

# Were gulim




Nexoş u derdedarim nûrî çawanim were
to calibi xemî dilmî mahî tabanim were

Herçen derwa u dê le asoy şîn zerde xendey yar le dilî pir ewîn

Bo wa bê lutf u ruh'mî hênde dilim deşkênî
tu xda bo fênikî dil ey kani giyanim were

Herçen derwa u...

Cewir u xemî zemane lêm diyare bo nîşane
saqî xumari bade heste direnge beyane

Herçen derwa u...

Soranî / Gelêrî

# Were keçê nav keleka




Were keçê keçê nav keleka
Were yadê yadê nav keleka
Ez radimîsim çav beleka
Ez qurbanê çav beleka
Keçê meke meke van heneka
Yadê meke meke van heneka
Were keçê keçê hukimdarê
Were keçê keçê bayraqtarê

Were keçê keçê nav zebeşa
Were yadê yedê nav zebeşa
Ez heyranê çavê reşa
Ez qurbanê çavê reşa
Were keçê keçê ez nexweş im
Were yadê yadê ez nexweş im
Nexweşê çavê reş im
Heyranê çavê reş im

Were keçê keçê nav tûtûna
Were yadê yadê nav tûtûna
Ez heyranê çav xatûna
Ez qurbanê çav xatûna
Agir deyne ser qelûna
Agir deyne ser qelûna
Were yadê yadê hukimdarê
Were yadê yadê bayraqdarê


Herêmên Amed û Serhedê, çavkanî : Eyşe Şan

# Were qurban




Zulfî wek marî reşe
Be ciwanî xot bimbexşe
Ek be barî zeh'met nebê
Bom were derkî h'ewşe
Were qurban aramî dilan...
Şêtit kirdim were qurban
E'qlit birdim, hoşit birdim
Sutam, birjam were qurban
Zulfî dû metir u nîwe
Yarim befire u barîwe
Min le dwênêwe nem dîwe
Ew pêm delê hetîwe
Awirî le dilim berdawe
Wek sure gulî xemlîwe
Leber peçemî ciwane
Lêwî mîslî qeytane
Leber kezêy çend ciwane
Lêwî mîslî qeytane
Nexoşî kirdûm hawar
Pêm bilên? Le kwê mîwane
Zulfî her wek xeyate
Ek kiçe cêgey awate
Eger maçêkim bidatê
Bo min rêgey necate
Leber egrîcey ciwanî
Deçim debime mîwanî
Şêt u şeyday çawî tom
Çend nasik u mîhrebanî

# Were qurban




Baxî sêw u dû lalêw
Şet u şeydam kewtime kêw
Lêm h´eram bû şem u şêw
Bo nazdarey Qeytan lêw

Areqî memkî yarê
şîrîne weku henarê
Le e´şqî çawekanî
Ser helegirim le şarê

Ebiroy reşî kemanî
Zulfî reşe rêh´anî
Law ekûjê ke be î´nwan
Helebirê çawekanî

Eli Merdan, adyoya Bexdayê

# Were were lankê




Lankolekey dar henare, were were lankê
Role binuwe wextî kare, dilberey lankê
Role binuwe wextî kare, dilberey lankê
A were lankê dey, dilberey lankê
Lankolekey dare biye
Ray dejênê bo kes niye
Lankolekey dare biye, ey were lankê
Ray dejênê bo kes niye, dilberey lankê
A were lankê dey, dilberey lankê
A were lankê dey, sa were lankê

Lankolekey dare sêwe, were were lankê
Role goş gire be lêwe,dilberey lankê
Axir bo nanwî parşêwe,dilberey lankê
Dey were lankê dey, dilberey lankê
A were lankê dey, dilberey lankê
Lankolekey dare sêwe
Role goş gire be lêwe

Lankolekey dare sêwe,
were were lankê
Axir bo nanwî parşêwe,
sa were lankê
A were lankê dey, dilberey lankê
A were lankê dey, sa were lankê
Lankolekey dare gwêze,
were were lankê
Çende ciwane u be amêze,
dilberey lankê
Ew estêrem bîparêze, sa were lankê
A were lankê dey, dilberey lankê
Lankolekey dare biye
Ray dejênê bo kes niye
Lankolekey dar xurmaye,
were were lankê
Role boçî xewit naye, sa were lankê
A were lankê dey, dilberey lankê
A were lankê dey, sa were lankê

# Werî lê Emîne




Werî lê lê lê lê lê lê lêlê Emîne
Werî lo lo lolo lo
Sebra dilan meşkîne
Êmo tê ji Diyarbekir
Werî lê lê lê Emîne
Êmo tê ji Diyarbekir
Sebra dilan meşkîne
Şam qutnî li bejna xwe kir
Qaymeqam qebûl nekir
Serê metrana jêkir
Serê metrana jêkir

Werî, werî
Êmo êma Hekakî
Kofya te ji barê gakî
Tu ji mi ra karek nakî
Şevê li cem axakî

Werî, werî
Êmo li ser gemiyê
Çavreşê çav mawiyê

Werî, werî
Êmo li ser pelekê
Çavreşê çav belekê
Werî lê lê lê lê Emîne
Çavreşê çav belekê
Sebra dilan meşkîne

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Werin govendê gulê




Hey gûl ê, gûl ê, gûl ê
Werin govenda Gûl ê
Demdema gûl bişkiftin
Pêjonokan hilmiştin
Gûl zeri diyarî hiştin
Ew gula geliyê kûrde
Reş kezi di ranê stûr de
Şahiye di mala mir de
Hey gûl hey gûl hey gûlê
Ew gûla geliyê şaxê
Reş kezi ket kemaxê
Şahiye li mala axê
Hey gûlê tû oldaşî
Poşiyogê bike şaşî
Hey gûlê tû esmerî
Poşiyogê bike serî

# Werne rêzê




Werne rêzê, werine rêzê
Ez heyrano werine rêzê

Werne rêzê, rêzên mîhan
Ez heyrano werine rêzê

Te ser memik cotên bîhan
Ez heyrano werine rêzê

Wan lawikan dev lê nihan
Ez heyrano werine rêzê

Werne rêzê, werine rêzê
Ez heyrano werine rêzê

Werne rêzê rêza pezî
Ez heyrano werine rêzê

Ser memikan xoxa rezî
Ez heyrano werine rêzê

Wan lawikan dev lê tezî
Ez heyrano werine rêzê

Werne rêzê, werine rêzê
Ez heyrano werine rêzê

Here gorê gora mezin
Ez heyrano werine rêzê

Te ser memik cotên bazin
Ez heyrano werine rêzê

Heger hatin dê min xwazin
Ez heyrano werine rêzê

Werine rêzê, werine rêzê
Ez heyrano werine rêzê

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Werne sêva




Werne sêva werine sêva
Talane li xoxan û sêva
Werne sêva, sêv ne tirş in
Hêdî hêdî vegivêşin
Talan e li xoxan û sêva

Dilê lawan ji ber ve êş in
Talan e li xoxan û sêva
Xezêm şorê ket ser lêvan
Talan e li xoxan û sêva

Werne sêva sêv mizeytin
Talan e li xoxan û sêva
Dê lê (bi) kîn e xiloveytin
Dilê lawan ji ber ve şikestin

Werne sêva werine sêva
Talan e li xoxan û sêva
Xezêm şorê ket ser lêvan
Talan e li xoxan û sêva

Werne sêva sêv şêrîn in
Hêdî hêdî ve gemrîn in
Dilê lavan ne êşînin
Talan e li xoxan û sêva

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Wextê mehîrê




De lê lê wexte mehîrê
Bişînîn pey melê Cizîre
Bila bid fetwa mehîrê

Mehîra mala Hebeş e
Delala mala Hebeş e
Kevanî hûr hûr dimeşe
Kevanî hûr hûr dimeşe
Heskê li mehîrê dixe
Derdikeve kurmê ser reş e

De lê lê wextê mehîrê
Bişînîn pey melê Cizîrê
Bira bid fetwa mehîre

Mehîra mala Emer e
Delala mala Emer e
Kevanî kîşyayî ber e
Kevanî kîşyayî ber e
Heskê li mehîrê dixe
Derdkeve kurmê ser zer e

De lê lê wextê mehîrê
Bişînîn pey melê Cizîrê
Bila bid fetwa mehîrê

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Wextê Zeryam nîŞan kirin




Wextê zeriyam nîşan kirin
Derê birîna min vekirin
Birîn tije xwey tê kirin
Derman çare pê nedikirin

Derdê dila wê çawa be
Dil kafir e ray pê nabe
Eşqa dila betal nabe
Gelo halê min çawa be

Wextê zeriyam…

Çi kanîke we qic qicî
Cotê kewa lê xaricî
Xwezya min li wî xortî diye
Ew bi dilê xwe zewicî

Wextê zeriyam

Derdê dila kes nebîne
Gelê meriya dizêrîne
Dil ku ketê çare nabe
Lê tu dîna nahebîne

Wextê zeriyam

Aramê Tigran, radyoya Êrivanê

# Wey baranê




Herêma Amedê

Wey baranê wey baranê
Law şewitî lawê hanê

Wey baranê wey baranê
Law şewitî çol wêranê

Wî dayê baranê çi kir
Wî bavo baranê çi kir

Heft roja barî venekir
Heft şeva barî venekir

Xêlya bûkê şelpeze kir
Xêlya bûkê şelpeze kir

Yar îşev şeva baranê
Dost îro roja baranê

Yar govend gerya eywanê
Dost govend gerya eywanê

Wez ketime destê seyranê
Wez ketime destê seyranê

Yar îşev şeva bûkê ye
Dost îsev şeva bûkê ye

Yar govend gerya sûkê ye
Dost govend gerya sûkê ye

Wez ketime destê bûkê ye
Wez ketime tora bûkê ye

Wey baranê wey baranê
Law şewitî lawê hanê

Wey baranê wey baranê
Malê me çûn wa baranê

Malê me çûn ax baranê
Xwe dane sîngê zozanê

Ka wa êmîşên dikanê
Dostan çerezê dikanê

Wey baranê wey baranê
Law şewitî lawê hanê

Wey baranê wey baranê
Law şewitî çol wêranê

# Wey felekê




Herêma Serhede

Wey felekê wey felekê
Tew dinyayê dinyalekê
Felek bavê kesî nîne
Herkes hespê xwê dibezîne
Textê bûkê ji darçilo ye
Westa û necar tê ji Hezro ye
Text liyaqê zavay no ye

Wey
Tew
Felek
Herkes
Textê bûkê ji dar biyokê
Westa û necar tê ji Licokê
Text liyaqê zava û bûkê

Wey
Tew
Felek
Herkes
Textê bûkê ji darê çamo
Westa û necar tê li Dêrqamo
Text liyaqê qeymeqamo

# Wey herîre




Ey herîre u agir barane
Mubarekit bê la u lerzane
Mubarekit bê ew xene bendane
Baxî gulanit pê despêrim
Xunçe be xunçe dey bîbijêrin
Yekî kem bê pêt debijêrim
Ey herîre u agir barane
Sî u mirawî deporin
Beser beh'randa denorin
Kîjî ew e'srey kem şertin
Êcgar zû qewlan degorin
Ey herîre u agir barane

Soranî / Gelêrî

# Wey lo li min




Wey lo li min wey lo li min
Wey lo li min wey lo li min
Seredor
Wey lo li min wey lo li min
Bejna zirav çûn û hatin
Seredor
Serê sibê xatir bixwazim
Wê şev werî dikarim razim
Seredor
Tê bîra te li nava baxa
Çend sozê me bi hev ra da
Seredor
Ev çend sal ez li xeribiyê
Ji bin destê bê hêviyê
Seredor
Tehmûl nakim xwedîtiyê
Bûn hêlina nexweşiyê
Seredor
Ez dil xweş im ji vê hêviyê
Wek xezala pez kûviyê
Seredor

Wey lo li min emrê mino
Wey lo li min mala mino
Seredor
Wan çavê reş burhê mezin
Wey lo li min mala mino
Seredor
Dilê şikestî bi kûl û gazin
Wey lo li min mala mino
Seredor
Wan mijûlyet xweşî hêja
Wey lo li min emrê mino
Seredor
Wê kul kişandî eziyetiyê
Wey lo li min mala mino
Seredor
Bar giran e zehmetiyê
Wey lo li min emrê mino
Seredor
Ko ez herim çol beriyê
Wey lo li min mala mino

Aramê Tîgran, radyoya Êrîvanê

# Wey lo şivano




Wey lo lo lo lo lo şivano
Can lo lo lo lo lo şivano
Pezê şêvîn lo ser kaniyan e
Wey lo lo lo lo can şivano

Wey lo lo lo lo lo şivano
Kelî li pêçiyê lo bilûrvan e
Can lo lo lo lo lo şivano

Wey lo lo lo lo lo şivano
Pezê nîvro lo hate bena
Wey lo lo lo lo can şivano

Wey lo lo lo lo lo şivano
De zû derkew lo were malê
Wey lo lo lo lo can şivano

Ez razame lo hêviya te me
Wey lo lo lo lo lo şivano
De zû derkew lo were malê
Can lo lo lo lo lo şivano

Herema Serhedê

# Wey narê narê





Wey narê narê narê narê narê narê
Wey narê narê narê narê dînê delalê
Te dîbû refek beto
Min dîbû refek beto
Geryabû xet bi xeto
Firya bû xet bi xeto
Li gundê me deweto
Li gundê me deweto

Wey
Wey
Min dîbû refek şamî
Te dîbû refek şamî
Gerya bû kanî bi kanî
Firya bû kanî bi kanî
Li gundê ma şîranî
Li gundê me şîranî

Wey
Wey
Min dîbû refek çûço
Te dîbû refek çûço
Gerya bû qûç bi qûço
Firya bû qûç bi qûço
Li gundê me xal xûço
Li gundê me xal xûço

Wey
Wey
Min dîbû refek qazo
Te dîbû refek qazo
Gerya bû gaz bi gazo
Firya bû gaz bi gazo
Li gundê me cambazo
Li gundê me cambazo

# Wey wey Zara







Kizeyek le min yekê le şemal
Ey wey zara giyan dîdem zara
Bibirin be balay yarî bê xeyal
Ey wey zara giyan dîdem zara
Ba birwa yarim bew lence u lare
Subih´ u êware maç qerizdare
Şahêdîm bo bide le guley xesare
Ey wey zara giyan dîdem zara

Xuda bîstênê h´eqim le dayet
Ey wey zara giyan dîdem zara
Min cewrim kêşay kê nîşt le sayet
Ey wey zara giyan dîdem zara
Ba birwa yarim bew lence u lare
Subih´ u êware maç qerizdare
Şahêdîm bo bide le guley xesare
Ey wey zara giyan dîdem zara

Ca çon wa debê xerqim key le xem
Ey wey zara giyan dîdem zara
Meylim bideye yan zor u yan kem
Ey wey zara giyan dîdem zara
Ba birwa yarim bew lence u lare
Subih´ u êware maç qerizdare
Şahêdîm bo bide le guley xesare
Ey wey zara giyan dîdem zara

# Wey zêrî




Wey zeri, zerî, zeri, lê wey lê
Wey zeri, zerî, zeri, lê wey lê
Tu xwe mede hêşya derî lê wey lê
Tu xwe mede heşya derî lo wey lo
Mecdiya carde seri lo wey lo
Tu bi zêran beramberî lê wey lê
Tu bi zêran beramberî lo wey lo

Em yek in zerî yek in lê wey lê
Em yek in zerî yek in lo wey lo
Dor baxçe bi genek in lê wey lê
Dor baxçe bi genek in lowey lo
Keç hene law bi henek in lê wey lê
Keç hene law bi henek in lo wey lo

Em dido ne zerî dido ne lê wey lê
Em dido ne zerî dido nê lo wey lo
Dorê baxçe bi gezo ne lê wey lê
Dorê baxçe bi gezo ne lo wey lo
Keç hene law navno ne lê wey lê
Keç hene law navno ne lo weylo

Em sisê ne zerî sisê ne lê wey lê
Em sisê ne zerî sisê ne lo wey lo
Dora baxçe bi hirmê ne lê wey lê
Dora baxçe bi hirmê ne lo wey lo
Keç hene law çi çêne lê wey lê
Keç hene law çi çêne lo wey lo

Em çarîn zerî çarîn lê wey lê
Em çarîn zerî çarîn lo wey lo
Dorê baxçe bi hinar in lê wey lê
Dorê baxçe bi hinar in lo wey lo
Keç hene law çi har in lê wey lê
Keç hene law çi har in lo wey lo

Em pênc in zerî penc in lê wey lê
Em pênc in zerî penc in lo wey lo
Dorê baxçe bi sênc in lê wey lê
Dorê baxçe bi sênc in lo wey lo
Keç hene law çi genc in lê wey lê
Keç hene law çi genc in lo wey lo

Em şeş in zerî şeş in lê wey lê
Em şeş in zerî şeş in lo wey lo
Dorê baxçe bi zebeş in lê wey lê
Dorê baxçe bi zebeş in lo wey lo
Keç hene law çi geş in lê wey lê
Keç hene law çi geş in lo wey lo

Wey zerî, zerî, zerî, lê wey lê
Wey zerî, zerî, zerî, lo wey lo
Tu xwe mede hêşya derî lê wey lê
Tu xwe mede heşya derî lo wey lo
Mecdiya çarde serî lê wey lê
Mecdiya çarde serî lo wey lo
Tu bi zêran beramber î lê wey lê
Tu bi zêran beramber î lowey lo

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# W'ez gul im




W'ez gul im ez gul im lawiko were wez gul im
W'ez gul im ez gul im sêwiyo were wez gul im
Ez gul, gula Mişrîta
W'ez gul gula Mişrîta
Zêra bîne bi şirîta
Zêra bîne bi şirîta
Ji bo xatrê egîta
Ji bo xatrê egîta

W'ez gul im ez gul im
Ez...
Ez gul gula Edenê
W'ez gul gula Edenê
Zêra bîne bi leganê
Zêra bîne bi leganê
Ji bo xatrê gerdenê
Ji bo xatrê gerdenê
W'ez gul im ez gul im lawiko were wez gul im
Ez gul im wez gul im sêwiyo were wez gul im

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# W'ez hatime te bivînim




W'ez hatime te bivînim yar tê ji mala bavê min
W'ez hatime te bivînim şeş meş werdek sê qube
Qazî çardor girtî yar ser girtî zer memiko

W'ez hatime aliyê we da yar tê ji mala bavê min
W'ez hatime aliyê we da şeş meş werdek sê qube
Qazî çardor girtî yar ser girtî zer memiko

W'ez hatime te bi gul kim yar tê ji mala bavê min
W'ez hatime te bil gul kim şeş meş werdek sê qube
Qazî çardor girtî yar ser girtî zer memiko

Pûcika aniya te bi hilkim yar tê ji mala bavê min
Pûcika aniya te bi hilkim şeş meş werdek sê qube
Qazî çardor girtî yar ser girtî zer memiko

Herêma Serhedê, çavkanî : Şemdin

# Wez hene





Wez hene tu hene wez heneka bûkano
Wez hene tu hene mi go ewkî mêvano
Wez hene tu hene mêvanê van şevano
Wez hene tu hene mêvanê van rojano

Wez hene tu hene mi'd go kinê mêvano
Wez hene tu hene mêvanê van rojano
Wez hene tu hene hene li dest û nigano
Wez hene tu hene xew nekete çavano

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Wez hene




Wez hene tu hene wez hene hene hene
Wez hene tu hene wez heneka kêderê
Wez hene tu hene wez heneka bûkano
Wez hene tu hene sor heneka bûkano
Wez hene tu hene hene li dest û nigano
Wez hene tu hene hene li dest û nigano

Wez hene tu hene wez heneka Licokê
Wez hene tu hene ecland li bin biyokê
Wez hene tu hene hene li destê fatokê

Wez hene tu hene wez heneka Helhelê
Wez hene tu hene ecland li ber nefelê
Wez hene tu hene hene li destê delalê

Wez hene tu hene wez heneka dêrûnê
Wez hene tu hene ecland li bin zeytûnê
Wez hene tu hene hene li destê xatûnê

Wez hene tu hene wez heneka Dedaşê
Wez hene tu hene eclandî li ber aşê
Wez hene tu hene hene li destê belaşê

Wez hene tu hene heneka Diyarbekir
Wez hene tu hene ecland bi şîr û şekir
Wez hene tu hene mi'l destê bûka xwi kir

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Wî bi erebo




Erebo ha bi erebo
Wî bi erebê min (Şêr Lewendê min)

Erebo bengî bengî
Hoy erebê min (Şêr lewendê min)
Şal Şapik Qehwe rengî
Hoy erebê min
Heyrana te bi wî dengî

Erebê Beriyê pir in
Hoy erebê min (Şêr lewendê min)
Kihêlê situ xurxurîn
Pizmaman domam birin
Erebê deştê hiştin
Kihêlê situ niviştin
Pismaman domam hiştin

Herêma Serhedê, çavkanî : H. Aydin

# Wî day




Wî day, wî day, wî dayê
Wî dayê wî dayê
Wî day, wî day, wî dayê
Mayto bimre Husnayê

Wî day, wî day, wî dayê
Wî dayê wî dayê
Wî day, wî day, wî dayê
Mayto bimre Husnayê

Êr hotu hotu hotu
Wî dayê wî dayê
Êr hotu hotu hotu
Mayto bimre Husnayê

Kûy çûlîk vor gureto
Wî dayê wî dayê
Kûy çolîk vor gureto
Mayto bimre Husnayê

Mehhek diwar xurerto
Wî dayê wî dayê
Mehhek diwar xurerto
Mayto bimre Husnayê

Wî day, wî day, wî dayê
Wîdayê wî dayê
Wîday, wîday, wî dayê
Mayto bimre Husnayê

Pêyo tifing gureto
Wî dayê wî dayê
Pêyo tifing gureto
Mayto bimre Husnayê

Qesas husna gureto
Wî dayê wî dayê
Qesas husna gureto
Mayto bimre Husnayê

Verniyê mehkumont koto
Wî dayê wî dayê
Verniyê mehkumont koto
Mayto bimre Husnayê

Wî day, wî day, wî dayê
Wî dayê wî dayê
Wî day, wî day, wî dayê
Mayto bimre Husnayê

Omnonu wext vaşono
Wî dayê wî dayê
Omnonu wext vaşono
Mayto bimre Husnayê

Kon barkerd şî warono
Wî dayê wî dayê
Kon barkerd şî warono
Mayto bimre Husnayê

Warêma pîr zozano
Wî dayê wî dayê
Warêma pîr zozano
Mayto bimre Husnayê

Wî day, wî day, wî dayê
Wî dayê wî dayê
Wî day, wî day, wî dayê
Mayto bimre Husnayê

Wî day, wî day, wî dayê
Wî dayê wî dayê
Wî day, wî day, wî dayê
Mayto bimre Husnayê

Heremên Bîngol û Hênê/ Dîmilî

# Wî Şemo




Wı wîwî wîwî wî wîwî wî Şemo
Wî wîwî wîwî wî wîwî wî Şemo

Quça li newala şemo wî wîwî şemo
Defa li diyara şemo wî wîwî şemo

Wî wîwî...

Şîşik mîşik li cemo wî wîwî wî şemo
Qîza şahê ecemo wî wîwî wî şemo
Helandim bîna pemo wî wîwî wî wî
Helandim bîna pemo wî wîwî wî şemo

Wî wîwî...

# Wisa nenêr tu li min




Wisa nenêr wisa nenêr tu li min
Pêtu pêtu dişewite dilkê min
Wisa nenêr wisa nenêr tu li min
Bê tu bê tu dişewite dilkê min
Çav rê te ji avrê te qîzka baş
Dilê min e dilkê min e pir nexweş
Çav rê te ji avrê te qîzka baş
Dilê min e dilkê min e pir nexweş

Wisa nenêr wisa nenêr tu li min
Bes e êdî îşiq nema çavê min
Wisa nenêr wisa nenêr tu li min
Bes e êdî îşiq nema çavê min
Sêva sor î sêva sor î li nav rez
Tim ji te tim ji te roja ez
Sêva sor î sêva sor î li nav rez
Tim ji te tim ji te roja ez

Wa navê xwe wa navê xwe bîr bike
Wa navê xwe wa navê xwe bîr bike
Baxê gula baxê gula çêbike
Baxê gula baxê gula çêbike
Xwe helal ke xwe helal ke tu li min
Bila qenc be bila qenc be dilkê min
Xwe helal ke xwe helal ke tu li min
Bira qenc be bira qenc be dilkê min

Radyoya Êrîvanê

# Witim ey kiç




Witim ey kiç le geştî
Şaristanî ya deştî
Wa ciwan u pak rewştî
Mesîh'î ya zerdeştî

Ew kiçe kurde nazdare
Reng zerd u lêw be bare
Bergî reşî poşîwe
Wa melul u xembare

Ey bira kurdî min
Ger depirsî reng zerdî min
Xizim u biram kujrawe
Kes u karim nemawe

Ew kiçe...

# Xal mercan




Xal mercan mercan mercan
Xal mercana li gerdenê

Xal mercan cot in cot in
Xal mercana li gerdenê

Ser milgên ser de latin
Xal mercana li gerdenê

Xal mercan mercan mercan
Xal mercana li gerdenê

Keçikê derî li min veke
Xal mercana li gerdenê

Xal mercan sê ne sê ne
Xal mercan li gerdenê

Ser milgin ser de têne
Xal mercana li gerdenê

Keçikê derî li min veke
Xal mercan li gerdenê

Bihna memkên te têne
Xal mercna'l gerdenê

Xal mercan çar in çar in
Xal mercan li gerdenê

Ser milgên serde'd xwarin
Xal mercana'l gerdenê

Xal mercan mercan mercan
Xal mercana'l gerdenê

Xal mercan pênc in pênc in
Xal mercan li gerdenê

Ser milgin serde'd rênc in
Xal mercan li gerdenê

Keçikê derî'l min veke
Xal mercan li gerdenê

Bihna memkên kirmênc in
Xal mercan li gerdenê

Xal mercan şeş in şeş in
Xal mercan li gerdenê

Ser milgin serde'd meşin
Xal mercan li gerdenê

Keçikê derî li min veke
Xal mercan li gerdenê

Bihna memkên kirmêncî
Xal mercan li gerdenê

# Xalê xalyazê




Xalê xalyazê way gulê gulyazê way
Bejin ziravê bi rebenê gerdena gazê way
Malê me danîne li gelîkî kûr e way
Konê me danîn bi rebenê li gelîkî kûr e way
Zavay me dixwaze cilê gulhûr e way
Paşay me dixwaze cilê gul hûr e way
Bûka me derxin lê rêka me dûr e way

Xalê
Bejin
Malê me danîne li ber devê aşo way
Konê me danîn bi rebenê li ber devkê aşo way
Zavay me dixwaze cilê gulreşo way
Paşay me dixwaze cilê qumaşo way
Bûka me derxin lê rêka me kaşo way
Xalê
Bejin

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Xalêk le Mabeyn




Erê xalêk le mabeyin wey wey xalêk le mabeyin
Giyane dû ebiro bene neşmîl dû ebiro bene
Erê yekcar ew xale giyane yekcar ew xale
Be xuday rîşey dil kene neşmîl rîşey dil kene

Erê hêşta meyleket giyane hêşta meyleket
Be xuday neçuwe le yadim giyane neçuwe le yadim
Erê to wêney şîrîn çaw ciwan to wêney şîrîn
Be xuday eminîş ferhadim giyane eminîş ferhadim

Erê bûm be yarî to giyane bûm be yarî to
Çaw mest bigem be mirad be xuday bigem be mirad
Erê rencekem ne key tu xwa rencekem nekey
Çaw mest be rencî ferhad neşmîl be rencî ferhad

Erê mêwilê u dêlêje giyane mêwilê u dêlêje
Ey hawar ber biney xawê giyane ber biney xawê
Erê giştî be qurban giyane giştî be qurban
Ey hawar yek nesrîn nawê giyane yek nesrîn nawê

Eli Merdan, adyoya Bexdayê

# Xalo Hecî




Vana vana vana vana vana vana Xalo Hecî
Vana vana vana vana mi çi got û tu behecî
Xalo Hecî tê ji orsa vana vana Xalo Hecî
Teres hecî tê ji orsa mi çi got û tu behecî
Xume xumê mîtralyosa vana vana Xalo Hecî
Xume xumê mîtralyosa mi çi got û tu behecî
Kofya me de ber kolosa vana vana Xalo Hecî
Kofya me de ber kolosa mi çi got û tu behecî
Çira medin ber fanosa vana vana Xalo Hecî
Çira medin ber fanosa mi çi got û tu behecî

Vana vana vana vana vana vana Xalo Hecî
Vana vana vana vana mi çi got û tu behecî
Xalo Hecî tê ji Xiya vana vana Xalo Hecî
Teres hecî tê ji Xiya mi çi got û tu behecî
Tu şerm nakî ji wan riya vana vana Xalo Hecî
Tu şerm nakî ji wan riya mi çi got û tu behecî
Tu hêna bibî eşqiya vana vana Xalo Hecî
Tu hêna bibî eşqiya mi çi got û tu behecî

Vana vana vana vana vana vana Xalo Hecî
Vana vana vana vana mi çi got û tu behecî
Xalo Hecî awa neke vana vana Xalo Hecî
Xalo Hecî awa neke mi çi got û tu behecî
Guh li gotina şeytan neke vana vana Xalo Hecî
Guh li gotina şeytan neke mi çi got û tu behecî
Beyta şerîf betal neke vana vana Xalo Hecî
Beyta şerîf betal neke mi çi got û tu behecî

Vana vana vana vana vana vana Xalo Hecî
Vana vana vana vana mi çi got û tu behecî
Xalo Hecî tê ji bêndera vana vana Xalo Hecî

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

Xalo Hecî tê ji bêndera mi çi got û tu behecî
Xurme xurmê van qondera vana vana Xalo Hecî
Xurme xurmê van qondera mi çi got û tu behecî
Halê hecî halê kera vana vana Xalo Hecî
Halê hecî halê kera mi çi got û tu behecî
Vana vana vana vana vana vana Xalo Hecî
Vana vana vana vana mi çi got û tu behecî

# Xaloy




Xaloy xaloy xaloy xal xalê min
Xaloy xaloy xaloy xal malê min
Xaloy çerçî hatiye
Xaloy çerçî hatiye
Çerçî barê te çi ye
Çerçî barê te çi ye
Barê'm hul û morî ye
Barê'm hul û morî ye
Mi'j keçan ra haniye
Mi'j qîzan ra aniye

Xaloy xaloy
Xaloy çerçî
Xaloy çerçî
Çerçî
Çerçî
Barê'm nîk û derz3ı ye
Barê'm nîk û derzî ye
Mi'j bûkan ra haniye
Mi'j bûkan ra aniye

Xaloy xaloy
Xaloy çerçî hatiye
Xaloy çerçî hatiye
Çerçî barê te çi ye xalê min
Çerçî barê te çi ye malê min
Barê'm şar û kofî ye xalê min
Barê'm şar û kofî ye malê min
Mi ji pîran ra haniye xalê min
Mi'j pîran ra aniye malê min
Xaloy

Herêma Amede, çavkanî : Hilmi Akyol

# Xanbacî




Memkit dû mîm u kafêke, Gulbacî
Le sîney, sîne safêke, Xanbacî
Her maçêkit tewafêke, Gulbacî
Xan bacî, eman xanbacî, mero gulbacî
Ger demkûjî hanê xencer Gulbacî
Hanê xencer lêmde, toran yanî çî

Suret ger neqaş çîn! Xanbacî (Kople be Farsî)
Ru suret yarem bibîn, Gulbacî
Yekiş hemçîn suretî, Xanbacî
Ya terk kun suretgerî, Gulbacî

Xozgem be wey yarî ciwane, Xanbacî
Le nêw cahêlan sultane, Gulbacî
Ta demirê sah'êb îmane, Xanbacî
Çawit baz, ebrot kemane Xanbacî
Wexte bot bim be dêwane, Gulbacî
Weku Mecnun lew kêwane, Xanbacî
Xeber berin bo xizmanim, Xanbacî
Awirê berbote xermanim, Gulbacî
Lêm zîz buwe mîhrebenim, Xanbacî
Be carê malî wêranim, Gulbacî
Xanbacî, eman Gulbacî, mero ciwan bacî
Hanê xencer ger demkûjî Xanbacî
Hanê xencer lêmde, toran yanî çî?!

# Xan xanimê




Xan xanimê, xanimê, xanê xanimê xanim e
Xan xanimê, xanimê, te kiras kitanê bi çawirme

Xan xanima min ev e, xanê xanimê xanim e
Gewr û rinda min ev e, koçê taqîkê te bi surme
Şekirek bi lêva te be, xanê xanimê xanim e
Şekirek bi lêva te be, te kiras kitanê bi surme
Li me ro bû te kir şev e, xanê xanimê xanim e
Li me ro bû te kir şev e, koçê taqîkê te bi surme
Qeda li karê te keve, xanê xanimê xanim e
Hero halê te ev e, te kiras kitanê bi çawirme

Xan xanimê, xanimê, xanê xanimê xanim e
Xan xanimê, xanimê, te kiras kitanê bi çawirme

Xan xanima Hindrofî, xanê xanimê xanim e
Gewr û rinda Hindrofî, te kiras kitanê bi çawirme
Te li serî şar û kofî, xanê xanimê xanim e
Te li serî şar û kofî, te kiras kitanê bi surme
Bextê min re bûy sofî, xanê xanimê xanim e
Bextê law ra bûy sofî, te kiras kitanê bi çawirme

Xan xanimê, xanimê, xanê xanimê xanim e
Xan xanimê, xanimê, te kiras kitanê bi çawirme

Xan xanima Mêrînî, xanê xanimê xanim e
Gewr û rinda Mêrînî, te kiras kitanê bi çawirme
Tu bi xizêma zêrîn i, xanê xanimê xanim e
Tu bi xizêma zêrîn i, koçê taqîkê te bi surme
Kor bûy lawik nastînî, xanê xanimê xanim e
Kor bûy lawik nastînî, te kiras kitanê bi çawirme
Xan xanimê, xanimê, xanê xanimê xanim e
Xan xanimê, xanimê, te kiras kitanê bi çawirme

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

Xan xanima Ertoşî, xanê xanimê xanim e
Bav delala Ertoşî, te kiras kitanê bi çewirme
Te li serî şar û poşî, xanê xanimê xanim e
Te li serî şar û poşî, koçê taqîkê te bi surme
Zer memika nafroşî, xanê xanimê xanim e
Zer memika nafroşî, te kiras kitanê bi çawirme
Difroşî muşterî me, xanê xanimê xanim e
Nafroşî ez rêwî me, koçê taqîkê te bi surme

# Xanê beyazê




Xanê beyazê lê, gulê gulyazê lê
De cîka deyne bi rebenê, ez û tu razên lê

Malê me danîne li gelîkî teng e lê
Konê me danîn rebênê li gelîkî teng e way
Hespa girêdin lê li merwendî reng e lê
Hespa girêdin bi evdalê li merwendî reng e way
Paşa ji me dixwaze topek heftreng e lê
Paşa dixwaze bi evdalê topek reng e way
Bûka me derxin lê li me dereng e lê
Bûka me derxin rebenê li me dereng e way

Hanê beyazê lê, gulê gulyazê lê
De cîka deyne bi rebenê, ez û tu razên lê

Malê me danîne li gelîkî kûr e lê
Konê me danîn rebênê li gelîkî kûr e way
Hespa girêdin lê li merwendî hûr e lê
Hespa girêdin bi evdalê li merwendî hûr e way
Paşa ji me dixwaze topek ferfûr e lê
Paşa dixwaze bi evdalê topek ferfûr e way
Bûka me derxin lê rêka me dûr e lê
Bûka me derxin rebenê rêka me dûr e way

Xanê beyazê lê, gulê gulyazê lê
De cîka deyne bi rebenê, ez û tu razên lê

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Xanê lê




Xanê lê canê lê esker kişyan bêdera
Xanê lê canê lê bû xirmînê xencera
Xanê lê canê lê xwûnê dabû bin bera
Xanê lê canê lê delîle dauka eskera

Xanê lê canê lê esker kişyan van·dera
Xanê lê canê lê bû şingîna singuya
Xanê lê canê lê xwûnê dabûn bin ciya
Xanê lê canê lê delîle dayka gundiya

Herema Amedê

# Xanimê




Xanimê lê bi xanimê
bûka mala bavê minê
çîçeka li rewşa minê
tu soz nedî yekî dinê

Xanimê bi lome ye
Bi şew bi roj li mala me ye
Qisûrek lê peyda ye
Gotina xwe bi mane ye
Xanimê lê...

Xanimê çû kanî ye
Ezê diçûme pêşî yê
Aniya xwe diqermiçand
Ji mira digo tû divêy çî yê
Xanimê lê...

Xanimê dinya dem e
Devê min li ser singê te me
Deyndarê bavê te me
Ez aşiqê çawê te me
Xanimê lê...

Herêma Amedê

# Xaniyê bavê te




Xaniyê bavê te dûta ye ha te dûta ye he
Leylim leylim leylim leylim leylim can
Koşka bavê te du ta ye ha te dû ta ye he
Şalûr bilbil di odê da

Stûna navin badaye hev ha badaye he
Leylim leylim leylim leylim leylim can
Stûna navin badaye ha badaye he
Şalûr bilbil di odê da

Doşek baliv paldaye ha paldaye he
Leylim leylim leylim leylim leylim can
Doşek baliv paldaye ha paldaye he
Şalûr bilbil di odê da

Zerî di nav da razaye ha razaye he
Leylim leylim leylim leylim leylim can
Zerî di nav da razaye ha razaye he
Şalûr bilbil di odê da

Çav û birî kil da ye ha kil daye he
Leylim leylim leylim leylim leylim can
Cav û bûri kil da ye ha kil daye he
Şalûr bilbil di odê da

Çava ji bo çi kil daye ha kil daye he
Leylim leylim leylim leylim leylim can
Ji bona kê kil daye ha kil daye he
Şalûr bilbil di odê da

Herêma Amedê, çavkanî : Mele Mehmûd Qeretaş

# Xanyê Memo




Wî Memo Memo Memo wî Memo
Wî Memo Memo Memo wî dayê
Xanyê Memo çardax e wî memo
Xanyê Memo çardax ê wî dayê
Fat kulafa ranaxe wî Memo
Fat kulafa ranaxe wî dayê
Pîreka waxewax e wî Memo
Pîreka waxewax e wî dayê
Xeberdan kir yasax e wî Memo
Nan û dew lê yasax e wî dayê

Wî Memo Memo Memo wî Memo
Wî Memo Memo Memo wî dayê
Xanyê memo çar qul e wî Memo
Xanyê keko çar qul e wî dayê
Baranê xulexul e wî Memo
Baranê xulexul e wî dayê
Jina Memo bi dil e wî memo
Jina Memo bi dil e wî dayê

Wî Memo Memo Memo wî Memo
Wî Memo Memo Memo wî dayê
Xanyê Memo çar tîş e wî Memo
Xanyê Memo çar tîş e wî dayê
Baranê rîşerîş e wî Memo
Baranê rîşerîş e wî dayê
Çavê reş bû bexşîş e wî Memo
Çavê reş bû bexşîş e wî dayê
Wî Memo Memo Memo wî dayê
Wî Memo Memo Memo wî dayê

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Xeco dilê min




Xecokê me digo ew e yeman yeman yeman
Delalê me digo ew e Xeco dilê min

Her şev karê me ew e yeman yeman yeman
Her şev karê me ew e Xeco dilê min

Xecokê semer qed î yeman yeman yeman
Delalê semer qed î yeman dilê min

Hemayloka bazbend î yeman yeman yeman
Hemayloka bazbend î Xeco dilê min

Xecokê sêlê bîne yeman yeman yeman
Delalê sêlê bîne Xeco dilê min

Dendika biqelîne yeman yeman yeman
Dendika biqelîne Xeco dilê min

Piştikê xwe jê bihilîne yeman yeman yeman
Piştikê xwe jê bihilîne Xeco dilê min

# Xelef im




Ez Xelef im Xelef im
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Ez Xelef im Xelef im
Êzdîn Şêr mîrê Botan e
Xweyê şûrê sedef im
Nav şera kûl û gef im
Ez xelefê şofî me
Xweyê tifinga bîr no me
Nav şeran de her ho me
Ez Xelefê kinik im
Xweyê şûrê bi destik im
Nav şeran de hevrig im
Axa wo qewmê te giran e
Hey lalê lalê lalê lalê xanê
Koçkê were eywanê
Termê Ehmo li kolanê
Bespinê dehl û avê
Fermana mîrê Botan e
Çara Ehmo nû kirî
Ehmed li koçkê xûrî
Bespinê dehl û avê
Çara nûrê zirave
Ehmed beg bê hinava

# Xerîbê




Xerîbê xerîbê xerîbê xerîbayê
Xerîbê xerîbê delîlê delîldayê
Wey bira Uzêro xerîbê xerîbayê
Wey bira Uzêro delîlê delîl dayê
Te pez berda zinêro xerîbê xerîbayê
Te pez berda zinêro delîlê delîl dayê

Xerîbê
Xerîbê
Wey bira Umero
Wey bira Umero
Te pez berda berjêro
Te pez berda berjêro

Herêma Amedê, çavkanî : Hilmî Akyol

# Xerîbê




Hoy hoy li min xerîbê
Hoy hoy li min delîlê
Bi teqdîr û nisîvê
Ji mal bavê te kî bê

Xerîbê gotî gotî
Delîlê gotî gotî
Cotkarî çûne cotî
Xerîbê kember firot î

Ez xerîba xwedê me
Ez delîla xwedê me
Dara li devê rê ma
Hesreta mal bavê me

Xerîba wî pişt î
Delîla wî pişt î
Tavê dabûn tenişt î
Xerîb bermalya heft xwişk î

Xerîba wî pala
Delîla wî pala
Tavê dabûn xirxala
Xerîb bermalya heft xala

Xerîba fetlekê
Delîla fetlekê
Tavê dabûn kulekê
Xerîbê dest kir kêlekê

Xerîba holika
Delîla holika
Bû orîna golika
Xerîb mêvanê keçika

Herema Amedê

# Xesiya xerab




Wî civato bextê we me rê bidine min ez gune me
Eva serê sê salan e destê xesiya xerab da me

Wî civato serwext dikim serwext nabe bê serwextî gura har e
Eva serê sê salan e destê xesiya xerab da me

Wî civato çiyayê hanê win binêrin mij duman e
Çiyayê hanê mij duman e xesiya min e bê îman e

Wî civato bextê we me rê bidine min ez derbas bim
Rê bidine min ez derbas bim destê xesiya xwe xelas bim

Radyoya Êrîvanê

# Xeyaban




Erê rastey xeyaban neşmîl giyan baxçey mîllete
Wella kirasekey berit çaw ciwan çîtî şîrkete
Lay lay lay lay kewî gerdin be xalî
Giyan giyan giyan giyan kûştûmî perçemî xawî
Boç boç boç boç henaw to çwarde salî, şêt bûm bo xet u xalî

Erê binê ser dilim çaw ciwan nasike penceket
Giyane baweşênim ke wird wird be egrîceket
Tu xwa baweşênim ke wird wird be egrîceket
Lay...
Giyan...
Boç...

Erê pirsîm le çîmen be qurban ew qebire kêye
Fermûy qebirî mecnune şêt u kûştey leylêye
Lay...
Giyan...
Boç boç boç boç şêt bûm bo çawî kalî

Elî Merdan, radyoya Bexdayê

# Xezala min dela min




Xezala min delala min
Konê barê te çît e
Xezala min delala min
Kon girêda şirît e
Xezala min delala min
Tu rabe werîs bîne
Were bal min ml ra bikene
Nav kona de kes nine

Xezalê, delalê, wek sê tel kêlek wana
Malam barkir koç bi rê ket
Koçer ser çû zozana
Xezala min delala min
Evîn xweş e di dil da
Evîna me şan û şên be
Di bilûra şivan da

Xezalê, delalê ware canê bêri can
Evîn xwese li zozana li ber
qeraxê çeman
Desta Heranê pir germ e ez
anînim vêdere
Destê xwa bidem em tev herin
Şerefdînê

Herema Serhede

# Xezala min




Xezala min delala min ha yêrî yêrî yêrî
Xezala min delala min ca yêrî yêrî yêrî
Xezala min delala min av xarî berdêr cêrî
Xezala min delala min av xarî  berdêr cêrî
Xezala min delala min tû jina mala mêr î
Xezala min delala min zanim tû jî ya mêrî

Xezala min delala min karê xezalê cot in
Xezala min delala min karê xezalê cot in
Xezala min delala min gulpkê şîlanê kotin
Xezala min delala min gulpkê şîlanê kotin
Xezala min delala min av xwarin berdêr hatin
Xezala min delala min av xwarin berdêr hatin

Xezala min delala min konê bavê te ta ye
Xezala min delala min konê bavê te ta ye
Xezala min delala min hurik hurik badaye
Xezala min delala min hurik hurik badaye
Xezala min delala min keşka cindî bela ye
Xezala min delala min kecka cindî bela ye

Xezala min delala min karê xezalê sê ne
Xezala min delala min karê xezalê sê ne
Xezala min delala min ber kendalê avê ne
Xezala min delala min ber kendalê avê ne
Xezala min delala min av xwarin hevraz têne
Xezala min delala min av xwarin hevraz têne

Xezala min delala min konê bavê te çît e
Xezala min delala min konê bavê te çît e
Xezala min delala min kon girêda bi serît e
Xezala min delala min zerî qîza Filît e
Xezala min delala min lawkê cindî egît e

Radyoya Êrîvanê

# Xezala minê




Xezala minê delala minê her hêlî hêlî hêlî
Xezala minê delala minê av xwar û berjêr çêrî
Xezala minê delala minê pezê bavê te sor e
Xezala minê delala minê pezê bavê te sor e
Xezala minê delala minê gelî da ore ore
Xezala minê delala minê gelî da ore ore
Xezala minê delala minê derdêm keçka çuxsor e
Xezala minê delala minê derdêm keçka cilsor e

Xezala minê
Xezala minê
Xezala minê delala minê pezê bavê te reş e
Xezala minê delala minê pezê bavê te reş e
Xezala minê delala minê gelî da erş e erş e
Xezala minê delala minê gelî da dimeşe
Xezala minê delala minê derdêm keçka keleş e
Xezala minê delala minê derdêm keçka por reş e

Xezala minê
Xezala minê
Xezala minê delala minê pezê bavê te spî ye
Xezala minê delala minê pezê bavê te spî ye
Xezala minê delala minê gelî da hat hêdî ye
Xezala minê delala minê gelî da hat hêdî ye
Xezala minê delala minê derdêm keçka miftî ye
Xezala minê delala minê derdêm keçka gundî ye

Radyoya Êrîvanê

# Xezalam




Xezalam lê delalam lê wez berf im berf im berf im
Xezalam lê delalam lê wez berfa çiyayê reş im
Xezalam lê delalam lê di ber we ra dimeşim
Xezalam lê delalam lê di ser we ra dimeşim
Xezalam lê delalam lê aşiqê çavê reş im

Xezalam lê delalam lê wez berf im berf im berf im
Xezalam lê delalam lê wez berfa çiyakê sor im
Xezalam lê delalam lê di ber we ra diborim
Xezalam lê delalam lê di ser we ra diborim
Xezalam lê delalam lê aşiqê gulyên sor im

Xezalam lê delalam lê wez berf im berf im berf im
Xezalam lê delalam lê wez berfa çiyakê spî me
Xezalam lê delalam lê di ber we ra diçûme
Xezalam lê delalam lê di ser we ra diçûme
Xezalam lê delalam lê aşiqê dostê bûme

Radyoya Êrîvanê

# Xezalê yêlî




Xezalê yêlî yêli xezalê yêlî can
Xezalê yêlî yêli delalê yêlî can

Ez çûme Diyarbekir xezalê yêlî can
Ez çûme Diyarbekir delalê yêlî can
Bazara şara te kir xezalê yêlî can
Bazara şara te kir delalê yêlî can
Min bîr kir reşî nekir xezalê yêlî can
Min bîr kir qeytan nekir delalê yêlî can

Xezala vê Xinûsê xezalê yêlî can
Xezala vê Xinûsê delalê yelî can
Ba lêdixe belge sûsê xezalê yêlî can
Ba lêdixe belge sûsê delalê yêlî can
Zêr li serê diçirûse xezalê yêlî can
Zêr li serê diçirûse delalê yelî can

Min Qersê dikan vekir xezalê yêlî can
Min Qersê dikan vekir delalê yelî can
Bazara sola te kir xezalê yêlî can
Bazara sola te kir delalê yêlî can
Min bîr kir nalçe nekir xezalê yêlî can
Min bîr kir nalçe nekir delalê yêlî can

# Xezalê




De mi go xezalê min bi rebenê meçe avê way way
De mi go delalê min bi rebenê meçe avê way way

Wê bê pêşiya bi delalê siwarê axê way way
Wê bê pêşiya bi delalê siwarê axê way way

Wê ji te bistîne bi delalê kembera navê way way
Wê ji te bistîne bi delalê kembera navê way way

Xezal xezal l'rebenê keça kurda ye way way
Delala min kî delal e li pişta mêra ye way way

W'ez tew xezala xwe nadim qe tu kesa ye way way
W'ez tew xezala xwe nadim qe tu kesa ye way way

# Xiftan




Nîmga xiftan û xiftan e
Nîmga xiftan û xiftan
Nîmga xiftan û xiftan e
Nîmga xiftan û xiftan

Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran
Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran

Nîmga xiftan bîst û sê ye
Nîmga xiftan bîst û sê ye
Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran

Nîmga cihê dostim xweş e
Nîmga cihê dostim xweş e
Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran

Nimga xiftanê reş e
Nimga xiftanê reş e
Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran

Nîmga xiftan bîst û şeş e
Nîmga xiftan bîst û şeş e
Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran

Nimga xiftanê te sor e
Nimga xiftanê te sor e
Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran

Niga bişkoj deyne dor e
Niga bişkoj deyne dor e
Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran

Niga cihê dostim jor e
Niga cihê dostim jor e
Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran

Niga cihê dostim spî ye
Niga cihê dostim spî ye
Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran

Nîmga cihê dostim nî ye
Nîmga cihê dostim nî ye
Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran

Nimga bişkoj sê rêzî ye
Nimga bişkoj sê rêzî ye
Nîmga xiftan û xiftan e
Mala xiftan û wêran

Herêmen Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Xiftan




Xiftan, Xiftan, Xiftano lo, were loylo were lo
Xiftan, Xiftan, Xiftano lo, dinyayê betalê
Hem derdo hem dermano lo, were loylo were lo
Hem derdo hem dermano lo, dinyayê betalê

Xiftan pembiyê Miqûrê lo, were loylo were lo
Xiftan pembiyê Miqûrê lo, dinyayê betalê
Xiftan xemla li Nûrê lo, were loylo were lo
Xiftan xemla li Nûrê lo, dinyayê betalê

Xiftan, Xiftan, Xiftano lo, were loylo were lo
Xiftan, Xiftan, Xiftano lo, dinyayê betalê
Hem derdo hem dermano lo, were loylo were lo
Hem derdo hem dermano lo, dinyayê betalê

Xiftan pembiyê Çiçika lo, were loylo were lo
Xiftan pembiyê Çiçiko lo, dinyayê betalê
Xiftan xemla li keçika lo, were loylo were lo
Xiftan xemla li keçika lo, dinyayê betalê

Herema Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Ximê




Xime siye serê bonî
Dest esto meno barî
Tew tew meno barî
Nata be lewe piranî
Vindero cema sonî
Tew tew cema sonî

Were xime xime xime
Ez naye tore vanu
Ti rindekahore vanu
Cayilahore vanu

Xime siye derero
Domonî çî dormero
Tew tew çî dormero
Pusil dayî hermero
Xime de derero
Tew tew de derero

Xime meso çe sarî
Xorta sarî biye harî
Tew tew biye harî
Copol danetoro
Siknene meno barî
Siknene meno barî

Zazakî, heremên Bingol û Dersîmê

# Xiringe






Hey xiringe babim xiringe u xiringey naw gulan
Dem le nawî dem xiringe u dest le memkolan

Zorim nemawe xiringe u bimnên le qefes
Ne çaw têr debê xiringe u ne dil delê bes

Detirsim bimrim xiringe u be ciwane mergî
Bimnêne jêr xak xiringe u naley dil tengî

Hey dad hey bê dad xiringe u aludey derdim
Bo ruh'mê nakey xiringe u be rengî zerdim


# Xirnîkê




Xirnîkê xoyê
Xirnîkê xoyê
Torbe hilgire
De biçîne kayê
Kadînek kûr e
Ser me de nayê
Gundek xaîn e
Hona me nayê
Xirnîkê xirno
Tû neçe dara
Dê bên pêşiya te
Cotên siwar e
Dê ji te vekine
Bend û guhar e
Xirnîkê xoyê
Tû neçe avê
Dê bên pêşiya te
Siwarên axê
Dê ji te vekine
Kembera navê

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Xîzolê




Tu bi xîzolê xîzolê ala ala ala
Tu bi zîzolê xîzolê ala û barî kela

Tu bi xîzola min ev e ala ala ala
Tu bi xîzola min ev e ala û barî kela
Te li min gerandî şev e ala ala ala
Te li min gerandî şev e ala û barî kela
Her şev karê te ev e ala ala ala
Her şev karê te ev e ala û barî kela

Tu bi xîzola Şikakî ala ala ala
Tu bi xîzola Şikakî ala û barî kela
Kofya te ji barê gakî ala ala ala
Kofya te ji barê gakî ala û barî kela
Rûdinî karek nakî ala ala ala
Mêvanê xwe birê nakî ala û barî kela

Tu bi xîzola Hondrofî ala ala ala
Tu bi xîzola Hondrofî ala û barî kela
Te li serî şar û kofî ala ala ala
Te li serî şar û kofî ala û barî kela
Ji bextê min re bûy sofî ala ala ala
Ji bextê min re bûy sofî ala û barî kela

# Xurnik û gurnik




Ha li wiyalî avê kayik dimeşin
Ca li wiyalî avê kayik dimeşin
Berburî hatin xelqê bi nexş in
Berbûrî hatin xelqê bireşin
Çavê reşbelek xew lê dixuşin
Çavê reşbelek xew lê dixuşin

Xurnik û gurnik xurnik lê nayê
Kofiya bêbavê cênîk berdayê

Ha li wiyalî avê kayîk dibezin
Ha li wiyalî avê kayîk dibezin
Berbûrî hatin xelqê bigevezin
Berburî hatin xelkê bigevezin
Çavê reşbelek xew lê bigezin
Çavê reşbelek xew lê bigezin

Xurnik û gurnik xurnik lê nayê
Kofiya bêbavê cênîk berdayê

Ha li wiyalî avê kayîk diçûne
Ca li wiyalî avê kayîk diçûne
Berbûrî hatin gundî li dû ne
Berbûrî  hatin gundî li dû ne
Çavê reş û belek xew lê diçûne
Çavê reş û belek xew lê diçûne
Xurnik û gurnik xurnik lê nayê
Kofya bêbavê cenik te da ye

Herema Bingolê, çavkanî : Eliyê Hinzorî

# Xweliya weten




Xweliya weten tu kar dar î
Tu kaniya min î tu rih û can î
Tu kar û bar î xweliya weten
Xweliya weten

Rih û can î tu kar û bar î
Xweliya weten xweliya weten

Reng û awaz didî gula
Emir didî çiya û baniya
Dibî dimis dibî mêwe
Dayîka min em tên baş
Rih û can î

Tu kanî yî tu emîr î
Ferman didî tu ewle da
Tu huba xwe tu vedikî
Li pêşiya me hemû derge
Rih û can î...

Xweliya weten tu kar dar î
Tu kaniya min î tu rih û can î
Tu kar û bar î xweliya weten
Xweliya weten
Rih û can î...

# Xwestî me




Xwestî me xwestî me lê yadê lêlê lo yabo min nadê
Xwezgîniyê min hatine lê yadê lêlê lo yabo min nadê
Malame rûniştî ne lê yadê lêlê yabo min nadê

Xwezgîniyê min kî û kî ne lê yadê lêlê lo min nadê
Mele, Qazî û Miftî ne lê yadê lêlê lo yabo min nadê
Qelenê min birîne lê yadê lêlê lo yabo min nadê

Sed beran û sed mî ne lê yadê lêlê lo yabo min nadê
Xelata min danîne lê yadê lêlê lo yabo min nadê
Çift dêrê qextanî ne lê yadê lêlê lo yabo min nadê

# Xwezla kirasê bi şal bûma




Xwezla kirasê bi şal bûma lê lê kemê lê lê
Xwezla sêva sor bûma sîng sedefê canê

Xwezla gorê bi nexş bûma lê lê kemê lê lê
Xwezla li lingê te bûma sîng sedefê canê

Xwezla qayîşa sor bûma lê lê kêmê lê lê
Xwezla li pişta te bûma sîng sedefê canê

Ez li vî gundî mêr nakim lê lê kêmê lê lê
Kofiya zêra çênakim sîng melemê canê

# Xwezle biskek bûma




Xwezla ez têlek bûma lê lê lê lo bi lo lo lo cano
Xwezla ez biskek bûma domamê bi xulamê

Têl têlê berana bi lê lê lê lo bi lo lo lo cano
Bisk biskê berana bi domamê bi xulamê

Çavkêm di xewa şêrîn lê lê lê lo bi lo lo lo cano
Destêm ser bistana bi domamê bi xulamê

Têl têlê karika lê lê lê lo bi lo lo lo cano
Bisk biskê karîka bi domamê bi xulamê

Çavkêm di xewa şêrîn lê lê lê lo bi lo lo lo cano
Destêm ser memika bi domamê bi xulamê

Aramê Tigran, radyoya Êrîvanê


# Yadê Yabo




Harê yadê hey harê yadê
Yadê yabo hey bê mirwetê
Te wez kuştim hey (li) vê dawetê
Yadê yabo hey bê mirwetê
Harê yadê hey bêriya pezî
Yadê yabo hey bê mirwetê
Te ser memik hey xoxa rezî
Yadê yabo hey bê mirwetê
Te wê xwaro hey dev lê tezî
Yadê yabo hey bê mirwetê
Te wez kuştim hey vê dawetê
Yadê yabo hey bê mirwetê
Harê yadê hey beriya mihan
Yadê yabo hey bê mirwetê
Wan lawikan hey dev lê nihan
Yadê yabo hey bê mirwetê
Rezê mêran hey rezê mêran
Rezê mêran hey baxê mêran
Gûl û rihan nêv van giran
Rezê mêran hey baxê mêran
De hûn rabin hey bikin seyran
Rezê mêran hey baxê mêran
Bûk leylanê hey gerden zîvê
Rezê mêran hey baxê mêran
De bila rabin hey bigirin seyran
Rezê mêran hey baxê mêran
Bûk leylanê hey bigirin seyran
Rezê mêran hey baxê mêran

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Yadim ke feryadim ke




Yarekem miryemî naw bû faydey çî wefay bom nebû
Sed h'eyif le destim derçû ay birînanim mekulênewa
Yadim ke feryadim ke tixwa çaw ciwan to naz meke
Her çend carê nazan dekey ay malê le min wêran dekey

Kaxezî denûsî bo min ke şêt u şeyday tom emin
Were kinim yarî tom min ay birînanim mekulênewa
Yadim ke feryadim ke...

Derdî dilim tewaw nabêt xuda zû ew mustecab bê
Be destî min giriftar bê ay birînanim mekûlênewe
Yadim ke feryadim ke...

Soranî / Gelêrî

# Yar bêzar bêzar




Yar bêzar bêzar bêzarê
Gelo hûn bêjin bêzarê

Bêzar kewa kek belek e
Delal kewa kek belek e

Herê bêzar sed û yek e
Herê bêzar sed û yek e

Ferek xwe da çop kulek e
Ferek xwe da çop kulek e

Bêzar kewa kek hêşîn e
Delal kewa kek hêşîn e

Herê bêzar sed û sî ne
Herê bêzar sed û sî ne

Wê li pencerê xwe diweşîne
Wê li pencerê xwe diweşîne

# Yar bêzarê




Yar bêzarê yar bezarê
Lawno win bêjin bêzarê
Yar bêzarê yar bezarê
Kurno win bêjin bêzarê

Bêzê sêva li guliya darê
Lawno win bêjin bêzarê
Bêzê sêva li guliya darê
Kurno win bêjin bêzarê

Xortno herinê binîne xarê
Lawno win bêjin bêzarê
Xortno herinê binîne xarê
Kurno win bêjin bêzarê

Yar bêzarê yar bezarê
Lawno win bêjin bêzarê
Yar bêzarê yar bezarê
Kurno win bêjin bêzarê

Bêzê kevokek belek e
Lawno win bêjin bêzarê
Dêlê kevokek belek e
Kurno win bêjin bêzarê

Firek da xwe çû felek e
Lawno win bêjin bêzarê
Firek da xwe çû felek e
Kurno win bêjin bêzarê

Danî li ser xaniyê melîk e
Lawno win bêjin bêzarê
Danî li ser xaniyê melîk e
Kurno win bêjin bêzarê

Yarê xelkê yek û du ne
Yê bêzarê sed û yek e
Yarê xelkê yek û du ne
Yê bêzarê sed û yek e

Yar bêzarê yar bezarê
Lawno win bêjin bêzarê
Yar bêzarê yar bezarê
Kurno win bêjin bêzarê


# Yar can têrcan




Yar can têr can
Çûme siwara Xelêwo
Yar can têr can
Kêloka serê rêwo
Yar can têr can
Kil û kildan mistêwo
Yar can têr can
Kêlokî çendî ciwan e
Yar can têr can
Memik tirhê rezan e
Yar can têr can
Colemêrgê zozan e
Yar can têr can
Birno danî ser ra ne
Yar can têr can
Navê yara min ev e
Yar can têr can

Armanc girto nîşan e
Yar can têr can
Ev armanca lawan e
Yar can têr can
Her roj karê min ev e
Yar can têr can
Kêlokê tevnek danî
Yar can têr can
Dav ser davê hilanî
Yar can têr can
Keç xişîmo nezanî
Yar can têr can
Vê narê tevnek çêkir
Yar can têr can
Dav ser davê wê lêkir
Yar can têr can
Keç xişîmo wê rêkir

# Yar derwa




Soranî / Gelêrî

Wek bulbulan feslî behar
Şew u roj leyil u nehar
Denalênim bo weslî yar
Her derwa u be cêm dêlê

Cergim let let ken be şîran
Qol bestim ken be zincîran
Deçime dîdenî dezgîran
Her...

Cergim let letî balate
Xalêk wa leser kulmane
A'lemê xuday betemate
Her..

De gule damênî min u h'acer
Xalê leylêm dêne defter
Her xalêk u dused gewher
Her...

# Yar dîlan




Yar dîlan dîlan dîlan yar dîlan yar dîlan hoy dîlan
Can dîlan dîlan dîlan can dîlan yar dîlan hoy dîlan

Min dibêm dîlan ramûsim yar dîlan yar dîlan yar dîlan
Min dibêm dîlan ramûsim yar dîlan can dîlan emrê min

Tirsim bimrim nebînim yar dîlan yar dîlan can dîlan
Tirsim bimrim nebînim yar dîlan can dîlan emrê min

Tirsim bimrim nebînim yar dîlan yar dîlan yar dîlan
Te bibînim te nebînim yar dîlan can dîlan emrê min

Tesker nebê wer tînim yar dîlan yar dîlan yar dîlan
Tesker nebê wer tînim yar dîlan can dîlan emrê min

Yar dîlan dîlan dîlan yar dîlan yar dîlan hoy dîlan
Can dîlan dîlan dîlan can dîlan yar dîlan hoy dîlan

Gearbêtê Xaço, radyoya Êrîvanê

# Yar Eyşê




Yar Eyşê tê 'j bircan
Bircên belek e

Çend stêrên ezmanan
Ley bûn xelek e

Yar Eyşê ez çûme
Bircekî sor e

Çend stêrên ezmanan
Ley bûn pispor e

Yar serê min dêşit
Keyfa min xor e

Yar çavê min b' te ket
Keyfa min veke

Yar Eyşê tê'j bircan
Bircên bircî ne

Yar stêrên ezmanan
Ley bûn civîn e

Yar çavê min bi te ket
Keyfa min nîn e

Yar Eyşê tê'j bircan
Birceki reş e

Yar stêrên ezmanan
Ley bûne geş e

Yar çavê min b' te ket
Keyfa min xweş e

Herêmên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan

# Yar govendê




Yar govendê yar govendê
Yar govendê yar govendê

Wez heyrana lê bejnê zendê
Wez heyrana lê bejnê zendê

Ket bîr te ez hatime bendê
Ket bîr te ez hatime bendê

Govend gera lê xet bi xet e
Govend gera lê xet bi xet e

Ser govendê lê qîz û met e
Ser govendê lê qîz û met e

Govend gera lê sûk bi sûk e
Govend gera lê sûk bi sûk e

Ser govendê lê qîz û bûk e
Ser govendê lê qîz û bûk e

Yar govendê yar govendê
Yar govendê yar govendê

Radyoya Êrîvanê

# Yar Gulê




Yar gulê gulê gulê gulê bi gula min e
Yar gulê gulê gulê gulê bi emrê min e

Gula min e xerab, rind e yar gula min e
Kulîlka li nava gund e yar gûla min e

Gula min e dil şa bûye yar gula min e
Nişaniya xwe hinda kiriye yar gula min e

Nişaniya wê bê dilê wê ye yar gula min e
Can û dilê min ketiyê yar gula min e

Gula min e ne li wir e yar gula min e

Radyoya Êrîvanê

# Yar li tebexa didiya




Yar li tebexa didiya
Rûnişt û rabû piya
Yar li tebexa didiya
Rûnişt û rabû piya
Xwîna min zû lê keliya
Dilkê min ji ber êşiya
Dilkê min ji ber êşiya
Yar tu were vî banî
Dost tu were vî banî
Min nîşanya te anî

# Yar merheba




Yar merheba, yar merhaba
Hê li min kurk e ca li te eba
Yar merheba şimik sorê
Dost merheba şimik sorê
Şimka derxe derxe derxe
Şimka derxe were jorê
Ez ramîsim heylo meylo
Heylo meylo te por sorê

Yar merheba yar merheba
Hê li min kurk e ca li te eba
Yar merheba şimik zerê
Dost merheba şimik zerê
Şimka derxe derxe derxe
Şimka derxe were derê
Ez ramîsim heylo meylo
Heylo meylo te esmerê

Yar merheba yar merheba
Hê li min kurk e ca li te eba
Yar merheba şimik reşê
Dost merheba şimik reşê
Şimka derxe derxe derxe
Şimka derxe were hewşê
Ez ramîsim heylo meylo
Heylo meylo te çavreşê

Yar merheba yar merheba
Hê li min kurk e ca li te eba
Yar merheba şimik alê
Dost merheba şimik alê
Şimka derxe derxe derxe
Şimka derxs were malê
Wez ramîsim te delalê

Herema Amedê, çavkanî: Rojen Barnas

# Yar Meyremê




Yar Mayremê Meyremê alla alla Meyremê
Yar Meyremê Meyremê keça şahê Ecemê
Meyrem qîza keşîş e
Tolbav keça keşîş e
Paşil tije mişmiş e
Paşil tije mişmiş e
Şevkî were mala me
Duşev were mala me
Canê te ra bexşîş e
Canê te ra bexşîş e

Yar Meyremê
Yar Meyremê
Meyrem qîza file ye
Tolbav keça file ye
Paşil tije xurme ye
Paşil tije xurme ye
Şevkî were mala me
Duşev were mala me
Canê te ra feyde ye alla alla Meyremê
Canê te ra feyde ye keça şahê Ecemê

# Yar Şemamê




Herêma Serhedê

Yar şemamê şemamê yar yar yar şemamê
Yar şemamê şemamê dost gewrê dotmamê
Şemam sêva li sûka
Şemam sêva li sûka
Nedin destê zarûka
Nedin destê zarûka
Xira nekin neynûka
Xera nekin neynûka

Yar
Yar
Şemam sêva dikana
Şemam sêva dikana
Nedin destê nezana
Nedin destê nezana
Xira nekin dirana
Xera nekin dirana
Yar şemamê şemamê yar yar yar şemamê
Yar şemamê şemamê dost gewrê dotmamê

# Yar şîna min




Herêma Amedê

Yar şîna min yar şîna min
Yar şîna min gul şîna min
Ma tu gul î li ber bîna min
Yar şîna mina hondrof î
Gul şîna mina Hondrof î
Teli serî şar û kofî
Ji bextê law ra tu bûy sofî
Ji bextê kur ra tu bûy sofî

Yar şîna min
Yar şîna min
Ma tu gulî
Yar şîna mina îndarî
Gul şîna mina îndarî
Te li serî zêrê sarî
Bavê te nade bi heft hezarî
Bavê te nade bi heft hezarî

Yar şîna min
Yar şîna min
Ma tu gul î
Yar şîna mina Berbûşî
Gul şîna mina Berbûşî
Te li serî şar û poşî
Ji bextê law ra tu berdûş î
Ji bextê kur ra tu berdûş î
Yar şîna min yar şîna min
Yar şîna min gul şîna min
Ma tu gulî li ber bîna min

# Yar sosin sosin




Yar sosin sosin sosin sosinê li mêrga dema yî
Yar sosin sosin sosin delalê li mêrga dema yî

Keçik çûne dîlanê hemî bi kemberê badayî
Keçik çûne dîlanê hemî bi kemberê badayî

Ez diçûme ramûsana aqil û sewda nemayî
Ez diçûme ramûsana aqil û sewda nemayî

Yar sosin sosin sosin sosinê li mêrga hêşîn e
Yar sosin sosin sosin delalê li mêrga hêşîn e

Keçik çûne dîlanê hemî bi kemberê zîvîn e
Keçik çûne dîlanê hemî bi kemberê zîvîn e

Wez dikim sosin ramîsim aqil û sewda tu nîne
Wez dikim sosin ramîsim aqil û sewda tu nîne

Yar sosin sosin sosin sosinê li mêrga belek e
Yar sosin sosin sosin delalê li mêrga belek e

Keçik çûne dîlanê hemî bi kemberê xelek e
Keçik çûne dîlanê hemî bi kemberê xelek e

Hesen Cizrawî, radyoya Bexdayê

# Yar welle keçik e




Yar welle keçik e bîlle keçik e
Yar serî siyam e bin da tenik e

Dikim wê ramûsim nizanim çi dike
Min divê wê ramûsim min li xo şor dike

Yar welle...

Yar guhê guhar e guhar kûl dike
Min divê ramûsim nizanim çi dike

Yar welle...

Yar pozê xizêm e xizêm şirik e
Min divê ramûsim nizanim çi dike

Yar welle...

Herêma Serhedê, çavkanî : Şemdîn

# Yar Weso




Delalê yar weso, wez naçime guniya
Delalê yar weso, wez naçime guniya

Banadim şe nakim, ha ez cotê guliya
Banadim şe nakim, ha ez cotê keziya

Çi kul e çi derd e daye dilê zeriya
Çi kul e çi derd e daye dilê zeriya
Delalê yar weso, wez naçime qirşika
Delalê yar weso, wez naçime qirşika

Lê nadim dernaxim, reqe reqê şimika
Lê nadim dernaxim, reqe reqê şimika

Çi kul e çi derd e daye dilê keçika
Çi kul e çi dred e daye dilê keçika

Delalê yar weso, wez naçime beyara
Delalê yar weso, wez naçime beyara

Hilnagirim ranakim, ha ez piştiyê dara
Hilnagirim ranakim, ha ez piştiyê dara

Çi kul e çi derd e daye dilê van yara
Çi kul e çi derd e daye dilê van yara

Delalê yar weso, wez naçime guniya
Delalê yar weso, wez naçime guniya

Herêma Serhedê, çavkanî : Şemdîn

# Yar wezo




Yar wezo nexweş im
Min bavêjin zozana
Dost wezo birîndar im
Min bavêjin zozana

Yar bavêjin ser min
Qatên orxana
Dost bavêjin ser min
Qatên orxana

Yar derdê hêwiyê
Jana dirana
Dost derdê hêwiyê
Êşa dirana

Yar wezo nexweş im
Min bavên odê yo
Dost wezo birîndar im
Min bavên odê yo

Yar bavêjin ser
Min qatên cilê yo
Dost bavêjin ser
Min qatên cilê yo

Yar derdê hêwiyê
Jana tayê yo
Dost derdê hêwiyê
Êşa tayê yo


Yar wezo nexweş im
Min bavên hewliyê
Dost wezo birîndar im
Min bavên hewliyê

Yar bavêjin ser min
Qatên xaliyê
Dost bavêjin
Ser min qatên xaliyê

Yar derdê hewiyê
Jana tiliyê
Dost derdê hewiyê
Êşa tiliyê

Herema Serhede, çavkanî : Marûf

# Yar xesuyê




Hêlela maşela yar xesuyê xesuyê

Hêlela maşela bangerê serê tuyê
Hêlela maşela biqulibe ser xesuyê
Hêlela maşela bişkêne paresuyê
Hêlela maşela yar xesuyê xesuyê

Hêlela maşela xwezka xesû nebana
Hêlela maşela du kod mewuc hebana
Hêlela maşela bûk bi dilê (serê ) xwe bana
Hêlela maşela yar xesuyê xesuyê

Hêlela maşela xesuya hemuya gewlaz kin
Hêlela maşela ava mezin derbas kin
Hêlela maşela bûka ji xesuya xilas kin
Hêlela maşela yar xesuyê xesuyê

Hêlela maşela Xesuya bibin koxêyo
Hêlela maşela wan kin cila kerêyo
Hêlela maşela xesuya bidin tobêyo
Hêlela maşela yar xesuyê xesuyê

Herêma Serhedê

# Yar xwihkê




Yar xwikê xwihka te me
Nav rez û baxê te me

Tirhokê balê te me
Dêm heyvika çarde me

Xewna te ez her heme
Ew lec û balê te me

Yar xwihkê pezê soro
Yê'd beriyê de'd boro

Wê'l nav ketin pisporo
J'hemuyan ketin hingoro

Yar xwihkê pezê spiyo
Yêl beriyêd'd çêro

Wê'l nav ketin bêriyo
J'hemuyan ketin keyfiyo

Heremên Şirnax û Çulemergê, çavkanî : Seydayê Goyan


# Yar yar




Bulbulî le nêw gulzar
Yar, yar, yar, yar
Ta key danîşîn xumar
Yar, yar, yar, yar
Yarim, yarim, yar...
To bo gul u min bo dil biçirîkênîn
Herdûkman, a'şiqî gulîn, dil pir le xwênîn
Bulbul boçî damawî
Yar, yar, yar, yar
Bo le gulzar torawî?
Yar, yar, yar, yar
Ey bulbulî dil xemgîn
Yar, yar, yar, yar
Danîşîn be kul bigrîn
Yar, yae, yar, yar

Soranî / Gelêrî

# Yar yarê




Yar yarê yarê lê, yar yarê yarê
Keç çûne bêriyê lê danê êvarê

Yar yarê yarê lê, yar yarê yarê
Yar yarê yarê lê şarhêşînokê
Şarhêşînokê lê xemrevînokê
Xemrevînokê lê xortxapînokê

Carek me di gotî lo hîva me wa ye
Du car te di gotî lo hîva me wa ye
Rûkê esman da lo wayê xuya ye
Di nîvê esman da lo wayê xuya ye
Xwar bûm ramîsim lo keçka keya ye
Derdê min kula min keçka keya ye

Yar yarê yarê lê, yar yarê yarê
Keç çûne bêriyê lê danê êvarê


Carek me di gotî lo hîva me zîz e
Du car te di gotî lo hîva me zîz e
Rûkê esman da lo wayê dileyîze
Di nîvê esman da lo wayê dileyîze
Xwar bûm ramîsim lo keçka Ezîz e
Derdê min kula min keçka Ezîz e

Yar yarê yarê lê, yar yarê yarê
Keç çûne bêriyê lê danê êvarê

Carek me di gotî lo hîva li bêderê
Du car te di gotî lo hîva li bêderê
Sênî li desta lo av da şêzerê
Cerî li desta lo av da şêzerê
Xwar bûm ramîsim lo te keç esmerê
Derdê min kula min te keç esmerê

Herêma Amedê

# Yar yeman




Yar yeman yeman yeman
Yar yeman gewrê yeman

Ez çûme Diyarbekir yar yeman yeman yeman
...yar yeman gewrê yeman

Anî kelek şekir yar yeman yeman yeman
...yaı yeman gewrê yeman

Heram be qûmtam nekir yar yeman yeman yeman
...yar yeman gewrê yeman

Yar yeman

Herêmên Serhed û Amedê, çavkanî : Hilmi Akyol

# Yar Zeyneb




Yar Zeyneb Zeyneb Zeyneb Zeyneba min
Zewali Zeyneb nayê çaw reşa min

Awî h'emamok çend germe wey lê lê
Singî nazdarêm çend nerme wey lê lê

Yar Zeyneb...

Herêma Amedê

# Yara min a bedew e




Yara min a bedew e
Çav reşê sîng sedef e
Yar ez wa nakim
Memkê yarê wisan e
Mîna sêv û hurmiyan e
Agirê dilêm bişkêne
De tu were ba min

Yara min e bilind e
Çav reşê gula gund e
Yar ez wa nakim
Biryê yarê qeytan e
Eniya kever meydan e
Agirê dilêm vemrîne
De tu were ba min

Yara min e qeşeng e
Şara serî heft reng e
Yar ez wa nakim
Dêmê yarê sor gulî
Kesk û sor de xemilî
Agirê dilêm vemrîne
De tu were ba min

Rabe were li ba min
Te ez boy xwe helandim
Yar ez wa nakim
Qeşeng çavreş bedewê
Por sorê pencê tavê
Agirê dilêm vemrîne
De tu were ba min

Ez nexweşê bedhal im
De tu were ber pala min
Yar ez wa nakim
Ji derdê dila dinalim
Gul sosina dewranim
Agirê dilêm vemrîne
De tu were ba min

Gazî dikim deng nakî
Derd û kulan radikî
Yar ez wa nakim
Nazdarê nazya neke
Soz qirarê me yeke
Agirê dilêm vemrîne
De tu were ba min

Delalam çima ditirsî
Ne ez xort im tu qîz î
Yar ez wa nakim
Wextê daweta me ye
Dinê alem şade ye
Agirê dilêm vemrîne
De tu were ba min

Aramê Tigran, radyoya Êrîvanê

# Yare ciwanekem




Yare ciwanekem, yare ciwanekem gulî şox u şeng
Xunçîlanekem, dilgoşay dilteng
Le baxî sawa le baxî sawa pawanî sîne
Pencem sergermî lîmo gûşîne

Ser kulmey geşit, ser kulmey geşit berewberî gul
Xwa dawiye beşit giştniyazî dil
Le baxî...
Pencem...

Ew şew wa diyare, ew şew wa diyare qedirî dilane
Mangî behare u cengey gulane
Cengey behare u mangî gulane
Le baxî...
Pencem...

Be qijî zerînit, be qijî zerînit be lîmoy alit
Be çawî şînit be daney xalit
Toy şilk u nasik toy şilk u nasik toy u nerim u tol
Toy sil wek asik toy wa xir u xol
Le baxî...
Pencem...

Ew sîney nermit ew sîney nermit le dil çespandim
Tarmayî şermit le rû tarandim
Le baxî...
Pencem...

# Yarekem çawî şîne




Soranî / Gelerî

Yarekem çawî şîne awatî dil u jîne
Demî be pêkenîne boye le dil şîrîne
Be xwa xoşim dewê derdî le min kewê
H'elalî xome bê ew dinyam nawê

Rojê eger neybînim xerqî aw u agirim
Ya xwa qet lêm dûr nebî bê to aram nagirim

Be xwa xoşim dewê...

Bulbulim perwane nîm h'ez be sûtanim meke
Kafirî îşqit bum to musulmanim meke

Be xwa xoşim dewê...

# Yarekem delêy bûke




Yarekem delêy bûke ciwanî şarî kerkûke
Lankêkî le bo dênim darekey belalûke

Şiney şemal lewlaye ba helkat u ew xwaye
Belku hewalêkî yar le şiney şemal daye

Yarekem...

Deçme wilatî germênê lêm zîze u naman diwênê
Şêxî germên u kwêstan xwaye le minî nestênê

Yarekem...

Soranî / Gelêrî

# Yarekem dildarekem






Bedkaran malyan şêwê
Ya rebî kostyan kewê
Neyan hêşt binuyin dwê şewê
Yarekem, dildarekem
Dostî par u pêrarim
Bo şêwandit gulzarekem
Ciwanî delêy terlanî
Ey kotorî deştî e'mmanî
Awirit le min berdawe
To xase kewî ceyranî
Yarekem, dildarekem gulzarekem
Cergim hela helaye
Dey were toy çarekem
Çend mela bûn çend feqê
Deroyin le rêy şamê
Hemûy a'şiq bûn kewtin
Giyan be dewrey gul endamê
Eminîş yekêk bûm lewan
To bo maçêkit nedamê
Yarekem, dildarekem gulzarekem
Sed hezar xozgem be to u be parekem

Beh beh lew çawe ciwane
Lêwî delêy qeytane
Gerdinî delêy guldane
Ca ew derdey min dekûjê
Xo jinî guley mêrdane
Çaw çiray seh'ray çînî
To wek kotirî serbal şînî
Awirit le min berdawe
To çend xanim u çend nexşînî
Şew u roj bîst u çware
Wey be deqîqe u be sea't
Emin çawerêy yarim
Min nemzanî boçî nehat
Rebî muşkilozmem bê hey
Ew leser pirdekey sirat

# Yarî caran




Betal bû cêjwan giyane berî beyane
Pêm niye birom giyane yarekem ciwane
Yarî caran çî bikem zor le min dûrî
Meger xudawend bimda seburî

Awirî tê berdam giyane ew taqe xale
Satêk netbînim giyane jînî min tale
Yarî...
Meger...

Yar belênî da giyane eminîş weku tom
Eminîş weku to giyane şêt u şeyday tom
Yarî...
Meger...

Dest be destî yek u dûr le awayî
Zor zor naxoşe giyane katî cûdayî
Yarî...
Meger...

Soranî / Gelêrî

# yarî reza şîrînim




Xem xor u xwên şîrînim
Xwênaw dê le birînima
Ya rebî be xêr bêtewe
Yarî reza şîrînim
Hêşta leser lanik bû
A'şiqî çawî amînim
De were destim desto bike
Ba sarêj bê birînim
Temenna dekem le xuda
Ya rebî mergit ne bînim
Be harey delêy hewre
Be girmey delêy baye
Nexoşim bo lêw alê
Le bo lencey tuba ye
Lewetey amînim dîwe
Qed kesim we bîr naye
Xizmîne memken lome
Ew dilem şêt u şeydaye
Cûtê çawî belek u
Zulfî hewda hewda ye

Çend qeza u lîwa geram
Serpakî merwê u pişder
Bo to mirdim reş esmer
Tîrêkit le cergim da
Le dilim buwe karîger
Awirit le min berdawe
Memkî çepit wek gewher
Hey delêm bimdeye maçê
Bo to mirdim reş esmer
Wey sea't le heşt u h'ewt
Dîm çawim pêy kewt
Girtim be zulfîmda kird
E'trî h'eftad u h'ewt
Girtim dû maçim lê send
Daykî zanî rêm kewt
Ca xuda be we ruh'mî kird
Sersimêkî daw kewt
Ger bihatiba u nekewtiba
Se darim wê dekewt

Soranî / Gelêrî

# Yarilla




Yarila de bi yarila, yarila
Yarila ya Xwedê û ya Ela

Yarila ew rûvîkê Boşatê
Yarila ew teresê Boşatê
Yarila qemça xwe kir bin tatê
Yarila ya Xwedê û ya Ela

Yarila de bi yarila, yarila
Yarila ya Xwedê û ya Ela

Yarila ew rûvî mamê min e
Yarila ew teres mamê min e
Yarila qemça xwe kir şûjin e
Yarila qij kir û hate min e

Yarila de bi yarila, yarila
Yarila ya Xwedê û ya Ela

Yarila çerme xesûyê jê kin
Yarila li ser pişta kerê kin
Yarila bibin bajarê Hezo
Yarila şim û masa jê çêkin

Yarila de bi yarila, yarila
Yarila ya Xwedê û ya Ela

Herêma Amedê, çavkanî : Rojen Barnas

# Yek mûmik




Kanê tembûra we lo kanê tembûrvanê we
Kanê zurneya we lo kanê zurnevanê we
Kanê dahula we lo kanê dahulvanê we
Kanê mêvanên we lo kanê mazûvanên we
Wanê mêvanên me lo vane mazûvanên me
Kanê bûk û zavê we lo kanê va govenda we
Wanê bûk û zavê me lo vayê govenda me

Yek mûmik du mûmik sê mûmik çar mûmik çarde mûmik
Serê malê misqalêk bûk li zava bimbarek ha nîna ha nîna ha nîna

Çû me Musilê carek min anî hine barek
Her çî malê keç tê da me dabûye sihanek

Yek mûmik

Hatim Diyarbekir carek min anî rihel barek
Her çî malê xort tê da me dabûye destmalek

Yek mûmik

Herêma Amedê

# Yerîlo yerîlo




Yerîlo yerîlo yerîlo can
Yerîlo yerîlo yerîlo can
Yerîlo yerîlo dilorîne
Yerîlo yerîlo yerîlo can

Hatin derî bi dadayî
Yerîlo yerîlo yerîlo can
Hatin derî bi dadayî
Yerîlo yerîlo dilorîne

Cî û balgîf danayî
Yerîlo yerîlo yerîlo can
Cî û balgîf danayî
Yerîlo yerîlo dilorîne

Qerzê ber da dolab e
Yerîlo yerîlo yerîlo can
Qerzê ber da dolab e
Yerîlo yerîlo dilorîne

Derdê min keçika muxtar e
Yerîlo yerîlo yerîlo can
Derdê min keçika muxtar e
Yerîlo yerîlo dilorîne

Sibe ye tav zereqî
Yerîlo yerîlo yerîlo can
Sibe ye tav zereqî
Yerîlo yerîlo dilorîne

Zêr li eniyê biriqî
Yerîlo yerîlo yerîlo can
Zêr li eniyê biriqî
Yerîlo yerîlo dilorîne

# Yo Zeynê




Yo zeynê zeynê zeynê, zeynê zeynê
Yo zeynê zeynê zeynê, kulîlka evdil eynê

Hevke penîrê sipî me, yo yo yo zeynê zeynê
Cîcike penîrê sipî me, kulîlka evdil eynê

Hima-îla dor morî me, yo yo yo zeynê zeynê
Hîma-îla dor morî me, kulîlka evdil eynê

Para lawkê cindî me, yo yo yo zeynê zeynê
Para kurkê cindî me, kulîlka evdil eynê

Berfa çiyayê sor im, yo yo yo zeynê zeynê
Berfa çiyayyê sor im, kulîlka evdil eynê

Hima.îla dor bimor im, yo yo yo zeynê zeynê
Hima-îla dor bimor im, kulîlka evdil eynê

Pora lawkê pismor im, yo yo yo zeynê zeynê
Pora lawkê pismor im, kulîlka evdil eynê

Berfa çiyayê reş im, yo yo yo zeynê zeynê
Berfa çiyayê reş im, kulîlka evdil eynê

Hima-îla dor binexş im, yo yo yo zeynê zeynê
Hima-îla dor binexş im, kulîlka evdil eynê

Para lawkê keleş im, yo yo yo zeynê zeynê
Para kurkê keleş im, kulîlka evdil eynê

Radyoya Êrîvanê

# Zava tê ji hemamê




Zava tê ji hemamê
Ji hemamê derketiye
Şaşa xwe girêda
Reş rihan ber de têye

Dayîkê tû qurban bî
Ser milan çoxê sor e
Dayikê tû heyran bî
Ser milan çoxê sor e

Zava tê ji hemamê
Ji hemamê derket der ve
Dayikê tû qurban bî
Ser milan çoxê zer e

Zava tê ji hemamê
Ji hemamê derket jor e
Şaşa xwe girêda reş rihan
Ber de (di) bor e

Zava tê ji hemamê
Ji hemamê di meşe
Şaşa xwe girêda reş rihan
Ber de (di) meşe

Herêma Serhedê

# Zava




Ax loloy loloy loloy loloy loloy zava
Ax loloy loloy loloy loloy loloy paşa

Ax loloy zava çadir mezino
Ax loloy paşa çadir mezino
Serdarê çadira şîşê hesino
Serdarê çadira şîşê hesino
De bira bi qurban be xuşka mezino
De bira bi gorî be xuşka mezino

Ax loloy zava çadir navîno
Ax loloy paşa çadir navîno
Serdarê çadira şîşê zîvîno
Serdarê çadira şîşê zîvîno
De bira bi qurban be xuşka navîno
De bira bi gorî be xuşka navîno

Ax loloy zava çadir biçûko
Ax loloy zava çadir biçûko
Serdarê çadira dar belalîgo
Serdarê çadira dar belelîko
De bira bi qurban be xuşka biçûko
De bira bi gorî be xuşka biçûko

Ax loloy zava me ji te hêvî ye
Ax loloy paşa me ji te hêvî ye
Şekirek bixwe şev çû nîvî ye
Şekirek bixwe şev çû nîvî ye

Ax loloy zava me ji te dîlek e
Ax loloy zava me ji te dîlek e
Şekirek bixwe şev çû gelek e
Şekirek bixwe şev çû gelek e

Herêma Amedê

# Zawa le bûkê mede




Erê e'mir u çawekem yare
Zêrî hecde e'eyare
Ca gelî dost u biraderan
Tegbîr biken lew kare
Babî zîndanî kirduwe
Dewirey sîmî xardare
Nawêrim biçime jiwanêy
Kost u qerewil diyare

Erê zawa le bûkê mede
Bo lêy dedey le bûkê
Ca de malî xot berdedey
Giryan u nûke nûkê
Babî lêt a'ciz debê
Daykî lêt deka tûkê

Erê zawa le bûkê mede
Ca delêy dinyat nedîwe
Bo de male xot dexey
Ew zirîwe u qirîwe
Cûtêk şemamey xet xet
Goy memikî dadirîwe

Cûtêk gwarey bo dekirim
Xalis telay destewşan
Çepkêkî gul leber da
Têkelin le wenewşan
Zulifî pexiş u pexşane
Çîn çîn kewtûne ser şan

Erê zawa le bûkê mede
Samit we ser nakewê
Cutêk şemamey xet xet
Ca direng wedest dekewê
Ser goy memkoley lûse
Le kirasê derdekewê

Cûtêk şemamey xal xal
Ca le beroyda dirwawe
Be yarêm gut bo maçê
Şîrîne awirêkî dawe
Ciwabî dawe deyfermû
Be kes wei'dem nedawe

Zawa le bûkê mede
Bukê danebezîwe
Bo le male xot dexey
Ew zirîwe u qirîwe
Cûtêk şemamey xet xet
Goy memkî dadirîwe

Erê zawa le bûkê mede
Bûk bo lêdanê nabê
Zor h'eyfe ew gule sûre
Ser u desrey xera bê
Eger bêtû lêy bidey
Serpencet kolewar bê

Sorani / Gelêrî

# Zembîlfiroş




Zembîlfiroş zembîla tîne
Kolan bi kolan digerîne
Gulxatun lî bircê wî dibîne
Aqil û sevda namîne

Kuro selka wir da bîne
Mîr dixwaze te biwîne
Buha buha ji te bistîne
Lawiko wez evîndar im

Xatûna min a delalî
Cavreşa min a delalî
Min bîhistî mîr ne li malî
Bazaram hekê helalî
Xatûnê wez tobedar im

Zembîlfiroş lawkê biyanî
Keremke tu were banî
Qîmeta xelkê tu zanî
Selka nefroşe bi erzanî
Lawîko wez evîndar im

Xatûnê wez tobedar im
Delalê wez tobedar im
Tobedarê xelqê ceBotan-
Behdînanar îm
Ji ber hukmê xaliq nikarim
Lê kemê wez tobedar im

Zembîlfiroş lawkê ne nas e
Bi tena derpê û kiras e
Tû ji destê min nabê xelas e
Lawiko wez evîndar im

Xatûnê gerdan bi morî delalê ger-
dan bi morî
Sol nabe bi kotek û zorê tirsa min
ji Rebê jorî
Xatûnê wez tobedar im

Lawiko dûnya sîrîn e
Tu lez ke bi tenê werîne
Kêf û lezetê biwîne
Tu min ji xwedê ne tirsîne
Lawiko wez evîndar im

Lê lê lê lê lê xatunê
Çawên te weka zeytûnê
Tirsa min ji agirê wê tune
Xatûnê wez tobedar im
Delalê wez tobedar im

Herêma Amedê

# Zênebê




De ber ew zulfet demirim leser kulmit bûne lam
Êsta her denalim bew tîrey dwênê lêt dam
Were bimdeye maçêk dulberî şîrîn endam
Zênebê wey zênebê zêneb dû danî zêre
Ummetî mih'emmedîm le dînim wermegêre
Deçime ser mexakoye derwanête ferengî
Cûtêk şemamay xet xet le min heldênin jengî
Leser balay berzî to ba lêm den be tifengî
Zênebê wey zênebê le zênebey ziwarî
Derdî babanit şêwê xem bûy le dilî min barî
Ew sal h'ewt salî texte bo balat şêt u şeydam
Nexoşî balay tome kewtûme le naw cêgam
Were awirêkim wêde derdit le malî dinyam
Zênebê wey zênebê le zênebey qelatan
Derdî babanit şêwê nawit kewte wilatan
Deçime ser sipî sengî derwanête nalênê
Deber ew çawey demirim ger be naz helîdênê
Tîrêkî le cergî dam xwênawê dedelênê
Zênebê wey zênebê zêneb dû danî zêre

Ummetî mih'mmedîm le dînim wermegêre
Deçime ser seydeh'imedan kanî zerdim lê diyare
Destit de u'mrî girê şêxî mal le biyare
Berde spîkle çole cêrawgey xom u yare
Zênebê wey zênebê le zênebey qelatan
Derdî babanit şêwê nawit kewte wilatan
Deçime ser qendîlî derwanête lacanê
Deber perçemit demirim le henyet degirim sanê
Payizê were sablax bo gerî de dîlanê
Zênebê wey zênebê zêneb dû danî zêre
Ummetî mih'emmedîm le dînim wermegêre

# Zengilê narîn




Narîn narîn narîn narîn zengilê narîn
Narîn narîn narîn narîn genimê parîn
Hewşa ewkî me bi keviro
Hewşa ewkî me bi keviro
Hewşa keko me bi keviro
Hewşa zava me bi keviro

Herêma Amedê

# Zer hêlan






Zer hêlanê hêlanê lê yarim hêlanê hêlanê
Zer hêlanê hêlanê têlim çoganê çivyandar
Kî siware siwar e lê yarim hêlanê hêlanê
Kî siwar e siwar e têlim çoganê çivyandar
Kî siwarê bergîre lê yarim hêlanê hêlanê
Kî siwarê bergîre têlim çoganê çivyandar
Dajo têye ser bîre lê yarim hêlanê hêlanê
Dajo têye ser bîre têlim çoganê çivyandar
Xwezgînçiyê cahîla lê yarim hêlanê hêlanê
Xwezgînçiyê cahîlatêlim çoganê çivyandar

Zer hêlanê hêlanê lê yarim hêlanê hêlanê
Zer hêlanê hêlanê têlim çoganê çivyandar
Kî siwar e siwar e lê yarim hêlanê hêlanê
Kî siwar e siwar e têlim çoganê çivyandar
Kî siwarê qantira lê yarim hêlanê hêlanê
Kî siwarê êstira têlim çoganê çivyandar
Piya dibe li ser pira lê yarim hêlanê hêlanê
Piya dibe li ser pira têlim çoganê çivyandar
Xwezgînçiyê cahîla lê hêlanê hêlanê
Xwezgînçiyê cahîla têlim çogqnê çivyandar

Zer hêlanê hêlanê lê yarim hêlanê hêlanê
Zer hêlanê hêlanê têlim çoganê çivyandar
Kî siwar e siwar e lê hêlanê hêlanê
Kî siwar e siwar e têlim çoganê çivyandar
Kî siwarê kerêwo lê hêlanê hêlanê
Kî siwarê kerêwo têlim çoganê çivyandar
Tajo tê ser pirêwo lê hêlanê hêlanê
Tajo tê ser pirêwo têlim çoganê çivyandar
Xwezgînçiyê cahîla lê hêlanê hêlanê
Xwezgînçiyê cahîla têlim çoganê çivyandar

# Zêr Zeynebê




Zêr zeynebê zeynebê
Zêr zeynebê zeynebê
Zêr zeynebê zeynebê
Kur li mila Cêr li piştê
Zêr li sêrî Pez da bêrî
Zêr zeynebê zeynebê

Zêr zeyneba min evê
Qedal eslê te keve
Heroj (Hergav ) halê me eve
Kur li mila Cêr li piştê
Zêr li sêrî Pez da bêrî
Zêr zeynebê zeynebê


Zêr zeyneba sîpîkî
Tu bi guharê gupikî
Tu ji mn ra malê nakî
Kur li mila Cêr li piştê
Zêr li sêrî Pez da bêrî
Zêr zeynebê zeynebê

Zêr zeyneba Azîzî
Xizêm zêrê altuzî
Bextê minra tu qîzî
Kur li mila Cêr li piştê
Zêr li sêrî Pez da bêrî
Zêr zeynebê zeynebê

Zêr zeyneba burukî
Xizêm Zêrê Çurîkî
Talie minda tu bukî
Kur li mila Cêr li piştê
Zêr li sêrî Pez da bêrî
Zêr zeynebê zeynebê

Herêma Serhedê

# Zêrîn




Zêrîn zêrîn zêrînê hewar medet
zêrînê
Zêrîn zêrîn zêrînê ziravê nav terhînê
Zêrîna mi ji Kela Wanê
Delala mi ji Kela Wanê
Sed zêr da ser hawanê
Sed zêr da ser hawanê
Dabû qelenê xanê
Dabû qelendê xanê

Zêrîn
Zêrîn
Zêrîna mi ji Kela Qersê
Zêrîna mi ji Kela Qersê
Sed zêr da ser meqesê
Sed zêr da ser meqesê ???
Dabû qelendê wesê
Dabû qelenê wesê

Zêrîn
Zêrîn
Zêrîna mi ji Kela Botan
Delala
Sed zêr da ser qotan
Sed zêr
Dabû qelendê xortan
Dabû

Zêrîn
Zêrîn
Zêrîn ji Kela Mêrdînê
Delal
Sed zêr da ser mêzînê
Sed zêr
Dabû qelendê zînê
Dabû qelenê zînê

Herêma Amedê

# Zeriya gunda dil qemerê





Zeriya gunda dil qemerê
Sûret sorê sing mermerê
Dilê min da mihûbetê
Êgirê nede nav cegerê
Dilê min da mihûbetê
Êgirê nede nav cegerê

Zeriya min e kezî dirêj
Boy huba te ez li bendê
Nehelîne cegerê min
Dil û cegerê min dêne dertê
Nehelîne cegerê min
Dil û cegerê min dêne dertê

Evîndaram navkê zirav
Demî qemer tû jî gul av
Li min da sozê dila
Ez bidime te baqê gula
Li min da sozê dila
Ez bidime te baqê gula

Ez bengîme tu bilbilî
Xas bexçeda di milmilî
Li min da qew qiraran
Nebe payîza min vî dilî
Li min da qew qiraran
Nebe payîza min vî dilî

# Zeynokê




Zeynokê Zeynebê
Ru sorê brîna şevê
Keça hakimê Helebê
Te çi digo min digo lebê
Zeynokê hêrî hêrî
Şivanan pez dan bêrî
Ez şivan zeyno bêrî

Zeynokê xwezî li caran
Em çuban nav şunwaran
Pez berdaban nizaran
Zeynokê Zeynebê

Ru sorê brîna şevê
Keça hakimê Helebê
Te çi digo min digo lebê

Ew Zeynoka Musilî
Te agir berda dilî
Çima tu ji min silî

Zeynokê Zeynebê
Ru sorê brîna şevê
Keça hakimê Helebê
Te çi digo min digo lebê

Herêmên Botan û Behdînan

# Ziravê




Herêma Amedê

Zirav zirav ziravê leylo leylo ziravê
Zirav zirav ziravê cav resê qafir bavê

Zirav e weka derzi leylo leylo ziravê
Zirav e weka derzi cav resê qafir bavê
Li ber derê me da di bezi leylo leylo ziravê
Li ber derê me da di bezi cav resê qafir bavê
Li hev ketin ser û kezi min te diwê beyte nabê

Leylo çûye kirşika leylo leylo ziravê
Leylo çûye kirşika bedevê qafir bavê
Şeqa şeqa şimika leylo leylo ziravê
Şeqa şeqa şimika bedevê qafir bavê
Radimisim zer memika min te diwê bey te nabê

Leylo çûye beriyê leylo leylo ziravê
Leylo çûye beriyê ziravê qafir bavê
Cerxa zera li aniyê ziravê qafir bavê
Cerxa zera li aniyê ziravê qafir bavê
Min xwe avêt pêsiyê min tê divê bey te nabê

Leylo hati ji wê da leylo leylo ziravê
Leylo hati ji wê da keleşê qafir bavê
Agir bi dilê min dada leylo leylo ziravê
Agir bi dilê min dada keleşê qafir bavê
Cavê min mabû di rêda min tê divê bey te nabê

# Ziravê




Ziravê wey ziravê
Zirav zirav ziravê
Zirav zirav ziravê
He ziravê ziravê
Xulama bejna ziravê
Zirav zirav ziravê
Ziravê bendî began
Gel xwe nabim ordekan
Ziravê li bendî mîran
Gel xwe nabim nêçiran
Keziyê zirav ê bi cot in
Wê li ser nilande lot in
Xulama bejna ziravê
Bihna gulan jê hatin
Keziyê ziravê sê ne
Wê li ser milan de têne
Bihna gulan jê hatin
Keziyê ziravê çar in
Wê bi ser milan de xwar in

# Ziravik ha




Herema Amedê

Ziravik ha ziravik ve Leylo Leylo ziravik
Ziravik ha ziravik ker im gêj im deng nakim

Hewşa mezin me dar e Leylo Leylo ziravik
Hewşa mezin me dar e kerim gêj im deng nakim


Dara girtî hinar e Leylo Leylo ziravik
Dara girtî hinar e ker im gêj im deng nakim

Leylo keça mixtar e Leylo Leylo ziravik
Leylo keça mixtar e kerim gêj  im deng nakim

Hewşa mala me bi bî ye Leylo Leylo ziravik
Hewşa mala me bi bî ye ker im gêj im deng nakim

Leylo hati hediye Leylo Leylo ziravê
Leylo hato hediye ji eşq û şewqa ker im gêj im deng nakim

# Zozan ber zozan




Zozan ber zozan zozanê me ne
Zozan ber zozan zozanê me ne

Zozana wêda reş konê me ne
Zozana wêda reş konê me ne

Yarim xemgerî sed car xemgerî
Yarim xengelî sed car xengelî

Heya xemilî heya xemilî
Heya xemilî govend betilî

Yarim teze ye sed car teze ye
Dostim teze ye sed car teze ye

Kiras ketan e kiras ketan e
Kiras ketan e lê ber te şile ye

Zozan ber zozan zozanê mene
Zozan ber zozan zozanê mene

# Zulf şor





Şêt u şeyday kidûme
Kûştey bendey be bazîm
Çawit le xora ciwanin
Ya her wa pir le nazin
Lêm zîz buwe çaw kejalim
Zulif şor u gerdin be xalim
Ay xuda be xoy deyzanê
Bo wî şêt u e'wdalim

Delê ta key sebirim bê
Edî to kengê sazî
Zor kes dêne xwazbênî
Emin pêyan nîm razî
Lêm...
Zulfit...
Ay...
Bo...

Nakirê recaye bikem
Dugmey berokit bitrazî
Zor detirsim netgemê
Taku min dêm bitxwazin
Lêm...
Zulif...
Ay...
Bo...

Dwayî xetay min negirî
Pêm nelêy razî razî
Razîw kirdûn dayk u baban
Eger dêyt u bimxwazî
Lêm...
Zulfit...
Ay...
Bo...

# Zulf û rûxsar




Erê ey be zulif u rûxsar senemî çîn mahî tabim
Demeke u xendekey nîgahit nemek u mezey şerabim
Min le ber nîgahit bimirim tu serî xemzekey celabim
Bilê pêm gulekey beharî le to tabekey cûda bim
Were be şertî caran rojî sed carit fîda bim
Be wêraney dilî şêwawim şîn u waweylaye u ro ro
Awirêk ber bote henawim dête der le henasem bo so
Bum be efsaney wilatan şar be şar mal be mal ko be ko
Xalî goşey çawî ebrot dû dîniyan kirdim le ser to
Ya bimke pîrî meyxane yan mirîdî xanaqat bim
Roh'ekem rûy xot binwêne ta be key kûşte nazit bim
Demeket wetekelûm bêne ta nemirdûm hem razit bim
Carêkî be kerem bimdiwênî be fîday deng u awazit bim
Meylî ebroy to qet nanêm xemzedey çawekey bazit bim
A'şiqî wa debê be hemu dem çaw pir aw dilbiraw meh'zûn
Pê heway bişkê pê nemênê xeyrî ew le derûn u bîrun
Xakî rêy dulbere wamzanî surmeye bo çawî mecnun
Dunyam ew roje lê rûne xakî ber pêy aşinat bim



Kurdistan yek ji welatê herî kevn ê Rojhilata Navîn, kurd jî miletekî otokton ê vê herêmê ne. Di kultur û zimanê kurdî de ev taybetmendiyên kevnar hatine parastin, nexasim di muzîka kurdî de.

Civaka kurd jî wekî civakên din ên Rojhilat, civakeke tradisyonel e, kultura kurdî bêhtir devkî û anonîm e. Ev yek jî herî zêde şopên xwe di muzîkê de nîşan dide.

Di destpêka sedsala 21ê de, tevî hemû zordestî, asîmîlasyon û polîtîkayên tunekirinê ên çaralî, eger em îro behsa kultur, ziman û edebiyata kurdî bikin yek ji rolê sereke ê vê serkeftinê ê muzîka kurdî ye, ê dengbêj, çîrokbêj, stranbêjan... e. Ew bîreweriya sedan salan e.

Tevî hemû populerî û aktualîteya xwe, muzîka kurdî hê zêde nebûye mijara xebatan.

Kilam û Stranên Kurdî bi nota û gotin wekî antolojiyeke muzîka kurdî ye. Bi hezaran kilam û stran bi rêzek alfabetîk ciyê xwe tê de digrin. Tu diyalekt û devokên kurdî, tu herêmên Kurdistanê jê ne kêm in. Cewad Merwanî, bi salan wek dengbêjekî nûdem ketiye pey şopa wan kilam û stranan, ji arşîvên Radyoya Erîvanê ta Radyoya Bexdayê û Kerkukê, berhevokên folklorê her tişt li hev civandiye.

Eger ev berhevok ji bo arşîv û dokumantasyoneke bi rêkûpêk a muzîka kurdî bibe destpêkek armanca wê ya sereke ê cîbicî bûbe.

www.avestakitap.com

ISBN 978-605-5585-16-7

9 786055 585167

avesta